

# NÜDEM

## No 3 1992


### Kovara Hunerî, Edebi û Çandî

Xwedî û Berpirsyarê Giştî: Firat CEWERÎ

#### NAVEROK

Çend Gotin - Firat Cewerî .....	3
Tivinga Rêncber - Dr.Cemşid Bender .....	6
Mahcir - A.Hicri Izgören .....	10
Biranina Cegerxwîn - H.Kılıç .....	12
Cegerxwîn û Lerza Biranînê - Ehmed Huseynî .....	20
Zarok, Dua, Pîrê, Xeber - Eskerê Boyik .....	24
Dadmend - Ferhad Çelebi .....	26
Edebiyat, Siyaset û ... - Xellî Dihoki .....	28
Sibeha İlönê - Arjen Ari .....	36
Çend Gotin Di Derheqa Esma Ocak De - Husen Düzen .....	39
Nameya Ku Hate Gund - Esma Ocak .....	41
Sing û Pîstal - Mueyyed Teyib .....	45
Hevpeyivin Bi D. İzoli re - Dervêş. M. Ferho .....	45
Azadî - Laleş Qaso .....	49
Anton Çexov - Firat Cewerî .....	50
Yen Serxwes - Anton Çexov .....	53
Ez Girtî Me - Bareş Batê .....	57
Kurdeki Bi Rûmet; Y.Güney - Dr.Poloço .....	58
Mêvanê Bêwext - Tosinê Reşid .....	61
Ne Te û Ne Min - Mervanê Keleş .....	67
Mercen Diroki û Derketina Hawarê - Dr. Husen Hebeş .....	68
Biranina Kiralekî Ciwan - Heinrich Böll-Werger: Ş.Soreklî .....	72
Xwin û Berf, Kovaniya Te - Ziya Şeker .....	77
Gerrek Agahi... - Dilower Mêqerî .....	78
Zanîn Ji Nûdemê re ... - Selah Berwari .....	82
Feqiye Teyran - Zeynelabidin Zinar .....	84
Dengnivîsarê Sazbendiya Kurdi - Nûra Cewarî .....	87
Şar - Şirin Bozarslan .....	89
Di Çavkaniyên Swêdi de ... - Nûdem .....	93
Kurd û Kurdistan ... - Timûrê Xelîl .....	96
R. Qutbedin - Amadekar: F.Pirbal .....	97
Le Şîri Mewlewî Kurad da ... - Ehmed Şerifi .....	100
Le Ser Sakoyekî Sard Da - Ferhad Pirbal .....	105
Siyamed û Xecê - Koyo Berz .....	108
Gedêdê Wedatî Ré - Mihem Himbelij .....	112

Hevkareñ Swêd: Xelîl Dihokî, Mueyyed Teyib, Dilower Mêqerî, Hevkareñ Danmark: Weşanxaneña Xanî û Batêyî, Hevkareñ Almanya: Husen Düzen, Hevkareñ Belçika: D. M . Ferho, Hevkareñ Fransayê: Ferhad Pirbal, Hevkareñ Awistralya: Şahînê B. Sorekli, Hevkareñ Tirkîyê: Dr. Cemşid Bender, Hevkareñ Ermenistanê: Eskerê Boyik, Timûrê Xelîl, Hevkareñ Iranê: Ehmed Şerifi, Navnişan: Gamla Landsv. 36, 740 41 Morgongåva, Sweden. Telefon û telefax: 0224-61 428. Postgiro 636 36 25-2. Şerdên abonetiyê ji bo salekê: Swêd 190 skr. Ewrûpa û Rojhilata Navin 50 DM. Amerika û Awustraliya 39 Dolar.



Musa ANTER (Foto: F. C.)

Apê Mûsa,

Em medeniyetê ji te hîn bûn, felsefe me ji te bihîst, pêñûs te bi me şêrin kir, hezkirina xwendinê te da me, em xweşî û jiyanek xweştir ji te fêr bûn, te xort kişandin qada berxwedanê, ji bo-biratiya gelan te bang kir, tu nefşbiçükî dîltenik bû, tu biçûkan re biçük, bi mezinan re mezin bû, tu mirovhez bû, te ji bindestiyê re serî netewand, te jê hez nekir, loma te bi pêñûsa xwe şer kir, ji bo mirovântiyê tu çirûskek bû apê Mûsa, te rûpelekî nû di dîroka me de vekir.

Ji wan weye ku wan ew çirûsk vemirandin û ew rûpel çirandin. Lê ew dixapin apê Mûsa. Bi te, bi Mehemed, bi Îsa; em ê çirûska te geşir, rûpelê ku te vekiriye firehtir bikin!

Em te bi hurmetgirî bi bir tînin...

# ÇEND GOTIN



## Fırat CEWERİ

**V**a bi xêr û xweşî hejmara kovara me ya sêyemin jî derket. Hê berî ku em dest bi weşandina kovarê bikin, em bi gelek kesan şêwiribûn, me li pêşniyar û rexneyên wan guhdarı kiribûn, hin kesan bi vê nûçeya han geleki kêfxweşî û dilşahiya xwe nîşan dabûn, hin kes bêdeng mabûn, hin kesan ji zehmetî û astengên pêşerojê gazin kiribûn, hin kesan milên xwe hejandibûn û lêvên xwe berevajî kiribûn, hin kes jî bi dengê nizim li hember derketibûn.

Her çiqas derketina berhemek di vî celebê NÜDEM'ê de ji bo me kurdan wek damarên xwinê û lêdana dil e ji, dîsan di derheqa wê de nêrinêñ cihê jî geleki normal in. Ev nêrinêñ cihê yên di derheqa kovarê de ji wê re nebûn tu asteng, berevajîya wê, ew ji bo pêşeroja wê bûne weke çirayê. Me jî niha ev çiraya ha ya pîroz xistiye destê xwe û em bi wê dixwazin tarîtiya salan bicirînin û bigilîjin armanca xwe. Di gîhiştina vê armancê de kurdêñ hevwelat me bi tenê nahêlin, ew bi her awayî piştgirî û hevkariya xwe nîşan didin. Yên ku destêñ wan pêñûs û firçe digirin, ew baz didin hawara me, bi nivîs û wêneyên xwe yên hêja û balkêş rûpelên kovara xwe NÜDEM'ê dixemilînin.

Yên ku xwendevanêñ dilpak in, bi riya nameyan, an jî bi riya telefonan li me digerin û daxwaza abonetiya kovara xwe dikin. Hin kes jî pişti pesindaynek dirêj, ji dema kovarê ya demsali gazinan dikin û dixwazin ku kovara wan li ser hev û hê zûtir derkeve û bi lez bigihîje destêñ wan.

Gava em vê dilgermî, dostanî, pêşketin û tîbûna kurdan ya ziman û edebiyata wan dibînîn û hîs dikin, ji bo ku me hê zûtir dest bi weşandina berhemek wilo nekiriye, bi rasî em dêşin û em li ber xwe dikevin. Ji ber ku ji bo me kurdan demek nû dest pê kiriye. Dema hisyarî, zanyarî û azadiyê... Bi guhertina dinyayê, bûyerên herêmê û bi pêşketina teknolojiyê re em jî têñ guhertin, gavêñ bi lez bi demê re davêjin û em dixwazin di vê cîhana nûjen de bi rûmet û serbilind bijîn. Ji ber vê hindê ye ku xortêñ kurdan milên xwe lê rapêçane, bi qevda pêñûsa xwe girtine û bê rawestan zor dane nivîsandinê. Ev xortêñ ku hêviyên pêşeroja civata me ne, em ji wan bi hêvi ne, ku ew ê ji niha û dehsalekî din navêñ wan di rex navêñ nivîskarêñ dinyayê yên navdar de bêne dîtin. NÜDEM ya wan e. Wê NÜDEM di gel rojêñ xweş, di rojêñ herî nexweş de ji wan hemêz bike.

Ji bo hêsanûkirina vê yeka han kovar û rojnameyên kurdan ji bazdane hawara me, bi dilsoziyek dostane NÛDEM'ê didin naskirin, wê bi gelê wê re dikin yek û tovê jiyanê di navbera wê û xwendevan û nivîskarên wê de direşinin.

Rojnameya rojane ya bi tirkî, lê ya kurdan Özgür Gündem, di meha tîmehê 1992'an de li ser derketina hejmara duwemîn ya NÛDEM'ê bendek danasînê belav kir. Rojnamevanê mîzgîr Göndem'ê Mîrza Mustafa Erdogan di benda xwe ya danasînê de piştî ku mîzgîniya derketina hejmara duwemîn ya kovarê dide, weha dom dike: "Kovara NÛDEM bi awira pêşî hewayek entelektuelî jê difûre û edebiyata dînyayê bi zimanekî xweş û zelal tîne ziman." Piştî belavkirina wê benda danasîna kovarê Mîrza Erdogan bi me re li ser hewcedariya derxistina kovarek mîna NÛDEM, li ser rewşa kurdan û li ser çand û edebiyata kurdî hevpeyivînek çêkir.

Herweha di rojnameya hefteyî, ya xwerû bi kurdî Welat de ji Mîrza Z. Farqînî danasînek spehî li ser NÛDEM'ê nivîsandiye. Bi danasîna Farqînî re wêneyê berga pêşî yê kovarê ji bi awayekî balkêş hatiye bi cih kirin. Piştî ku Farqînî mîzgîniya derketina hejmara duwemîn ya NÛDEM'ê dide û xwedî û berpirsiyarê wê bi xwendevanar dide naskirin, ew weha dibêje: "Di vê hejmara duwemîn a NÛDEM'ê de helbest, çîrok, gotar, hevpeyivîn û wergerên xurt hene. Xwediyyê van nivîskaran bi pirranî bi nav û deng in. Gelek ji wan bi nivîsên xwe yên berê ji têñ naskirin. . . Kovar ji aliye naverokê ve gelek dewlemend e. Ji nivîsan bi rastî bêhn û tama zimanê kurdî tê, nivîs fesîh û xwerû ne. . .

Mîrza Eskerê Boyik ji ku yek ji helbestkarên kurd yê navdar yê kevnsovjetê ye, di rojnameya Riya Teze ya hefteyî, ku ji sala 1930'yî û vir de bi alfabeşa kîfîlikî derdiikeve, li ser NÛDEM'ê, di rûpelê dawiyê de bendek danasînê nivîsandiye. Gorî ku ji nivîsa wî xuya dike ew ê hê hejmara kovarê ya duwemîn negîhiştibe wî. Ji ber ku ew li ser hejmara yekemîn ya kovarê radiweste. Ew gelekî kîfa xwe ji kovarê

re tîne, behsa girîngiya kovarek edebî û çandî ya mîna NÛDEM'ê dike û mînakan ji nivîsên di kovarê de dide.

Kovara Edebî û çandî a bi navê Aso ji, ku li Libnanê derdiikeve li ser NÛDEM'ê bi me re hevpeyivînek çêkir. Di hevpeyivînê de li ser derketina kovara NÛDEM'ê hat rawestandin.

Ji bili kovar û rojnameyên bi kurdî û yên kurdan, nivîskar û hunermendêñ kurd ji nêzîkahiyek germ nişanî kovarê dan. Helbestkarê hezkîri Mîrza Mueyyed Teyib di televizyonâ Kurdistana Iraqê de behsa NÛDEM'ê kiriye. Di piroznameya xwe de ew nêrina xwe ya di derheqa kovarê de wilo tîne ziman: "Hevalê hêja kek Fîrat Cewerî, te bi kovara NÛDEM canê Bedîr-Xaniyan şad kir û xwîneke teze da rojnamevaniya kurd-bê gîlî, gotin-dê deriyê xwe ji NÛDEM'ê re veket û bi germî himbêz ketin. Ez bi germî destê te digivêsim, pirozbahiya te dikim û ji NÛDEM'ê re temenekî dirêj dixwazim."

Mîrza Cemşîd Bender, ku doktora xwe ya hûkûkê di salêñ 58'an de li unîversîta Parîsê kiriye, di gelek şaxan de bi tirkî berhemêñ nemir afirandine û yek ji hîmdarêñ Enstîuya Kurdî ya Stembolê ye, bi dil û can bi NÛDEM'ê re ye û ji bo her celeb alîkarî û piştigiriyê di her nameya xwe de amadebûna xwe tîne ziman. Nivîskar û welatbez kurd Mîrza Dr. Cemşîd Bender wilo dinivîsine: "Birayêñ min yên hêja, Bi xebata ronakbîrêñ kurd yên li Swêd, ev deh salek e, ku edebiyata kurdî ges bûye. Ez wilo bawer im, ku di pêşerojê de wê xebata we bi navê dibistana Swêd di dîroka me de cih bigire. Wê rojekê li ser xebat û mijûliyêñ we, kovar û rojnameyên we, lêkolînêñ kûr çê bibin û bi nivîsên hêja berpêşî gelê me bibin. İro ji em dibînin, ku seriye kar û xebata çandî li welêt dîsan hevnijadê me kurdêñ li Swêdê dikişinin. Bi vê yeka han we bingehek baş avêteyiye. Gavêñ ku demekê ji bo çand û medeniyeta kurdan ji aliye Bedirxaniyan

û Nûredin Zaza hatine avêtin, iro em dibînin ku ekola Swêdê seri dikişine. Derketina NÛDEM'ê em gelekî kêfxweş û dilşa kirin. Bi taybetî werger û danasîna ji edebiyata Ewrûpiyan destpêkeke gelek baş e. Ez kovara we ya ku ez gelekî diecibînim û jê hez dikim, bedew û dagirtî ji dil pîroz dikim, silavên xwe yên dostanî pêşkêş dikim û ji her celeb hevkariya we re amade me."

Resamê kurd yê navdar Remzî, ku ev çil sal in, firçeya xwe bi hosteti li ba dike û di warê hunermendiyê de iro bûye navekî navnete-veyî û di hejmara me ya duwemîn de Mîrza Mehmed Uzun nivîsek danasînê li ser nivîsandibû, hezkirina xwe ya NÛDEM'ê wilo tîne ziman: "Min NÛDEM pirr pirr eciband, ew gelekî xweş û spehiye. Herweha hevalên min yên firansız ji ecibandin. Ez we ji bo vê xizmeta çanda kurdi ji dil pîroz dikim."

Helbestkarê nûjen, Ferhad Pîrbal ku niha hevkarê me yê Firansayê ye di piroznameya xwe de weha dînîvisîne: "Pîrozbayan lê dekem be boney bilawkirdinewey govarî NÛDEM. Min emro jîmara duwem le Enstituya Kurdi ya Parîsê dît. NÛDEM hem le barî şêwe û muntaj, hem le barî nawerok û kalîte, govareki kok û dewlemed e. Awatexwazim ke bîken be rewteki edebiy newjen û pêşkewtûtir. Her bijîn.

Hûn ji her bijîn! Hemû kovar, rojname, nivîskar, hunermend û xwendevanê kurd yên ku nêzikahî li kovarê kirin û dikin, her bijîn! Em ê bi hev re zora gelek zehmetiyan bîbin. Em hew êdî qîma xwe bî jiyana rojane û basitînin. Em serê roka azadiya xwe di paş çiyayê Kurdistanê yê herî bilind de dibînin. Em ê ala zanistî û medeniyetê li wir biçikînin...

# TIVINGA RÊNCBER



Dr. C. BENDER

Dr. Cemşid BENDER

Weke iro tê bîra min. Ew lawîkekî zerik û zeyifokî bû. Çavên wî yên keskê vekirî di paş berçavka wî ya çarçeve qalind de melûl û fikirtijî bû. Em zarokên kurdî yên xwas bûn. Bavêن me ji ber şer hatibûn li wî bajarı bi cih bûbûn. Ji ber ku gotina "kurd" qedexe bû, wan ji me re digotin zarokên mahciran. Em xwas bûn, lê lawê Mufetîş her tim bi solêن xwe yên boyaxkiri digeriya. Kincêن wî jî nû û xweşik bûn. Me ji xwe re ji şaxêن spîndaran ên zirav pîspîsk çê dikirin, lê lawê Mufetîş ji xwe re pîspîskeke bekçîyan ji bajêr kirî bû. Di lêgerîna çûkan de ku em winda bibûna, bi lêdana pîspîska wî em tavilê dihatin ba hev.

- Binêrin, va lawê Mufetîş sax e, me digot û heyâ ku ji me dihat me li pîspîskêن xwe dixist.

Wî, şaxêن daran dida ali û bi berçavka xwe ya ku dadiket ser pozê xwe ve bi bêhnîkandinekê ve xuya dibû.

Ew rez, fêkiyên bê xwedî û çûkêن ku difirîyan hemû di bin emrê me de bûn. Em weke dewriyan heyâ aşê avê li gelî digeriyan, em bi giran ve radipelikîn, em li wî cihê ku jê re digotin "Zinarê Keçikan" rûdiniştin, me bêhna xwe berdida, me li hêşnahiya li derveyî bajêr temaşe

dikir û em vedigeriyan. Küçikêن şivanan yên bê xwedî dihatin me û em derbasî aliyê rê yê wî alî dikirin. Lawê Mufetîş zû bi zû nedikeniya. Ew hertim difikirî. Gava em bi hev re diketin qayışa avêtina kevirê kefkanîya, wî ji bêrika xwe kovareke zarakan derdixist û dixwend. Gava yekî ji me ji yê din dûrtir davêt û lawê Mufetîş ji ew serketîna han ferq dikir, me di bin çavan de li wî dînihêri. Wî guh nedida tiştên wilo, lîskêن me bala wî nedikişandin.

- Binêrin, binêrin, axayê we Smaîl bû ye yekemîn, İsmâîl digot û tepik li sînga xwe dixistin.

Lawê Mufetîş ji ber van kirinêن İsmâîl guhêن xwe miç dikirin, ew wer ku aciz dibû, wî nedixwest ku ew bûyerê bibîne.

- Navê te ne Smaîl e, İsmâîl e, birawo, digot û nizanim wî çend caran şâsiyên lêwik rast dikirin.

Di şûna gotina Îbo de, ez gotina Îbrahîm ji wî hîn bûbûm. Ji ber rastkirina van şâsiyên me bûn, ku lawê Mufetîş em li dû xwe dikîşandin. Ji bo şikandina forsa lawê Mufetîş ne derketina İsmâîl ya zer Zinarê Keçikan, ne jî li ser riya bitoz bîst û pênc gava meşa wî ya li ser destan pere kir. Min jî bi terriya wî marê ku min ew berê bi dar gêj kiribû, girt, hejand û avêt. Lê ji

bo şikandina forsa wî wê yeka han jî pere nekir. Em hersê zarokên wek kerpiçen Meramê yên şewitî, qemer, me çi kir jî, dîsan lawê Mufetîş hêdî, lê bi hosteti em dixistin xefka xwe û em bi xwe ve girê didan.

Her ku hevaltiya me bi pêş diket, rojêñ nû ji wî re serfiraziyêñ nû tanî. Ew zarokekî biaqil bû. Her gava ku wî davêt, her tevgera wî weke resimekî mozaikî ku ji perçekevirêñ biçûk pêk hatibû, ew serfiraziyêñ wî dixemiland. Di dirêjahiya demsalek havîna bi bet de, em rojekê li bin darekê rûniştî bûn û me riya lawê Mufetîş dipa. Wî hez dikir ku em li bendî wî bimînin. Ew dereng hat. Tiştek di destêñ wî de bû. Gava ew nêzîk bû, em têgihîştin ku ew tişte di destê wî de tivigek ku devê wê bi kuvarkêñ bi ben xetimandiye. Ez, Îsmail û Îbrahîm lastikêñ me yên çûkan di destêñ me de û em sar mabûn.

Weke ku Îbrahîm ta girtibe, "Em ê niha çi bikin, em ê çi bikin?" got. Îsmail jî pişti ku ew buxuşkêñ berî bi kurtemekê dabû hev, xist bêrika xwe ji bo ku ew quşurekê bibîne peyivî:

- Lê ev tiving çûkan nakuje.

Lawê Mufetîş jî,

- Ev ne ji bo kuştina çûkan e, got. Ger bavê min bibihîze ku ez çûkan dikujîm ew ê bi min re hêrs bibe.

Îsmail bi ken, weke ku bawer nekir,

- Ger bavê wî bibihîze ew ê hêrs bibe, bi teqlîtpêkirînî got.

Lawê Mufetîş henekê xwe bi devê Îsmail kir,

- Mirov gotina "bav" wilo nabêje.

Ji bo ez liberxweketina Îsmail nebînim, ez çûm ser kehniyê da avê vexwim. Di vegerê de mîna ku Îsmail hisen xwe yên súcdar vesêre, ew rabûbû ser herdu destêñ xwe û ber bi Îbrahîm ve dicû. Ji bo ku ew xwe ji solêñ wî yên bi toz biparêze, wî hêvî dikir, ku ew jê bi dûr bikeve. Ew yeka han qet ne xema Îbrahîm bû, wî bi destêñ xwe Îsmail dehf da û ew xiste erdê. Paşê ew hate ba min, mîna ku wî fikrek

din kivş kiribe, bi hêsanî û bi dilşahî got:

- Em jî ji xwe re ji şaxêñ daran tivingan çê bikin. Bila her yek ji bejna me dirêjtir be.

- Baş e Îbrahîm, em çê bikin, min jî got.

Lawê Mufetîş li mîrgê rûniştibû, tivinga wî li ser çonga wî bû û kovara xwe ya zarokan dixwend. Wî qet guh nedida me. Îsmail herdu destêñ xwe mîna baskêñ çûkan kirin, li herdu hêlêñ xwe xistin, hate ba me û tevli biryara me bû. Lê me nikarîbû serê lawê Mufetîş ji ser wê kovarê rakira.

Haziriya me du roj ajotin. Min ji malê ben, bizmar û hin tiştên din anîn. Min lastika xwe ya çûkan bi herdu hêlêñ tivinga xwe ve bizmar kir. Qet nebe ew buxuşkêñ ku min ê tê de bi cih bikirana, min ê çar pênc metre biavêtana. Îbrahîm û Îsmail jî niyet û zemanê xwe yên baş dane vî karî.

Gava gundiyyêñ ku genimê xwe dibirin êş di wir re derbas bûn,

- Çi ye zarokno, ma hûn haziriya şer dikin, gotin. Lê lawê Mufetîş qet li me hayî nedibû.

Yê me em bi çekirin û duruskirina aletêñ xwe ve mijûl bûn, lê lawê Mufetîş bi tenê carinan destmalkeke pakij ji bêrika gomlegê xwe ya biçûk derdixist, pê camêñ berçavka xwe pakij dikir, paşê dîsan berçavka xwe dida ber çavêñ xwe, bi pozê xwe ew çend caran ber bi jor ve hildida. An jî kêzika ku wî dikust, gula ku wî jê dikir, datanî kêleka xwe û ziq lê dînihêri. Her tiştên ku bala lawê mufetîş dikişand, wî dixwest wan di çav re derbas bike.

Heçê ez bûm, min di hundirê xwe de heq dide Îbrahîm, ez difikirîm ku "hê ev lawik çi bîne serê me" Lastika min ya çûkan ji bizmarêñ qalind, birînêñ mezin xwaribû. Di ser re jî bi kutana keviran, min ew ji hev perçê kiribû. Ji bo min geleki zehmet bû ku min ji xwe re lastikêñ nû bikirîya. Ew pereyêñ ku wê bavê min bidaya min ji bo eydiyê bû, lê hê ji eydiyê re sê meh mabûn.

Îbrahîm jî ew neynika biçük a girover, ya ku ji malê dîzî bû, bi qevda tivinga xwe vekiribû. Îsmâîl jî tivinga xwe bi morîkên biçük û bi reng xemilandibû. Em westiyayî, ji haldeketî û perişan bûn. Roja ku me ê ji lawê Mufetîş re bigota, "Edî va ye tivingên me ji heye" wê rojê wî tivinga xwe ya xweşik, delal û malê fabrikê neanşibû. Me jî li serê çem, li binê darê, mîna leşkerên ku her havîn ji bo talîmê dihatin, me tivingên xwe spartibûn wir, em li dora wan diçûn û dihatin û em li bendî lawê Mufetîş bûn. Me digot, gelo ew ê bêje"çawa jî tivingên xwe spartine wir".

Îsmâîl lîka ku ji pozî wî diherikî dikişand û nanê xwe yê bi rûn dixwar. Îbrahîm jî weke ku ji min hêrs bûbe, behsa serpêhatiyek xwe ya do kir. Di wê navê de, lawê Mufetîş herdu destêñ wî li paş qûna wî bûn û kete nav me, bêî ku ew tiştekî bibêje, derbasî ba tivingan bû û di ber wan re çû û hat. Em li dû mabûn. Ji bo ku em bimeşin û herin ba tivingên xwe, me li çavêñ hevdu nihêrîn. Qêrîna pêşî ji Îbrahîm hat. Tiştê ku digot nedihate fêhm kirin, lê pehînek li tivingên me yên ku me spartibûn wir, xist. Eşa lingêñ wî yên xwas qet ne xema wî bû. Wî bi wê yeka han dixwest xwe têxe çavêñ lawê Mufetîş, ew êdî derbasî aliyê wî dibû.

### Îbrahîm:

- Wî lawê qehpê neynika min şikand, bi qêrîn got. Îsmâîl û Îbrahîm bera ser pişta hevdu dan û lawê Mufetîş derbas kirin. Pişti kurtedemekê Îsmâîl kete xwarê û Îbrahîm jî bi kulma li devê wî xist. Ji bo ku hemû keda min bi erdê ve neçe, min tivinga xwe ji nav tozê hilanî. Ez li dû hemûyan dimeşiyam. Gava Îsmâîl xwe ji girî li erdê dixist, Îbrahîm zîvirî hate ba min. Du pehîn jî li zikê lêwik xistibû. Ji tirsa ku wê Îsmâîl zixurêñ di bêrika xwe de bavêje wî, wî xwe davête pişt min.

Me Îsmâîlê ku digot "Ay yadê tihêla min, ay yadê tihêla min" derbas kir.

Gava ku tu tâlûke nema, mîna ku Îbrahîm bêje yê súcdar lawê Mufetîş e, ev zarokê ha li

hember Xwedê derdikeve yaho, got. Min got ez ê jê bipirsim, bê ka ew ji bo ci li hember Xwedê derdikeve, lê min nepirsî. Wî dixwest wî lawikê ku şexsiyeta wî dipelçiqand, bi Xwedê re bike dijmin, da ew bi xwe rehet bike. Lê qet ne xema lawê Mufetîş bû. Min li berketina Îbrahîm zû fêhm kir. Ji bo neynika girover wê diya wî, xaltiya Miyasê lêxista. Ji ber ku ew neynika bavê wî ya rihkirkirinê bû.

- Gava min darê tivingê çê dikir, min güzanê wî bi kar anîbû, min ew ko kiribû, niha jî va me neynika wî şikand. Pirr xerab e, digot.

- Ma neynika we ya konsolê tune ye? min jê pîrsî.

- Heye, lê bi dîwêr ve ye, got.

Îsmâîlê ku ji bo carek din lêdanê nexwe û têra xwe ji Îbrahîm re xeberan bide, bi qedereh deh panzdeh gavan li dû me mabû.

- Baş bû, baş bû, got.

Ew meşa wê roja bi bahoz wilo derbas bû. Heya ku lawê Mufetîş hilkişîya ser Zinarê Keçikan û li wir rawestiya, bêhna wî diçikiya. Yê min jî tivinga min di destêñ min de bû û ez çûm ba wî.

Ev cara pêşî bû, ku pişî pevçûnê Îbrahîm û Îsmâîl dihatin ba hev. Dijiminatiya hev ji bir kiribûn, bi hev re dikenian.

Min di dilê xwe digot: "Ji ber ku lawê Mufetîş westiyaye, ew rawestiya ye".

Lawê Mufetîş cihê ku pê ve hilkişiyabû, nişanî me da,

- Gava ku mirov bi serkêş ve radipelike, erd nêziktirî lingê mirov e. Ji ber vê yekê diva bû, ku mirov ji meşa li ser erda rast hindiktir biwestiya. Lê ne wilo ye, ji bo ci gelô?

Îsmâîl destê xwe bir ser eniya xwe û xurand.

Wî tenê dixwest nişan bide ku ew difikire. Heçê Îbrahîm bû, ew ji mêt ve bi çûyina zora xwe razî bû. Neynika wî şikestibû. Wek ku ew mecbûr bû ku tiştek bigota,

- Werin em herin qereqola Meramê û em ji wan bipirsin, got. Ew hukûmet e, ji me çêtir dizane.

Wê nêrîna İbrahîm a ku di rojêng teng de xwe disparte peyayêng dewletê ez diêşandim. Min di wê navê de li lawê Mufetûş jî nihêri, ku ka bê ew jî hêrs bûye an na. Ew difikirî. Ew di nav fikreke ku nikarîbû jê derketa dipelçiqî. Bi destê xwe çenga xwe ya zer difirkand, bi pozê xwe berçavka xwe ber bi jor ve dibir. Paşê bi carekê ve rûyê wî fireh bû. Wî em carek din jî ji bîr kiribû.

- Ez ê herim ji bavê xwe bipirsim, got. Wî xwe weke gulleyê jî serê kêş berda jêr û di nav deviyan de winda bû. Em di zirecêba dinyayê de bi tenê mabûn. Ji bo ku Îsmâîl xwe ji hêrsê vala bike,

- Gava ez bi girik ve bi hewa kevim, ez ê bi-westim, newestim, ji te re çi kûçik lawê kûçika, got.

Weke ku İbrahîm jî heq bide wî,

- Em nikanin bi wî lawikî re qayışê bikişinin, em lawê rênçberan in, wî gotina bavê xwe bi bîr anîbû.

Rezêng Meramê li pêş me dirêj dibûn. Pale bi bêrêng nav milêng xwe ve di şiveriyêng jêr ve derbas bûn û çûn. Ji bo ku em jî derdê xwe ji germa ku lingêng me yên xwas dişewitand re, bibêjin, em çûn ser çem. İbrahîm û Îsmâîl ketin avê, ez jî li ser pira textinî rûniştîm û min lingêng xwe yên bi toz xistin nav ava sar.

\* \* \*

# MAHCIR

## A. Hicri ÊZGÖREN

Min hemû azadiyêñ xwe bi bîhnekê xelas kirin  
Ez êdfî Janeke mahcir im  
Mîna ku ez hemû evînêñ xwe bi şasî jiya me  
Xencereke zingarî me, bê welat im  
Bêrawestan xwîn ji nan û kêfxweşîya min dihere

Min çiya li hundurê xwe, bahoz di dengê xwe de kolandin.  
Her kêlikeke min êşek e, ku qetliam tevî bûye  
Bedena min zêdahiya şevêñ Helbçe ye  
Nivînêñ ku ez dikevimê hew min germ dike  
şevêñ xerîbiya derengmayî ne yêñ min in  
Qêrîn hîç ranawestin di rehêñ mîjiyê min de  
Min mîna yadîgarekî kozikan bihesibîne  
Yan jî perçeyekî bêçek ji wexta teng

Her roj koçeke nû dest pê dike di dilê min de  
Kon radibin, zîn li hespa dikevin  
Ew zarokên ku min bi serê wan sond xwariye  
Mîna hespêñ bezayî, westayî dikevin rê  
Xwe bi cih û deverên nû digihînin

Ez niha mîna zivîngeke terkkirî bi tenê me  
Mîna gunehkarekî ku adet û usûl dane bin lingan  
şewatek bi navê huwyetê li ser sînga xwe digerînim  
Ez divê gulek lêkim di bin vê nav û navnîşanê de  
Eger rojekê zarokek bixwaze rabirdûya xwe bixwîne  
Ew navê min nizanibe jî dibe, lê divê min bibihîze  
Mîna dengê xîcekî ku li xîcekî din dihûne  
Ew bikaribe bibêje, ev deng ê min e, ev ez im

Dîsan mitirb di pêldana xwîna min de lêdixe  
Ez êdî westiyam ji jiberkirina şikestan  
Ez êdî divê stiranên nû ji bo xwe peyda bikim  
Dest bi evînên nû, gerên nû bikim  
Yan na wê tarîx hertim min şikestî û bindest bihesibîne

# Bîranîna Cegerxwîn

H. KILIÇ

**S**al 1978, meha çirî. Payîzeke zû ye, lê xweza şîne bijûn ber bi zer û hişk bûnê ve ye. Lê belê, tîrên rojê hêj ji hestiyêñ mirov germ dikin... Hat û çûna li ser bajêrên "serxetê" xurt e. Ji Hekarî û Wanê bigre heta Mêrdin û Ruhayê gereke car bi lez car jî li ser hemda xwe û tenha... Di vê trafikê da carna jî seredanîya bajêrên "binxetê", westan û monotonîya hat û çûnan germ, xweş û xemîl dikir. Di keyseki herî baş da me çerxek li binxetê jî da û riya xwe bada ser bajêrê xweşî navça Cezîre Kamişlî...

## Hevalê rê

Şeveke payîzê li Sêwerekê digel hevalê dilêr Necmedîn Büyükkaya derbaz kîrin hêj ji bîr naçe... Digel refek dostêr hêja, axiftîn û suhbeta di nav hewşa mala babê Necmedîn da li ber bayê hûnikî (ne yê zozanan!) bawesînê (ventilatörê) qet ji bîr diçe... Ew demê di wê hewşê da hatîye jîyan di nav rîza bîranîna da demekî taybetî û hêja ye...

Digel berbanga sibê, xeweke kurt û em bi teqüreqa deriyê hewşê hişyar bûn. Necmedîn ji deriyê piçûkî di nav deriyê mezînî hewşê da bi wê bejn û bala xwe'y bedewe mîna tayê spîndarê çawa kete nav hewşê, destêr wî bi kîsikên kaxez ve tijî wisa roj başî di me da...

Diyar bû ku, çû bû çarsûyê ji bo têşta me tişti kiribûn... Piştî têşt û suhbeteke dirêj me demî xwe kire nîvro... Paşê ji me xatira xwe ji bab dayîk û birayê Necmedîn xwest û teví Necmedîn ji hewşê derketin. Necmedîn hazırlîya çûnê kiribû. çawa em derketin deriyê hewşê Teksi I ber derî hazır bû... Em lê suwar bûn û di bin tîrên germe hetava Sêwerekê da ber bi Serûkanîyê ve bi rê ketin... Diviya bû ku em dorberê evarê bigihin ser qewlê xwe. Lewma Necmedîn riya ma dirêj kir û ji pişta bajêr ra em ber bi gundeki Serûkanîyê ve çûn. Dema em hatîn gund roj ber bi avabûne ve bû. Bêhneke çay vexwarinê em li mala dostekê mîhvân bûn... Wekî demê me hafî em çûn ser qewlê xwe û me digel Necmedîn destêr xwe hejandin û xwe berda binê xetê... Di nav wê zevîya mayînan da li ser tîrerêyekê Necmedîn li pêşiyê wekî bayê birûskê dipeyikî... Wekî em gihiştine mala dostekî gundê pêşîne binxetê, piştî silavê gotina herî pêşîne xwedîyê malê "Kak Selah çaya we hazır e" bû... Necmedîn edî "Kak Selah" bû û digel "Selah" bûna wî em jî bi navê binxetî bûn...

Piştî wê şeva têrxew sibê zû em çûna Serêkanîya binxetê... Sifra têşta me bû mala "Xale Remo" li Serêkanîyê... Digel rîbarî û demekî xweş bi Necmedîn ra em ji hev veqetîyan... Ew bi alîkê ve em jî ber bi Kamişlî ve bi rê ketin... Dema digel Dr. Kemal Xoşnav

bi Jeepa Kak Behzat em hatiye Kamişlı saet nîvê şevê bû...

Spêda pêşîne Kamişlı em bi dengê xwendina Qur'anê hişyar bûn... Dema em li ser têşte Kemal Koşnav bi heneki û keneke têrdeng got "diyare Kak Behzat hûn jî bi awazî Qur'anê hişyar kirin"... Kak Behzat jî hema da bersivê û go "Kaka biborin, emin jî dengî ew segbabe Ebdulsemede zor hezekim"... Hindî em li wê derê man ew "awaz" jî me kêm nebû!..

### **Hevdîtina pêşîne digel seyda Cegerxwîn**

Cerxa me ya binxetê dirêj kêşa. Ji Serêkaniyê, Amûdê heta binê Endîwer û Dêrikê me qada gera xwe fireh kiribû. Ji xwe Hesekî li ser riya me bû, çend em diçûn Serêkaniyê me serek lê dida... Pişti firîneke kurte ji ser Helebê bo şamê em disa vegerîne Kamişlı... Payîza me êdi bi derengî ketibû... Li gor gotinên Cezîriya "berê zad" ew şâ kiribûn. Yen têr zevî têrên bireng raçandî tiji genim, kisikên xwe jî tiji "lire" kiribûn... Paleyên ku helbestên Cegerxwîn xemînlendî das û tirpan ne hejandibûn lê li ser makînên genimdirûn û patosan xûha xwe kiribûn keda helal û vegeribûn ser malên xwe...

Ev payîza dereng bi rasthatina li gor adetê İslâmî "Eyda Hecîya" piçekê xelk bizivandibû... çarsûya Kamişlı tiji bû û hatûçûna li nav malan jî trafîka taxên Kamişlı boş kiribû... Ermeniyên Kamişlı jî li gor vî adetê «slâmî "eyda" cîranên xwe Kurda pîroz dikirin!..

Roja pêşîne vê "Eyda Hecîya" em li salona mezine mala ku em lê mîhvan rûniştî cab hat ku Hemîdê Derwêş û Seyda Cegerxîn digel çend hevalên xwe dê bêne piroziya vê "cejnê"!.. Di programa me da ji xwe seredaniya Cegerxwîn hebû. Lê hevalên ku em lê mîhvan ev rasthatine li hev anîn. Eve keysekî baş bû...

Cegerxwîn li pêşîyê mîhvan hatîn û pişti seramonyeke formel cejna hev û du pîroz kirin û

rûniştin... Behsê "Eyda Hecîya" êdi li dûr mabû. Axiftin û suhbet li ser pirs û problemên welat kûr û fireh bû... Di navbera vê axiftinê da me "çikçikek" xwende guhê Cegerxwîn ku em pê ra hevpeyvînekê bikin. Di cih da rabû û gote civatê "Heyran hûn axiftina xwe bidomînin ez û ev hevale jî li odeke dî emê jî xwe ra baxivin" ... Em bi Cegerxwîn ra derbazî oda dî bûn. Me hazırlîya xwe kiribû. Pişti suhbetekê kurt me çend pirs jê kirin û wî jî bi sebir û hemd bersivêن xwe dan.

Cara pêşîn bû ku ez rastî Cegerxwîn dihatim. Carina dema mirov hêj ne dîti hizra mirovekî navdar dike wisa dizane ku ew wekî palevanekê gir, wek şerekê bişel û wekî pilingekê jî bi sehm e lê belê gava rastî wî mirovî tê, dibîne ku mirovekî beden piçûkî mîna sivorekê ye. Berî ku ez rastî Cegerxwîn bêm ew bûyera ku bi serê Dr. İsmail Beşikçi li zîndana Diyarbekir hatî hate bîra min. Pişti 12-ê Adara 1971-ê dema ku cunta fasîst, kurd-tîrk hemû şoressgera digre davêje zîndanê, İsmail Beşikçi jî digrin davêjin zîndana Diyarbekir. Beşikçi bi nîvîsin, axiftin û berxwedana xwe mafê gelê Kurd şerane diparêze li hember dadgehîn leşkerî. Ev nav û dengê

Beşikçi jî li Kurdistanê belav dibe û sempatiyekê mezin peyda dike li nav xelkê Kurd. Rojekê çend gundi têñ hefsa Diyarbekir û dixwazin Beşikçi bibînin. Gardîyan bang li Beşikçi dîkin û Beşikçi têt û li hêviya wan dimîne; gundi jî li alîyê dî li hêviya mirovekî mîna "dêwekê" ne. Qederekê wisa li hember hev li hêviya hev dimînin. Paşê ji gundiyan ra tête gotin ku ev mirovê hûrîkî mîna sîvorâ «smail Beşikçi ye. Gundi wisa ecêpmayî dîbêjin "heyran em jî li hêviya mirovekî wisa bûn ku destê me negihe milê wî, lê diyare tu yî Beşikçi..." û bi hev ra dikenin û gundi disa dilheziya xwe nîşanî Beşikçi didin û diçin... Vêca carina bêhemd mirov wisa dihizire ku nav û gotinên mezin yên mirovên beden gir in. Lê helbet ne wisa ye. Carina "hûrikek" deryayek e wekî Beşikçi, lê yekî girî mîna filekê nake dilo-

pek... Lî belê, carina xwediyyê nav û kiryarêñ mezin bi beden jî gir in wekî palevanekê, bişel in wek şerekê, bisehm in wek pilingekê. Aha Cegerxwîn yek ji van kesa bû ku hem bi nav û kiryarêñ xwe hem jî bi senga bedena xwe i gir û mezin bû... Dema min eve jê ra gotî bi deqîqan kenibû Cegerxwîn...

Ev hevpeyvîna min ya digel Cegerxwîn 15-ê meha kanûna (çilê pêşin) sala 1978-ê di hejmara 12. ya Roja Welat da hate weşandin. Baleke germ kişandibû hingê. Ji ber ku cara yekemîn bû ku hevpeyvîneke digel Cegerxwîn di rojnameke kurdi da li Kurdistanâ Bakûr dihate weşandin... Paşa ev hevpeyvîne di kovara Özgürlik Yolu da (hejmara 44, meha çile sala 1979-ê) bi tirkî jî hate weşandin...

Pêşiyê herwekî adetî min jî bi pirsa li ser jîyana wî dest bi hevpeyvînê kir. Cegerxwîn xwe li ser kursiyê piçekê livand, pîyêñ xwe dirêj kirin, destêñ xwe danîn ser rexên kursiyê û bi wî dengê xwe'y nerm û tijî dest bi axistinê kir :

*Z.Elki – Mامosteyê héja, gelê Kurd te baş nas dike û gelek ronakbirêñ Tirk jî. Em bi te û navê te gelek serfiraz in. Min dixwest, tu di derheqa jîyana xwe da me careke di ronî bikî.*

Cegerxwîn – Qeydî nake hevalê delal. Sala 1900-ê li dora Mêrdinê li gundê Hesarê hatim dinyayê. Babê min rênçber bû... Hasîlî em gelek feqîr bûn. Wexta ez 9–10 salî bûrn, dayîk û babê min mirin. Bi destdarîya xwe min şol dikir û jîyana xwe derbaz dikir. Hatime 18 saliyê, min dest bi medresê kir. 10 sala da min xwendina dînî xilas kir û îcaze stand. Ji bo xwendina dînî li gelek ciha gerîyam : Iran, Iraq û Sûri... Sala 1927-a zewicîm. 1928-a jî li Sûri min dest bi melaşîya gunda kir. 1935-ê bûma xwecihê Sûri. 6 dîwanê min hene : 3 hatine çap kirin, 3 jî mane. 2 pirtûkên çiroka jî min nivîsandine : Yek Cim û Gulperî ye, ya dî jî Reşoyê Darê ye. 3 pirtûk (ji erebî) û qezatek jî min wergerandine zimanê me. Ya pêşin

Halfin e yêñ dî jî Mînorskî û Komara Mehabadê (ya Agleton) ye. Qezeta farisi jî di derheqa şoresgerekî Iranî da ye, li demê Elmanya Nazî û Hitler ev şoresger hatîye kuştin. (\*)

Niha jî helbest û çirokan dinivîsim. Wekdî, pirtûka jî werdigerînime ser zimanê me.

Li Kamişlo rûdinim. 7 zaroyê min hene. 2 xort in, 5 jî keç.

Pişti vê pirsê min xwest hewayê hevpeyvînê ji çarçova monotone pirs û bersiviyê derbêxim... Cegerxwîn bi şeleke dilnizmî û bi sebir diaxift... Li ser bêje û hevoka çu leza wî nebû... Min jê xwest ku li ser helbest nivîsin û babetta helbesten xwe baxive... Bi rûkenîyeke balkêş axiftina xwe demand :


*Z.Elki – Kîjan salê te dest bi helbest nivîsandinê kir û di helbesten te da merhela şoresgerî kengî dest pê kir ?*

Cegerxwîn – Sala 1924-an min dest bi helbest nivîsandinê kir. Îtirafekê jî bikim baş e... Ev sal dest pê kirina welatparêzîya min e jî... Salêñ ewil, di helbesten min da tema millî û welatparêzî giran bû. Lî disa dijî axa, şêxa û bega û teví kevneperesta jî min dinivîsand. Vê temayê heta herba Cîhanê ya duya kêşa. Ji sala 1945–46 pê ve di helbesten xwe da min tema şoresgerî giran kir.

*Z. Elkî – Helbesta ci demê rojê dinivîsi û di helbesten te da kîjan babet giran e ?*

Cegerxwîn – Wekî min gotî, di helbesten min da babetta şoresgerî û welatparêzî giran e. Wekî hûn dizanîn, bêhna welatparêzîyê û ilmê sosyalizmê ji helbesten min tê... Wekdî, dijî axa, şêxa, bega, teví kevneperesta, nijadperesta û emperyalizmê dinivîsim. Metha marksizmê û leninizmê dikim. Materyalizmê di nav helbesten xwe da dîyar dikim. Ji bo şîyarbûna gelê me ci hewce ye, ji riya sosyalizmê dernakevim û dinivîsim...

Bi piranî li demê beyanê, wexta şîyar dibim,



CEGERXWÎN

1903-1984

berî têşt xwarinê helbestan dînîvîsim. Wî wexfi gelek helbestên baş dînîvîsim. Ihamek baş tê serê min...

Wekdi, ci zordesîya ez dibînim, mesele weki digerim, bibînim yek tedayekê digel insanekê dike, yek belengaz e, ya mezin ji xwe gelê min bindest e... Ez ji van meselan ilhamê distînim û helbestan dînîvîsim...

Cegerxwîn weki helbestvan pêşengê helbesta kurdî ya hevdemî ye. Di warê helbestê da hostabûna Cegerxwîn ji xîm û bingeha zengîni, saxlemî û qewîbûna helbesta kurdî têtin. Cegerxwîn xwedî şans bû ku li pêşîya wî, Herîriyan, Cizîriyan, Teyran, Bateyîyan, Xanîyan, Mizûrî, Hezroyî û Birîskanîyan û geleken dî bingehê helbesta kurdî bi hostahîke mezin danibûn... Cegerxwîn li ser vê zengîniyê reng, naverok, form û temayekî nûjen da halbesta kurdî û bi vê yekê helbesta kurdî hem anî merheleke nû hem jî helbest kire şûrê xebat û têkoşerîya şerî azadî û serxwebûniya gelê Kurd û welatê xwe Kurdistanê... Cegerxwînê ku jiyana wî bûye helbest helbet divîya ku hindek şîretan jî bike. Min jê xwest ku dê ji bo nîşê nû çi bêje:

**Z. Elkî – Ji bo helbestvanen Kurdistanê çi rê nişan didî û ci daxwazîyen te dê jê hebin ?**

**Cegerxwîn** – Daxwazîya min ev e ku helbestvanen Kurdistanê, çend qeweta xwe ji bo dijminê navda û derve serf bikin, ji bo şiyarbûna gelê me xebat bikin. Destê ku qelem digire, ji bo riya ilmê marksîzmê û lenîñîzmê bila biwestînin. Bila gelek binivîsin, edebîyat û çanda gelê me zêde bikin. Ew jî bila bi helbest nîvîsandînê milê xwe bidin şoreşa gelê me. Dijminatiyê digel dewletên sosyalist nekin. Hasîfi li ser ilmê sosyalizmê, ji bö gelê me iyar kirinê û şer kirinê, bîrafîya tevî gelan û karkeran binivîsinin.

Cegerxwîn digel kar û xebata edebî û helbestvanîyê bi aktîvî di nav karê politik û rîxisitîni

jî da cih girtibû. Ew herweha endamê komîta navendiya Partîya Demokrat a Kurdên Pêşverû li Sûriyê bû... Lewma me digel pirsên li ser xebata helbêstên wî çend pirsên ideolojîk û politîk jî jê kirin... Ew pirsên ideolojîk û politîk li gorî wê demê di qada politîk û rîxisitîniya Kurdistana Bakûr da û herweha li dînyayê gelek pirsên aktuel bûn. Wê demê pirsên girîng bûn. Herkesekî politîk li hember van pirsan hewce didît ku xwe kivş bike. Ji ber vê yekê ew bersivê Cegerxwîn çarçova dîtinêni wî yên ideolojîk û politîk yên wê demê nişan dide... Gelo heke iro jiyaba dê ci bigota ? Helbet nayê zanîn lê bi bawerîya me ji dîtinêni xwe yên li ser sosyalizmê milîmek jî nedihate xwar... Lê herhal piştî hilweşîna bloka Sovyetî, li ser Sovyet û çin û hetta li ser Serok Barzanî jî weki berê nedihizirî!.. Iro mixabin di şûna Sovyet û bloka wan da bayê bakûrê toz û dûmanâa sermayedarîyê bilind kirîye û hestîyên seydayê hêja, parêzerê sosyalizmê û piştevanê Sovyeta, mamooste Cegerxwîn jan didin... Digel van guhûrînen li dînyayê jî ev hevpeyvîna digel Cegerxwîn belgeyeke ji alîyê bîr û bawerî û dîtinêni wî ve... Ji ber vê yekê, careke dî ragi-handina vê hevpeyvînê di demekî taybetîyê bîranîna wî da bi serê xwe karekî girîng e...

Weki me li jor jî gotî Cegerxwîn digel helbestvanîya xwe misyonekî politîk û rîxisitîni jî hebû. Bivê-nevê axiftin dê bihata ser pirsên politîk jî. Gava gotina wî ya li ser karê edebîyat û helbestvaniyê xilas bû min çend pirsên politîk û ideolojîk jî jê kirin... Pir bi keyfxwesi û bi tîrkenî axiftina xwe wisa domand:

**Z. Elkî – Derheqa Kurdistanê da, wexta borî û niha dîtinêni te dê ci bin ; wekdi, niha em dibêjin Kurdistan kolonî ye, anku mistemeleke ye ; ji bo vê gotina te ci ye ?**

**Cegerxwîn** – Weki zanîna we jî, welatê me bi hezar salî bûye gêra (bêder) Imparatora, mîra û zulimkara. Derebegêñ (mîrîn) Kurdistanê jî bo mesleheta xwe nûrê zulimkara qebul

dikir. Ewan jî teib (teda) li ser feqîrên Kurda dikir.

Welatê me li milekê Osmanîyan li alyekê jî Farisa di navbeyna xwe da belav kiribû. Ji bo vî welatê xweş hemû zordestan li navbeyna xwe şer jî dikirin. Feodal û kevneperestên me jî, ji bo jiyanâ xwe, kîjan mîlî mezînahî dabayê nîrê wî qebûl dikir.

Mîr û feodala, axa eşîra ji ber sereketû û sazûmana xwe, şiyarbûna gelê Kurd li qeydê (zincirê) dida.

Niha jî tiştekî mezin ne hatîye guhartin. Welatê me hatîye perçê kîrin, em bindest bûne. Emperializm xwûna gelê me dimije. Menfeeta feodalên me jî bi vê ra ye. Ew jî nahêlin gelê me şîyar be. Destê xwe dane destê nijadperesta û emperialista. Bes tiştekê bêjîm, gelê me ne gelê berê ye, kêm jî be şîyar bûye. Edî bilûrên feodalan, axa eşîran wek berê deng nade. Gundiyênen me bi kêmasi jî be, ked û gendana (karên) xwe dikin. Xwendevanên welatparêz û pêşverû zêde bûne, heqê gelê xwe dipirsin, hêj zêde jî...

Welhasil welatê me û gelê me xweşî bi çavê xwe hêj jî ne dîfîye. Lê belê, wê bibîne, ni dûr e, nêzik e...

Ji bo kolonîûyê, ez jî wek we dibînim. Helbet ku koloniye. Hemû hatina sererd û binerîdê welatê me, zimanê me, hemû tiştên me ji me hatîye standin, hem jî bi zordesû. Wekî ev jî ne kolonîti be, wê çi be ?..

**Z. Elki – Derheqa xilasîya gelê Kurd, dîtinê te wê çi bin ; anku bi kîjan rîyê wê çêbe ? Ji bo dewletên sosyalist, Yêkitiya Sovyeta dê çi bêjî ? Derheqa Maoistî û sîyaseta çînî gotinê te dê çi bin ?**

**Cegerxwîn – Birayê ezîz, bersiva vê pîrsê geleki kûr e. Lê belê, ez bi kurtî bersiva wê bidim.**

Ez dixwazim xilasîya gelê me bi pêşdarîya sosyalistî be. Evroke gelê me li çar dewleta belav bûye, şert û zûrûvîn wan jî mimkûne ku ferq bikin. Hewce ye ku li her perçê Kurdistanê, kesen marksist û leninist xebatê bikin, raçandina siyasi û ava kirina partîyek sosyalist bikin. Digel hêzên pêşverû girêdanê dostanî bikin. Dijî axa, şêxa, tevayî kevneperestên navda şer bikin. Gelê me wekî mistekê bikin û li pêşdarîya sosyalistan digel hêzên pêşverû li ber singe dijminê mezin, emperializm û kolonializmê şerekî zor bikin. Rêxistinêni siyasi yên perçen Kurdistanê hewcye ku navbeyna xwe ne qetînin. Milê xwe li gelêk bisidînin. Carek di jî dibêjîm ; ji rîya marksizmê û leninizmê şaş nebin, nacîbûn bi vê ra ye.

Dewletên sosyalist jî dostêne me ne. Hewcye ku em navbeyna xwe û wan xirab nekin, dostîniya xwe zêde bikin. Yêkitiya Sovyeta jî her wisa. Evroke li dijî emperializmê, hevalen gelê me û tevayî gelên bindest Yêkitiya Sovyetan e û dewletên sosyalist in. Bawerîya min ev e ku alikarîya Yêkitiya Sovyeta û dewletên sosyalist û tevayî hêzên pêşverûyen dînyayê, ji bo xilasîya gelê me şert e. Gelê me bi vê alikarîyê wê geleki keyfxweş be. Ji bo vê yekê, hewcye ku em digel dewletên sosyalist û tevayî hêzên pêşverûyen dînyayê dosfiniya xwe zêde bikin.

Sîyaseta çîn û maoistî niha digel hev dimeşin. çîn evroke hevalîniyê digel dijminê gelên bindest û tevayî sosyalistên dînyayê, emperializmê dike. Milê xwe û Emerîka daye yêk. Ev rêveçûna çînî û maoistîyê ne digel gelên bindest e, digel dijminê gelan û sosyalizmê, emperializmê ye. Ji bo vê yekê ez maoistîyê û sîyaseta çînî li dijî marksizmê û leninizmê dibînim. Hasılı dîtinek geleki xelet e.

Cegerxwîn hem wek edebiyatzan û helbes-tvanek lê herweha jî wekî polîtikerekî profesyonel mideheki dirêj li Kurdistanâ Başûr jî mabû. Hem li Bexdayê hem jî li Silêmaniye mamosatîya ziman û edebiyata kurdî kiribû. Digel vê

xizmetê wekî şewirdar hevkariya tevgera politik ya Partiya Demokrat a Kurdistan û serokatiya Barzanî jî dikir. Helbet di nav vê xebata direkte politik da xwedîyê bîr û bawerî û prensibên xwe jî bû. Diji şaşî û kîmasîyan derdiket. Fel-sefa ku di helbestên xwe da dianî ziman dixwest di pratîka tevgera Kurdistan Başûr da jî bibîne... Lî belê, li gorî dilê wî nedîcû û vê di-jayetiya politik dîsa riya Kamişlî da ber ma-moste Cegerxwîn û wî xebata xwe êdi li Kur-distana Rojhilata başûr domand... Paşê jî 1975-ê tevgera Kurdistan Başûr têkçû... Lî serhatiyê wî yên girîng ew kiribû xwedî ditinek li ser bizava politike Kurdistan Başûr... Min xwest li ser vê jî guhdarîya wî bikim:

*Z.Elki - Wekî zanîna te jî, şoreşa Kurdistan Iraqê 1975-a têkçû. Derheqa vê têkçûnê wê gi bêjî ?*

Cegerxwîn - Birayê eziz, li ser vê pirsa te ez gelek nasekinim.çiku, tu jî dizanî, şoreşa li pêşdariya axa-eşîra be, feudal û burjuvazî be, hewce nîn e ku ez bêjîm, bivê-nevê wê têk biçe. Ne mumkun e ku bigihê armancê, şoreşa Kurdistan Iraqê ketibû destêñ kevnepерesta, axa-eşîra, feudalêñ wekî Barzaniyan. Ji bo vê yekê têkçû... Evan xiyaneteke tarixî(dîrokî) li gelê me kir. Gelê me vê ji bîr nake... Bes baweriya min geleki heye ku, şoreşa Kurdistan Iraqê nemiriye, na mire, li pêşdariya sosyalistên Kurdistanê wê bigihe armanca xwe...

Axaftina me êdî ber bi xilasbûnê ve dibû. Dîsa wekî adetê klasîkî min pirsa xwezi û daxwazêñ wî yên ji me jê kir.

*Z.Elki - Mamoste, Rojnameya me Roja Welat ku li Tirkîyê kurdi û tirkî derdike-ve, digihiye destê te yan na? Wekî dî, daxwaziyek an gotinek te heye ji xwendevanêñ Roja Welat û Kurdistanâ Tirkîyê ra?*

Cegerxwîn - Navê Roja Welat min dibihîst, lê belê, ne digiha destê min. Bes hejmara 9'an giha destê min. Di rûpela ewil da li ser gir-

tina Elî Eskerî û hevalêñ wî gaziye hebû. Min xwend. Gelekî keyfa min pê hat. Rojnameyeke pêşverû, welatparêz û sosyalist e. Meqela li rûpelêñ navîn, ya derheqa şoreşa Kurdistanâ Iraqê da gelekî baş bû. Li rûpela dawî jî li ser mirina mamostê mezîn Ereb şemo xeberekî kurdî nîvisandibû. Rastî navê Roja Welat gelekî bi sehm e, baweriyê dide insanî. Dîsa bêjîm, welle gelek min jê hez kir. Bi vê Rojname derxistinê we gavek bi mîranî avêtiye. Daxwaziya min ew e ku hûn hêj pêş ve biçin, gelê kurd şîyar bikin, riya sosyalizmî nişan bidin. Ji xwe baweriyâ min heye ku hûn vê dikin. Bes daxwaziyeke min jî ev e ku hûn, Roja Welat bigihînîne destê min. Hez dikim bibim girêdayî(abone). Eger mimkun be neşîrên dî yên kurdi ji bo min bişînin, ez dê kêfxweş bim.

Hasili gelekî silavê şoreşgerî dikim ji bo gelê Kurdistanâ Tirkîyê û tevayê kurda.

Xebatek zor bikin. Gelê me hewceyi vê ye. Ji riya marksizmî û lenînizmî hewce ye em şaş nebin. Ev rê ye, bivê-nevê wê bighine armancê. Gelekî serfiraz bin.

*Z.Elki - Gelek spas dikim ji bo van bersîven te, mamosteyê hêja. Gelê kurd jî bi te geleki serfiraz e. Gelek bijî!...*

Belê, payiza 1978-ê li Kamişlî mamoste Cegerxwîn wisa diaixit. Dema hevpeyivîna me xelas bûyi di gel spaskirinê min xwest destê wî maç bikim. Lî wî bi destê xwe yê mîna pencê şera destê min guvaşt û go "Heyran min iro rişen xwe tiraşîne û ava gula jî lê kiriye. Were alekên min maç bike"...

Digel vê gotinê em herdû jî kenîn û em çûn serê hevdû. Dema me xatir ji hev xwestî du wêneyêñ xwe jî dan min ku em digel hevpeyivînê çap bikin. Lî mixabin herdu wêne jî (yek li rojnamê çap bû) berî cûnta faşista 12-ê ilonê digel girtina arşîva rojnamê ew jî di nav wan de çû.

**Wexf û Nişana Cegerxwîn**

Cegerxwîn 22.10.1984-ê li Stockholmê fiziken mir.Lê belê,mirovêni bi nav ,xebat û kiryarêni xwe mezin pişti mirina xwe ya fiziki ji nayêni ji bîr kirin,ew bi berhemên xwe yê hêja û qedirbilind her dijin...Jiyandina nav û kiryarêni kesen wisa,bi serê xwe kar û xebateke girîng e.Ew kesen ku di demê jiyana xwe da xwe bi kar û xebatêni gelêri radipêçin,bi vî tehrî dibin malê gel.Ew di jiyana xwe da jî û herweha pişti mirina xwe ji ne malê xwe û familya xwe ne.Ew heyiyêni anonîmin.Lewma bîranîna wan bi awayê giştî divê bi hevrayî be.Lê belê,tenê di rojêni mirina wan kesen navdar da bîranîn,têra nake.Divê awayên baştır bêne dîtin.Di vê navêni wan li hindek tişt û aktivîtan de bi konkireti bêne dîtin.Divê navêni wan li kuçe û kolanan bêne dan,li ser navêni wan organizasyon bêne çêkirin û gelek tiştîn dî...Iro berhemên Cegerxwîn bi tevayî-helbest,çirok û yên dî-tîş desteyek cild dibin...Divê ev berheme ji nû ve bêne çap kirin û bi nifşê nû ra bêne gi-handin.Eve ji parce parce û bi belavî nabe.Divê ji bo vî karî organizasyonek bête danîn.Ji bo vî karî baştırın organizasyon danîna wexfekê ye.Esas danîna wexfê(Foundation)divê weki wesiyyeta Cegerxwîn bête qebûl kirin.Ji ber ku Cegerxwîn xwe bi temamî wexfi gelê xwe û welatê xwe Kurdistanê kiribû.Lewma divê enda-

mên familya wî û nivîskar û ronakbîrên me bi vî karî ra bin.Nav,dirêj an kurt lê divê rojek zûtir "Wexfa Cegerxwîn" bête danîn.Ev wexfe divê hemû berhemên wî ji nû ve çap bikin.Eve ji têra nake divê ev wexfe "Nişana Cegerxwîn ya Helbestê" ji amade bike û her sal wekî xelat bide helbestvanekî.Ev nîşane tenê di çarçova netewî da jî dibe,di qada navnetewî da jî dibe...

Cegerxwîn ji iro û pê ve divê tenê di nav rûpelên çend kovar û rojnaman da bi bîr neyê,Ne tenê bîranîndivê Cegerxwîn bête jiyan-din.Eve ji bi karê piratîk dibe.Em hêvî dikin ku kesen xwe beramber Cegerxwîn berpirsiyar di-zanîn dê rojek zû bi vî karê danîna wexf û nîşanê rabin û dilê wî yê di xeweke kûr da li tîrba bexçê mala wî li Kamişlî şâ bikin...

Hezîran 1992

---

(\*) *Helbet Cegerxwîn bi van berheman nema.Wî hejmara berhemên xwe gelek zêde kir.Piştî ku hate Swêd-sala 1979-ê-hem berhemên xwe yên kevin dane çap kirin hem ji yên nû nivîsin û çap kirin...Heta mirina xwe,sala 1984-ê-jî qelemê xwe ji dest berneda...*

# CEGERXWÎN Û LERZA BÎRANÎNÊ

Ehmed HUSEYNÎ



E. HUSEYNÎ

**S**iyar be helbestvano..!  
Peya be seyda..!

De bila gavêن te, neviyêن te, zeviyêن te, xwe bi raperîna kewan re, dahêjin bergeha gorisanê...Bêdengiye helbestvano û hespê te serî ji şîrîna me, ji gulçîna me stendiye.

De bila çiyayêن bi xewnê avdayî, kendal, xeroj û hinara ji bendemanê westiyayî, te ji nû ve di gerdena xwe de , di tenhayî û di şîlmisandina me de, bafrînin.De bila werzên şerîkirina te, bişirîna asoya kal di bejna çinarê le xwe bi helbesten azdiyê rapêçin.

De bila mizgînî ji pêñusa keftelefteşt û ji ximanê vê êvara pepûkî dawerive û mirina ku li er doşeka jiyanê ramedandiye û oxira hozanekî si serbilindî.

"Hesarê" jibermaya lêlav û pengavênatmayî, wê bi kijan hawarê eniya şeva te bête temilandin? Wê di gulistana dilê te de çendin ulilkên reng qaçax, gulvedana xwe bikar bînin? Ji dergûşa xwîna te de peqpeqokên xwînê têne orandin.Perdaxa te di ser dev re çû û cegerekî bi wîn, va ye, li azmanê qolinca te, le seranseri ilovaniya te, belav dibe.Tu li ser agir Nexşeyên evînê ji pîtanokên te diweşin.Tu li er dilê berbangê şérîn dibî û di sala 1903 an de

zarokekî xemgîn hildiperike dara bidestiyê ya ku di hûçikên te de hînî xweliyê dibû.Hesar...Wê kî bibe mîratgirê şîniya te, eger guliyêن te bi çîrokêن rojçêbûnê nehatin hûnandin? Wê kî toza serdeman ji ser cama dilê te paqîj bike, eger damarêن te bi navêن serbazan, bi xuşexuşa berû, benok û spîndaran nehatin dagirtin. . ? û Hesar.. . te çûk di hemêza xwe de vedayî hişt, te bizota nalînê di cergê wî de dadayî hişt, te bîranîn û listikên li bin hetava hîvê di hişê wî de avdayî hiştin. şîrê te li kezeba wî veda, hêrsa te xwe li çavê wî bada û belengaziya te xwe di henasa wî de rada. Di hêlîna te yi çiyayî de, bi çavên tîrsokî, bi canekî lerzokî perwerde dibû. Ériş û serdanvanen wênekar pelû dibûn, herdem sibehêñ mîrkuj, bi banga bê hûde re, di hestêñ helbesvanê te de diteqiyân.

şiyar be helbestvano. . !  
Peya be seyda. . . !

Li wî warê qedexekirî, tu ê nikaribî ava jiyanê biparêze ji hêzên serberdayî. Tu ê niakribî destêñ çepel, neynûkên kovane, ji laşê welêt yê rapêçayî bi ferhengeke pîrozwer, werfîne der. Xwe amade ke. . . çarenfusa te di koçbaryê de ye, zarokên vi welatî xwe ji destêñ bav û dayikan bernadin. Destêñ xwe rapelîn, hêdi hêdi xatirekî nazenîni, bi kurtepisteke şerîni tîpêñ xaka xwe di sawa

sînor de, vejîne, li "Bûka welatan" an li ser çermê Amûda şewatperest, neviya goristan û kulan, tu ê hevokan ji xwe daweşîni, dê belengazî û sêwîti bibin hevparê te, dê qırçina welatê dabeşkiri, pêl bi pêl, te li ber hêsrên xwe bigindirîne. Niha, tu li nik sala 1920 a yî, destê te li ber rûyê te yî, tu diponijî û tava bêgunehiyê li ser serê te û bêkesî li ser kolinga te, zaroktî di bîra te de diqermiçe, tu dibî siwarê çol û deştan, tu rengê zemînê ezber dikî, hê stîrkêñ ges yên şeva havînê li Amûdê, kirâse te yê şîlbûyî bi ava şebeş û hinaran, ji bir nekiriñe. Sîbera te li kolanêñ tozgirtî nîşan e, şûnşopa keserêñ te, renckêşana te, pîkoliya te, dilopêñ xwêdana eniya te û zîngezinga xewnê hogîrî xwelibakirina simbilan dibe. Keştiya umidan li nik perrêñ xewna te radiwest e. Pirseke bi gincir weke birûskekê di mîjîyê te de vedide, dûkela wê, herçar sînoran dinixumîne "Kîme Ez" û Fîrat di pêçeka Toros de vediciniqe, kew, qulung û eylo tar û mar dibin, bazî û başok û şalûr har dibin, û pêñûs "çiqas derdê pêñûsê giran e Seydaaa? . . ." di nav tiliyêñ perweran de, dinermije, şîlîr û dilêr di nava te de zîl didin, û hilatina evînê di cergê te de û gulvedana nîsrînê di dengê te de.

Hebûn e Seyda. . . Destnivîsa xurustê pêdiviyî xwendinê ye. Reş û spî ye, ken û girî ye, ger û rawestan e, hetav û ziryan e, hêvî û reşbînî ye, gername ye Seyda. . . Ji tevzinokêñ giyanê Hesarê ta gergerînokêñ derya Baltiqê xwe dispêre ronahiya helbestê. . .

şîyar be helbestvano. . . !  
Peya be Seyda. . . !

Vê carê reşeba û bahozêñ şêt gelî û dolan, rîzên çiya û gundêñ bê çira dane ber zextêñ mirinê. Govenda mîrxasan li dar dikeve û reşgirêdan dibare, hespêñ kumêt nagihîjin kîfarata çeknasan. . . Xewna te tê xemilandin bi sedar û navê şehidan, tu li ber dîwarê şoreşa xwe yî, tu bi rûpelêñ dîroka gunehkar tê şewitandin, qêrîna şêx Seid dibe rivîn, tu di taya sar de ye, mit û mat, şikestî û újdanê te di bin

bar de piştûz dibe. . .

Derya xwînê dilop dilop bi lêvîn axîna te şil dike. Birîndarî û kuştin, serjêkirin û term, bî û sêwî, talan û çavşorî, rimbaz û serbaz, leşker û karker, ewrêñ reş û giran, wawîk û kund û reva gernasan dihigive baweriya te, te tirsa sînoran ezber kiriye, bi qudûmê şikestî, bi şîn û xeşîgnî, tu êvara bîranînan bi dû xwe de dikêşî. Dîlbera te "Seyda" bi singo û guran re ye, dahatûyê te bi rist û peyvan re ye. Halan e, qirkirina karwan e, zikreşya însan e, gurina rehan e, û biyanî dikevin pêxêra berû û hirmiyan, gezoya bîhokan didizin,

tîrêjîn dilşadiyê dicûn  
avgîr û çavkaniyan, didrûn. . .

Nemrûd û Cûdî di xwîna te de dibezin. . .

Ken nebedî dibe

Heyvron bêxwedî dibe  
û helbest di canê te de bi ci dibe. . .

Sala 1925 an, xwîn dipijiqe  
Ji cegerê niştiman. . .

Dara mirinê diheje,  
Cegerxwîn dibe şahsiwarê  
Kêş, rist û helbestvan.  
şîyar be helbestvano. . . !

Peya be Seyda. . . !

Bi rîveçûneke dijwar e, demsala xebatê bê hedan û buhar e, torevanî û parastina ziman e, vejîna Xanî, Cizîri û Teyran e, şagirt in û li Amûda lerzokî dibistana Kurdistan e.

(Birêveçûna cihokekê, xwaromaro dibe,  
pêş de diçe bi paş de vedigere, dizîvire  
û herdem digihêje:

Birêveçûneke rewan  
ya stîrkek e an ya buhareke ne bi lez,  
awake çavgirtû  
li seranseri şewî, pêzanîn jê dipijiqe,  
heyineke giştî di qerebalixê de,  
pêl bi pêl ta ku her tişt tê nixumandin)1

Erê SEYDA. . . Agirî dilê te mist dida.  
Agirî xewrevîn e, vê sibê çavêñ xwe dixurîne,  
dîroka kedxwaran di hişê Agirî de, lêvîn Agirî



CEGERXWÎN

1903-1984

bi agir vediçiniqîn, biskêñ Agirî weke ku pinpinikêñ êgir di taristana demê de, xwe li ba dîkin û şevbuhêrkêñ rewşenbiran bi hevdîna şemala Agirî têñ dorpêçkirin.

Ü her gav xewnêñ wê dişkin, barana welêt wê aghdarê mirina qehremanan dike. Li Mehabada dilçiryayî û nûbişkivi, dengê zeminê têt birrin, pencereya azadiyê tê girtin, berfa ŞAHO bi xwînê dicûrise û li ÇARÇIRA ronahiyê talan dîkin, baskêñ diperpişinîn. Dilê te di şeva çarçira de mîna xatireyekê disote û bêyî qurtêñ hêviyê, tu ê nikaribî têkçûnêñ me biguhêzî qonaxêñ hebûnê:

(Xakî Kurdistan bi qurban  
pirr ciwan û paqîjîn  
Xwîn rijandin pirr kurrêñ te  
Wa li her alî riji  
Miletê kurd ta ku sax e  
Ew ji vê rê nagerî  
Aferî, aferî  
Qadî Muhamed aferî).  
şiyar be helbestvano. . !  
peya be Seyda. . !

Cîgeh û şûnwar di gewriya jînegariya te de, dilivin. Kuç û kolanê vegotinê li bejna evînê dipirsin. Rêçê te hê di neynikêñ gula berbiro de ne, silavêñ te yên nazenînî xwe çem dîkin ser bisan û werzan. Hesarê, Sinan, Dêrikê, Hicra

Ewêna, Amûdê, Kercewsê, Yewancix û Tilşîrê, şaxê li ber kohê Cûdi, Birêjê, Ajgê, Siktanê, Qelesincê, Tutmê, Gelalê, Mehabat û Xelan, û pîra Qamîşloka dilrevinî, bêriya te kirine Seyda. . .

De peya be. . . Miriyên me pêdiviyî gulan in.

Xuşexuşa daran li nik dengê miriyan radiwes-te,

miriyên me pêçayî ne bi keskesoreke nûhilatî. . .

Avê dirjîne ser lingê jîndaran,

De peya be Seyda. . . Pencêñ jiyanê bişkojan ziwa dike, ji rastiya tal, kutakirina gernamê, rev nîne. Peya be ta ku kerwanê azadixwazan bigihîje girnijîna stêrka destê sibê, ta ku hechecikêñ penagehan xwe bispérin hêlinâ dilê te, ku em cergê te ji oxira sermedi hilbijêrin û bi hetava helbestan, em rengê evîna te wergerînin zimanê çiyayêñ serhiş û xeydok.

De şiyar be. . .

Miriyan hînî vejerê bike. . .


Siwaran hînî bagerê bike. . .

1 Octavio Paz, *Kevirê Rokê*

2 Cegerxwîn, *Sewra Azadî*

# ZAROK

Eskerê BOYIK



E. BOYIK

**Y**a serê sibê  
Wisa mîna vê zarokêyi tu  
Ku hela duh,  
Di zikê diya xwe de te nizanîbû ci ci ye,  
Te îro çavên xwe bi hewes vekiriye  
Tu xweş dînihêri bê sûc bê gunê,  
Di nav pencê te yên nûre nedîr da  
Destkê xwe yên biçük dibe û tîne,  
Dixwaze pencê te yê şewqe şâ  
Hemêz bike mîna bistanê diya xwe...

Ya serê sibê  
Tifêl hemêzke bi vê paşla dê  
Bi vê pêçeka sehat qewetê  
Bi vê bêşika bext bereketê,  
Bi vê niviştä aqil şuretê,  
Xweyike tu wî  
Ji deva ji çava  
Ji qezya ji nezya...

Ev dinya wisa tije dek û fen in,  
Tije nerastû, tije zordesû,  
Tije neheqî û tije tenin,  
Ser riya emir piir bi kelem in,  
Ewqas keser in û ew ewqas xem in,  
Ku evd nikarin bêxem bikenin...

Bi dê re kenê bi dil bi keser,  
Van xem û tenê dexes xelas ke,  
Ber van hasegê emrê bêne der  
û van çiyayên bê beşer rast ke,  
Tevî şîr remê bi dê de hergav,  
Isafê bidê, heqiyê, helaliyê,

Xîretê û nav,  
Firaxe çawa Mirzê Mehmüdi  
Hikayeta çê  
Ku ji devê ziya, şera û dêwa  
Xelas ke dinê.

## DUA

Ez dua dikim  
û zanim wekî  
Bi dua ne derî vedibin,  
Ne kanî dertêñ,  
Ne kor sax dibin,  
Ne jî horî têñ.

Dil jî nerm nabin,  
Kul jî qenc nabin,  
Na, kêm nabin derd,  
Na, rem nabin evd,

Emirê bikşê riya xwedê dîsa,  
Wê hebin Mehemed û hebin İsa,  
Bekoyê Ewan wê qetlê bike,  
û gur wê postê berxê li xwe ke,  
Xeber şuxulê hev negrin ese,  
Neheqiyê re kes nabê bes e.

Ez dua dikim  
û zanim rastî  
Xema kesî bi dua min nîne,  
Bi duayê tek isafa min ê  
Paqij bimîne.

# PİRÊ

E vîra hezîzî li quntara çiyê  
Vê şefâqa nûr çok daye erdê  
û dua dike...

Çi dixwaze ew vê heyamê  
emirî dereng...  
Bext miraz yanê  
Buhara heft reng?

Têr nebûye ji emir,  
Dixwaze emir pey wê re hebe,  
Dinya rohnî û xweş e,  
Rohnayiya dînyê tu car kêm nabe,  
ser e, şupuk in,  
şûrê edlayê timê bira be,  
... û meytê wê li ser milê kura be.

## XEBER

Li ku ye ew xeber, çîra nayê ew,  
Ku bi vê dua ser zimanê min  
Vê siba eziz,  
Vê siba bedew...

Dibêñ raza ye,  
Dibêñ li rê maye,  
Yanî westiya ye, li cîkî telya ye,  
Çi rengî ye ew?  
Dibêñ bûye kew  
Keweke qerqaş ezmanê sayî,  
Bi nûr şemala sibê kildayî  
Nav pencê şewqê de difire aza  
Bê derd, bê xweyî...

Li ku ye ew xeber, çîra çetin tê?  
Ku bi vê duayê, bi vi dengê dê;  
Vê siba eziz,  
Vê siba xwedê.

Dibêñ qeyd kiriye, yanî bend kiriye,  
Yan surgûn kiriye, bêhunure bê,  
Yan rûşet kiriye telka bedew da  
Ketiye xewnêñ xweş, winda kiriye rê...

Li ku ye ew xeber, ku bê çawa şewq,  
Çawa ronahî,  
Dila safî ke, ji şikê, ji qelpiyê  
Vê siba eziz,  
Vê siba sayî...

# DADMEND

Ferhad ÇELEBÎ

**H**awara Pîra Fatê wek qamçiyân li kolanên bajêr diket, qîrîna wê wek birûskan li dergeh û penceran diket, wan jî bi qehir devê xwe ji hev vedikirin û mirov jê dihatin der... Nêrinêن pêsi, pirsên belengaz dihatin pirsin:

- Ci bûye? Ci bûye? ...
- Pîra Fatê ye cardî... Pîra Fatê ye...
- Wey weled... Ji xwe re miriba baştar bû ji vê jiyana ku tê de ye.
- Hema bi Xwdê ez dibêjim vê carê çû, piça hiş di serê wê de nema ye...!

Kolan lê hatin hev. Mirov lê kom bûn, xelek xelekî di ser serê hev re lê dinêrîn, belki tişteki nû ji xwe re bibînîn. Pîrê jî xwe bi ser hev de qilûs kiribû, serê xwe dihejand û ji xwe re dinuhurand...

Hesta camêriyê bi Osê ve hat û wek berpirsiyarekî girîng bang kir:

- Dûr herin!.. Dev jê berdin, her kes here karê xwe!

Ehmê jî xwe kêmî Osê nekir. Çima wê ew qençî tenê ji Osê re be? Wî hêz da xwe û bi hêrs got:

- Ma we dinya nedîtiye... De belav bibin, we bêhna wê çikand...

Gin gin bi tevan ket, ji nişka ve hesta

camêriyê di wan de hate kilandin û her yek ji yê din re di ber xwe de dibêje:

- Ma we dinya nedîtiye... De belav bibin!

Wek gergerfînokê li dor wê pîrê dirin û tê, kure-pista wan e... Pîrê jî bi aşûfteyî li wan dinêre, nuhurandina xwe berdewam dike û dibêje:

- Lawê min kuştin, tişt tê de nehiştin!

Dema Pîra Fatê qız bû, kêm keçik weke wê xweşik hebûn, gelek xortêñ malmezin li dora wê digerîyan, lê wê li xwe danetanî li yekî ji wan jî binêre. Wê tu kes nedieci band. Ji ber vê yekî jî ew hetanî iro mabû bê mîr.

Hino hino ew xeleka mirovan tenik dibûn, yeko yek xwe jê vediqetandin. Osê nêzîkî wê bû û bi dilovanî jê re got:

- Pîrê ma te xêr e? ci bi te hatiye? Ma tu dev ji xwe bernadî!

Pîra bê hîmdar serê xwe rakir, nêrînek umîdewar li dûr nêrî, bişîrî, serê xwe hejand û bi stiranî got:

- Lawê min kuştin, tişt tê de nehiştin!

Osê bi hiskî jê re got:

- Pîrê, lawkê ci halê ci? Rabe here mala xwe. Şerme ji te re ku tu ê her ji çendekî bik

hawar û xelkê li xwe bicivînî. . . Ger xwediye te heba tu ê ne di vî kirasi debuya. . .

Pirê bi devgermî serê xwe hilda, destêن xwe livandin, ku bavêje pêxila xwe û bike hawar, lê rewa di destan de nemabû, xwişka wê di qirika wê de ma, vê re rehêن wê tarî bûn, reş bûn û herweha bilind dibûn. Wê keserek ji hinavê xwe berda û,

- Lawê min kuştin, tişt tê de nehiştin, got.
- De here yadê, lê. . . Tu xurufi ye û çû ye, Osê bi qehir got û pişta xwe dayê, kir ku here, çend gav avêtin, lê dilê wî hinekî bi Pirê şewîfi, xwest ku çarekê jê re bibîne, gava ew li Pirê vegeriya dît ku Pirê bêhiş ketiye. . .

\* \* \*

Li dadgehê, dadavan ji Pire re got:

- Fatima keça Erdîxan te ci divê? Ev cara dehan e ku tu tê û gîfî dikî. Carekê tu dibêjî lawikê min kuştin, dest û lingên wî şikandin. Carekê tu dibêjî kurm ketine laşê wî. Ka vê carê ci pê hatiye?

- Lawikê min kuştin û divê tu mafê min ji wan bistînî. . .

- Ka bêje bê kê ew kuştiye û ew li ku hatiye kuştin, dadvan ji wê re got û di bin simêlan de dikeniya. Kenê wî hişt ku Pirê di hev keve û hew bizanibe bersiva xwe bide.

- Ez nizanim, hema wî dikujin. . . û. . .

Dadvan xweş bawer kir ku Pirê din bûye.

Jê re got:

- Baş e Pirê, tu here mala xwe, em ê mafê te ji wan bistînî û lawikê te jî sax bikin - ku Xwedê got erê - û kenekî da ser dadvan ta ku bi pişte ve ket.

Pirê serê xwe berda ber xwe, bi giranî gavêن xwe diavêtin, di nav wan cendekan re, xwîn ji wan diherikî, Pirê dikeniya û di ber xwe de got:

- Bila biherike, belkî van terş û gemaran li ber xwe bibe.

Ew bi ser laşekî de hate xwar, guhê xwe danî ser dilê wî, dît ku lêdixe. . . Dilan û sema, keç û xortan bi destêن hev girtine û govendê dikan. Pirê jî ji wan re difilîne, wê bi lîlandina xwe re bang kir:

- Lawê min nemiriye, sax e. . . Nemiriye.

Bi qîrîna wê re mirov ji her çar aliyan de lê hatin hev, kom bi kom. . . Li ber çavêن wê dibû gur, pîrhevok, ejdeha. . . Dihatin ku lawikê wê bixwin. . . Diranê xwe qîç dikirin, zimanê xwe bi girêza li dora devê xwe dixistin. Ji hev re digotin: "Can jê cuda bû ye. . . )mm. Ka em wê bibin mizgeftê û li ser nimêj bikin.

- Ew hîn sax e, nemiriye bavo, ma hûn ji Xwedê natîrsin.

Hinan gotin sax e, hinan gotin miriye û di-lovaniya Xwedê jê re

xwestin. . .

Lê dilê Pira Fatê hê jî dilerizî. Wan Pirê di nav xwe de hilgirtin û her yek ji wan di ramanekê de bûn. . .

# EDEBIYAT, SIYASET Ú DÎROK DI ROMANA SIYA EVÎNÊ DE

Xelîl DIHOKÎ



X. DIHOKÎ

**B**i sedan sal e ku Kurdistan di bin zulm û stema dijminan de dinale. Çi dergehêne xweşî û pêşdeçûnê li ber venedibûn; belku berdewam ji layê dijminan ve dihatine girtin. Lewra bizava edebî û çandeyî jî, mîna ya siyasi û civakî, lawaz û paşdemayî bû û çi rengên bajarvaniyê nedigihîştin deverê kurdî. Lê dîsan "hemî tariya cîhanê, neşa ronahiya fene-rekê biveşêre".

"Folklorâ kurdî girîngirîn û kevintirîn se-rekanî ya çîrok û stiranêñ kurdî bû. Her wesa jiyana koçeriyê, binaxê serhildan û peydabûna wan bû. "(1)

Lê çîroka nivîsi (Hunerî) ya kurdî, ne ji mêtje ronahî dîsiye. Lewra piraniya nivîskarêñ ku bi kurmanciya jêrî dinivîsin, di wê baweriyê de ne, ku yekem çîroka kurdî ya hunerî di sala 1925'an de, ji layê Cemîl Saibî ve hatiye nivîsin. Lê ya rast ev e ku yekem çîrok di sala 1913 an de, ji layê Foadê Temo ve, di kovara Rojî Kurd de hatiye belav kirin. Her wesa Eb-dulreqîb Yusif dibêje: "Destnîvisa Bersîsê Abîd, wesa xuya dike ku, Feqiyê Teyran, yekem çîroknivîs bûye, ji ber ku ew di salêñ 1307-1376'an de jiyaye. "(2)

Her çend romannivîsên kurd, wek tiliyêñ destan jî nebûn, mîna Erebê şemo û İbrahim

Ehmed, lê di van deh salêñ dawiyê de, çendin ro-mannivîsên peyda bûn û qonaxêñ girîng derbas kirin.

Ji wana: Bavê Nazê, Husêñ Arif, Mahmûd Baksî, Mehmed Mokrî, Birîndar, Nûrî şemdin Ebdulla Serrac, şahînê Soreklî û Mehmed Uzur cihê mebesta me di vê nivîsinê de.

"Roman rengekî pexşanê yê girîng e, hilbi-jartina vî cûrê edebî, hişyarbûn û pisporiya nivîskarî nîşan dide. Ji aliyeķî din ve ji qulaçeve mezin dîroka çîroka kurdî ya me piñ dike. "(3)

Lê vekolîn jî karekî pirr zehmet e, taqet, şiyar û bêhneke fireh divê, her wesa pêdivî dehan serekaniyê girîng e ku ew jî li vî welatî, bi hêsanî bi dest nakevin. Her çend heta niha çendin romanêñ kurdî peyda bûne, lê dîsa mirov dikare bêje, ku hêştan destpêk e, nemaze dema bizaveke rexneyî ya lawaz hebe û eger mirov temasay xebata miletêñ din bike, hingî mirov dikare bêje ku rexne li cem me tuneye. "Dîsan ci bizaveke edebî û hunerî ber bi pêş de naçe ë nagihê pileya edebê nemirê cîhanê, eger xebateke rexneyî ya pêgehiştî û bi hêz, mil bi mil digel neçe û nîhîniyêñ wê xuya û eşkere nake. Lê erkê rexnegirî ne ew e ku bibe rêber ji bo nivîskarî, yan kotekiyê li ser bike, belku; divê

helsengandineke zanistî û babetî be ku di encamê de, ew jî bibe karekî hunerî yê din û têkelî yê wî bibe."(4)

Her çend niha çendin romanên kurdi belav bûne û nivîskarê xurt Mehmed Uzun jî, çar nivîsîne, lê romana wî ya bi navê "Sîya Evinê" gelek kar li ser min kiriye û min pîr jê wergirtiye. Eve jî bo sedemê hindê ku vê vekolinê li ser binivîsinim. "Armanca mezîn a vekolîna edebî jî, dîtina nihêni, ciwanî û bîhayêñ berhemêñ edebî ye."(5)

Ez hêvidar im biha û rola wê danim ber desten xwendevanan.

Bi hizra min "Karê edebî çareserkirina doz û gîriftariyêñ mirovî dike. çareserya her tişî bi mirovî ve girêdaye. Lewra li vêre edeb bi rola xwe ya mezîn radibe û dibe pirtûka jiyanâ mirovî. Dibe dîrok ku qonaxêñ jiyanê tomar dike."(6)

"Her wesa edeb, wesileyek e(Bazeberêk e)ji bo xizmeta civatê, nemaze dema ew civat ber bi avakirinê diçê, ku dehan salêñ paşdamayinê ji şaristaniyetê berveket(Teiwîz)." (7)

Bi kurtî roman behsî hindek layêñ jiyanâ kurdi dike. Memduh Selîm Beg, ronakbîrekî kurd e. Her ji destpêka çerxê bistê, digel şoresgerên din li dijî Osmanî û Kemalistên kevneperest xebata xwe ya siyasi dike. Komala Hêvi, Partiya Xoybûn, şoreşa Agîri. Her wesa di derya çavêñ keçeke çerkez de (Ferîhayê) dixeniqe. Lî di herduyan de bi ser nakeve û li dawiyê jî, li xerîbiyê, bi dilê şikestî û bi tenê, li sala 1976 'an, li Şamê, koça xwe ya dawiyê dike.

Romana Mehmed Uzun, "Her çend edeb e, hind jî siyaset û dîrok e. Wek edeb bi rengekî taybetî girîng û bayexdar e, lê her wesa wek siyaset û dîrok jî, di vekolinê de, serinca mirovî radikêse û rexnegirî diêxite hember behis û karekî dîrokî yê nazik û aloza miletê kurd." (8) Wek edeb, jî layê form û naverokê ve serketî

ye. Zimanê xweş, peyvîn ciwan, daristana hevokan û wênêñ şîrî, parastina zincîra rûdanî, cih û dem, pesna bajêr û deveran, serinc rakêşana xwendevanî, gîriyêñ romanê, xeyaleke berfireh, realîte, şerenîx, babetêñ girîng û ramanê di cî de(hîzir û bir)û bi rengekî siroşî ber bi dawiyê.

Qehremanê serekî, rola xwe ya girîng leyisitiye.

Layê derive: Cil û berg, rabûn û rûniştin.

Layê navxwe: Rewşa psîkolojî, hîzir û bir.

Layê komelayetî: Rola wî di civatê de, rewşa civata wê demê.

Her wesa zîrekane niqteşanî:Bêhnok, niqtebehnok;niqtepirs?niqtehang! û yêñ din bîkaranîne.

Ew dergeha li ber xwendevanan vedike û radikêse çendin pîrsiyaran. Wî zaniye kengî romana xwe bi dawî bîne û gehaye armancê. Ez bawer im ku wî bi hêsanî dikarî romanê bi têkçûna şoreşa Agîri, yan jî bi mîrkirina Ferîhayê, bi dawî bîne. Lî belê wî bi planekî serketî roman bi mirîna pîr dilşewat û trajedî - Memduh Selîm Begê, bi dawî anîye. Ne Memduh Beg- wek şoreşger û evîndar-geha armancêñ xwe, û ne jî mîletê wî jî bin perdîn tarî û bindestiyê derket!!! Dema Mesîh bi xaçê vekirin, peyva wî ya dawî ev bû:Xwedêyo!çîra te ez bi tenê hêlam!?

Mehmed Uzun jî divê pîr bi dengê bilind hawar bike û bêje:

- Xwedêyo!çîra te mîletê me bi tenê hişt!?

Wek siyaset, rewşa kurdan, rîexistinêñ demokrat û partîyêñ kurdi, xeletî û neşarezabûn, rola kêma ronakbîran, jiyanâ piraniya serkirdîn kurd li derveyî Kurdistanê, helwêsta çewta welatêñ dû û ber, plan û nexşen dijminan, xapandin û derxistina efûyan.

Wek dîrok, biratiya kurd, çerkez û ermenan û ji navbirina ermenan, kovar û rojname,

komele, partî û rêxistin, kel û cihêن kevin û hwd.

Dema mirov dest bi xwendina romanê dike, dixwaze bi lez rûdanên din bizane. Roman mirov radikêse kûratiya salên 1900'ı. Mirov xwe di nav rêzên komela Hêvî 1912 de dibîne. Diçe nav civînên Xoybûnê. Carna dibe evîndarê dilşewat û carnan diçe çiyayênil bilind û asê. Diçe Agirî. Dikeve bose, nexşe û planêni dijmin. Diçe. . . Diçe û di nav rûdanan de winda dibe. Belê; romana serkefi wisan mirovî dikêse.

Memduh Selîm Beg, evîndarekî mezin e. Evîna şox û şengê ji layekî ve û ya welatê bîdest ji layê din ve. "Du tayêen giran. "Ew li benda wê rojê ye ku bi destê Ferîhayê bigire û ber bi gola Wanê biçe. Erê;çavêni wê kanî ne. Kéziyên wê rûbar û hîvîn e. Bejna wê spîndar e rind e, lê dûriya wê kovan e, wêrana gundan e. Ew cihana xweşiyê nayêne ber dest. Buharê li ber dilê xwe xweş nake. Lê ew ji mirov e. Evînê dike. Hej ji araq û dengê kemançê ji dike. Belê; ew li navbeyna du hêzên mezin, hêlawistî dimîne. Lê ji dawiyê welat û xelkê jérdest, wî radikêsin. "Ew mirovekî şoresger e neşet reşbin bit, ji ber ku reşbînî, hêz û taqetên mirovî dişkîne û nahêle li ser xebatê berdewam be." (9)

Ew pirr ku dê welatê wî azad bit û gihe armancê. Kengî? Nêzik e. Lewra ew evîna welatî dibijêre û paşî ya Ferîhayê. Eve berêxwedaneke mirovaneya mezin e û ji ber vê çendê ji, bi hezaran li ser axa pîroz şehîd dibin.

Memduh Beg dimire. Lê Mehmed Uzun divê bide xuya kirin ku ew namire. Belê; mirovîn wisan tim sax in û di dilê xelkê de dijin. Navên wan di nexşeya welêt de, diêne çandin û wê rojek bê ku helametên serbilindâhiyê ji wan re bêne çêkirin. Zana, ronakbir û şoresger, yên rê ji bo miletî rohnî dîkin, namirin.

"Memduh Selîm Beg, hem li nik wan e, hem ji na; hem li vê dînyayê ye, hem ji na." (10) (Siya Evînê, rûp. 9).

Uzun gelek pîte bi xewnan Memduh Begê kiriye. Lê wî mebestêni gîring hebûne û kariye bigihê armancê. "Lewra rûdanêni çîrokê di çarçiva xewnan de ji aliyê hunerî ve, gelek alîkariya nivîskîr kirine, ku eger li hindek cihan zêde çûbe, lê neête girtin, ji ber ku evçend di xewnan de karekî asayî û normal e." (11)

Belê wî xwestiye rewşa welatî bide xuyakirin. Welatê şerîn. Bajarêni xweş. Birc, keleb û cihêni dîrokî, berî hezaran sala hatine avakirin. Lê dagirkeran talan û wêran kirin. Bircen bilind, lê heriftî. Dîwarêni pehn û xemilandî, lê hilweşiyayı. Hemî cih xopan kirine. Ji bili şînewaran, ci tiştek nema ye. Ew cihêni bi zend û baskêni xurt û lawêni me hatine avakirin. Bi xwîna şehîdan hatine xemilandin. Bûne kavil, ci ruh, bizav û deng jê dernakeve. Pirrê caran xelkê me bi çavêni xwe ditiye ku çawan dijminan nivîsi û nexşen li ser dîwarêni şikeft û kelehen welatê me, bi tevr û çakûçan xera kirine, jê birine. Bi vê çendê dijminan viyaye, şaristaniyeta me têk bide û dîroka me binax bike.

Uzun divê hizra me û cihanê ji, ji bo vê mesela gîring rakêse.

"Hin aliyêni sûran hilweşîyan e. Hin qulêni mezin ji di bedenêni wan de vebûne. . . Li dora sûran ji hêşinahî û av dixuyin. Lê, tu tiştek jîndar naxuye. Ne meriv, ne teyr, ne masî, ne heywan û ne ji mehlûqatîn din." (Siya Evînê, rûp. 9.) Belê; dema dijmin bi sedhezaran xelkê me ji gund û bajarêni welêt derdixe, sîrgûni deverên biyanî û dûr dike. Kaniyan têk dide. Rez û bexçan dişewitîne. Hingî"ci tiştek jîndar naxuye."

Gava mirov diçe nav rûdanê romana "Siya Evînê", nemaze mesela evîdariyê, hingî romana Gabriel Garcia Marquez "Evîn di dema taonê" de tê bîra mirov. Qehremanê herdu romanen hej ji hevdu dîkin, lê her yek ji keçan bi egerekê mîr dîkin. Xort ji bi dilê şikeftî, bi dirêjiya emrîn xwe, li benda berdilkê xwe dimînin û her yek ji xortan ji bi dehan naman dinêrin, lê

herdu keçik dest ji mîrên xwe bernadin. Li dawiyê Memduh Beg bi pîrî jinê tîne, lê qehremanê Marquez dimîne û dema mîrê jinikê dimire-Hingê emrê wî ji heftê salî bêtir e-ji nû ve ew wê dike û bi hev re dijîn. Bi kurtî kartêkirina Marquez "Tem û mijî, wêneyen şîirî, bêhneke dirêj û berfireh, xeyaleke bi hêza têkel û bi realite" û di mesela evinê de, li ser Uzun heye. "Lê yê şarezatiyeke baş di teoriya edebî de nebe, wisan hîzir dike ku eger cihêن tiliyên nivîskareki biyanî li ser berhemên nivîskarekî welatên wî de hebûn, êdî ew nivîskar dikeve cihê gumanê, ya jî bi xeleka lawaz didin xuyakirin. Lê belê;ew ên di alfabeuya edebî de pispor û şarez, wê kartêkirina di hevanê xana edebê hevberkirî û bi pêngaveke serketî dizanîn. Sedem jî di vegerîte xwe westandin, têgihîştin û rewşenbîriya wî nivîskarî, ne ku xeleka lawaz û kêmasiyek, lê bi mercê hindê ku tiştîn nivîskarêni biyanî gotîn, ne vecit, ne vegerîte ve û ne bite wênen wî yê duyê."(12)

Dema Uzun behsa şoreşa Agirî dike, nezanîn û kalfamiya serkirdê şoreşê berçav dike, dema ew xwe bi rengê xulama diguhere û ji bo anîna jîna xwe, di gel Silo diçe bajarê Xoyê, li Kurdistana Iranê-Hingê dikarî du hevalan bisîne-û dema dijmin digirin, dibê:"Here zû saetê bigire û bizivire."(Siya Evînê, rûp. 144)Lê eger girtiban, weheya bîba sedemên problemên mezîn bo şoreşê. Lewra karên wisan û xeletiyê din, dîbin sedemên têkçûna serfîldan û şoreşan.

Uzun divê bide xuyakirin ku her çend ji destpêka çerxê bîstê, Memduh Begê destnîşana armancêن xwe kiriye û ketiye nav qada xebatê, lê heta niha jî-dawîya çerxê bîstê-hêşta mîletê me negihaye mafê xwe. Anku jiyan û xebata Memduh Begê, bi ya xwe ve girê dide. Ji ber ku Mehmed Uzun jî, mina wî, di bizava siyâsi û ronakbîrî de kar kiriye. Di kovar û rojnaman de nivîsiye, ketiye ber hing û dingên dijmin, jorêن zîndanan pîvane û sîrgûnî welatê xerîbiyê bûye. Lê Uzun zîrekane kariye xwe di jiyanâ wî de bihelîne, ji ber ku armancêن wan mina hev in. Xuya ye ku "Nivîskarek nîne, her ji Aristoteles

bigire û heta niha jî, ku berhemên xwe nekiri-bin egerek ji bo rêxweskirina bir û baweriyêن xwe. Sartre di rêke edebî de bir û baweriyêن xwe belav kirine û her wisa yê din jî."(13)

Ew bawer dike ku kesen ji neçarî welatên xwe hêlane û li derve dijîn, dikarin karên baş encam bidin jî, lê dîsa xebata rast û durust ew e ya di nav cergê welatî de diête kîrin. Piraniya serkirdêن Xoybûnê li Şamê, Antakya, Bêrût, Qahîre, Paris û Londonê dijîyan. Lê welat pêdîvi wan bû. Dema Memduh Selîm Beg Agirî û rewşa şoresgeran ji nêzîk de dibîne, hingî dizane ku mesela şoreşê, ne wilo hêsan e. Belku;mirovêن xweragir, qehreman, bêhînfireh û şareza divê. Belê;yê li ber serma, tîrs, têhin, birçibûn û bomban dijî, ne mîna wî ye yê ku li dervey welatî, li cihênil bilind û tena dijî. Uzun bi navê Memduh Begê dibêje:"Ma mirov dikare xebatêni wan û xebatêni van canfidayan bide ber hev?Memduh Selîm Beg, têdigihê;ev cîhana şer û xwînê û cîhana derve, wek rengê reş û spî, ji hevdu cihê ne."(Siya Evînê, rûp. 135)

Di mesela efûya rejîmê û vegera Memduh begê de, dergeha li ber xwendevanî vedike û wî radikêse tiştîn girîng. Wî şiyaye rojên bûrî bi yê niha ve girê bide û paşerojê jî bide munaqesekirin. Erê;niha bi bezaran kurd, ji neçarî welatê xwe hêlane û li yêni biyanî dijîn, dijmin jî bihayê wan dizane, lewre ji her çend mehan carekê efûyekê derdixin. Lê di wan effûyan de, ji destkevt ji bo mîletê kurd nîn in. Anku dijminan mebestêñ cepel hene. Evca mirovê bi dehan salan xebat û bizav ji bo hindek armanca kîrî, dê çawan bi efûyêñ vala razî bibe!Wî divê bêje, eger hindek bi efûyêñ dijmin bêne xapandin, bila xwe hişyarkin ji ber ku vegera welêt jî"Divê li gor hin qaîdan be. Gava me her celeb qayide û bawerî dan bin lingêñ xwe, hingî mana jiyanê çiye?(Siya Evînê, rûp. 180) Erê; bi dirêjiya dîroka mîletê me û xebata wî ya xwînawî, her dijminî ji neçarî efû bo xelkê me yê şoresger derxistiye. Dijmin rola girîng ya ronakbûr û welatparêzen kurd li derveyî welat dizane. Ew têdigihê ku

xwepêşandanek, protestek, nivisîn û pirtûkek çi dîkin.

Lewre ew ne bes bi efûyan , belku:bi dehan riyên din jî, hewil dide ku ronakbîr û şoreşgeran ji derveyî welêt rakêse bin sibera xwe û paşî bêrûmet û serşûr bike, yan jî bi pîlanekî bikuje û berze bike. Erê hêşta"zor û zulum li welatî her berdewam e. Ma ev çend xebat, ev çend zehmetükêşan, derd û keder, ne ji bo azadî û serbestiya kurdan bû? Gelo ew niha vegere, ew dê li xwe mikur neyê? Ew dê ixanet li xwe, li jiyanâ xwe, li doza xwe û li gelê xwe neke? Ew dê bi vî awayî siyaseta rejîma Tirkîyê nepejirîne?" (Siya Evînê, rûp. 179) Belê; Mehmed Uzun divê bide xuyakirin ku ronakbîr û welat-parêzên kurd li derveyî welat, plan û nexşen dijmin têk didin û ji bo mafêñ xwe yên rewa dixebitin. Dema miletê me giha azadî û serbilindiyê, hingî dê efûyen dijmin bi dawi bêñ, nexo dê her berdewam bin, lê kes guh nedetê.'

\* \* \*

Dema Xaniyê nemir ev çend rêzên xwarê ve handin:

"Ez mame di hîkmeta Xwedê de, Kurmancî di dewleta dinê de,

Aya bi çi wecîh mane mehrûm? Bîlcumle ji bo ci bûne mehkûm" (Siya Evînê, rûp. 218)

Hingê wî baş dizanî ji bo ci bûne mehkûm. Her wisa Memduh Begê dizanî ji bo ci? Niha Mehmed Uzun jî dizane ji bo ci? Lé ya girîng ew e ku sêsed(300) salêñ pirr kuştin û wêran kirin, hêstan me nekiriye-Yan me neviyaye bersiva wê çendê bidin!! Her wisa xelkê me-yan rêberên me-çi wic û mifa ji serbûrên berê wernegirtiye. Ta niha bi dehan serhildan û şoreşen kurdî yên hatine kirin, lê ji ber sedemên xuya û ne xuya, hemî ji van çûne. Uzun divê bi navê Xanî, Memduh û xwe jî, disan vê pirsyarê bike û li benda bersivê ye...

\* \* \*

rûdan, şewat û derdeserî. "Niha payiza 1926'an e" (Siya Evînê, rûp. 32) Dema hevalê wî yê çerkez, pirsyara dest û darê welati dike, Memduh Selîm Beg dibêje:

"Par li Kurdistanê, qetliamek mezîn çêbû. Tîrkan gelek bîrewer, rînas û pêşewayêñ me bi dar ve kirin." (Siya Evînê, rûp. 32-33)

Hingî xwendevan hîzir dike. Par, an ku sala 1925'an ci büye? Ew ci qetliam bû? Bi germî di-pirse. Erê;di wê salê de, şoreşa Şêx Seidê Piran, bi destêñ kevneperestêñ tirk, hatibû ji nav birin. Li qada bajarê Diyarbekirê, ji pêncî rîberêñ kurd bêtir bi dar ve kiribûn. Welat wêran kiribûn û bi sedan karêñ hov li dijî miletê me yê bê guneh encam dabûn. Her wisa helwêsta Sovyetê ji destnîşan dike ku dema şoreş ber bi têkçûnê diçe, çawan dergehêñ xwe digire û ci alikariyê nake, ji ber ku berjewen-diyyêñ wê di gel hukûmeta Tirkîyê hebûn. Hingî her ci bîr û baweriyêñ mirovatî û pirensibêñ Marksizm-Lenînmîz hebûn di beryiyave dan.

Tirkîyê hukûmeta Sovyetê ber bi xwe kişandiye. Hikûmeta Sovyetê alikarî li serîhîdanê nake û deriyêñ xwe ji şervanay ragirtiye. "(Siya Evînê, rûp. 147) Lewra dema xwendevan diçe nav dîroka xwe, ew agehdarî rûdanî dibe, egerên têkçûna şoreşê dizane, dost û dijminan dinase û li riyêñ rizgarbûnê jî digere. Ji ber ku yê dîroka xwe nenase, ew neşê bi durusî berevaniyê ji miletê xwe bike.

Dema Memduh Beg, ji ber sitem û tadeya rejîma Tirkîyê direve û digihê Antakyayê. Ji layekê ve, ew dibe mamosteyê zimanê ferensi-Pirraniya ronakbîrên kurd, Bedirxanî û yên din-bi alikariya ferensiyan dijin û kar û barêñ xwe bi rê ve dibin. Lé ji layê din ve, pirraniya serekaniyêñ dîrokî, xuya dîkin ku "Ferensiziya destê here dirêj, di alikariya Kemaliya de, ji bo şikandina şoreşen kurdî, hebû, "(14)

Lewra mirov wan ronakbîran, mîna berxê Isê Dela dibîne(15), ev kare jî tevaya dijminen miletê kurd encam dane û heta niha jî berdewam e û nimûne jî mişene. Uzun viyaye xuya bike

ku divê miletê kurd stratejiya xwe rohnî bike û pişta xwe bi dijminan germ neke. Eger dijminen, alikariyê jî bike, ew pîlan û nexşen xwe hene. Lî, divê kurd, şareza û pispor bin û xwe ji wan pîlanan bidine aliyekei.

\* \* \*

Ew mesela behit û dozexê, berovajî pirtûkên ayînî xuya dike. Ew dibêjin: "Agirê dozexê pirr germ e û yê ku gunehê wî pîrr bin, wê bikeve nav agirî û bişewite!" Lê dema Memduh Selîm Beg, dikeve nav agirî. "Heyret, tu germî tune. Na, carina heye, carina tune. (Siya Evinê, rûp. 215) Her wisa pesin dide. "Ev agirê xopan ku her kes jê ditirse, ev e?" (Siya Evinê, rûp. 215) Ne agir, ne jî sotin heye. Neki çawan" Ew di nav gulikên êgir de, hêdî hêdî digere. Agir. Agir" (Siya Evinê, rûp. 215) her çend vê meselê ne ji Mehmed Uzun destpêkiriye, belku; bi dehan zana û filozofan ev çende destnîşan kiriye, lê girîng ew e ku hêstan di nav miletê me de heye, cihê rêz û tîrsê ye jî. Lewra li ser peyvîn û vekolîn, karekî pêwist e.

\* \* \*

Sorşa Agirî têk diçe û Memduh Selîm Beg, bi dilekî şikestî ji wexera xwe vedigere, lê Ferîhayê mîr kiriye. Dipirse, lê ew neşê dest ji mîrê xwe berde! Eve jî wê çendê xuya dike ku nivîskar xem û kovanê wan, dihavêje ser milîn adet, rewst û torêن kirêt û ne jêhatî. Uzun bi zimanê wan dibêje: "Mîrin ji bo adetên kirêt. Bila asteng di riya evîndaran de nemînin. Da ku jiyana xelkê delal ser û bin nebe. "Rast e ku ev babete, mişê di stiran û çîrokên folklorî de, hatine destnîşankîrin û xelkê baş jî li dij rawestkiye, lê Uzun bi rengekî ciwan ev çende pêşçay kiriye. Dîsa ji şarezatiya xwe, keçekke çerkez dike berdilka Memduhê kurd. Yê derbeder û sîrgûnê welatê xerîbiyê. Da ku bi wê çendê eşkere bike, ku her çend Kemaliyên faşist, hewil didan ku mabeyna miletên di nav Tîrkiyê de dijîyan têk bide û pîlanê çepel bigêrin, lê dîsa nekarî vî sînorî dane û biratiya kurd, çerkez

û ermeniya jî ku-ji ayinekî din bûn-têk bide. Lewra "Bingehe debê jêhatî û nemir ew e ku biratiya mabeyna xelkê bindest û zorlêkirî peyda bike. Xelkê ku di nav civatekê de, di gel hev dijîn û ji bo hev xebatê dikin." (16)

\* \* \*

Bî giştî xelk wisan hîzir dikin ku nabe û karekî kirêt e, mirovê şoreşger, carina bi xweşîya bedenî, araq û keyfê ve mijûl bibe. Belku; divê hertim paqîj û bêguneh be, ci karêne di rê de neke. Lî Uzun naxwaze qehrîmanê xwe, mîna mesîhi xuya bike. Ji ber ku ew jî mirov e, hej araq û bedenê nazik dike, rastiya dengê dil û mîjiyê wî didane ber çav. "Şevêñ bêxew, carina ji bo xebatê, carina ji bo qesta felekê. Dengêñ kemançê û keçen xama yêñ Yewnanî. (Siya Evinê, rûp. 61) "Gava daxwaza bedenê li Memduh Begê tê xezebê, ew xwe davêje otelêñ Şam, Heleb û Bêrûdê. "(Siya Evinê, rûp. 195)

\* \* \*

Folklorâ kurdî, deryayeke mezin û pîr e ji çîrok, stiran û dehan babetên girîng ên din. Nivîskarê şareza, dikare gele mifay ji wan wergire û berhemên xwe pê dewlemend û bi hêz bike. Lewra Mehmed Uzun kariye sûdê ji çendin çîrok û stirana wergire, mîna: Binefşâ Narîn, Xec û Siyabend, Mem û Zînê. Her wisa şiyaye dergehê helbestvanê mezin, wek: Xanî û Cizîrî ji biquete û romana xwe bi dirr û mirariyêñ wan bixemilîne. Dîsan kariye li dif stiranê kevin û dîrokî bigere û romana xwe pê bi hêztir bike û di ciyêñ xwe de bi kar anîne.

*Agirî, Agirî tu agir bûyî  
Li nav ketî, serbilind bûyî  
Li ser Kurdistanê çira bûyî  
Hilbe Agirî, hilbe agirî*

(Siya Evinê, rûp. 130)

Her wisa jiyana Ferîhayê bi ya Binefşâ Narîn ve girê dide û vê stirana pîr mana, mişî wênen

şîirî û daxwazên dilê şewitî, bi zimanê Ferîhayê dibêje:

Bila mîrê meriya bi dilê meriya bî  
Bila nan hebû û dew tune bî  
Bila xwarina meriya garisê bi gîlgîlî bî  
Bila lihêfa meriya ezmanê bilind bî  
.....  
Bila cihê meriya ne li vir bî  
Li sînorê Ecem û gêwir bî  
.....  
Bila mîrê meriya ne bi dilê meriya bî  
Bila sibê heya êvarê ne kar bî, ne guxul bî  
Xwarin û libas pirr bî  
Dilê meriya tim bi kul bî. . .

(Siya Evînê 185)

\* \* \*

Di hunerê nivîsinê de, Uzun hindek xeletên teknîkî di avahiya romanê de kirine, bo nimûne:

Ew dibêje: Mîrê têrbejin dirêj(Siya Evînê, rûp. 14)

Lê dema jinê Antakyayê, pesnê wî didin, dibêjin: Merivekî bejin navîn, zirav (Siya Evînê, rûp. 26)

Ew dibêje: Di bajarê biçük de, taxa biçük. Di taxa biçük de xaniyê biçük(Siya Evînê, rûp. 81) Lê dema Memduh Beg diçe jor, dibêje: Deriyê odeya rûniştinê. Deriyên girtî yên odayen din. (Siya Evînê, rûp 82) Odeke mezin, li gor adetên çerkezan raxistî(Siya Evînê, rûp. 32)

Ew xanî wisa xuya dike ku mezin e, çend odayen wî hene û ya rûniştinê jî fireh î raxisitiye, ne ku biçük e!

\* \* \*

Zimanê kurdi li Kurdistanâ jorî, her ji sala 1923 an hatiye qedexe kirin. Lewra ci dergehê zanîn û fîrbûnê nebûn ku xelk pêş ve biçe û layêñ tarî rohnî bike. Ne xwendinge û

pirtûkxanêñ kurdi, ne kovar û rojname, ne radyo û ne ji televizyon. Di rewşek weha de, li jêr perdeke reş de, dê çawa milet bi pêş bikeve, edebiyat û çanda xwe bi pêş de bibe! Ev e hemî sedemên paşdemayina miletê me bûn, lê digel hindê ji, ronakbîr û nivîskarêñ me, asteng têk dane û xizmeta ziman, edebiyat û çandê kirine, mixabin ew mîna tiliyên destan bûn. Lê belê; di van salêñ dawiyê de, bi dehan nivîskar û ronakbîrêñ kurd peyda bûn û rewş ber bi pêş de birin. Mehmed Uzun bi xwe dibêje: "Ez sala 1972 di zîndanê de fêri xwendin û nivîsandina kurdi bûm. (17)

Lewra eger kîmasî ji di zimanê wî de hebin, tiştekî normal e, çinku "her çend pêngavêñ me kurt in, lê girin ew e ku em ber bi pêş ve diçin. (18)

Her çend ta ku niha gelek meselên ziman û rînivîsê, nehatine çareserkirin û zimanê vê romanê(Siya Evînê)ji, ji romanêñ wî yên din bi hêztir e, lê dîsan ew ji kîmasîyan rizgar nebûye. Peyvîn biyanî, darristica hevokan, bi karanîna hindek peyvan ne di cihê xwe yê dirust de, bo nimûne:

Muqedes	= Dibe Pîroz
Sîrr û esrar	= Nîhêñî û nependî
Serq	= Rojhelat
Esas	= Bianaxe, şengiste
Lewhe	= Keval
Wezinandin	= Kêşan
Letif	= Nazik, rînd, ciwan, narîn
Tecrûbe	= Serbûr, bûyer, serpêhatî
Zikam	= Persîv, helamet
Hereke	= Bizav, bizotnewe
Xof	= tîrs, sehim
Xerbe	= Kavîl, wêran, û geleken din. . .

- Bêyî ku ew hay ji taya evînê hebin(rûpel 76)

Ya rast ev e: Bêyî wan hay ji taya evînê hebe. (yek taye)

- Dapîra min ew fêri min kiribû. (Rûp. 106)

Ya rast ev e:Dapîra min ez fêri wan kiribûm.

- Giyanê min eziztir ji hevalên min, ji ev  
gehremanan nîne. (Rûp. 159)

Ya rast ev e: Giyanê min, ji hevalên min  
van qehremanan eziztir nîne.

-Tu divê bizewici. (Rûp. 200)

-Jinek divê li mala te be. (rûp. 200)

Ya rast ev e: Divê tu bizewicî?

Divê jinek li mala te be?çinku firman e  
(Emre)

\* \* \*

-Mistek ronahî direşîne ser kaxezê. (Rûp.  
119)

Dema çiray sînahîya xwe direşîne jorî tarî, ji  
nû wî misteke nîska berda binê tîrkî.

-Ez ji we re qehwekê bipêjim(Rûp. 64)

Nanî bipêje, lê qehwekê ji me re çêke.

-Di odeke stûr ya Hotel central de. (Rûp.

116)

Darekê stûr bîne, lê di odeke mezin de razê.

-Hebûna wê germiyek dide odê û tiştîn odê.

(Rûp. 40)

\* \* \*

Di nav rûpelên vê romanê de, gelek rûdanêñ  
girîng hene: Şoreşa Şêx Seîdê Pîran, Agîrî,  
Kurd Teali Cemiyeti; komela Hêvî, Partiya  
Xoybûn; Hewlwesten welatên Sovyet û Iranê,  
Hovîtiya hukûmeta Tirkîye, qehremanen xelkê  
me, Xîyaneta hindekan (Mehmed şukrî  
Segman). Her wisa piir e ji babetên siyasi,  
civakî evîndarî û edebî. Xuyaye ku Mehmed  
Uzun piir zehmet daye xwe, ta ku kariye  
bîgihe van rûdan, cih û binkan. "Qehwexana  
Abdulla çawîşê erxeniyê, cihê Hêvî li sîrkeciyê,  
li hember postexana nû, di xaniyên Erzuromiy-  
an de. "Her wisa di nav rûpelên rojname û ko-  
varan de ji gerhaye, xwe gîhandiye gelek  
qulaçen jîna mîletê kurd. Bi vê çendê ji, romana  
xwe xemilandiye.

Her çend mîletê me, di vê dema nazik de,

pêdivî edebê realite û xweragirtiye û ev romana  
dikeve xana romana romansı(Xerîbi, tenhayî,  
derdeserî, bêxwedanî, xem û kovanen giran,  
bêçareyi û bêrêditin bi dawî hatiye)lê Siya  
Evînê ji layekî ve, baştırın romana Mehmed  
Uzun e ji layê din ve ji, ji romanen here serke-  
tiyên me ye û qilaçke vala ya pirtûkxana kurdi  
piir kiriye. Em hêvidar in li ser nivîsinê berde-  
wam be, lê girîngî ne ew e ku miş binivîse,  
belku;ew e ku berhemên jêhatî yên hosan  
pêşkêş bike.

1. Hesen Caf, çiroka nû ya kurdi, rûp. 19.  
çapxana Elai, Iraq 1979.

2. Her ew serekani, rûp. 24.

3. Kovara Beyan, hejmara 126, befîrbar, Iraq.

4. Husén Arif, çiroka huneriya kurdi 1925-  
1960, rûp. 112, dezgeha roşenbirî û belavkirina  
kurdi, Bexda, Iraq 1977.

5. Sebah Xalîb, jîn di çiroka kurdi de, rûp.  
10, dezgeha roşenbirî û belavkirina kurdi.  
Bexda, Iraq 1979.

6. Nizar Mehemed Seîd, kes di kurteçirokê de.  
Kovara dengê me, hejmara 4, rûp. 65, Dihok  
1989.

7. Husén Qebani, hunerê nivîsina çirokê, rûp.  
8, dezgeha çiyay, Bêrût 1979.

8. Husén Arif, çiroka hineriya kurdi, rûp. 10.

9. Reca Alneqaş, helbestvanê xweragirtinê,  
rûp. 91. Dezgeha erebî ji bo vekolin û belavki-  
rinê, çapa seyan, Bêrût 1972.

10. Mehmed Uzun, Siya Evînê, rûp. 9, Orfeus,  
Stockholm, Swêd 1989.

11. Hesen Caf, çiroka nû ya kurdi, rûp. 24.

12-Heme Seîd Hesen, pêşgotineke dirêj ji bo  
komeleke kurteçirokan, rûp. 12-13, Stockholm  
1990.

13. Heme Seîd Hesen, erê form ji naverokê  
girîngtir e?Rûp. 4. Yekitiya Niviskarêñ Kurdis-  
tanê.

14. Kovara çanda kurdi, hejmar 1, rûp. 90.  
binkê çanda kurdi, London, cirîya pêşin 1988.

15. Ji bo ku paşayê Amêdiyê, bawerî bi aqîle  
Isê Dela bîne, jê re dibêje: "Vi berxi bibe û pistî  
meheke din bîne ve, lê ne qelew û ne jî lawaz  
bibe, min her wek niha ji te divê. Pistî hizirki-  
rinê ew pîlana xwe datînit. Her roj bermilkê  
giyay dîte berxi, lê êvari serê Gurgî nişa dide.  
Lewra ji tîrsa Gurgî, her ci xwarî dîhelîne. Pistî  
meheke, her weh berê, berxi ji paşay re vedi-  
gerine. Ew ji pirri bi aqîle wi dixwes dibê.

16. Georg Lukacs, vekolindî realizmê de, rûp.  
38. Dezgeha université ji bo vekolin û belavki-  
rinê, çapa sêyan 1985. Wergerandina DR. Nayîf  
Biloz.

17. Kovara Wan, hejmar 1, rûp. 37, Stock-  
holm, Swêd 1992.

18. Ji peyvîn Lenin e.

\*Roja 16. 5. 92"Yekitiya Niviskarêñ Kurd -  
Swêd'li Stockholm seminerek saz kir, ev  
vekolin di wê semînerê de hatiye pêşkêş kirin.

# SIBEHA ÎLONÊ

Arjen ARÎ

Di sikakan de  
tenqan erd dicût,  
li serê qorziyan nobetdar  
û panzera  
mîna gura  
tirs belav dikir...  
Wê sibeha îlonê  
hîn reş li erdê  
ew ci derba ji xafil de bû?

Temara xewê ji ser çavan bavêjin.  
rom tê!..  
rom...  
bi tenq û topêñ xwe  
wê sibeha îlonê  
da zilmê pir bike  
birawo,  
da me bidin hevdu di hepsan de;  
da geman li hişê azad xin,  
rom tê!  
rom!..  
ji xafil de...

Derketin meydanê,  
kûçikên maldaran;  
nobetdarêñ kedxwiriyê;  
ên ser û pî bi stêrk;  
ceneral  
general  
amîral...

û...  
emir dan ên bin xwe...  
tirs belav bû  
tirs kete çiyan

nava gundan  
sikakê bajaran  
tijî eskerin  
zilmê dikin,  
mîna tu nan belav bikî  
êşê didin xelkê,  
û şînê dihêlin li dewsâ xwe,  
şînê;  
bi hêşir û girî...

zilmê dikin  
zilmê.  
zilma kesnedî  
me df:  
birawo qondaxtiving  
serposk;  
û daliqandin...  
û di nava gundan de  
şilfi adem  
lêxistin;  
û xeberên bê rê;  
bûne pênc pere  
jin  
û xuh  
û dê...

Namûsa me  
di nav destan de ma;  
em  
di nava daran de  
ne axîn kar dîke  
ne jî şaq û waq  
me kîjan çûk peritandibû?  
birawo,  
ji kîjan hêlinê me hêk

dizibûn?  
ku ev tore  
hatin serê me.  
Xerc avêtin ser me  
bi zorê  
îsleh bêş kirin  
me zêrên bûka dericand  
û me dan  
di qirnê bîstan de bê fedî  
birawo,  
mêtingehkarî?..

Pênc sal çê bûn  
bi hejmar  
pênc sal.  
ne zilm sekinî,  
ne jî asaq kêm bûn.  
û şîn  
hîn jî dom dike  
hîn jî  
mîna rojêñ pêşî,  
wê sibeha ilonê...

## ÇARÎN

Ne bi agir,ne bi stirana  
ev du buhar e te pîroz nakim,  
çi bû wilo ji min û te  
çi bû,ka bêje,da ez bang kim.

83 Nisêbînê

# ÇEND GOTIN DI DERHEQA ESMA OCAK DE

Husêن DÜZEN

**E**v bûn zêdeyî deh salan ku pêñûs di destê wê de ye û bê etlayî dinivisîne. Heta niha wê sê roman û sê pirtûkên kurteçirokan pêşkêşî xwendevanêن Tirkîyê kirine. Ev ciwanika ku li gundekî Diyarbekrê rûniştiye û bi berhemên xwe di demek kurt de nav û deng daye jineke kurd e.

Lê ew di nav xwendevanê kurd yên ku bi tirkî nizanin de pir nayê naskirin. "Nameya ku Hat Gund" kurteçirokek wê ya duwemin e ku bi kurdî tê weşandin. Di sala 1988'an de kek Zinarê Xamo kurteçiroka wê ya bi navê "Pireka di kelekê de" wergerandiye kurdî û ew di rojnameya Armancê de weşandiye(Armanc, hej. 82).

Ez li vir dixwazim bi awakî pir kurt Esma Ocak bi xwendevanê NÛDEM'ê bidim naskirin:

Xwişka awûkatê kurd Canîp Yildirim Esma Ocak di sala 1928'an de li Diyarbekrê hatiye dinê. Pişî ku wê biryara xwe ji bo niviskariyê daye û pêve ew li gundekî nêzîkî Diyarbekrê bi cih û war bûye. Pirtûkên wê yên çapbûyî ev in:

- Berdel (Berdêl), kurteçirok, 1981
- Kirlardaginin Düzü(Beriya Çiyayê Çelen), kurteçirok, 1982
- Kervan- Serva, roman, 1983
- Sara sara, kurteçirok, 1987
- Kuyudaki Ses (Dengê Di Bîrê De), roman, 1990

- Muş Gürcüsü(Gurciya Müşê), roman, 1991

Nivîskarê hemû pirtûkên xwe bi tirkî nivisîne. Esma Ocak nivîskara zimanê tirkî ye. Lê babeta pirtûkên wê jiyana merivên li Kurdistanê ye. Ew bi piranî li ser rewşa gundiyyêن Kurdistanê û bi taybefî ji li ser jiyana jînîn kurd radiweste. Esma Ocak li gund dijî û jiyana gundiyyên kurd baş nas dike.

Ji bo kurteçirokên xwe yên ku sala 1981 di pirtûka wê ya bi navê "Berdel" de hatine çapkîrin û "Nameya ku Hat Gund" ji yek ji wan e.

Nivîskar weha dibêje:

"Min bi pêşkêşkirina kurteçirokên xwe anî zîmîn ku mafê jinan li van deran di çi eyarî de ye. Min li kehremanên xwe ne wek temayekê wek wesiyetek kurteçirokê nerî. Min hewl da ku ez wan di dinya hisên wan de bînim ber çavan. Gelo ev tişt bi min re çû serî, ez ji nizanîm. Tiştê ku ez dizanîm bes ew e ku min bûyer û tiştê min ditibûn, bêyi ez edebiyatê bikim, min ew bi zimanekî zelal guhezandin."

Esma Ocak ji bilî kurteçirokên xwe yên modern gelek stiranên şînê û evîntiyê yên gelêri di kurteçirokên xwe de bi karânine. Bi vî awayî beşek ji zargotina kurdî ji xezeba jibîrbûnê rizgar kirine.

Lê wê, wek ku hevalekî min di nameyeke xwe de ya li ser Esma Ocak ji min re nivîsibû,

gelek tiştên kurdi "tirkandine".

Ez bawer dikim ev mesela "tirkandinê" tiştekî pir girîng e. Ew kesên ku bi tirkî dinivîsinin(eslê wan tirk yan kurd be) û di berhemên xwe de kilam û çirokê edebiyata kurdi ya devkî bi kar lînin, divê ku bizanibin ku berpirsiyariyek vê kirinê jî heye. Ku edebiyatâ kurdi ya nivîskî hîn ewqas bi pêş neketiyê û keys nedîtiye ku gelek berhemên xurt biafirîne, nivîsandina berhemên edebiyata kurdi ya devkî bi zimanekî serdest wan dike malê wî zimanî. Ma ne xuriste ye ku bi demê re tiştên devkî ji bûr dibin û yên nivîsandî dimînin?

Bê şik Esma Ocak ne bi tenê ye ku wek kurdekê bi zimanekî biyanî berhemên xwe diafirîne. Hejmara ew kesên ku bi eslê xwe kurd in û bi erebî, farisi, yan jî bi tirkî dinivîsinin bi sedan in.

## Bi tirkî dinivîsin lê bi kurdi dişewitin

Helbestvanê kurd yê bi nav û deng û wezîre çandî yê Kurdistana Iraqê şérko Bêkes ji bo nivîkarêni bi eslê xwe kurd in û bi erebî dinivîsinin, weha dibêje "Bi erebî dinivîsin lê bi kurdi dişewitin".

Ev gotinê şérko Bêkes ji bo wan kurdê ku bi farisi û tirkî dinivîsinin jî derbas dibin.

Minaqeşeyek di nav ronakbir û nivîkarêni kurd de li ser van kesên ku bi zimanê serdestan dinivîsinin pêwîst e. Ji ber vê yekê ez li vir çend têzan ji bo minaqeşe pêşkêşî xwendevanan dikim:

## Çend Têz ji bo Minaqeşekirinê

1.- Nivîkarê dewletekê neteweyekê, gelekî yan jî eşirekê tune; nivîskarek yê wî zimanê ku ew pê dinivîsinê.

2. Meriv nikare cihêtiyekê têxe navbera "Nivîskarê Kurd" û "Nivîskarê Zimanê Kurd". Nivîskarê kurd ew kes e ku bi kurdi berhemên xwe diafirîne, ango zimanê kurdi bi kar fine.

3. Kesekî kurd dikare bi zimanekî biyanî gelek tiştên çê ji bo kurdan binivîsinê. Ew dikare bi alîkariya wî zimanê biyanî bibe welat-parêzeki kurd, lê bêyî ku ew bi kurdi binivîsinê nikare bibe nivîskarê kurd.

4. Nivîskarêni ku bi eslê xwe kurd in û nivîskarêni zimanê tirkî ne, ne homogen in; gerek meriv wan nexe kategoriyekek. Ew di nav xwe de pir celeb in: wek mînak Ahmed Arif, Esma Ocak û Yilmaz Odabaşı bi tirkî dinivîsinin, lê kurdîtiya xwe jî încar nakin. Lê kesên wek Bekir Yıldız hem bi tirkî dinivîsinin, hem jî xwe tirk dihesibînin.

5. Bê şik ji bo wan kurdêni ku di zaroktiya xwe de kurdi fîr nebûne- ya ne li nav kurdan mezin bûne, yan jî dê û bavêni wan ev keys nedane wan- nivîsandina bi kurdi pir dijwar e. Ra li van kesên wanî dibe. Lê ew kesên ku bi zimanê kurdi mezin bûne û li malê bi kurdi dîpeyîvin, lê nivîskariya xwe bi zimanê hikimdarêni biyanî dikin, ew di nepêşketina zimanê kurdi de xwedî pişk in. Divê ku ev kesên han dev ji pseudonivîskariya xwe berdin û milen xwe bidin wan kesên ku kurdîya xwe ya malê kirine zimanê berhemên xwe yên edebî û zanisî.

6. Rewşa nivîskarêni afrikî, amerîka laûnî û kurd ne wek hev e. Meriv nikare bêje ji ber ku afrikayan bi firansizî, portekizî û îngîlizî berhemên xwe nivîsinê, gerek nivîskarêni kurd jî bi tirkî, erebî û farisi binivîsin. Ev ramanek dogmatik e: Li welatêni Afrika û Amerîka Laûnî dijitiya di nav mêtîngeh û mêtînkaran de, xwe wek dijitiya di nav nijad û olan de derdixist pêş.

Ola kurdan û yên mêtînkaran yek in. Ku nivîskarêni kurd di rewşek wilo de zimanê xwe berdin û bi zimanê hikimdarêni biyanî binivîsinin, ew tirba gelê xwe bi destê xwe (ji hêla çandî de) dikolin.

Armanca min bi van têzan ne ew e ku ez kesî biêşinim. Bê şik gelek kurdêni ku bi zimanêni biyanî dinivîsin berhemên pir hêja tînin pê. Ew li ba min jî gelek berêz in. Ez hêvîdar im ku ev têz karîbin minaqeşek pir bi ber di nav pispor, nivîskar û ronakbirêni kurd de vezin.

# NAMEYA KU HATE GUND

Esma OCAK

Werger: Husêن DÜZEN

**A** hmedê ku ji berî sê mehan ve di nûavakirina xaniyekî kevnare yê li kêleka behrê de karkerî dikir, ji gundê Diyarbekirê, ji Kazancı bû. Gundiyên der û dorê yên ku çûbûn Stembolê û vegeriyabûn, dawiya qal kirina wê netanîn. Wan tewr qala jinêñ xweşik û bi bêhna erzan, behrê, papûr û wekî din qala tranway û tunelan dikirin. Bi kurtî ji ber ku wan bi heyranî qala tişten ku wî nedîbûn kiribûn, wî bi daxwazek bê ragirtî, zaroka xwe di hemêza jina xwe de hiştibû û bazdabû Stembolê.

Gava jina wî ew bi rê kiribû, ne xemgîn bû. Tewra ew bi kêt bû ji. Dê mîrê wê nameyên bi silav, bi evînî û pere ji Stembolê jê re bişanda; wê ji dê name bibira oda gund û bi yekî xwende bida xwendin. Bi vi awayî wê temama xelkê gund demek dirêj behsa nameya Ahmed, pereyên ku wî şandibûn û hezkirina wî ya ji jina wî bikira. Ev ji ji wê re bes bû û zêde bû ji. Ji ber vê yekê gava mîrê wê çû, wê zaroka xwe xistibû hemêza xwe û li paş gundiyyên ku bi ser dolmîş de kumişî bûn û ew bi rê dikirin, sekînî bû û bi awayekî kêfxweş dibişiri. Gava dolmîş bi rê ket, Ahmed ji bi kêfxweşî û bi rûyekî vekirî li jin û zarokên xwe nihêri. Te digot qey kêfa wan tesîr li zarokê ji kiribû, ew ji bê hemdê xwe dikeniya.

Li ser riya malê ew pêrgî kê bîhata,

- Ahmed çû Stembolê, me niha ew bi rê kir, digot.

Gava wê bi kêt wilo digot, Pîra Fatima ku weke cinekê bû lê vedigerand:

- Keçê raweste, xwe wenî nenepixine, ew xetek name ji ji te re nanivisine, ew tu peran ji ji te re naşîne, an ji ku ew sala bê Tangoyek Stembolî ku zarok di hemêzê de li vir ji dolmîş peya bike, tu ê weke nepoxekê bifise. Yên ku wenî diçin me gelek fen û fûtén wan dîtine.

Xwîna wê hilkişa mîjîyê wê:

- Dayika Fatma, dayika Fatma!
- Keçê kêt meke, kêt meke, Şemsâ behlûlê.
- Tobe tobe, lê ez çi bikim, ma ez bigirîm?
- Here li mala xwe qenc bifikire.
- Lê Ahmed çû. Ma ku ez bifikirim wê çi bibe?

- Ka tu hebekî kûr bifikire wê hişê te bê serê te. Niha aqilê te bi hustekê li jor e, ji bo wê min ji te re got.

Ew derbasi hewşa mala xwe bû û derî li xwe girt. Şika pêşî hîna ku mîrê wê li ser erdê gund bû ket nava wê, ew weke gulokek berfê ya cemidî ku her digindîrî mezîn dibû, ew ji nişkê ve gelek mezîn bû.

Di vê germê de berf li şevêñ wê dibariyan, ruhê wê bi hîseke bi tenê hiştî ya bê deng dahat girtin.

Ew nameya ku ew bi tas û wasiyek mezîn li bende bû, pişî sih û pênc rojan hat, te digot qey ew ji wê şika ku pîra Fatma xistibû nava wê rizgar bû, name girt, hemêz kir û got: "Ox, Xwedêyo spas."

Bi kêfek weke ji bo bedewiyek pîr mezîn, name di dest de, wê zaroka xwe kir hemêza xwe û bazda oda gund. Eynî weke ku xeyal dikir, ji

xortekî xwenda re got:

- Zû bixwîne, li ser piyan zerf dirêjî wî kir.

Dest bi xwendina namê bû. Pişti silavan, ku rüpelek dagirtibû, Ahmed qala xaniyekî pîr bedew yê li ber behrê, ango qala wî xaniyê kevnare yê bi xanimnavmali ku ew di nûavakirina wî de dixebiû, bi zêdebûn dikir. Pişti ku wî rexne li gemar û germa gundê xwe digirt û dû re wî nameya xwe bi wî awayî diqedand. ". . . Gotina min ji wan kesên ku nameya min dixwînin û yên ku li wê guhdarî dikan re ye. Hûn li wê derê li nav toz û kayê paleyê dikan, pûş cercere dikan, yan jî hûn bênderan didêrin û ji german difetisin, ê min gava ez karê xwe diqedinim, ez dikevin dengizê. Ox ava weke qesê. Papûr û gemî diçin û têr. Jinêñ bedew, keçen ciwan tev de tazî, tewre şilfi tazî dikevin dengizê. Ez bi sobahiyê digihîjim ba wan. Ew li min temâse dikan û hey li min temâse dikan. Ji ber ku ez di dengizê de me, tazî me û xweşikim jî. Lî ew ê ji ku zanibin ku ez karkerim, gundî me? Em bi hev re dikevin qayışê, em bi gogê dileyizin û bi wî awayî har dibin. Jinêñ vê derê ji canêñ xwe re comerd in. Ma Stembol ne Stembol e yabo, buhuşa bi horî ye, buhuşt e. Dil û çavêñ min vebûn. Xwedê sobaniya bi jinan re li wan deran bike nesîbê we hemiyan. De niha di nav xweşiyê de bimînin. . . "

Bi xwendina nameyê re rûyê Şemasa bi zerbûneke ku ji kederê derbasî hêrsbûnê dibû, hate guhertin. Bêyî ku namê bi şûn de bigire, ji nişkê ve ji odê derket, bi xezeb kete nava gund.

Wê nedixwest ku here mala xwe, kete riyeke ku bê hemdi kete pêş wê.

Henîfa ya ku zaroka xwe li ber siya li pêş derî dixist xew got:

- Ci ye keçê, qey nama Ahmed hat?
- Hat. Ma te çawa tê derxist?
- Ehh ji hatina te ya odê kifş e. Jina ku mîrê wê li xerîbiyê ye, ji xeynî ku ew nama mîrê xwe li odê bide xwendin, ew ê here odê ci?

Şemsa got:

- Xwezî min hustê xwe bişkenanda û ez neçûma odê.

- Cire keçê, ci bûye, ma wî di nama xwe de

çi gotiye?

Weke ku bikeve ew li nik wê rûnişt.

- Tişte ku pîra Fatimê gotibû wê bibe.

- Ma pîra Fatimê gotibû ci?

- Wê gotibû ku Ahmed ê bi tangoyekê re bizewice.

- Yadêê. Na lê ma ew zewicî ye?

- Ez ê ji ku zanibim. Bila ew serê wî bixwe, lê wer xuyaye.

- Tifû tobe. Ma ew jin ji te xweşikir e?

- Ma min ew dîtiye, tu dibê qey min ew binerda ha dîtiye?

- Dibêjin tango ye?

- Erêê, dibêjin ew tango ye.

- Lî wî çawa bê fedî ew tişt xistine nama xwe?

- Nexistiyê.

- Lî kî gotiye?

- Lî?

- Ma lome heye keçê? Ma ez ê bê sedem derewa bikim. Bi tangoyan re dikeve avê û bi wan re sobaniyê dike, ew bi wan re har dibe, tango wî diecibînin. Ger ku mîr bi jinê re tazî, hem jî şilfi tazî têkeve avê, henekan pê re bike, ma wê ew ci bike keçê? Ma wê mehrbirîn pêwîst nebe? Ji xwe cennet minnet e.

- Wîii ruwê min reş be. Bi wanân re? Wê bîne, ma qey wê neyne? Ma namûsa xelkê li çolê ye lawo?

- Eêê wekî din ci?

- Rast e keçê, ma tu rast dibêjî, wî ev xistine nama xwe?

- Xistinê, xistinê. Mêze bike di nama wî de qet navê min derbas nabe, li zarokan napirse û qala peran jî nake. Derdê wî keç û jin in. Ew hew tê van deran. Wî ez û pitika min li navê hişt.

- Keçê meriv nebehecîne. Ji bo ci te ew xistriya Stembolê, ma te nizanîbû ku malbatâ wî xerabé ye?

- Min ji ku zanîbû ku ew ê weha bike. Min got qey ew ê peran bişîne.

Henîfa,

- Wey wey li tişte ku wê hêvî dikir mîzeke, got. Keçê ma tişte ku karkerek distîne ci ye? Ew wek carûda tozê, nikare qirika xwe jî têr bike.

Mîna ku dibêñ "ben umarim bacimdan, bacim olur acindan"(Hêviya min xwişka min e, ew jî ji nêza dimire). Hem jî te ê bi vê gunditîya xwe çi bikira ji peran? Tu bi mîr bû te xwe bê mîr hişt. We debara xwe dikir û derbas dibû.

Dengê wê bi girî, hêviyên wê ketî bûn.

- Min ê wek bajariyan merş, sobe û dîwanek bikiriya. Min ê balîfîn neqîskirî çêbikira û bisparta dîwana xwe. Şevêñ zivistanê gava hûn bihatana, em ê li dora sobê rûniştana. Min ê bi wî teybek jî bida kirîn. Me ê bi hev re li dengê Ayşe Şan guhdarî bikira.

Hanîfa dilê xwe bijand wan tiştên ku hatin gotin, te digot qey çê bûbû. Wê serê xwe doşî herdu aliyan kir û got:

- Hey gidî xayinê, te çîma ev tiştan berê ji min re negotibûn?

- Weke ku min zanîbû wê çi bê serê min. Ez fikiribûm ku "belkî nebe". Tu dibîne, nebû jî.

- Keçê wele ev tiştên ku tu dibêjî pirr xweş in. Xwedê gişî bike rizqê me hemiyan. Wey xwezi mîrekî wenî bikeve bin erdê. Binêre bêjin ci difikire û ew ci tiştên bêrê dike? Tu zarok û jina weke gulekê li ortan bê kes bihêle, bi xelkê re rabe û rûne, vê ji têxe nama xwe û bila ew li oda gund bê xwendin. Bila her kes herin mala xwe, ji jin û zarokên xwe re qal bikin û bêjin "Ahmed di çeman de bi jinan re sobaniya dike û wan bi sobaniya har dike".

- Ez ê çawa derkevîm nava gund Hanîfa, ez rezîl bûme, rezîl... .

Şemsa bi lez berê xwe zîvirand aliyê dîwêr. Ji ber ku Xellîl û Husêñ çakêtên wan li ser milêñ wan, ji oda gund derketibûn û bi aliyê bênderê de dihatin. Gava ku name li odê hatibû xwendin ew jî li wê derê bûn. Şemsa bi awayekî ku ew wan nebîne serê xwe pêl kir. Wan gavêñ xwe hêdî hêdî avêtin û gava gihiştin ba wan ji nişkê ve sekinîn.

Henîfa mizicandina henekpêkirina ku ji lêvîn van herdu mîrên derdiket û xwe bera ser riwê wan dida hew tehmûl kir. Ew li wan rabû û got:

- Hûn ci sekinîne kurno? Ma tiştekî ku hûn

bêjin heye?

- Nama Ahmed. . .

- Bila nama wî rezîlî têkeve çavêñ we. Ma hûn bi tiştên ku wî kiriye

kêfxweş dibin? Wê bizewice. . . Bila bizewice, hûn jî herin bizewicin. Hetanî di serê mîrên gund hemiyan de qoçelê çaqulî çê bibin, gava li nik hev bimeşin bila qoçelên wan di nav hev kevin.

- Diyar e ku jin pirr bedew e. Min li Stem-bolê pirr jin dîtine, lê ez pêrgî yeka nexweşik nebûme. Nig û destêñ wan jî gewr in, wek semûnan nerm in û bêhna miskê ji wan tê.

- Kuro kûcîk. Jina bajarî û tewra jina Stem-bolî ma rêxa dewaran ji axur paqîj dike, ku bêhna ne xweş jê bê? Ma ew tepikan çê dike, yan hevîr dike, ku destêñ wê bibin mîna çipêñ mirişkan? Ma ew li ser bênderê serê xwe dixe ber xwe û sap dikute? Ma ew kayê dikşîne, ku reş û hişkolekî bibe? Ma ew çewalêñ şêst kilo davêje ser pişta xwe, ku pişta wê xûz bibe? Ma ew sibê û êvarî dewê bê rûn û nanê hişk dixwe, ku hestiyêñ wê derkevin der? Ma ew tî û birçî ji yên wek we bê dîn û îman lêdanê dixwe, ku riwê wê nekene?

Ji bo wan weke ku dibêjin "verin yiyeлим, örtün yatalim, bekleyin ölmeyelim" (Bidin em bixwin, binixumîn em razîn, bipêñ ku em nemirin). Helbet wê bêhna xweş ji wan bê, helbet wê destêñ wan weke nanê xas bin. Gelek ji wan zik û xavkêñ wan xetimîne, ji rûniştinê bez girtine. Ew odayêñ xwe yên bi merş û xalîçan ji bi makînan rês dike, kincêñ xwe hemiyan bi makînê dişon. Lî em? Her şo ji bo ku em gemara xwe bison, em sih çel satil av ji bîrê funin, piştre em zendêñ xwe hildimêşinîn û li ber teştan rûdinêñ. Wê got, ma ez hîn jî bihejmîrim, xweziya xwe bi zorê daqurtand û hilma xwe vekir. Ew kesen ku li ser piyan li hemberî wan sekinibûn hîn jî dibişirîn.

- Heydê herin ji vir û mîna segan mekenin û mehêlin ku serê min bavêje. Herin ser bênderan û ji gundiyan teva re qala qehpîka Ahmed bikin, belkî ew bê gund û para we ji tiştek bikeve, wê got û ji cihê xwe çeng bû û got "Tifûû", wê tif ser çavêñ wan kir.

### Xelîl:

- Kuro li Henîfa binêre, ew dîsa har bûye.  
- Riya gotina xwe bizanibe û dû re bipeyive,  
tu di bin erdê keto. Ez ne seg im ku ez har  
bibim. Ew tişteku tu dibêje hûn in, hûûûn.  
Yella ji ber çavêñ min winda bibin!

Yekî yê din dehf da, bi bazdan çûn, li ser  
bênderan çarmêrkî rûniştin.

### Husêñ şefqa xwe xist nav çavêñ xwe:

- Hela werin milet. Ahmed zewicî ye. Nama  
wî vê gavê hat, wî got û bi hemû şahiya xwe  
qîriya. Gundî ber bi wî de hatin.

- Çi bûye, ci bûye?
- Ahmed zewicî ye, Ahmed.
- Çii, ew zewicî ye?
- Erê, erê.
- Bi kê re?
- Bi tangoyekê re.
- Wey weyy, nebêjin kuro.
- Ji bo ci em ê nebêjin bavo, mîrik zewicî  
ye.

- Hayê şemsa jê heye?

- Heye, heye.

- Siûd e. Rind kiriye, rind... Tango zendên  
xwe yên mîna berfê gewr û tijî bazin, hetanî  
bin çengan vedikin û datînin navê, saetek biçûk  
jî dixin destê xwe yê çepê. Oxx tiştekî mexwe  
û li ba wê ramede. Welle wî pîrr baş kiriye.  
Xwedê bike qismetê me jî.

Cend jin bi hêrs çûn ser wî.

- Bê fedî, bê terbiye.  
- Ez ê ci bê fedî bim, aqûbeta wî li serê me  
tevan be.

- Hûn wê yekê nebînin.  
- Ji solan ya kevin, ji jinan ya nû. Xwedê  
siûd daye xelkê, yê me jî salhê kor daye me  
bavo. Siûda me jî yên bi naz, ji tangoyan re  
nîn e.

- Hela deng meke kurmî, qet nebe tu bê deng  
be.

- Kurmî bavê te ye. Ox wa ye wî kiriye. Ma  
meriv jinêñ wek we gemarî bi yên xweşik û  
gewr naguhere?

- Ma ew jinêñ han, mîren bi pantorêñ setre  
(setre ji erebî tê, ji cakêtê taciran, yê beskura  
wan rast û bi bişkok re tê gotin)bi yên wek we

hustuelok, şefqa wan bi rûn û şelwar pineki  
diguherînin?

- Binêre, guhertiye.
- Erê, erê, em ê dawiyê bîbînin, dawiyê.

Li ser bênderan bû wek roja mehserî  
Hinan li hev bêr, melkes û melhêbêñ dar hildi  
dan, carîn û qêrîn bi hinan diket, hinin din çê  
dikirin, hin ji wan jî dikenîyan û dibîşirîn.

Dengen wan digihan guhêñ wan kesêñ li be  
dîwêr. Şemsa hê ji serê xwe yê pêlkirî ranek  
ribû. Henîfa ji nişkê ve be çenga wê girt û ser  
wê rakir jor.

- Keçê te ci serê xwe berdaye jêr mîna yek  
ku qebhet bi ser de hatibe. Tu ê ji qehra  
bimire, ku tu li wan kesêñ li ser bênderan ji bc  
xatîrê bênamûsekî wek keran dizûrin, guhdar  
bike. De rabe ser xwe, em herin malê.

- Wek bêxwedîmabûna min ne bes be, ez êd  
ji her kesî şerm dikim;ne yê din lê xwediyê w  
fedi dike. Qurbanê Hanîfe em zû herin. Wê niş  
yên li ser bênderan bigihîjîn cem me.

Zarokên xwe hemêz kirin û meşîyan, keti  
hewşê û koleka deriyê text ji paş de radar  
Şemsa li sikafka odê rûnişt. Gava wê zarok  
xwe danî ser hesîr, got:

- Pitika min a bê bav, paşê ricifi û bi qêrî  
giriya. Lê belê, ji berevajîya nama xwe gavê  
Ahmed sîngêñ qaşîşelyayî, piştêñ birînvebûy  
bedenê çîlmisi yên jinêñ bi bikinî, ku di qûmê  
de vezelyayî bûn, didîtin, hingî verşandina wî  
dihat. Bi hesreta dîtina gundê xwe û yê bi ka û  
çavêñ reş û vekişî, rûyê girover ê ku ji tav  
qemer bûyi, kirasêñ nimêjê yên li pehniyêñ  
qelişî, fistanê gulgulî yê jîna xwe ya zeh  
metkêş, zarok li pişte, satil li mil ku diçû derî  
dûr bêriyê bû. Wî xwe bi wê hesretê davêt nav  
avê ji bo ku herareta xwe bişikîne.

\* Ev kurteçiroka E. Ocak ji pirtûka wê ya ku  
di sala 1982 an de di nav weşanêñ Tekin de bi  
navê BERDEL li Stembolê çap bûye, hatiye  
wergerandin.

# SÎNG Û PÎSTAL

Mueyyed TEYIB



M. TEYIB

**D**i dîroka gelê kurd ya tîjî karesat da, ji ka resata buhara 1991 mezintir qet rwînedayne. Ew dîmen û wêneyên di rojname û televizyonê cîhanê da belav dibûn dinya hejand. Yek ji wan dîmenêner cergbirr jineke kurd ya rûnişti bû û cendirmeyekî tîrk pîstala xwe li sîngâ wê dida. Ev helbesta pêşkêşî wê jina kurd e.

Ew sîng berî çardeh salan,  
çimeneke zozana bû  
helalêñ sor  
Li herdu milan sema dikir.  
Ew sîng berî çardeh salan,  
zinareki Laleşê bû  
hemî çava  
digel rojhîlat û rojava  
tewaf dikir.  
Ew sîng berî çardeh salan,  
rûmeta mala giran bû  
Sîng û dilê heft bira jê ra perjan bû.  
Ew sîng berî çardeh salan,  
lawekî kurd pawan kir û  
dilê xwe li ser kire ala.  
Ew sîng piştî çardeh salan,  
du keviya li ser dada,  
kela bayê eşqê lêda  
heft zarokan jîn jê vexwar.  
Ew sîng piştî çardeh salan,

çardeh caran lê bû nîhar,  
çardeh caran reş û şîn bû,  
çardeh terim hemêz kirin.  
û bahoza reva reş hat  
û li cergê Kurdistanê...  
ew cergê evroke bûye  
berderazînka cîhanê.

Ew sîng û  
çîmen û  
zinar û  
rûmet û  
kevî û  
gonistan,  
kete jêr pistala cendirmeyekî tîrk.  
Oh Agirî!  
Ey berztirîn ciyayê kurd!  
Te çav lê ye raneweste!  
Yan bipeqe û kevirên xwe ji xwînê sor bike!  
Yan jî heta ber piyêñ xwe sor bike!!!

Gulan 1991, Katrineholm

# HEVPEYIVÎN BI D.ÎZOLÎ RE

Derwêş M. FERHO

**D**îzolî ji çend salan û vir de xebateke hêja dike. Ferhenga Kurdi-Tirkî, Tirkî-Kurdî amade kir. Çapa yekê li Holanda, çapa duduyan jî li Tirkîyê bû. D. Îzolî li ser ferhenga xwe hê jî dixebite û wê fireh dike. Li ser vê xebata wî me ji bo xwendevanên NÛDEM'ê pê re sohbet kir.

**Derwêş:** Xebata edebî, di bin şertê xerîbiyê de pirr çetin e. Tu jî xebatek weha dikî, li ser ferhengê dixebitî. Ev xebat zehmetiyên taybetî bi xwe re tîne. Yan na?

**Îzolî:** Li Ewrûpa êdî mirov nikare bibêje "şerdên xerîbiyê". Wisa bû ye ku tu dikarî li her derê her cûre kesenê welêt bibînî. Xebata edebî li gor kesan tê guhertin. Her kes li rîgâyî rewîst (karekter) û tuwana(qabiliyet) xwe li ser cûreyek edebî mijûl dibe. Lê min ferheng hilbijart. Pirsâ jofir de "Xebata ferhengî çawa ye, zehmetî çi ne?" ku ez vê yekê wekî du pirsan dipejirînim. Yekem: "Xebata ferhengê çawa ye?" Bersiv: "Kîjan ferhengê" dibêjim û berevajî jî pirs dipirsim. Bi gelmperî ferheng hemî weke hev in an jî wisa xuya dibe. Tu li bêja digerî, kom dikî, wan rîz dikî û şirove dikî. Paşê mirov bi edebî û zanistî li ser dixebite. Lê di piraktikê de ne wisa ye. Ferheng hemû ne wekî hev in. Her zimanek ferhengek xwe heye, bi



D. ÎZOLÎ

taybetî karêni xwe yên cûda cûda hene. Rêzkirina bêjeyan hîmê hêşan in, lê malbata bêjeyan, yanî bêjeyen ku ji bêjeyan derdikevin, ji bo wan ferhengeke kurdî mumkun nîn e, ku mirov wan bi cih bike, an jî li ser wan bîryareke serbixwe bide. Wekî bêjeyen ku ji Agir an ji Ser de têr tu nikarî bîryar bidî ku kîjan di bin hev de û kîjan di nava tekstê de wê bê nîvisandin, yanî kîjan

biwêj e(terim)an kîjan bêjeya hîmî ye. Wekok: Serêş, serêşandin, serbajar, serbajîr, ser de, serbijêr û hwd.

Biwêj û biwêjên lêkerî bi awayekî din idiom an semi idiom di kurdî de bi serê xwe problem in. Wekî biwêja "Ji bîr kirin, ji ber xistin" mîna bîr kirin, ber xistin jî dikare bête gotin û nivîsandin. Ferhengê de rêza wan gelek ji hev dûr e. Pirsa duhem: "Zehmetî ci ne?" de vesartîye. 1)Wekî tiştên ku min li jor got, ev yeka ha bi serê xwe zehmetî ye. 2)Pê re jî zehmetiyêñ bêjekomkirinê ye. 3)Nivîsandin, ew jî zehmetî ye. Gava ku bêje kom dibin û rêz dibin û li ser tête xebitîn divê bê nivîsin jî. Kesê ku ji te re vî karî bike tune û divêt tu bi xwe binivîsi. 4)çap û çapxane. Gava karpêkek ku amade dibe divê bête çap kirin. 5)Belavkirin. Tirsa mezin ev e. Hê ku te xebateke edebî destpênekiriye ev tirs û xov, a rastî ev fobî di dilê te de ye. Gelo di dawiya ev çend zehmet û kar û serêşî de ev karpêka min di nava gel de belav bibe an na, ku belav nebe ez ji bo kê an li ser ci kar dikim. Kesê din nizanim, lê ez tim û tim di bin bandûra vê tirsê de jiyan.

**Derwêş:** *Li ser ci esasî tu gotinêñ xwe dide hev (sedema dûrbûna ji xelkê xwe).*

**Îzoli:** Li xeribiyê bêje çawa kom dibin.

a)Weşanêñ kurdî. Gelek weşanêñ kurdî hene, bawer dikim besî me ne. Ger ku tu bikaribî tipêñ erebî û kirîlî jî bixwînî serkaniyêñ herî girîng pirtûk, rojname û kovarêñ kurdî ne.

b) Kes. Wekî tê zanîn li Ewrûpa ji her perçeyêñ Kurdistanê mirov hene. Ger têkîlî bi wan bikî û hinek ji hewl û zehmet li wan bigerî di navbera axaftin, pirs û şêwr û galegal de mirov dikare gelek bêje bi dest xîne. Lê divê kaxez û pênuşa te di bêrika te de be.

c) Ya herî girîng jî mirov bi xwe ye. Ez kurd im û li gund mezin bûme. Dorhêla xwe û derdora xwe hemû dizanim û zarava an devoka herêma xwe jî ji bîr nakim. Ger hemû bêjeyêñ herêma xwe kom bikim, ew jî ferhengek e. Hewce nîn e ku ez hemû bêjeyêñ kurdî binivîsim lê ez ferhengê dînivîsim. Paşê ez li

vir misalekê bidim. Di dawiya 1992 an de ferhengek Holandî derdikeve. Ew di 150 salî de temam bû ye. Çapa yekem di 1864 an de xuya dibe. Heta niha nizanim ew çend caran çap dibe û niha bi 36 cildên xwe ve bi qasî 40. 000 rûpel dertê. Tê de çend bêje hene ku her yek ji wan bi qasî 30 heta 40 rûpelan cih digirin. Bizane ku di pêkanîna ferhengek wisa de bi hezaran kes xebitîne û bi milyonan pere lê xerc bû ye. Tu nikarî vê bi Îzoli re beramber bikî. Lê ez ji wê netirsiyam, bawer ke di kurdî ger ez tenê çend mehan li ser bêjeya *ser û serî* kar bikim dê ew jî wek 40 an jî 50 rûpel cih bigire.

**Derwêş:** *Tu xebata xwe bi ci û bi kî din re dimeşîni, yan tu bi tenê bi imkanêñ xwe kar dikî?*

**Îzoli:** Di destpêkê de min bêje li ser kaxizên ku xîzkêñ xwe wekî xeçerêz bûn, dinivîsi. Min bêjeyek dinivîsi û çend xêzik vala dihiştin û bêjeya duhem bi cih dikir. Dawî ku min bêje didit, ku rêza xwe li pêş bû min ew dixist wî cihê vala. Ew xebateke basît û paşverûhî bû. Lê ferhenga min ya yekem bi sistema "Kartêñ kartonî" bû. Di ebata 8 û 10 cm. de min wekî 40. 000 kart dane birîn û ji her bêjeyekê re kartek tirxan kir. Lê niha nûjen bûme, li ser computere kar dikim. 2) Ez bi tena serê xwe kar dikim. Zor mixabin ku ew imkanêñ min yên kolektîvî tune ye. Ji xwe ku 3-4 kesên ku bi hev re bixebeitin hebûna wê ev ferhenga ha hê ji ser û bertir bûya.

**Derwêş:** *Hêvî û daxwazêñ te di rojêñ pêş me de! bi awayekifireh.*

**Îzoli:** Ez ji zimanê kurdî gelek hez dikim. Em behsa Xanî û Hawarê, Cegerxwîn an Osman Sebrî nekin lê li Ewrûpa ji navêñ nû hene û hê jî me agahdarî li wan nîn e. Daxwazêñ min yên gelek baş hene, lê ez di hêviya xwe de reşbin im(pesimist im). Ji ber ku -ha li welêt ha li der ve-ji bilî çend kesen dilsoz û welatparêz pê de kes zimanê xwe naxwîne û pê re mijûl nabe. Zimanê partî û rexistin û rojnameyêñ wan ên herî mezi bi tirkî

ne. Axaftina wan ya rojane bi tirkî ye, şev û Newroz û semînerên wan bi tirkî ne. Di mala xwe de bi tirkî diaxivin, zarokêن wan bi kurdî nizanîn, navêن wan bi tirkî ne. Ya xerabtir ji her rêxistinêk li dijî rêxistinê din ambargoyêن xwe hene. Weşanêن hevdu naxwinin, êdî dimîne çend kesen bê teref, kesen ku bi xwe dinivise û bi xwe dixwîne. Ev yeka hanê hêviya mirov dişkîne û êdî mecal namîne ku mirov karekî destpêkirî bi serfirazî dawî bîne. Ez li vir itîraf dikim, eger Komkar nebûna çapa duwem a ferhenga min dernessiket. Diyar e ku rêxistinêن siyasi ku bixwazin dikarin pirr tiştan bikin û ya kirî ji bînin meydanê. Li Ewrûpa hin kesen din hene ku bi destlepê karêن baş dikin û ji bê mecalî karêن wan pêş ve naçe, an ji di dolava wan de dimîne. çend misal bidim: Xorteki ciwan navê wî Firat Cewerî ye heye, ku di çiroknivîs û tekstnivîse de bi rasî ji cewher e. Min gelek bêje, ji nivîsarên wî girtine, lê mi-xabin ku piştgiriya wî nîn e û kes wî diviyayî nivîsandinê nake, ku ew hê ji bi kêr bê. Sîistema hevokçêkirin û bêjebikaranîna Reşo Zîlan min tim ji xwe re weke wekok gitîye. Bavê Nazê li vir ji bîr nakim û mafê kovara çiya hê li ser me heye, ku bûye serkanîya ede

biyata kurdî. Rojen Barnas bi awayekî sohbet-warî zimanê kurdî di devoka gunditîyê de bi teşeyeke pisporî bi kar tîne, lê ji çend meqale û helbest pêve xwe zêde nişan nedaye. Bawer nakim ku ew naxwaze, lê belê ew ji di bin bandûra siyasi û aborî de ye. Hîmê romana kurdî helbet ne Mehmed Uzun e, lê rûmeta nîvisandina romana berçav di zaravayê kurmançî de ez wî dibinim. Kêmasî û rexne her li cihê xwe bin, lê divê mirov heqê mîran înakar neke. Di dîroka rojnamevaniya kurdî de, Kurdistan Press bûye nimûne.

Weke ku min li jor ji gotibû: "Ez hemû bêjeyen kurdî nanivîsim, lê ez ferhengê dinivîsim". Daxwaza min ya herî girîng ew e. Zêde ferheng bêne nîvisandin. Wisa ku mirov bikaribe ji her deverê û ji her herêmê ferhengo-kekê û ji her zaravayî ferhengokekê peyda bike. Ev hemû dibin serekaniyek û gava mirov van hemûyan bigihîne hev wê ferhengek bi qasî 100. 000 bêjeyî pêk were. Édi kes nabêje: Te çîma ev nenivîsandiye, an ev ê te li vir gotiye xelet e, a rasî divê wisa bûya". Tiştê ku tenê ji destekî dertê, tu bivê nevê wê xeletî tê de hebin.

Hêvî û daxwaziya min serfiraziya gelê kurd e... !

# AZADÎ

Laleş QASO

D i xweşêvareke gulanê de

Çavên min girêdayî

Destêن min kelepçekirî

Wexta li benda dora îşkencê bûm

Bayekî hênik li sînga min dida

Mezinahiya te ji min re digot

Azadî!

Ger ku ez di deryaya dijwariyan de dijîm

Û ji dijwariyan re hosteyên min dibêjim,

Ger ez bi wan pirtikên tûrêjên rojê

Ku dikevin tarîtiya min rojê bêhempa

Hîs dikim,

û ger hizna li ser hîsêن min weke ku

kêfxweşîya evîndariya te dizanim

Bawerke ev hemî bo evîna te ye

Azadî!

Bila ew bizanîbin ku min

Tu

Di quncikên herî tarî û bê pirtûk de ji

Di dilê xwe de

Di cihê herî pêşîn de hilgirtiye

Azadî!

Ev çend car çêbûn ku daran çîçek vedan,

Ev çend car çêbûn ku leyblekan çûçikên xwe

Bi firê xistin,

Kî dizane ev çend car e ku roj bêî min hilat

Azadî!

Girtîgeha Diyarbekirê, 1981

# ANTON ÇEXOV

## 1860-1904

### Firat CEWERÎ

**A**nton Pavlovîç Çexov di huvdehê meka yekê, 1860' ï de, rojek ji rojên herî sar, li bajarê Taganrogê çavêن xwe li dinya me ya rohnî vekiriye. Ew li ber destêن bavekî dîndar, sert, awirtûj digihê û li dikana wî şagirtiyê dike. Bavê wî yê dîndar, ji bo ku gunehê xwe bi Xwedê bide efûkirin û ruhê xwe nêzîkî Xwedê bike, wî ew Çexovkê biçûk jî nêzîkî dîn dikir û ew di riya dîn de perwerde dikir. Çexov di salêن xwe yên gelek biçûk de bi xwişk û birayêن xwe re di koroya dêrê de distiran û wan herweha ew stiranêن xwe yên dînî li malê ji distiran û bawesîna buhuşte li giyanê bavê xwe dikirin. Lê bavê wan yê Xwedahez, ji bo ku dîndarêن baş û mirovêن rind û qenc ji wan derkevin, wî pîrrê caran ji berdêla şîretêن bi devkî, lêdan û tadeyiya dinyayekê li wan dikir. Pedagojiya wê demê li ser wê nêrinê ava bûbû. Gorî tasvîkirina jiyana aristokratêن rûsan, mirov di terbiyekirin û perwerdekirina zarokan de pêrgî gelek lêdan û tîrsa mezinan ya li ser zarokan tê.

Ji aristokratbûnê wêdetir, di gel ku Çexov ji malbatek kole dihat jî, dîsan bavê wî yê dîndar û sert, ew zarokê bî qasî destekî bi tîrs û xofeke mezin digihand. Ji ber wê tîrs û xofa bavê xwe, wî newêribû li malê bi xwişk û birayêن xwe re bi hêsanî henek bikira, bikeniya, bileyista. Ji ber ku ew hemû jî li Çexovê biçû

qedexe bûn. Lê dayika Çexov, ya weke pirraniya dayikan dilşewat, reben û dilovan, berevajiya bavê wî bû; wê hemû jiyana xwe seferberî zarokêن xwe kiribû. Lêdana zarokan deyne aliyekî, ger pozê zarokekî wê xwîn bibûya, ew ji ber êşa wan dikete tayê, dil û cegerê wê ji ber êşa zarokêن wê dihatin sotin. Carinan gava ku bavê Çexov li zarokan dixist, diya wî ya dilovan dixwest zarokêن xwe biparêze û li hember mîrê xwe derkeve, lê ji bo ku ew di nav héval û cîranan de nebin mijara paşgotiniyê, wê pîrrê caran bêdengî dipejirand û ji ber liberketina zarokêن xwe, wê hêsîren xwe di dilê xwe de di-barandin. Ew diya dilovan, ku zarok û neviya koleyê erdan bû, wê ew zulmdariya koledaran ji bîr nekiribû, ew bîranînêñ tîrsê yên zaroktiya xwe ji zarokêن xwe re jî behs dikir; Çexovê biçûk û jîr, guhêñ xwe miç dikirin, bi saetan li diya xwe guhdarî dikir, di awirêñ wî de li hem-berderketina koledaran pêl dida.

Di gel zulmdariya bavê xwe, dîsan ew zarokekî jîr, biaqil û bi terbiye bû. Bavê wî jî armanca disiplîna xwe weha tanî ziman: "Ez dixwazim zarokêñ min şiyar, jîr û biaqil bin". Ev yeka han xwesteka gelek bavan e, lê her bav li gor kultur û têgihîştina xwe zarokêن xwe digihînin û wan perwerde dikin. Bavê Çexov jî dixwest zarokêñ wî qenc bin, zana bin, dewle-mend bin. Loma wî tavilê Çexov şand dibistana

Yunaniyan, ku wê demê li Rûsyayê gelek aristokrat û dewlemendên Yunanî hebûn. Pirri-nya rûsan jî dixwestin ku zarokên wan hînî yunani bibin û wek yunaniyan dewlemend bibin. Lê, li dibistana yinaniyan jî riya perwer-dekirinê di lêxistinê re derbas dibû. Wî Çexovê biçûk, nazik û hêviya pêşeroja rûsan, ji ber lêdana mamosiyêñ dibistanê nekir der, bi riza dê û bavê xwe, wî dev ji dibistana yunaniyan berda. Lê ji aliyekî ve jiyanâ bê xwendin çi ye? Kî bê xwendin gîhiştiye ku? Kijan civatê bê xwendin û nivîsandin zincirên koletiyê şikandiye û gîhiştiye azadî û serbestiya xwe? Bavê Çexov jî di wê baweriyê de bû. Herçiqas Çexov nazik, bi terbiye û hurmetgir bû, ew ji bo serketina xwe jî ewçend bi gîr bû jî. Lê hebe tunebe ew ê ji ber tesîra lêdana bavê xwe û tesîra lêdana dibistana yunaniyan be, ew di dibistana navîn û lîseyê de ne zêde biserketî bû. Lê gava ku ew êdî baş bi firê ket, ji cîhana zarokiyê derbasî jiyanâ mezintiyê dibû, jîrî û zirektiya wî jî serî hildida, wî ji bo xwendinê ji nav şaxan şaxa tibbê hilbijart û bi serfirazî xwendina xwe xelas kir û bû doktorekî ciwan, çeleng û hêvîtijjî.

Lê Çexov hê di dema xwe ya dibistanê de dest bi nivîsandinê kiribû, çîrokên wî yên pêkenînê lê bi cidiyetê ve tijî, di kovar û rojnameyên herêmê de derdiketin û bi wî awayî Çexov mesrefa xwe ya dibistanê derdixist û pereyên ku ji ber dima jî ji xwe re pê pirtû dikirî. Wî digot, ji bo ku ez bikaribim çîrokên baştır binivîsinim, divê ku ez gelek pirtûk biwxinim.

Çîrokên Dr. Çexov di demeke pirr kurt de li seranseri Rûsyayê deng dan û di wê sistema, bi gotina Lenîn, Feodal Emperyalist de ji teqandina edebiyata Rûsyayê re bû çîrûskek.

Nivîskarêñ hemdemêñ Çexov, an jî yet ji kaloyêñ edebiyata rûsan, Tolstoy, di derheqa Çexov de wîlo digot: "Çexov ji wan hindî-nivîskaran e, ku mirov dixwaze çîrokên wî careke din bixwîne". Gorkî jî hevçaxê xwe Anton Çexov dipesinand, ew weke çîroknîvîskarekî kedkar, kûr û têghişti tanî ziman. Wê ew kûrbûn û têghiştibûna wî bala Andre Gide jî kişandibe, loma ew jî di derheqa Çexov de wîlo dibêje: "Ez li tu çîrokên Çexov yên ne balkêş rast nehatime; hemû çîrokên wî balkêş û yet ji ya din xweştir e. Ji xweşbûn û balkêşiyê jî wêdetir ez heyranê wan im".

Ew çîroknîvîskarê balkêş, ku di kurtedemekê de sînorê Rûsyaya mezin gav kir û bû malê hemû dînyayê, bi nêrîna hin rexnegirîn wê demê, wî car caran çîroknîvîskarê firansiz Guy de Maupassant jî derbas dikir. Tolstoy di derheqa vê yetê de wîlo digot: "Çar nivîskarêñ firansizan hene; Stendahl, Balzac, Flaubert û yet jê jî Guy de Maupassant e. Lê Çexov di ser Guy de Maupassant re ye."

Ji ber ku Tolstoyê mezin di derheqa Çexov de wîlo fikiribû, zêde neajotibû ku jî bo ew Tolstoy fedîkar dermexe, wî cihê xwe yê nemir di nav edebiyata rûsan de çêkîribû. Ew bi qasî nivîskariya xwe doktorekî baş û zîrek bû jî. Wî gelek çîrokên xwe bi şarezabûna operatoran nivîsandine, psîkolojiyek kûr û şerpeziya ronakbîr, burokrat û aristokratîn rûsan yê sedsala xwe bi zimanekî basit, bi tasvîren kurt û xurt û bi awayekî pêkenîni anije ziman. Di gel ku ev sedsalek e di ser çîrokên wî re derbas bûne, dîsan jî çîrokên wî bi qasî misqalekî tiştek ji naverok, ziman û forma xwe winda nekirine. Ew weke şeraba ku her ku kevin dibe, tehma wê ewçend xweştir dibe. çîrokên vî hostayê nemir bi kevinbûna xwe nûdem dîbin û ji bo ruhêñ tî dîbin şeraba jiyanê.



A. ÇEXOV

# YÊN SERXWEŞ

Anton ÇEXOV

Werger: Firat CEWERÎ

Frolvê fabrikator, yê çeleng, esmer, rihgi rover, bi awirên nerm û hevrêşmî, bi avûkatê xwe yê navsal, sermezin, porkurîşk, li hêwana restoranteke li derveyî bajêr rûniştibûn û ji xwe re bi kêf dixwarin û vedixwarin. Ji ber ku herdu ji rast ji baloyê hatibûn restorantê, frak li wan bûn û doraxên spî li dora stûyên wan gerandûbûn. Li hêwanê ji wan û ji garsonên li ber derfî pê ve tu kes tunebû. Bi emrê Frolov wan tu muşteriyênen din bera hundur nedidan.

Wan heryekî bi qedek mezin ya vodkayê dest bi vexwarinê kirin û ji îstirîdye(heywanenke behrê ye)meze çê kirin.

Almer:

- Xweş e, ezîzê min, got. Ev modeya ku ji îstirîdye meze çêkirin min derxist. Vodka qırıka mirov dişewitîne, ziwa dike, lê ku mirov bi dû de îstirîdyekê daqurtîne, mirov di qırıka xwe de hênkahiyeş şêrîn his dike. Ma ne wilô ye?

Garsonekî bê simêl, cêníkspî, sênikek ava firingiya danî ser masa wan.

Frolov:

- Ew ci ye te anî?  
- Mayonez e, ji bo ku hûn bi ser mêsî dakin.

Frolov bê ku li sêniķa ava firingiya binihêre,

- Wilo ha? Ma mirov wilô datine? bi ser garson de qîriya. Ev ci celeb mayonez e? Ma qey tu nizanî xizmetê bikî heywan!

Mîna ku birûsk di çavêن Frolov yên hevrîşmî de pêketin. Wî kujekî rûyê masê li tiliya xwe gerand, bi tevgerek biçûk, wî hemû tiştên li ser masê;şûse, firax, mûmdank gindi randin erdê.

Garsonên ku ji berê de fêrî bûyerênil wilô bûbûn, ber bi masê ve bazdan, mîna operatorên emeliyatê bi cidî, giran giran ew perçecamên lerdê dane hev.

Almer bi ken got:

- Tu ci xweş bi wan re didî û distînî. Lê xwe ji ba masê bide alî an na tu ê pê li xevyarê bikî.

Frolov:

- Bang muhendîz bikin, bi hêrs got.  
Muhendîz bi rastî ji berê muhendîz bû û peyayekî dewlemend i rûtîş bû. Wî hemû ser-weta xwe xerc kiribû, lê ew niha bi vî emrê xwe yê kal ketibû vê restorantê û keçik û garsonê restoranî idare dikirin. Ger pêwîst bibûya wi carina delalîya evinê ji dikir. Muhendîzê ku pişti bangkirina Frolov hat, bi hurmetgiriyeş

mezin serê xwe ber bi jêr ve tewand.

Frolov li wî zîvirî:

- Bala xwe bidiyê ezîzê min, ev çi kepazetiye? Peyayê te ci celeb xizmetê dîkin? Ma tu nizane ku ez ji tiştên wilo aciz im. Xwedê bela xwe bide te, ez carek din nayêm vir!

Muhendîz:

- Ez rice dikim tu ê me efû bikî, Aleksey Semînoç! got. Ez ê niha tevdîrên pêwîst bigirim! Xwestekê te yên herî biçük, wê bi şiklekî herî baş û zû werine cih.

- Baş e, heydê, here... .

Muhendîz heya erdê xwe tewand, berepaş çû, bişkokên milên gomlegê xwe û hungulîska xwe ya elmasê derewîn cara dawî dan bîriqandin û di pişt derî de winda bû.

Masa wan ya meze ji nû ve hatibû raxistin û xemilandin. Almer şeraba sor vedixwar, kuvarkên terr û goşte çûkan dixwar. Paşê seleta masiyan û masiyên di ava şor de birajî xwest. Frolov tenê vodka vedixwar, bi nîn meze çedikir. Wî bê rawestan bi destan çavêن xwe difirkand, bi ûf û kûf rûyê xwe tirş û mirşo dikir. Xuyabû kêfa wî ne li cih bû. Herdu jî bêdeng rûniştibûn. Hêwan jî bêdeng bû. Lampeyêن mezin yên elektirkî pêketî bûn û weke ku ew ji tiştekî qeherşbin fişinî ji wan dihat.

Cengenan li pişt derî bi dengê sivik stiran digotin û digeriyan.

Frolov:

- Ez vedixwim lê ez tu zewqê jê nasûnim, got. Her ku ez vidixwim ez jî xwe diçim, kesen din bi vexwarina vodkayê şen dibin, yê min bervajiya wê ez pê hêrs dibin, fîkrîn kirêt têne min û ez nikarim razêm. Çîma birawo, şahiyek bê vexwarin û bê sefahat tuneye? Ev yeka han kirêtiyê dide mirov!

- Wê çaxê bang cengenan bike!

- Jehr di wan keve!

Pirejinek cenge serê xwe di deriyê korîdore

re dirêjî hundur kir.

- Aleksey semînoç, cengene çayê û konyakê dixwazin, got. Ma bila ew -werine hundur?

Frolov:

- Baş e, got. Gelo tu zane ji bo ku ew ji müsteriyan ziyafetê dixwazin, ew ji xwedîyê restoran tan jî ji sedî tiştekî distin. Di dema me de bawerî bi kesen bexşîşwaz nayê. Hemû mirovên pîs, rûşustî û kirêt in. Wek mînak, ev garsonen ha. Rûyê wan dişibin rûyê profesoran, porê wan spî bûye, mehê dused rubleyan qezenc dikin, li malen xwe rûdinên û keçen xwe di dibistanen Zadegan de didin xwendin, lê heta ku tu bixwaze tu dikarî ji wan re çêran bikî û erza wan bişikini. Gava ku muhendîz deh rublan bide wan ew kûzek xerdel dixwin, weke dîkan dikin. Ger yek ji van li ber xwe û şerefa xwe bikevin, bi Xwedê ez ê hezar rubleyan bidime wan.

Almer bi ecêbmayî li rûyê wî nihêni:

- Baş e, lê ci bûye? got. Ev reşbîniya te ji bo ci?

- Ez ne rehet im. Tiştek ketiye serê min, ew rehetiyê nade min.

Weke ku bizmerek di serê min de hatibe kutan, tu ci bike jî tu hew dikarî wî ji wir bikişinî.

Kaloyekî kinik, girover û qelew kete hundur hêwanê. Çakêtekî pitikpitikî û êlegekî belek lê bû û gîtarek jî di destê wî de bû. Bi gêjikî nihêri û mîna leşkeran silav da.

Frolov:

- Wey parazit! got. Tu bijî, tu bi teqlitkirina berazan bûyî xwedî serwet. Ka were vir!

Fabrikator vodka, şerab, konyak bera qedehêkî dan, paşê xwê û îsot pê dakir, hemû li hev xist û da yê parazit. Wî jî vexwar û bi mîrxasî kuxuya.

Frolov:

- Wer ku ava firaxan vexwariye, dilê wî ji

şeraba heqîqi dixe. Heydê, Parazîto, rûnê û bistirê.

Parazit rûnişt, bi tiliyên xwe yên dagirtû li gitara xwe xist û dest bi stirana xwe kir:

Tayik, mayik Margirêtka...

Gava Frolov şampanya vewxar ew serxwes ket. Wî kulma xwe li masê xist û got:

- Erê, tiştek ketiye serê min, min deqîqeyekê jî rehet nahêle!

- Baş e, lê tiştekî çilo ye!

- Ez nikarim bibêjim. Ev sir e. Ev sireke wilo ye, ku anca gava ez duan dikim ez dikarim bibêjim. Lê ger tu bixwzî bi dostanî, bi şerdê ku di navbera me de bimîne. . . Lê nebe, nebe tu ji kesî re nebêje. . . Tu nebêje ha. . . Ger ez ji te re bibêjim, dibe ku dilê min fireh bibe, lê tu. . . Ji bo Xwedê li min guhdarî bike, lê paşê ji ji bîr bike. . .

Frolov devê xwe ber bi guhê Almer ve dirêj kir, pişti ku bi qasî nîvdeqîqeyekê di guhê wî de kir pistinî:

- Ez ji jina xwe nefret dikim.

Avükat bi şaşmayî li wî nihêri.

Frolov hêrs bû:

- Erê, erê, ez ji jina xwe Marya Mihaylov-nayê nefret dikim, di ber xwe de got. Ez nefret dikim, te fêhm kir?

- Ji bo çî?

- Ez ji nizanim bê ji bo çî ye! Lê ez bi hezkirin zewicîm, niha jî ew weke dijmînekê ye; a ji vî, bibûre, ez ji vî parazitî çiqası nefret dikim, ez ji jina xwe jî ewqası nefret dikim. Lê li navê jî tu sedem tune ye! Gava ew li ba min rûdine, bi min re xwarinê dixwe, an jî gava ew bi min re dipeyive, hêrsbûnek wilo ruhê min digire, ku ji bo ez gotinêne xweş ji wê re nekim, ez bi zorê xwe digirim. Tiştekî ku ez nikarim ji te re behs bikim di hundurê min de çedibe. Veqetandina ji wê an jî ji wê re rastigotin bê imkan e, ji ber ku wê rezalefi derkeve. Lê jiyana bi wê re jî ji min re ji dojehê xerabtir e. Ez nikarim li malê rûnêm! Ev e, ji ber wê yekê ye, ez bi rojan bi karê xwe re mijûl dibim, ez xwarina xwe li restoran tan dixwim û

êvaran jî ez wextê xwe li cihêne keti dikujim. Gelo tu di derheqa vê hisa nefretê de ci dibêjî? Ew ne jineke hayela ye jî; ew xweşik e, biaqil e, bêdeng e...

Yê parazit lingê xwe li erdê dixist û stirana xwe dewam dikir:

*Ez bi sâbayan re geriyam*

*Min maçî kir, min bêhn kir...*

Pişti ku Almer hebekî bêdeng ma:

- Ez îtîraf dikim, ez her fikirime, ku Marya Mihaylovna ne li gorî te ye, got û axînek kişand.

- Yanî tu dixwazî bêje, ku ew xwende ye? Li min binêr. . . Min jî dibistana taciriyê bi madalyaya zér xelas kiriye, ez sê- çar caran çûme Parîsê. Erê ez ji te ne biaqiltir im, lê ez ji jina xwe jî ne ehmeqtir im. Na, keko, mesela bingehin ne di xwendinê de ye! Ez ê ji te re behsa vê nexweşiyê bikim, ca tu guhdarî bike. Binêr bê çawa dest pê kir: Rojekê ez ji nişkê ve fikirîm, ku jina min ne ji ber hezkirina min, lê ew ji bo perên min bi min re zewicî ye. Ew fikra ha di serê min de cih girt. Ez ci bikim, ci nekim, bê fêde ye, ew fikra ha ji serê min der-nakeve! Tam di wan deman de hirsek hatibû jina min. Bi dû belengaziyê re ew ketibû kûpê zér, wê pere vir de û wir de dirijand. Wê mehê li dor bîst hezaran xerc dikir. Heçê ez im, ez ji roja ku çê bûme, ez bi şik im. Ez baweriya xwe bi tu kesî naynim, ez ji her kesî bi şik im. Tu çiqas diltenikahiyê nişanî me bîdi, ez ê ewqası ezab bikişinim. Ez wilo texmîn dikim ku her kes ji bo perên min xwe bi min şelafî dîkin. Ez baweriye bi tu kesî naynim! Ez ne miroveki şen im, keko, ne miroveki şen!

Frolov qedeha şerabê di qurtékê de vewxar û peyva xwe dom kir:

- Lê ev hemû vala ne. Ji te re behskirina min ne di cih de bû. Min ehmeqî kir ku min ji te re got. Min ev bi serxwesi jî devê xwe revandin. Tu jî niha bi çevê avükatiyê li min dinihêri. Ji ber ku tu niha hînî sîrrêne min bûyî tu xwe dilşa hîs diki. De, dev jê berde. . . Em

vê mijarê bigirin. Em vexwarina xwe bidominin!

Wî bang garson kir,

- Li min binêre, got. Ma Mustefa li vir e?

Bang wî bike bila were vir!

Piştî kurtedemekê zarekekî temenê wî li dor donzdeh salan, bi frak û bi lepikên spî kete hundur.

Frolov,

- Were vir! got. Ji me re behsa wê rastiyê bike. Demekê we Tataran li me zulm dikirin, we ji me xûkî dixwarin, lê niha jî hûn ji rûsan re xizmetê dikan û hûn jiyanâ xwe bi firotina xewliyên serşokan ve derbas dikan. Mirov ê çawa vê rastiyê rohnî bike?

Mustefa birûyên xwe hildan jor û bi dengekî nizim bersiv da:

- Feleka xapînok!

Almer li rûyê lêwik yê cidî mîze kir û bi pîrqûn keniya.

Frolov,

- Heydê, rubleyekê bidin wî! got. Ev bi feleka xapînok diji. Wî bi tenê ji bo van herdu gotinên wî li vir dihêlin. Vexwe Mustefa! Tu ê di pêş de bibî kereteyekî mezin! Yanî parazîten ku li ba dewlemendan dijîn ewqas pirr bûne, ku ecêb in. Hûn pêxwas û dîbirrên bê kér û demançê ewqas pirr bûne, eferim ji wî re, yê ku xwe ji nav lepên we xelas bike. Ma em bang mitirban ji bikin? Hi? Mitirban ji bînin vir!

Cengenênu ku ji mêt ve di koridore de aciz bûbûn, bi deng ber bi hêwanê ve baz dan, şahiyek wehşî dest pê kir.

Frolov ji wan re,

- Vexwin! bi qêrîn got. Vexwin, vexwin dolên Firewn! Bistirên! He- yt!

Rojek zivistanê bû. . . He- e- yt. . . palik difiriyan. . .

Mitirban stiran digotin, difîkandin, direqisîn. Frolov ji wek pîrt dewlemendên delali, "dîfîreh"ku carinan ji kêfan dînîtiyan dikan, wî ji dest bi dînîtiya kir. Emir da garsonan da nân û şampanya bidin mitirban. Abajûra fenerekê şikand. Şûse avetiñ neynik û tabloyêni li dîwêr Xuya bû ku wî tu zewq ji wan kîrinêni xwe nedîstand. Ji ber ku wî her rûyê xwe tirş dikir û bi ser wan de diqîriya. Di çavêni wî de xuya bû ku wî nefret ji hereketen xwe dikir. Bi muhendiz

stiran dida gotin; şerab, vodka û tevliheviyek ji zeytê bi denbêj û sazbandan dida vexwarin. . .

Saet şesê sibehê hesab anîn.

Almer,

- 925 ruble û 40 kapik! got û milêni xwe hejandin. Ji bo çi? Na, na, raweste, ez kontrol bikim!

Frolov cûzdanê xwe derxist,

- Dev jê berde, di ber xwe de got. Bila ew min bişêlinin. . . Ger ew min neşêlinin ma ew ê kê bişêlinin. . . Ger parazît tunebin. . . çê nabe. . . Ev e, tu avûkatê min i. . . Tu salê şes hezar ruble distîni. . . Ji bo çi? Lî bibûre, ez niha bi xwe jî nizanim bê ez ci dibêjim.

Gava ew bi Almer re ber bi malê ve diçûn, Frolov di ber xwe de dipeyivî:

- Niha ji bo min çûyina mal ji çûyina dojehê zehmettir e! Erê. . . Kesekî ku ez ruhê xwe jê re vekim tuneye. . . Hemû diz in. . . Hemû xayin in. . . Gelo çîma min sîrrîn xwe ji te re vekirin? Ji b. . . çi? Bêje, ji bo çi?

Gava ew gîhiştin ber deriyê malê, weke ku Moskovayî li her derê û bi her kesî re dikan, wî jî devê xwe dirêjî Almer kir, di cihê xwe de hejiya û lêvîn wî maçı kir.

- Bi xatirê te. . . Ez ne mirovekî qenc û şen im, got. Ev jiyanek kirêt, ne pak û şermîn e! Tu peyayekî xwendê û biaqil i. Di gel vê hindê ji tu tenê dibişirî û bi min re vedixwi. Wekî din tu tiştekî nakî. Di kesî ji me de xêr tuneye. . . Ger tu mirovekî bi namûs û dostekî bi rasû bûya, te ê ji min re bigota: "Tu benderuhêkî pîs, mekroh i kirêt!"

Almer:

- De, de. . . Here ji xwe re razê, di ber xwe de got.

- Xêr di te de tune ye. Tenê hêviyek min heye, ew jî gava ez havînê herim havîngehê, ji wir jî ez derkevîm çolê, bahozebk rabe, ewr bikin şîrqînî, birûskek vede û ruhê min bistîne, hingî ez ê ji xwe re xelas bibim. Bi xatirê te. . .

Frolov û Almer dîsan hevdu maçı kirin; ew li ser lingan bi xew re diçû, di ber xwe de tiştin digot û bi alîkariya herdu xulamên xwe ew bi mîrdewanê ve bi jor ket.

# EZ GIRTÎ ME

---

Bares BATÊ

Ez girtî me  
Bi pêtêñ agirê sor.  
Li der û dora min in  
Gulleyên leşkerê dijmin.  
Ez girtî me,  
Di revê de li dûr  
Bi kêr û gûzanan birî  
Ji ezman dibare jehr  
Dojeh ketiye nava min.  
Ez girtî me,  
Di cegerê tirsê de  
Di nava rojê de  
Li bendî behiştê mirî  
Ez girtî me,  
Bi sînorêñ hesinî  
Bê xwarin,rût û tazî  
Dîl im di dendika nezaniyê de.  
Girtiyê evîna yarê,  
Bi baskêñ şikesî di avê de  
Kerr û kor im di girtîxana azadiyê de.

# KURDEKİ BI RÛMET; YILMAZ GÜNEY

Dr. POLOÇO

**H**uner xemla welitekî ye. Welatekî bê huner, gelekî bê hunermend wek darek bêber e, rût e, bêkêr e. Miletékê bê nivîs, bê edebiyat, ew miletékî hov e, nezan e, ji medeniyetê bêpar e. Huner û edebiyat, xwendin û nivîsandin; terbiye, edeb û rabûn û rûniştandina miletékî têküzti्र dike, wî hemdem dike, wî medenî dike. Îcar gava ku mileték bindestê miletekî din be, pirê caran hunermend û nivîskarêñ wî miletê bindest, mecbûr dimînîn ku bi zimanê miletê serdest tevdigerin, hunera xwe bi zimanê welatê serdest dikin û di xizmeta welatê serdest de pêşkêş dikin. Ev celeb nivîskar û hunermend pişti demekê bi dû navêñ xwe û jiyana luks dikevin, rûmeta xwe li bal gelê xwe kêm dikin û ji bo ku têkevin çavêñ serdestan tişte ku ji wan tê ew dikin. Hin nivîskar û hunermend jî hene, ku navdariyê, pere, jiyana luks datînin aliyekî, ew rûmet û şerefa xwe dixine pêş. Ew bi gelê xwe re ne, derd û kulên gelê xwe bi xwe re parve dikin. Ew stemkarî û zulmdariya li ser gelê xwe qebûl

nakin, loma jî ew pênuş û hunera xwe ji bo çareserkirina problemên gelê xwe, ji bo ji bindestiyê rizgarkirina gelê xwe û ji bo xweşkirina jiyana hevwelatiyêñ xwe bikartûnîn.

Yılmaz Güney, yek ji wan hunermendan bû, ku êdi pişti demekê xwe nas kir, rastiya welatê xwe û neheqiya civatê dît, bi hunera xwe xwest ku jiyana gelê xwe û neheqiya civatê tasvir bike û wê yeka han weke çekekê li dijî dijmin bi kar bîne. Lê herçiqas ji bo armancêni siyasi carinan hêlêñ wî yên hunermendî sist dibûn jî, dîsa ew baştirîn listikvanê sînemaya Tirkîyê bû û ew herweha baştirîn senaryonivîs û filmçêkerê Tirkîyê bû. Jê wêdetir jî wî deriyê sînemaya Tirkîyê ji cihanê re vekir, ew Tirkiya ku ji bo gihîştina pîvana Ewrûpiyan bi kêmanî pêncî salan li paş bû, Yılmaz Güney bi vekirina deriyê sînemaya wan ve ew ber bi Ewrûpayê ve kişand. Lê di eyñî demê de wî rastiya civata Tirkîyê, ya li ser neheqiye ava bûbû raxiste ber çavêñ temaşevanêñ Ewrûpiyan. Yılmaz



Y. Güney

digot: "Burjûvaziyên tirk ji min gazarinan dikan, dibêjin: Tu hêlên civata me yên ne baş nîşanî Ewrûpiyan didî, fermo hêlên wê yên baş ji nîşanî wan bide. Yên me ji bajaren me yên xweş hene, avahiyê bilind hene, hotelên luks hene. . . "

Lê wî ji nîşandana jiyana kulumk mirov wêdetir, jiyana zirecêbek gel ji xwe re kiribû mijar. Vê yeka han ew hêdî hêdî ber bi rastiya welatê wî ve kişand. Wî êdî dest bi çekirina filmêni li ser kurdan kir.

Di şikandina tubuya pirsa kurdan li Tirkiyê rola yilmaz Güney ji çê bû. Wî bi filmêni temayen kurdî, kir ku gelek xorîn kurdan bi kurdibûna xwe serbilind bibin û herweha wî tesirek li ronakbîrên Tirkiyê ji kir, ku ew careke din li ser pirsa kurdî bifikirin û wê perdeya bêrûmetiyê ji ser rûyê xwe bavêjin.

Yilmaz Güney ne bi tenê di warê sînema de, ew herweha di warê nivîsandinê de ji navekî bi rûmet bû. Çirok û romanên ku Yilmaz Güney nivîsandine, di dema xwe de rexnegiran ew gelekî pesinandise û ew beramberî roman-nivîsê navdar Yaşar Kemal kirine. Herweha Yaşar Kemal ji pesnê romana wî ya bi navê "Bi Stûxwarî Mirin" ya ku bi wê di sala 1972'an de xelata romanê ya Orhan kemal girtibû, dida û wî yek ji nivîkarên Tirkiyê yê mezin dihesiband.


Yilmaz Güney di çirok û romanên xwe de

jî, mîna filmêni xwe, mijara wî her gundi û qâbindest bû. Ji ber vê yekê serdesten Tirkiyê be xwe ji vî hunermendê kurd yê pirralî venediki li riyekê digeriyan da wî winda bikin û bi wir dakirina wî re ji ew agirê ku gurr dib vemirînin. Loma ji wan çend caran ew girtin xistin zîndanan. Girtina wî ya dawî ji t kuştina hakimeki ve girê dan, ew hunermenc têgihiştî û bi ber bi salan di girtigehan cîşîşandin. Lê Yilmazê narkomanê xebatê, girtigehê de ji seri netewand, wî girtigeh ji xw re mîna dibistanekê bikaranî. Wî di girtigehê dîtera xwe guhdarî kir, dîtera xwe fikirî, dîtera xw nivîsand. . . Pasê wî bingehêni filmêni xwe yê nemir, mîna; Endîşe, Sürü û Yol avetin. Ew bi wan filmêni xwe hem nêzîkî pirsa kurdî bû, hen ji di dîroka sînemavaniyê de bû xwedîyê navek nemir. Hema pişti filmê xwe yê bi navê Yo ku bi wê xelata sînema ya mezin Canne girtibû, bi kurtemekê ew bi destûr ji girtigehê derket, wî berê xwe da Ewrûpa û ew êdî hew ve geriya. . .

Li Ewrûpayê Yilmaz Güney hê bêtir nêziktirî pirsa netewaya xwe ya kurd bû, soza çekirina filmêni bi kurdî da, xwe hêdî hêdî hîn zimanê kurdî dikir û bû yek ji hîmdarêni Enstituya Kurdi ya Parisê.

Vî camêre kurd yê zana, têgihiştî, huner mend û têkoşer, bi koçkirina xwe şûneke mezin vala hişt. Em wî di heyşt saliya wefata wî de b hurmetgirî bi bîr tînin.

# MÊVANÊ BÊWEXT



T. REŞİD

## Tosinê REŞİD

**L**i derive vizîna bê bû. Ji şeva vê demsalê re "Orta saç, Xidirnebî, kî ne li mala xwe bî, qesasê serê xwe bî" hatiye gotin.

Berî ku derî û pacan dadin, Şemo carekê ji derket derive, wekî teseliya deriyê gomê bike.

Sayıyek tas bû. Bayê sar yê ku berî êvarê kiribû fizildûman, niha nema bû. Ji surê rûyê berfê qerimî bû, niha bayê nerm tenê dikarîbû hinek berfa mîna tozê rake jor.

Pacêni bi ronahî kêm mabûn. Gund bi xew re diçû.

Şemo vegeriya mal, derî bi hêç girt, dada, paşê potekî kevin wisa danî, ji bo ku ji qeliştekan sura bê neyê hundur, paşê ew çû ber sobê û li quncikeke nizim rûnişti.

Xewa wî nedihat. Qutiya xwe ya titûnê derxist, cigarek pêça, vêxist û demek dirêj wisa rûnişti ma.

Şemo ji vê yekê têr nedibû. Wî hê bawer nedikir, ku ew çiqasî bixwaze dikare li kêleka soba germ rûnî, kengî bixwaze razê, kengî bixwaze rabe. Wî bawer nedikir, ku kengî ew bixwaze ew dikare nên bixwe û êdî ew nedifikirî,

ku heta carek din nêñ bidinê ew ê lê xin an na.

Ev êdî şes mehêñ wî bûn ku ew vege riyanabû malê, lê dîsa jî ew ji vê azadiyê têr nedibû, ji vê azadiyê bawer nedikir. Ji wî webû ku ev giş xewnerojk û derew e û wê dîsa rojekê werin wî bibin.

Şemo sala 1937 an girtin. Lêdan, girtixa na çêlyabînskê û paşê jî salêñ dirêj nefiya Sîbirayê.

Havîna sala 1953 an ew vege randin Ermenîstanê, lê nehiştin ew here mal. Ew sê rojan li Rewanê xwedi kirin, paşê carek din derxistin mehkemê. Elo vê carê jî hat li rûyê wî sekinî û berê wî carek din jî dane Sîbirayê.

Li welêt êdî guhertinêñ qenc dibûn, girtiyêñ siyasi dihatin berdan, Şemo jî jî van guhertinan destkewtî bû û ew jî hate berdan.

Ew hingî du salan ma. Ji bo wî ew herdu salêñ pêşî ji şanzdeh salêñ berê zehmettir dihat. Her roj Elo di bîra wî de bû. Her êvar gava ku ew dikete nava nivîna, wî ji xwe re pilanek çedikir, ku bê ew ê pişû derketinê çawa tola xwe ji Elo hiline.

Helbet wî hingî bawer nedikir, ku ew ê dîsa vegere malê.

Lê hema roja ku ew gihîste nava neferê xwe, roja çavên wî bi hersê kurên wî, bi komî-kulfetê wî ket, ew poşman bû. "Çi bûye, êdî çûye, ew ê ji bo çi rabe ji kurê xwe re dijminan çê bike, destê qebîlê têke hev. Bila ew teslimî Xwedê be" wî di bîra xwe de digot.

Kurê wî yê mezin çiqas pê daket, çiqas xwest pê bihese bê ka kê ew nemamî kiriye, tu çare nebû, tu gili ji devê bavê wî derneket.

Vê carê ji hukûmetê nehişt Şemo di gundê xwe de biji. Lawêن wî li gundeki ermeniyan jê re xaniyek kirin, çend pez û çelekek danê û hêdî hêdî Şemo ji rewşa girtiyan derbasi rewşa gun-diyan bû. Wî êdî dixwest wan hijdeh salêن girtin û nefiyê ji serê xwe derxe, wan ji bîr bike, lê nedibû. Wan salan hê para jiyana wî ya sereke dişan, bîra wî gişt zevt kiribûn û nedixwestin vekşiyana.

Niha jî ew li ber soba germ rûniştibû û bi mitalan vege riyabû wan salan. Di hucrê de sêzdeh girtî bûn. Cih ewqas teng bû, ku cihê paldanê tê de tunebû. Girtiyan ku nuh dihatin, hema di cihêن xwe de pişta xwe pal didan dîwêr û bi xew re diçûn.

Derengê êvarê bû. Çend girtiyan li ber ro-nahiya lempê bi kaxizan dileyistin, girtiyan din jî li listika wan temaşê dikirin. Ji nişkê ve bû şîrqîna derî û mîrikek dehfdane hundur. Ew mîrik hulkumî û di hundurê zîndanê de dirêj bû. Girtiyan dev ji listika xwe berdan û li dorê kom bûn. Paşê ew li ser pişte dane paldan û potek ji xistin bin serê wî.

Şemo Elo nas kir. Wî hema bi lez destmal-ka da bêrika xwe de şil kir, anî û pê xwîna ser çavê Elo paqij kir. Elo çavêن xwe vekirin, li Şemo nihêri û hêdîka got:

- Şemo tu jî li vir ? Xwedê qebûl neke, wî disa çavêن xwe girtin û bi ser de zêde kir, hinek av ji min re bîne xwarzê.

Şemo rabû çû jê re avê bîne. Sargisê ku temenê wî li dora şest salan bû û hê ji Qersê

malbata Şemo nas dikir, li quncika nezaretxanê, bi milê Şemo girt û hêdî jê re got:

- Hevza xwe ji wî bike.

- Na, ci re, - Şemo metal ma, - ew kurxalê bavê min e, em merivêñ hev in.

- Tu gura min bike, ew ji bo başiyê neanîne vir. Ji bo xal û xwarzîtiyê ji, ewqas ji nefikire, niha bîra aminiya xwe bi birê nayne.

Sargis peyakî zane û xwende bû. Şemo zanibû ku ew tişîen xêlif nabêje, lê disa jî ew dudîlî bû, wî bawer nedikir ku wê Elo giliyê wî bike.

Elo nêzikî du saetan wisa paldayı ma. Hema wisa nale- nala wî bû. Paşê çavên xwe vekirin û ji Şemo re got:

- Çika ji kerema xwe re pişta min bispêre dîwêr. Şemo bi herdu destan bi milê wî girtin û ew kişande ber dîwêr.

- Ma tu ne birçî yî? hinek nan li bal min heye, Şemo jê pirsî

- Dilê min naçiyê, nav dilê min gişt diêşin, Elo berê xwe ji Şemo guhest û bi kelogirî got. Axir min ci kiriye, ku ew rojê carekê min wilo dihincirinîn.

Paşê wî xwe wisa qinciland, mîna ku mirov qolinci bibe.

- Cigarê te hene? Elo jê pirsî.

- Erê, hinek titûna min heye, Şemo bi şabûn got.

Te digot qey ew li bendî wê yekê bû ku ew tenê xizmeta Elo bike. Wî qutiya xwe vekir, bi xwe cigarek pêça, vêxist û da Elo. Elo gulpek du gulp lê da, dû di dev û firnikên xwe re berda û hêdîka di ber xwe re got:

- Ji xorfen me kes li vir heye?

- Na.

- Lî kesî din ku bi kurmancî zanibin heye?

- Na, kesekî ku bi kurmancî bizanibin li vir tuneye, got. Şemo bi xwe jî texmîn nekir bê ji bo çi wî rast negot. Sargis bi kurmancî zanî bû.

Elo demeke dirêj çavêن xwe girtibûn û

cigara xwe dikişand.

Gotina Sargis kete bîra Şemo û fikiri: "Bi rastî ji ev ne xalî ye".

Elo carekê ji kire nale nal, paşê bi hêdika got:

- Ev çi welat e, ev çi dewlet e, malhebûna me ji me standin, xulamê me yê do ne pêr, yê ku bi nanê mala me mezin bûbû, anîne danîne ser serê me û di ser de ji dibêjin, hûn cîma gazi-nan dîkin. Lî ma ev heqê Xwedê ye.

Şemo lêva xwe gez kir û xwest qaşo dilê wî xwes bike:

- Tişt nabe, çawa be wê rastiyê derkeve, ew xwe bê súc navêjine kelê.

- Çawa tişt nabe, pêşîyan ji berê de gotine: "Mirav di mala xwe de çêri Padîşê ji dike", îcar çi bû, dilê yekî teng bû, li cihekî tiştek got. - Wi hebekî bêhna xwe stend, qula-peke kûr li cigarê xist û dîsa got. - Em xal û xwarzê ne, ez tu tiştî ji te venâşerim. De tu zanî, ew mala rengîn, bi xulam û xizmetkar, de me anîne kirine hevalên gavanê gundan, hê ji dibêjin gazinên xwe ji nekin. Me ne qaçaxçisti kiriye, ne li dijî hukûmetê serî hilda ye, qet ni-zanim ew çi ji me dixwazin.

- Bîna xwe fireh bike kurxal, Xwedê yek e, dergeh hezar in, wê dergehekî xêrê ji bo me ji vebe. - Şemo dixwest wan giliyan bigire, lê Elo hêsa nedibû.

- Hela ji me re dibêjin we zor daye xelkê, we keda xulama xwariye, Xwedê qebûl neke, xulam bi nanê mala me mezin dibûn, îcar me keda xulaman xwariye. Xwedê hevîne çi şer avêtine te. - Elo vegeriya ser Şemo û zûr bû li çavêن wî nihêri. Di çavêن Elo de zêrandin tunebû û giloka hêrsê ji nav dilê Şemo hilkişîya û gewriya wî xitimand. Lî wî nedix-west ku Elo hêrsa wî texmîn bike. Bê guman gotina Sargis rast bû, gerekê hevza xwe jê bike.

- Ez çi zanim, dibêjin qaşo min gotiye, ku ev hukûmeta gelekî neheqiyê dike, gerek bê wergerandin. - Şemo xwest hemdê xwe bêje.

- Îcar çi bû ye, bi rastî ji neheqî li mala we hatiye kirin, dibe te bi hêrs tiştek gotibe ji, - Elo hemdê xwe got.

- Na, min tu cara tiştekî wisa negotîye.

Tiştên wisa tu cara di fikra min re derbas nebûne ji. - Şemo çiqas xwest hêrsa xwe veşere, lê ew yek ji wî re li hev nehat. Elo ew hêrs texmîn kir û sohbata wan êdî hevdu négirt.

Heta berbangê xew nekete çavêن Şemo. Xwestine xayin tebaşî nedidayê. Hema li vir lêxe, Elo bikuje. A, ê weha dîbin sebebê girtina mirovê am û tam.

Di berbangê de hatin Elo birin.

Şemo carekê ji Elo di roja mehkemê de dît. Wî got, ku wî bi xwe bihistîye ku Şemo gotiye divê ev hukûmet bê wergerandin.

Dengê kûçikê Şemo ew ji nav wan mitalan derxist. Rabû, potê xwe yê ku bi stûnê ve bi dardekirî avêt ser milê xwe, kumê xwe yê bi guhik, ku ji Sibîryayê anîbû kire serê xwe û derket der. Hişkîke zor bû. Reşek li ber deriyê hewşê sekinîbû û ji tirsa kûçik cesaret nedikir ku bi pêş de bê. Kûçik ji tu nema bû qetê xwe biqetîne, hema wisa xwe davête wî reşî.

- Hoşt, hoşt, - Şemo bi ser kûçik de hêrs bû. Kûçik vekişîya tolana xwe, dêla xwe kire nav lingên xwe, lê dîsa hêsa nedibû, gire- mîra wî bû.

- Évara te bi xêr, - reş bi zimanê ermenî silav da Şemo, xwest pêş de bê, lê kûçik dîsa ewtiyyât.

- Ser çava, - Şemo bersiva wî da, - pêş de were, metirse.

- Bira, ma li vî gundi malên kurmancan hene?

- Ez bi xwe kurmanc im, tu çi dixwazî, - vê carê Şemo bi xwe pêş de çû.

Wan hevdu nas kirin. Şemo zûr bûbû li çavêن Elo dinihêri. Elo serê xwe kiribû ber xwe. Pişti demek kurt wî serê xwe bilind kir û tehevzbûyi got:

- Şemo, min bihistibû tu hatiyî, lê min nizanîbû tu li vî gundi dimîni.

- De va êdî tu dizanî, ew ji baş e, - Şemo bi xwe ji nizanîbû bê ji bi çi wisa got.

Demeke ne dirêj herdu wisa peşmorde li ber hev rawestiyabûn. Elo dîsa serê xwe kiribû ber

xwe. Şemo bi xwe sar û ecêbmayî mabû, ku tu his di nava wî de hişyar nebû. Wî bi teherêkî sivik, bi hemdê xwe li Elo dînihêri.

- Ez herim, erê, - Elo xwest bilive.

- Were were, ji qewlê te ve em xal û xwarzê ne. Tu ê vê nîvê şevê, vê seqemê bi ku de herî.

- Na, ez ê peyî ewqasi re çawa bême mala te, çawa li çavê neferê te binihêrim.

- Tu xema nefera neke, ew bi tiştekî nizanîn, paşê jî kes ji neferan li vir tune ne, ez û kevaniya xwe tenê ne.

- Bi rastî te ji kesî re tiştek negotiye?

- Xwedê zane bes nîne, - Şemo texmîn kir hêrs dibe, lema jî xwest terka wan giliyan bike. - de em herin malê, em ci li ber vî bayê sar sekinîne, em ê serma bigirin.

Elo ji ci nelebi.

- Were, were, me hê bextê xwe winda nekiye, em di mala xwe de ji kesekî re tişteki nabêjin. - Şemo bi xwe ber bi mal çû.-

Elo beyî dilê xwe da pey wî.

Sobe hê dişuxulî: Elo germiyeke xweş his kir. Wilo xuya bû ku wî gelekî serma girtibû, simêlê wî bûz girtibûn. Lema jî ew bi carekê ve ber bi sobê çû û destê xwe li dora lûla wê girtin.

Şemo potê xwe derxist, bi dar de kir û vegeriya ser Elo:

- Mal germ e, potê xwe ji xwe bike.

- Xwedê şen bike, bi rastî jî xweş e. - Elo got û potê xwe ji xwe kir. Şemo potê wî ji destê wî girt û bi ser ê xwe ve bi dar de kir.

Kevaniyê şîv danî. Derdanek tiji toraq, hinek rûn, tûsîk tije tîrşîn û şûşak şeraba malê. . . Lê şûse nêvî bû. Kevaniyê du qedehêن carparso yê mezîn jî danîne kêleka şûşê.

Gava ku wê her tiş li ser text danî, Şemo ji wê re got:

- Tu here razê, - wî nedixwest ku jina wî gili û gotinên wan bibihîze.

Di pey şîvê re ew demekê bê deng bûn. Elo cigare dikişand û zûr bûbû li soba sinciri dînihêri. Gava wî cigara xwe kîşand, bi maşê dergîlkê sobê hilda, boçika cigarê avête hundur

û disa dergîlk girt.

Şemo tizbî dikişand. Gava dit ku Elo cigara xwe temam kiriye, gotiyê:

- Édi nîvê şevê ye, rabe ji xwe re razê.

Elo serê xwe bilind nekir. Wî hê jî li sobê dînihêri. Paşê hêdîka zîvirî ser Şemo:

- Kesek nikare derdê min fêhm bike, kesek,

- û zûr bû bi çavên şêli li Şemo nihêri. Şemo xwe zebt nekir:

- Xwedê hevîne derdê te çiye, ku em nikarin fêhm bikin?

- E, Elo, ji te weye, ku te hijdeh sal girtin û nefî dit, lê ji wê xerabtir tune ye, erê;

- Nizanim, lê tişte ku min dit bila neyê serê gûrên çiyan, ew jî gune ne.

- Tu ê bawer nekî lê disa jî ez xweziya xwe bi te tînim. Tu bi sitqê qenc, bi eniya vekirî ji xwe re dijî.

- Lê ew hijdeh sal, ew neferê hûr, tî û birçî, bê star hiştî. Na, bila neyê serê bavkuştîyê min.

- Wan hijdeh salan min xwezla xwe ji te tanî. Roj hebûn ku min gazi Xwedê dikir da ruhê min bistîne. Min dixwest ku yek bera min de min bikuje. Lê bextê min lê neda, Xwedê ji bo min heta di pirsa mirinê de jî timayî kir.

Şemo nedixwast ku van gotinên Elo bibihîze, lê bi xwe nizanibû ci bike. Lema jî xwe bi tizbiya xwe mijûl dikir.

Elo ji ser text pakêta cigarê hilda, cigarek derxist, vêxist, çend qulapên kûr lêdan û disa vegeriya ser Şemo:

- Tu zanî gunehê çiqas jin û zarokan ketiye stûyê min.

Şemo hêdîka serê xwe bilind kir û bi ten got:

- Lê hingê ew guneh qet nedikete bîra te.

- Her şev û roj di bîra min de bû. - Elo serê xwe bilind kir û li Şemo nihêri. Şemo di çavên wî de hêşir dîtin û berê xwe jê guhast. Hijdeh salên girtinê rûmeta taba mîran li bal wî bilind kiribûn.

- Rojekê Gozelyan gazî min kir. - Elo pişti bêdengîke dirêj disa dest pê kir. - Nizanim te ew

dît an na. Mûyekî ezraîl pê re hebû, gava li mirov dinihêri, sawa mirinê dikete dilê mirov. Gazî min kiribû, ez çûme Rewanê. E, ez karibûm neçûma. Ez ketim hundur û li ber deri dest tevwerkirî mam. Wî dinivisi. Paşê serê xwe bilind kir, kursiyek nîşanî min da got: "Derbas be, rûnê". Kumê min di desten min de ez rûniştüm. Wî êmê cigarekê dîsa dinivisi. Paşê rabû, hebekî di hundur de çû û hat û hat di ser serê min re sekînî.

- Minbihîstiye tu dawa begîtiyê dikî, erê?

- Begîtiya ci hevalê Gozelyan, - ez zarî bûm, - ez jî mîna teva li kewşenê kolxoze dixe-bitim.

- Na, çawa jî bibe hûn terka begîtiyê nakin, qeziya dewleta Sovyetê jî we heye, got û zûr bû li çavên min nihêri.

Ez ji zar û ziman ketim, di fikra min re derbas bû, ku ew ê niha werin min bibin û êdî ez hew vedigerim mal. Gozelyan halê min texmîn kir û ji kirina xwe razî hebekî bi beşer got:

- Tu hê dikari xwe efû bikî, ya te em ê niha bîhelin. - Hinekî fikirî û dîsa got, - lê li gundê we kî ji vê hukûmetê ne razî ye, ki xeyba dewleta Sovyetê dike, tu bi xwe pê dizanî.

- Kesê wisa tune ne, hevalê Gozelyan, - hebekî ruh bi min ve hat.

- A, tu dibînî, lê ez dibêjim tu dawa begîtiyê dikî, tu dibêjî, na. Çawa begê êlê, tu dijminê dewletê jî ji me vedigêri. - Wî cigara xwe vêxist, çû ber pacê sekînî û derve nihêri. - Haya me jê heye, lê em dixwazin bizanibin çıka tu ji vê dewletê re çiqas amin î.

- Hevalê Gozelyan, Xwedê şahid e, bi rastî ez nizanim.

- Bi navê Xwedê şêxê te te dixapîne, lê tu nikarı min bixapînî, - wî hebekî bi hêrs got, paşê bi dengê nerm bi ser ve zêde kir; - Xem nake, vê carê here mal, here û baş dêna xwe bide çûyin û hatina gundiyan, guhê xwe bide ser gili û gotinên wan. Pişti hefteyekê dîsa vê saetê ez li bendî te me, ez êdî kesekî naşinim pey te.

Min bi xwe texmîn nekir ez çawa ji bal wî

derketim, ez çawa gihiştîm mal. Roja din sibehê min ji neferan re got, ku ba ketiye lingê min, ez ji nav nîvînan derneketim. Ez bi şev û roj difikirim, axir ez ê ji Gozelyan re ci bibêjim, ez ê şera biavêjime kêt?

Roja sisiyan ez çûme nava gund.

Payîza dereng bû. Gundîyan eknê xwe, debir, dulika xwe berev kiribûn, qûtê zivistanê dabûne ser hev û êdî betal bûn. Mêrén gund her roj di nava gund de berev dibûn û mijûliya xwe dikirin.

Ez çûme nava wan. De merivên betal ji hezar tiştî qise dikin. Gilî hate ser revê, ser xelayê. Emerê Keso, ku tizbî di dest de bû û hebekî dûr rûniştibû, got:

- Kî ci dixwaze bila bêje, dewleta Emerîka zêde ye, dewleta Emerîka alî me nekira, neferek ji me nedifilitî.

- De ya baş bû, destê Romê negîhişte me, - Hesenê Avas ber gotina wî ve hat.

Lê min êdî gotina kesî nedibîhistin. "Axir vî kurê kerê ci got. çawa Emerîka, dijminê dewleta Sovyetê wê baş be. Ev yeka han ne tiştê gotinê bû. Helbet wî ji bêhişîya xwe got, lê dîsa ji."

Bi şev gotina Emer ji bîra min neçû. "E, baş e, - ez difikirim, - Emer merivekî dilê xweyi sax e, hema wisa evsentuya xwe got, lê ji yên li wir sibe yek giliyê wî bigihîne Gozelyan, Gozelyanê nebêje, tu li wir bûyî, te çire nehat negot. Hingî ez êdî ji desten wî naflitîm. Çawa tê xuyayı ku merivên wî di gund de hene."

Ez li bendî temama heftê nemam, çawa sibe rohnî bû, min berê xwe da Rewanê. Bi şev Emerê Keso birin. Hêwirze kete gund, bû zarezara jin û zarokan. Jina wî ser çavê xwe pencerük kiribû, li xwe dixist û dizûriya:

- Kurê sebeba bimire, mîrê min xerabiya kê kiribû, ew kê mala xwe şewitand şer avîte mîrê min.

Ez deh rojan ber bi Gozelyan neçûm. Lê

rojekê disa caw kiribû, wekî ez herim.

- Hi, te em ji bîr kirine, - Gozelyan mîna dostê kevin bi beşer got. - Tu li ku yi?

- De hevalê Gozelyan, tiştekî wisa tune ez bêm bêjim, - min bi cûrê lavakirinê got.

- Lê xelk çawa tê dibêje. Hema ji gundê we. Na, tu naxwazî giliyê êla te derkevin.

- Tişt hebe, ez ê ese bêm bêjim, hevalê Gozelyan, ez tu tişti venâşêrim.

- De baş e, here, heya duşemê ez li bendî te me, - wî got, ji cihê xwe rabû û destê xwe dirêjî min kir. Min bi herdu destan desten wî guvaştin û ez ji hundur derketim.

Şemo herdu qedeh tişti şerab kirin, yek hilda dirêjî Elo kir û got:

- E, baş e, em wan giliyanbihêlin, kasa xwe vexwe.

Herduwan gazî Şems kirin û kasen xwe vexwarin.

Lê pirsekê tebatî nedîda Şemo, di pey ewqası re wî dixwest bizanibe çığa mana girtina wî ci bû.

- Ya gundiyyêne we hela wisa, lê te çîma şer avîte min, ne em xal û xwarziyyê hev bûn? Paşê ji gundê me li ku, gundê we li ku, ez ji ku re hatim bîra te?

Elo serê xwe berda ber xwe, hebekî fikirî, paşê serê xwe rakir, li Şemo nihêri û got:

- Tu zanî, piştî heft- heyşt merivên pêşî min êdi xwe winda kiribû. Ger ku Gozelyan bigota şika min diçe kurê te, min ê şer biavêta kurê xwe, bigota şika min diçe birayê te, min şer bavêta birayê xwe.

Rojekê ji ji min re got:

- Elo, tu qet di derheqa kurmeta xwe de ji me re tiştekî nabêjî. Me bihistiye ew xeyba dewleta Sovyetê dike.

E, êdi ew bes bû, wî wisa got, wisa gerek bû min şer bavîta te.

- Şirovekirina hêsa, makkirî û kesekî gunehkar tune. - Şemo bi ten got.

- Na, Şemo, efükirina min tune. Ne li ber Xwedê, ne ji li ber evdan.

Demekê weke ku gunehê Şemo bi wê mehrûmiya wî hat. Lê paşê wî texmîn kir, ku ji huzûra Elo zivêr dibe û bi teherêkî hêrsa xwe fetisand û got:

- Rabe, rabe em razen, du saet mane ku dinya rohnî bibe.

Elo ji aciziya Şemo texmîn kir û êdi dengê xwe nekir.

Hê teze gewrayî ketibû sibê, Elo rabû kincen xwe li xwe kirin û da ser rê. Şemo kir nekir wî taşte nexwar.

Roja din kurê Şemo yê mezin hate mal.

- Bavo, duhu Eloyê kurxalê te kuştine, rabe em herin hewara wî.

- Kê kuştîye, lawo?

- Gundiyeke wan. Li ser pirsekê şer kirine, ewî bi kevir lê xistiye û kuştîye.

Şemo hebekî fikirî, paşê ji kurê xwe re got:

- Hûn herin, ez hebekî bêkêf im, ez nikarim bêm.

- Çawa, bavo, tu neyê wê bixeyidin.

- Tişt nabe, gerek ew ji min nexeyidin.

26. 04. 1992

# NE TE Ü NE MIN

Mervanê KELEŞ

Wê berbunga teng  
Ez û tu bûn  
tenê  
tenê  
Li wî çiyayê bilind...  
bilind...  
Ta ber perê ezmên  
û hembêz kirî bi ewran.  
Çawa hatin bêdeng  
ji nişkê ve  
wilo ez û tu xilmaş  
bariya...niza ne baran bû  
ne mijek giran bû.

Wek kuliyan bariyan  
di wê berbunga  
bê xwedî  
û sêwî.

Hêlîna me dizariya  
sêncâ werzê bavêن me  
xwêdana germ diherikand  
Ne te û ne min dît,  
çawa em dûr çûn,  
Ü çawa li şûn man  
dergûş  
meşka dew  
û berxê salê...

# MERCÊN DÎROKÎ Û DERKETINA HAWARÊ

Dr. Husêن HEBEŞ

Serhildana mezin ya sala 1925 an li Kurdistana Bakur ya bi navê Şêx Seid hatiye nasîn bi hovîti ji aliyê desthilatdarên xwînmij li Tirkîyê tê vemirandin û ta roja îro folklorâ neteweyî ji me re bûyerên wê salê nima dike; kî ji me kurdan stirana Şêx Seid ne bihîstiye, yan birrekê jê nizane?

Wê serhildanê nîşan daye ku agirê rizgariyê di dilê azadîxwazan de venemirî ye, tevî ku kuştin wek baranê li ser kurdan de dibarî û dijmin bi her awayekî serjêkirina me rewa kiribû, lê diyar bû ku vîna têkoşer û şoresserên Kurdistanê ji metodên kolonyalistan bi hêztir e, ew stûxwar û melûl neman û wan li gor zanîn û mercen dijwar berdewamiya xebatê kirin.

Berpîrsiyarên rêxirawên kurdan hevdu dibînin û di navbera meh û nîvekê de amadeya xwe ji kongreyeke nihêni re li Kurdistanê dîkin û di oktöbira 1927 an rêxirawa "Xoybûnê" ava dîkin. 1) Di kutahiya kongrê de pişkdarêne wê bîryarin hêja werdigirin, a herî girîng jê ew bû, ku hemû rêxirawên siyasi yekîtiyekê pêk bînin û şoreşa Kurdistanê berdewam be ta axa welêt ji bin piyên leşkerên tîrkan bê rizgarkirin, ji bo pêkanîna wê arrancê dest bi raperîneke çekdarî

bikin û çiyayê Agirî bibe navenda şoreshê. Mêrxasê gelê kurd Îhsan Nûri (2) dibe serokê hêzên kurdi û hukûmeteke medenî bi serokatiya İbrahim Heskî tê damezirandin(3)û ala Kurdistanê li pozê çiyê tê venan. Xoybûn di demeke kurt de çalakîyen fireh dike, liqên xwe li Kurdistanê û li derve vedike, ew girîngiyeke mezîn dide belavkirina propoganda û çanda kurdi û rojnama Agirî belav dike(4)

Tîrkan di salê 1928 û 1929 an nikarîbûn zora kurdan bi awayê leşkerî di Agirî de bibirana (5)wan amedeya xwe bi şêweyekî firehtir kirin û ta rê li ser şoresserên Kurdistanê bigirin. Tirkîye perçak ji zeviya Wanê dide farisan da ku ew alîkariya tîrkan bikin(6). Ji bo lêxistina kurdan kolonyalîstên me hevdijatiyênen xwe di navbera xwe de didine aliyekî û çawa bûye "qanûn" bi hev re û bi nûjentirin çek kuştinê bi ser kurdan de li pêşçavêne dewletên vê dînyayê hildiweşînin.

Di 11'ê hezîranê ta dawiya firmeha sala 1930 leşkerên tîrkan serhildana Agirî vedimirînin û bi tradisyonike tîrkanî hovîtiya xwe beramber kurdan nîşan didin. (7)

Rêkxirawa Xoybûnê nimûneyek yekîtiyê numa kir ku bi hemû hêz û çînan û bi hev re

karin baş rê li dijminan teng bikin;ji ber hoyine eşkere serhildan bi ser neket, li hukûmeta dîrokî ji wê raperînê ew bû ku ji her aliye kî Kurdistânê kurdan pişkdarî tê de kirin.

Rola nivisevanê Hawarê ji di damezirandin û pişkdarîya Xoybûnê de mezin bû, li gor jêderina ku Celadet Bedir-xan serokê Xoybûnê bû, herweha di "merkezî heyet"de Kamiran Bedir-Xan, Memduh Selîm, şahîn beg, Ihsan Nûrî, Dr. Ehmed Nafîz, Arêf Ebbas, Qedrî û Ekrem Cemîl û htd. . . (8) endam bûn.

Piştî têkçûna raperîna Agirî besdarine wê xwe li sinoran dixînin û digihêne Sûriyê; yek ji wana Celadet Bedir-Xan bû. Sûriyê wê demê di bin mandata Firansizan de bû. Kolonyalistên firansizî hîn berî cenga Cîhanî ya yekem, Sûriye û Libnan kiribû plana xwe ku wan welatina dagîr bike, mêtjûnivîsê rûsî V. Lûtski dinivîsinê ku konsulxanêne firansizî li Şamê û li Bêrûdê pêwendiyêne xwe bi hîroven erek ên navdar re durust dikan, wan alîkariya diravî ji çend rojnamên libnanî re dikirin. Karbideshîne firansizî pere pîrr rijandin bona bêtirî 25 hezar kesî di wan dezgehan de dixwendin û pêwendiyêne xurt bi zana û bi rêkxirawen rewşenbirî re çê kirin(9). Ji bo qelskirina tevgera azadîxwazan li herdu welatan berpirsiyarêne Firansizî dewleto-kan saz dikan, mîna dewletoka Şamê, Helebê, Latqiyê û htd. . . Ji bo ku meydan hîn ji Firansizan re firehtir bibe wan hewl dan ku cûlanewey niştimanî kurd bo encemakanî xoy be kar bîne, be rastî paş têkçûna cûlanewey Şêx Seîd le salî 1925 a Sûriye bibiwe penagey ew kurdanew le Turkiye rayan dekird û le lay bira kurdekanî Sûriya deçün(10). Dagirkirêne firansizî û ingîlîzi bi hûrî li çalakiyêni siyasi û civakî yên kurdan mîze dikirin, xasma li rêkxirawa Xoybûnê, ji lewre wê xebatê li dijî Tirkîye dikir û pêwendî di navbera Firansa û Tirkîye de li hev ketibûn. Pêwest e were gotin ku hevpêwendiyêne navbera herdu dewletan baş dibûn, gava gotin li ser parvekirina Kurdistânê dihate kirin: hemû aliye siyaseta dijkurd bi kar anî. Li gor peymana ku hatîye imze kirin di 20

oktobîra 1921 an li Biriyan-Bekirê di navbera tîrkan û firansizan de birreke ne kêm ji Rojava Kurdistanê(Herêmêne Cizîrê, Çiyayê Kurmêncî Kobaniyê)tevî Sûriya firansizî bû. (11)

Tevkariya firansizan û tîrkan di sala 1925 a ji encam da gava firansizan rê dan tîrkan ku hêzîne xwe yên leşkeri di xeta hesin re, di bakura Sûriyê re vegrinin ser raperrvanêne kurdan, tenê piştî hatina wê îmdadê kurd neçai bûn dev bidin çiya û leşkerên tîrkan ketin bajarene kurdan(12). Têkoşer û rewşenbirî mezin Dr. Nûredîn Zaza tîne bîra xwe ku dema navbera herdu dewletêne kolonyalist rind dibûn sawir dikete dilê Xoybûn yên penaber li Sûriyê;tîrkan teslimkirina wan ji firansizan dixwest, ew "Demêne bi tîrs dagirtû" derbas dibûn, gava firansizan ew ji Helebê rakirin Şamê(13).

Şoreşen Kurdistanê yên di navbera şes sala de rûxandina du raperrînen mezin û yên ji ber jenosîda tûraniyan reviyabûn Sûriyê, li Şamê bîr dikirin ku li ser riya rizgarkirina Kurdistanê berdewam bin, lê vê carê dest davêjin qeleman, tovîn raperrîneke rojnamevanî bi derxistina Hawarê di zeviye çanda kurdfî de diçinîn.

Di mercine weha de, di 15'ê gulana 1932 'an hejmara yekê ya kovara Hawarê derdikeve. Derketina kovarê bûyerek girîng bû di dîroka çapemaniya kurdfî de. Xwedî û berpirsiyarê wê Mir Celadet Alî Bedir-xan bû.

Hawar ne organa tu parti û ne dengê tu komelan bû. Ew li ser daxwaza Celadet Bedir-xan derdikeve, wî dilsozi rîdana derketina kovarê ji karbideshîne firansizî wergirt. Li ser wê yekê xwedîyê kovarê ji xwendevanêne xwe re li Iraqê bi kurmanciya jérîn dinivîsinê:Hawar ne le layen komelekêwe derdihêni û ne le komelekêwe paraye esînê(14). Bi vî terzi em eşkere dikan ku ditina O. Vîlçêvîskî ne rast bû. gava diçespîne ku kovara Hawarê ogana komîta Xoybûn bû.

Hawar di desipêkê de û ta hejmara 23 an bi tîpêne latînî û erebî derdikeve, hejmara yekê ji

16 rûpelan bû, herweha 3-4 rûpel bi firansizî di her hejmarekê de çap dibûn. Formata kovarê 21x30 sm. bû. 16.

Li ser bergê yekê ji hejmara yekemîn, li jor sernava kovarê nivîsine, li bin:Komela kurdî, revue kurdî, li aliyê çepê :Sal, 1, yekşem, li aliyê rastê:hejmar 1, 15'ê gulanê 1932, li navînê: Têdexistiyên komelê û birrê firansizî. Li tewri jêr:çapxana Tereqî, 1932 Şam.

Kovara Hawarê piştä xwe bi tu dewletan, yan bi tu rêxirawên bêgane ve girê neda, ji bo alikariya diravî xwediyê wê tenê hêvî ji xwendevanan û xemxurên çanda kurdî dikir, ji bo wê yekê Mîr Celadet Bedir-Xan lava wî ji wan dike ku alikariyê bikin:Hawar zarokeke nûza ye. Zarowa me ye;zarowa kurdan e. Wek her zarok bi xweyitiya dê û bav, bira û pismamîn xwe dikare bijî. Her kes, her kurd dikare aßikariya Hawarê bike. . . Her kes bi tiştekî, bi awayekî dikare bê hawara Hawarê (17). Di rûpela 11'an nirxa (buhayê)kovarê tesbît bûye;ji bona Sûriyê, Tîrkiyê, Iraq û welatên Qevqazê:Salekê 500 qirûşê Sûri;şesmehkî 200 qş. ;sêmehkî 175 qş. , ji bona welatên din:salekê 150 frank;şesmehkî 90 frank;sêmehkî 50 frank. Li ser bergê hejmara 2'a reklama du bijîkîn kurd têr çap kirin, yek ji wana Dr. Ehmed Nafiz bû. Ew piştvan û nivîsevanê kovarê bû-ew reklama ha bi erebî û firansizî belav bû, her li wir jî reklama çapxana herdu bra Eyobi çap bûbû û di hejmara sisiyan berdewam bûn. Xwendevanên kurd li Bexdayê resimekî (foto) tofeyî (gîrûbî) pêşkêsi kovarê dikin û di hejmara pêncan de belav dibe. Li ser bergê hejmara 9 a û di rûpela 5 a resimê tofeke kurdên deşta Hesînan bi cilênetewî têr weşandin, her di wê hejmare de jî nirxa nû bona abonevanên kurd li Iraqê diyar dibe. Bergê hejmara 11 a bi ala Kurdistanê tê pêçan. Ew sê rengîn e, li jor sor, di naverast de spî ye û nîgara rojê li ser e û li jêr kesk e. Xwediyê Hawarê bi ala Kurdistanê kelasê rehmetî Şêx Evdirehmanê Garisî dipêçe û di nav rûpelan kovarê de çap dike, herweha resimên du navdarên kurd di wê hejmare de çap

dibin:Rehmetiyê Xelîl Ramî Bedir-Xan û bijîkê 25 sali Ahmet Bêreqdar, hejmara 11 a wek berhemeke şinê tê xuyakirin. Di hejmara 26 an ilüstrasiyoneke pêxember Zerdeş di rûpela 9 an de belav dibe, di bergeha duhem de sê reklamên firansizî hene.

Em bi van çend gotinên kurt li ser derxistina Hawarê temam dikin ku di hejmara 39 an rûpelan Hawarê kêmtir dibin ta 12 an û ji hejmara 46 an tenê bi ta 8 an ji bilî hejmaren 49 an û 52 an ku rûpelan wan 16 de ne.

Hawar di sala yekemîn de bi rêk û pêk derdiket:2 caran di mehê de, merema xwediyê wê ew bû ku kovar hefteyî derkeve(18). Lê mixabin ew awata bi cih nabe, C. Bedir-xan di benda "heyineke yeksalî"de dijwariyên hatine pêşıya derxistin û belavkirina wê nîşan dide 19.

Di sala 1932 an de 14 hejmar derdikevin, sala 1933 an kêmtir bû, 9 hejmar digihê xwendevanan, paşê dijwarî pirr dibin, hejmara 24 an 8 meha û 18 rojan dimîne ta di 1 ê nîşana 1934 an belav dibe, herweha hejmara 25 an ji 4 mehan û 18 rojan li ber xwe dide, di 19 tebaxa 1934 an derdikeve, di wê salê em hejmarine din nabînin. sala 1935 an bi hejmara 26 an kuta dibe û paşê kovar tê birîn.

Kovara Hawarê ji nû ve tê vejandin, ew piştî pênc salan û heyşt mehan;di 15'ê nîşana 1941 an de hejmara 27 an ronahî dibîne. Bi wê vejandinê em karin bêjin ku qonaxa duhemîn di diroka berdewamkirina kovarê de destpêkir û ew di wextê de tê weşandin. Di sala 1941 ê de xwendevan 10 hejmarê kovarê werdigrin, di wê salê de em karin bêjin ku ji her 22 rojan bi şêweke gelemerî hejmarek derdiket. Sala 1943 an ji her bi wî cûreyî bû;14 hejmar derdikevin;ji 28-51.. Di 20 ê kanûna duhemîn ya sala 1943 an hejmara 52 an derdikeve, 5 hejmarên dawiyê, her yeke di 44 rojan derdikeve, hejmara tevî dawiyê ya 57 an di 15 ê tebaxa 1943 an tê der.

Bi vî terzî, eger em wan salêñ kovar

derketî nehejmêrin, em karin bêjin ku jiyana Hawarê 5 sal, 7 meh û 3 roj in. Em dibinin ev jiyyina Hawarê rastî ye, lê dîroknivisê navdar Dr. Kemal Mezher dema derketina hejmara dawiyê dijmære, bi raya wî jiya kovarê bêtirî 11 sal in (19).

Ev rûpelên jorîn numa dikin ku bi ci rengî Hawar derdiket û çiqas asteng dihatin ser riya wê, nemaze di derketina hejmaren navin de, lê pêwist e em vê rastiyê ji bêjin ku dijwariyên Hawarê çawa diyar dibe ku diravî bûn, ji lewre em tu guhertinên serekîn di naveroka wê de nabînin; mijadênen wê wek berê mane.

#### Jêderk:

1- Bo bêtir nasînê binêr:Dr. Bilîç sêrko, Kêşeya kurdî, dema buhuri û a niha, Elqahêre, 1930, r. 108(erebi), herweha bin.:Zinar Silopi, Doza Kurdistanê, r. 131-188(erebi), û Ebdul Cebar Xefür:Tevgera kurdî a netewî li Tirkîyê di navbera di cengê cîhanî de. Kurtelêgerîna doktora, Mosko, 1977(rûsi).

-Bin: Serihdana Agîri. Biranînê Ihsab Nûri. Hêvî, hej. 2. 1984, r. 19-28, h. 31985. r. 25-h. 4. 1985. r. 15-16. h. 5. 1986. r. 25-40.

2- Ihsan Nûri li Bîdlîsê sala 1892 hatiye dinê. Wî li akademiya leskerî li stembolê xwendîye. Pişkarê serê li dijî girêkan(yunan) dibe. Ew besdaruya kongra Sêwasê ji dibe, piştî têkçûna raperrîna Agîri, ew li Tehranê dijî, li wir pirtûkekê li ser dîroka kurdan dînîvisine: Tarikhe Rashid Nejad kurd, Tehran, 1955, . r. 40., Hasan Arfa The kurd Historical and political study. London 1966 herweha bin:Hêvî, h. 2. r. 17.

3-Bin: Zinar Silopi, nota 1 ê, r. 135 û 148.

4-Bin: Zinar Silopi, r. 135.

5-Bin: Not 1ê, Dr. Bilîç sêrko, r. 111 çapa rabêta Kawa, 1986.

6-Bin: Zinar Silopi, bin:Noten 1ê, r. 151.

7-Bona bêtir zanînê, bin:Noten 1-3, r. 107-118 û 129-159.

8- "International affiars "Vol. 22, N. 1. London, 1946, p. 96, herweha bin: Safrastian A, Kurd and Kurdistan, P. 84.

9-Lûtskî, Dîroka welatên ereban ya hevdem. Mosko, 1971, r. 405(erebi)

10-Dr. Ebdul Rehman Qasimlo, Kurd û kurdistana, Bexda 1973, r. 98.

11-Nasêh Xefür Remedan, Kêşeya kurdî di sistema pêwendiyê navnetewî de di navbera herdu cengê cîhanî de. kurtahiya lêgerîna doktora, Kiyev, 1971, r. 19 (rûsi)

12-Ebdul Cebar Xefür, Tevgera kurdî a netewî... r. 11 (rûsi)

13-Bin: Dr. N. Zaza, Hawar û çanda kurdî.

14-Hawar, h. 10 r. 8.

15-O. Vîlçevski. Li ser bibliografiya pirtûkên kurdî yên çapkiri di sedsala 20 an de. Ew lêgerîn di kutêba "Iranskiyê yêziki" Kn. 1, M-L., 1945. belav bêye. r. 162 (rûsi).

16-Formatâ Hawarê ji hejmara 1ê ta ya 23 an bi vê pîvanê ye: 21-x-29 cm ji hejmar 24 an û ta ya 57 an me nûçapa mamosta Hemres bi kar anî, ku wî formatâ wê ji ber hoyen çapê biçük kiribû.

17-Hawar. h. 1, r. 2.

18-Bin. :Nota 17

19-Bin. :Hawar. h. 20, r. 2

20-Dr. Kemal mezher. "Têgeyistinî rastî" û suenî le rojnamegerî kurdî de, Bexda 1978 r. 235.

# BÎRANÎNA KIRALEKÎ CIWAN

HEINRICH BÖLL

Wergerandina ji almanî:  
Şahînê B. SOREKLÎ

**B**i umrê 13 salin ji min hat xwaztin ku ez bibim kiralê Capota(1). Ez di odaya xwe de rûniştibûm û min dikir ku ez ji hevoka “Ne baş e” ya ku mamosteyê min di bin nivîsareke min de nivîsandibû peyva “Ne” rakim. Bavê min, Pig Gi I ji bo çar hefteyan li çiyan derketibû nêçirvaniyê, û divabû min nivîsara xwe tev namehilgirên taybetî jê re bişanda. Min hesabê tunebûna çirayeke bi ronahiyeke baş di şûna wî ya nêçirvaniyê de kiribû û min bi can û bêhn xwe dabû ber karê xwe, dema ji nişkan ve qîrîneke ji pêş qesrê dihatî ket guhê min: “Bijî Pig Gi yê Duyem!”

Bîstekê li dû wê dergevanê min li bayê bezê ket hundir, xwe li ber derî avêt ser erdê û bi hurmeteke mezin di ber xwe de got: “Kiralê min, bi kerema xwe, li min biborînin, ku min ber demekê di derheqê Cenabî we de ji bo kişiändina cixareyê li cem Serekwezir gili kiribû.”

Xwenizimdanîna dergevîn li xweşiya min nehat, min jê xwazt biçe der û karê xwe domand. Mamosteyê min bi merekeba sor dînîvîsand. Min şûna peyva “Ne” di deftera xwe de quł kiribû, dema ez car din hatim ewarekirin. Serekwezir ket hundir, xwe li nêzîkî derî bi dizan xist erdê û bang kir: “Bijî Pig Gi yê


Duyem, sê caran bijî!” Dû re domand û got: “Maqûl, gel dixwaze we bibîne.”

Ez li hev şaş bûm, min lastikê di dest xwe de danî, destêن xwe ji bo paqîskirina wan li hev xistin û pirsî: “çîma gel dixwaze min bibîne?”  
- “Ji ber ku hûn Kiral in.”  
- “Ji kengê ve?”  
- “Ji nîvseetekê û virde. Bavê we yê herî qedirbilind di dema nêçirvaniyê de ji hêla kesekî RASAC de hat kujtin.” (RASAC kurtkirina “Rasac Sadisten Capotas” e) (2).

“Ax, ev RASACan !” min bang kir. Dû re min da pê Serekwezir û derketim ser balkonê, pêş gel. Ez bişîrim, çepelên xwe li ba kirin û li hev şaş bûm.

Ev xwenêşandana xwe bi xwe hatî holê du seetan domand. Tenê ber bi êvarê, dema dest pê kir tarî bibe, xelk ji hev belav bû; lê li dû çend seetan millet bi meşheleyan car din di ber qonaxê re derbasd bû.

Ez li odaya xwe vegeriyam, nivîsara xwe çirrand û besen çîrtçîrtîn yên kaxizê çekirin hewşa navend ya qonaxa kiralî. Li wir-wek ez dûvre pê hesiyam- ew ji hêla yên tişteñ biranînê berhev dîkin de hatine rakirine û ji bo welatêñ



H. BÖLL

biyanî hatine frotine, li ku derê îroj îspatên nejîrbûna min di warê nivisa rast de di bin caman de hatine parastine.

Mehêñ balkêş û bi heyecan li dû ev bûyer hatin. RASACan hewl dan inqilabekê çêbikin, lê ji hêla MISACan ("Milde Sadisten Capotas") (3) û hêzên leşgerî de hatin rawestandin. Bavê min kirin gorê, û divabû ez di civinêñ parlementanê de besdar bibim û bendêñ qanûnê imze bikim-lê çawa be ji, min ji kiralbûnê hej kir, ji ber ku min nuha dikaribû li hember marmosteyê xwe metodêñ nû bi kar wînim.

Eger wî di dersa bi axiftin de ji min bipirsiya: "Li xweşiya Cenabî we were, hûn ji min re şert û qaşdeyêñ jimarêñ li hev-siwarikî yên ne wek hev bibêjin?" Min ê bigota: "Na, li xweşiya min nayê," û wî nikaribû tiştek li dij min bikira. Eger wî bigota: "Gelo ji bo Cenabî we zehmet be, eger min ji Cenabî we bipirsiya, heke hûn bikaribin bi kerema xwe nivisareke ji sê rüpelan binivîşinin, ka Tell(4) ji bo çi armancan Gessler kujt?" Min ê bigota: "Erê, ji bo min zehmet e" -û min ji wî dixwazt, bila ew ji min re bibêje, ka armancan Tell çi bûn.

Wisa, min bi hêsanî perwerdariyeke bi sînor bi dest xist, hemî pirtûk û defterêñ xwe yên xwendegahê şewitandin û kata xwe ji bo tiştêñ ez jê hej dikim derbas kir. Ez bi topê líztim, min kéra xwe ya beriyê avête textê nêşanê, romanêñ polisin xwendin û di civinêñ drêj de li gel berpirsiyarê sînemeya kiralî besdar bûm. Min ferman da, ku hemî filimên ez jê hej dikim werin ditin, û min di parlementanê de di derheqê xwendegahan de guhertinê mezin daxwaz kirin.

Dem yeke piir xweş bû, teví ku civinêñ parlementanê ez westa dikirim. Ji dest min hat der ez xwe ji derive de wek kiralekî ciwanî xemgîn xuya bikim, û min bi tevahî pişta xwe bi Serek- wezîr Pelzer grêda, yê ku hevalekî bavê min û pismameki diya min bû.

Lê li dû sê mehan Pelzer ji min daxwaz kir ku ez bizewicim. Gote min: "Divêt hûn ji gel re bibin nîşe, Maqûl." Tîrsa min ji zewacê tunebû, lê ya xirab ew bû, ku Pelzer qîza xwe ya yanzde salîn, Jadwiga, ji min re pêşniyar kir, keçekte lawaze biçük, ya ku min gellek caran didit di hewşê de bi topê dilfîzeye. Navê wê wek keçekte bêhiş derketibû, sinifa pêncem duçar dikir, rûzer bû û ne çeleng xuya dikir. Min ji Pelzer daxwaza katê kir, da di pêşniyariya wî de bifikirim. Nuha ez bi rastî xemgîn bûm, ez bi seetan li paş pencereyê rawestiyam û li Jadwiga niherî, ya ku bi topê dilfîz, yan xwe li ser lingekî çedikir. Kincêñ wê ji berê xweşiktir bûn, yek- caran serê xwe radikir, li min diniherî û dibişirî, lê kenê wê wek kenekî ji dil bi min ve xuya nedikir.

Dema kata biryargirtinê derbas bû, Pelzer bi taximekî kincêñ fermî ket hundir. Ew peyakî bi hêz bû, rûzer, rihreş, çavêñ wî dibrûsîn. "Bi kerema xwe rî bidin û biryara xwe ji min re diyar bikin, Maqûl;" got Pelzer, "ka we ew zaroka min layiqî Cenabî xwe dîtiye?" Dema min rasterast "Na" got, tiştekî erjeng cih girt: Pelzer nêşanen li ser milêñ xwe û qirdêleyen li ser sepe ta xwe çirrandin, çenteyê xwe -ji çermê neesli hatibû çêkirin- çekir ber lingêñ min, rihêñ xwe rûçikandin û qiriya: "Ev e şêweya spaskirinê li nik kiralêñ Capota!"

Rewşa ez tê de yeke xirab bû. Bêyi Pelzer ez ê wenda bibûma. Min hema di cih de got: "Ez destê Jadwiga ji we dixwazim."

Pelzer xwe li pêş min avêt ser erdê, bi germahî pêçiyêñ lingêñ min ramûsan, nêşan, qirdêle û çenteyê ji çermê neesli dîsa rakirin.

Merasimên zewaca me di kiliseya mezin ya Huldebach de cih girtin. Bîra û sicuqêñ goşt li gel hatin belavkirin, ji bo her kesekî heşt cixare hatin dayin, û li gor daxwaza min, herweha du bilêtên siwarbûna çerxfelekê(5). Bi drêjiya heşt rojan temaşeyan û qirecirê li dorhêlén qesrê domandin.

Li dû zewacê min di nivisandina wezifeyên xwendegehê de alîkariya Jadwiga kir, em tev bi topê lîztin, me xwe li ser lingeki çekir, em tev çûn siwarbûna hespan, û heku dilên me xwaztin me şiranî ji xwe re ji mitabaxa şiranîyê ya kiralî wesand, yan em çûn sînemeya malê. kiralbûn hêñ jî li xweşiya min diçû, lê bûyereke gran wezifeya min bi tevahî hanî dawiyê.

Dema ez gihîştim çardesaliya xwe, ez wek serekhêz û qumadarê Hêza 8em hatim binavkirin. Ji bo Jadwiga rutbeya serdar hat dayîn. Divabû em hin caran bi siwari di pêş leşgerên di rîzan de derbas bibin, êvaran biçin klûban û di rojêñ netewî de nêşanan bi sepetêñ leşgerên layiqî wan xin. Min bi xwe jî gellek nêşan girtin. Lê dû re meseleya Poskopek qewimî.

Poskopek leşgerekî Refê çarem yê hêza min bû. Êvareke yekşemê ew ji leşgeriyê reviyabû û xwaztibû tev siwareke hespêñ sîrkê sînorê welêt derbas bike, lê hat girtin û dadgeheke leşgerî cezayê mirinê dayê. Wek qumandarê hêzê divabû ez ferманa kujtina wî imze bikim, lê min di binê kaxizê de hema nivisand: Bi mayîna çarde rojan di girtîgehê de hat afkirin. Pig Gi yê Duyem.

Ev rîza nivîsê encamên xirab hanîn holê. Serleşgerên hêza min hemiyan nêşanîn xwe ji ser milêñ xwe cirrandin, qirdêle û xilatêñ li ser sepetêñ xwe qetandin û dan serpelekî(6) ciwan da ew wan di odehya min de çeve. Hêzên Capotayî bi tevahî dan şopa wan serleşgeran, û bi gihîştina êvarê re odehya min tiji nêşan, qirdêle û xilatêñ leşgerî bû. Rewşa odehyê ne ci rewş bû.

Erê, gel piştgiriya xwe ji bo min xuya dikir, lê bi şev Pelzer ez agahdar kirim, ku hêzên leşgerî bi tevahî çûne hêla RASACan e. Teqînê dest pê kir, gulle hatin barandin û dengê mîtralyozan qiyamet li dorhêlên qonaxê rakir. Erê, MISACan çend peya ji bo parastina min rîkirin, lê Pelzer di eynî şevê de derbas hêla RASACan bû. Ez neçar mam li gel Jadwiga

birevim.

Me zû kinc, pere û xişir civandin, MISACan taksîyek ji me re xwaztin û me xwe bi zor gîhand rawesteka trêñê ya li ber sinorê welatê cînar. Li wir, westa û hilak me xwe xuşand hundir vagoneke razanê ya dereceya duyem û me sînor derbas kir. Li hêla Capota tiqetiqa tifingan, qîrîn û qerxeşeya isyanê dunya kiribû heşermeşer. Em li dû çar rojan li bajarekî bi navê Wickelheim peya bûn. Bîranînên nebixêr yên dersêñ erdnigariyê(7) ez pê hesandim ku Wickelheim paytextê welatê cînar e.

Di navberê de ez û Jadwiga rastî tiştine hatin ku li xweşiya me hatin, wek bêhna trênan û xetêñ wan ya tirş û tûj; tama sicuqêñ goşt yên rawestekên trênan; û min dikaribû bi keyfa xwe cixareyê bikişînim. Jadwiga jî dest pê kir wek kûlkekê bişikife, çimkî ew ji karê xwendegehê xilas bû bû.

Di roja me ya duyem de li Wickelheim, afişine li her derê bi diwaran de dihatîni qemîtandin balêñ me kişandin ser xwe: "Sîrka Hunke-Werin li siwara bi nav û deng Hula û hevparê wê Jürgen Poskopek temaşe bikin." Jadwiga bi heyecan got: "Pig Gi, jiýina me bide berçav. Poskopek dikare alîkariya me bike."

Li otêla me seet bi seet tîlgraf ji Capota digihîştin, serkeftina MISACan diyar dikirin, kujtina Pelzer, organîzekirina hêzên leşgerî ji nû ve.

Serekwezîrê nû -navê wî Schmidt bû, serokê MISACan bû- ji min daxwaz kir ku ez vegeirim, da taca polatîn ya kiralêñ Capota car din ji destêñ gel bigirim.

Çend roj derbas bûn bêyi ez bikaribim ci biryarê bigirim, lê li dawiyê tirsa Jadwiga ji wezifeyên xwendegehê bi ser ket. Ez çûm sîrka Hunke û min li Poskopek pirsî, yê ku bi kîfxweşî bixêrhatin li min kir: "Parasdarê canê

min,” wî di deriyê karavana xwe de bang kir, “hûn ci aña kariyê ji min daxwaz dikin?” “Kareki ji min re bibînin,” min hema got.

Poskopek dilbişewat bû, ew ji bo min li gel Birêz Hunke axift, û min dest pê kir li Sîrka Hunke avleymûnê bifroşim, dû re cixareyan, û pê re tirşika goşt. Ji bo min karavanek hat dayîn û li dû demeke kurt ez bûm xiznedarê sîrkê. Min navê Tückes li xwe kir û ji wê demê û şûnve ez ji têlgrafên ji Capota xilas bûm.

Xelk min wek mirî yan wenda dizane, di dema ku ez li gel Jadwiga ya ku heku diçe xweşiktir dibe, di karavana Sîrka Hunke de ji cîhekî diçim yekî din. Ez welatên biyanê bêhn dikim, dibînim, û bi baweriya ku Birêz Hunke bi min tûne pîrr këfxwêş dibim. Û eger Poskopek yekcaran seri li min nexista û ji min re li ser Capota neaxista, eger siwara çeleng Hula, jina wî, her bi îsrar negota min ku mîrê wê ji bo jiyana xwe spasdarê min e, min ê nema bi-haniya bîra xwe ku ez demekê kiral bûm.

Lê ber demeke kurt ez li îspateke rastin ya paşerojên xwe yên kîraltiyê rast hatim.

Sîrka me bi mîvanî li Medrîdê bû. Ber nîvro ez li gel Jadwiga ji bo gerre derdiketim bajêr. Carekê Xaniyekî mezînî rengboz, ku li ser “Entîkxaneya Netewî” hatibû nivîsandin haya me kişand ser xwe. “Were em biçinê,” got Jadwiga, û em di entîkxaneyê de çûn yeke ji ew salonên mezine li hêlekê. Li ser deriyê wê “Beşê Destnivîsê” hatibû nivîsandin.

Beyî ci şik me ji xwe re li destnivîsê serok û kîralan dîniherî, ta ku em rast qukiyeke camîn hatin, li ser kîjanê beşkaxizeke spî hatîbû zeli-qandin: “kîraltiya Capota, ji du salan û vir de Komar.” Min li wir destnivîsa kalikê xwe, Wuck XL., dît, beşekî biçûk ji daxuyana Capotayî ya bi rûmet, ya ku wî bi destê xwe nivîsandibû. Min peleke ji deftera bavê xwe ya rojên nêçirvaniyê ji dît -û li dawiyê min perçeyekî biçûk ji deftera xwe ya xwendegehê dît, piçek kaxiza gemarin, li ser kîjanê min xwend: Yê lingê xwe qasî bera xwe rane hewcedar nabe. Min şermok berê xwe da Jadwiga, lê ew bişirî û got: “Tu nuha êdî ji van tiştan xilas büyi.”

Em zû ji entîkxaneyê derketin, ji ber ku seet bû bû yet, û seet sê temâşeyê li sîrkê dest pê dikir. Divabû ez seet du teqeya bilîtan vekim.

(1) *Capota: Welatekî xeyalî ye*

(2) *Rasac Sadisten Capotas rêxistîneke siyasiye xeyalî ye. Bi kurdî xwebêjeke wisa dide: Rêxistina Rasakên Bêwûcdan yên Capota.*

(3) *Milde sadisten Capotas partîyekî din e. Bi kurdi xwebêjeke wisa dide: partîya Rasakên nîvwûjdan yên Capota.*

(4) *Tell: William Tell(sedsala 13an), li Swîsre wek sîmbola têkoşîna ji bo azadiyê tê nasîn.*

(5) *çersfelek: karûsel(bi tirkî: atlıkarınca)*

(6) *Serpel: Teymen*

(7) *Erdnigarî: Coxrafiye*

# XWÎN Û BERF

Ziya ŞEKER

Dimrim  
Çar aliyê min berf e  
Xwîn û berf

Xwîn û berf  
Li ser hev dilerizin  
Helqa çiyan bê sî  
Hengame girtina  
Kulîkîn sor  
Kulîkîn zer  
Darêñ daristan  
Ji vera çivîkan  
Xwîn û berf

Lo komir,lo hesin  
Binerd e,sererd e  
Hey masiyê golan  
Hestiyê bav û kalan  
Tirba bê goristan  
Bi kêra bi şûra

Li dijî zilmê berxwedayin  
Bi tivingan  
Bi tilî lîlî...

Dimrim  
Hengame ye  
çar aliyê min berf e  
Bûye mast û mût  
Xwîn û berf

## KOVANIYA TE

Kovaniya te  
Ji govendan re dibe ritm  
Ji çîrokîn kevin re nexş  
Min dîn dike dinarê dike  
Dilê min da dibe kozir.

# GERREK AGAHÎ LI CİGEHÊN HUNERA KURDÎ YÊN KEVIN (1)

## Dilower MÊQERÎ

**D**i havîna 1986'an de, dostekî sazbend xwest ku ez seriyekî bi wî re herim Cizîrê û Kurddaxê. Wî ê li wir şeveke şahiyê çêbikira. Bi rastî ez bi vê ezimandina wî kêfxweş bûm. Ji ber ku ew ji bo min dibû fersendek ku ez li wir seriyekî bidim warên arkeolojik.

Wek tê zanîn Şam bi ava xwe ya sar û bi hênikbûna xwe navdar e. Em bi otobusê ji Şamê bi dûr ketin. Di wê dinyagermê de di rê de em germixî bûn. Dawî em gîhiştin Derbesiyê, bajarekî biçûk ku di navbera tixûbê Serxet û Binxetê de paldayî ye. Em li qehwexana bajêr, li bin siya çend darêن ku hebûn rûniştin, ta ku mîvendarêن me hatin pêşwaziya me kirin.


Cizîrê, "... ev erdê sawîrast, yê ku kîjan hevçavkî kargerî dikare ji bakura wê bibîne, dûrtir mirîşkê ji başura wê. . ." - Selim Berket: Biranîna zaroktiyê - Ev herêma belengaz û ciwârên hişkî, ku pirraniya Kurdistana rojava, di navbera Dicle û Firat hemêz dike; bi xwe na-venîda bajarvaniya mirovantiya kevin bû. Li vir kevintirin nemazên rewîştên pêşhatî û çûkên din wek cêr, mohr û wênegirtî, sergirtin. Herweha roleke pîr mezin di hemû serdemên dîrokî de leyistiye.

Arkeoloji diyar kirin, ku cîgirtina şivantiyê

li vê derê destpêkiribû, her çawan ku pêşinan revên pezkovî di navbera çiyayêن Toros û Zagrosê de belav dibûn. Heta dibêjin ku reha şîtlîn ceh û genim li vir rewz kiribû. Kolandina arkeolojiyê di sala 1911'an de, destpêkir, Gava hinartekî almanî gîhiştê girikê Gozanê(Tell Helef, rojhilata çemê Fîrat). Ew yeka han di bin serokatiya F. Von Oppenheim de bû. Bi dû wê wan serî dan çend cihêن nûdiyarkirî li Cizîrê, wek: Tell şêx Hernedî Li rojhilata çêtavê Xabûr) û Tell Faxariyê(nêzîki Serê Kaniyê). Hinartekî almanî, ji sala 1958'an mezintirin girikê rojhilata kevin, Tell Xwarê, dikole. Ji lewre min di destpêkê de got, ji bextçakê fersendek ket destê min, ku ez seredana vê herêmê bikim.

Tell Xwêra:

Ev cîgehêن girîng dikeve nêzîki sînorê "Tirkiyê û Sûryê". Ew di navbera çemê Xabûr û Belîx de ye. Di ber wê jî riya Serê Kaniyê derbas dibe. Hinartekî almanî ê yekem di bin serokatiya profesor Anton Moortgat bû. Wek tê naskirin ew hîmdarê arkeolojiya zanînê ye di rojava Asyayê de. Kolandinê çêbûne, nîşan dide ku quatîn herî kevin li vira, vedigerin serdema berbanga Mezopotamya ya navîn(2900 - 2350, Berî Zayinê). Herweha babetên neqşen ku wan li Tell Xwêra, ser mohrên stûnî dîtin, nîşana bendewariyê bi Mezopotamya dike(Serdema Uped yê Sumerî). Ji ber ku nemazên ku wan derxistine



*Çapa muhreke stûnî ji Tell Xwêra- Serdema Mitanî (Wênexêz: D.M.)*

mîna hev in û vedigerin nîvanî hezara sêyemîn, Berî Zayinê. Heykelên ku di sala 1962'an diyar bûn, wan jî eynî rengdêrin(xusûsiyet)sehkirî û hunerî yên ku heykelên hevçax li Tell Esmer, hildidin. Wan ku li nîvcê Diyala(Kurdistana Başur)sergirtin. Vana vedigerin Serdema Mizilim yê Sumerî.

Ji dora duyemîn a serdema berbangê Mezopotamî û navîn, babetên nakokiya xêrxwazî û şerxwazî di wênegirtina êrişen tebahoviyê li ser tebakedî û paşmîrê wan(carcaran Gilgamêş), xuya dibû. Ew mirov - ga, cara yekem li vir diyar dike: Yê laşê wî mîna ga û rûyê wî mîna mirovan. Ev nakokî jî merov dikare li ser çapêñ ku rûber kirin wan qapaxêñ herrî yên sewîlkan digirtin, bibîne. Di sala 1973'an de, komelkî çikêñ túnc(bronz)diyar bûn. Vana jî vedigerin serdema berbanga sulaletên Sumerî, ji wan çikêñ wek bivir û teyrêñ mes yên ku baskêñ wan digihîste 75 sm, hebûn. Neqşen wan di eynî rewîstan yê "Heykela Bazîyan", hatine rewêtin. Ew heykela navdar li bajarê Ur e.

Selbendek ji kevirê kils di odehyeke ji vê qatê, hatiye sergirtin. Forma wê lakêşîye, û bi

lindbûna wê 25sm. Li ser rûyê wê hest jin hatine neqîşahdin, wek ew li rûniştekê danişbûn, reng û rû û lixwekirina wan, yek bûn. Wan zarok û tebakedî jî hemêz kiribûn. Lê mixabin, ji ber rewitandina wê tabloyê, beşek ji mijara wê winda büye. Dîsa jî ji vê çîkê yê girîng ku bala mirov dikşîne, perçakî qafiloç (den)ê ku li ser rûyê wê çar tîpêñ alfabeşa nenasî hatiye neqîşandin: Zimannasê almanî Rolesch bawer dike ku bi alfabevê aramî(Suryaniyêñ kevin)yan kananî ve nayêñ girêdan. Lê mero dikare texmîn bike ku ev tîpêñ han dibe ku ji alfabeşa hûrî; gelê li derdora navça Wan û Urmîyê, berî ku çembera Hûrî - Mitanî bigîhê vê herêmê, û imperatoriya wan dirêjî derya spî bike (sedala 20'an, B. Z. ).

Her wisa avahîgehê mezin di vê qatê de hat sergirtin, nav du xaniyan de parve dibe: A yekem, sala 1974'an de di hêla bakura girik de, diyar kirin. Ew jî ji çar odehyan, ku erd û diwarêñ wê bi kilsa spî têvdayine, afiranî ye. Xaniyê duyem, di sala 1973'an de di hêla girik yê rojava, diyar kirin. Ew xaniyêñ mezin ku ji keviran çêbûye, û ew bi panzdeh odehyêñ xwe wek cihê serayekê(qesrekê)xuya dibe. Sedema

texmîna me ew e ku hewşa wê gelek fireh e, digel tiştên girîng ê dihewîne wek riştên (amuret, cîhaz) yê sergirtî bi rastî gelek in û pirraniya wan sewîlkîn bîçûk digel çend listikêن teyran ên ji ava sor sazbûne.


Paşıya sergirtin di cîgeha Tell Xwêra di sala 1985'an de, çêbûye:

1 - Pêgehnasan(arkeologan)perestgeheke girîng di kepeza başûr yê girkê diyar kirin; ku dirêjbûna wî 24m. ye û firehbûn 14m. ye. Hîmdanîna wî ta kûraniya 140sm hatiye kolan. Di hundurê vê perestgehê de rûxistigeheke bi kilsê tevdayî heye û di rexê wê ya bakur de çar avzêl ji bo rêjtina meyê(serabê)heye. Ew jî di

A)bendewarî bike, ku vedigere serdema qirale Mîtanî yê mezîn Şûştar (nîvanî sedsala 15'ar Berî Zayînê).

2 - Di qatekî ji vê perestgehê de, komelki giranbuha ji qafiloçan(den)diyar bûn. Ew vedi-gerin serdema berbanga sulaletên duyemin yê Sumerî û hebûna wan ya di vê qatê de pirseke ku mero mat dike.

3 - Mohrên stûnî yê di vê perestgehê de hatin diyar kirin, nûjentirê wan vedigerin dora Hûrî - Mîtanî(1530 - 1100 B. Z. ). Pirraniya wan ji cûrê ciwelkî(gelêri), yê ku ji hevîrê camê û bi awayekî taybetî hatine çêkirin. Rewişt û babetên mohrên vê qatê bi awayekî gişî bende



*Çapa muhrekê ji Tell Xwêra- Serdema Sumerî (Wênexez: D. M)*

herikin û dikevin nav avzêlek mezîn. Wekî din, pêşderâ vê perestgeha han di rex başûr de ye û di aliyê bakur de bingeha heykelê Yezdanekî heye, ku ji bo sazkirina riq û qurbanan bi sîvandeka dor lêgirtî ye.

Ji bili nemazên perestgehêن Hûrî - Mîtanî, em dikarin bêjin ku şahesera vê perestgeha han di nav cîgehêن Mezopotamyayê tuneye. Mero dikare wê bi perestgeha navdar ya Nûzî(qata

wariya mohrên hevçax dîkin. Ew bi navê (komelka Kerkük)bi hemû tesnîfatên navnete-veyî navdar in. Ji ber ku pirraniya mohrên stûnî yê Mîtanî ji ritimên girka Nûzî hatine sergirtin. Ew girga han dikeve navça Kerkükê.

Neqşen mohrên vê perestgehê yêن ku hatine wênekirin, wek nimûne mirov li dorhêla "Dara Jînê"ê ku her û her di hunera çembera Ariyên - ciyayı de ducar dibe, dibîne. Lî li vir

ev dara han hatiye zîvirandin. Ew bi awayekî rewiştê hunera serdemê me yê nûjen(wek Sembolizm)bi bîra mirov tîne. Vê yeka han hişt ku her dara jînê mîna ku ji gulleyan peyda bûbe. Mirovên di wênan de, serpûşk û şemilkên pêladi li wan bûn. Ew di tesnîfatên arkeolojî de bi navê (cîlêن ciyayî)tên naskirin.

Ji lewre em têgihîstîn ku çîma li hember dara jînê, ya ku temsila xêrxwaziyê dike, cina-wir û xêwêñ tirm jî temsila şerxwaziyê dikin. Wek mero li mohrên 42, û 43 (Muzexana Şamê), dibîne. Li herdûyan jî meriveki rûnişti li kîleka dara jînê xuya dike. Cilêن ciyayî li wîne û mîna ku ew nimêj dike herdu destêñ wî li ser singa wî ne. Ji bilî dara jînê ku wek kornel-ka gullan berjor dirêj dibe, neqşen wênegirî du gayan tebahovî diyar dike, ku hertim nîşana şerxwaziyê dikin.

4 - Ji nirxtîrin çîkêñ di girkê Tell Xwêra yên hatine peyda kirin, çîkêñ lîskê(zar)ne, li ser rûyêñ wan niqtêñ spî hene, ew eynî wek zarêñ ku îro pê têne listin e. Her çawa ev vedigere serdema sulaletêñ kevin (nîvanî yekem yê hezara 3'an B. Z.); êdî mero têdigihîje ku ev kevintirin çîkê li cihanê hatiye diyarkirin e. U dibe ku ne tiştekî ji ber xwe ye ku li hemû dinyayê jimartina kurdî(ji yekê ta şeq), di vê listika han tê bikaranîn.

Herwekî di dawiya geryana xwe de em bêjin, ku çîkêñ din ê şahesera evê han, ji girikê Kaniya Dara(Tell Endara, Kurddax), derxistin. Ev yê ku vedigere serdemek nûjentir, ji sedsalâ 10'an B. Z.

Em ê di beşa duyemîn ya nivîsa xwe de behsa vî girikê girîng, ê ku dikeve rojavayê çembera Hûrî, bikin.

### Çavkanî:

1 - Anton Moortgat, *Tell Chuera in Norost - Syrien, rapport, 1958.* (Wergera erebî, Enstituya Arkeolojîk ya Almanî, sam).

2 - A. Moortgat, *Die kunst des Alten Mesopotamien, Köln 1967.* (W. erebî, Bexda 1974)

3 - A. Moortgat und U. Correns, *Tell Chuera, rapport, sam 1973.*

4 - A. Moortgat und U. Correns, *Tell Chuera, rapport, sam 1974.*

5 - H. Kenna, *Cylinder Seals from Syria, catalogue.* (W. erebî, Tuppengen 1980)

6 - F. Rolesch, *Antiquites Syriens, katalog,* (W. erebî, Vien 1985)

7 - Al - Mathaf Al - Arabî, No4 - 1987, (kovareke Kewêti)

8 - D. Mêgerî, *Hevpariyek di lêkolîna sehirvaniya kurdi ya kevin de, rojnama Gel(6 beş, sam 1989 - 1990).*

# ZANÎN, JI NÛDEMÊ RE DILÊ XWE VEDIKE

Selah BERWARÎ

**E** ndezyar Ebdil-baqî Huseynî, yek ji rewşenbir û nivîskarên Kurdistana Sûriyê ye. Ew berpirsiyarê kovara "Zanîn e, ku yekem kovara serbixwe û berfireh e li vir. Ebdil-baqî Huseynî, pirtûkek wî bi navê "çîrokên Mîran" heye, yek din jî bi navê "Lawir di çîrokên zarokan de" wê di nêzîk de bikeve destêñ xwendevanen.


Hevpeyivîna me ya ji bo xwendevanen NÛDEM'ê bi mamosta Huseynî re weha destpêkir:

**Selah Berwarî:** Em dixwazin Zanîn bi xwendevanen Nûdem'ê bidin nasin?

**Ebdil-baqî Huseynî:** Berî ku ez çela kovara Zanînê bikim, ez dixwazim spasiya wan kesen ku ev kovara hêja "Nûdem" derxistine bikim. Pîroz be ji dil û can, bi hêviya ku ev kovar di pêşerojan de bibe kovareke navdar.

Zanîn, her weke ku hûn dizanin, kovarek torevanî û çandeyî ye, kovarek serbixwe û aza ye. Her du-sê mehan carekê dertê. Ta niha çar hejmaren wê derketine û ya pêncan li ber çapê ye. Zanîn meydana ciridê ye ji bo hemû torevan û nivîskaran.

**S. B:** Di hejmara yekê a "Zanîn"ê, we gotiye ku ev kovar berdewamiya kovara "Gurzek Gul" e. çawa?



Berbirsyarê Kovara ZANÎN ê Huseynî

**E. H:** Rast e, me di pêşgotina hejmara yekê de nivîsandibû, ku kovara Zanîn berdewamiya gelek kovaran e, bi taybeti jî ew berdewamiya kovara "Gurzek Gul" e.

Di sala 1989 an de, me çend xortan dest bi derxistina kovara Gurzek Gul kir, kovarek çandeyî û folklorî bû, ta sala 1991 ê berdewam kir, me duwanzdeh hejmar derxistin û roj bi roj

xwendevan û nivîskarên wê pîrrir dibûn. Ta rojekê em gihan bîryarekê ku em vê kovarê fi-rehtir û mezintir bikin. çend roj di ser bîryara me de neçûn, me programa hejmara yekê a Zanînê danî.

Ev ji bîli hin rewşen dî - (Rewşen kone-vanî li nik me kurdên Sûriyê) - baş hatine zelal kirin.

**S. B:** *Ango tu dibêjî asteng di riya derxistina kovarê de nîn in?*

**E. H:** Rast e, em kovarê bi berzeyî derdi-xin û belav dikin, lê tu astengên wilo mezin em nabînin, dîsa bawer neke ku em di buharek wilo geş de ne!

**S. B:** *Ez dibînim ku kovara we li ser şopa Hawarê diçe, an ku hûn pirtûkan jî bi navê kovarê derdixin?*

**E. H:** Spas, lê pîrr maye ku kovara me bigihê Hawarê. Lê dîsan jî hêviya me mezin e. Weki din jî rast e em alîkariya torevan û hel-bestvanên kurd, di warê çapkirin û belavkirina pirtkîn wan de dikin. Ta niha sê pirtûk jî weşanên kovara Zanînê belav bûne:

1-Serpêhatiyên kurdan, Tîrêj, folklor.

2-Kîşwera şehîdan, Fethula Huseynî, hel-best.

3-Mada û Zerdeş, Bavê Helebçe, kurteçirok.

Ü çendêن din jî li ber destêن me hene.

**S. B:** *Heya niha we du hejmaren taybet, yek li ser Cegerxwîn û a din jî li ser Helebçe derxistine. Aya hîn wê hebin?*

**E. H:** Belê, wê hebin û pîrr in, weki tu dizanî me di hejmara 3-4 danibû ku dilê me heye em "Melefekê" li ser Mîr Celadet Bedir-Xan çêkin. Weki din di hejmaren hafî de em ê li ser jiyan û xebata sînemavan Yilmaz Guney rawestin... û gelek tiştên kurdî hene, hîn destne-dayîne. Ji ber vî hawî çi kovar û rojnameyêن kurdî ji niha û ta demek baş dikarin rûpelên

xwe ji materyalên xav mişt bikin.

**S. B:** *Hûn rewşa çandeyî li Kurdistanê Sûriyê çawa dibînin? Bi dilê we ye?*

**E. H:** Rewşa çandeyî li nik me kurdên Sûriyê, van du-sê salêن çûyi gavin baş avêtiye û roleke baş di warê çapkirin û belavkirina pirtûk û kovaran pêkanîye. Lê ku em bêjin ev rewş ji sedî sed bi dilê me ye, wê çaxê em ê xwe bixapînin. Lê a rast ew e; ku nivîskar û torevanên me kurdên Sûriyê em karin wan pişk bikin.

- Çend helbestvanên me ên klasik hene, mîna Tîrêj, Bêbihar û Keleş. Dîwanên wan derçûn, naveroka wan li gor wan baş e, lê li gor nivîse xort ew ne ewçend bi serketîne.

- Kortêن me ên ku bi rengê serbest jî dînîvîsinin çêbûne, mîna; Royarê Amedî, Nîsrîn Têlo, Tengezar, Alan Osman...

- Di warê kurteçirokan jî hin nivîskar peyda bûne, mîna; Bavê Helebçe, Fewaz Evdâ, Alan Osman...

- Di warê wergerandinê de jî, pîrr kes hene niha xwe pê mijûl dikin û pirtûkek jî di vî warî de derketiye. Pirtûk ya nivîskarê tirk Azîz Nesîn e û bi wergerandina Keçâ Kurd e.

- Di warê rexne û rêzimanê de jî hin hene ku dixebeitin, ji bîli çend gotarêñ rexneyî û rêzimanî ên ku di kovaran de belavbûne, diyariya dawî ku kete destêñ me, pirtûka mamosta Deham Evdîlfeteh a bi navê "Nîrînek Rexneyî Li helbestên Kurdi" ye. Di vî warî de ev pirtûka yekem e, ne tenê di nav kurdên Sûriyê, herweha li nav hemû kurdan yêñ ku bi zaravayê kurmancî dipeyivin.

- Herweha gelek pirtûkên hêja, ên têvel, li ser rewş û çanda kurdî bi zimanê erebî derketi-ne. Hin jî wan bi awayekî fermî derketine, hin jî bi berzeyî.

Ev jî navê çendek ji wan nivîskar û rewşenbiran in: Dr. M. E. Necarî, Dr. Ismaîl Hesaf, Rewşen Bedir-Xan, Nûra şêx Bekir, E. Helîm Yûsif, Taha Xelîl, İbrahim Yûsif, Dr. E. Mecîd şêxo, Heyder Omer...

11 08 1992

# FEQIYÊ TEYRAN

1590-1660

Zeynelabidîn ZINAR



Z. ZINAR

**E**v yek eşkere ye ku ji ber bindestû û dabeşkirina Kurdistanê, herweha ji ber qede-xekirina zimên jî ku ev 65 sal in li bakûrê wê, jînenîgariya gelek rewşenbir, nivîskar, helbestvan û siyasetmedarên Kurd ên kevnare tevlihev bûye û di rûpelên dîrokê de rind nayêne xuyakîrin. Belam her çiqasî di serê Sedsala Bîstî de gelek zanayêن dilovan ji bo bidestxistina berhemên dîrokî û zanîna jînenîgariya kesên dîrokî fedakarîne mezin kirine û xwe pir êşandine gelek berhem, belge û destnîvis peydâ kirine û wergerandine tîpêن latêni û wek pirtûk çap kirine jî, lê ji neteweyekî mîna Kurd re dîsa jî ew tişt hindik e û pê temamiya dîroka kurdi nayête zanîn. Ha yek ji wan rewşenbûrêن Kurd ê ku di derheqê wî de hin tarîxên cuda û riwayetên cihê têne gotin, Feqiyê Teyran e.

Navê F. Teyran ê asasî *Mihemed* e. Ew kurê şêx Evdile ye û ji Miksê ye. Gundê wî Miksê, li nêzî Norsê û Bêdarê dimîne. Ew hersê gund, di heyamên kevin de ji xwendin û zanînê re merkezine pîr mezin bûne û timî jî xwe di rûpelên dîrokê de dane nişandan.

Feqiyê Teyran di paşıya hemû helbestên xwe de, wek hemû helbestvanî navê xwe hil-daye. Wî bi piranî navê xwe bi "Mihê", "Mîm û Hê", "Muksî" û "Xoce" nivîsiye.

Bêjeya "feqe" yan "feqî" xeysetek e ji wan kesan re tê gotin ku ew kes dixwînin, yan ji xwendina xwe nîvco dihêlin û dev jê berdidin. Lê belê binavkirina vî helbestvanê hêja, ne ji wê babetê ye. Lewra ji Sedsala Nozdehan bi wir ve ci hozanek, helbestvanek yan nivîskarekî ku berhem dinivisandin, xwe bi nasnavekî didane naskirin. Wek "Xanî", "Mela-Melê", "Bateyi", "Rûhi", Xaki û gwd. Ji nîvîkarêن klasik Feqiyê Teyran û Feqe Reşîdê Hekarî ji xwe bi feqîtiyê dane naskirin. Binavkirina bi wê xeysetê, bêguman ji ber nefspîçûkdîtina wan hatiye holê.

Bêguman rewşena çanda kurdi di warê helbest û xezelan de, bi Feqiyê Teyran gelekî dewlemend bûye. Belam di helbestên wî de gelek bêjeyên kevnare hene ku niha jî xwe diparêzin û di warê edebî de jî tu kêmâsi nayête ser helbestên wî. Herweha ew helbest wisa rind û bi xweşî ketine ser zimanê xelkê ku her Kurd têdigehe. Her çiqasî ev 350 sal in ku wî koç kiriye jî, lê mîna ku ji demeke nêz ve be çûye dilovaniya xwe wisa ji xelkê ve ne dûr tê dîtin û di civat û caxiyan de, xasma di yên mele û feqiyan de timî behsa wî tê kirin.

Pêşî em ê hin jêderk ji hin dîrokzanan wer-girin, ka di derheqê F. Teyran de ci gotine:

1- Dîrokzanê Kurd xêrpêbûyê M. Emîn Zekî Beg, di *Tarîxa Kurdistan* de nivîsiye, ku: Feqiyê Teyran li Makûyê di nav salên 1307-1357 an de jiye. Ji xeynî helbest, beyt û xezelan du pirtûkê wî bi navê "Serpêhatiya Şêxê Sen'an" û "Qewlê Hespê Res" jî hene.

2- Pr. Qanadê Kurdo nivisiye ku Aleksandir Jaba gotiye: F. Teyran di 702'ê (1375-76) Hicrî de ji diya xwe re çêbûye.

3- Kovara Hêviya Welît nivisiye, ku: F. Teyran di 1302'an de çêbûye û di 1375'an de ji miriye.

4- Dr. N. Mackenzie di pêşgotina pirtûka "Şêxê Sen'an" de nivisiye ku: F. Teyran di (1000-1070) 1590'ı de çêbûye û di 1660'ı de ji miriye.

Belam di hin helbestên F. Teyran de hin tarîx hene ku ji wan, dema ew ristine zeman tê zanîn. Wek daneberheva wî û Melê Cizîrî, ku gotiye "Zanîn meddahê kî me, di hezar û yek û sihan?" Ji vê hate zanîn ku ew di 1031'ê de (1621) li jiyanê bûye. Ya diduyan jî ew malika ku wî di şîna Melê Cizîrî de gotiye. Di malikê de ji tarîx 1050'ı (1640) ye.

Tarîxeke din jî heye ku Feqî di vê helbesta xwe ya li jér de gotiye (5):

*Li "Mîm û Hê" gelek çûne  
Gelek sal û felek çûne  
Hezar sal cil û yek çûne  
Ji hîcra nebyê muxtar e.*

Nivîskarê hêja Evdilreqîb Ûsiv di pirtûka xwe ya bi navê "Şairên Kilasîk În Kurd", rûpela 29'an de nivîsiye ku: F. Teyran di meseleya Miksê, ya Cizîrê û ya Finikê de xwendîye. Xasma di ya Finikê de gelek maye. Lewra jî di gelek helbestên wî de navê Finik hatiye gotin.

Û dîsa gotiye: Feqiyê "Teyran, şairekî mezîn ê kevn e. Yek ji wan hersê şairan e ku Ehmedê

xanî di Mem û Zînê de navê wan anîye. Niha jî nav û dengê wî gelek belav e di nav kurmancan de, yanî li Kurdistana Tirkîyê, Sûriyê û li navçen Behdînan. Teyran gelek helbest nivisîne. Heta niha jî gelek helbestên wî bi destnîvis li Kurdistana Navrast belav in..."

Feqiyê Teyran mirovekî pir zîrek, zana, bîrbir, tijîfehm û xeberxwêş bûye. Wî di demê de pêre pêre dikaribû li ser bûyeran helbest biafirine. Gelek serpêhatiyê wî yên rengareng û xwêş jî hene, ku neşa mirovan pê vedibe. Yek ji serpêhatiya wî ev e: Rojekê Feqî ji jîna xwe dixeyide û ji malê diçe. Ew, sond dixwe heta ku porê wî sipî nebe venagere mala xwe. Di wê navê re gelek sal dibihurin û tu hisek jê nayê bihîztin, îcar her kes dizane ku ew miriye.

Feqî li xerîbiyê dimîne heta kal dibe, por û rîh hemû sipî dîbin û rojekê radibe vedigere diçe mala xwe. Lî belê heta ku ew diçe, jîna wî mîr kiriye. Kincine getiyayî li Feqî ne û rast diçe li ber deriyê mala jîna xwe rûdine. Ewçax jîna wî hevîr dike girêk da bibe tendûrê nan bipêje. Jinik wî nas nake, radibe ji bo karekî din dike ku here deverekê, dibêje Feqî:

- Kalê gerok, bi kerema xwe tu hay ji girêkên hevîr bimîne, heta ez têm.

Feqiyê Teyran xwe bi xwe dibêje:

- *Herê, herê! Dema ez can bûm, ez melhemâ dilan bûm. Lî dema ez bûm kalekî pîr, min dîkin notirvanê girikên hevîr...*

Li gorî hin rîwayetan, Feqî bi zimanê teyran jî dizanibû. Binavkirina wî bi "Teyran" jî ji wê yekê hatiye. Serpêhatiya wî û du kevokan jî weha tê gotin: Rojekê Feqî xwe li binê siha darekê dirêj dike û serê xwe datîne ser kevirekî ku ji erdê hinek bilind e. Di wê navê re du kevok têni li ser darê datînin. Dema kevok dibînin ku wa zilamek li binê darê xwe dirêj kiriye û serê xwe datîne ser kevirekî, ji hevdu re dibêjin: Ev zilamê raketî nizane ku kûpek zêr di bin kevirê ber serê wî de ye! Feqî dengê wan seh dike, lê hîc deng nake, piştre radibe diçe

mesela zêran ji yekî feqîr re dibêje. Ew zilamê feqîr ji diçe wî kevirî radike û kûpê zêran ji xwe re derdixe.

Helbestên Feqiyê Teyran heta niha, wek pirtûk nehatine berevkirin û çap nebûne. Belam çewa ku wî bi xwe di helbestekê de gotiye, hezar helbest nivisîne. Lî mixabin piraniya wan wenda bûne, yan jî nehatine dîtin.

Di 1985'an de çaxê min dest bi berevkirina destnivisên kevin kiribû, ji min re nêzî 250 rûpel destnivis berdest bûbûn. Di nav wan de neh helbestên Feqiyê Teyran ji hebûn. (5)

Helbestên Feqî gelekî xweşxwîn û rewan in. Tev bi kitejimar û qafiye ne. Li wan zimanekî wisa hêsan heye, ku mirov zêde ferqa wan ji xeberdana îro nake. Me ev helbesta li jêr bo xwendevanên NÜDEM ê nivisi.

## (ÇIYA ANÎ LI DEŞTÊ KIR)

Ji rengê dîlbera horî  
Gul û reyhan li min peyda  
Zerîfa şeng niha borî  
Şefeq dabû di rewzê da

Şefeq da erd û esmanî  
Li min dîlber tu astan î  
Dixwim sondê bi Subhanî  
Zileyxa bû di Misrê da

Tu çêtir î j'Zuleyxayê  
Nehin wek te di dinyayê  
Dixwim sondê bi Tahayî  
Munewwer bû di nûrê da

Munewwer bû di nav nûrê  
Kemer dabû li ser sûrê  
Ji rengê dîlbera hûrê  
Dilê min tîrekê lê da

Li min da tîrekê dijwar  
Serê tûrê di dil çû xwar  
Dema ku ez dikim hawar  
Wekî Mecnûn di deştiê da

Wekî Mecnûn dimînim ez  
Fena bilbil dixwînim ez  
Heta kengê bimînim ez  
Di hebs û hem di zîndanê?

Di hebs û hem di zîndanê  
Wekî Yûsuf li Ken'anê  
Gelo ya Reb dîlber kanê?  
Neçar mame di vê rê da

Dikim hawar dewa lê kî  
Ku bê carek derman lê kî  
Welê bejnê tu zahir kî  
Bibînim ez di cîlwê da

Bibînim bejn û balayê  
Zerîfa şeng û lalayê  
Nehin wek te di dinyayê  
Di Tebrîz û di Şamê da

Şukur j'bote, ewî çêkir  
Çiya anî li deşte kir  
Dema ku min nezer lê kir  
Meşî ew çû di xelwê da.

Li dawiya vê benda li jor de, navê Feqî  
nehatiye. Diyar e ku hin malik jê kêm in.

1- Tarîxa Kurdistan, Weşanxaneya Komal, Temûz 1977, rûpel: 181, bi zimanê Tirkî.

2- Tarîxa Edebyata Kurdî, weşanxaneya Roja Nû, 1983, Cild 1, rû: 70.

5- Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekiri, 1991, Stockholm, rû: 83.

# DENGNIVÎSARÊ SAZBENDIYA KURDÎ

Nûra CEWARÎ

**K**eda rewşenbirêr êrmeniyan di dereca ber hevkirin, çapkirin û lêgerîna folklora kurdî de mezin e. Bi saya serê wan gelek nimûnên folklora kurdî ên dawiya sedsala nozdan û destpêka sedsala bîstî gihîştine me. Ew nimûne ji bo zanyran berhemên hêja ne.

Ji wan rewşenbirêr hêja yên bîranînê Xaçatûr Aboyan, Garêgîn Srvastyan, Krîstapor Kara-Mûrza û gelekên mayin. Bo seri xemxuriya Komîtas notayê dengnivîsara mèxanîkiyê gihîştine me. Di nava wan de qinyatê dewlemend hene, ew ku ji destpêka sed-saliya me girî heta rojîn me hatine nivîsin.

Dîroka dengnivîsarê sazbendiya kurdî yê folklorî mèxanîkiyê ji sala 1905 an dest pê dibin. Cara pêşî Lûşanê alman li Berlinê dengê hêşirekî kurd nivîsiye. Bergirtina wê dengnivîsarê di enstituya Sankt-Petersburgê ya edebiyatê de tê xweyikirin.

Ew stirana xerîbiyê bi navê "qulungo" ye

Di salên 1927-1929 an de bi pêşdanîn û serokatiya asistanê konsevatorya Sankt-Petersburgê, Krîstapor Kuşnaryan, tevî nimûnên sazbendiya ermeniya, wisa ji gelek nimûnên sazbendiya kurdî têne berhevkirin.

Xên ji Kuşnaryan, tevî ekspedisya zanyariyê, sala 1927 an dibin wisa ji xwendekarê konsevatorya Êvgenî, Gîpyûs û dersdar Zinaida Evald, yên ku paşê dibin zanyar û folkloristên bi nav û deng. Ew diçin Nor-Bayazêtê, Erêvanê, Tbilisi, Gunriê. Piştî salekê Kuşnaryan tenê

diçe Zangêzûrê, Daralagyazê û Tbilisê.

Ekspedisîya sisiya sala 1929 an tê teşkil kirin. Tevî wê ekspedisiyê dibin xwendevanê konservatorya yê Haro Stêpanyan, Tigran Têr-Martirosyan û sazbendzanê eyan Yûri Tyûlin. Ew li şîrakê berpala çiyayê Elegazê û şûlavêrê diqesidin. Eserên wan ekspedisya di enstituya Sankt-Petersburgê ya edebiyatê de têne xweyî kirin. Nimûnê wan ên bergirtî li enstituya Ermenî ya hunermendiyê de têne xweyikirin.

Sazbendzan Aram Koçaryan di salên 1939-1943 an de tevî nimûnê folklora ermeniya, wî folklora kurdan ji berhev kiriye. Dengnivîsarê Aram Koçaryan ji sedî zêdetir in. Ew niha li enstituya Ermenîstanê ya hunermendiyê têne xweyikirin.

Profesorê konservatorya Tbilisê Gêorgî Çxikvadzê û xebatkarê kabînêta sazbendiya gelêri Vladîmîr Axobadzê di sala 1950 de bi berhevkirin û dengnivîsandina sazbendiya kurdî ya folklorî ve mijûl bûn. Dengnivîsarê Çxikvadzê li mala wî têne xweyikirin, lê yên Axobadzê li konservatorya Tbilisê ne.

Niha karê berhevkirin û lêgerîna sazbendiya kurdan yê folklorê va li para sazbendiya gelêri, ya enstituya Ermenîstanê yê hunermendiyê mijûl dibin.

Gelek dengnivîsarê sazbendiya kurda yê folklorê wisa ji li dengxana radyoya Erêvanê de têne xweyikirin. Rast e, ew qewlê tebyetiye de nehatine nivîsarê, lê dîsa ji nimûnê folklorê yê giranbuha ne.

Mé hay jê heye wekî gelek nimûnê dengnivîsarê folklorâ kurdî yê sazbendiyê, wisa jî li çend ocaxêñ kurdî yê kultur û di dengxanê şexsî de têne xweykirinê.

Ji van dengnivîsarên jorgotû bi kevinbûn, dereca bijartinê, naverokê zanraye dewlemed dengnivîsarê Kîstapor Kûşnaryan cihê dibin. Ew beranberê dengnivîsarên Komîtas in. Jimara wan dengnivîsaran digihîje 60'ı, ja wan 54 stiran in, 4 jî miqam in. Ew mirovên ku stiran gotine û miqam danê pirraniya wan kurd in. Di nav wan de ermeniyêñ ku zimanê wan kurdî ye jî hene. Ji wan nimûna 17 stiranêñ méraniyê ne, 4 destan in, 20 stiranê evîntyî ne, 4 stiranêñ aşikan in, dîrok û stiraneke xebatî ye, 8 stiranêñ govendê ne, 4 miqamên ser bilûrê û fiqê lêxisû. Ji nav wan gişan stiranêñ méraniyê cihêñ hêja digirin. Gerekê mîna Komîtas mezin bî wekî xwe ji stiranêñ govendê yê bi teqil û şâ şûnda bigirî û stiranêñ méraniyê yê carina melûl û ji bo dengnivîsandina nota dijwar binivîsi. Gerekê zanayê mezin bî wekî texmîn bikî hema ev stiran original in, wekî dêmê sazbendiya kurda yê miletiyê tînîne ber çavan. Wekî em hesav hildin, ku endamê ekspedisya haj deba kurdan tunebûna, wisa mezinahiya Kûşnaryan wê hê berbiçav bibûya.

Seva salêñ 20'ı gava mecalê têknîkê lep sist bûn, gava şerdîn xebatî normal tune bûn, ekspedisyarê li hev hatiye dengnivîsarê gelekî paqî bike. Stiran normal dest pê dibin, normal temam dibin, deng weke hev tê bihîstin.

Rast e, ji kevinbûn û ji bergirtinê ew hebekî xirav bûne, lê dîsa jî mirov niha dikare tekst û noten wana binivîsine.

Em li vir çend nimûnan bidin:

"Serayê" stirana méraniyê ye. Ew di derheqa wê yekê de ne, ku çawa Reşîd Paşayê tîrk gazi serokê kurdê êzidî, şêx Mîrza dike, wî dixapîne û nemamî dikuje. şêx Mîrza nemamya Reşîd Paşa texmîn dike û bi teherêki xencerekê li ba xwe vedîşêre. Gava qewazê Paşê ेrişî wî dîkin, ew bi xencera xwe donzdeh kesan jî wan dikuje, lê xencera wî dişikê û ew şehîd dikeve. Stiran bi hostefike mezin tê qedandin. Ew bi binaxa ladiyê û rêza îndonasya xeysetê stiranê kurdî yê

méraniyê tîne ber çavan.

Mêrxasê destana "Dewrêşê Evdi" Dewrêş ji aliye denbêjan ve bi nexş û nîgarê nebinayivî hatiye xemilandin. Hîmê destanê evîntyîa kurdê êzidî Dewrêşê Evdi û keça kurdê musulman Edûla Zor temir Paşayê milî ye.

Bi şaxeke vê destanê Dewrêşê Evdi şerê teví erebê gêsyâ da tê kuştin. Lê bi şaxeke mayîn Zor Temir Paşa naxwaze keça xwe bide Dewrêşê Evdi û wisa dike da ew bê kuştin.

Şaxa ku Kîstapor Kûşnaryan nivîsandiye stirana Edûlê ye, ku avêtiye ser delalê dilê xwe, Dewrêşê Evdi. Ew stiran bi dramatizmê tijî ye. Bi têkst û awazê xwe ve weke destana "Dewrêşê Evdi" nêzîki wê şaxê ye ku Komîtas nivîsi ye û di sala 1903 an de li Moskovayê çap bûye. Di herdu şaxan de jî bi nexş û awazê ges trajedyâ evînê tê ber çavan.

Stirana "Evdalê Zeynikê" bi navê aşiqê kurd yê bi nav û deng Evdalê Zeynikê hatiye navkirin; stirana Evdalê Zeynikê ku di dawiya sedsala 19 an û destpêka sedsala 20 an de hatiye afîrandin, çawa bi nivîskî, wisa jî bi zarkî gîhiştine me. Ji tekstê stirana xuya dibe ku ew dengbêjê Memed Paşa bûye û gelek caran teví aşik û dengbêjîn mayîn ketiye hucetê.

Şaxa ku Kûşnaryan nivîsiye bi sazbendiya xwe ve sext û xisûsi ye. Miqamê şivantiyê ku Kûşnaryan nivîsi ye ser haceteke sazbendiyê ye, bahar bikî edî bîkirkî-bi bilûrê hatiye qedandin. Ew miqam di aliye sazbendiyê de gelekî hêja ye û dikare di dema konserتا de bê qedandin.

Dengnivîsarê Kûşnaryan yêñ mayîn jî gelekî heweskar û hêjayî guhdariyê ne. Xêñ ji wê jî ew ji bo lêgerîna zanyariya folklorâ kurdî qinyetên baş in. Ew wisa jî dikarin di dereca pevgirêdana çanda miletan de bêne lêgerin. Ew nimûnêñ sazbendiya kurdan ku dengbêjîn ermeniyân qedandine ji bo lêgerîne gelekî heweskar e.

Wê gelekî baş bibe ger ew dengnivîsarêñ ku Kûşnaryan teví hogirêñ xwe kirine bêne lêgerin, tekst û notayêñ wan bêne nivîsandin û têkevin nava fitla zanyariyê.

# Ş A R

## Şîrîn BOZARSLAN

**H**usêن Arif di sala 1986'an de li Silêmaniye hatiye dînyayê. Li unîversîta Bexdayê avûkatî xwendîye. Herweha ew nivîskar û rojnamevan e ji. Di kovarên Rewşenbirî Nû, Nûserî kurd û Karwan de kar kiriye.

Di sala 1957'an de xelata yekemîn ya hev-beziyekê çirokan wergirtiye. Gelek çirokên wî di van pirtûkan de hatine weşandin: Le korri xebata 1959,

Kilafeyek janî tûrre 1971, Tiwesûyî seferekî sext 1975, Gele gur 1983.

Herweha xebatên wî yên lêkolînî û wergêrî ji hene. Têzek bi navê "çirokî Hunerî Kurd" nivîsiye, ku li serçiroknivîsiyê bi kurdi lêkolînek e. \*

Romana şar ya Husêن Arif di sala 1986'an de li Bexdayê derçûye. Bergê yekem li dor 390 rûpelan e. Her ew berg min xwendîye û ez dixwazim bi xwendevanên kovara NÜDEM'ê bidim naşin.

Roman bi zaravayê soranî û bi tîpên erebî ye. Babetên wê di sala 1942'an de destpêdike. Cî bajarekî Kurdistana jérin e. Daxwaza nivîskar bi giştî ew e, qala jiyana kurdan ya li bajarekî bike. Gelcên ku jiyana bajaran bi xwe

re tîne, pirr bi awayekî eşkere têb ber çavan. Ew gelc, gelcên navbera "nû" û "kevin", gelcên navbera gunditî û bajartiyê ye. Nivîskar bi qasî ku qala bîr û baweriyê kevin dike, qasî ku qala urf û adetên ku bi sed salan in di nav kurdan de bi cih bûne dike, ew ewqasî ji qala bîr û baweriyê ku jiyana modern bi dibistan, nexweşxane, kar û hwd, bi xwe re tîne, dike. Herweha daxwaza rizgariya Kurdistanê û xebatên siyâsi bi awayekî girtî be ji tê qal kirin û li hember vê yekê ji behsa rejîma Iraqê dîsan bi awayekî girtî di romanê de cî digire.

Tîştekî dî ku bi carekê ve bala xwendevan dikşîne ew e, ku nivîskar gelek cî daye jiyana keç û jinan, daxwazên wan bo pêşedemê, pêwendiyê wan û mîran, rola wan ya di malê û di civatê de. Herweha meriv dikare bêje, ku roman romana gencan e. Pirraniya qehremanê romanê genc in. Ew dizanin ku pêşedem ya wan e. Berpirsiyariyek mezîn li ser milên wan e. Li aliyeke problem û teşxeleyên ku hene, li aliyeke din xewn û xeyalên bo pêşedemê. Li aliyeke kar û xebatên têkoşînê, li aliyeke din ji müşkilên ku rejîm bi riya polis û casûsan derdixe pêş wan. Bi gotinek din, qalkirina jiyana gencan ku di navbera rastiya dijwar û daxwazên bo pêşedemê de diherike diçe, girîngirîn mexsed e ku nivîskar di romanê tîne ber çavan.

Bûyerên romanê di sala 1942'an de

destpêdike. Évarekê, merivekî bi navê Sabîrê Hemal li xaniyekî odayekê kirê dike. Li oda xwe difikire û bi wê fikrandina xwe, xwe bi xwendevanan dide nas kîrin. Huvdeh sal berê gundê xwe hiştiye û hatiye bajêr. Hatin ew hatin e. Ji ber ku yekî pîrr budele û tîral e, ew huvdeh salan li bajêr vedigezive.

Xwediyê xanî Mimike (nenê), yeka gelek serwext û serdest e. Dibîne ku Sabîr yekî gêj û bêkêr e, rojekê kar dike sê rojan radizê. Mimkê dide ser ku ew biçe kar bike û peran bîne. Li xanî kirêdareke jinebî bi navê Xawêr heye. Mimke, Xawêr û Sabîr bi hev re dizewicin û ji wê zewacê qehremanê romanê ya rola yekemîn, Miryem tê dinê. Miryem ku dibe pênc salî, Xawêr dimire. Mimke xwedikirina Miryemê digire ser xwe. Lê êdî ew li dor heftê salî ye û ditirse ku bimire û Miryem bikeve ber destan. Wisa ji dibe. Miryem hîn neh salî ye Mimkê dimire. Xeyn ji bavekî budele êdi tu kesekî Miryemê tune ew roj bi roj ber bi trajedyekê ve diçê.

Sabîr ji bo çendakî Miryemê dide cem mala nasekî xwe. Miryem li wir sivika ber destê Xanimê ye. Lê ji halê xwe razî ye. Keça malê Gelavêj, yeka têkoşer, rewşenbir û marnoste ye. Ji Miryemê re dibe wek xwişkekê, wê fêri xwendin û nîvisandinê dike, wê digihîne. Lê Sabîr, Miryemê ji cem wê malê dibe. Merivekî bi navê Hemê Kerîmê Derwêş, Miryemê dixwaze. Ew yekî cil û pênc salî ye û li şar bi navê Derwêşê dirinde(cinawir)tê nas kîrin. Tev li ku Sabîr wî nas nake, nizane ci kes e, dîsan ji Miryema yanzdeh salî bi pêncî dînarî dide Derwêş.

Derwêş yekî zalim û wehşî ye. Berê ji du jînênu ku emrên wan dozdeh-sêzdeh salî anîne, lê bi awayekî xwe ji destên wî xelas kirine. Xwişka wî Xurşê li ber destê wî wek hêşirekê ye. Ew ji mîrê wê daye berdan û ji tîrsa ruhê xwe, Xurşê gotinek wî nake didu. Şeva zewaca Miryemê, ku Derwêş ji hundur derdikeve û Xurşê diçê cem Miryemê, dibêje qey Derwêş wê kuştîye. Dest û devê wê girêdayî, di nav xwinê

de bê hiş e. Heta roja din hişê Miryemê nayê seri. Lê ku şiyar dibe, wisa tirsek di dil de ye, ku bîryara xwe daye ku carek din xwe bi destê Derwêş re bernede. Carê ku Derwêş nêzê diçê bi qelembazî dibeze nav hewşê û dibe hawar hawara wê. Xurşê bawerî tîne ku ew ê dîn bibe.

Xweştîrin rûpelên romanê ew in ku behsa têkoşîna Miryema yanzdeh salî dîkin. Herçiqasî derî kîlît kîriye û kîlît li ber pişta Xurşê ye, dîsan ji Miryemê ku kês dikeve destan, xwe bi pirtav digihîne bavê xwe. Xwe davêje bextê wî, ku wê ji dest dirinde xelas bike. Sabîrê budele şaş dibe ku çawa jînek ji mîrê wê bitirse. Pîr derbas nabe Derwêş kêrek di destan de li dû Miryemê dikeve hundur. Herçiqas Sabîr lê hêrs dibe ku bi kîrê wê netirsîne, hîn zarok e, dîsan ji bi destê Miryemê digre dide pêş Derwêş û jê re dibêje biaqil be û li mala xwe rûnê. Miryem hêviyê ji bavê dibire. Lê cîran hene û bîryara wê bîryar e ku wê ji destê Derwêş xîlas bike. Derwêş bi rojan wê girê dide, dide sondê û tobe pê dide kirin ku êdî ji malê nareve. Ku wê vedike, Miryema zarok tobê û hertişî ji bîr dike, di nav malê de dibeze, dibe zarezara wê heta ku cîran tê alikariya wê. Carinan ji xwe di ser xaniyan re davêje mala cîranan heta ku Derwêş tê wê ji wir dibe. Wisa dibe ku cîran ji ber wan têne emanê û nahletê li Derwêş û Xurşê tev tînin. Miryem dibîne ku cîran aciz dîbin îcar kûna rohnî li cem gelavêj dibîne. Di keysekê de hema hema çarlepikan, bi girîn û nalîn xwe digihîne mala Gelavêj. Gelavêja rewşenbir dê û bavan radike ser piyan û bi awayekî Miryemê vedişerîn. Edî dimînîn Sabîr û Derwêş. Derwêş jiyanay dike jehr ku Miryem li ku ye. Sabîr bi xwe ji nizane ku keça wî li ku ye. Her cara ku Derwêş bi ser de tê wek zarokekî ditirse û dilerize.

Li wir êdî xwendevan şopa Miryemê winda dîkin beta ku di dawiya romanê de bi derdekî din, îcar bi derdê evînê derdikeve pêş xwendevan. Di şûnê de gelek qehremanê din derdikevin pêş. Xurşid û Evrehman ku hevalên hev ên

pirr nêz in, têkoşer û xebatker in, Exter û xwendekar e û ew û Xurşid ji hev hez dikin, xwişka Xurşid Askol ku ji Evrehman hez dike, Westa Tayer ku xwedî çayxeneke û gelek hedise û sohbetên romanê li çayxana wî derbas dibil, birayê Xurşid Zorab ku li ber destê Westa kar dike û Westa keça xwe Nazê dide wî, Heme Şin, Ferhad, Newzed, Xulê Casû, Zayarê Casûs ku birayê Tayer e, Meciyê birayê Exter ku hevalbendê rejimê ye û gelek kesên din.

Gelca di navbera jiyana kevnar û jiyana modern, herweha gelca di navbera dilsozi, kurdîtî û tadeiyîn rejimê û casûsi pirrtir di evîna navbera Exter û Xurşid de xuya dike. Xurşid karker e û Exter jî xwendekar e. Pirr ji hev hez dikin, Exter birtyar daye ku ew yan ji Xurşid re ye, yan ji axê re ye. Lê dixwaze bibe doktor û heta ku xwendinê xelas neke dê bi Xurşid re nezewice. Herdu, pişti ku Extar ji xwendingehê derdikeve, hevdu dibînin. Gelek cara li mala Evrehman qise dikin, destê hev digirin, hevdu maç dikin, xiyalê pêşedemê û zewacê dikin. Lê mişkilek i pêş wan e, ew ji birayê Exter Mecî ye. Ew mecbûr in ku evîna xwe veşîrin. Dîsan jî Mecî bi wan dihese. Bi kesên hevalbendê rejimê, Xurşid dide birîndarkirin û Exter jî mecbûr dike ku ew dev ji xwendinê berde û bi yekî ji hevalê wî re bizewice. Mecî baweriya wî wisa ye, ku ew xwişka wî ye û bi kesê ku ew dixwaze pê re bizewicîne. Exter ji malê direve. Ew amadeye ku dev ji xwendinê berde û bi Xurşid re birevin biçin Bexdayê, li wir bizewicin. Lê hîn ku kes nedîne, Mecî bi alîkariya Zayerê casûs Xurşid dide girtin. Exter içar wek Miryemê penaberî cem Gelawêj dibe. Herweha ev gelc di evîna navbera Evrehman û xuşka Xurşid Askol de ji heye. Zayer ku xwedî mal û zarok e, çav berdide Askolê. Diya Askolê dibêje, ku ew keça xwe nade ser hewiyê. İcar Evrehman û Askol lez dikin nişan dibil û hazırlıya dawetê dikin, lê keys nakeve desten wan. Ji ber ku Zayer bi dekekê Evrehman bi Xuleyê casûs dide girtin. Evrehman salekê di hevsê de radizê.

Xebata siyasî û tekoşerî jî di romanê de tê qalkirin. Newzad, Ferhad, Xurşid, Evrehman, Zorab, Gelawêj vana hemû endamê xebatê ne, gelek caran li hev dicivin. Di rakirina cenazê şêx Mehmed de ew organiza wan a siyasi rolek mezin dilize. Derhal li hev dicivin, dikevin dewrê ku wisan bikin ku hîn zerarek negihije gel, hîn jî bi awayekî rêk û pêk termê şêx hilinin. Ci jî dikin nikarin pêşê jê bigirin ku merasima cenaze nebe raperîneke gelî li diji rejimê. Di raperînê de çend kes tênu kuştin. Gelek kesên ku birîndar jî dibil hewl didin ku neçin nexweşanê û nekevin ber desten hukûmetê. Li vir mexseda nivîskar ew e ku nebawerî û tirsa xelkê kurd li hember rejimê nişan bide.

Herweha li şar neserek pir mezin radibe û gelek xanî û dikan xera dibil, gelek kes dimirin, dîsan ew xebata van gencan ya siyasi û veşartî derdikeve pêş. Ew li hev dicivin, nexşê û pilanan çê dikin ku çawa alîkariya gel bikin. Lê carinan hin ji van gencan xwe bi vê organizekirinê ve girêdayî dibînin. Wek Evrehman. Pişti ku ew ji hefsê dertê ew dixwaze heyfê ji Zayer bistîne. Lê Ferhad ku ji kesên bilind e di xebatê de, bi navê siyasetê rê nade wî. Li aliye din ji Zayer birtyar daye dîsan tiştekî bîne serê Evrehman, ku ew û Askol negihijin hev. İcar Evrehman di nabverê de dimîne. Ya ew ê wek xwe bike û heyfê hiline, ya ji ew ê bi ya Ferhad û siyaseta wî bike.

Di dawiya romanê de dîsan Miryem derdikeve pêş. Edî ew panzdeh-şanzdeh salî ye. Keçîkek rind û nazik e. Li mala xalê Gelawêj, Wehab, dimîne. Derwêş geleki lê geriyaye. Geleki jî tade li bavê wê Sabîr kiriye, heta ku rojekê li çayxana Tayer li Westa bi xwe xistiye. İcar Sabîrê budele bo yekem car di jiyana xwe de hatiye xezebê, rahijiye bêra li tenîşa oçaxê, heta ku kuştiye lêxistiye. Ji ber vê yekê jî ew li Bexdayê ketiye hevsê û deh sal dene wî.

Wehab bere bere Miryemê jî dixe nav xebata siyasî û ji bo vê yekê carna wê dişîne

cem Ferhad. Di navbera wê û Ferhad de hezkirinek destpêdike û Wehab jî di dilê xwe de wa datîne ku wan bizewicîne. Derdê ku vê carê derdikeve pêş Miryemê, ya ku her tişt kiribû, ku wê ji destên dirinde xelas bike, Gelawêj bi xwe ye. Ji ber ku dilê Gelawêj jî ketiye Ferhad. Gelawêj û Ferhad temenê wan li dor bîst û pênc salan in, herdu jî ji zû ve di xebata siyasi de ne, herdu jî jîr û zana ne. Lê Ferhad jî Miryemê hez dike. Ji ber vê yekê jî Gelawêja ku ji bo rizgariya Miryemê hertişt kiribû, niha wisa kîneke bê eman dikeve dilê wê, ku dike bi destê wê bigire, ji mala xalê xwe bavêje der, bêje wê ku ew ji kuderê hatiye dîsan hete wir. Li vir cihê jinan di civatê de çiye piir baş derdikeve pêş. Gelawêj herçiqas zane ye, têkoşer û mamosye, dixwaze li Ferhad vebibe û hêsin xwe jê re bêje, pêşniyaza zewacê jê bike, lê nikare. Ferhad, Miryem û Wehab jî têdighêjin ku Gelawêj ji Ferhad hez dike. Miryem nizane dê çi bike. Naxwaze Ferhad ji dest berde lê li aliyekejî din jî Gelawêj jiyanâ wê xelas kiriye. Ger bi Ferhad re bizewice dê çawa êdi karibe li rûyê wê mêze bike.

Di rîpela dawî ya romanê de radyo hewadîsa derbê li Bexdayê dide. Êdî dimîne xwendevan û gelek pirsiyar. Ji Miryem û ji Gelawêj kî dê bi Ferhad re bizewice? Xurşid dê ji hevsê derkeve û bigihîje Exterê yan birayê Exterê Mecî dê wê bibîne û bi zorê bi yekî din re bizewicîne, heke ku wisa be Exter wek ku sond xwariye dê xwe bikuje? Evrehman dê heyfê ji Zayar bistîne? Rejîma nû dê ji wan re

û ji xelkê kurd re çawa be? Bersivêvan pirsiyan dê di berga diduyan de hebe ku ez hêvîdar im derketiye an jî wê derkeve.

Romana Şar yek ji romanên xwestirîn e ku min ci bi tirkî, ci bi kurdi û ci bi swêdî xwendîye. Gava min ev roman xwend ez baştir têgihîştîm ku edebiyata kurdi bi zaravayê soranî gelek dewlemend e û pêwîst e em kurdên Kurdistanâ jorîn fêri soranî bibin û bikaribin besdarê vê dewlemendiyê bibin.

31. 8. 1992

---

\* Çavkanî: Svensk-Kurdisk Journalen.

# DI ÇAVKANIYÊN SWÊDÎ DE MOTÎVÊN KURDÎ

**B**erî niha bi demekê pirtûka Mîrza Rohat ya bi navê "Di çavkaniyên Swêdî de Motîvên Kurdi" derket. Rohat ev lêkolîna xwe bi kurdîyek zelal û pakij nivîsandiye. Bi armanca danasına vê berhemâ hêja me di derheqa pirtûkê de çend pirs ji Rohat pirsîn:

**Nûdem:** *Ji bo çi te hewcedariya nivîsandina "Di çavkaniyên Swêdî de Motîvên Kurdi" dît? Armanca te bi vê pirtûkê çi bû?*

**Rohat:** Gelê kurd bi sedan sal di bin zordesûke bêhempa de maye, hemû hebûnên netewî hatine talan kirin û pêpes bûne. Di warê pêşketina çandî, edebî, folklorîk û hunerî de asteng û dijwariyên mezin hatine pêk anîn. Ji ber van sedemên jorîn, kurdan bi xwe îmkan û mecalêni amadekirina materyalên nivîski kêm dîtine. Berhem û çavkaniyên ku dikarin iro dîroka kurdan rohîn bikin, iro hêdî hêdî têzanîn, derdikevin ronahiyê. Piraniya dîroka kurdî iro di nav tariyê de maye, roj bi roj her rûpelekî vê dîrokê têzanîn. Di vî warî de berhem, çavkanî û dokumentên Ewrûpiya xwe digihînin hawariya me, gelek aîkariya me dikin û kêrî ji nû ve nivîsandina dîroka kurdan dikin. Bi saya gerok, misyoner, rohilatnas, kurdnas, nivîskar û rojnamevanên Rovjavayê; agahdariya gelek tiştan dibin. Ji ber ku wan di derheqa kurdan de, di derheqa dîroka wan ya kevin de gelek tiştîn balkêş, kêrhatî û giranbiha rokirine an ji derbasî ser kaxizan kirine. Armanca amadekirina vê lêkolîna min ya here mezin, ez dikarim bêjîm armanceke zanistî ye. Min xwest bi saya van çavkaniyên

Swêdî dilopek be ji, aîkariya ronahîkirina dîroka kurdan bikim. Ji der vê armanca bingehîn, armanceke mayin ji, min xwest ez dîroka peywendiyên kurdan û swêdiyan, kûrayî û rabihuriya van pêwendîyan piçek be ji ronahî bikim. Iro bi hezaran kurd li Swêdê dijîn, gelek kontaktêwan bi hev re hene. Ji aliyê din kurdên li Swêd dixwazin sempatiya Swêdiyan li ser kurdan zêdetir bikin, vê dilşewatiya wan bikin wek faktorekî tekoşînê. Lê belê ev kara ji yekten û bê hazîrî pêk nayê. Ji ber van dijwariyên xebatê rojane, min xwest ev xebata min bibe materiyalek. Ev yeka ji armanceke min ya mayin bû, mirov dikare vê armancê ji, wek "armanceke pragmatîk" bi nav bike.

**Nûdem:** *Di pirtûkê de ses lêkolînên cûda, lê di eynî wextê de bi hev ve girêdayî hene. Tu dikarî bi kurtebirî behsa wan lêkolînan biki?*

**Rohat:** Rast e, di vê pirtûka min de ses lêkolînên bingehîn hene, her lêkolînek bi serê xwe wek xebatekê tê hesibandin, lê dema mirov van lêkolînan di ber çav re derbas dike, ev hemû bes wek lêkolînek fireh ji dikare bê binav kirin. Ji ber ku ev hemû şes beşan ji li ser hîm û bingehîn kontakt û pêwendiyên Swêdî-Kurdan şax vedane, ava dibin. Bi rasti cara pêşin amadekirina pirtûkeke weha tu wext ji bîra min nedîçû. Dema ku dîndayîn û balkêşîya min li ser berhemên helbestvanê Swêdî Gunnar Ekelöf zêdetir bû, tema kurdan di nav helbestên wî de, ez gelek di bin bandûra xwe de hiştîm.

Li ser Gunnar Ekelöf lêkolînek dirêj min amade kir û di kovara Bergeh de weşand. Dema

ku ez li ser vê temayê kûr bûm, ez hûr-hûr fikirîm û min çend materiyal berhev kirin, vê carê bala min li ser berhemên gerok, misyoner, rohilatnas, zabit, nivîskar û rojnamevanên Swêdî tîr û berhev bû, di derheqa kurdan de van kesan ci gotine, ci nivîsine, ci berhem li paş xwe ji me re hîstine? Ez pey bersiva van pirsan ketim. Ev yeka karekî giran, tevlihev û demkêş bû. Xebata min çend salan ajot. Bi destxistina bi sedan çavkanî, materyal û berhem, li ser wan kar kirin, ji nav wan hilçandina zanyarî û ageh-dariyên hewcedar bi rastî xebateke profesyonel e, wext, imkan û sebir dixwaze. Dîsa jî min cedand, hewl da xwe weki van dijwariyan bîhîgivim, ji holê rakim, ez çiqasî bi ser ketime, divê vê yekê jî xwendevan binerxîmin i bipîvin.

**Nûdem:** *Me heya niha bi danûstendin û pêwendiyên gerrok, lêkolîner û pisporêñ rûsan, firansîzan, almanan û îngûlîzan yên bi kurdan re dizanîbû, lê haya gelekan ji me bi danûstendin û pêwendiyên swêdî û kurdan tunebû. Gelo dîroka van pêwendiyân digihîje kîjan demê? Pêwendiyên wan li ser ci ava dibûn?*

**Rohat:** Bi giştî Ewrûpa, an jî her wela-teki Ewrûpî ji bo safikirina problemên dîroka kurdî wek definekê ye. Lê mixabin deriyên van definan heta niha tam nehatine vekirin. İro em dikarin bêjin ku bi sedan an jî bi hezaran dokument, berhem û çavkaniyên li ser kurdan di arşîv û pirtûkxanê van welatan de têr parastin. Lê belê kurdên li derveyî welat hê riya deriyên van jêrzmînan serrast nekirine. Vê gavê bi sed-hezaran ronakbîr û xwendekarêñ kurd li Ewrûpa dijîn, lê pêwendiyên van welatan û kurdan bi çavekî zanistî nehatine lêkolandin, dîroka van pêwendî û kontaktan nayêñ zanîn. Wek misal dîroka pêwendiyên kurdan û yunaniyan çawa pêş de çûne, li ser kurdan ci dokument li Yunanistanê hene? Bersiva vê pirsê iro meriv nikare bide, bi baweriya min êdî pêwîst e em dest ji pêşîra "Ksenopnê reben" berdin û nasiya xwe bidin "Ksenophonê nenas". Ne tenê pêwendiyên kurdan û yunaniyan, pêwendiyên kurdan û Firansayê, Ingiltere, Almanya, Austu-

rya. . . jî, iro bi tehrekî sistematik nehatine lêkolandin. Dema sala 1978'an de lêkolîneke lêkolînvana Italyê Mirella Gualletti li ser kurdan hat weşandin, bala gelek kurdnas û rohilatnasan kişand(Binêre:Kurd-Kurdistan di çavkaniyên Italia yên sedsalê 13-19'an de, Kovara Oriennt Mederno, hejmar 11, 1978). Ev cara pêşin bû li ser pêwendiyên kurdan-Italian lêkolîneke ku dihate amade kirin. Her çiqas na-veroka vê lêkolînê bi sinorkirî bû jî, dîsa jî di warê xwe de xebateke yekemîn bû.

Kurdistan û Swêd du welatên ji hev gelek dûr in. Lê çawa em dibînin angorî meş û rêveçûna dîrokê di navbera kurd û swêdiyan de çend pêwendiyên cuda-cuda peyda bûne, ew nêzîkî hev bûne. Her swêdîki ku çûye Kurdistanê angorî armanca çûyina xwe bi kurdan re pêwendî danîne. Di nav van kesan de gelek mirovên navdar jî hebûne, wek gerrokê li hemû cîhanê naskirî Sven Hedin û serokê Komîsyona Musilî E. af Wirsén. . . Dîsa ji bo bazirganiya Firansê li Rohilatê pêş de bibe, rohilatnasê swêdî Johan Otter di navbera salê 1736-1743'an de diçe Kurdistanê, di dawiya vê gera xwe de pirtûkeke gelek giranbuha dinivise (Veyoge en Turquie et em Perse, 1748, Paris). Ne tenê Swêdî çûne Kurdistanê, çawa em ji çavkaniyan fêr dibin, di salên buhurî de çend kurd jî hatine Swêdê, di sala 1894'an de hatina Dr. Mirze Seîd. . . Ev kontaktan navbera swêdî û kurdan de di sedsala 19'an de zêdetir bûne, di sedsala 20'an de her çûne pêş ketine û heta niha jî ev pêwendî bê navbirî berdewam dîkin.

**Nûdem:** *Beşek ji pirtûkê li ser helbestvanê swêdî Gunnar Ekelöf e. Te di sernava lêkolîna xwe de Gunnar Ekelöf wek helbestvanê "mûrê Kurd" daye naskirin. Gelo Gunnar Ekelöf li ser kîjan Mîrê Kurd û li ser kîjan demê nivîsandiye?*

**Rohat:** Helbestvanê Swêdî Gunnar Ekelöf, (1907-1968)di derheqa dîroka imparatoriya Bîzansî de heweskari û intreseke wî ya mezîn hebûye. Hertim ji listikên Bîzansî nefret kiriye. Çawa tê zanîn di sedsala 11'an de li dorberê

sînorêن Imparatoriya Bîzansı ya Rohilat gelek eşîrên kurd jî dijîyan. Şerê Malazgirê(1071) di navçeve ku kurd tê de hebûn, teqîya, ev şer di navbera Bîzansiyân û Selçukiyan de derbas dibû. Di nav vê teq û reqê de kurdêن koçer jî perîşan dibûn, carina jî mecbûr diman, jî bo xwe biparêzin derbasî aliye kî dibûn, piştgiriya ordiyekê dikirin. Gunnar Ekelöf jî bo ku politîkaya Bîzansiyân protesto bike, dîroka van salan di ber çav re derbas kiriye, rewşa kurdan jî daye ber çavêن xwe, kurd çawa di navbera du agiran de mane, hemû ev yekanâ gihandine hev, jî xwe re mîrekî bi navê "Mîrê Emigîonê" afirandiye, peyda kiriye. Ev mîr mîrekî kurd e, di rastiyê de mîrekî wisân tuneye, tenê mîrxas û motîvekî edebî dikare bê hesibandin. Lî belê merc û hoyêن dîrokî yêن ku dora vî mîrê kurd di destanê de berevbûyî çawa em jê derdixin jî realîteyên dîrokî pêkhatine. Ekelöf wek nivîskar imkanêن dîrokî û edebî gihandine hev, ev destana xwe ya navdar pêk anîye. Ev destan, enînivisa kurda, perîşanî û janêن wan yêن sedsala, geleki bi serfirazi radixe ber çavan. Ezîyetêن ku li Istenbolê li vî mîrê kurd dibin û rîwîtiya wî ya ber bi Kurdistanê bi rastî dibe kakiîê bedewiyeke herf destanî.

**Nûdem:** Te berê du pirtûkên hêja "Kürdoloji Biliminin 200 Yillik Geçmişî" û "Çağdaş Türk Edebiyatında Kürtler" bi tirkî derxistine. Lî te ev pirtûka xwe ya ku ji 163 rûpelan pêk hatîye bi kurdîyek pak û zelal nivîsandiye. Gelo ev kare ji kesen ku dibêjin: "Bi kurdî pirtûkên lêkolîn û yêن siyasi nayêne nivîsandin" re bibe derzek?


**Rohat:** Zimanê kurdî bi taybetî zaravê kurmancî carina wek zimanekî devkî, zimanekî gundiyan, an jî wek zimanekî folklorik tê hesibandin. Bi baweriya min iro zimanê kurdî

gelekî bi pêş ketiye, wek zimanekî jîndar û modern gelek têri nivîsana lêkolînê dike, wek pêşketina her zimanekî, zimanê kurdî jî, di proses nuh re derbas dibe, zelal û hêdi hêdi standart dibe, dikeve qama xwe. Lî belê wek her zimanekî bê dewlet, bê televîzyon û radyo, bê zanîngeh û universite, zimanê kurdî jî carina di warê ifadekirin û termînoloji de me têr nave, îmkanê fireh pêşkêş nave, lê dema mirov rastiyê bigire, ev yeka ne qelsbûn an jî xizanbûna zimanê kurdî, zordestiyêن li ser ziman-civatê eşkere dike, bifikirin heta duh li Tirkîyê berdin nivîsin, dengkirina vî zimanî jî qedexe bû û vê janê jî bi salan ajotkiye. Eger iro lêkolînek bi kurdî tê nivîsin, jî aliyê xwendevanan dikare bê fêhm kirin, ev yeka nîşan dide ku zimanê kurdî iro wek zimanekî edebî dikare bê hejmartin. Ji bo ku pêwendiyêن di navbera nivîskar û xwendevanan li ser hîm û bingehêن hevtîgihiştinê pêş de diçin.

**Nûdem:** Niha tu li ser ci dixebeitî? Pilanêن te yêن pêşerojê ci ne?

**Rohat:** Niha li ber destê min xebateke li ser Yaşar Kemal heye. Tema kurdî di nav berhemên Yaşar Kemal de cîhekî çawa giritiye? Di vê lêkolîna xwe de, ez dixwazim bersîva vê pîrsê bidim. Ev lêkolîn li ber qedandinê ye, vê payizê li Istenbolê di nav weşanên Firat de bi navê "Di Nav Berhemên Yaşar Kemal De Realîta Kurdî" wê bê weşandin. Li rex vê lêkolînê ez li ser Ziya Gökalp jî kar dîkim, bir û baweriye Ziya Gökalp, pêwendiyêن wî bi kurdan re, di destpêka sedsala me di nav tevgera politîk de rola wî û gelek pîrsên mayîn di vê lêkolînê de ronahî dibin. Ev pirtûk jî disa di nav weşanên Firat de bi navê "Jana Ziya Gökalp Ya Herî Mezin: Kurd" wê bê weşandin. Ev herdu xebatê min jî, jî bo çapê ez dikarim bêjim êdi amade ne.

# KURD Ú KURDISTAN DI NAV PIRTÜKA ZANYARÊ GURCÎ DA



Tîmûrê XELÎL

T: XELÎL

**V**an dawiya, bi hevdudîtina min ya bi kurdên Gurcistanê re, ez pê hesiyam ku sala 1979'an li paytextê Gurcistanê ji aliyê weşanxana Uniwersita Tibilisê ya dewletê de pirtûka zanyarê gurcî yê bi nav û deng, akademik şeta Mexsia, ya bi navê "Rewşa politiki ya hundur û di sedsa 12'an de qeyde û qanûnên li Gurcistanê. Di vê pirtûka ha de malûmatên heweskar di derheqa kurd û Kurdistanê de hene. Min hêvî ji camêreki kurdê Gurcistanê kir ku wê pirtûkê ji min re bişine. Min ew pirtûk van rojan girt û perça di derheqa kurdan de bi wegera kurdî ji bo xwendevanê NÜDEM'ê dişinim.

\* \* \*

"Dawiya sedsala 12'an, nîveka sedsala 13'an ya pêşin di nava politika Gurcistanê ya hundur û der de mirovên diwana padışayê here bi nav û deng malbatâ Mixardzêliya bûye.

Weke dixuye karkirina wê malbatê rolek mezin di dema serkarîkirina Tamara padışê de leyist. Pêwîst e kivş bikin ku karkirina Sargisê Mixardzêli û lawêni wî Zekeriya û Ivanê (bi kurdî Zihar û Ibo, T. X.) yêni ku hindava diwana padışê gelekî amin bûn. Zekeriya karekî mezin ji bo azadiya wan herêman kir. Ew herêmên ku

berê di bin nîrê tîrk-selçûkiyan de bûn, wî ew gîhadin Gurcistanê.

Bi gora dîrokzanê Tamara padşê, giregir û beg û beglerên zêni û helaliya Mixargrdzêliya bilind qûme kirine.

Hewaskare pîrsa esil-esasê Mixargrdzêliya:ji îzbatiyêni dîrokî xuya dibe, ku pêşiyêni Mixargrêliyan zureti qebileke kurd bûne. Ewana hela ser axa kal û bava ayîna dinê xaçparêziyê qebûl kirine. Lema mecbûne dest ji welatê xwe bikşînin û di nîveka sedsala 11'an de cîguhastî Pişkafsê bibin.

Mixarrdzêli xurû paşnavê bi awayê gurcî ye û dide kivşê, ku hela demêni buhûrî da ew malbatâ kurda welgeriyaye, bûye gurc.

Dîrokzanê gurcî yê mezin Ivan Cavaxîşvîl gotiye, ku Mixargrdzêli kurd in û eva yeka ji sedi sed e, hela em dikarin bêjin, ku wasan e, weke du caran dudu dike çar û di vê derecê da munaqşekirin bê mane ye.

\* \* \*

# R. QUTBEDÎN

Amadekar : F. PÎRBAL

**R**emzi Qutbedîn yekêke le baştîrîn huner mende nîgarkêse kurde newjenekanî emro. Le sereta da be realîzm dest be kar kird, paşan rûy kirde rîbazî derbirinxwazî (Expressionisme) û karî grafik.

Jiyani pêşmergeyî û jayanî trajediyi xelik, herweha mergesatî mirovî kurd û rûdawe xwênaviyekanî Kurdistan be quly û be naziky le tablokanî da rengî xoyan dariştiwe.

Tablokanî Remzî Qutbedîn jiyani tarîk û sextî neteweyek, wêraneyî û darûxanî niştimanêk, be çawêkî rengin û hunermendaney zirav pişan deden.

Remzî Qutbedîn le salî 1955, le Xaneqîn le Kurdistanî Iraq le dayik buwe. Diplomî peman-gay Hunere Ciwanekanî Bexday wergirtiye le salî 1975 da.


Pêşangehên Remzî Qutbedîn:

- 1976- Xanêqîn, Kurdistanî Iraqê
- 1979- Sulêmanî, kurdistana Iraqê
- 1979- Melbendî roşinbîry î kurdî le Bexda; Roma(İtalya)
- 1980- Al- Methef Al- Watanî, Bexda.




R. QUTBEDÎN

- 1981- Sulêmanî, Kurdistanî Iraqê.
- 1983- Kurdistanî Azadkiraw (Heledin, Malûme...)
- 1984- Meydanî Azadî, taran, Iran.
- 1988- Taran, Iran.
- 1989- Sine, Kurdistanî Iran.
- 1989- Salonî Pirozî, Sêqiz, Kurdistanî Iran.
- 1990- Ensûtuî Kurd le Paris; Albî(Ferensa); Espace UVA; A: A: P: K: F. , Parîs.
- 1991- Sarcelles(Ferensa); Albî(ferensa); Mosaïque d'exposition artistiques, Galerie Wazemmes, Lille(Ferensa); Maison des association de Paris; Chatean de Baillen, Conde (frensa).
- 1992- Generation 95, Forum des Cholettes, Sarcelles(Ferensa); Galerie associative la Seranne, Montpellier; Centre de Confereces internationales, Paris; maison des artites de Graz (Austriche).




Resim



**Resim**

# NIMAD U SIMBOLI OSTUREY LE ŞIİRÎ MEWLEWÎ KURD DA

Ehmed ŞERİFÎ



E. ŞERİFÎ

**O** stûre yan mîto yan be kurdî xomalî renge bilîein, efsane besêke le bîr û bawerî here konî çax û dewrangeli seretayî mirov ke payda bûnî. Le gel famkarî însan dest pêdeka û hawlîfî mirov dewran û mecal gelê cor be corî mêmjûyi bîrewe û geyîwete serdemî ême û heta mîroviş, le sergoyezwî bijî ostûreş hawjiyetî li rastî de, ostûre nîşanderî bîrkinewew halsûkewtî barî ayîmî û komelayetî û mêmjûyi û tenanet ramiyarî û aborî însanî dêrîne û rûwangeh konekanî dexoyî de parastûwe û geyîwete çaxî me, emro le akademî û meko ilmî û zanistîyekanî cîhanî da girîngiyekî ewto be ostûre dedêrê ilmî ostûrewanî, yan mîtolojiya be çawêkî rêzewe seyrî dekirî û le ber ronahî zanistî em ilme seyrî hels û kewtî mirov û edebiyat û gişt layenekanî jiyanî dedirê.

Belaw daxî giranim, le nêw ême yî kurd da ke xawenî gencîneyekî mezînî ostûreyin, mîto û efsane ne teniya gîringî pê nadirê. Belkû le waneye bêjîm bê ewêye le barî zanistî doxeke bigeyn, berberekanîşî degel dekein û agadarî zanistî mezînî mîtolojiya nîn. Her lem bûwareşdaye ke heta êsta bo nimûneş tuwêjewaniyekî mîtolojiyane, le edebî kurdî da ber çaw nakewe. Eweş kelên û boşaiyekî zor gewre ye le edebî kurdî da. çunke êmey kurd,

her neteniya xêwî ostûreyî nêwcaneyn, belkû beşêkî şerîke malîşin le gel gencîney ostûrey Iran û gelanî pêdestî Iran.

We tenanet behoy ayinza kon û dîrinekanî wek metiryalî sirûstî û enosor perestî mîtîraizmewe, têkelawiyekî berbilawman le gel ostûrey gelanî Yunan û Romî bastanîşa heye. Renge her lem bûwareşdabê ke nawî hêmdê le xuwa û jînxuwa here derînekanî Rom û Yunan û Hind û êstaş le Kurdistan da her mawin. Bo nimûne Ako, Aso, Sirwe, Siwa, Ayîn- Dira, Seryas, Nahîd, Anna, Taûs, Mars û temûz û deyan wise nawîtir. . . Ke her yekem bo xoy nawî yekêk le xuwa û jînxuwa. Kanî geli Hind û Iran û Rom û Yunan bûn.

Em naw xuwayane êstaş le kurdewarî da her mawin û dejin.

Ew nawane û be sedan û hezaran nawîderînîstir ke le kultur(kelepûr) û helbestî kurdî da ne teniya dengdaneweyekeyî firawanî yan heye. Belke nawîn bo zor cêge û mekan û mekoy wek şax û kêw, çem û rûbar û gund û dê. Ca seyr ewe ye ke zor car bir û endêşey ewan çaxanîş le hekayet û serbûrî û serguzeşte û razoy kurdî da ber çaw dekewê.

Ez le ruwangeyekî mîtolojiyanewe serincêkî serpêyanew helbest û diwanî Mewlewîm Kurdîm dawe û em reçele endêşaneyem têda kirduwete pênc(5)bes.

1- Wuşenaw û bo çûnî dewranî mîtraîzm de helbestê Mewlewî da.

2- Wuşenaw û bo çûnî dewranî PALEWA-NI helbestê Mewlewî da.

3- Nimad û endîşeyî dewranî ZERDUŞTAYETÎ... .

4- Nimad û simbol û Rûdawekanî serdemî Sasani.

5- We serencam bir û bawerî ayînza konekanî kurd de helbestên Mewlewî kurd da.

Lêre da emin zor be kurtî perjawmeser layenkanî pêncane çunke le rastî da eger pîyaw biye wê be urdî û têr û tesel ewane lêkdatewe kurd wetenî batimanêkî kaxez û umrekî nûhasayî wext dewê.

A. Wuşenaw û bo çûnî dewranî mîtraîzm le helbestî mewlewî kurdî da.

1- Simbol û nimadekanî dewranî mîtraîzm û ostûreyimîtraeyet çend calê le qalibî wûşeda le helbestî Mewlewî da. we ber çaw dekewê. Bo nimûne wûşegeli (Suweil, Xurşid û Mêhraw) pêwendêkî twawayan le gel Ayînzayî konî mîtraîyetewe heye.

Wûşey mîhiraw, le ferheng û ostûrey mîtraeyet da be manayı perstge û pîri mezîni rêberî ayîzayeke hatûwe. Em wûşeye paşan le çiwarçêweyî ferhengî İslâmî da bote(Mihrab) û le farisî da bote(Mihrab) û le kurdî da le bîçimî Mêhraw û Mîraw debîndirê.

Mewlewî sererayî ewey ke wûşenawî Mîraw le bîçim û sîmaî İslâmî da be kar hanîwe:

Rû ne paî mîhraw henasan serd (Diwanî Mewlewî lapereyi 154) yan ce goşeyî mîhraw mizgî pakewe (La. 155).

Em wûşeyey le şikil û qewareyî mîtraeyetis da be kar hînawî. Wek de fermuwê. Murşid Mîraw ser coy badeyî leyl (la. 265).

Em diyar de suwênge ayînzayî her tenîya le wûşey (Mêhraw) da qetîs nemawî, belkû wûşey (Sûweil) ke nawî esitêrey berebeîyanî kurdevarî û suweneke le Kurdistanî Iraq da, pêwendêkî rast e û xoy le gel (Xurşid) mîtaizimewe heye û palgeyî em dozeş fermûdey Mewlewî ye:

çun suweil Rewneq pencey Aftab (La. 427).

Em pêkewe hînan û pêklikandînî (Suweil) wek peykî hatînî (xor) iş her wisa endîşeyekî mîtraîzime ke le derûnî Mewlewî da helcemiwe.

(Xor) ke simbol ô nimadi pîrozî ayînzayî mîtraîzime, le helbestî Mewlewî da be şêwe gelî (Xurşid, Xor, Hetaw, Aftab û Aftaw) da debîndirê. Belam sereray em bo çûneş, Mewlewî ew wûşaney le çiwarçêweyî ûfân û ayîni İslâmî da be kar hînawî.

B. Wûşe û birî dewranî palewaniyetî le helbestî Mewlewî kurd da.

2- Mewlewî berze birî ferawej, her neteniya le genciney dirîri ayînzayî konî mîtraîzimî kel wergirtûwe. Belkû nimad simbolekanî dewranî palewanî û ostûrey here konî gelanî Arîyayı pêdeşti İranwiçîsi le helbestekanî da we ber çaw dekewê û le şêwegeli cor be cora sudî lê bînîwin.

Wûşekanî(Key, Cem, Camîcem, Newroz, Awiheywan yan Abiheywan).

Nimûneyekin lew nimad û simbolaney ostûreyane ke le helbestî mewlewî da hene.

Ewaney pêwendêkî aşkaraîyan İranewe heye. Mewlewîş le helbest û honrawekanî da, em nimad û simbolaney le şîmayî serekî û resenî xoyiyan û qewarebendi İslamefi da be kar hînawîn û tenanet hêndê car awîtey yekdişî kirdün:

Suleyman Cahê, Camcem nîgahê.  
Sikender sahê, Dara dergahê (La. 507).

Awî jiyan yan awî hayat ke yekêk le

nimade here derfîn û konekanî îsan e bo zalbûn  
be ser dêwe zimey merg da, le efsanew ostûrey  
zorbey her zorîgelanî cihanê da (Duniya da)  
dengdaneweyekî yeksanî heye û mirovî xakî  
deyewê bem armance biga ke enêrey neman le  
beyn berê û jêwarî û jiyyarî hemîşeyî bo însan  
çê bika. Wek serekîtîrin arezûy îsanî le efsane û  
ostûre da heye. Estaş ke êstaye em awate le  
derûni însan da her dejî û mirov dexwaze rew ar-  
manbajêrekî weha bilwê ke merg û nemanî tê  
da nebê.

Le efsane û ostûrey gelanî ûran da, her wa  
Hind û Yunan da em awate bew peri biarjoyî  
gewaye û le qalib û qewarey ostûrey beder bûwe  
û çote qalibî xuwanekanî efsaneyî ew gelenewe.

Rengdanewey ajûwan bere Armanbajêri awî  
jiyan le helbestî Mewlewî da le ser heman  
endêsey dîrînî binaxe rîj bûwe.

Netûrey manî aw heywanî (La. 311) yan  
wêney goy hubab aw heywanî (La. 496)

Le herdu beyte dêr da, Mewlewî heman  
awatî konî însanî palewanî nawê kirdotewe û  
armancî awî heyat û jiyan bûwe, bo berberekanî  
de gel neman.

Wûşekanî (Key, cem, cam cem, Newroz) iş  
ke her kam bo xoyan nuwêngayekî dewranî pa-  
lewanîn le helbestî Mewlewî da be heman  
manay kon û dîrîn û awatî zûyîn be kar hatûn û  
tenanet hîç kamışiyan qeware gorîyan be ser da  
nehatûwe û le bîcîm û şîmay nimad gelî  
îslamefi da helbest be karî nebirdûn û nawerokî  
serekîyan parastûwe.

C: Nimad û endêsey dewranî Zerdûştî le  
helbestî Mewlewî kurd da.

Nimad û simbolekanî dewranî palewanî  
dunyalîsm û şêwanî çax û tafî fire xudayî  
têkelew mîto û mîtogiî serdemî Zerdûştî madî  
debin.

Besêkî serekîyan cil û bergî nimadî ostûrey  
Zerdûşt û Avesta defoşin û le pêdeşti berînî  
îranwîce da ferheng ferheng û ostûreyekî nuwê  
serhelde da, ke êsta be ferhengî Zerdûştî û ede-  
biyatî Avêstayî be naw bange.

Em ferheng û edebeş be hemî taybetmen-  
diyekîyewe maweyekî zor seranseri pêdeşt û  
felatî ûranî kon da degirê û awîtey jiyanî gelanî  
herêmeke dehêw û le kelepor û edebiyatî paş  
xoy da rengdedatewe.

Diyardedîtûrîn nimadî ew ferhengeş êsta  
renge pîrî muxan bê ke wek pîrêkî sîma pakî  
nûranî û Yezdanî le ferhengî kilasîkî gelanî  
îranwîç da cîwar bûwe:

Xak pay Hezret Pîr Muxanem (La. 28),  
Mewlewî her neteniya xakî pay Pîrî muxan  
bûwe. Belkî le nimad û simbolekanîtîrî edebiy-  
atî Avêstayî û Zerdûştayetî wek (Meyxane,  
bade, peymane, piyale, saqî û cam) iş le helbes-  
takanî da kelkî wergirtiwê û be deyan car le  
şêwe û bîcîmî coraw cor da sudî lewan bîniwe,  
ke hêndê car le sîmaw nimad serekî da palaştey  
herbestî kirdûn.

Awir yan be fermûdey pîrman (Ayir û  
Ahîr) iş nimad û simbolêkîtîrî edebiyatî ostûrey  
Zerdûştayetî û Avêstayî ye, ke le helbestî  
Mewlewî kurd da debîndirê.

Em nave zor car belîkanewey wek (Ayir-  
dan, Ahîrdan, Ateşge û Ateşga) le helbestî  
Mewlewî da hatûwe ke qewarekeşî her heman  
manay dîrînî debexîse û xêwekeşî (Eherîmen)e.

Belam wûşe nawî Eherîmenî xêwî agir, le  
helbestî Mewlewî da sîma û rûwaleti îslamî  
peyda kirdûwe û bote(şeytan).

Newî we riş xend soxirmey şeytan (La. 64)  
cige leweş 8diw) ke yekêk le nîhad û nimade  
pelidekanî ostûrey çaxî palewaniyw û awîtey  
ostûrey ferhengî Awêstayî bûwe, le helbestê  
Mewlewî da heman bîcîmî pelid û napakî  
bedferî dîrînî parastûwe:

Refiqim meynet, enîsim dêwen(La. 393) her wek çon dêw le ayinî mizdeyesina da sîmâyî negatîvî peyda kirdûwe, her bem şeweysel le helbestî Mewlewî da cêwar bûwe.

Cige lewaney ke lem beşe da basim kirdin, wûşen û nawşegali (Manî, qeqnus, huma, tawis û semender)ış nimad gelêkî mêtjûy konin ke le helbestî Mewlewî da rengdanewyan heye. Tenanet Newroz deka û debêje.

Sebizen sosenen Newroz gulanen(La. 473)

D: Simbol û rûdawekanî dewranî Sasanî de helbestî Mewlewî kurd da.

4- We belam de helbestî Mewlewî û çamekanî da her teniya dendarnewey. Ew çax û dewrananey ke basiman kirdin weber çaw nakewê, belkû le nimad û simbolekanî ostûrey dewranî Sasanî bew peri şewayewe kelik wer-girtûwe û honrawekanî pê rengnawe kirdûwe.

Le buwareş da dekirê diyar da bo (Bêsitûn, Ferhad û şerîn, Xusirew, Perwîn û çogan. . . ) bikeyîn.

*Ga we bêsitûn hestî bînawî(La. 91).*

*Yan dest (şirîn)ış mawero we yad.*

*Ferhadî ne taq fergeyek Ferhad(La. 92).*

Her wek dezanîn pêwendêkî qol û ostûrey le nêwan bêstûn û Ferhad û şirîn heye û ser bûri ewan sêyen bote beşêkî serekî le efsanî keleporî ostûrey gelanî iran û her yek bûne nimad û simbolekî le nêwan komelanî herawî xelik da.

Ca diyar e ke Mewlewîş bê guman le nêzikewe bêstûnî gerdinkeşî wê çem wîniwe, bo bîrewerî û jayenewey em ostûreye û palewanî serekî karesateke Ferhad be (Nale yî Ferhadîy Zamet Sexten La. 416) yad dekat û (şirîn)î girawişi le heman simbol û nimadî ostûrey da feramos naka.

Leyla, Asa, Nazê, şirîn Cemalê(La. 482)

Cemalî şox û şengî şîr^an le nimadî ciwanî da û rencî Ferhad le nimadî bêwerîda, ke Mewlewî basî lêwe kirdûn nîşanderî ostûreyekî

konî em ser zewiyeyen.

*Hiç kes newaço we Ferhad renden  
Neqîş şîrînîş ne rûy şeng kenden*

C: We belam serencam bîr û bawerî ayiza-kanî konî kurd de helbestî Mewlewî da.

5- Mewlewî her çend be bîr û bawer miro-vekî musulman û Arif safiyekî xawen rîbagzge bûwe.

Belam be hoy mekoy jiyanî dêwr û berîyewe, ke her le konewe melbendî pîrozi mitolojiyay ayînî û ayînedîrene. Kanî kurd bûwe û le Hewreman û Goran da jiyawî û gewre bûwe û hamûşoy xêlatî soran û goranî herêmekey kirdûwe.

Kemta zor kewtote ber sowêngey ayînza konekanî devekerê be şeweysel ke nimad û simbolekanî ew baweraney le helbestî kanî da be zeqî diyar in û heta radeyekî zor endîse û ostûrey ayînzay kakeyî û yarı û ehli heqê le honrawekanî da bekar hênaue.

Yekêk le nimad û simbolekanî ayînza kon-ekanî kurdî wek Yezidi, Hesareyi, Yari, Kakeyi û ehli heq rîz û keramefi taybetîye bo Hêzretî Eli.

Heis û kewtî asayî û rojaney hemû dîn û kone ayînzakanî kurd be nawî Ali, ya Ali, medet ji Ali, yarı le Ali, yarmeti ce Ali dest pêdika û remzi em yarixwaziyeş be ya Ali meded dest pêdike.

*Medet ya Ali pey sefer ker meyl.*

*Menzîl we menzîl ta menzîgî leyî(La.502)*

We nimadêkitirîem kone ayînzayane be giştî wûşey(yar) û (yarî) û (yaran) e.

Ke Mewlewîş em wûşeyey zor car wek nimadî dîne konekan be kar hênaue:

*Badey bêwadey fenam werde bo sert, bo kamîn sert? Yaran kirde bo(La. 144).*

We yan:

*Camê ce meacûn derd ew garan*

*Dord wa mendey bezmekey yaran(La. 150).*

We yan:

*Bezmêman cem bo çûn herde caran  
Binoşin camê we yad yaran(La. 105).*

Lem sê beytan da cîge le wûsey yaran ke peyvekî mîtolojîyî ayînza konekanî kurd e. Basî(mey)îkiş deka ke (yaran) şert û mercî pêdebesitin. Ke le rasfî da renge mebestî (mey-cemxane) bê ke le rîbâzî kone ayînekanî kurd da suwêndî pê dexon û şertiyyarî pê be cêdênin.

Le beytî eweli dêri sêyem da diyarde dekate ser bezmî mey noşînî cemxaney ayînza konekanî kurd û be rîzewe yadi lêwedekat.

Em şêwe endîşey katê le helbestî Mewlewî da guljo debê, ke deçête rejawî kerend û awaye pîrozekanî yarî û ehlî heq debîne.

Dîdem (rêjaw) Ruxsarim (zerde) in, ci dax (yaran) û (Pîran) im kerden(La. 354).

Lêre da (rêjaw, zerde, yaran, pîran). Her çiwar nawî gund û awayî gelêkin, ke le nizîk gorî pîrozî (Babayadîgarî) rîberî ehlî heq û kakeyî helkewtûn.

Mewlewî katê deçête ser gilkoy. Babayadîgar bewperî sozî derûnewe be çameyekî (18) beyti sitayışî Babayadîgar deka.

*Xeylê melûl im ya pîr hîkmetê.*

We yan:

*Hîmetit baîs resgarî bo, yar bo, diyar bo,  
yadîgarî bo(La. 29).*

Lem sê dêre helbestan da wûşegeli (Pîr, yarı) her tik Remzî ayînî kakeyî û yarı û ehlî heq in, ke be simbol û nimadî zorbeý ayînza konekanî kurd be Hisawdêñ sereray hemû ew qisane, mebestî serekî min ew e niye ke bêjîm xuwa nexuwaste Mewlewî musulman nebûwe û lader bûwe.

Belkû amancî min tenîya tuwêjewanîyekî kurtî mîtolojiyane bûwe le helbestî Mewlewî kurd da û bes, her lam bûware da eger basî sitayışî Yezdan û pêxember û yaranî le helbestî Mewlewî da bikein û şikirêtewê renge mesnewî asayek bibê.

---

*Ew wûtare bo kongirey rîz nan le Mewlewî  
amade kirawe ke le nîwey duhemî mangî  
gelawêjî 1371 (August 1992) da le şari Saqîzî  
Kurdistanî Iran da pêk dê.*

# LE SER SEKOYEKİ SARD DA

Ferhad PİRBAL



F. PİRBAL

Beyanî baş, ey tale tişke narinciye-  
kan!

Beyanî baş, ey xelbe xelbe aware,  
taze le xew helsawekan!

Beyanî baş, ey tirîfey sipyana  
mandû,  
Jeng û tep û toz lêniştwekan!

Min; ew derge mîhrebaney  
Ke hemû rojêk lêyewe derdêm,  
xoşim dewê.

Derga, wate:asûdeyî. . .

Derga, wate:  
şexkirdinî dîwarekî estûrî nezok  
Berew aso na aşin bê rehendekan  
Berew heware sehenge efyûniye  
axleyekan.

Min hezim dekird pele hewrek  
bim:  
her tinokêkim le daristanek sewiz  
bibêtewe,  
çîngek xol bim ya gerdelûlêk:  
her daneyekim le le pêdeştek çaw  
bikatewe.

Hezim dekird wek wişîye trêyek,  
dilim  
Her denkek;  
Be liqî dirextêk  
Be gwêçkoley kîçêkewe helbiwa-  
sim,  
Be çira y berzî seqamêkewe.

Hezim dekird kize ba bim  
Le ser rêga awarekan da  
Fita lêbidem, sema bikem.

Ah!  
To, taze çitir  
Ne daykit ma, ne dezgîran  
Ne malit ma, ne nîştiman, -  
Ey şîrrî bê enway bê hedadan!  
Jiyan

Le ser em seko sardewa dest pê  
deket.  
-Beyanî baş. . . !



## GUNAH

Min û to  
ke le yekтир cuda bûynewe:  
"Cuwani"  
teniya mayewe.

## NAW

Gijarîna  
Gîrajna  
Gerjaniya  
Geyrenaja  
Garanîja  
Graynaja

Nawit zor giran e: GRANIJA!

## LE SER ZEMIN DA

-Asiman  
As. . ma. . n. .  
A. . s. . m. . a. . n. .

## BEHZEX

Le tenişt ciwanîye mîhrebanekan da  
Le tenişt bextewariye bexşendekan da  
Le naw nwêñ da, le tenişt maç, le tenişt  
pêkewe xewtin da

Em hemû nisko û na ramîye  
Em hemû azar û eşkenceye!

## K

Agir be aw dekujêtewe.  
Dilî min be mirdin,  
Teniya be mirdin.

# SIYAMED Ú XECÉ



K. BERZ

Koyo BERZ

.....  
**O**sire di aşiqê vija ravêreno. Vengê bermî şino aşiqî, aşiq yeno Xeci heti û ci rê wina vano:

- Xatûn, xatûn, xatûn a xaseki tî ya ci rê bermena? Se biya to, qandê çiçî no bermiyê to?

Xaci vana:

- Dîha se bo mi, qndê çiçî nêberma? Kosbesi pay dê waştedê mi ro, waşteyê mi kemer ra perna, dikda kemeri ya dardê qiznawêri ser o verda. Darê qiznawêri pîze di sî war mîyane di vijya. O yo cêr di darda qiznawêri ya naleno, ez o nêseñe xo ey resna, ey bireyna û dirbeta ew bipêşa.

Aşiq xo çewt keno, hetê cêrî ya winiyêno û Siyamedî vîneno. Hal Siyamedî di nêmendo û dest ra şîyo.

Aşiq vano:

- Xatûnê, ez zana ti kam a, ti Xec a, Xeca Resûlî ya, xasek a hewt dewan, waya hewt biratyan a û weştiya Siyamed ê Silifî, keleşê serdê koyan a. Siyamedê to di, waştedê to di diha hal nêmendo, ti a darda qiznawêri ra bireyna jî, o a dirbet a nêreyêno, bêrî mebermi û çimanê xo kori meki. Ti hewna zaf lazim a. Siyamed şî ez esta. Ez aşiq a, ez niqara û zirna cinena, zey xatûnana winêna to ra û to warî kena. Ez nêverdan a destê to awda honihi ra

awda germi, awda germi ra awda honiki kewê. Finê çimdê girotu ya bewnî mi ra, çiçî yê mi Siyamedî ra kemî yo?

Xeci hêrs bena vana:

- Aşiq rayda xo ra şorî! Derdê mi xo ra mi bes o, ser o jî ti derd û kulanê mi tê ra meki!

Aşiq vano:

- Xecê, ma çiçiyê mi kemî yo? Bewnî Siyamedê to keçel o, ez keçel jî niya. Ey şemşerdê xo ya, xencerîda xo ya, keleseyda xo ya nam dayo û name giroto, mi jî niqara, lûfî û zirnada xo ya nam dayo û name giroto. Qandê çiçî tî ya razi nêbena û qebûl nêkena.

Xecî vana:

- Aşiq, ez o to rê vana rayda xo ra şorî, mi hêrs meki û cinanê mi meya mi sere. Dinya zano ez Xec a, Xeca Resûlî ya. Eger ez çiyê rê vaja "nê" hetan merg jî "nê" yo. Bê Siyamedî destnadê kesî do destê min a nêneyo. Bê virarda Siyamedî virarna mi mi rê heram a. Dinya zano ez ci ïnad û êks a. Mi dezadê xo rê, lajdê Mirdê şikakî rê va "nê", ma ez do rê vaja "e". Mi vêşî bêrihat meki, mi rihat ver di û rayda xo ra şorî!

Aşiq vano:

- Ez zana ti Xec a, keyna Resûlî ya, waya hewt birayan a. Ez zana to zeriya xo verdaya Siyamedî i ti Siyamedî ra hes kena, labrê Siyamedî di hal nêmendo. Zaf xo ver bido, seatê yo, bahdê seatna çimanê xo gêno û şino a dinî. Ti do teniya bi seredê xo ya nê koyan ser o se kera.

Hetan merg ti do bê mîrda bimana û por sipe kera. Keyê to jî çîniyo ki ti şira, ti do kuçar ra rezil û kepaze ba. Ez nêba do jewna bo. Kes to rihar nêverdano. Hendik to di na xasekey bibo û ti genci ba, kes to ra fek nêviradano. Jew do şiro, jewna do bîro to dimi kewo. Ti do o wext mecbûr bimana jewî rê vaja "e". Hendik xeber a kesî ci ra çîniya û kes pey nêhesiyayo qebûl biki. Bêri vêşî înadey meki û mi xo rê waşte ki, ez zey xatûnan a winêna to ra û qenê to rê serevde nêkena. Ti jewnaya bijew jiya, do hergi roj to rê serevde kero û vajo:

Ti erd o mendibîya mi ti girota, diha ti Ellay ra çîçî wazena.

Xeci vana:

- Aşiq to zaf kerd derg, mi to rê va bê Siyamedî destna do destê min a nêneyo.

Xeci hebê dişmişî bena, heq dana aşiqî. Eger weş bimano zaf merdimî do dimi kewê. Wexto kes jî çîniyo ci bipawo û ci rê paşû bivijîyo. Kişîtê ra hêrs û eciz bena, kişîtê ra heq dana aşiqî, ayeften a aşiqî ser û aşiqî ra wina vana:

- Reca kena to ra, ti na mesela ra fek vira di û goştareya mi biki. Nika ez do jî xo çê kera Siyamedê xo ser û ey a piya gan bida û bimira. Wextê ko ez xo berza dardê qiznawêrî ser dardo bişikî yo û ma do kemer ra biperê cêr û cêr di gan bidê. Cayo ki ma kewnê û mirenê, wa mileti wijay kiş a, yanî kemerî ver di inîyê aşano û tasêda awi pa kero. E ki benê aşiqê pê û pê ra hes kenê û nêşenê ê pê bê, wa bîrê nê inî ser o, a awi ra hergi jew tasê awi bisimê.

Xeci wina vana û dana piro şina diyardê kemerî ya vindena, veyn dana vana:

- *Lo, lo, lo, lo Siyamedê mi lo lo.*

*No do jî biyameyê ma sere di*

*Felekî do wina bikerdê ma.*

*Ma do wina qanik biyayê û bicewiyayê.*

*Aşiqî do ewro mi rê nê qisey bikerdê.*

*Zalîmî do ma ser o wili bivarnayê.*

*Lo lo Siyamedê min o bêqeder lo lo.*

*Wa Xec a to to rê qurban bo.*

*Wa mi rê heme çî gûniya xozî bo.*

*Wa sondê mi, zey sondê to yê qestelî bo.*

*Bê to vira mi kesî rê virari nêbo.*

*Zeriya xo teniki meki,*  
*Cado xorî ra axî manci.*  
*Hawar meki û nalî manci.*  
*Adir a zerîda min a kulin a mefîni.*  
*No qederê ma yo, wina nûşneyayo.*  
*Wa Xec a Resûlî, waya hewt birayan,*  
*To rê qurban bo, to ver a biçarneyo.*  
*Se beno dest beri xo,*  
*Hebê sebir biki, bipawi,*  
*Xec a to ya to dimi yena.*  
*Ez to tenîya,*  
*E dardê qiznawêrî ya nêverdan a.*  
*Siyamedê mi, dest beri xo,*  
*Xo ver bidi. Vira ra xo mi rê aki.*  
*Xeca to ya yena, xo to resno.*  
*Vira ra xo aki, mi virarda xo ki*  
*Ü pêt pêt xo ra pêsi!*

Ü ya ya Ellâ vana, xo pîzî ser, veñî ser vira-dan a

Siyamedê xo ser.

Gilê qiznawêrîyo ki pîzedê Siyamedî di şî war, o qil

pîzedê Xeci di jî şino war û miyanedê ci di keno teber.

Xeci jî pîzî ser kewna Siyamedî ser. Wirna pî ya pê ser o gildê qiznawêrî ya manenê.

No fin aşiq kemerî ser ra şino û yeno.

Xeci rê û heskerdenda Xeci rê ecêb maneno, mat maneno. Hend winêno şıwaneyêno vija ra ravêreno.

Veyn danoşivanî û vatena Xeci şıwanî rê vano.

Vatenê Xeci şıwanî rê va tepey a wina vano:

- Ma ez reci rinderî ya? Ma gûniya mi ê Xeci şîrinêrî ya? Ma ez hendê Xeci bi cesaret û camêr nêbena, Xeci xo eşt Siyamedî ser? Ez do jî xo berza Xeci ser, wa emrê mi jew deqîqe bo, wa o jî Xeci ser o pir bo û temam bo. Wa destê mi Xeca neyo, bedenê mi bedendê ay ser o bo, wa qez jî inan a pî ya bimira.

Aşiq jî xo cor di erzeno Xeci û Siyamedî ser, o jî gildê qiznawêrî ya maneno. Gilê qiznawêrî damîş nêbeno û nînan bin di şikyêno.



Hîrê heme dikda kemerî ra perenê, kemerî ver o gunenê erd ro.

Wexto ki nê diki ra perenê, hewa ra destanê xo hetê pêya derg kenê nêşenê destanê pê tepêşê. çimki wertedê nînan di aşiq beno.

Wexto ki gunenê war ro, Siyamedâ kiştena. Xeci kiştena a kewna û no aşiq jî kewno wertedê wirnan. Wexto ki nê kewnê hewna gan Siyamed û Xeci di beno. Erd o nê wirna hetê pê ya destanê xo derg kenê. Senî kenê senî nêkenê nêşenê pê resê û destanê pê tepêşê. Aşıq wertedê nînan di nînan rê beno bend û nêverdano pê resê destê ci pê nêresenê, erd o derg manenê û no hesab a gan danê.

Nê manzarayê nînan hemî, şiwane cor di kemerî ser ra vîneno.

şiwane kemerî ser ra gedûk o yeno war û şino meyitandê nînan ser. Wexto ki destanê nînan hetê pê ya derg biyaye vîneno, adir kewno a zerîda ci lanet waneno aşiqî rê. Damiş nêbeno nînan ser o zey qeçkan a bermenô.

şiwane şini keye ra zengen û huweyê nao û dest bi aşanayış dê tirbandê nînan keno. Tirbi aşaneno û nînan herûnda ci di keno tiebi. Nê kerdi tirban, nîmî tepey a, lûliya xo tewredê xo ra vejeno û dest bi lûlîcînayîşî keno. Wexto ki lûli cineno, kodê Sîpanî ser o ci cin cinawir aşnaweno, yeno goştarey keno û ci rê bermenô.

Wexto ki şiwane izah keno, veno:

- Wexto ki aşiq xo erzeno darda qiznawêri ser dar şikiyêno, nê hîrê heme kewnê. Wexto ki kewnê, Siyamed û Xeci wirna hewa ra destan hetê pê ya derg kenê.

Siyamed wina vano:

- Xecêê, Xecêê, Xecêê!

Hîrê finî pê ser o qîjeno. Xeci jî qîjena vana:

- Siyameed, Siyameed, Siyameed!

şiwano vano: Qîjînîda nînan ra virûsîki akewtî û hewrî guray. Erd û azmîn tê tewrlerza. Di Bewranê sipey nînan ser ra peray, qertelêdo cilinî jî nabî nînan dimi. E bewranî rihê Siyamed û Xeci bî, o qertelo cilin jî felek bî.

No şiwane hema ca ra xeberi keno vila û vaten a Xeci ïnan rê vano.

Wextê do zaf kilm di xeberi hema .ca ra bena vila û merdimo ki pey nêhesiyêno nêmaneno.

Bahdê wextêna him tîrbda Siyamedî ser o him jî ê Xeci ser o gulêri benê kihoy û gulî akenê, boyâ ê gulan çorşmey ra bena vila.

Tîrbda ê aşiqî ser i jî teliyê do siya beno kihoy. Wexto ki nê guleri benê kihoy û gulî akenê, hetê pê ya gilanê xo derg kenê û wazene pê resê û pê ra pêşiyê. No teliyo siya wertedê wirnan di vila beno û nêverdano nê gilê gulêran pê resê, pê ra pêşiyê û pê boykerê.

Hergi seri mengda gulani di, nê gulêri benê kihoy, abiyênenê û hetê pê ya gilanê xo derg kenê ki pê resê, ema no teliyo siya wertedê nînan rê bend beno û nêverdano nê pê resê û pê ra pêşiyê.

Yê ki ra kes kenê û benê aşiqê pê yenê tirbanê nînan tewaf û ziyareti kenê. Tirba Siyamed û Xeci bena ziyaretgehê pê heskerdan. Qefle qefle merdimi yenê û şinê.

Gama ki heskerdey, aşiqbiyayey, şiwaney û raywanî yenê tirbandê nînan ser, nînan tewaf kenê, kardiya xo ancenê û nê teliyê siyay birnenê, cikenê. Ema wexto ki nê gulêri benê kihoy û abiyênenê, no teli fina wertedê nînan di beno kihoy, nêverdeno nê pê resê. çend birnenê bibirnê, fayde nêkeno, no teli fina peyser beno kihoy. A roj heta ewro merdimo ki wazeno pê ra heskerdoxan pê ra abirno yan jî meseleda aşiqan miyan kewo û ïnan rê bend bo, ey rê vanê "Ze teliyo siya" . . .

.....

---

*Pirtûka Koyo Berz, Siyamed û Xecê di nêzik de bi zazakî derdikeve.*

# GEDEDÊ WEDATÎ RÊ

Mihem HİMBELIJ

Bihwi..!  
Wa çimê to yê rindî nêbermê  
Eşqî reydi jiyan ra bewnî  
Insanî ra,  
nefret mekî.  
Ayê ki,  
pî to kişt.  
însanî nêbî,  
Qîmetê jîni,  
hinda heywanan zî çiniyo  
Heywana zî,  
Merhemetê jîni esto.  
Zaf,zaf...  
Hetenî ki,  
şenê.  
Hezbîkî însanî ra  
bawer biki  
aw çax  
hezkerdoxî to  
pî to  
Ze ki,  
Yew hewnêdo şêrîn di bo.  
Rehet,  
Se yew gula sûrî  
çimkî  
Armanca delalî  
însanî ra hezkerdis,  
û ìnasenetey bî.

## YEW HÊRIS

Yew hêrsi,  
Mi çiman ro hamey.  
Belkî kêfana bi,  
Belkî zî.  
Telûyo ki girtan mîyan di bi.  
Kam ci zano?  
Qethîna,  
nêbo,nebo ha!  
Ti mi ra perskê.  
Dest tepiştoxî ra persî.

1991,Stockholm

9-5-1992

# NÜDEM

No 4 1992

Kovara Hunerî, Edebi û Çandî

Xwedî û Berpirsiyarê Giştî: Firat CEWERÎ

## NAVEROK

ÇEND GOTIN - Firat CEWERÎ .....	3
Jİ BO MUSA BEG - Can YÜCEL .....	6
DI STIRANËN KURDİ DE NAVÇEKE EROTİK - ROHAT .....	7
STIRANA MEZRA BOTA - Medenî AYHAN .....	29
EVİNEKE MELODRAMİK - Hesenê Metê .....	32
RIYA HÈVIYÊ - Hazim KILIÇ .....	38
PAYÎZA ÇIYAN BÜKA AGIR - Ehmed HUSEYNÎ .....	43
Jİ AUSTRALYA: ROJBAŞ Û KUŞTINA... Şahînê B. SOREKLÎ .....	46
KULİLKËN BÊRONÎ - M. Efîf HUSEYNÎ .....	60
DARA HINARÊ A LI SER GIRIK - Yaşar KEMAL, weger: Dr. POLOÇO .....	62
LI WELATÊ MIN - Medenî FERHO .....	72
ŞORBE - Edip POLAT .....	73
KENGÊ - Eskerê BOYIK .....	77
ÇIROKA JYANA MIN - A. Hicri Îzgören, weger: M. Baran .....	78
KURTEBEHSEK JYANË Û ELÎ HERİRÎ - Zeynelabidin ZINAR .....	82
TU ÇÛYÎ, ÇÛYÎ - Férikê USIV .....	89
ÇIROKA JYANA MIN Û XELATA NOBEL - Firat CEWERÎ .....	90
QEHREMANËN KURD LI ZÎNDANË MIN DÎTIN - Laleş QASO .....	104
ÇIROKA JYANA MIN - Cemşid BENDER .....	105
AZAD ŞEWQÎ - Amadekar: D. MÈQERÎ .....	108
EV XWÎN - Arvain WERTA, weger: Mervanê KELEŞ .....	110
KURTEJIYAN Û HELBEST - Derwêş M. FERHO .....	111
HUDA SABRÎ; TABLOYEK RENGÎN Jİ KURDISTANA SÎRÎN - Muayed TEYIB .....	113
APÊ HORO - Husêن HEBEŞ .....	116
XORTANI, BARAN - Eric FYLKESON .....	119
JIYAN Û HEVPEYVÎN - Xelil DIHOKÎ .....	121
DUBARE MIRAR BÛNE - Fazıl Umer SALIH .....	124
HEVPEYVÎN BI HAFİ QAZÎ RE - Revdar MIZÛRÎ .....	126
GERREK AGEHÎ LI CİGEHËN HUNERA KURDİ - Dilower MÈQERÎ .....	128
DI SÎNEMA KURDİ DE BÜYEREK NAVNETEWÎ ... - Husêن DÜZEN .....	132
NÜDEM FORUMA HEMÛ NIVISKARAN E - Petra WARZEL .....	135
KOMPETENS - Nûri ALDÛR .....	136
DANASINA KOVARAN - Lokman POLAT .....	138
GERAN BEDWAY WILATEKİ TAZE... - Ferhad PIRBAL .....	144
GEDEDÉ WEDATÎ RÊ - Mihem HIMBËLIJ .....	150
BI ZEHMETEY A AMEYO - Koyo BERZ .....	151

Hevkârên Swêdê: Xelil Dihoki, Muveyyed Teyib, Dilower Mêqeri. Hevkârê Danvard: Weşanxaneya Xanî û Bateyi. Hevkârê Almanya: Husêن Düzen. Hevkârê Belçika: D.M.Ferho. Hevkârê Fransayê: Ferhad Pirbal. Hevkârê Australia: Şahînê B.Soreklî. Hevkârê Tirkîyê: Dr. Cemşid Bender. Hevkârê Ermenîstanê: Eskerê Boyik, Tûmûrê Xelil. Hevkârê İranê: Ehmed Serifi.

Navnişan: Gamla Landsv. 36, 740 41 Morgongåva, Sweden. Telefon û Telefax: 0224- 61 428. Postgiro: 636 36 25-2. Şerdên abonetiyê: Salek, Swêd 190 skr. Welatên din: 39 \$.



**Tabloyek Huda Sabrî**

# ÇEND GOTIN

Firat CEWERİ



**N**iha, gava ez van çend rêzikan dini-visinim, ez car caran hersê hejmarêN NÜDEM'ê yên kevin didim ber hev, pelên wan di ser hev re diqulupînim û hin bend û nivisan ji nû ve dixwînim. Û ez di dilê xwe de dibêjim: "Vaye hejmareke din jî li van zêde dibe". Di salekê de nêzîkî pêncsed rûpelên bi kurdî. Pêncsed rûpelên hunerî, edebî û çandî. Bi dehan navên nû, di ser pêncî re nivîskar û hunermendêñ kurd. Pêncî endamên malbatekê di NÜDEM'ê de gihane hev, milêñ xwe lê wergerandine û ji bo rohnîkirina civata xwe, yên bi helbestêñ xwe, yên bi çirokêñ xwe, yên bi hevpeyîñ û lêkolînêñ xwe pêncî nivîskar û hunermendêñ kurd yên ji her cih û deverêñ Kurdistanê û dînyayê rabûne ser lingan. Ew bi xurtî dinivisînin, bi xurtî li ber xwe didin. Ji pênuşa wan hesret û evîn, ser û aşî, xweşî û nexweşî, bindestî û azadî dizêñ. Dilê wan geş e, hêviya wan xurt e, pêşeroja wan rohnî ye. Erê, pêncî nivîskar û hunermendêñ kurd. Pêncî kulilkêñ xwezaya me ya bi reng. Pêncî bilbilên dengx-wes... Û nêzîkî pêncsed rûpelên bi kurdî.

Lê di gel vê jî NÜDEM hê zarokeke biçûk e. Ew hê nebûye yeksalî jî. Ew tenê nehmeñî ye. Ew di adara 1992'an de hatiye dînyayê, di temûzê de ji qolincan azad bûye, di ilonê de

diran derxistine û niha jî bi çarpiyan dihare, xwe bi deran ve radipelikîne, dixwaze rabe ser xwe û bimeşe. Erê, NÜDEM'a nehmehî li ber rabûnê ye, dike bi ser lingan bikeve. Ew li ber dilê me şerîn e, li ber dilê me delali ye. Ew pêşeroja me ye, dewleta me di serê wê de ye. Loma jî berî xwe em li wê difikirin. Em dixwazin ew têr be, bi kinc be, bi xwarin û vexwarin be. Em di xwazin ew di nava heval û hogiran de bi rûmet û serbilind be. Em naxwazin ew hewcedar be, stûxwar be, belengaz be. Erê, NÜDEM mîna zarokeke biçûk e. Lê wê mezîn bibe, vaye mezîn dibe. Ev zaroka biçûk a delal zaroka me hemî kurdan e. Ketina wê ketina me, rabûna wê serfiraziya me hemîyan e. Loma jî divê em li wê xwedî derkevin, em wê biparêzin, em wê bijînin. Ew wesiyetnama ku Celadet Bedir-Xan ji me re hîştiye, divê em vejinin. Em bikin ku xwişka HAWAR'ê NÜDEM'ê bibe gula welatê me. Bi hebûn û bêhna wê ya xweş welatiyêñ me sermest bibin, keçen me yên ciwan li dora wê dîlanê bigirin, şêhîdîn welatê me di gorren xwe de bi rehetî binivin, stiriyêñ wê xewa dijminêñ me birevînin.

Werin, em zaroka xwe ya biçûk bigihînin, bûkeke delal jê derxînin, wê bixemilînin.

NÜDEM ne ya yekî an duduwan e, bi gotina Petra Wurzel ew foruma hemû nivîskaran e. Rûpelên wê ji hemû hunermend û nivîskarêñ kurd re vekirî ne; ew meydana kultur, edebiyat û hunera kurdî ye. Herkesê ku dixwaze di wî warê jibîkirî de fêdeyekê bigihîne gelê kurd û vê valahiya salan dagire, bila bifermin, tevî refê me bibin.

\* \* \*

Wek herdu hejmara pêşî, hejmara sisiyan ya NÜDEM'ê ji baleke baş û erînî kişand. Kovar û rojnameyêñ kurdî di rûpelên xwe yên kulturê de cih danê, ji her çar perçeyêñ welêt û ji gelek welatêñ dinyayê name û pîroznameyêñ xweş û delal hatin. Ji ber ku me hê biryara weşandina nameyêñ xwendevanan nedaye û em ê nikaribin nameyêñ we biweşînin, em ji we lêborînê dixwazin. Lî em bi çar çavan li bendî pêşniyar, rexne, şîret û hevkariya we ne. Herweha em difikirin, qet nebe, em ji salê carekê bi hejmareke taybetî re hemû nameyêñ ku di hundurê salê de hatine çap bikin.

Weke xwendevanan, nivîskarêñ kurd ji bi dilgermiyekê nêzîkî NÜDEM'ê dibin, bi nivîs û bendêñ xwe yên hêja rûpelên wê dixe-milînin. Lî em ji kûraniya dilê xwe ji hin nivîskarêñ xwe lêborînê dixwazin, ku me ji tunebûna cih nivîsêñ wan hiştin hejmara pêncan, ya biharan 1993'an. Nivîskarêñ kurd yên zîrek yên ku besdariya hejmara çaran kirine, bi kurtayî ev in:

Rohat li ser erofîzma di stiranê kurdî de dis-ekine û di stiranêñ kurdî de rola memikan tîne ziman. Ew bi vê lêkolina xwe ya ku zêdeyî şêst çavkaniyan nişan dide, tabuyekê dişkîne. Bi "Stirana Mezra Bota" Medenî Ayhan dîroka

Kurdistanê radixe ber çavan û têkoşîn û berx-wedana gelê kurd tê de dicivîne. Hesenê Metê bi "Evîna Melodramîk" bîranînê kal û pîrekê dihûne. Ev beşa ku di civata me de jîrbûyî ye Hesenê Metê bi zîrekî derdixe pêş. Hazim Kiliç wek nivîsêñ di hejmarêñ bûrî de, di vê hejmarê de jî nivîseke balkêş "Riya Hêviyê" nivîsandiye. Ew di vê nivîsa xwe de dadikeve kûraniya dîrokê, zulm û jenosidêñ li kurdan hatine kîrin û di wî warî de rola helbestkar û nivîskaran tîne ziman. Ü dibêje." Îro firnex jî dê bibe helbst û stiran, dê bibe roman"... Ehmed Huseynî bi şarezabûna xwe ya bi listina gotinan disa derdikeve pêş. "Payîza çiyan...Bûka Agir" banga Hekarî ye. Wî ev helbesta xwe ya dirêj bi peyv û gotinêñ nepi-jayî hûnandiye û mîna çemekî ji jor de diherikîne jêr, fiahînê Bekirê Soreklî li ber vê pêla ha radibe, bi jiyana xwe ya balkêş û bi "Kujtina Du Mirovîn Belengaz" derdikeve pêş me. Mehemed Efîf Huseynî jî bi helbesta xwe "Kulîlkîn Bêronî Yêñ Biyaniyan" tevlî refê Nûdemê dibe. "Dara hinarê a li ser girik" ku kurteromeneke Yaşar Kemal e û bi wergera Dr. Poloço besê wê yê pêşî di hejmara me ya dudan de çap bûbû, li ser xwestina xwendevanan Dr. Poloço hemû besê wê wergerandin. Ev roman di derheqa şerpezeşî û belengaziya çend peyayêñ çiyyâyi ku li çûkûrovayê bê kar dimînin, de ye. Medenî Ferho pişti bêdengiyeke dirêj bi navê "Li Welatê Min" bi helbestekê xwe davêje meydana edebiyata kurdî û sala 1980 bi bîra me tîne. Edip Polat ku bi pirtûkêñ xwe yên tîrkî navdar e û yek ji biyologên Tîrkiyê yê herî zîrek e bi "şorbe" besdariya Nûdem'ê dike. fiorbe, serpêhatiya malbatekê û çikûsbûna sermiyanê malê bi zimanekî zelal û tasvîrên xweş hatiye ziman. Eskerê Boyik bi dewama helbestên xwe yên hejmara bûrî, di vê hejmarê de jî bi navê

"Kengê" bi helbesteke xwe berdewam e. A. Hicri ûzgören ku bi xwe li Diyarbekirê dimîne û bi tirkî çend pirtûkên helbestan çap kirine û ji aliyê rexnegiran ve hatiye pesinandin, bi çiroka jiyana xwe û bi du helbestêن xwe besdariyê li vê hejmarê dike. Hem çiroka jiyana wî, hem jî helbest ji aliyê M. Baran ve hatine wergerandin. Zeynelabidîn Zinar di şaxê xwe de her berdewam e. Wek tê zanîn wî di hejmarêن bûrî de jî her carê klasîkî kurd daye nas kirin. Di vê hejmarê de ew ji bili jiyana xwe ya balkêş, Eliyê Herîri bi me daye naskirin. Ev besa wî ya klasikan berdewam e. Fêrikê Üsiv ku xwediyê çar-pênc berhemên hêja ye û ji kurdê Sovyeta kevin e, bi helbesteke kurt "Tu çûyi, çûyi" bi me re besdariyê dike. Pirsa ku her nivîkar behsa çiroka jiyana xwe bikin ji mêt ve di serê min de bû. Di vê hejmarê de di gel neh-deh hevalan min ji behsa çiroka jiyana xwe kiriye. "Swêd, Nobel û Xelata Wî" bûye mijara nivîsara min. Lales Qaso di girtîgeha Diyarbekirê de li mîrxasên ku ji bo azadiyê giyanê xwe dîkin qurban rastê. Serpêhatiya Cemşid Bender bala me dikişine surgunêن kurdan. Mervanê Keleş du helbestêن şairê Meksîkî Arvain Werta wergereandine û me dike şirikê derd û kulê wî. Derwêş M. Ferho ku bi stiranê gelêri mezin bûye, di kurtejiyana xwe de ew ji xwe re kirine çavkanî. Mueyed Teyib "Tabloyeke fîrîn ji Kurdistana Rengîn" ji me re tîne û çend berhemên Hudaya delal pêşkêş dike.

Helbestkarê Swêdî yê navdar Eric Fylkeson bi du kurtehelbestêن xwe mîvandariya NÜDEM'ê dike. Di "Apê Horo" û "Paytona-Vegerê" de Husêñ Hebeş du tipêن cihê pêşkêş dike. Xelîl Dihokî di kurtejiyana xwe de vedigere fiirnexê û Dihokê û me dike şirikê kêfxweşî û xemgîniya xwe. Paşê ew Fazil Umer Salih bi me dide naskirin û di avêtina duşeshê de me dixe heyecanê. Revdar Mizûri berpirsiyârê kovarê "Hiwa" û "Ronahî" Hafî Qazî li Austurya dibîne û pirsan lê direşîne. Hafî Qazî di bersivêن xwe de me dibe salêñ 1960'î û me dike şahidîn gelek tiştan. Dilo-wer Mêqerî dîsan li cîgehêن hunera kurdî yêñ kevin digere û hin bermayêñ medeniyeta kurdan ku heta îro jî hebûna xwe parastine ji me re diyar dike. Husêñ Düzen filmê Nizametîn Ariç nîşanî me dide û jiyana wî radixe ber çavan. Petra Warzel di nameya xwe de behsa girîngiya zimanê xelkê dike û di hin xalan de me hişyar dike. Li ser girîngiya pisporiyê Nurî Aldur bi nivîsa xwe ya "Kompe-tens" radiweste. Lokman Polat hemû kovarê kurdî û yêñ kurdan ku li Tirkîyê derdikeve li hev dixe û hejmarêñ wan yêñ dawî bi me dide naskirin. Ferhad Pîrbal bi kurtejiyana xwe ya bi soranî û bi çiroka xwe ya "Byaban" derdi-keve pêş me. Mihem Himbêlij bi sê helbestêن xwe yêñ bi zazakî û Koyo Berz jî bi nivîsa xwe ya bi zazakî "Bi zehmetey a ameyo" besdariya vê hejmara me ya çaran dîkin.

# JI BO MUSA BEG

Can YÜCEL

Musa Anter di derma me de  
Selahadînê Eyûbiyekî  
nû bû  
Ger şûrê wî yê ku hevrêşim dibire  
hebe,  
Yê Musa Beg jî tırkiya wî,  
Û ew kurmanciya wî ya xweş hebû  
Cihê ku herkes peya diçûyê  
Ew bi çûmîn xwe yên zirav  
bi bazdan diçû

Musa Pêxember di nav pêlên derya sor de  
gihiştibe peravê

Ew bi biratî, bi biratiya dinyayê re  
gihiştîye

Hêşirên ku ji bo Musa Beg dirijin  
Gulleyên heftber in  
yek bi yek

---

Can Yücel iro yek ji helbestkarêن Tirk yê herî mezin e.  
Wî ev helbesta xwe ya jor di kovara çandî, edebî û hunerî  
"Evrensel Kültür", hejmara yanzedahan de weşandibû. Me  
ew ji bo xwendevanêن kurd ji tirkî wergerande kurdî.

"Kesê orta du dila û çar çavan xeber dide  
bira xêrê-wayê qet nebîne"

---

## Di Stranên Kurdî De Navçeke Erotîk : MEMIK



L'Eternelle Idole (Auguste Rodin 1840-1917)

---

*ROHAT*

### EVÎNA DIL ZORA HER TIŞTÎ DIBE (Amor Vinsit Omnia)

Folklor neynika serpêhatîya civatekê ye. Mirov dikare gelek rûcik, alî û rengên pêşketina civatan di vê neynikê de bibîne. Hemû zane, pispor, rohilatnas û Kurdnasên ku li ser folklora Kurdi sekinîne, xebitîne, hemû di warê dewlemendîya folklora Kurdi de hevbawerî ne. Bi taybetî edebiyata Kurdi ya devkî (zargotin) pir dewlemend û rengin e. Lê mixabin ev edebiyata ne bi temamî hatîye berev kirin, ne jî lêkolînên têr-tijî, zanistî li ser van

materîyalêñ berevkirî hatine pêk anîn. Dema mirov vê folklorâ devkî raçav dike, wek mîsal rewş, cih û rola jinan di nav vê edebîyatê de gelek bala mirovan dikşîne. Di nav folklorâ Kurdi de tema jinan hertim cîhekî berbiçav û fireh girtîye. Hemû zaniyarî û agahdarîyêñ ku di nav folklorâ Kurdi de em rastî wan têñ, derheqa cih û rola jinan me gelekî ronî dîkin. Di nav sedsalêñ bîhûrî da civata Kurdi bi çi çavî pîrsa jinan nihêriye? Bi alîkarîya materîyalêñ folklorâ Kurdi mirov dikare bersîva vê pîrsê ji bide. Jina Kurd heta ji destê wê hatîye, ya xwe kirîye, dema xwastîye, bi dilketîyê xwe re revîye, bi vê yekê ve mirov dikare bêje hemû dijwarî û tengasîyêñ li pêşîya xwe protesto kirîye, ev meteloka han vê dilsoziya jinêñ Kurd gelek baş eşkere û îspat dike : *reva jinê edetê dinê*. Lê belê ew dorgirtina civakî, aborî û polîtîk timê riyêñ xelasîyê ji wê re girtine, çembera li dor wê her çuye teng bûye. Ji alîyê din jina Kurd timê stûyê xwe li hembenî van êrişan xwar nekirîye. Bi taybetî êrişen feodalî, nîv-feodalî qet nebe bi bi saya folklor, stran, destan, metelok û berhemên mayîn hatine protesto kirin.

Dema mirov naveroka stranêñ Kurdi raçav dike, mirov dibîne ku tema memikêñ jinan cîhekî bi taybetî di nav van berheman de digre. Hejmara van stranan digihêje dereceke bilind. Kêm-zêde her straneke Kurdi ya ku li ser evînê-vîyanê hatîye gotin, tê de qala memikan tê kirin. Ev stranan di nav folklorâ Kurdi de bingehêñ edebîyateke eroktîk pêk tînin. Bêguman nîşanêñ pêl û cereyanekê erotik bi tehrekî baştîrîn di stranêñ Kurdi de xwe nîşan dide. Di van stranan de hemû motif û nîgarêñ derheqa memikan bi zimanekî gelek bilind, folklorîk û giranbiha ve têñ pêşkêş kirin, wek mîsal keç timê dixwaze dilketîyê wek "dost" dibîne, keçik wî wek "mêvan" bi nav dike û evînê li ser her tiştî re dibîne, malê dinyayê davêje alîkî:

### Ha Wer Delal

*Emîno kuro, tu sevkê  
Were mala bavê min mîvanî,  
Tu were tewafa cotê memikê mi zerîyê,  
Ji ter re pir xwestir e, ji axatîya Remanîyê.  
...(1).*

### Çavê Min li Rênga Te Qerimî

*Lawiko, were te de tu were,  
Bira serê min qurbana serê te be,  
Sevek şevêñ van payîzan,  
Mêvanê sîng û berê dosta xwe be .  
...(2).*

Eroticism bi taybetî di stranêñ Kurdi yên evînê de gelek xurt e. Di nav van stranan de mirov nikara rastî şop û rêçêñ vulgarismê û devjihevîyê bê, ebosor û pêxas efrandarê van stranan nînin, gel bi xwe ye. Ji alîyê din ev stranêñ erotik, dema mirov baş lê dinêre pornografîk nînin. Çawa tê zanîn armanca "edebîyata pornografîk" qamcîkirina hîsîn xwendevanan yên cînsî ne. Lê ev stranêñ Kurdi bi hêjabûna xwe ji sînorê vê edebîyata pornografîk gelek dûr dimîne. Her ciqas carina sînorê di navbera efrandinêñ erotik û pornografîk dem dem zirav dibin ji, lê belê çawa em dibînin van stranan hêjatsya xwe ya edebî çawa tê xuyan bi dirêjiya

salan wunda nekirine, ev yeka jî bi serê xwe pîvanek e. Wek mîsal di nav mîtolojîya Kurdi de mîrxasa destana Mem û Zîn ya jînîn-keşa Kurd Zîn mirov çawa lê dinêre mîna Xwedakê wek Erosa Yunanî û Amora Romenî bûye nîşana evînê û bi salan li ser zar-zimanê Kurdan digere, jî rûmeta xwe tu tiştek wunda nekirîye.

Dema gîlî jî Mem û Zîn hatîye vekirin, di berhemâ Ahmedê Xanî de em rastî çend ifadeyên derheqa memikan jî tê, wek keçen "memikhînar" û keçen "memikgilover"...(3). Ev yeka jî nîşan dide ku, tema memikan ji berê de di nav edebiyata Kurdi ya devkî û nivîskî de cîh girtîye, bûye babeteke erotik. Ji alîyê din ev dirûvlêxistinê Ahmedê Xanî, çawa emê paşê jî bibînin, di warê navkirina formêni memikan de cîhekî bingehîn digrin.

## PEYVEKE EROTÎK : MEMIK

Memik nîşana kesnama (huviyet) jinan e. Bi salan di nav her çiqlê hunerêna cuda de memik wek nîşana bereket û bedewîyê hatîye hesibandin. Ji der fonksiyona memikan ya mijandina zarokan, fonksiyona memikan ya here mezin bêguman erotik e, wek baqe gulênu dema mirov serê xwe dixin nav, bîn dikin, bi bîn û nermikiya wan mest û serxwes dibin, memik wusan di jîyîna mirovî de bandûrhişt in û roleke gelek mezin dilizîn, bi taybetî memikên keçan wek dewlemendî û zeynetekê hatine hesibandin. Ji bo bal û dêna mîran bikşînîn li ser xwe, jinan hertim mezînbûna "taxima memikan" ji xwe re kirine pîvan û nîşaneke jînîn. Bi saya memikên xwe yên mezin xwastine jîyîna seksuel hin jî seksueltir bikin. Di çiroka pêşketina mirovatîyê de çawa em dibînîn nîşandayîna memikan di sedsalêne kevn de gelek hêsa bûye û ev rehetîya jinan tu wext nebûye sedemê serêşike civakî. Heta niha jî car-carina çawa em di televizyon, rojnama û kovaran de dibînîn jînîn çend êl-eşîren Afrikî bêtirs û bêşerm memikên xwe dikarin nîşan bidin. Gelo bermayîn û nîşanêna vê toleransa berî hezar salan çiqas şop-rêçen xwe di nav stranê Kurdi de hîstîne? Her çiqas bersîva vê pîrsê armanca lêkolîna me nîn be jî, lê belê ev lêkolîna qet nebe bersîvdayîna vê pîrsê hêsanter dike an jî dibe referanseke folklorîk.

Di zimanê Kurdi gelek peyvîn ku cîhê memikan digrin, hene. Bikaranîna van peyvan angorî fonksiyona memikan li gelek cîhêne Kurdistanê diguhîrin. Peyva memik ji peyveke Latînî tê: ango ji peyva *mamma*. Di gelek zimanîna de ev peyva li cîhê dê/dayîk jî tê bikaranîn, dema zarok gazî dayîkên xwe dikin, dibêjin "*mama*".. Ji ber ku memikên mîran kor bûne, pêşta neçûne, piçûk û bêfonksiyon mane, çawa em dibînîn pêwendîyêne peyva memik û mîran qet tune ne. Di hin zimanîna de xwarînîna ku ji bo zarokan amadebûne, têni firotanê jî, bi "*mama*" têni bi nav kirin. Bi kurtî bihgehîna van hemû peyvan diçin digêjîne peyva "*mamma*" (dê/dayîk). Ev peyva Latînî angorî avahîya zimanê Kurdi, bi alîkarîya formê diminutif (bi saya paşpirtika -ik) bûye :*memik*. Di zimanê Kurdi de li şuna memik car caran ji ev peyvan têni bi kar anîn : *çicik, bistan, sîng, pêşîr, paşîl, sîngber, guhan, hingil...* Peyvîn *guhan* û *hingil* zêtir di zimanê argoyê de, di zimanê ebesor û pêxasan tê bi kar anîn. Ji alîyê din, çawa tê zanîn peyva *guhan* bi taybetî ji bo memikên heywanan tê bi kar anîn, wek *guhan*ên çêlekan. Peyvîn pêşîr û paşîl her çiqas li şuna memik têni bi kar anîn jî, ev peyvanan zêtir wek beşeke bedenê an jî kincen li dorberê memikan derbas dibe, wek "*pêşîra xwe bigre!*" (ango pişkokên li dorberê memikan bigre), an jî "*perêna xwe têxe pasîla xwe!*" (wek cîhekî parastina tiştan)... Di çend stranê Kurdi de emê çawa paşê jî bibînin wek mîsal

mirov rastî ifadêñ wek "paşıl tişe xurme ye" û "paşıl tişî êmîş e" tê... Li vira peyva "xumme" û "êmîş" bi tehrekî sembolîk memikêñ jûnan ifade dike. Angorî cih û dema karanîna van peyvan maneyêñ wan ji têñ guhirîn. Bi vi tehrî mirov dikare ji bo mîran ji peyvîn pêşîr û paşîl bi kar bîne. Li çend cîhan mîsal wek dorberê Qonyayê li şuna zarok dema jîr ji memikêñ dîya xwe dimêje, ew dibêjin "pêşîr dimije"... Di gelek stranêñ Kurdi de em rastî ifada "sîng û ber" têñ, ji vê ifadê em jê derdixin ku qala memikan tê kirin. Peyva sîng hem ji bo besê bedenê ya jorîn (ji qirikê heta nava mirovan), hem ji, ji bo cotê memikan tê bi kar anîn. Di gelek zimanîn de hem ji bo vê beşa bedenê, hem ji ji bo cotê memikan tenê peyvek tê bi kar anîn, wek brost (Almanî) û Brust (Swêdi)... Çawa em dibînin di zimanê Kurdi de carina ev beşan bi du peyvan ve têñ nav kirin : sîng û memik, ev peyvan car caran wek du peyven hevnâverok (sînonîm) têñ bi kar anîn. Bi kurtî bi peyvîn memik û sîng (sîng û ber) wek du peyvîn evînê û erotîk di stranêñ Kurdi de zêtir derbas dibin. Di gelek stranêñ Kurdi de em rastî ifada "sîng û ber" ji têñ. Gelo peyva ber ji ku tê? Di zimanê Kurdi de peyva ber car caran ji bo fêkiyan û ji bo "pêş" (wek besê pêşîn yê bedenê!) tê bi kar anîn. Dema mirov menayêñ vê peyvî bi memikan ve girê dide, mirov rastî şopêñ hevgirêdanekê tê, di vê navkirinê de mantiqekê ji dibîne. Di zimanê devkî de her çiqas peyva ciçik li şuna memik tê bi kar anîn ji, di zimanê nivîskî de em ewqasî rastî vê peyvî nayêñ. Di stranêñ Kurdi qasî memikan, em rastî ifada serê memikan (bi Latînî *mamillan*) ji têñ. Serê memikan hem ji aliyê tehr, reng, tam ,hem ji bi fonksiyonên xwe ve di van stranan de cîhekî taybetî digrin. Çawa tê zanîn li dora serê memikan beşike wek baxçekî ji gupik û xalan pêk hatî ji heye, jê re bi Latînî dibêjin "areola mammae" ( *baxçê xalan*). Di straneke Kurdi de qala vi "baxçê gulân" tê kirin :"Taximê sîng û berê Eyşana min gîhiştine / xalêñ zer û sor ketinê" (4). Di çend stranan de em rastî ifada "xal û xelê memikan" têñ, ev ifada wusan tê xuyanê ku ji bo van gupikêñ li dora serê memikan cih digrin, hatîye bi kar anîn.

## PÊŞKÊŞA MEMIKAN

Di stranêñ Kurdi de tiştê herî balkêş, piraniya stranêñ ku li ser memikan hatine gotin ji devê jinan derketine. Ev yeka derheqa şkandina çend tabûyan, cihê jinan û derheqa aktîfbûna jinan di pêwendîyêñ cînsî de an ji derheqa rola wan di civatê de me gelekî ronî dike. Di çend civatêñ İslâmî de li ser memikan peyivîn, stran gotin û besndayîna wan ewqas hêsa nebûye, wek çawa di zimanê Tirkî de ji tê xuyan tema memikan, temake ewqas berbiçav nîne, wek stranêñ Kurdi ewqas bi vekirî ev tema di stranêñ Tirkî de cih nagire. Gelo mirov ji serdemêñ kevn heta niha vê yekê wek serdestike jinan dikare bihesibîne an ji nişan bide ? Bersîva vê pirsê babeta vê lêkolîna me nîn be ji, lê belê ev yeka babeteke gelek balkêş û hêjâyî lêkolîne ye.

Dema dilê keç/jineke Kurd dikeve yekî, li ser bangîn dibe cara pêşîn di van stranan de memikêñ xwe pêşkêşî lawikê xwe dike, destûrekê derdixe, hemû tîrsê ji ser xwe davêje û memikêñ xwe pêşkêşî "helaliyê" canê xwe an ji "xelqê delal" û "xelqê têlî" dike, jin van dilketîyan di kategorîke taybetî de ciwar dike, wan ji ser her kesî re dibîne:

### Dewrêşê Evdi

Minê destmala sor gul-gulî anî,

Çiftâ zer memika navda girêda û ber delalê dilê xwe pêşkêş danî.

....(5).

## Ahmedo Ronî

...  
*Ahmedo ronî, heyran navê min Besna ye,  
Tilî, pêçyê mine, marmutî al şema ye,  
Sing û berê min evdala xwedê koşk sera û qîma ye,  
Serê qiranê pezê xwe serda gérke,  
Minê hemdê xwe te re destûr daye.*  
...

Ji bo ku delalîyên xwe dilşa bikin, jin hemû ırıkanên xwe pêşkêş dikan, pêşkêşa here giranbiha bêguman di van stranan de cotê memikan e. Ji ber vê yekê jî gazîyên jinan tehrê xwe diguhirîn. Di strana *Hey Lo Lo Delal* de ci ji destê jinê tê pêşkêş dike:

### **Hey Lo Lo Delal**

...  
*De lê lo heyran  
Wezê delalê malê birêkim,  
Wezê taştêkê ji delalîyê malê re çêkim  
Wezê temamê rûnê Xinisan jê re lêkim,  
Eger qîma delalê malê pê neyê  
Wezê cotê memikan jê re pêşkêş kim.*

*Hey lo lo delal..*

*De lê lo heyran,  
Berîka Mêrdînê berîkî düz e.  
Pozê Qerecdaxa gewitî li serda xuz e.  
Nava sîngê mehbûbê min, evdalê  
Temam zîv û zêr altûn e.*  
...(6).

Dema kesek mizgînîya hatina lawikê (dilketîyê) keçekê jê re bîne, keçik dikare ! ji cotê memikan yekî pêşkêşî kesê ku mizgîn anîye, bike. Ev yeka bêguman xurtbûna evîn û hezkirina dilketîyan nîşan dide, mîsala kesê mizgîn tîne çawa tê xuyan ne dilketîyê keçikê ye, lê belê ew dikare memikekî xwe pêşkêşî wî kesî bike (bêguman tenê bî rîya folklorê), ev yeka jî, di realîte de xurtbûna evîna jinê temsîl dike:

*Lawiko qurba, Girîdaxa berbi welat,  
Heçî kesê bêje -Gede lawikê te hat,  
Ezê gevê çepê, memikê rastê  
Bidim pêşkêş xelat.*  
...(7).

Di strana Delalê Berîyê de vê carê keçik amade ye wekî "ramûsana rûyê rastê" jî pêşkêşî kesê salixdayî bike:

## **Delalê Berîyê**

...

*Minê sonda mezin xwariye  
 Heçî saloxekê ji delalî malê ji me re bîne  
 Ezê bidim heft aqê mala bavê xwe rebenê  
 Li ber çemê Nisêbînê.  
 Eger pê razî nebû, ezê ramûsana rûkê rastê,  
 Bidim bi mizgînî.  
 Hey lolo... (8).*

Car caran di van stranan de jin bo hezkirfîyê/dilketiyê xwe hertim amade ye wekî lawkê wê, xwe bigîhîne cotê memikan, merc û xoyan bi xwe amade dike, bêsebirîya jinan caran ji sînoran derbas dibe. Dema ji alîyê dê/bavan de, ji alîyê mîrên xirab de tengasî û dijwarî peyda dibin, jin ji bo dilketiyê wê, xwe bigîhîne cotê memikan gelekî serê xwe li ser planêن cuda diêşîne. Jin naxwaze kes ji vê hevduditînê agahdar bibe. Dema mirov rastîyê digere jina Kurd evîna du kesan ser her rîşî re dîtîye, ev yeka bûye wek hîmekî felsefik : *Kesê orta du dila û çar çavan xeber dide, bira xérê-wayê qet nebîne.* Dema mirov li ser van peyvîn zérîn difikire, mirov dibîne ku jina Kurd ji alîyê serbestî û daxwazîyên xwe de çiqas rehet fikirîye. Lê dîsa jin ji ber çend diwariyan mecbûr dibîne xwe dipareze, wek mîsal jin dema "hîv wunda bû" dorber tam tarî bû, wê çaxê dilşa ye û xwe emîn dihesibîne:

*Hîva gundê me derketîye, hîva sava  
 Hîv xeyidîye, tela bextê min û te re naçe ava,  
 Lawko qurba, hîv çû ava, paşê were,  
 De tu were, ser sîngê min evdala xwedê veke,  
 Forma toyê pêz, mastê medaka şekir ser e (9).*

## **Herê De Mêvan**

...

*Mêvan, qurba herkê tu pirsa tamê mala bavê min dikî,  
 Tamê herî pêşîn e,  
 Du cêrge dîwarê wî ne  
 Çargoşe danîne.  
 Paşîya tewla mala bavê min quî e,  
 Şev nîveke gevê tê de werê xarê.  
 Herke dê û bavê min pê hisyan,  
 Ezê bêjîm - ne mêvanê sîng û berê min e,  
 Qerewilê gevê ye,  
 Şaş bûye,  
 Hatiye avê digere, tî ye.  
 ... (10).*

Di çend stranan de hevdudîtina keç/xortan bi saya pêskêşkirina memikan dibe edetekî nûjen-hevdem. Çawa tê xuyan, vê carê keç li dîya xwe şîretan dike û ya dilê xwe venâşêre:

*Were mala bavê min keçikê bi şeve,  
 Ezê cîya ji xwe û delalê malê re daynim tev li heve,  
 Heger diyam go :"Çi bû, ci çirfya?"  
 Ezê bêjim :"Porkurê, edetê xort û keçê vî zemanî yek jî ev e.  
 Yadê, tro sê ro delalê dilê min xeyîdîye,  
 Ezê cotê memika bavêm deve"(11).*

Di nav stranên Kurdi de pêşkêkirina memikan hemû şik, dijwarî û nebaweriyêñ navbera jin/mêran yekten ji ortê radike, ev ifadeyêñ pêşkêş û xelatan mirov dikare bêje, di van stranan da dibin manifestoyen evinê. Ji alîyê din çawa em paşê ji bibînin jin dikarin van manifestoyan biqelêşin û bavêjin alikî jî. Ev yeka jî di folklorâ Kurdi de nîşanên dilsarı, heznekirin û bêdilîyê raberî me dikin. Ev protesto û dijîderketinan dîsa derheqa rola jinan de me gelekî agahdar dikin.

Dema jin memikên xwe pêşkêş dike, ne tenê pêşkêş kirin, carina qala "tapukirinê" jî dike:

### Bavê Seyro

*Bavê Seyro qurba! çima tu deynakî?  
 Her çar malê Aluca li qûna diyêr demam nakî?  
 Sîng û berê min keçikê weke bexçê Zinara Mêrdinê  
 Ji xwe re tapo nakî.  
 ...(12).*

## FONKSÎYONÊN MEMIKAN YÊN DUWEMÎN

a) Wek Derman : Ji bo qenckirina birînên mîrîn xwe ,dilketîyêñ xwe, di çend stranan de çawa em dibînin jinan xwastîye memikên xwe bikin derman û melhem têxin devê birîn. Ji bo ku ber dîlê birîndar de bê, stranbêja jinîn ji ser cotê memikên xwe re tu tiştekî giranbiha nedîtiye wekî pê birînên birîndaran bipêçe:

### Bavê Fexro

*Ez qûme Bolindê Sebrîyê Hecî ne li mal e,  
 Dibêñ li serê Tirka, li pira Batmanê birîndar e,  
 Nizanîm ci steqlala şêx Sehid, fermana Kurdan rabûye,  
 Berê Sebrî tev birînê dane elemane,  
 Ditîrsim birîna Sebrîyê Hecî li binya xetê,  
 Bê hekim û bê derman e,  
 Minê cotê zermemikê xwe biqelaştı,  
 Jê re bikira mûl, melhem û serdermane.  
 ...(13).*

Ev stranan ji alikî de nêzîki stranên şînê dibin, her çiqas mirin-kuştin tune be jî, çawa tê xuyan şîn û girîk heye. Di rewşeye awa de qala memikan kirin, ez bawer dikim zêtir bi daxwaza zû qencbûna birîndar ve girêdayî ye, keçik dixwaze bi motîva memikan hêviya

xelasbûnê li bal birîndar zêtir bike, bîna wî fireh bigre, bo vê yekê jî diçe bal hekîmê filleh (Erakêl):

#### Bavê Fexriya

...

*Bavê Fexriya qurba!  
Ji înê heta înê,  
Îro sê ro bavê Fexro birîndar e,  
Di nav nivînê, wey li minê!  
Ezê rabim daw û delingê xwe hilgêvîm,  
Herim Hadhaka xopan, mala Erakêlê hekîm,  
Ezê bêjîm: Erakêlo qurba! sîng û berê min keçikê,  
Bike melhema devê vê birînê.*

...(14).

**b) Wek Star:** Memik hem ji alîyê nermbûna xwe, hem jî bi germbûna xwe ve wek stareke giranbiha hatîye hesibandin, wek koşk û serayê hatîye bi nav kîrin, angorî van stranan mirov tenê di nav sîng û beran de dikare bîna xwe derxe, an jî di şevêñ zivistanê, xwe di nav de germ bike : *Xwezila şevezê ji şevêñ çilê kanuna zivistanê / Di ber sîng û berê xelka têlî de bibûma mîvan* ... (15). Hembêzkininji alîyê jîn-mîr de wek avahîke evînê hatîye dîtin, dema mirov dikeve nav sîng û beran, ev avahî hemû şana xwe di van stranan de nîşan dide:

#### Heso

*-Heso, işev şeve e, şev wê bi gîlî ye,  
Guhêra hogecê te av e, avherî ye,  
Were têkeve nav dest orxan-doşekê qastûkîye,  
Herge qîma te dest orxan-doşekê qastûkî nayê,  
Ber serê te cotê zer memika serî sorî, binî sipî ye.*

...(16).

**c) Wek Ronahiyê:** Di çend stranan de memik şemal didin wek "şemala şevê" (17) hatine dîtin, ronahî û tîrêjên li dorberê memikan peyda dibe angorî dîtina dengbêj tarîya şevê belav dike :

#### Eyşê

*Eyşê qurba, dilê min qîz û bûkê van koçera,  
Sîng û berê Eyşa min usa ne,  
Nola hîverona van payîza ser bêderâ.  
...(18).*

**d) Wek Mijûli:** Dema bîna lawikê keçekê teng dibe, xew nakeve çav an jî li ser rê ye, diçe xerîbiyê an jî şevêñ dirêj dema wext derbas nabe, keç di gelek stranan de gazî lawikê xwe

dike wekî bê têkeve nav sîng û beran ji xwe re mijûl be, bi memikan şâ be, pê bilîze. Bi kurtî memik wek çavkanîke bînfirehîyê û çerezê şevbihuriyê di van stranan de derbas dibin:

### Şahîno

*Şahîno, dîno tu dîn î, tu ne mi distînî, ne direvînî,  
Nextikê mi giran e, tê ji ku bînî,  
Tu ji xwedê natîrsî etfa zîvî li ser sîngê mi dihejînî,  
Sîngê mi baxçê gulan û sêvan e, dema bîna te teng bî,  
Werê demekê, da tu xemên dilê xwe jê birevînî.  
...(19).*

### Du Zerî

...  
*Canê canê,  
Du zerî ber derikê mala bavê min rêze,  
Xwîska mezin ya piçûk re digot:  
"Îsev mîvanekî hatîye mala bavê min û te  
Rebenê pir ezîz e.  
Ezê nizanim jê re çi pêşkêş, çi layîqî, çi cayîz e,  
Ezê ji şevezekê, nîvê sevanî,  
Pêda jê re teslîm bikim cotê zer memikan,  
Sevê çilan û kanûnan dûvedirêje,  
Rabe, rûnê û pê bilîze".  
(20).*

Ji alîyê din dema dilketîyê keçekê diçe xerîbiyê, leşkeriyê an ji welatên dûr, wê demê keç memikên xwe pêşkêşî bîntengan dike :

### Gondera Reşê

...  
*Wekî tê carekê mala bavê mi bivî mîvandarî,  
Ezê cihê te daynim yalê odê,  
Ezê cotê zer memika pêşkêşî nefsa canê tekim,  
Xwe re têr şabe, hetanî sibê.  
...(21)*

d) **Wek Xwarin:** Di gelek stranan de memik wek xwarinêna cuda derbas dibin. Em ji van stranan fam dîkin ku tam û xweşîya memikan li ser zarê dengbêj demeke dirêj maye, jê têr nebûye. Çawa emê paşê ji bibînin, di gelek stranan de memik wek fêkîyan hatine nav kirin. Ji der fêkîyan em rastî ifade û xwarinêna mayîn ji têr wek taştê, firavîn, paşîv, dimis, çerez, to, kebab, hingiv, wek mîsal: *Ezê serê memikê xwe biçilpînim / ji kalan re bikim taştê, ji xorstan re bikim firavînê...* (22).

## MOTİVA "MÊRÊN JI HEQÊ MEMIKAN DERNAKEVIN"

Di çend stranê Kurdî û şaxên wan de çawa em dibînin, jin ewqas ji zewaca xwe dilşâ nînin, mîrên wan an ji dilketiyêن wan "mîrên ji heqê memikan dernakevin" têن bi nav kirin. Ev mîran ji aliyê jinan de wek mîr nayêن hesibandin, navêن mayîn li wan têن kirin, wek mîrên çeper, şindo, şindonek, kund, kundo, nemîr, gilek, mîrên kotî, melmelestî, serjinik, pintî, serhevde, mîrên kotî, dewar, mîrên sil-sêt... Sedemên vê dilsarıyê gelek in, wek bi darê zorê ve hatin revandin, zewaca bêdil, hêvî anîn, çavderiya mîran ji mîrtiyê ketin û gelek faktorêن mayîn... Di dawiyê de şartiya di malê de û di pêwendiyêن cînsî de digihêje dereceke bilind. Êdî rehetî ji jinan re namîne. Jin ji mîrên ku "sevê heta sibê pişta xwe didine jinan" hez nakin. Hemû ev yekan, ji jinan re dîtina îmkana dilketiyêن nûh peyda dike, wek çawa di stranekê de ji tê xuyan, jin gazî dilketiyê xwe yê nûh dike : *Were teresê kuçikê mîrê min bikuje...* Di van stranan de çawa tê xuyan jin gelek xemgin û dilsar in :

*Derfîê mala bavê min yatamê bi toz û mij e,  
De rabe teresê kuçkê mîrê min bikuje,  
Tê devê xwe têxe xan û manê gerdenê,  
Cotê memika ji xwe re birnije (23).*

### Xelilê Qazî

*Ezê Dîyarbekira şewitî ketim bi mişmişe,  
Toq û benîyê mi rebenê ser bejna zirav xusexuse,  
Bira bavê min xêrê bike, xêrê nebüne,  
Çawa ezê nedam Xelilê Qazî, lawkê Kurmanç,  
Ezê dam kum bi qulkî ji vanê bajariya,  
Ji êvarê heta sibê li ser sîngê min diponije (24).*

Çawa di van stranan de bi vekirî tê xuyan ku, jin ji mîrê xwe razî nîne. Di strana *Xerabo* ya ku di nav xetêن wê de li dijî mîrê xirab protestoke gelek tûj heye, mirov dikare gelekî bi hêsanî vê nerazîbûnê bibîne. Ev strana ji devê jîneke dil bi keser tê strandin, çawa em ji naveroka stranê têdighîn mîrê jînikê keseki çavder e, jinxapînok e, di nav malan digere, di stranê de motîva memikan gelek xurt e, jînik bi alîkarîya vê motîvê qet nebe li şunda vegerîna mîrê xwe hêvî dike, gazin, lome, şîret di stranê de tevlihev dibin, jînik bi vî tehrî hundîrê xwe dirêje. Stran bi van xetan dest pê dike : *Ruhê bizdonek bi sîngê gewir şâ nabe...*

### De Xerabo

*De Xerabo, de xerabo taximê sîng û berê mi kara xezala,  
Ji te re nola qesra prota li Mêrdîna şewitî, nûh camkirî,*

*Na welle nola guşyek tîrîyê Çêlikê Eliyê Remo  
Di kan û mîwa xwe de nîh kemilin.*

...  
*Xerabo, mal şewitîyo, ez ji te re dibêm tu her şeva Xwedê  
Wer tewafa sîng û bera, ramûsanê cotê memikê mi kara xezalan.  
Ji te re nolî sények berdîrê yê ter e.  
Li Mêrge Mîra jorîn li Qeredaxa şewitî,  
Tu bike parzûnan û torba,  
Tu biguvişe av jê here,  
Bi kîrê qelem traşê du dîlim ke,  
Damarê geza û sekir ji nav here.  
De xerabo, ez ji te re dibêm tu her şeva Xwedê,  
Were li ser rûnê bixwe tev megere.  
...(25).*

## NAVKIRINA FORMÊN MEMIKAN

Di stranên Kurdi de dema dengbêj qala memikan kirîye gelek tiştên mayîn anîne ber çavan, wekhebûna memikan û van tiştan li ser bingehêن mantiqî ava kirine. Di nav van pîvanan de tehr, reng û gîhiştina memikan cîhekî fireh digrin.

a) Tehrê Memikan: Dengbêj di gelek stranan de memik wek fêkîyan dîtîye û navê fêkîyan li memikan kirîye. Çîma fêkî? Ez bawer dikim ji der guloverbûna memika û fêkîyan, zêtir dengbêj ew tam û lezeta ku demekê di fêkîyan de tam kirîye, di memikan de ji nûh ve kefş kirîye, ji ber vê yekê ji hem guloverbûn û hem jî tam-lezeta memik û fêkîyan di van stranan de ketine nav hev. Ew fêkîyen ku di stranên Kurdi de wek memikan hatine pejirandin û nîşandin wek mîsal ev in : sêv, hurme, tîrî, porteqal, xurme, hêjîr, guz, şememok, qawin, hinar, şememok, wek mîsal : *Memkê xezala malxirab sor bûne / Mîna şemamokêt deşta Hesîna* (26).

### Elê Meyrê

...  
*Ezê sîng û berê Meyrema xwe dibêjîm  
-Xurmek xurmê vê Bexdayê,  
Hêjîrek hêjîrê vê Şengalê,  
Tîrîk tîrîyê Bisindirê,  
Qawinek qawinê Diyarbekirê,  
Xort nizanbe, xwe re bike cerezê şevbihêri.  
...(27).*

Ji der tam-lezeta fêkîyan, ji alîyê din ew bîna xweş ya ku ji fêkîyan tê, vê carê dengbêj çawa kefş dike ji memikan jî bîneke awa xweş tê. Di çend stranan de em rastî iffadeyên derheqa bîna memikan tê, wek : *bîna memka em kotin, bîna memka em xwarin...* Ji ber ku memik

di bin kincan de zêde dimînin, ew xwey didin, wek hêkan disincirin, germ dibin, di çend stranan de vê carê em rastî ifade "hilma memikan" tênil "hilma memka em xwarin". Dema ev bîn û hilma memikan tev hev dibe, çawa em dibînin dinya bûye ya dengbêj.

Stranbêj memik ne tenê wek fêkî dîtîye, çawa di çend stranan de tê xuyan navê gelek tiştên mayîn jî, li memikan kirîye. Dema memik û ev tişt dane ber hev, rûberî hev kirine, bêşik wekhevbûna van tiştan û memikan daye ber çavan, wek *kanî, kulîlk, baxçe-bostan, zér-zîv, fincan...*

Ci ye nêzîkiye di navbera kanî û memikan ? Ez bawer dikim bersîva vê pirsê diçe digihêje wekhevbûna şîr û avê, herduyan jî mirov vedixwe, dengbêj memik wek cot kanî dîtîye, kanîyênu ku li şuna avê şîr jê dikişin. Ava van kanîyan agir û şewata di dilê stranbêj çığas dide sekinandin? Bersîva vê pirsê jî dîsa di nav fonksiyonê memikan yên duwemîn de veşartiye:

### Hey Lê, Lê

*Hey lê, lê, hey qemerê!  
Gundê Dodo du gelî ne,  
Cotê zer memika cot kanî ne,  
Wey malîno, hûnê qet dey nakin,  
Ezê destê çav-birûyê beleka dimirim,  
Hûnê bawer nakin(28).*

### Lê Gewrê

*Min serê memika givaşt  
Sê fincan av ji hatin xwar,  
Min fincanek jê vexwar,  
Û ez bûme wek zîveal  
Ez bûme wek merekî teyar.  
...(29).*

Di çend stranan de memik wek fincanan bi taybetî wek fincanê ferfûrî hatine hesibandin. Ji alîkî de tehrê fincanan (giloverbûna wan, xweşikbûna wan), ji alîyê din fonksiyona (motiva vexwarinê) fincanan û memikan ji hev ne dûr in. Carina em rastî ifadeyên "fincanê dest hakiman"(30) û "fincanê dest axeleran"(31) tênil. Çawa di van stranan de jî tê xuyan, di salêñ kevn de fincanê hakim, axa û began giranbiha bûne, bi saya vê giranbihabûnê stranbêj xwestîye hêjabûna memikêñ dilketîya xwe jî nişan bide:

### Hesreta Min

*...  
Hesreta min ji mala bavê derket,  
Bi min re xeber nade*

*Nizanim çira?*

*Bejin zirav e mîna hal-halê nav geniman,  
Memik sipî ne mînanî fîncanê dest hakimam  
-Keçê, kulmalbavê,  
Te gosîê min helandîye  
Bi waqî, bi derema  
Hestûyê min helandîye  
Kirîye şima.*

...(32).

Stranbêj ji bo ku bedewî û xweşîya memikan bi tehrekî baştirîn bîne zimîn, hemû rê û îmkanenî hunerî cerîbanidine, carina sîng wek baxçekî, di nav vî baxçeyî de memik jî wek "baqê gulan" bi nav kirîye. Di strana *Eyşanê* de awa tê gotin :

### **Eyşanê**

...  
*Sîngê gewrê baxçe ye, Eyşanê,  
Baqê gula di navda ye, Eyşanê.*  
...(33).

Mirov li vira baş têdigihê ku baqê gulan memik in, di çend stranê Kurdi de carina peyvîn sîng û memik bi hevra têni bi kar anîn, di van stranan da sîng wek deşt, zozan, bostan û baxçekî fireh tê nexş kirin, memik jî di nav vî erdê fireh de cih digrin. Li vira êdi sîng li şuna memikan derbas nabin, ji ber ku qala memikan xwe tê kirin. Lê belê carina jî dema qala memikan nayê kirin, mirov vê çaxê têdigihê ku peyva sîng memikan ifade dike.

**b) Rengê Memikan:** Di stranan de rengê memikan ji hev cuda dibin. Ji aliyê din besên memikan (serî, binî, xalêñ memikan) jî bi rengê cuda carina têni nîşan kirin. Di gelek stranan de memik wek berfê sipî ne. Sedemên vê yekê angorî besê bedenê yên mayîn, memik zêde hatine parastin, rûyê rojê nedîstine, zêde sipî mane, her çiqas peyva gewr ne wek peyva sipî be jî, li şuna peyva sipî carina em rastî peyva gewr jî têni. Zêtir memik bi rengê zer hatine nîşandin. Dema memik digihêjin, vê carê em rastî peyva sor têni : *Memkê xezala malzirab sor bûne / Mîna şememokêt deşta Hesîna ...* Dema memik digihêjin xalêñ li dorberê serê memikan çawa tê zanîn reng diguhirînin:

### **Eyşan**

...  
*Taximê sîng û berê Eyşana min gîhistine,  
Xalê sor û zer ketinê (34).*

## GÎHIŞTINA MEMIKAN Û SERHILDANA WAN

Di stranê Kurdî de memikên here baştirîn memikên ku bi hemdê xwe digihêjin, memikên ku zêde pê nehatine listin, memikên here cîwantir têن hesibandin. Memikên ku dest lê neketine di van stranan de memikên keçen çarde salî ne : "Xwezlyâ min tê li wî xorî / di çarde salîya xwe de dest bavêje cotê zer memikan". Memikên nûgîhiştî, memikên keçen azep-xama angorî memikên jinê mîrkirî. û pirzarak gelek hîsk in û ji guloverbûna xwe tiştek zêde wunda nekirine, timê gilok û gulover mane. Memikên ku di wextê xwe de digihêjin, di stranê Kurdî de wek avahîkê, koşk-serake ku roj bi roj bilind dibe, hatine hesibandin :

### Xerabo

...  
*Serê memikê min xatunê,  
Mîna tiriyê Çêlikê Eliyê Remo  
Di çax û benga xwe de digihîya,  
Û di mîewa xwe de dikemîlî,  
Mîna qesra pîrota,  
Serê mihela Meşkîna,  
Li bajarê Mêrdînê avakirî (35).*

Mezinbûn û gîhiştina memikan di stranê Kurdî de wek "serhildana memikan" hatîye hesibandin. Memik, çawa tê zanîn di kontakt û nêzîkîya bedenî de tesîreke gelek zû nîşan didin, bî taybetî serê memikan gelek jîndar in : *serê memikê te tûj in / weke serê derzîya* (36).

### Gulê Gulê

...  
*Destê xwe kir paşîlê,  
Çi paşilek xwedayî,  
Serê memikan hildaye,  
Memik para xorta ye  
...(37).*

Ev serhildana memikan çawa em dibînin di çend stranê Kurdî de bi serê xwe bûyerek hatîye hesibandin, memik silavan didin, deng dîkin û bû lez reng diguhîrinin, sor-zer dibin...

### Eman, Eman Dotmam

...  
*Vî kerî pezê çendî va ye,  
Nêriyê nav de notla ga ye,  
Lawîkê min qesta sîng berê min kirîye,  
Cotê memikan jê re silav daye.  
(38).*

## Dilber

...  
*Cotê memikê mi keçikê, mîna du kewê gozel,  
Bi sarîya sibehê re,  
Li paşlîka mi keçikê dîkin şêre-şêro.*  
(39).

Memikên keçen nûgîhiştî an jî memikên ku zêde nebûne "destmala dest xortan" çawa me li jorê jî gotibû hişk û gulover in, wek sêvekê ne : *Memikê dosta min sêvê sor in / Hêdî bidine ber wan gezane* (40). Çawa têzanîn tiştê hişk û sert tênen gezkirinê, ji ber vê yekê jî dengbêj memik û sêv wek hev dîtîye: *Sîng vê teresbavê hişk bû / Mîna helawa Entabê / Bi çakuç û tevşoyê Destê neçaran û merengozan nedikşîya* (41). Ji aliyê din dengbêj wek fêkiyê ku digihêje û ji çîqlê darê dikeve , dema gîhiştina memikan jî tespît kirîye :

## Bedewê

...  
*Girîdaxa berbi dunê,  
Suret sor bûne xal ketinê,  
Par vî çaxî memkê kewa min tune bû,  
Îsal vî çaxî hatine ber ketinê.*  
...(42).

## GUHASTINA FORMÊ MEMIKAN

Ew bedewî, guloverbûn, hişkbûn û rengîniya memikan çawa em dibînin di çend stranê de wunda dibin. Di van stranan de em rastî peyvên *mizdan, tevdan, gez kîrin, givaştinê têن, piranîya van stranan ji devê mîran derdikevin*. Ev yeka jî nîşan dide, mîr li dijî guhirîna memikan nerazîbûna xwe li hemberî jînê nîşan dide : *Memkê vê tolbabê sistibûne ji mizdanê* (43). An jî çawa di strana Canê de têxuyan vê carê mîr ji zêde tevdanê gazinê xwe dike : *Ezê orta sîng û berê kawa xwe dinêrim / Gişte xirte-xale bi nîgana tevdanê* (44). Carina jî çawa em dibînin ji ber çend sedeman wek ji hev dûr ketin û dilsarıyê memikên jînê "bê tîmar" dimînin :

## Sê Malo Gundo

*Ez çûme derê çemân, çemê sar in,  
Zozanê bavê te bilind in,  
Berf û baran lê dibarin.  
Îsal sala hefta ye,  
Berî lawkê min ketîye,  
Welatê xerîb û gurbetê,  
Sîngê û berê min fadilê!*

*Bê mihas û bê tîmar in.  
Yar, yar, yar Xopano gundo !  
...(45).*

Ji ber tevdan, mizdan û gezan an jî sedemên mayîn çawa tê xuyan di van stranan de memik êdî wek memikên kevnejinan ji hev çûne, çîlmissine û vê rewşê bala dengbêj gelek kişandîye.

## DIZÊN MEMIKAN Û MUCÍZEYA VEBÛNA BIŞKOKAN

Di nav stranê ku li ser memikan de hatine gotinê, peyva ku zêtir li bala mirovan dikşîne, bêguman peyva *pişkok* e. Ci pêwendiyêñ memik û pişkokan hene? Di serdemêñ kevn de jinêñ Kurd memikên xwe bi *pêşîrdank* (berpêşîr, çıkışkend) ne diparastin, tenê memikên xwe di bin kincêñ pişkokkiri de vedîartin, lê belê dîsa jî rîskê xuyabûna memikan hertim zêtir bû. Ji ber van sedaman di gelek stranan de motiva bişkokan wek motiveke şer-dew derbas dibe. Ji aliye mîran de kembûn an jî tunebûna bişkokan şahîke here mezin hatîye hesibîn. Di stranan de em rastî vekirina bişkokan (bi destê mîran) nayêñ. Ev yeka jî nîşan dide tenê îrada mîran roleke ewqas mezin nalize. Daxwaza jinê zêtir giringtir e. Ji ber hevdu famkirin û hevdu hizkirinê çawa em dibînin pişkokên pêşîran carina bi xwe jî vedibin! Dema bişkok vedibin memik bi xwe difirin derva. Di bin vebûna van bişkokan de bêguman daxwaz û evîna jinê roleke mezin dilîze. Ji ber vê yekê jî dizêñ memikan hertim nagihêjin armanc û xwazîyêñ xwe.

Jina Kurd hebûna memikên xwe angorî memikên mîran (yên korbûyi, şundamayı) hertim wek serdestîke mezin dîtîye. Bo vê yekê jî parastina memikan û pirsa pêşkêşkirina wan di van stranê lîrîkî de cîhekî fireh digre.

Angorî daxwazî an jî bêdilîya jinê demên vebûn / pevxitina bişkokan ji hev cuda dibin. Biryar dîsa di destê jinan de ye. Ji ber vê yekê jî dizê memikan hertim bi hêsanî nagihêjin armancêñ xwe : *Ezê dikim herim dizîya cotê zer memikan / Destê min kete moriyê lingan* (46). Dizêñ memikan her rê û îmkanan diceribînin wekî xwe bigihînin cotê memikan :

*Ay ay li min, kubarê dinê!  
Dere Meşkîna xopan bi şewitî, ne tu der e,  
Pozê kela Mêrdînê bişewitî, tim rasere.  
Xweziya ez bibûma zêrekî Mehmûdi,  
Ji xanboxaza qirikê xwe berda,  
Nava cotê sîng û bera!  
Sîng û berê xelka têli kaleboze spî ne,  
Mîna baxçekê Sultan Evhîmîd,  
Bi şev û rojê qereqol û newbet tim li ber tê!  
De ay ax li min, of of li min!  
De ax ax li min, tengerzar im Xwedêwo(47).*

Lê dema jinekê dil kir, wê çaxê pişkok êdî xwe vedibin. Çima xwe vedibin? Ji naveroka stranan em fam dikin ku, êdî her tişt bi hemdi xwe, bi qamê xwe dimeşe, du dil bûne yek, dema du kesan hev hez kir, bêguman pişkok êdî xwe vedibin, kes pişkokan venake , di van

stranan de pişkok ya *diqetin*, ya *difilitin*...! Çawa di stranekê de tê diyar kirin êdî "sî û şes bişkokên zîvîn" hatine vekirinê ,kê vekirine? Ev yek nayê zanîn, wek mucîzekê evînê tê xuyan:

*Delalo, mi bêrî kir, te bêrî kir,  
Rîya Mendara şewîti li newalê me li hev hêvî kir  
Bîşkokê mi rebenê xwedê flîlit, sînga gewr spî kir* (48).

*Vî zînarî li me sî kir  
Bîşkok qelîya, sîng spî kir,  
Emrê minî sed salî hebû,  
Minê te re tev nîvî kir*(49).

Di stranê *Zerî Domamê* û *Merdinê* de çawa em dibînin di navbera lawik û keçikekê de li ser memikan tê deng dikin, şer-dewek heye, dîtinê cuda davêjin ber hev. Angorî naveroka van stranânen dirêj, mîsal wek strana *Zerî Domamê* ,dema keç pey mîyên xwe diçe, erdê dikeve "sêsed û şest şes pişkokên keçikê" diqetin, lawik wê çaxê memikên keçikê dibîne. Lê belê cara pêşin keçik van baweri û dîtinê lawik qebûl nake, xwe li diji van "*iftîran*" û "*bêbextîyan*" diparêze û ji lawik dipirse:

### **Zerî Domamê**

-*Kuro kulmalo, ya bêbextî serda hato,  
Te wextê serê zer memikê dîne,  
Nav û nîşanê wan çîye, ci nîne ?*  
...  
-*Kuro kulmalo, te wexta çîfte zer memikê mine zer dîbûn  
Sede, sudê te kî, kî bûn ?*  
...

Paşê di navbera keç û xor de ev dîialoga jêrîn derbas dibe. Keçik di dawîyê de têdighê ku bi rastî lawik memikê wê dîtine, kesekî nas e :

-*Keçê, kulmalê, wextê min çîfte zer memikê te zer dîbûn,  
Neh hebe li wêderê hezire sekînibûn:  
Sê heve Celalî bûn,  
Sê heve Rojîkî bûn,  
Sisêye Sîpîkî bûn.*

-*Kuro, kulmalo, hersêkê Celalî qaçaxê çîya bûn,  
Hersêkê Rojîkî vireke derewîn bûn,  
Hersêkê Sîpîkî razgona, cînarê mala bayê min bûn,  
Usa ne te çîfte zer memikê mine zer dîne.  
...(50).*

Hem di strana *Zerî Domamê* de, hem ji di strana *Merdinê* de çawa tê xuyan bi rastî lawikan memikên van keçikan dîtine, ji ber vê yekê ji keçik cotê zer memikan xwe pêşkêşî "*helalîyê canê*" xwe dike. Çawa di stranekê de ji tê xuyan hertim kilît di destê jinê da ye: *Heger tu*

*Asker oldum peyade,  
Te'lîm bilmem ne çare.  
...(57).*

Di strana Eşê de jî çawa em dibînin vê carê li ser memikê Eşê "cotek melek" dixwînin (58).

## PEYDABÛNA TEMA "JINÊN MEMIKFIROS"

Tema "Jinên Memikfiroş" zêtir di nav stranê ku ji devê mîran derketî, cih digre. Mîrên ku evîndar bûne hertim çawa di van stranan de tê xuyan, negîhiştine daxwazên xwe, hêvîyên wan nehatine cih. Ji ber vê yekê jî, van mîran di hembeza xem-xeyalan de jî xwe re îmkan û mecalên nûh peyda kirine, ew di derya xewnerojan de bi tehrekî hunerî avjenî kirine, çûne-hatine ji bo ku ji xwe re cote memik dest bixin. Em di çend stranan de rastî peyvîn *dikan, suk-pazar, mîsterî, kirîn-firotanê...* tê. Ji ber çend dijwari, bêgavî û bêmecâliyên jîyinê, stranbêj xwe avîtiye ber bextê xemn-xeyalan. Di van stranan de keç hertim di rola memikfiroşek, xort jî di rola mîsterikî de ye:

### Helimcanê

*De bi can be, Helîmcانê,  
Ê lê Helîmcانê,  
Heyran ez ne tî me,  
Û ez ne birçî me.  
Ez li ber sîhka Bitlîsa xopan rûniştîme.  
Ê lê Helîmcانê,  
Heke tu avkişenî, ez gelek tî me,  
Heke tu nanopêj î, ez gelek birçî me,  
Heke tu sîngfiroş î, ez mîsterî me,  
Heke tu nafroşî,  
Roj hizura heq,  
Ezê li ser pela selatê,  
Destê min û dewa te  
Ezê li Helîmcana xwe de'weçî me.  
...(59).*

Di van stranan de derbasbûna peyvîn *sîngfiroş-mîsterî*, ji alîkî de evîndarîya mîr çiqas bi şewat e, gelek baş eşkere dike. Bêguman ev peyvan ji kirîna memikan zêtir ,destxistina memikan ifade dikan, li vira mirov nikare pêwendiyêñ ekonomîk-bazirganî bîne bîra xwe, wek mîsal :*-kawa min meşya dikanê / memik birin firotanê* (60). Di vê stranê de tişte mirov jê derdixe ne kirîn-firotana memikan e, mebest hêviya destxistina memikan e, tenê di nav sînorê daxwazekê de dimîne.

Çawa me berê jî gotibû, dengbêj di navbera fêkî-êmîş û memikan de tu cuadâlik nedîtiye, *wek paşîl tijî êmîş e* (61). Vira peyva êmîş li şuna memik hatîye bi kar anîn, cîyê ku fêkî-êmîş li tê kirîn û firotanê, angorî dengbêjê mîrîn û fantaziyêñ wî, li wira mirov dikare memikan

jî, jî xwe re peyda bike, ji ber vê yekê jî pey rîya sûkê (pazarê) ketîye û ji keçikê pirs kirîye: *Zer memika nafroşî?* (62).

## ÇAVKANÎ :

- 1) Roja Nû, hejmar:27. Ev kovara ku bi Kurdi û bi Fransî du zimanan hatîye weşandin, di navbera salên 1943-1946 li Beyrûte derketîye, çapa nû: Uppsala, 1986.
- 2) Hecîyê Cindî, *Kilamêd Cimaeta Kurdaye Lîrikîyê*, Erivan, 1972, rûp.39.
- 3) Ehmedê Xanî, *Mem Zin*, İstenbol (werger: M.E. Bozarslan) 1975, rûp.193, 108.
- 4) Nura Cewarî, *Stranê Kurdaye Cimaetîyê*, Erivan, 1983, rûp.128.
- 5) Nura Cewarî, rûp.166.
- 6) **Kürt Halk Türküleri** (Kilam û Stranên Kurd), Ankara, 1991, rûp.178. Amadekar; Mehmet Bayrak.
- 7) Cindî, rûp.71.
- 8) Cigerxwîn, *Folklorâ Kurdî*, Stockholm, 1988, rûp.133.
- 9) Ordîhanê Celîl -Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda*, Moskov, 1978, cilt :I, rûp.373.
- 10) Cindî, rûp.110.
- 11) Celîlê Celîl, *Zargotina Kurde Suriyê*, Erivan, 1985, rûp.241.
- 12) Bayrak, rûp.101.
- 13) Celîlê Celîl, rûp.223.
- 14) Cigerxwin, rûp.116.
- 15) Cigerxwîn, rûp.164.
- 16) Cindî, rûp.73.
- 17) Ferhat, Govend - Kürtleri Türkülerinden Öğrenmek, Köln, 1990, rûp.13.
- 18) Ordîhanê Celîl -Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda*, cilt I, rûp.411.
- 19) Hawar, hejmar:37.
- 20) Cindî, rûp.33.
- 21) Cewarî, rûp.145.
- 22) Hawar, hejmar:38.
- 23) Celîlê Celîl, rûp.245.
- 24) Celîlê Celîl, rûp.116.
- 25) Roja Nû, hejmar:36.
- 26) Sekvan Abdulhekim, *Mehmed Arîfê Cizirî-Kewê Ribad e*, Stockholm, 1990, rûp.30.
- 27) Cewarî, rûp.149.
- 28) Cindî, rûp.122.
- 29) Roja Nû, hejmar:6.
- 30) Cindî, rûp.201.
- 31) Cindî, rûp.198.
- 32) Cindî, rûp.201.
- 33) Celîlê Celîl, rûp.270.
- 34) Cewarî, rûp.128.
- 35) Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe III*, Stockholm, 1991, rûp.45.
- 36) Roja Nû, hejmar:56.

- 37) Cindî, rûp.115.
- 38) Roja Nû, hejmar:45.
- 39) Cindî, rûp.115.
- 40) Zeynelabidîn Zinar, **Xwençe II**, Stockholm, 1990, rûp.109.
- 41) Cindî, rûp.30.
- 42) Cindî, rûp.70.
- 43) Cindî, rûp.47.
- 44) Hawar, hejmar:6
- 45) Cindî, rûp.108.
- 46) Cigerxwîn, rûp.146.
- 47) Celîlê Celîl, rûp.245.
- 48) Ordîxanê Celîl-Celîlê Celîl, cilt I, rûp.353.
- 49) Cindî, rûp.88.
- 50) Hawar, hejmar:28.
- 51) Cewarî, rûp.162.
- 52) J.S. Musaelyan, **Zembîlfîroş - Destana Kurdi û Şaxen Wê**, Moskov, 1983,rûp.138.
- 53) Cindî, rûp.163.
- 54) Roja Nû, hejmar:32.
- 55) Roja Nû, hejmar:10.
- 56) Cigerxwîn, rûp.147.
- 57) Roja Nû, hejmar:57.
- 58) Ordîxanê Celîl-Celîlê Celîl, rûp.411.
- 59) Roja Nû, hejmar:22.
- 60) Cindî, rûp.145.
- 61) Nura Cewarî, **Kilamêd Cimaeta Kurdaye Govendê**, Erivan, 1964, rûp.64.
- 62) Cemîla Celîl, **Stranê Cimaeta Kurda**, Erivan, 1977, rûp.34.

# STIRANA MEZRA BOTA

Medenî AYHAN

Mezra Bota

Tu kare bêje

Bê berfî niha bi çend hezar sala

Şûna tiliyê nigê me

di zeviyê te de bê çawa şûn veda ye

Kabihêle ku dîroka derewîn li ber

xwe keve

Şerê me

Serfiraziyên me

û bindestiyên me tu bêtir zane

Tu çêtir zane

Bê ji hewdikê te pêşî kê av vexwa-

riye

Bê kê li ber siya darêne te

Xwe li zevî vezelandiye

Tu çêtir zane

Pevçûna me, evîna me û hêviya me

Serê xwe li me giran meke

Dilê me bi xwîn meke

De bibêj

Mezra Bota

Di stiraneke pelê xwe de bibêj

Bê kê ev bêhna xwêdanê barandiye

zeviyên te

Kê av daye werz, rez û daristanê

te

Tu bêbext nakeve li însan

Û tu zane yê ku pêşî daneyne

paşî nayne

Ka kêfbaşî û însanetiya me bêje

Bê kê bi agirê newrozê

Ronahî da ser û dora te

Bê kê dabû hev

Wekhevî, biratî û azadî

û bê çawa bela bûbû

Li nava zevî û gelê te

De serê xwe li me giran meke

Dilê me bi xwîn meke

De bibêj

Mezra Bota

De bikêlim ruhê min

Dilê te bila giran nemîne

Em evîndarê te ne

Hisreta dilê me bi te nakeve kel û  
girî

Melûlbûn ne para te ye

Wê hemû tişt di qêrîn û ken de  
vebe

Ka bêje bi serê ziman

Deng bide ji qêrîn, hawar û nalîna  
me

Bê ji kîjan hestî tê  
Çawa xwîn digire ruhê me  
Tu ne ya van salan î  
Tu ne ya sedhezar salan î  
Tu çêtir zane  
Serê xwe li me giran meke  
Dilê me bi xwîn meke  
De bibêj

Mezra Bota  
Tu kare ji me re bêje  
Bê ev çend hezar sal çêbû  
bindestiya me

Ji me re bêje  
Ku dilê me bêtir bişewite  
û deqis li pîsa keve

Bêje  
Bê çîma axa te  
Di nava şûr û mertalan de maye  
Bi dayik, zaro û kal  
çîma bombe dixwe ji dilê xwe  
Hîn ev ci qewimandin in li welatê

Ka bêje, di şerekî dû dirêj de  
Ku mûyê laşê me biricifin  
De serê xwe li me giran meke  
Dilê me bi xwîn meke  
De bibêj

Mezra Bota  
Tu zane bê evîna zaroktiya me  
Ci êş, ci zilm û zordarî kişandîye  
Di xiş xişa pelê daran de  
Di xum xuma avan de  
Bê av, bê nan û di reşiyê de maye  
û bi ji aliyekî axa xwe  
kî koç bûye, li hêla dî xerîb maye

Ev zarokên kê ne bi kel û girî  
Di şerekî dû dirêj de  
Bi xwîna gerfla em axa te maç  
dikin  
De serê xwe li me giran meke  
Dilê me bi xwîn meke  
De bibêj

Mezra Bota  
Diya dîrokê  
Ji jiyana xwe bistîne û bibêje  
Bê li cîhanê Ehrîman û destbirakê  
wî

çend welat kirine par par  
Sînor kişandîne bi şevan  
Bila li vî alî xwişk  
Li wî alî dayik  
Li vî alî bav  
Li wî alî jihevqetandina av û axê  
çav lê ne  
Tavikê ji şînahiyê bistînin  
Zanîna te heye Mezra Bota  
Ev hesab wisa li hev dernakeve  
Tu dibînî  
Gerfla li axa te gulan dicînin  
Ji bo dilgermiya te dest dikşîne  
rokê  
De serê xwe li me giran meke  
Dilê me bi xwîn meke  
De bibêj

Mezra Bota  
Tu bêje ji zarokên xwe re  
Ma dijmin ji însanetiyyê fehm kiriye  
Ji zilmê, ji zorbâriyê  
û xwînê pêve ci naskiriye  
Rê di ci de hiştiye

Tu dibînî  
Hawîrdor dijmin in  
bigre wek bîzrê kulfî  
Azadiya vî zevî, vê avê  
û gul û kulgîkên çiya

Di lûlêن tivinga karker û gundiyan  
de ye

Qelandin, koç û hilgavtin  
Ne para kur û keçen te ye

Kîjan dilî koletî ragirtiye  
Em guhê xwe didin dilê te  
Ka em stiranekê bêjin bi zimanê me  
De serê xwe li me giran meke  
Dilê me bi xwîn meke  
De bibêj

Mezra Bota  
Hêviya me evîna te ye  
Rûken be  
Zarokê te, Egît ji Egîtan e  
Di nav agir de bi ken in  
Qêrîna azadiyê girtine bi mirinê  
Li zîndanan navê te dikolin bi  
neynûkan

Keç û kurr bi heft dila ji dilekî  
Evîna te ya sedhezar sal girtine  
Ev bîr û baweriya bi risas  
Ev qayış û berberî bi lîle lîl  
Hemû ji bo azadiya te ye  
Bêhnê bide û bistîne bi me re  
Tu bi xwîn û keda gerîla şêrîntir  
dibî

Ka em stiraneke şoreşê bêjin pîr  
dû û dirêj

De serê xwe li me giran meke  
Dilê me bi xwîn meke  
De bibêj

Mezra Bota  
Destêن xortêن bi rûmet  
Destêن bi ked  
Ji bo kêfbaşıya te nasekine  
Li vî alî û li wî alî dikeviyê  
Rê di riyan de nahêle  
Kêfbaşıya te kêfbaşıya gelan e  
Kêfbaşıya te kêfbaşıya me ye  
Xem û gazin ne para me ye  
Guhertin ji bo hemî tiştî heye  
Axa te li rojhilata navîn  
Ji gelek tiştan bi hemle ye  
Newroz dîsa di dilê gelan de ye  
Ev govend hildikşê çiyan  
û ev govend rêz dibe bajêr  
Bi dû şehîdêن şoreşê stirana  
dibêje

Daweta me ye  
Stiranen bi me re bibêje  
Ha wilo ha wilo, ha wilo ha wilo  
ha

Dilê me rehet bike  
De bibêj.

pêşîn bû ku tiştekî weha dibihîst. Dibihîst ku dilketiyekê wê jî hebû. Bi vê hevokê re pêşiyê mîna ku di aveke sar de bibe, dûre ev ava ha lê germ dibe, tiştên xwes di ruhê wê de dilivin û bi mitûmatî ji nişka ve dibê:

- Dilketiyê min?...
- Erê, dilketiyê te bû.

Mîna ku bixwaze careke din jî û yeke din jî û hertim vê hevoka ha bibihîse, dibê:

- De tu jî ji xwe re henekan dikî, lo!
- Ez bê henek dibêjim, Zelê. Ez dixwazim bibêjim û wusa biçim hafa, Xwedê.

Tiştên weke mitûmatî, tevlîhevî û dilpekî li pîrejinê diyar dibe, ji bo bîhîstina vê arşîvê xwe amade dike û hinekî din jî ber bi Sofî Bengî tê.

- Belê, dilê wî keti bû te. Her cara ku ba lê dihanî, dihat li ser vê kaniyê, di riyêv avê de li bendî te disekinî ku te bibîne. Dema ku çav li te dixist, pêjnêñ dilê wî dipekiyan û evîna wî lê diazirî.

Zela pîrejin serê xwe xistiye ber xwe mîna ku li wan demêñ xwe binêre û heyfa xwe pê bîne, di ber xwe de:

- Haya min jê tune bû, dibêje. Çima rojekê yek ne şand û ev evîna xwe bi min ne da zanîn! Di tevayiyê jiyanâ xwe de min jî weke herkesî mizgîneke weha dipa. Lê...

Sofî Bengî didomîne:

- Lê... ji ber hinek astêngên şeytanî, dildariya dildarekî hertim dûrûdirêj dajo û dûre dikeve rewşike serhildanê, Zelê. Tew ne girîng e ku te hay ji vê evîna wî hebû an ne. Bi awayekî diviya bû wî bala te bikışanda ser vê dildariya xwe. Lê bi kîjan rê? Ji bilî Xerzî û Xwedê kesekî bi vê yekê nizanî bû.

Dilê pîrejinê tenik dibe û bi rewşike xemgîn dibê:

- Bila dismalek daniya ser riya min, bila

moriyek bavêta satila min...

- Na! Ji bo haydariyê, riya ku keti bû serê wî ev bû: Diyîna zarokekî ku bi kêrf vî karî were. A ew zaroka jî wê çaxê ez bûm, Zelê.

Sofî Bengî hinekî li hawurdora xwe dinêhire, ciyê xwe xwes dike û dibê:

- A li vir, rasterast li ber vî diwarî û weke anuha tê bîra min ku ew jî li vir rûnişti bû. Li kaniyê temâşe dikir. Ez jî ji nav rezan û di vê riya ha re dihatim. Bi dengekî sermest banî min kir. Ez hatim û li vir, li pêş wî sekinîm. Pişti ku hinekî li min nêhirî, ji min re got: «- Ku ez ji te re tiştekî bibêjim, tu ê bikî an ne?» Min jî bi awayekî zarokane gotê: «- Ez ê bikim.»

Li gel vî ciyê xewle jî Xerziyê xortûxama bi tirs û dengekî nizm ji min re got: «- Lê divê kesek pê nizani be, ha!» Min pê da zanîn û gotê: «- Ez ji kesekî re nabêjim.» Lê ji bo ku Xerzî baş ewle be, gotinêñ xwe ducar kir û got: «- Binêre, Bengo! Ez ji te re dibêjim, lê bila di navîna min û te de bimîne. Ku ji devê te derkeve...» Vê carê min serê xwe jî ber bi jor kil kir û gotê: «- Na, ez ji devê xwe dernaxim.» Xerzî bi tirs û dilpekin keserek veda û bi dudulî got: «- Lê ez newêrim bibêjim...» Min jê ne pîrsî ka ew çîma newêre bibêje. Bi tevgera zarokekî ez li pêşberê wî bêdeng sekinîm. Lê mereqdariya dilê min ji ya mezinekî jî bêtir bû. Nola ku bixwaze tiştekî ji min fam bike, Xerzî li nava çavêñ min nêhirî û li gotinêñ xwe zêde kir: «- Ez ditirsim ku li develekî ji devê te derkeve û ez bihetikim.» Min dîsa dengê xwe ne kir û sozek ne da wî. Êdî min li wî jî mîze ne kir, mîna yekî ku ji anuha ve xwe gunehkar bibîne, tenê di ber xwe de min li pozikên solêñ xwe nêhirî. Lê ji aliyekevî ve jî ez baş pê ewle bûm ku ew ê ji min re wê daxwaza xwe ya veşartî bibêje. Wusa jî bû. Wî gotinêñ xwe

domand û got: «- Ma tu ê sozê bidî min ku tu ê ji kesekî re nebêjî?» Min serê xwe ber bi wî bilind kir û gotê: «- Erê, ez sozê didim ku ez ê ji kesekî re nebêjim.» Bi vê hevoka xwe re min destê xwe li hemêliya piyê xwe jî xist û gotê: «- A bi vê hemêliya ha, ez ê ji kesekî re nebêjim.» Li vir min dît ku ew di rewşcke çawa dijwar de ye. Mîna ku daxwaza mîranî an jî dilovaniyekê ji min bike, bi hêviyekê li min nêhirî û got: «- Binêre, Bengo, ne ku ez bi te bawer nakim... Bi Xwedê dema ku ez li te dinêrim, ez dibêm qeyê tu birayê min î piçûk î. Lê divê tu bizani bî ku ev ne karekî zarokan e. Divê ji devê te dernekeve.» Min dîsa serê xwe tewand û di ber xwe de gotê: «- Ez dizanim ku divê ji devê min dernekeve.»

Nola ku ez germiya xwîna di laşê wî de hîs bikim, reşbûna berên çavên wî û sorbûna ruyê wî bibinim, min hevokek bihîst: «- Ez ji Zelê hez dikim!»

Bi bihîstina vê hevoka derenketî re xwîneke xortanî di laşê Zela pîrejin de digere, dilê wê dipeke, du sê dilopên bêserm ji çavên ximamî têne xwarê û di dilê xwe de dibê: «Çima min çel sal berê ev tişa ne bihîst!»

Soffi Bengî didomîne:

- Lê Xerzî ewqas ji nişka ve û ewqas zûzûka ev pênc peyvikên xwe got ku bi xwe jî bi guhêن xwe bawer ne kir... bawer ne kir ku wî çawa got. Ez têgêñistim ku ev hevoka wî ji dev filiti. Bi gwînekî zer tavilê li ber min geriya û got: «- Lê ez bi gorî, divê tu ji kesekî re nebêjî. Divê ev pir û pir bi dizî be. Binêre, ez dizanim ku tu ne wekî wan zarokên nerind î, baweriya min bi te heye û loma... loma min ji te re got. Ji bo min tu ji birayê min î piçûk ji çêtir î. Bi Xwedê ku ji devê te derkeve, êdî... êdî ji bo min mirin e. Divê ez êdî biçim û rasterast xwe

bikujim...»

Zela pîrejin bêyi ku li Sofî Bengî binêre destê xwe davêje pêsa fistanê xwe, bi fişkefiş dev û pozê xwe paqîj dike û dîsa di dilê xwe de dibêje: «Çima te şerm dikir, Xerzî? Ma tiştek ewqas bi tirs bû, beranê min?»

Soffi Bengî bi boça gopalê xwe dilîze û dibê:

- Min didît bê ev dildarê reben çiqasî bi tir: e. Lê ez bi xwînsarî li paş xwe zivirîm û min jê re got: «- Na, ez ji kesekî re nabêjim.» A di wê gavê de min dît ku tu jî li ser kaniyê yî. Bi kulfîkén gir û zer fistanekî şînokî li te bû...

Zela pîrejin bi çavên şilekî li Sofî Beng dinêre, peyva wî dibire û bi xemgînî dibêje:

- Ew fistanê min anuha jî li ber çavê min e Min pir jê hez dikir. Xelkê jî digot, pir li min tê.

- Belê, Xwedê dizane çavê Xerzî jî di wê gavê de bi te ket. Xwedêyo, Xerziyê dildar çawa diricifi, çiqas nerihet bû! Ji wî wetrê min ê devê xwe ber bi kaniyê vekira û biçîriyama. Tavilê bi lêvîn lerzok vege riya ser min û got: «- Li min bibore, birayê min î şîrpak. Ku te divê dev jê berde û ji bîr bike. Lê ku ji devê te dernekeve...» Bi vê gotina xwe re destê xwe di bêrika xwe de kir. Min jî ew hevoka xwe ya hertiñi dubare kir û gotê: «- Na, ez ê ji kesekî re nebêjim.» Xerzî ji bêrika xwe şeyekî soi derxist, dirêjî min kir û got: «- Bila ji nuha ve ev şeyê ha xelat... ewk... bila yê te be. Min digo tu ê bikevî navîna min û Zelê ku bizani bim ka ew jî ji min hez dike an ne.»

Çavên Zela pîrejin zîq li tûrê wê ye. Lê guhêن xwe wusa daye ser Sofî Bengî ku ew guhêن giran bê kîmasî hertiñi xweş dibihise Di dilê xwe de ji weha dibê: «Min ê çawa ji te hez nekira, Xerziyê min! Ma min tew hay jê

hebû, berxê min!»

Ev xemgînî û bêdengiya Zela pîrejin bala Sofî Bengî dikêşe, dizivire ser û dibê:

- Ez dizanim bê vekirina vê bûyerê êdî bi kérî tiştekî nayê, Zelê. Bûyera ku di demekê de vatiniya min bû! Ji bo pêkanîna vê vatiniyê, Xerzî gelekî ji min lava kir û got: «- Ku te ev karê ha bikira, te ci bixwesta min ê bida te. Ez di dikanê de me, ku pêwîstiya te ji ci hebe, tu were ba birayê xwe û ji min re bibêje. Ne pêwîst e ku tu bikiri. Ez ê bê pere bidime te...» Dûre destê xwe di ciyê berê re kir, vê carê neynikeke piçûk û çargoşe derxist û got: «- Viya jî bide Zelê.» Min şe û neynik herdu ji berdan bêrika xwe.

Mîna ku min bişîne ser mirinê an ji deverike wusa, destê xwe di serê min re da û got: «- Jê re jî bibêje ku Xerzî ev neynika ha ji te re şandiye. Ji te hez dike.»

Li vir êdî Zela pîrejin bi deng digiri, Sofî Bengî jî mîna ku destanekê kat bike, didomîne û dibê:

- Herweha şev û rojêن Xwedê dan pey hev û li hev buhurîn. Gelek caran min jî xwe da serê riya avê û li bendî te sekinîm, li hawurdorî kanî û birê geriyam, bi mebesta tîbûnê min ji satilên te av vexwar, lê tu carekê jî tirsâ dilê min rê neda ku ez neynika çargoşe dirêjî te bikim û evîna dilê Xerziyê ji te re bibêjim, Zelê...

Zela pîrejin berê xwe bi Sofî Bengî de dike û di nava giriyê xwe de dibê:

- De ka bibêje bê tirsâ te ji ci bû! Bi kêmanî te dikanî bû li ciyekî xewle ji min re bigota.

- Ev ne tiştekî ber bi aqilan bû. Erê, ez hinekî piçûk bûm. Lê di wî salî de êdî min jî dizanî bû ku dil û dildarî, bi gotineke din cîma jîn û mîr ji bo hev hatine afirandin. Ji ber vê

yekê heta demeke dirêj jî, min ji Xerzî şerm kir û xwe jê veşart. Lê êvara rojekê ez çûm dikana piçûk, piştî ku min dît dikandarê me bi tenê ma, min bi dengekî nizm gotê: «- Min Zelê dît. Min jê re got... min got, Xerzî ev neynika ji te re şandiye. Pir ji te hez dike.»

Zela pîrejin bi hêrs û enirîn di ser Sofî Bengî de dibê:

- Te ruyê xwe reş kirî.

- Belê, piştî van gotinêن xwe, ji rûresî mir rabû hêdîka paçekî soravî ji bêrika xwe derxist, dirêjî wî kir û min gotinêن xwe yên xêrê jê re domand: «- Zelê ji min re got: Ez ji ji wî hez dikim, pir jê hez dikim... loma ez vî perçê pîneyê piçûk weke diyarî jê re dişnim...»

Zela pîrejin bi rewseke bêhêvî destêن xwe vedigire û di ber xwe de dibê:

- De ka ci xêr di van gotinan de heye?

- Belê, dikandarê ku çav li pînê soravî xist mîna ku hiş û aqil ji serê wî biçe, sar bû û bi devjihevî heta demekê jî bêdeng ma. Xwedê dizane di xeyalêن xwe yên piçûk de bi te re lî newalêن kwîr û ciyêن xewle digeriya. Dûre bî dilekî şâ zivirî ser min, ew pîneyê ha ji dest mir girt û got: «- Ez çavêن te bixwîm, Bengo! B rastî ji tu jîr î, tu çavê min î! Bavê lawikan!»

Zela pîrejin êdî nikane enirîna xwe veşêre berê xwe bi hêla din ve dike û dibêje:

- Bavê kûçikan!

Sofî Bengî bêyî ku bitengije dibê:

- Ci dibe bila bibe, Zelê. Lê wî, pîne dî destê xwe de bir û hanî, dûre bi kêfxwesî mist: xwe di şûşa şekirê nokan de kir, destê xwe jî wir dirêjî qutiya piskivitan kir, ci şekir û şêrin di dikanê de hebûn, destê vî dikandarê começ li ser hemûyan jî geriya û ber bi min dirêj bû Bêrikêن min ji tiştêن xwarinê hatin dagirtin Têgêhiştîm ku li vê dunyayê perê her

giranbuha jî bi qasî vî pîneyî, li ba dikandar ne bi nirx e. Ca bifikirin, bi pînekî weha meriv bikani be ewqas şekir û şêrîniyan bikire!

Dîsa ufînek bi Zela pîrejin dikeve û dibê:

- Li te bi jarhr û xwîna kûçikan be!
- Belê, wek kûçikê ku carekê dev li xwînê bîkeve, serî çend rojan carekê min paçek dîbir û dida Xerzî, bêrîkên xwe ji tiştêن xwarinê tije dikir û diçûm. Ne tenê tiştêن xwarinê, herweha şûşen lampan, findêن rengîn, sawûnêن bi bêhn...

Zela pîrejin bi êş û tengijîn dike pilepil û dibê:

- Kurm di te keve, tu genî bibî, Sofî!
- Hemû jî bê pere, ango bi perçê paçekî, bi girişeki. Xwedê dizane ew hemû paç, pîne û qursikên ku min ji dikandarê dildar re dîbir, wî ji bi kîf û dilekî xweş heta du sê rojan bi xwe re digerand, li devernê xewle pê dilîst, bêhn dikir û dûre jî wek perên rûmetdar dîbir di ber bişkuvêن balîva xwe re didewusand hundurê wê. Min ewqas paç û pîne kişandin ku! Ez baş dizanîm ku wê çaxê ji wan paç û pînan ew balîva wî çiqas werimiye, dibe ku carina dema ji xew şiyar bûye hustuyê wî jî êşiyaye.

Dîsa pilepil bi pîrejinê dikeve û dibê:

- Hustuyê nerîndan bişikê!

Sofî Bengî nabihîse û didomîne:

- Dema ku te mêt kir û çûy, ez jî êdî ne çûm dikanê. Heta ku ji min dihat, min xwe ji dikandar jî dûrdixist. Piştî ku êdî hertiş diqedede, ew jî diçe ber balîva xwe ya evînê, di kîlekek bişkuvî re, hemû paç, pîne û weslêن ku tê de ne, derdixe, yek bi yek bi keservedan lê dinêre û ji nav hev dide alî. Dema ku di nava wan de ji şalê mérän çavêن wî bi paçekî dikeve, bi şûn de divenciqe û tavilê têdigêhîje.

Têdigêhîje ku ev hemû paçêن ha rengêv evîneke derewîn e. Paçekî herî piçûk jî bi destêن te ne hatiye şandin. Têdigêhîje ku min ew xapandiye. Min ji malê, ji qutiya diya xwe, ji devernê din ev paçêن ha berhev kirine û hanîne... Heta roja ku ji vir bar bikin jî, min hertim xwe jê vedizî û min ne xwest em raserî hev bêñ. Carina ku em rastî hev jîbihatana, mîna ku tew tiştekî weha ne bû be, wî jî çêlî çîrokê ne dikir. Ez bawer im ne dixwest bi bîr bîne, an jî dixwest ku ez ji bîr bikim û hîn jî ji kesekî re nebêjim...

Ev evîna melodramîk tê gotin û diqedede. Lê herwekî ku tê gotinê, her dawiyek destpêkek e, a ji bo Zela pîrejin jî bûyereke nû dest pê dike. Ji vir û weha dilpeki lê radibe, dikeve guamanan û xwe bi xwe dibê: «Aya ew daxwaza wî ê anuha jî hebe? Ma dil ne dil e?» Dema ku li ser pîrbûna xwe û wî difikire jî, bi tevgerekê gunehkarane serê xwe li ba dike û dibê: «Xwedê ruhê min ji van pêjnêن şeytanî bisitirîne!...» Lê carina ev pêjnêن şeytanî lingêن Zela pîrejin ber bi bajêr dikêşîne. Di her carêن weha de jî di bîra wê de ye ku riya xwe bi dikana Xerziyê pîr bixîne. Di her seredanêن weha de dibîne ku pîremêrekî nola van meleyêñ mizgeftan serûguhê wî paqîj, hustuyê wî sitûr di dikanê de rûniştiye. Bi mebesta ku ew ê tiştekî bikire, Zela pîrejin dikeve dikanê û bi şîrîteke dezî derdikeve. Lê tu carekê jî ruyê wê nagirê ku ji Xerziyê dikandar re bi lêv bike ku ew Zelê ye. Û piştî her seredanêن weha di dilê xwe î şewutî de dibê:

- Anuha ez têdigêhîjim bê çiqasî dijwar e. Çiqasî dijwar e ku meriv vê daxwaza dilê xwe bi lêv bike.

Hazim KILIÇ

## Riya Hêvîyê

Wekî her mirovekî bîrewer dizane; jîyan têkoşin e... Di dîroka gelekê da rûpelên tarî jî yên geş jî hene... Jîyana bi êş û jan, kul û derd niha ji bo piranîya gelan bûye gotineke klasik. Ew demêñ tarî di nostaljiya nifşê sere yên wan da êdî wek xewnekê mane. Ji xwe nifşê nû van bûyera di nav rûpelên pirtûkan da dixwûnin...

Lê belê, gelo eve ji bo gelê me jî wisa ye ? Mixabin nexêr! Belê, nexêr! Ji ber ku êş û jan, derd û kul hêj jî ji bo gelê me gelek aktuel e. Hêj nebûye nostalji!.. Ma kîjan gel naxwaze ku serpêhatiyê dilreş tenê di bîranînan da bimînin. Lê nexweşî, zulm, zor û zehmetî êdî bûye toka şeytan û ketîye stûyê gelê Kurd. Ev serpêhatiyê tahl û xemgîn bûyne destan, kilamên şînê, helbest, stran, çîrok û roman... Digel vê çendê jî gelê me di berhemên xwe yên çandî û edebî da hêviya xwe winda nekirîye. Di nav hinde asteng û dijwariyan da xwe şâş û berze nekirîye... Serpêhatiya xwe gotîye hem jî bi dengekî bilind lê di dawîyê da hêviya xwe jî ji bîr nekirîye... Bûyerên berî vê sedsalê li aliyekê, di serê vê sedsalê da, di demê şerê cîhanê yê yekemîn da an jî bi gotina bab û kala di demê "seferberlika" pêşin da ci bi

serê gelê me hate anîn... Bi hezaran mirov ji welat hatin dûr kirin, hatin kuştin. Gel hate qir kirin. Yêh hatine bar kirin jî di riyêñ dûre dijwar da mirin û winda bûn... Ev bûyer û serpêhatine hemû bûyne çavkanîya edebiyateke xurte têkoşer ji bo gelê me... Bûyne name, nivîsar, helbest, stran, çîrok an jî roman û gihiştine nifşen iro û dê bigihin nifşen paşerojê jî... Ev cûre edebiyate dê hêj jî dom bike. Heta rizgarîyê. Heta jîyanek serbixwe û bextewar...

Dema "seferberlika" pêşin ku gelê me digel Ermenîya hate qir kirin, Dawer Erdelanî ji Kurdistana Başûr ber bi Stanbolê ve têt û vê trajedîya gelê xwe bi çavê xwe dibîne û pişti digihe Stanbolê dîstiyê xwe ji kovara Jînê ra dinivîse. Bireke vê nivîsara wî di hejmara 18. û rûpela 20-an da tête weşandin... Nameyeke sentimental û bêyî ku bi bêjeyên edebî bixe-milîne her wisa ji nava dilê xwe bi dilkeser û kovanî û sade nivîsiye. Helbet name bi zara-vayê soranî ye û em jî dê orijinala wê li jér bidin. Ji ber ku bi zimanekî vekirî hatîye nivîsin têgihîna wê dê hêsan be...

Erdelanî bi his û dilsotunîyeke mezin wisa dibêje :

"Le paş pênc sal henase kêşan û bîrsiyî û

tênwî, axirî, xom geyanduwe naw biraderanî komelperwer û wetendos! Min le jêr em bare nahemware da hemû çiştêkim li fikir çûbûwe w hetta le jiyanî xom herasan bûbûm.

Emgut : Xudaya, le paş em agire “Kurd” çi lê dêt ? Le Mardîn û Mosile we ta weku Estemûl hemû kew û berd pîr bûbû le muhacîri Kurd. Yekê berdi eşikan, yekê xakî hel eken, yekê barî ekêşa. Hemû rût û qût. Her emende nebû. Zorî le birsa emird ebûwe xorakî qel û gurg.

Of, kam dil le pêş em menzerey berd berêje da natwêtewe! Kam çaw le beraber em sefalet û reşbextiyê da pîr le firmesk û agir nabêt! Ax, em bextereşe! Le Pozantî bo jûr, pîrejinekim dî. Sê kiçî wîrdî bû, berdyan ekêşa. Xom ranegirt, lêm pîrsî :

“Te ji kêder î, dayê ?”

Ke dengê minî bist, pîr çawî bû le firmesk, be işaret kiçekanî pêşan dam : “Emane mindalî min in. Bo parûyê ‘nan’ sibey ta êware ekoşin, hêsta têr man nakin. Du kurim le ber mird, bawkîyan emro sibeynê le jêr (kawîli kêwekî pêşan dam) ew berdasa mird, kirdmane jêr xakewe”.

Min berçavim tarîk bû, dilim hate lerze, gêj û sir bûm. “Ax, em bextereşe”. Birrê nan û parem pê bû hemûm daye dayke pîre-w rabûrdim.

Pirejin le “Wan” e-w geyşibûwe ewê. Feqet sê qurbanî dabû. E ke tesewir bikirit komeli Kurd çi kêşawe, çi mawe l’em hîkayetane eminde zor e. Eger pîyaw bêt û hemûy binûse, umri “Nuh”î pê lazim e.

Kurdistan hemûy talan kira, heta way lê hatuwe. Zor cêga merêkî, bizinêkî tiya nemawe. Bo emane çi bikeyn ? Kurdistan

wezifey zor e. Feqet eme le hemû gewretir, le gişt bee hemmîyettir e.”

Belê, sal 1918-1919 û ev xweşnameye di kovara Jînê da hatîye weşandin. Lê belê hûnê bêjin heçku îroya Kurdistanê hatîye teswîr kirin... çi ecêb!.. Ev nimûne ne kêm in, bi zêdehî ve hene di dîroka gelê me de... Ma sih û sê gundiyên hejare deşta Ozalpê çawa bûne “Sih û Sê Gule” yên Ehmed Arif. Jenosîda Helepçe çawa bû stran di dengê bilbilî yê Şivan Perwer da... Ji xwe qir kirina adara 1991-ê li Kurdistanâ Başûr ku bi hezaran mirovên me, biçûk-mezin, hatîn teli-fandin, dê hetmen bibe babeta gelek berhemên çandî, edebî û pîşeyî... «ro Şîrmez jî dê bibe helbest û stran, dê bibe roman û dibe ku gelek cihêن dî jî...

Lê belê, vê tabloya reş û tarî disa nikarîye serûkanîya hêviyê di nav gelê me da çik bike...

Di jîyana gelê me da hêvî û têkoşîn bi hevra bûye. Gelê me li ber hemû nexweşîyan hem têkoşîye hem jî hêviyâ xwe her xurt û qewî kirîye. Ji xwe hêvî bi têkoşînê aj dide. Cihê têkoşîn tê da nebe hêvî jî lê şîn nabe. Helbet hêvî ji bo herkes û her gelekê ne yek naverok e. Gelên ku niha xwedî dewlet in, ew ji bo jîyaneke refah û dilsatir têdikoşîn. Lê belê, gelê me iro di serê her tiştî da hêviyâ xwe kirîye dewleteke serbixwe... Heke kes an jî gelekê hêviyek dabe pêşîya xwe, ew êdi ketîye ser rê û qada têkoşînê. Gelê me ji kûrahîya dîrokê heta iro hêj jî li ser vê rê û qadê ye. Hêj negîhiştiye hêviyâ mezîn...

Lê belê li ser riya hêviyê ye. Hêviyekê xurt... Jîyana gelê me ji duhî heta iro her hêvi afîrandîye. Vê hêviyê hem di jîyana rojane û civakî ya gelê me da hem jî di jîyana çandî û edebî da xwe daye nîşan. Têkoşîn û hêviyê

*Dest bidin hev hemî pêş kevin em hemî  
Da biçin bo welat yan mirin yan felat.*

Ev pêl û heyecana germ û gur ji xwe di "Kîme Ez" da di dereca herî bilind da ye... Di dîwanên dawî da jî têr û tijîfiya helbestên Cegerxwîn dom dike û ji helbestên wî tovê têkoşerî û hêvîyê dipere...

Ev his û rûhiya mirov di guhdar kirina straneke têr mesaj û hêvî da jî wisa ye. Sîvan Perwer wekî strana li ser jenosîda Helepcê dixwûne hisek wisa mirov digre... Berhemên çand û edebî yên bi naverokên xwe têr û tijî, mesaj û heyecaneke têkoşerî û têr hêvî didin mirov û gel. Bi vê yekê kar û xebata çand, edebî û pîşeyî xizmeta têgihandin, pêşveçûn û serketina gel dike.

Ji duhî heta iro bûyerên bi serê gelê me hasî bûyne hevirê hûnandina berhemên çand û edebî. Zengîniya di vî warî da ji aliyekê bi jîyana gelê me ve girêdayî ye. Ev jîyane bûye bingeha edebiyata devkî. Edebîyata devkî hem têkoşerî, hêvî û heyecanek xurt daye gel hem jî bûye stûneke qaîm ya edebîyata nivîskî. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bêje ku edebiyata devkî hem bûye xîm û xwûna jîyandina çand û edebî û hem jî bûye çeperekî berfireh û xurt li dijî helandin û têkbirina gelê Kurd...

Em sedsalên navînî û hetta destpêka vê sedsalê danin aliyekê her berî bist-sih sale jî hejmara qelemdestên me nedigîhişte hejmara ducarî tifîyen herdu destâ. Lawazîya di vî warî da xwe di timamî jîyana gelê me ya çandî, edebî, cîvakî û politik da rû dida. Helbet di rewşek wisa da rol û girîngîya edebîyata devkî mezintir dibû...

Lê belê, iro di hemû baskêni jîyana gelê me da pêşveçûnek xûya dike. Taybetî di van dehpazdeh salêni dawî da digel jîyana çandî, edebî û pîşeyî di warê ramyarî da jî pêşketinek berbiçav tête dîtin. Helbet pêşketina bi giştî jîyana çandî, edebî û ramyarî tesireke pozitîv li bizava rizgarîya gel û welat jî dike û ev yeke enîya berxwedana gel fireh, geş û xurt dike.

Iro berxwedan û serhildan êdî bûyne çeng û perên bizava rizgarîya gelê Kurd. Di rojekî wisa da rola xebata çandî û edebî girîngîtir dibe. Xebata çandî û edebî herdem lê taybetî di qonaxeke wisa da divê wekî şürekê bête xebitandin. Karê çand û edebî yê di xizmeta gel da divê mil bide jîyana têkoşerî... Hêvî di xebateke wisa da ye. Xebata çandî, edebî û pîşeyî divê hêvîyeke xurte paqîj di bîr û bawerî û ramana gelê me da biperîne. Kurdistan û gelê Kurd divê bi berhemên çandî, edebî û pîşeyî yên naveroka wan têr û tiji bête nas kirin. Heke riya hêvîyê bi çand, edebîyat û pîşeya têkoşerî ve bête hûnandin hingê dê hesûya gel û welat jî geş û ronaktır be...

Tebax 1992

---

Silav li giyanê şehîdê pakî nemir Musa ANTER.

---

# PAYIZA ÇIYAN... BÜKA AGIR

## Ehmed HUSEYNÎ

*Payîz Payîz  
Bûkî pirçzerd  
Min mat, to zîz  
Herdû hawderd*

### GORAN

Eger hat û çiyan bi dilovanî destê berbangê ji pêçeka kevirînî ya evinê, deranîn...  
Kela girî di dilê ( Hekarê ) de geşir dibe, li ser pelên axîna wê yî tûj-ji bêçari-kew û dîlan, hev dinasin.

Berbanga te,  
di banga rizayî de, matmayî  
Dilop dilop  
bazzide ji seyrana şûr  
Kulilkên bi demûşa şebnemê  
yên bi nûçeyên dawa serdemê, har bûbûn  
Li pê te  
Li pê xizêma dilê te  
Gîhişt in  
Xwe dahîstîn pêla rewrewka dûr  
Vê taristana kûr  
Mêvanên te ne poşin û xewnên stûr  
Bagera tozê, Romî û kurekûr  
Serbazên çavşorî, sîkopatî  
Rimbazên bêcîrî bigincir  
Mirin, mirina ku teqyaye cûr bi cûr  
Tiliyên te ji nifiran derdibin  
Şîşen birînên di lerza te de, kerr dibin  
Û sibehêن te şermîn in,



Koçen xwe di mij û talanê de, bar dikin  
Êvarêن şîrkî di herikîna gezo de:  
Şûnşopan û çize çiza dilan  
Hêlinên hêwî yên qulingan  
Sersariya rîvingan  
Reşgirêdana gulan di ava maçê de, nas dikin

Helbestên barana tîrsokî,  
Sazbendekî bêhiş û tembûreke kod bixwîn,  
bext dane te, rext dane te, next dane te,  
gulvedana termê te, spas dikin.  
De rabe Hekarê...!  
Li te gunehkarê...!  
Şevbuhêrka te, diroka te nû ye...  
Şîniyê te, gava payîzê zû ye...  
Tu ar î, tu neviya dû ye...  
Bûka ji gihasêvkê bê lilandin û berbû ye...

\* \* \*

Şevger, payîza pirçzer, digindirin  
Zarokên bişîrvêkirî,  
çavşînkên şîmakirî, digindirin  
Zimanê jêkirî xwîna xwe dimije, digindire  
xwe çem dike devê berbanga gemkirî  
Salêن ji berû û mewijan, çûn, wenda bûn  
bi hetava giyan re zîvirîn û gindirîn  
Xewn ji hev ditîrsin  
Hêsrêن hinarkên zer, diçikin,  
Zarok navêن xwe, rojêbûnêن xwe diçirînin  
Ne dilşad û ne dilşîn in  
Şagirtêن serdema cejer bi xwîn in  
Lepêن gundiyan bilez, movikêن xwe  
hiltûnîn

Tarî digazine ji tarîtiya xwe  
 tû dike rengê xwe,  
 Dergeh têñ girtin  
 Bahozêñ zer poşman dibin  
 Rûbarêñ sor ji keskesorê bê guman dibin  
 Zemîn têt xemilandin  
 Seranserî Hekarê têt çîrisandin:  
 bi maçen zuha  
 bi lêvên qeliştü  
 bi sîngêñ singokirî  
 bi pêşîrêñ tazîkirî  
 bi Hekarê,... Nîv sax  
 Nîv saxîmirî.

\* \* \*

Hekarê??!  
 De rabe ser xwe  
 Rabe, zengil bide dest xwe  
 Hemû rexên payîzê ji hawara te re  
     hatine afirandin  
 Kolan bi kolan dilbijokê te ne  
 Hemû gornepaşen tovên guhîzê  
 Gor bi gor dilbijokêñ vedana te ne  
 Dayik xwas  
 li ser bêderan berzûri pêxemberan dibin  
 Sorgul guh nadin muzîka baranê  
 Yezdanê pak û dilzarokî  
 Xwedanê not û neh navêñ fedyoki  
 ketiye serê dîlanê  
 Hekarê... Têkeve destêñ wî,  
 Pêlekê ji xwêdana xwe bid-yê  
 Lê xwe med-yê lê  
 Lêlê biqurbanê.

\* \* \*

Payîz e Hekarê  
 De rabe gulokê  
 Vexwe, wekû şûrekî di ber xwe xe, nalîna  
 tiokê  
 Rabe, ta ku em bi ava bîhokan destnimêj  
 bigrin  
 Mane:  
 rojhilat di xeftanê te de asê bûye  
 rojava di çepkêñ te de çê bûye

bakur ketiye paş çeperên şevê  
 basûr bûye leheng û hozanê revê  
 Rabe bo min bêje:  
 Kîjan darê ji dilê xwe re bikme karker  
 Kîjan darbestê ji govenda birçîyan re  
 bikme per  
 Kîjan çiyayî ji hejmartina qamçıyan re  
 bikme ferheng

Kîjan zemînê ji sirûda serbixwebûnê re  
 bikme pêşeng  
 Kîjan helbestê ji naskirina hebûnê re  
 bikme sînor  
 Kîjan mebestê ji gewriya nebûnê re  
 bikme tor...?  
 Rabe bo min bêje:  
 Kîjan stiranê veşerim di bin çermê xwe de  
 bo peyala serxweşiyê  
 Kîjan lavlavê hilgirim bi dû termê xwe de  
 bo şemala rûreşiyê...?  
 Kîjan peyvê ji te re bikme balgeh?  
 Kîjan xencerê ji pêşenika te re bikme şeh?  
 Kîjan qendîli ji cergê te re bikme reh?  
 Amade be Hekar...  
 Ez û tu bi tenha xwe ne  
 Bo te şîn, bejna qirkirinê û cavêñ Zîn...  
 Bo min kîn, bîna bendewariyê, kêferata  
 Hemrîn...

\* \* \*

Hekarê  
 iro... Min te ji serhişkiya çiya hilbijartiye  
 iro... Min te di albuma giyan de veşartiye  
 iro tu jîn î, dilrevîn î  
 bi vizeviza gulan jimartiye  
 Di ruyê min de girtin e, guliyêñ berfê  
 Li ber çavêñ te yên hingivîn  
 sêdarkirina banga defê  
 Ta ku /HEKO/ ne dawiya qîrînê be  
     ne mizgînxêra evînê be  
     ne goşiya çinînê be  
     ne xewna axê be  
     ne bûka taxê be  
 Têñ, ji çaralî, demsal û payîzên qerfê.

\* \* \*

Bêdengiya te payîz e, mirin bi ser te de ket  
Gulwaz ji ferhenga te diherikin, bêminet  
diltenikbûna te li gulebaranê rast tê  
Dilê me bi ser te de dikeve/  
Welat dibişkive, di guharê berbangê de  
dilive/

Tevzînok û pîrevok, te bi nav dikin

D i l o p

D i l o p

canê te li me belav dikin

H

E

K

A

R

Ê

\* \* \*

/ H /

... Hewar e, zixtên serxwes dihingivin  
gurçika rojhilat. Hişê hîman bi qolincan têt  
guvaştin. Dilsojiya pinpinîkan, hej û xwelî-  
bakirina gulan, goristanên bîrtûj, bi tûpêr reş  
î ges dinivîsinin: Xelat xelat, husa hatiye serê  
kewan, romana bênav e, wişeya bê zirav e,  
navnişana felat e... felat.

/ E /

... Esmanê gerden şîn e, ewrekî sergerdan û  
dîn e, dêmên teze û berberoja terikî, xwe newq  
dikin... Banga gulfiroşan ji xelmaşbûnê radi-  
kin, singa germ bi ala pîrozî şad dikin.

/ K /

... Kevok li hev dicivin... Xwe dişon, bi  
keskesora çiyan, xwe dadiweşin in ji ariya  
topan, xwe diçivîn in, xwe digihînin hêlîna  
kilkirî û şaxêni niştiman.

/ A /

... Azadiyek sor bi poşen xwe perda bindesi-  
tiyê diçirîne, bi qulocen xwe navê zindanan li  
ser eniya rokê dikole.

/ R /

... Ronî, nimebaran, rêçen tazî, dastanên  
bargiran, çûkên baskokirî, cejnên kurdünde,  
bazên di xebxeba çiyan de, dilebitin, ji pencen  
berbatê difilitin:

Kurd...

Kurdistan an kurd stîran

Gêrikên bê mûristan

tiryê merzone û lêva sedsaliya bîstan.

/ Ê /

... Ê ş , k e z i y ê n  
hevreşimîn, dipêçen, bîranînen şelû û serserî,

Di xewnê de dibin bîn-bîhok

cîvik û zarok te himêz dikin:

Bûka êgire...

Nazik e...

Lêv tenik e...

Payîzxîr e, girnijîneke bi guregur e...

\* \* \*

Hekar...

Dê gun û şar

sazbend û gulbihar, bimirin...

Berberojen ku stûyên xwe bi dû rokê de  
xwar kirine

dê bimirin...

Lê/

Dê şili têkeve şûna zuhayê...

Dê banga te aza bibe ji pencen bayê...

Dê şalê te raweste li ber pêlên tayê...

çûk, pepûk, taristan û nenûk,

Dê biweşin ji xaçerêkên axîna dayê...

# Jİ AUSTRALYA: ROJBAŞ

## Şahînê Bekirê Soreklî

“Vegere, em ber mirinê hev bibînin,” bi dengekî kelgirî dibêje xûşkeke min di kasêtê de. Ji salên jiyana min ev bûn nêzikî bist û heft li dervayê welêt derbas dibine. Di cotmeha 65an de ez ji bo xwendinê ji welêt derketim. Li Otrişê û Almanya sê salên bi rojên geh xweş, geh zor dijwar, derbas bûn û di cotmeha 68an de ez gîhiştim Australya.

Li dû derketina min bi salekê rojnameyêن fermî navê min û hevaline di rûpela mehkeme û curman de weşandin: “ji bo endamtiya rôexistineke veqetxwaz û nijadperest, divêt ev kesên navê wan li jêr hatinî nivîsandin, seet 10, roja 20/11/69 di Mehmekemeya Bilind ya Emniyeta Dewletê de li Şamê besdar bibin, da ji bo ev curma li ser wan werin mehkemekirin. Eger neyêن, mehkemekirina wan ê bêyi hebûna wan, li gor bend 79 û 174 yên qanûnên,...”

Erê, bi umrê 19 salin, ciwan û xort, bi armancêن mezin ji welêt derketim. Ber çend hefteyan herdu zaroyan û dayika wan 46 saliya min “pîroz” kirin. Kurê mezin 16 salin e, yê din 13; herdu ji nikarin bi kurdî biaxîfin, dayika wan australî ye, ji malbateke bi esil ji Înglitztanê. Ber demekê meriyeke min li welêt gotibû, “Şahîn ji bo şâştiyêن di zimanê me de loman li me dike, zaroyêن wî bi xwe ji bi kurdî nizanin.” ci gotineke rast e! Lê kî ci

dibêje, bila dibêje, rewş ev e!



Ber çend salan, min di rojnameyekê de xwend, ku “xelkê Rohilata Navîn bi ser û binê xwe siyasi ne.” Ji bo gellek kesen kurd ev gotina rast e. Helbete siyaset ji siyasetê ferq dike, lê sedema “siyasetvaniya” gellekan ji me bi kurdbûna me ve grêdayî ye. Teqereqa Kurdan ya siyasi her tê. De êdi çiqa sûd û çiqa zirar jê dertê ev tiştekî din e. Xebata min ya “siyasi” di sinifa çarem de dest pê kir. Bawer im di 57an de bû. Mamoste di şanoyeke “niştimanperwerîye li dij impiyalîzmê û kev-neperestiyê” de rola Dîgol(Charles de Gaulle) da min. Şano di meydana bajarê Kobanî de li pêş bi sedan(bi zimanê Rohilata Navîn: Li pêş bi hezaran) kes hat pêşkêşkirin. Dîgol serxweş bû. Şûşeya şerabê di dest de, wî ji leşgeran dipirsî: “hûn ji min ci dixwazin?” Leşgeran, ciwanine kurd ji sinifên cuda, digotin: “Em ji te potînan dixwazin.” Dîgol ber bi çep û rastê dileqiya û digot: “Potînên we li ser ser û cavêن min.” Û temaşevan dikeniy-an,... Di 58an de Sûriye û Misir bûn yek. Em li dû mamosteyêن xwe yên misrî diqîriyan: Nasir, Nasir; Me kir yek, me kir yek; me erd û ezman kir yek. Filistînê em hatin, yek ji me bi sedî ye. Duhu Swês, iroj Filistîn û dûvre Iskenderon,...”. Di dema Nasir de Kurdên Sûriyê tađeyeke mezin dîtin. Di 61an de herdu welat ji hev veqetiany....

Di rojêñ zarokiya min de li hêla Kobanî, dora 30 kilometir li rohilatê Ferêt, li hember Srûcê, hestê netewî razayî mabû. Kurdan zimanê erebî û tirkî wek zimanê hukmatê û yê erebî wek zimanê xwedê pejirandibûn, lê ji % 99 ji xelkê hevîrkê, çend gotinêñ bi erebî ne tê de, tenê bi kurdî dizanibûn. Wek nîse, bavê min her digot, “aax, ax, bila zimanê ev hukmata vir bi tirkî bûya!” Qe nedigot, “... bi kurdî bûya!” Damariya min, li milê din, di nimêja xwe de digot,” Kul wellahî ehed. Ellahi semed. Lem yelid, yekun, kufwe-ehed.”

Dema kesek bi ev erebiya wê ya kullek bike-nya, wê şermok digot, “şivêñ gotiye: ‘çoyê şivêñ, qoçê berên,’ xwedê jê qebûl kiriye.” Ev li hêlekê, li hêla din, di nav hev de axiftina ne bi kurdî tiştekî şerm dihat dîtin. Erf û edetêñ hevîrkê yên kurdî bûn. Li hevîrkê pirsigirik û gelşen li holê li gor erf û qanûnê eşîran dihatin çareserkirin. Bi gotineke din, pirsêñ zewacê, parvekirinê, yên xûnê, û yên din bi şêwîrê û li gor erf û edetêñ Kurdan dihatin çareserkirin. Di rewşeke wisa de zarokiya min derbas bû.

Bi vegera bi rehmetî Barzanî ji Yeketiya Sovyêti û destpêkirina şoreşa “Kurdistana Îraqê” re hestê netewî dest pê kir bilipite. Navê Barzanî li cem Kurdêñ hevîrkê bû navekî muqeddes. Di sinifa heftem, yan hestem, de berpirsiyarê partiya Komonîst li bajêr ez û du hevalan birin mala xwe û dersa me ya yekem di siyaseta “hizbî” de da me. Me êdi dest pê kir pirtûkêñ li ser Marksîzm-Lenînîzmê bixwênin. Di sinifa nehem de ez ji bo xwendinê çûm bajarê Helebê. Hevaline ji Efrînê, Cizîrê û Kobanî peywendi li gel min û hevaline girêdan û em bûn endamêñ Partiya Democrat. Rojekê bavê min ez dam hêlekê û got, “min bihist tu di siyaseta kurdî da kar dikiye. Bike, aferin, lê li xwe miqayit be.” Ez bi ev gotina wî gellekî kêfxweş bûm.

Têye bîra min, em li Helebê diçûn şûna otobüsên heciyan, yên ji Tirkiyê dihatinî û ji Sûriyê derbas Hicazê dibûnî. Em li gel “Kurdêñ Tirkiyê” dixistin û me ji wan dipirsî, çima ew ev pereyan li xwe û zaroyêñ xwe xerc nakin. Kesêñ belengaz bûn, newêribûn bersîveke rêk û pêk bidin. Li Helebê em fêr xwebêja Newrozê bûn û me dest pê kir Newrozê pîroz bikin. Me belavok xwendin, belav kirin, di civînan de beşdar bûn, li ser mafêñ Kurdan gotûbêj kirin. Ev bû xebata me ya siyasi, “veqetxwaz û nijadperest.”

Roja yekem di xwendegehê de jî xweş têye bîra min. Mamoste ji xwendekaran pirs dipirsîn. Wan bersîvêñ xwe bi “neäm” û “kelle” didan. “Neäm” ji bo min gotineke biyanî bû, lê “kelle” xwebêja serê bizin û miyan dihanî bîra min. Hêdi hêdi ez fêr bûm, ku “neäm” xwebêja erê û “kelle” ya na didin.

Ber destpêkirina xwendegehê min zor baş dixwend, lê bêyî fêhmkirina peyvakan. Xoceyê me yekî tirkman bû. Bawer im navê wî Zekeriya bû. Em fêrdikirin xwendina quranê, tirkî û erebî li nav hev dixistin. Ji ew salêñ li ber xoce ev “helbesta” ku me li hev siwar kiribû têye bîra min: “Elif bê tê, cim cacê. Welle xoce biz acê. Biraxisen gêderik, biraxmessêna qaçerik.”

Gondê Mezrê, şûna ez lê bûmî, li nêzikî sînorê tev Tirkiyê bû. Xeta trênenê û mayînêñ li hêla Tirkiyê Kurdêñ herdu besan ji hev vediqetandin. Di wan deman de Mezrê gundekî biçûkî xweş bû. Nîvê gund yê bavê min bû, nîvê din yê xalanêñ min bû. Bavê min, Mehmed Eli Soreklî, axayekî ji dereceya çarem bû. Axayêñ derceya yekem Beg bûn. Hem dewlernend, hem xwedan êl û eşîr û hêz bûn. Li hevîrka Kobanî ji wan du kes hebûn, bra bûn: Bozan Beg û Hirço Beg( Bozan Şahîn û Mustefa Şahîn). Li dû wan dihatin

xwendina zanîngehê de min wek garson û şofêrê taksiyan kar kir. Di destpêka 74an de min ji nû ve dest bi xwendinê kir û di dawiya 77an de di zanîngeha Macquarie ya Sydney de xwendina xwe bi şehadeyên Bachelor of Arts û Diploma of Education tewaw kir. Ji 88an û vir de ez ji bo Wezareta Perwerdariyê ya Wilayeta New South Wales di kar de me. A nuha di lîseyeke Sydney de mamosteyê zimanê almanî û erekî me.

Australya min ci caran di xewnan de ji nedîtitbû. Nuha ez carine ji xwe dipirsim, gelo rast qeder heye, lê gelo birtyareke di deyekê de tê girtin rêçika jiyanâ merov, wek xeteke berê trênekê ji hêlekê bide ya din, dide guhertin?! Bersiv ci dibe ji tiştek min mat dihêle. Ji 46 salên jiyanâ min tenê dora 14 salan bi tevahî li Kurdistanê derbas bûne, çardeyên destpêka jiyanâ min. Ji 5 salên din yên ber derketina ji welebêt beşê mezin li Helebê derbas bûye. Tev wê ji hestê kurdaye-tyiya min li dervayê Kurdistanê kûrtir bûye. Di salên li Ewropa de ez rast Kurdên hemî beşen Kurdistanê hatim, li gel wan di karê siyasi de cih girt, di civînên xwendekaran de beşdar bûm, û ji xelkên welatên ez lê dimam fêri çend dersên jiyanê bûm. Li Australya di çend salên destpêkê de ez ji karê siyasi dûr mam, lê hêdi hêdi ez ta stuyê xwe car din ketimê. Berê li gel çepênlî australî, li gel filistîniyan, wek kurdekkî, û dûvre di sala 1979an de me li Australya komeleya Kurd ya yekem damezirand, komeleyeke ku di destpêkê de li ser hîmîn kurdistanî hatibû dameziran-din, dostaniya hemî partiyên kurd dixwazt, piştgiriya hemî beşen welêt dikir,... Di ew dem de hejmara kesên xwe wek Kurd didan nasîn bi jin û mîran ve dora 30 kes bûn. Pirraniya wan ji Bakurê Kurdisatanê hatibûn. Di çend salên borîn de hejmara Kurdish li Australya bêtir bû. Li dû Şerê Xelîc pirraniya

Kurdan ji başûr û rohilatê Kurdistanê di Tirkîyê re wek penaber hatin Australya. Min dil niye li vir bi şêweyeke rêk û pêk li ser jiyanâ xwe ya australî û xebata siyasi binivîsinim. Tenê dixwazim diyar bikim, ku ta sala 1984an ez serekê ew komele bûm. Di salên 1982 û 83 de me bernameyeke radyo li ser pêla FM li Sydney pêşkêş kir, bi kurdî înglîzi. Di îlona 85an de bernameya bi zimanê kurdî di dezgeha radyo ya ji bo komên etnik de, Special Broadcasting Service, dest pê kir. Ji wê demê de berpirsiyari û karê bi rêvebirina ew bername li ser milê min in. A nuha ew bername rojên yekşemê di navbera seet 11: 30 û 12:15 de li ser pêla navîn ji bo bajarê Sydney, Melborn, sê bajarê din û dorhêlîn wan belav dibe.

Merov nedikare hertişte kırî binivîsinê. Ev yeka li gor erf û edetên Kurdish şerm e. Ez bawer im kesên ne Kurd li Australya, û li dervayê Australya, yên haya wan ji pirsa kurdi heye, xebata Şahînê Bekirê Soreklî ya ji bo Kurd û Kurdistanê ji Kurdish bêtir teqdîr dikin û dinasin. Wek min berê ji di nivîsareke xwe de xuya kiribû, pirraniya Kurdish qedra kesên xwe nagirin, maflîn kesên xwe dikin bin lingan. Ev ji ne weqa xirab e. Tew hinê din hene, ku dixwazin mala kesên xwe wêran bikin. Lê ev gotar ne şûna xuyakirina hemî peywendî, serpêhatî û bûyeran e, ne ji dem ya vekirina hemî rûpelan e.

Ez şermok û fedîkar van çend rûpelan li ser xwe dinivîsinime. Ev ji ji neçariya me ye, ji ber ku Kurd zor kêm li ser hevûdin dinivîsinin, yan hevûdin baş nedinasin. Merovên kurd pirr hindik li ser kesên xwe û dîroka xwe nivîsandine. Di dîroka netewya kurd de keda gellek merovan nehatiye nasîn û teqdîkirin. İroj ji rewş wisa ye. Sedema ev kîmasiya mezin beşbeşbûna welatê me û

tunebûna dewleteke Kurd e. Hemî nexweşî û kêmasiyên me ji van sedeman zane. Li milê din, rëxistin û kesên kurd bi xwe jî, bi pirrani, besbesbûna xwe û welatê xwe di pratîkê de pejirandine. Kesê bi bîrûbaweriyeke kudistaniye gelempêr sêwî maye. Jê bêtir, nivîskarê kurd hêñ iroj jî nikare bi şêweyeke objektîv li ser pirsên bi siyaset û realîzma kurdî ve grêdayî binivîsîne, eger binivîsîne jî kes li wan xwedî dernakeve. Tîrsa wî ne ji dewletan, lê ji rëxistin, partî û kesên kurd e. Kesên biyanî baştır li ser Kurdan dinîvîsînin. çığa di nivîsarên wan de kêmâsîne hebin jî rastiya di gotarêñ wan de ji ya di gotarêñ Kurdan de bêtir e. Wek kesên ji derive de li rewşa Kurdan mîze dikin, ew realîzma Kurdistanî jî Kurdan çêtir dibînîn. Li milê din, kesek nikare navêñ kêm û xirab bi wan de biqemîtîne, ji ber ku ne Kurd in (Kesên bi îngлизî dixwêñin, bila bi kerema xwe li gotara Christopher Hitchens:National Geographic, 8/1992 binihêrin). Li milê din, em xwe di çavêñ xwe de pîrr mezin dibînîn, xwe bi peyvîn xwe pîrr mezin dikin, lê realîzma me me bi cîhanê ve bi hawayekî din dide xuyakirin. Wek nîse, em gotina hebûna panzde milyon Kurd li Bakurê Kurdistanê dikin, lê ew milyonê em behsa hebûna wan dikin nikarin bi şêweyeke rêk û pêk rojnamey-ekê rojaneye layiqî dawiya sedsala bîstan bi zimanê kurdî derxin; em gotina hebûna bêtir ji nîv milyon Kurd li Ewropa dikin, lê ew bi sedanhezarêñ em gotina hebûna wan dikine nikaribûne deh sêlikên müzîka kurdî çêbikin, yan piştigiriya çêkirina wan bikin,... Em behsa pêlixandina mafêñ me, stemkariya neyaran û besbeskirina me dikin, lê hêñ ji dest me nehatîye der ku em wek yek netewe daxwaza mafêñ xwe bikin.

Eger nivîskarêñ neteweyekê li ser nexweşîyên civaka xwe nikaribin binivîsînin;

eger endamên wê civakê nikaribin bi zimanê xwe li ser van pirsan bixwêñin, gelo em ê çawa nexweşîyên xwe derman bikin?! Me du nifşen xwe di rêya "karkirêñ cîhanê bi yek bin" de wenda kirin. Gelo çend nifşen din divêt wenda bibin, da em fêr rastî û şâştiyên xwe bibin?! Yêñ wek Şahînê Bekirê Sorekli di salêñ 80yi de li ser van pirsan nivîsandine. Gelo haya kê ji wan nivîsaran heye?! Gelo dilê nivîskarê kurd yê dixwaze ramanêñ xwe bi şêweyeke objektîv xuya bike ê çawa bixwaze bêtir berheman biafirine?! Em ji dema razana xwe katê didizin, da bnivîsînin, bi kurdî binivîsînin, em bi pereyên keda xwe nivîsarên xwe çap dikin û rîdikin, lê kî bixwaze wan nivîsaran çap bike, çend kes bixwêñin? Trajêdiya nivîskarê Kurd yeke mezin e. Hêñ bi ser de hinêñ bi kirina gotinêñ arzan jûr her rexneyan li nivîskar û ronakbirêñ Kurd digirin û dipirsin, ka nivîskar û ronakbir li ku ne?! Ev bûn şes sal Şahînê Sorekli romanekê Heinrich Böll wergerandiye kurdî, lê hêñ çap nebûye; ev bûn çend sal wî serpêhatiya Dewrêşê Ebdî xistiye ser rûpelan,... Bêguman gellek nivîskarêñ Kurd hene, ku diisariya wan pêñusa wan daye şikandine. Nivîskar bêpiştigiriya gelê xwe ne kes e, ne jî gelek bê nivîskarêñ xwe ci gel e!!! Ev e trajêdiya me, ev e realîzma iroj. Gotina kilişeyan, nivîsandina peyv û hevokêñ dêmagojiyê, û puffkirina balonêñ mezin hêsan el!

Gelo hewce hebe ez gotina endamtiya PENa australî/navnetewî û rêxstînêñ din bikim?! Bawer nakim pêwîst be. Herweha grîng nabînim behsa pîrtûkêñ min xwendinî jî bikim. Ya rast, min navêñ pîrraniya nivîskaran jî ji bîr kirine, bîborînin; lê divêt ez behsa tiştekî bikim( De êdî hûn û wûjdana we! Eger kesekî xwezt min wek "bûrciwa," yan "xwefroşê impiryalîzmê" bi nav bike;

wek soraniyên me elên: qey nake ). Ez hem-welatiyê Australya me û bi ev hemwelatiyê serbilind im. Bi înglizî, ez xwe wek Kurdish Australian , yanê australiyekî kurd, didim nasîn. Australya ji mafêن min bêtir daye min û ez li ser xwe ferz dibînim, kû spasiya xwe ji ev welet re ji bo rindiya wê bi min re, herweha ji bo rindiya wê bi Kurdan re, çıqa hindek be jî, pêşkêş bikim.

Heye ku xwendevan meraq bike, ka min kengê dest bi nivîsandinê kiribe. Nivîsandina bi zimanê kurdî min li Australya di salêن yekem yên 80yî de dest pê kir. Ta nuha hindek kurteçîrok û gotarêن min di rojname û kovarêن kurdî yên li Ewropa têyên der de hatine weşandine. Gellekêن din nehatine weşandine. Min dil heye li vir çend rêzan li ser romana WENDABÛN binîvîsinim. Min ew di sala 1985an de kuta kir. Di ew dem de min ci nivîsarêن HAWARê nexwendibûn; loma ji hêla rêxistinîyê de çend şâştîyên biçük ê tê de hebin. Di sala 1987an de Enstituya Kurdî li Bonn ew da weşandin, lê pereyên weşandina wê nedan. Pirtûk di weşanxaneya almanî de ma, Enstitû hat girtin.

Min pirtûkêن xwe bi pereyên xwe ji weşanxaneyê derxistin û bêyi pere hejmarine wê li rêxistinîne kurdî belav kirin, lê rêxistinîne, yan karmendêن wan, wek ez dûvre pê hesiyam, WENDABÛN dabûn wendakirin, ji ber ku ramanine tê de, li gor wan deman, li keyfa wan nehatibûn. Li vir dixwazim diyar bikim, ku di dema Kurd herdem daxwaza demoqrasiyê ji yên din dikin de, hejmareke mezin ji wan û rêxistinêن wan ne kes û rêxistinêن demoqrat in. Hêlî troj ji rojname û kovarên bi zimanê kurdî, bi taybetî zaravayê kurmancî, dinivîsinin, yan bi navekî kurdî lê bi tirkî, her xeta xwe tenê dinasin, rê nadîn nivîsarêن objektîv, yên li gor xeta wan nehatibin nivîsandin.

Ji berhemêن Şahînê Bekirê Sorekli ev hatine weşandine: \* Azadbûna Mehmet Karataş(çirok), Enstituya Kurdî, Bonn, 1985; \* Wendabûn(roman), Verlag für Kultur und Wissenschaft, Bonn, 1987; \* Em û Pirsa Me ( nivîsarêن siyasi ), Sydney, 1987; \* Mehkemekirina Selahiddînê Eyûbî (şano), Haykurd, Stokholm, 1989; \* Jana Heft Salan(helbest), Enstituya Kurdî, Brûksel, 1990; \* Hokirina Zimanê Kurdî(Pirtûk/kasêt, Kurdî/înglizî), Sydney, 1983; \* Helbest 1 (kasêt), Sydney, 1987;

\* Helbest 2(kasêt), Sydney, 1989.

Gellek nivîsarêن min bi zimanêن înglizî, erebî û almanî jî di kovar û rojnameyêن cuda de hatine weşandine. Li milê din, di pirtûkeke biçük de min helbestine Cigerxwîn wergerandine înglizî. Romana Heinrich BÎll, Herimandina Jiyana Katharina Blum, min ew jî ji almanî wergerandiye kurdî, lê hêlî nehatiye weşandin, herweha kurteçîrokine ji înglizî û almanî. Di Ensiklopêdyâ Gelê Australya(Sydney, 1988) de min li ser Kurdan nivîsandîye,... Li bajarêن Australya ez di gellek semînarân de besdar bûme, axiftinêن bêyi jimar di derheqê pirsa kurdî de kirine. Ji hêla xebata rojnamevaniyê û karê radyo de min hevpeyvîn li gel bi dehan berpirsiyar, hûnermend û ronakbîrên kurd çêkirine, herweha li gel şexsîyetêni biyanî ku piştgiriya gelê Kurd dîkin. Birêz Celal Talabanî, Birêz Mesûd Barzanî, Birêz Ebdellah Ocelan, Şêx Ezeddîn Huseynî, Birêz kemal Burkay, Birêz Serhad Dicle, Dr. Mehmed Osman, Birêz Resûl Mamend, Dr. Samî Ebdûrrehman, Dr. Necmeddin Kerim, Dr. Esed Xeylanî, Birêz Kendal Nezan, Birêz Mehdi Zana, Birêz Mûsa Enter, Profesor Seidê İbo, Hejar, Birêz İbrahim Ehmed, Birêz Umer Şêxmûs, Birêz Aleksander Stenberg, Stî Joyce Blau, Birêz Olof Tanberg, Dr. vera Saeedpour beşekî

biçûk ji wan şexsiyetan in ku min li gel wan hevpeyvînêñ ji bo bernameya radyo çêkirine. Li milê din, hema hema hemî çavîyêñ têlvizionê û gellek dezgehêñ radyo li hemî besên Australya û li Nûzîlenda di derheqê bûyerên hemî besên Kurdistanê de li gel min hevpeyvînêñ bêyi jimar çêkirine....

Min piçek alîkarî li Ewropa jî kiriye. Wek nîşe, di du konferensêñ navnetewî de, li Parîsê(1989) û li Stokholmê(1991), min axiftinêñ bi kurdî di cîh de werdigerandin îngлизî, axiftinêñ bi îngлизî werdigerandin kurdî. Rojname û kovarêñ Kurdan gotarêñ dûr û drêj li ser van konferensan û kesên tê de besdar,... nivîsandin, lê xuya ye dilê kesekî nexweztibû ku behsa rola wergerandina weqa axiftin û pirs û gotübêj bike; yan heye ku ev yeka grîng nedîtibûn. Xwendina helbestekê, yan stranekê ji wergerandina axiftinan, pirsan û gotinan grîngtir dîtibûn; yan belkî kîmasî ya min bû, ji ber ku min wêneya xwe nedabû wan, ...(!)

De êdi bes e gotina "min" hat kîrin. Xweziya ne "min" lê kesekî din li ser Şahînê Bekirê Soreklî nivîsandibûya; bîborînin! Ev nivîsar ne bi dilê min bû, ji ber ku min dil nebû xwe bi xwe li ser xebata xwe binivîsim, lê mixabin, ci rîyêñ din nebûn. Berpirsiyarê NÛDEM, Kek Firat, wisa pêşniyar kir, û pêşniyariyêñ wî li cem me granbiha ne.

Gotina dawîn: Ew gelê ku li gor pîvanêñ demê û li gor siyaseta rojê ber bi pêş neçe, ê her li dû gelên pêşkefî bimîne. Ew kesên xwe bi xwe çepikan ji xwe re lêxin û guh nedîn realîzma siyaseta cîhanî, ê her di xewn û xeyalan de bijîn. Ew gelê bi zimanê xwe nikaribe bixwêne û biaxife nikare xwe bi yek ke, nikare bibe xwedan şexsiyeteke netewiye serbixwe. Ew gelê qedr û qîmeta kesên xwe negire, li nivîskar û hunermendêñ xwe xwedî dermekeve, ê wan kesan û berhemêñ wan wenda bike. Ew rîexistin, partî û kesên bi xwe demoqrasiyê nedîn yên xwe ne layiqî demoqrasiyê ne.

Ji hevdûrbûna bi salan, jiýîna li şûnêñ ji hevûdin dûr û cihê, û tecrûbeyên şexsi raman û metodêñ merovan ji hevûdin cuda dikin. Loma, eger xwendevanek, li gor dîtina xwe, kîmasiyekê di gotarê de bibîne, bila bi kerema xwe bibexşîne. De bila gotar drêjtir nebe. Bila salêñ li pêş rojêñ baştir û xwestir ji neteweya me re li gel xwe wîmin; bila em ji hej hej bikin; eger hej nekin, bi kîmasî koka hevûdin nekolîn. Ji ev besê cîhanê germtirîn slav ji endamêñ gelê xwe re pêşkêş dikim. Her hebin.

Sydney, 13. 9. 1992

# Kujtina Du Merovê Belengaz

## Şahînê Bekirê Soreklî

“Te çima jina xwe kujt?” hêkim ji Birêz C.S. pirsî. Li dû ku wergêr pirsa dadmend bi zimanê erebî ducar kir, C.S. bi dengekî qebe bang kir: “Ez car din dibêjim, ez bêsûc im. Ma çavêن min kor bûne, ku ez şûya xwe biku-jim! Dijminên min ew kujtin. Bona xwedê, ji min bawer bikin.” Dengê wî yê qebe hin kesên di dadgehê de daniştibûn aciz kirin, lê di eyñî demê de dilên hinan şewitandin.

“Bila çawîş James White were hundir,” dad-mend ferman da. Li dû hatina çêwîş jê hat xwaztin, bila ew ji koma sondxwaran re bibêje, ka wî di ew roja yekşemê de, roja kuj-tina Stû N.S., di mala wan de ci dîtibû.

çawîş White dest bi ifadeya xwe kir û got, “ez sond dixwim, ku ez ê tenê rastiyê, ne tiştekî din, ji dadgehê re diyar bikim: Li dû girtina agahdariyê ji jineke ku nexwazt navê xwe bide, otomobîla me seet 12:30 gihîşt ber deriyê xaniyê apartmana malbata S tê de. Li wir komeke ji jinan, peyan û zarokan civiy-abû. Hinan ji wan em agahdar kirin, ku ber gihîştina me bi dora 10 deqan teqîniya dabençeyekê du caran ji apartman jîmar 7 hatibû bihistin. Ez û Polis Stewart, me zû berê xwe da wê apartmanê û min dest pê kir li derî xim. Kesekî derî ji me re venekir. Ji

hundir dengê giriyê zarokekî dihat. Xwdiya apartmana li hember ji me re diyar kir, ew wisa texmîn dike, ku Birêz S. jina xwe kuj-tiye. Heye ku xwe jî kujtibe. Li dû wê gotinê, min pehîna xwe sê-çar caran li dêri xist û ew bi zorê vekir.

“Eywana rûniştinê tiji dû bû bû. Birêz C.S. li ser qaryoleyê rûniştibü, te digot qey em li pêş xwe nedîtitin. Cixareya xwe dikişand û bi du çavêن wek yê miriyan li dîwarê li pêş xwe diniherî. Li kêleka wî dabençeyeke tazî hebû. Polis Stewart xwazt dabençeya xwe bikişîne, lê min ew bi nêşaneke destan haydar kir, ku wisa neke. Ez hêdikan ber bi Birêz S çûm, dabençeya wî derbas Stewart kir, li tenîşa wî rûniştim û desten wî kirin kelebçeyê. Komeke merovan nuha xwe li ber derî gîhandibûn hev û hindek stûyan xwe ber bi hundir drêj dikirin. Polis Stewart ji wan xwazt, ku bila belav bibin û hewl da deriyê şikestû bigire. Min xwazt ez ber bi ew odeya dengê dergûşekî jê dihat biçim, lê keleboxa ji mitbaxê dihat der haya min kişand ser xwe. Kelebox ji ava di quşxaneyeke li ser agirê xazê dihat der, ku hindik mabû nemîne. Li kêleka çepê ya odeya mitbaxê laşê Stû N.S. yê ramediyayı ez veci-niqandim. çavêن wê yê vekirî bi şopên

matmayîn û tirsê dagirtibûn. Gulleyekê, ku dûvre xuya bû ew sedema kujtinê bû, xwe di nav herdu çavan re berdabû hundir serê wê ; yeke din li milê wê yê çepê ketibû,...”

Bi daxwaza ebûqatê C.S. dadmend biryar girt mehkemekirina wî rawestîne ta ku raporên pişışk û pisporênen nexweşiyên nefsin yêni di derheqê wî de digihêne dagehê.

Tevî ku di qereqolê de bi dehan car pirsêne wek, “te çima jina xwe kujt?” ji C.S. hatibûn pirsîn jî, wî kujtina wê her înkâr kiribû, bersivêne cuda dabûn û di navberê de her gotibû, “ne min; wan ew kujt.” Carekê giriyabû û gotibû, “neyarêne me yêni bêwûjdan em kujtin.”

\* \* \*

Li paş deriyekî hesinî C.S. di odayeke biçûk de rûniştibû. Wî nuha êdî dizanibû, ku ew ji bo súcekî hatiye girtin, lê hîn nikaribû bipejirîne, ku wî rast jina xwe kujtiye. Ma kesekî wek wî ê çawa bikaribûya dayika çar zaroyen xwe bikuje?! “Na, na,” wî xwe bi xwe re got û bêyî hemdê xwe, weke ku ji dadmend re bibêje, domand, “na, na, hezar car na, tiştekî wisa ji dest min nayê der,” lê ji nişkan ve, wek kesekî ku bûyereke nebixêre were bîrê, súfetê wî tirş û tal bû, çavêni wî bîstekê qurç man û rûyê wî qermicî. Te digot qey cihan bi hemî giraniya xwe ve bi ser wî de hildiweşîya. Dûvre seri li wî leqiya, bi destê rastê du kut li eniya xwe xistin û lêva bini kir navbera dranen xwe, gezt û berneda ta ku xwûna sor jê hat der û ew di devê xwe de bi tama şor hesiya..

Dora bîst deqeyan derbas bûn bêyî ew bili-pite. Dûvre, çav di dîwêr de qîq, ew xwe bi

xwe re axift; wek merovekî dîn pilepila wî dihat. Li dû vêxistina cixareyekê wî dest pêkir bi dengekî nizimî xemgîn di ber xwe de bistirê, lê hêdî hêdî strana wî bû yet ji şêweyên gotina serpêhatiyên gelêri yêni kesen xwedan qederen reş. C. S. şûna xwe ji nişkan ve xweş kir, cixareyeke din vêxist û bi ev hevoka fermanê axiftina xwe domand: “De niviskaro, ez ya hatî serê min bibêjim, tu ji binivîsîne.” Te digot qey dîwar li pêş çavêni wî bû bû merovekî nivîskar û guhêne xwe dabûn ser gotinê wî.

“Baş têye bîra min, em çawa di rojeke meha nisanê de gîhiştin bajarê Melborn. Em ji ber belengaziyê direviyan, ji ber mirinê, ji ber leşkeran, cendirman, mamûran, ji ber peya û mirûdêne filankesi û filan rêxistinê, ji ber şoressgêr û nişimanperwer û têkoşer û olpe resten curbecur. Ji ber xorten pêşirvekirî em reviyan, ewen mîtralyozên xwe li ser cîpêne Toyota bi cîh kiribûn û heku dilen wan dixwazt gulleyen xwe ber bi çep û rast dibaran-din. Ji ber merovkuan em reviyan, ji ber bertilan, ji ber xirabiya merovan, nerindiyâ wan, ji ber heznekirinê, kujtin û sotandinê.

“Wêneyen malbata pismamê min ji ev welatê dûr digihiştin me û min didit çawa ew bi rûyen kenok li dor otomobîla xwe civiyanê, yan li ser keskayı di bin siya darekê de rûniştine, yan li kêleka ava derya hêşin derketine seyranê. Dilen me bi wan diman û me xweziya xwe bi wan dihanî. Di kûraniya hebûna me de meraqek dikeliya, ku me jî bikaribûya xwe ji ev beşê cihanê yê bi xem û kul û keseran avis bigihanda ew hêla xweş tihet, şaristaniya merovên pêşveçûnî. Li di mehîn tiji hevpeyvin û muayeneyan, mehîn ku li me bûn wek salan, xwedê meraqa dilen

me hanî cîh, me hew dît em di balafireke  
mezin de ne; û me hêvî kir, ku pişta me bi  
rojên reş de û berê me bi yên xweş de be.

Min ji merî û hevalên xwe re sond  
xwaribû, ku dûrbûna ji wan ê pîr drêj neke.  
Ma ev rewşa xirab ya li welêt qey ta roja qiya-  
metê najo! çar, pîr-pîr pênc sal, ne bêtir, em  
ê vegeerin. Di ev dem de, min di dilê xwe de  
digot, em ê dewlemend jî bibin û çend qurşan  
li gel xwe wînin. Jina min ê fêrî zimanen  
bibe, zaroyên min ê di xwendegehan de pêşve  
biçin. Di mîjiyê min de hezar wêne çedibûn:  
Jina min bi otomobileke mezin zaro dibirin  
dibistanê, di dawiya hefteyan de em her li  
seyranan bûn, li dû du-sê salan xaniyekî me  
yê duqatîn hebû, ji mîvanan vala nedibû, tiji  
ken û şahî bû,... Di serê min de weqa  
tevdîrên ji bo rojên dahatû hebûn, min digot,  
ez ê rojekê ji rojan vegeirim gundê xwe û bi  
pereyên xwe ji gundiyan re pirtûkxaneyekê  
lêkim. Navê min ê ta gund hebe li ser  
bimîne. Bavê min ji me re tiştek nehîst, min  
digote xwe, ez ê navê malbatê biparêzim. Ez  
ê bi otomobileke Mercedes vegeirim gund.  
Bila zîqeziq bi lastikên wê keve, bila dost bi-  
kenin, neyar biteqin; ey felek!

“Li dû gihîştina Melborn bi çend hefteyan  
xewn û xeyalên min dest pê kirin di rastiya li  
holê de bi ber bê kevin; yek li dû ya din, di  
çemê ji yînê de heliyan û di nav qûma herqa  
wê de wenda bûn. Bi min ve êdî baş xewan  
bû ku ci bihuştên wisa tunen, da merov hema  
weqa bi hêsanî xwe bixuşîne wan. Herweha  
ez têgihîştim ku bextiyariya malbata pismamê  
min, ew ken û keyfa wan, wek me li welât  
didît, ji peydakirina makîneyên kişandina  
wêneyan bûn. Min êdî pejirand, ku gotina

‘heriştê ji dûr ve dibiriqe ne zêr e’ rast e.

Bajarê Melborn dawî da tirsa ji mirinê û  
em ji dengê çekêne curbecur û lesger û  
partizanên hêzan xilaskirin, lê ew şahiya me  
jê hêvî dikirî neda me. Ji dest min û jina  
min nehat der em li wir xwe di nav civaka nû  
de bîhelinin. Em bû bûn wek du masiyên ji  
çemekî biçûk hatibin derxistin û ketibin nav  
ava derya. Dûrbûna ji hevalan, tenêmâyîna  
me, nezinibûna bi zimanê welêt û  
bicîhnebûna armancan ez kiribûm rewşeke  
wisa ku tê de min xwebêja ken ji xwe bîr kir.

Me rabû mala xwe ji Melborn bar bajarê  
Sydney kir, bi hêviya ku ew bextiyariya  
xûşka wê nikaribû bide me pêşkêse me bike.”

“Rojan dan dû hev, sal li dû hev rêz bûn û  
me nema xwazt em wan bijimêrin. Em li  
Sydney bûn xwedîyê xaniyekî, xaniyekî ku  
teqsîtên wî divabûn bîst û pênc salan werin  
dayîn; trimbêleke japoniye heft salmîn û  
têlvizyonekê.

“Min di mixazeyên bajêr yên mezin de  
tiştên xweşik diditîn, lê ji dest nedihat der ez  
wan bikirim, di klub û meyxaneyan de çavêن  
min li devêñ kenok diketin, lê nikaribû bi  
xwe bikenim, min hevaltiya kesan meraq kir,  
lê kesek li meraqa min xwedî dergediket; û li  
dû dîtina keçen çeleng û ciwan li ser tax û  
placêñ bajêr min lewendî û xwûnşerîniya wan  
dida hember rûtirşîya jina xwe ya ku li dû  
hanîna çar zaroyan roj bi roj qalintir û gulo-  
berîn dibû, û jiyan di çavên min de reştarî bû,  
min ji bo ev qedera nebixêr lome li xwedê di-  
kirin û bi drêjiya şevan ji axekufê xew nediket  
çavên min.

"Di berbanga sibeyê de min hezar nale li zengilê seetê dihanî. Pênc, yan şes, rojan di hefteyê de, hefte li dû hefteyê, meh li dû ya din, sal li dû salê kar li benda min bû. Ez bûm wek makîneyekê, jiyanekê bêyî guhertin, rojek wek ya din bû: Beyanî zû rabe, here serşokê, zû berê xwe bide rawesteka trênen, bigihê şûna kar, bikişin, biguviş, rake, gérke, bikişin, biguviş, rake, gérke,... Mijûlkirina mêmî ne pêwist e: bikişin, biguviş, rake, gérke; trênen, mal, bixwe, razê, rabe, serşok, mitabax, trênen, kar û dîsa bikişin, biguviş, rake, gérke,... Axitin jî ew axiftin e, nayê guhertin: Em ê iroj çi bixwin? Wê têlvizyonê vêxe, vemirin; zêrzewat dîsa biha bûye; wan zarakan huskirin bide; name hene?

"Na, na, bi kirina kar kesek dewlemed nabe, min rojekê gote xwe, û ez nema çûm kar. Min got wan, karê we zor gran e. Ev kişandin û guvaştin û rakirin û gérkirina malwêran ya salan ez seqet kirim. Aax, bavo, pişta min!

"Dadgehê biryar da ku karxane heşte hezar dolar bide min. Ez ji kar xilas bûm. Min zengilê seetê şikand, min kapitalizm dot, ya min bi ser ya sermiyandaran ket.

"Lê min ê çi bikira? fiahî carê bibû kevroskekî beza; ez jî tajiyekî westa, şahî her ji pêş min reviya û ez negîhiştêmê. Derbaskirina seetên dûr û drêj di hundir malê de ez û jina min li hev kirin xuh, em ji dengen hev û ji rûçikên hev westa bûn. Min dest pê kir biçim klübên cûzê. fiêniyê welêt navekî xwes li makîneyên cûzê yêñ klûban kirine: Dizêñ yekdest. Lîztina wan gellekî li keyfa merov tê. cirayeke biçük di makîneyê de vêdikeve:

Pereyan berde min. Dema pereyên xwe digire, çira te haydar dike: De holikê bi piyê min de bikişin; û lîztkî dest pê dike. Peran têxê, holik bikişin, holik berde, peran têxê, disa bikişin, car din berde,...ta ku dizê yekdest hemî pereyên te dike hundir zikê xwe.

"Rojek hat û nema êdi qurpika min bi lîztna tev dizêñ yekdest re dihat. Min dest bi cûza reva hespan kir. Tişte mat, li gel nebaşbûna îngliziya min jî, ez di warê ev cûza ku navê sport lê hatiye kirin de bûm pispor. Min di demeke kurt de navên hespan, siwarêñ wan û kata reva li şûnêñ cuda ji ber kirin. Ez bi ku de biçûma radyoke transîstor di beriya min de bû, da xwe agahdar bikim, ka kîjan hespê vexwar, kîjan duyem û kîjan sêyem hat.

"Rojekê ez zikxawiyayî gihiştüm malê û min ji kebaniya xwe pîrsî, ka ji bo xwarinê çi heye. Li şûna wek herdem piçek xwarin ji min re amade bike, tiştekî mathîştinê cih girt. fiûya min pelpel li çavêñ min niherî û gote min, bila ez ji ber çavêñ wê herim. Ev cara yekem bû min gotineke wisa ji wê dibihîst, lê tişte ez bêtir xeyidandim ew bû ku wê bi înglîzî gotina xwe kir, û li ber zaroyan. Ez êdi tê gihiştüm, ku perdeya di navber jin û mîr de ji navbera me rabûye. Zaroyen min jî hêdi-hêdi nema êdi guh didan min. Qimeta min di mala min de ji ya segekî di malêñ Australiyan de kêmter bû. Li ev welatê bêbext, merov newêre destê xwe jî li hember jin û zaroyen xwe rake; hukmata bêbav piş wan digire! Ji welêt jî name hatin birrîn, çimkî min nema dikaribû pereyan rîbikim, nikaribû merî û dostan ji welatê kevin wînim yê nû.

"Rojekê hevalekî cûzê gote min, li nik wî agahdariyeke bêyi guman heye, ku hespekî bi navê Star ê di reva roja şemê de yekem derkeve û dolarekî piştgiriya wî ê bîst û yek dolaran bide. Min hesiband, pênc hezar dolar ê 105 000 dolar bi dest xin. Bi perene wisa, ez ê hemî derdan derman bikim, navbera xwe û jina xwe baş bikim û serikî li welêt xim, ez ponijîm. Tiştê dijwar dîtina pênc hezar dolar bû. Roja îniyê, li dû ku şuya min keça me ya ku nû dest bi xwendinê kiribû bir dibistanê, ramanek ket serê min: Ez ê xişrê jina xwe bibim, wan ji bo du rojan rehîn bikim û roja şemê Star ê hemî gelşen li holê çareser bike, min gote xwe.

"Min zêr û zîvê jinikê bi ser û bini ve rakin û berê xwe da rawesteka trênen. Tiştê ez dûvre mat hîstimî ew bû, ku min wisa bi hêsanî ev kar dikir, tew nehat bîra min, ku gustîrka zewaca me, ew nêşana bimbarek û pîroz, ya ku diyariya bav û diya min bû, ew jî di tûrikê naylon de bû. Hevsarê min ketibû dest besê min yê bêtevdêr û ez wek zaroyekî wenda ber bi pêş diçûm, bêyi armanceke bi tevdêr.

"Roja îniyê êvarê bêyi serêşî derbas bû, jina min bi çûna xişir nehesiya. Roja din bi rohilat re ez ji mal çûm der. Herdu seetên ber destpêkirina reva hespan li min bûn wek salekê. Di quncikekî parkeke bajêr de rûniştî, hişen min weqa li hev ketibûn, ku heta min radyoya xwe vekir, reva hespan hatibû dawiyê. Ez bi heyecan reviyam şûna dayîn û stendina pereyên cûza reva hespan û li pêş teqake wê ketim dorê. Bi gîhiştina teqê re, min bilêta xwe zû drêj keçika li paş teqeyê kir, ya ku li wan niherî, serê xwe çep-rast hejand û got, na,

ev hesp ci pere venexwarine. Min herdu destê xwe ji hev vekirin, ber bi jor rakirin û keniyam: Tu şaş i, car din binihêr, min got keçikê. Bersîva wê ya bêyi guman bû satilek ava sar û bi ser min de rejiya,...

"Wê şevê ez li mal venegeriyam. çawa û li ku min ew derbas kir, ez nizanim. Tenê dizanîm, roja yekşemê, dema min nêzikî li mal kir, hin beşen asîman êdi sor bû bûn. Bi dengê girî û qîrîna jina xwe re min xwe ji xew çekir, çûm mitbaxê, qehwe çekir, rûniştüm û cixareyek vêxist. zaroyen me, dergûş ne tê de, ne li mal bûn. Jina min dawî da qîrînê, lê hêñ digiriya. Ez rabûm ser xwe, da biçim wê aşt bikim: Megirî dayika zaro-kan megirî; xwedê heye, xem niye, ez ê xişrê te li te vegerînim û bi ser de ji te re bazinekî zêrin bikirim, soz, megirî..."

Li vir şêweya axiftina C.S. hat guhertin, dengê wî qebe bû, ew rabû ser lingan; bedena wî bi tevahî dilerizi; te digot qey ew û jina xwe a nuha pev diçûn.

"Serê xwe radike jor, şer ji rû dibare; hezar naleyên reş li min û kok û binata min tîne. Keçê, dînê, kerr be, ez di bextê te dme, şerm e, dengê xwe nizim bike, tu ê cînarân bi me bihesinî, ez dibêjim. Ev jina cazî van gotinêna wisa berbat û gemnarîn ji ku peyda kirine, nizanim! 'Siktir, derkeve ji mala min,' dibêje min. İnglîzî û erebî li hev dixe. 'Mala min!' Kengê jîn bûn xwedîyên malan, cîhan?! Keçê, tu dîn bûye, xwe bide hev, xwe ragire, ez dibêjim wê. 'Yan bicehim here, yan ez ê polîs agahdar bikim,' li min vedi-gerîne. Li vir ji ranaweste. 'Destê xwe li min rameke,' dibêje, 'eğer polîs tiştekî neyi-

# Kulîlkêن Bêronî Yêن Biyaniyan

Mihemed Efif HUSEYNÎ

Werger: E. Huseynî

( 1 )

Xemgîn bûm dayê...  
Xemgînê kulîlkekê di zistanê de/  
Xemgînê jibermayêñ zaroktiya xwe yî  
li ser gustfilka te me...  
... Porê te yê ku spî dibe û kirasê te yê  
çiryayî  
Kîjan bêdengiya zîvane ji boyî  
bêdengiya te ye  
û ez bi ser dûrbûna xwe de dikevim/  
mîna  
zarokêñ te yî dîtir, hindikekî mirin, ji  
dema  
dayikan çûn der...  
Odene tarîbûyî di navbera temenê te de  
Ey dayê  
çi tenafî di dergehan de ye, bêyî te  
çi pîrsin bêhedan in di rêça min de,  
gava ku ez berê xwe didim te,  
gava ku ez berê xwe didim şenahiyêñ  
nerminî  
di giyanê xwe de/ Ta ku ez navê te yî  
kevnare  
ji bîr bikim, têm danhev wekû ereba  
nan

Tu çi dikî  
Ez çi bikim ji şîniya xwe, ya ku dûrî te  
ye  
Ez çi bikim bi vê mermara li ser sirûda  
xwe  
Sirûda min i razayî di sîngâ te de wekû  
tîyekî  
Ey dayê...

92.02.22

( 2 )

Ji mêt ve, ( Emîra ) yek li daristanê  
miribû  
Sîberan û kulîlkêñ biçûcik, ew nixu-  
mandin  
baranê serdemê û çirokan ji  
Tiliyêñ wê, bi bager û xelmaşbûnê  
hatin dagirtin  
û bi oxireke kurt mîna dengê biyaniyan  
Di şevê de/ daristanê dibirttin /  
li ( Emîra ) yê digerin)

92.08.04

nin serê te, dostê min ê te bikuje.' Wey hawar, xwedê, hawar, dostê jinikê ji heye! Toreyên me li ku man, erf û edetên me çi pê hatin, şeref û narmûs bi ku de çûn?! Ev jina nema êdi yeke ereb e. Ne rohilatî, ne roavayî ye, tevlihev bûye, herimiye, pîs û pas bûye ev çeleka! Derbas mitbaxê dibe, qîrîna xwe li gel xwe dibe û li wir didomîne. çi dengekî ne xweş jê tê, wey hawar! Ew dengê wê yê wek yê malayıkeyan, çi pê hat? Ka ew rûyê bi ken, ew bûka nazik û delal, ka,...?!!

"Ez ê wê bi dabençeyê bitirsînim, heye ku kerr bibe. Ez herim dabençeyê derînim. Ew ê wê bibîne, bitirse, sist bibe û dawiyê bide ev rewşa xwe ya bêfedî.

"Ez ê te bikujim, eger tu ev devê xwe yê gemarin negirî, ez ê te bikujim, ez dibêjim wê. Kuro, lawo, dikene! Qerfîn xwe bi min dike û ha, ha, ha, dikene! Kenekî bilind, kenekî bêsedem, kenekî bêserm! 'Siktir,' dibêje min, 'tu kengê bûyî peya?' Ez gaveke din ber bi wê radinim. Destê xwe yê rastê radike jor û tiliya eşhedê ber bi pozê min drêj dike: 'Li şûna xwe bimîn, bênamûsê peyan,' dibêje min, 'ez ê te ji kûçikan derbas bikim.' Keçê ji xwedê bitirs, bes e, ez dibêjimê. Devê xwe tiji xazî dike, tif rûyê min dike û dibêje, 'hey dizê xişrê jina xwe, tifû li simbelêن nîvpeyayêن wek te.' Erê, lawo, tif rûyê min

dike! Ha ji te re yek, ha ji te re dudu. Dikeve xarê, bi çavên vekirî û matmanî dikeve xarê."

Li vir girî dikeve xenaqa C.S., dengê wî car din nizim dibe, cixareyekê vêdixe, nefeseke kûr jê dikişîne û didomîne:

"Nivîskaro, de bila cîhan biryare bigire, ka kê kî kujt. Li welatê min, bila ew kesên di warê lixwekirina kincên leggerî de pispor ci-xareyeye din ji paketên xwe yên frensi û emerikî derînin û li paş mîtralyozên li ser cîpan bikişînin. Wan welat li me kirin dojeh, ewên xwe li ser jin û pîr û kal û zaroyan, li ser kesên belengaz dîkin boke û dûvre navê 'gel' li wan dîkin; wan em bi çolê xistin. Ewên bi tiliyên hêz û kesên di paş perdeyan de dilîvin, wan mala me wêran kir. De bila li wan pîroz be, ku wan em û welat gîhandin ev rewşa bi qîr û tenî, ew yên rojekê xwûna hevûdin xvedixwin û ya din piyan li dor stuyêñ hev digerînin û hevûdin radimûsin. De nivîskaro, bila cîhan biryara xwe bigire, ka kê kî kujt?!"

Agirê cixareyê gihîştibû nav tiliyên C.S., lê ew bi şewata tiliyên xwe nedîhesiya. Şewata dilê wî dabû ser her şewatê.

(Sydney, 1983. Ev kurteçirok, di bin navê "Curma Mezin" de, berê bi zimanê erebî hat nivîsandin)

( 3 )

Darbestne dilpak ji bo kulîlkan...  
 Keçne nûhatî, bi baweriyeke bêhempa,  
     bi poşmanî,  
 darbestan bi pêş de dibirin...  
 tarîbûnê derbas dikan...  
 Li ser darbestan poşmaniya xwe  
 direşînin,  
 û sorê veşirtî bîna xwe berdide wekû  
 gumlekê pakrewanekî,  
 xwîna wî û zimanê wî yê zuha, şirove  
 dike...  
 Di pangeveke xemgîn de/  
 Di zencîrekê ji gavêن wî ên cara dawîn  
 de/  
 Ku li Kurdistanê diçirisin  
 Mîna keçne nûhatî ku  
 li seranserî darbestan bêdeng in.

92.03.10

Biyanî ne...li ser rûniştekên wan  
 payîz hişin dibe...  
 Xelk in, em ji endamên bêrkirina wan  
 in/  
 û çîrokên wan yên di taristanê de/  
 Herdem...Em li xuşexuşa qırıkên wan  
 guhdar in.  
 Lî/ ji bo çi husa ne zelal in di nameyên  
 xwe de,  
 Li hemberî tenêtiyê radest in  
 Xwe di qehwa me de diqurnisînin...  
 Roj bi roj em ligel wan diçûn nik dara  
 hevrisê  
 Me navê xwe ji wan re çinîn...  
 Jihevketî ne... dilşikestina me ta  
 dawiya  
 bajîr, derbas dikan,  
 Gava ku em wan bibînin/ hergav em ji

wan hez dikan û  
 di şemendefira sîrgûnê de, em destêن  
 wan dihejîn in.

91.10.05

( 5 )

Yêñ hindik, ku bendewariya mirina me  
 kirin/  
 Bêrkirinêñ xwe ji me re nehinartin  
 û ne rûpelên rojêñ xwe yêñ ku li ba me  
 mane jî...  
 Ji me re nenivîsandin... gelo mirina  
 me jîbir kirine ?  
 Gava ku em bi dizî ji nameyên wan  
 hatin der  
 me ji boy xwe xuşexuşa payîzê afirand  
 û ji mafê wa ye  
 ku rûniştekê xwe yî vala di giyanêñ me  
 de  
 dirust bikin.

92.08.04

( 4 )

( 6 )

Di rojêñ xemgîn de...  
 Bapîran xwe dikirin mîna sorgulêñ  
 destê te  
 di têlêñ muzîkê de wenda bûn...  
 Matmayî ne wekû mîran di perest-  
 gehêñ sermedî de  
 Em bendewarê wan in, lê bêçare ne/  
 Ew bapîrana bi dengê xwe, wekû  
 şikestina pelêñ daristanan  
 Wekû sîberêñ te ku bi ser giyanêñ wan  
 de dişikin  
 Me bêrawestan bangî wan dikir:  
 çend zarokan ji me re li çiya bihêlin  
 û serdanekê di rojêñ xemgîn de  
 Di zenbeqêñ me de wenda dibû  
 û bagera ku bapîrê dawîn li ber xwe  
 bir...

92.03.29

# DARA HINARÊ A LI SER GIRIK

(2)

Yaşar KEMAL

Werger: Dr. POLOÇO

**P**işî ku ji mîrik vejetiyan bi saetekê bû. Roj ber bi ava diçû, lê dîsan jî der û dor di nava germê de vedigevizand. Lê kîleka rê dareke tuyê ya bi emir, ku pelên wê ji tozê spî bûbûn, hebû. Li ber siya wê darê jî, traktorek bi erebeke naylon ya ku di tozê de mabû, sekînî bû. Li ba traktorê tu kes tunebû. Ew hatin li hember traktorê sekimîn.

Husik nêzîkî motorê bû, ku destê xwe pê bike, lê Aşik Alî:

- Meke Husik, got. Nêzîk mebe. ci dibe ci nabe!

Husik xwe bi paş de kişand.

Demeke dirêj ew wilo li dora traktorê çûn û hatin û li her derê wê nihêrin.

Mehemedê Zarok:

- Binêrin, binêrin, got. çavên wê yên mezin jî hene. Binêrin, çawa dibiriqin!

Husik:

- Bila tunebûna, got.

Aşik Alî bi hêrs:

- Bikeve û bimire, got. Tiiif...

Wî devê xwe tije xwezî kir û avêt motora bi toz. Tifa wî riyek sor vekir û heyâ bi jêr herikî

Üsiv:

- Çükûrova di bin erdê keve, motor di bin

erdê keve, got. Tiiif...

Mehemedê zarok hebekî ji motorê bi dûr ket, li paş xwe zîvirî û got:

- Mirat, mîrat, însaleh tu ê bimirî. Tiiif...

Tifa Mehemedê Zarok negîhişte traktorê.

Ji hemberî wan zilamekî bi şelwerê heya bi çongan qetiyayî û perîfi dihat. Mîrik xwas bû. Wî destnalek kevin li serê xwe gerandibû û di bin wê lihêfa li piştê, pişta wî tewiya bû. Gava ku wî pê li erdê dikir, te digot qey ew pê li sêleke sor dike, tavilê lingê xwe ji erdê radikir. Ew bi ecêbek kesnedî dimeşîya. Ew ziwa bûbû. Gava mîrik di ber wan re derbas bû, ew li wan hayî jî nebû. Wî ne silav da wan ne jî tu tişt got.

Husik:

- Tu wilo bi ku de diherî birawo? got.

Weke ku mîrik ji xewê şiyar bibe, ji xwe aciz:

- Ez diherim cehenemê, got.

Husik:

- Te rast got, ji xwe ev rê rast diçe wir.

Mîrik an nebihîst, an jî bîhîst lê guh nedayê, ew derbas bû û çû.

Aşik Alî:

- Vê meke Husik, got. Guneh e birawo. Ma te rewşa mîrik nedît? Tu pixkiyê wê ruhê wî

di pozê wî re bavêje. Tu ji xelkê belengaz çi dixwazî? Ma te rûyê wî nedît? Ew mehû bûye, miriye.

Husik:

- Min tişt negot, ku...

Aşık Alî:

- Guneh e, got. Mirov ji peyayên wilo re bibêje keko, wek mirov ji diya wan re xeberan bide.

Piştî deme kurt ew traktora ku li bin siya darê bû, toz û dixan li nav hev xistin û ji wan derbas bû.

Husik diranên xwe qirriçandin:

- Bimeşe, got. Bimeşe. Ya ku nêñ dibirre, ya ku malan wêran dike bimeşe.

Mehemed:

- Înşaleh em ê kar bibînin, got. Dilê min weha hukum dike. Ger em kar nebînin qet çê nabe. Divê ku em bibînin.

Üsiv têê li dawiyê mabû. Mehemed li paş xwe zîvirtî û li wî nihêri. Üsiv di nav toza li ser rê rûniştibû. Weke ku wî nimêj dikir, daqûl dibû û radibû ser xwe.

Mehemed:

- ci bi wî Üsivî hat? got.

Aşık Alî:

- Xwezî ku nehata. Rewşa belengazo ne î baş e.

Husik hêrs bû:

- Ma bi vê qûnê mirov kare were çûkûrovayê? Gawirê dêhn, hem ew davêje çûkûrovayê, hem jî bi dû me de tê. Kûcîk lawê kûcikan!

Aşık Alî:

- Husik, wa meke birawo, got. Wa meke. Deriyê nêñ e. Bi niyeta ku ew çend quruşan kar bike her tişt da ber çavêن xwe û hat. Ma qey ew bi xwe nizane ku ew di ci rewşê de ye? Wê ci gûyî bixwe, tunetî... Tunetî kirâsê ji

êgir e.

Husik:

- Bila segbav nehata...

Ew gihiştin ber Üsiv.

Aşık Alî:

- Rabe keko, got. Ma ci bi te hatiye?

Üsiv bi nañin:

- Damarên çongên min hatine bîrîn. Ez nikarim bimeşim. Dilê min wer lêdixe, ku...

Aşık Ali rabû, bi milên wî girt:

- Rabe keko, got. Wê niha derbas bibe.

Evqasî qels mebe.

Üsiv jî:

- Wê derbas bibe, got. Hertim wilo dibe, hertim mirov...

Piştî demekê ew rabû ser xwe.

Êdî dibû êvar. Roj dadikete paş çiyan. Dora ewrên spî yên rojhilat dibiriqî. Hebekî wê de erdekî birincê dihate xuya kirin. Li nav erdê birincê legleg li ser lingekî rawestiyabûn û difikirîn. Dibû ku jî ew razabûn. Şitlîn birincê bi qasî tiliyekê dirêj bûn. Di bin re aveke zer diherikî û li cihokekê hom dibû. Aveke zer û girrikî...

Husik xwe daqûlî ser cihokê kir, devê xwe xiste avê û vexwar.

Üsiv bi lez bang wî kir:

- Husik, Husik, vemexwe birawo! Ev av hemû jehr e, vemexwe! Tu ê pê bimîri. ci dibe bira, vemexwe. Ez bi vexwarina vê ava ha ketime vî halî.

Husik guh neda wî. Wî têr vexwar. Dû re Aşık Alî, Mehemed, Mehmedê Zarok, gişan av vexwarin.

Üsiv her li ber wan digeriya:

- Jehr e, got, mirin e, got, zar û zêçen me hene got. Pere nekir.

Wan paşiyê xwe dane cihokê û rûniştin. Üsiv idare nekir, wî jî devê xwe xiste ava cihokê û têr vexwar.

Husik:

- Ew ci ye Üsiv? got.

Aşık Alî peyva wî ji dev girt:

- Husik, destê mede, got. Dest belengêz mede.

Mehemed:

- Înşaleh em ê kar bibînin... Dilê min weha hukum dike. Ger em nebînin nabe.

Husik:

- Em ê bibînin, got. Em ê karekî pirr baş bibînin... Ma qey te di xewna xwe de dîtiye?

Mehemed:

- Dilê min weha dibêje.

Mehemedê Zarok:

- Dilê min jî... Ga...qulonç çengel...

Husik:

- Bibirre, got. Bibirre segbav.

Aşık Alî:

- Dest lêwik mede.

Husik:

- Mirov dêhn dike, got. Em nêñ bi dest naxînin ew di derdê gayan de ye.

Aşık Alî:

- Cahil e, got. Zarok e. Ma qet cahiltî di serê te re derbas nebûye?

Husik:

- Derbas bûye, lê ne ga, min di emrê xwe de ciwange nedîstine.

Aşık Alî:

- Ew jî weke te ye, got.

Husik:

- Oof Aşık, tu jî...

- Ê wa ye.

Bû êvar, der û dor tarî bûn. Te digot qey asman ji stêrkan hatibû raxistin. Stêrk wilo pirr bûn ku mirov digot qey asman hemû stêrk in Wawîk dikewtiyan.

Lihêfîn xwe kirin behlif û xwe dirêl kirin. Birrek kelmêş, weke ewrekî reş hat û li ser

wan kom bûn. Gezên kelmêşan weke derziyan di laşê wan de radibûn. Wan ew vir de û wê de qewirandin, ne bû, ew kuştin ne bû. Her cihênu kelmêşan xwe lê datanîn, dinepixî. Wan dest pê kirin û xwe xurandin. Xirte xirta wan bûn wan xwe dixurandin.

Üsiv:

- Rawestin, got. Hûn nikarin razên. Heta sibehê ew ê me perçe bikin. Kelmêşen vir weke kûçikan bi mirov digirin. Bêçare ye, divê em agirekî dadîn. Ew nayêñ êgir. Nayêñ dixanê.

Husik:

- Rast e, got. Ez jî zanim. Ez jî havînekê li çûkûrovayê mabûm.

Wan çûn hemêzek pûş ya mezin ji gidişa kîleka Husik anîn û li ortê danîn. Paşê kibrît vêxistin û dan binî, agir bi carekê ve gurr bû.

Hebekî wê de riya spî, ya weke şerîtekî zirav rohnî bû. Ava cihokê xuya bû. Gava ku wan Üsiv di şewqa êgir de dîtin, tirsîyan. Ew zer û hişk bûbû. Goştê rûyê wî kişiya bû. Devê wî jî hev mabû.

Husik:

- Kelmêş nayêñ şewqê, em ê heyâa sibehê wilo vêxin, got.

Aşık Alî:

- Em ê vêxin.

Husik:

- Kelmêşen çûkûrovayê... got.

Aşık Alî:

- Qet mebêje, got. Lawîkekî feqîr hebûye...

Husik:

- De bêj Aşık, got. çırka ku em hatine çûkûrovayê ne te stiranek gotiye, ne jî te li tembûre xistiye.

Aşık Alî:

- Wa bû.

Üsiv:

- Aaay, got, naliya.

Aşik Alî:

- Înşaleh wê derbas bibe keko, got.

Husik hemêzek pûşê din jî anî û avêt ser êgir. Ji aliye kî ji ber germa hezîranê, ji aliye kî jî ji ber germa êgir, ji rûyê wan dilopên xwêdanê diherikî.

Husik:

- Aşik Alî, yê ku te bîska din dest pê kir, bîbêje, got û destê xwe li milê wî xist

Aşik Alî tembûr xiste destê xwe, pişti ku kok kir:

- Ji wê hêla me lawikekî feqîr hebûye... Dilê wî ketibûye keçikekê. Bavê keçikê keçik nedîdayê. Gotiye bila du hezar lîre peran bîne, bila keçikê bibe. Lawik feqîr bûye, xwas û tazî û hewcedarê pariyek nan. Bi sala bi dû keçikê ketiye. çawa ku lêwik ji keçikê hez dikir, keçikê jî ewqasî ji lêwik hez dikir. Şevekê lêwik bi destê keçike girtiye û gotiye, bimeşe em herin çûkûrovayê. Hatine çûkûrovayê. Lawik zaro bû. Bi roj xwe vidişartin û bi şev jî dîmeşîyan. Ew ditirsiyan ku hukûmet wan bigire û wan ji hev bîqesînin. Bavê keçikê zengîn bûye. Dest û ling dirêj... Lawik bi rojan keçik baş vedişart û bi xwe jî diçû ji gündan nan dida hev. Rojekê dîsan lêwik keçik di kortaleke di nav erdê birincê de veşartiye û çûye ji gunadan nén bide hev. Pişti ku roj çûye ava û şev tarî bûye, ancax ew gîhiştiye kortala ku keçik tê de veşartiye. Nihîriye ku keçik li cihê xwe tuneye. Geriya ye negeriya ye, wî keçik nedîtiye. Heta sibehê li wir çûye û hatiye. Wî heta sibehê hêşirêñ ji xwînê rijandiye. Cenet, Cenet! heta bi sibehê bang kiriye. Gava ku dinya rohnî bûye û gawir û musulman ji hev ferq bûne, ew ji xwe re çi bibîne! Di kortalekê de komek hestiyên spî... Ji aliye kî gulyêñ keçikê weke marekî reş,

li aliyê din jî kincêñ keçikê yên perçê perçê... Gava ku lawik vê yekê dibîne serê xwe winda dike. Dibêjin ku kelmêşan keçik perçê kiriye, kelmêşan keçik xwariye. Gunêhê wê di stûyê yên ku dibêjin de...

Husik:

- Rast e, got. Ger niha agir tunebûya ma qey wê kelmêşan em jî perçê nekirana?

Mehemed:

- Wan ê em bi saxî bixwarana.

Aşik Alî:

- Lawik li hemberî hestiyêñ spî rûniştiye, gulyêñ wê xistine destêñ xwe û stiranek gotiye.

Husik:

- De, got. De ez heyrana çavêñ te bim Aşik.

Aşik tembûra xwe xiste nav destêñ xwe û xwe bi ser tembûrê ve tewand. Lêxist, tembûr peyivand û wî jî got. Dengekî Aşik hebû, weke dengê Veysel, mirov dişewitand. Aşik got û yên din di cihêñ xwe de sar man. Ji devêñ wan ji "ax" ê pê ve tiştek dergediket.

Aşik Alî:

- Weha, got. Lê lêwik gulyêñ keçikê yên şîrikî xistine destê xwe û ketiye nava gundêñ çûkûrovayê li kê rast hatiye, derdê xwe jê re gotiye û kula dilê xwe jê re rijandiye, dil li wan perçê kiriye. Dûrî serê dijminan...

Dûre Aşik tije bû. Tembûra xwe hemêz kir û xwe baş bi ser de tewand, bû bi qasî destekî, ew weke zarokekî pênc salî ma. Dengê wî yê gurr û xurt di tarîtiya şevê de pêl da û di hemû deşte de belav bû.

Ew radibû, dadiket, hêrs dibû, diqîriya. Wî li ser derd û kulan digot, li ser evînê, li ser mirinê, li ser tunebûnê, li ser êşa zirav, li ser tayê, li ser zar û zêcan, li ser tenêbûnê, li ser dûrbûnê... Li ser Kızılırmak, li ser Seyhanê, li

ser Ceyhanê digot. Li ser çükürovayê, li ser mêsan, li ser gawirên motoran. Li ser dinya xerab, li ser ciyayê bi berf û keriyê xezalan digot. Li ser axan, li ser stemkariyê digot.

Heta bi berbangê got. Gava ku dinya rohnî bû û bayê sibehê yê hênik hat, wî hêdika tembûra xwe danî kèleka xwe. Jê pê ve wî devê xwe venekir û tu tişt negot. Tenê rûyê wî rehet û di hundurê ronahiye dilşa de bû.

- Aşik, gotin. Xwedê nexweşiyê nîşanî te nede, tunebûnê nîşanî te nede. Ya ku tu destê xwe biavêjê bibe zér.

Ew ji wir çûn. Agirê ku li dû xwe hîstibûn vêketibû. Dûre agir winda bû. Ji dûr ve tenê dixaneke zirav xuya dikir.

Gundê ku ew tê re derbas bûn, navê wî Akkîy bû. Gund xerabe bû. Kozikênu ku bi rêxê hatibûn seyandin, qamîş li ser nêma bûn, hemâ ew wilo spartibûn girik. Bi dû wan de keriye kükük dihat. Gava ku ew di ber xirbeyekî xerabe re derbas bûn, kalekî çavbişlaq û piştxûz bang wan kir:

- Merheba.
- Merheba, wan jî gotin.
- Hûn ji ku têñ û hûn ê bi ku de herin? mîrikê kal ji wan pîrsî.

Mehemed:

- Em ji Urumê têñ û em hatine li kar bigerin.

Peyayê kal:

- Kar di devê piling de ye, got. Ku tu karibî bistîni, bistîne.

Mehemed:

- Însaleh emê bibînin.

Kalo:

- çükürova ne ew çükürovaya ku tu pê dizanî, erd û ezman bûye traktor.

Aşik Ali:

- Wê Xwedê li feqîr û belengazan were

rehmê, got.

Kalo:

- Amîn, amîn, li me hemiyan...

Mehemed:

- Di xweşiyê de bimîne, got.

Kalo:

- Zadekî Welîyê me heye, raza ye, got û kete riya wan. Zadê ku radizê makîne nikare biçine. Hûn ciyayî paleyên baş in.

Mehemed:

- Em pirr xweş diçinin.

Husik:

- Em diçinin

Mehemedê Zarok:

- Ez jî diçinim, got. Qulonçê dasînî, weke heyvê.

Aşik Ali:

- Tu jî diçinî, got. çîma tu ê neçinî, ciyê te kêm e?

Kalo zarokek xiste pêşıya wan û ew şandin mala Welî.

Lawik:

- Apê Welî, got. Bavê te ev şandine, ew ê zadê te biçinin. Ev baş diçinin. Bavê te wilo got. Ev eynî weke bîcerê ne. Yaaa...

Dûre wî şelwerê xwe yê reş û qetiyayî kişand û ji wir bi dûr ket.

Welî:

- Baş e ku hûn hatin, got. Zadê min bi erdê ve bûye yek. Makîne nikarin biçinin. Tu makîne nikare biçine.

Mehemed:

- Em karin biçinin

Welî:

- Hûn ê bi çiqasî biçinin?

Aşik Ali:

- Hela carekê em erd bibînin.

Piştî ku wan avek vexwarin, ew çûne nav erd. Zad bi qasî bist donim genim bû. Ew

weke hesîlê li erdê hatibû raxistin. Similek ji li ser xwe nemabû.

Aşik Ali:

- Wax, got, mehû bûye.

Weli:

- Gava Xwedê nede nade, got. Ger piling têketa nav vî erdi nikarîbû wilo bikira. Qismet e, genimê weke qamişan raza ye. Baş bû ku hûn hatin.

Ji bo çinîna wî bîst donimî bi bîst lîran li hev kirin. Wan zûka dasêñ xwe derxistin û ketin nava erd.

Mehemed:

- Min ji we re negot, ku em ê kar bibînin? Dilê min wisa hukum dikir. Li vê çûkûrovayê binihêrin, weke dînyayekê ye. çawa kar tuneye! Tenê ku mirov bixwaze kar bike.

Herkesi dest bi kar kiribûn. Hele helaya wan bûn diçinîn. Ûsiv serê xwe xistibû nav çongên xwe û li ser qûçekê rûniştibû. Dasa Ûsiv Mehemedê Zarok girt. Gava Weli kete riya malê da here ji wan re xwarinê bîne, Mehemedê Zarok bi dizi nêzîkî wî bû.

- Apo, got, tu ê heqê min jî bidî min? Gayêñ qulonçdas... Wî xweziya xwe daqurtand.

Weli şaş ma. Berê xwe bi yên ku zad diçinîn vekir:

- Ev ci dibêje wilo, dêhn e ci ye?

Aşik Ali:

- Guh mede wî, got. Ew zaro ye.

Mehemedê Zarok bi hêrs ber bi berê genim ve çû.

Husik:

- Te ci ji Weli axa re got kuro? Kuro lawê kûçikan...

Aşik Ali:

- Ma wê ci bibêje, got. Hebe tunebe wê li hejmara traktorêñ ku li çûkûrovayê hene pîrsî be. Ma wekî din wê ci bipirse? Ne wilo Me-

hemed?

Mehemedê Zarok:

- Ji xwe min jî ew pîrsî, got.

Heya bi pişî nîvro bêî ku ew piştên xwe rast bikin wan çinîn. Ji germa rojê leyelan li ser wan rabûbû. çinîna genimê razayî ne weke çinîna genimê li pê ye. Pişta mirov dişikîne.

Dema firavînê Weli ji wan re satilek şorbe anî ser erd. Ew rûniştin û şorba xwe bi iştêh xwarin. Lê Ûsiv pariyek ji nexwar. Hevalên wî kirin nekirin, li ber geriyan negeriyan, şorbe bi wî nedan xwarin.

Pişî xwarinê, bêî ku ew westa xwe bigirin, wan dest bi çinînê kirin. Ew lê vebûbûn, bi awayekî diçinîn ku bîçerê li ber wan gû dixwar.

Nêzîkî roava bû, nêrîn ku Ûsiv hat, bi hêrs dasa xwe ji destê Mehemedê Zarok girt û dest bi çinînê kir. Her derê wî diricîfî.

- Tu nexweş î, meke Ûsiv, gotin. Tu ê bi vî awayî xerabtir bibî. Tu ê vê havînê li çûkûrovayê perîşan bibî. Tu meçine. Em ê di nava xwe de parekê bidine te jî. Em ne ker in, qey em jî camêr in.

Ûsiv qet deng nebire xwe. Serê wî di ber wî de bû û helke helka wî bû diçinî. Dûre ji nişkê ve kete xwarê, dasa wî ji destê wî ket.

Aşik hat, Ûsiv ji erdê rakir.

- Meke keko, got. Tu nexweş î.

Ûsiv ji nava erd derxist, li paş xwe zîvirî.

Husik pirr hêrs bû:

- Şeytan dibêje rahêje dasa wî û di nava serê wî de lêxe, ci dibe bila bibe. Kuro segbav, tu zanî ku tu nexweş î, tu mirî yi, ci ji te re ku tu bidî dû me û werî van deran? Li cihê xwe bisekine, li gundê xwe bimîne, bela serê me. Tu ci ji me re dibî bar... Ji xwe em...

Aşik Ali:

- Husik, got û hêrs bû. Tu ji vî belengazî ci

dixwazî Husik? Ew ne nanê me dixwe, ne jî ava me vedixwe. Tu ji vî zilamê nexweş çi dixwazî birawo? Ji xwe Xwedê lêxistiye, ma em jî lêxin.

Husik:

- Bila bisekine, got. Bila li cihê xwe biseki-ne. Tê genim jî diçine! Dimire! Genim jî... Ma ne ew bû yê ku digot, çûkûrova cehenem e û riya me dibirrî? Niha jî...

Heta bi roava wan çinîn. Lê xelas nekirin. Wan dasêñ xwe xistin ber pişten xwe û vege-riyan gund. Bayê xerbî bi hemû hêza xwe dihat. Welî merşek li der ve raxist û ew li ser rûniştin. Li kêleka wan çêlekê pozê xwe xistibû nav giha hêşin û dixwar. Devê golika wê di guhanê wê de bû û şîr dimêt. Bêhna gihayê li wan der û doran belav dibû.

Welî siniyek mezin tije savar, anî û li ber wan danî. Savar riјî bû, lê guh nedanê, bi iştah xwarin.

Jina Welî nuh zaro jê re çê bûbû, ew li hundir razayî bû. Li kêleka wê jî zaroka wê ya nûzayî li ser seradê razayî bû. Sê zarokên Welî yên din jî hebûn. Hersê jî nexweş, bi tayê bûn. Hemû diricisîn. Gava Mehemedê Zarok hatibû hundir, wî hingî ew li hundir dîtibûn.

Ûsiv şiv jî nexwar. Diranêñ wî bê hawe li hev diketin. Mirov digot qey hesp di riyêñ bi kevir de diçin. Hertim jî wî axîn dikişand.

Husik:

- De, digot. Ez niha çi bikim? Wê ev zilam min dêhn bike. Li vê germa çûkûrovayê nexweşî ji me kêm bû.

Aşik Alî:

- Tiştê ku wê bibe dibe. Mirov nikare pêşiyê lê bigire. Em ê bikişînin birawo, ma wekî din çi ji destê me tê...

Welî nivînê jina xwe li ber dikê raxist.

Nivînê zarokan jî li ber ê wê raxistin. Bayê xerbî toza li ser nivînan dimalîşt.

Palan jî lihêfên xwe vekirin û ew li ser merşâ di bin xwe de raxistin. Yêñ din razan, lê Aşik Alî û Welî hişyar mabûn û dipeyivîn.

Welî:

- Bila erd jî min bistîne, bila bisfine, da ez jî xelas bibim... Tu bixebite, bixebite, diran nemîne, neynûk nemîne, dest nemîne, ling nemîne û nêviyê wê bide yê ku kar nake, ma wiло dibe? digot. Tune, tune, ji vê çêtir tune. Mirov birçî bimire çêtir e. Bila ew erd jî min bistîne da ez jê xelas bibim.

Aşik Alî:

- Wa mebêje birawo, digot, li hember derdi-ke. Tu şaş î. Erd cihê ye.

Welî:

- Raste, ku erd yê te be baş e, lê yê xelkê be tu ê wiло bîbî kole. Ev keda min xwîn e. Haya wî tew jê tune ye. Binihêr, tu rewş û pergala min dibînî. Bila erd jî min bistîne da ez xelas bibim. Ji xwe wê bistîne. çırka ku traktor hatine, yên ku erd deman dikirin ji navê rabûn. Bi tenê ez mame. Bila ez bimirim û jê xelas bibim. ci dibe bila bibe, jiyan ev be...

Welî hîna jî got. Ew kufur bû, wî xeber da, lê Aşik Alî wer ku westiyabû, ew bi xew re çû. Wî hew gotinêñ Welîbihîstîn.

Wan roja duda, pişti nîvro zad hemû çinîn. Perêñ hûr ji Welî xwestin û weke biran li hev par ve kirin. Ûsiv pere nedixwest. Aşik Alî belkî zêdeyî satekê li ber wî geriya ta ku bi zorê para wî xiste bêrika wî.

Gava ku pere kete destê Mehemedê Zarok gelekî kêfa wî hat. Wî pere xistin destêñ xwe, di ser hev re qulupandin, lê nihêri, xiste bêrika xwe, dîsa derxist. Dû re da Mehemed. Lê paşê dîsan bi paş de jê xwest. Dû re dayê,

dîsan jê stend. Dawiyê xiste bêrîka xwe, wî destê xwe qet ji bêrîka xwe dînedixist. Carê ew pere ji bêrîka xwe derdixist û lê dinihêri. çû ba Mehemed:

- Apê Mehemed, got, ez ê coteke ga bikirim, coteke gayê qulonçmezin, ez ê bibim welêt...

Husik ji Mehemedê Zarok pîr hêrs bû, wextû li wî xista, lê Aşik Alî nehişt. Dû re li Mehemedê Zarok zîvirî:

- Lo Mehemed, got, tu jî evqas dinya nedîti nebe, lo!

Mehemed:

- Ma min ji we re negot, em ê kar bibînin, em ê peran qezenc bikin. Em ê îsal pîr peran bidin hev. Dilê min wisa hukum dike.

Jina wî, zarokêni wî û bizina spî jî qet ji bîrê nedîçû.

Ji wê pê ve ew li her derê çûkûrovayê geriyan. Wan pîr tişt dîtin. Pîr tişt bi serê wan de derbas bûn. Gundêni ku neçûnê, axayêni ku xwe neavêtinê, neman.çûkûrova beroş, ew jî çôçik, bimeşe bavo bimeşe. Ew her geriyan. Rojekê gava ku di mîrgekê re derbas bûn, ew heya qirikê di herriyê de man. Şofêrê trakto-rekê ku ew xelas kirin, ji wan re behsa wê avzêlkê kir.

Li deşte gelek pale bêkar digeriyan, paleyên weke wan birçû û belengaz. Hemî jî weke wan şas mabûn. Di riyêni ku tozê dida çongên mirov de traktor, bîçer û kamyonên şîn, zer, sor û şîrkî derbas dibûn. Li ser wan bi qasî nîvtilyê toz girtibû. Ji tozê qet rengê makînan xuya nedibûn.

Deşt hemû ji tayê diricî. Rûyê mirovan yêni zer dirêj bûbûn.

Giha hişk bûbû, pel li şaxan çilmisibûn. Ser û binê deşte ji german zer bûbû. Wan miriyêni ku di riyan de mabûn, dîtin. Berêvarekê, miriyê ku ew lê rast hatin, di nav

toza rê de mabû. Rûyê wî yê ku di bin tozê de xuya dikir, weke kehribarê bû. çimêni wî rep û lingêni wî dîk bûn. Pişti hatina traktoran, mirov bi carekê ve hatibûn guhertin. Ew tewlo mewlo bûbûn. Wan li rûyê mirov jî nedînihêrin. Van makîneyên ku nizanibûn bê wê ci ji wan re bike, ji wan re bûbûn weke pütan.

Li gundekî axayekî xort bê sebeb tif kir wan, ji dê û jînêni peleyên bêaqil, ku ji çiyan hatibûne çûkûrovayê re xeber û gotinêni nemayı kirin. Ku Aşik Alî bi Husik negirta wê Husik mîrik ji hev perçê bikira. Wî ji kerban serê xwe li dara tiwê, ya li ser rê, ya ku pelên wê di tozê de mabû, dixist, digiriya, dinaliya û xeberên nebaş ji çûkûrovayê re dida.

Wan hîn gelek tiştên din jî dîtin, bi serê wan de tiştên nedîti derbas bûn. Ew du rojan jî birçî man. Ku ne ji Aşik Alî bûya rewşa wan xerab bû. Ew li gundan geriya, li tembûrê xist û nan da hev. Ger weke bêrê bûya, wan ê Aşik Alî li ser destêni xwe bigerandina. Niha tew li rûyê wî jî nedînihêrin. Berê xwe davêtin Aşik Alî, li ber wî digeriyan, ji bo ku li deng û tembûra wî guhdarî bikirana.

Ew di tozê de mabûn. Xwêdana ku ji laşê wan diherikî tevlî tozê dibû û dibû herri. Weke ku ew ji nav çirravê derketibûn. Tiştê ku nedîtitibûn, dîtin. Tiştê ku nekişandibûn, kişandin. Aşik Alî li ser derd, li ser tunebûnê, li ser riyêni bi toz, li ser axayêni zalim, li ser kelmışen bi hesû yên ku weke maran bi mirovan vedidan stiran gotin. Yên ku dengê Aşik dibihiştin, dilê wan perçê dibûn, di nava kul û kederan de diman.

Em bêni ser Üsiv, ne ez bibêjim, ne hûn bibihîzin! Ji wê re dil debar nake. Ku dilê

mirov kevir be ji wê ji ber rewşa wî bihele. Ew du hefetyan bi wê belengaziya xwe bi dû wan de dikişkişî. Yêñ ku li her aliyên xwe agir dadidan, bê hiş diketin û yêñ ku weke berfa zozanان dîcerisîn. Piştû du hefteyan êdî ew nikarîbû bimeşîya. Wî nan nedixwar, lê bêñ navbirava çukûrovayê ya şîrgerm, mîna xwînê vedixwar. Ew tenê çerm û hestî mabû. Wan bi dorê ew li pişta xwe dikirin. Bêtir Husik ew hildigirt. Ji ber ku di nav wan de yê herî bi qewet Husik bû.

Üsiv:

- Min bayejin û herin, digot. Ez ji we re bûme bar. Bila ez ji wek wî miriyê ha li ser rê di nava tozê de bimînim.

Yêñ din guh nedidane wî.

Pêşî Husik hişyar bû. Destêñ xwe yêñ mezin kirin hutik û çavêñ xwe firkandin. Her derê wî dişewî. Dû re Husik Aşik Ali hişyar kir. Dû re Mehemed... Üsiv heya bi sibehê ranezabû, ew her ji ber eşâ laşê xwe naliya bû. Niha ji ew hêdî hêdî dinaliya. Diranêñ wî ji weke ku bi hev ve hatibûn çengelkirin. Mehemedê Zarok ji destê xwe yê rastê xistibû bêrîka xwe û li ser raza bû. Razaneke wî weke ya zarokêñ biçûk hebû. Te digot qey wî nefes nedigirt.

Weke ku êvarî şîlî bariyabe, avî ketibû, der û dor şîl û pil bûbû.

Çukûrova hişyar dibû. Dîkêñ gundê li jêri wan bang dan. Dû re dengê makînan hatin. Paşê ji dengê mirovan. Dengê rojê tevlî dengê makînan bûn.

Paşê ji li erdê leylaneke zirav bilind bû, pirêze biriqîn. Ji dûr ve, ji pişt Gawirdaxê topek şewq pijiqi.

Ji vî cihê re axa Yüregirê dibêjin. Ev axa Yüregirê teze ye, weke laşen jinan nerm û germ e. Tu can biçîne wê şîn were. Zadekî wê heye, dibêjin ku piling ji têkeve nav ne xem

e. Ji yekê re sih, ji yekê re çil davêje. Gava pembûyê Yüregirê derdikeve, hemû erda Yüregirê çilspî dixemile.

Husik bi pozikê sola xwe Mehemedê Zarok tevda.

- Rabe, got. Rabe kûçik lawê kûçikan. Tu heta bi nîvro radîz! Ev kûçikbav li serê min bûye Keklikoglu.

Aşik Ali:

- Husik, got. Tu bi her awayê xwe baş i, lê xwezi ev adeta te tunebûya.

Husik:

- Binîhêr, got, tu bi Xwedê kî Aşik binîhêr bê çawa raza ye! Pere xistine bêrîka xwe, destê xwe ji xistiye bêrîka xwe û li ser wan raza ye. De were dêhn mebe! Tu dibê qey em hemû diz in.

Aşik:

- Her xuyêñ te baş in, Husik... Lîwik nedîtiye. Ne bi zorê ye... Nedîtiye.

Mehemedê Zarok bêñ dilê xwe hişyar bû.

Êdî kêt giliştibû hestî. Wan ji mîj ve bîryar dabûn, ku vegezin. Lî Mehemed pêxîla wan bernedida. Her ku wan berê xwe bi welêt vedikirin ku vegezin gundê xwe, Mehemed ji dûr ve gundek didit,

- Hela em herin vî gundî ji, ew ê helbet li wir karek hebe, digot, li ber wan digeriya û ew dibirin wî gundî. Wilo, belkî wan deh caran berê xwe dane gundê xwe, ku vegezin, lî Mehemed berê wan bi gundêñ din vedikir.

Îro êdî dawî bû. Careke din vege tunebû. Kar tune ye, ew ê ci bê sebeb û perişan li çukûrovayê bigerin. Mehemed ji hêviya xwe birri bû, stûyê xwe xwar kiribû.

- Em herin birano, ma ci ji destê me tê, em herin, gotibû.

Husik Üsivê ku li erdê dinaliya rakir û li pişta xwe kir.

Üsiv ji nişkê ve veciniqî.

- Min deynin. Êdî ez westiyam wer ku ez li pişten cihê cihê siwar bûm. Ez ji ber xwe fedî dikim. Ez ji we re bûme bar. Min deynin. Ez ê bi xwe bimeşim. Min deynin. Wî lingên xwe li hêtên Husik dixistin. Min deyne! Ku tu min daneynî ez ê bimirim.

Aşik:

- Meke birawo, got. Ma ev rewşa te ya bi xwemeşandinê ye? Vê meke. Êdî va em diçine mal.

Ûsiv guhdarî nekir. Wî her digot, min deynin. Husik jî hêrs bû, ew danî û meşiya. Mehemed kete bin mileki Ûsiv, Aşik Alî jî kete bin milê din û bi dû Husik de meşyan. Serê Ûsiv pê ve daliqyabû. Gava ku ew di nava wan de dimeşiya, lingên wî li hev digeriyan û huldukumî. Pişti ku ew demekê wilo meşiya, bi carekê ve êdî hew lingên wî pê ve hatin. Ger ku wan milên wî berdana, ew ê deverû di nav axê de biketa.

Mehemed bi lez ew girt û ew li pişta xwe kir.

Mehemedê Zarok:

- Ger ew min bikujin jî ez naçim ba Keklikoglu. Ez ji birçîna bimirim jî az dîsan naçim ba wî. Ne wilo apê Aşik?

Aşik Alî:

- Ku ez bi tenê bûma dinya hîç bû. Ez di şûna te de bûma ez jî nedîcûm ba wî.

Mehemedê Zarok:

- Ew ne heqê min dide min, ne jî tiştekî... Ew bi lêdanê jî min dikuje.

Mehemed:

- Ez ê niha çawa li rûyê jina xwe binihêrim. Ez ê ji zarokên xwe re çi bibêjim? got.

Aşik Alî:

- Tu ê dîsan listikekê derxînî. çavê te lê ye ku tu dîsan listikekê derxînî Mehemed?

Husik:

- A niha, a niha ku kar hebe û bêjin were bixebite, ez dîsan jî nasekinim, ez ê herim. Bes e êdî! Ev rezilli û kepazetiya ha bes e. Ku çûkûrovayê bi ax û kevirê wê, bi motorê wê û bi van tirimpêlên wê ve bidine min ez dîsan nasekinim.

Aşik û Husik di rex hev de dimeşyan. Mehemed di bin Ûsiv de westiya bû û di pêşıya wan de dimeşiya. Serê Ûsiv bi aliyeği ve daliqyabû û bê deng bû. Aşik çû ba ûsiv, daqûl bû û lê nihêri.

- Husik, got, rewşa Ûsiv xerab e. Stûyê wî ketiye...Xwedê zane... Xwezi ku ew bigihije gund û di nava zarokên xwe de...

Husik:

- Qet hêviya min tune ye, got. Ez bawer nakim ku ew bigihije gund. Ez li ber dikevim ku wê Ûsiv li çûkûrovayê bimîne...

Aşik Alî,

- Zor e, got.

Husik:

- Ku em wî bigihînin gund ew ê jina wî were pêşıya me. Ew ê zarokên wî li ser serên me kom bibin. Ez ê ji wan re çi bibêjim? Ûsiv li ku ma? ew ê bipirsin. Ax, ku nemira... Ku ew nemire ez ê qurbanekê bidim.

goşt û wekî din bida çêkirin. Jina wî û lawikê wî tenê rojên ida çav bi birinc û tîrşikê dike-tin. Ji ber vê yekê ne bi kevciyan, lê bi pariya dixwarin. Serê sibehê nîskên xwerû, firavînê şorba savar, êvarî jî şorbeşîr dixwarin.

Rojek, dudo, sisê. Evserê ji xwe re got: "Ev wuha nabe. Em çûn helakê, ez divê tiştekî bikim". Mala bavê wê jî di wî gundi de bû û du birayêن wê hebûn ku zeballah bûn. Ew qelew û li wê gorê jî dirêj bûn. Evserê ji tîrsa mîrê xwe newêribû ku ji mala bavê re behsa tiştekî bike.

Rojekê Evserê diçe mala bavê xwe. Birayêن wê, diya wê û birayêن wê li zerbûyina rûyê wê heyirî dimînin. Nizanîbûn ku çi hewalê qîza wan e. Birayê wê di derheqa mîrê wê de ew guvaşt û jê pîrsin kirin. Pêşî jinikê nexwest ku tiştekî bibêje. Dawiya dawî wê hew xwe girt: " Ez çi ji we veşerîm jî ji Xwedê nayê veşartin. Hal û mesela min û mîrê min ev e. Ew her roj şorbê bi me dide çêkirin û naxwaze ku em ji xeynî şorbê ti xwarinêن din biwxin. Em hînî çêkirina cûrbecûren şorba bûn. Ëdî nava me tê xwarê, em emelî bûn". Pişti van gotinan birayêن wê gotin: " Xwişka me, em ê te ji vî derdi xelas bikin. Tu işev ji me re derî vekirî bihêle, em ê nîvê şevê werin. Haya te ji me hebe, tu netirsî".

Şev nîvê şevê herdu birayêن Evserê têne mala wê. Bi şev derî vekirî ye. Gava ew têne dibînin ku xwişka wan şiyar e. Bê guman haya wan ji hev heye. Sado razayıyî ye, kes nizane bê kijan xewna bi şorbê re dibîne. Lihêfa wî davêjin ser serê wî, nahêlin şiyar bibe. Her yek bi du kujen doşekê digirin û hêdîka wî ji hundur derdixin. Herdu birayêن jinikê cilêن

çîlspî li xwe kirine.

Sado di xewê de dibin nava mezelan. Goristan nêzî gundi e. Gundî hemû di xewa şérîn de ne. Ji bili ewte ewta kûçikan yên carinan, tu deng ji gundi nayê. Bayekî hêdî li pelên dara dixe. Sirra payizê carinan dicemidî ne. Şevên payizê yên dirêj in. Tavehîv heye û şewqa hîvî li kevirên goristanê dixe û wan spî dike. Di nava wan keviran de cilêن birayê Evserê mîna ku mirov du darêن hewra jê bike û qaçîlêن wan ji ser hilîne, di nava kevirên dirêj yên li ber serûlingêن miriyan dixuyin.

Şevê xwe bi hevvê xemilandiye û bi mi-riyan re hevpeyvînê dike. Stêrik ji hev re destan dihejîmin. Asîmanê bê stûn wekî konekî bilind fireh bi ser dinyayê ve vegir-tye. Mirî bi hev re ketine gotübêjek dûr û dirêj. Carna ba li hinek naylonêن nava meze-лан dixe, dihejîne. Xişna naylonan bêdengiyê diqelişîne û tirs û sawê çê dike. Gava mirov ji dûr ve li mezelan dinêre, kevirên bilind û darên nava wan mîna bajarekî xuya dikan. Ba-jerekî bêkes.

Sado li ser doşeka xwe, li nava mezelan di xew de ye. Carna xwe bi vî alî û alî de di-qelibîne, lê belê şiyar nabe. Ba li porrê wî yê spî dixe, poçaxa wî şeh dike. Ji her du bûrayêن wî, yek li bin serê wî yê din li bin ligê wî ji piya sekinîne. Serê wî dane rojava û lingêن wî dane aliyê rojhilat. Bûrayê mezîn xwe da aliyê serê wî, yê biçûk li aliyê lingê wî sekinî. Bûrayê biçûk hêdîka lingê xwe li yê wî xist, kir ku şiyar bibe.

Sado wê şeva payizê ya dirêj, li bin stêrkîn asîman, li ber tava hevvê û li nava mezelan şiyar bû. Gava ew şiyar bû telpek ewr

li asıman hêdî hêdî çê dibû, ba jî ji gavek berê bêhtir dihat. çavêن xwe vekir ku ci binihêre! Li raserî wî yekî dirêj, di nava kiras û derpiyê qedekde û li binya lingên wî jî zilamekî qasî yê din dirêj û ew jî cilspî sekînî ye. Li hawîrdora xwe nihêrt ku ci bibîne, pepûk reben tev kevirêن mezelan bilind dibin. Li mezela nihêrt û li herdu cilspiyan nihêrt, ji xwe re got: " Welleh ez mirime û vana jî Munker û Nekîr'in, her du yêñ cilspî yek Melekê Şer, yê din jî yê xêrê ye. Wî bi çavêن xwe bawer nekir. çavêن xwe miz da û cardin nihêrt. Belê, eynî wisa ye. Ew tîrsiya, hinekî ricîfî. Bawer nekir. çavêن xwe dîsa girtin. Ji ber ku wî nedixwest ku rewşike weha bibîne. Xwe li xewê danî. Lî nebû. Carek din çavêن xwe vekirin û li mezelê dora xwe nihêri. Pişte bi mirina xwe yeqin bû. Gava baş bi mirina xwe baweri anî, bi rastî jî ew ji tîrsa nîvrûhî bû. Ruhê wî hate çoka wî. Madê wî zer bû û xwîna wî sekînî. Bûrayêن wî tîrsiyan ku ew birra jî ji dil here û bimire. Sado selewat anî " Ber eynê Mihemmed selewat, *Bismillâhîrrehmanîrrehîm. Yasîn wel quranîlhekîm...*" û wekî din dest pê kir xwend. Piştî çend deqîqan, Munker got: " Ya qûlê Rebbelalemîn. Tu gihişî rehma Xwedê. ci xêr û gunehê te hebe, tu ê di huzûra Rehman de hesabê wan bidî. Pêşî suala meytê jê kirin. Sado baş û bi rastî bersiva xwe da. Paşê Munker li Nekîr fitili û got: " Gunehên vî evdî ci ne? Ka tu li deftera gunehan binihêre!" Nekîr li kaxizekê nihêrt û got: " Ez tiştekî nivîsandî nabînim. Lî belê típa "Ş" tenê heye. Ew jî ez nizanim bê tê ci maneyê." Gava ku ew diaxîfin Sado deng nedikir û xwe di nava cihan de pûç kiribû. Xwe guvaştibû ser hev. Dengê wan dihat wî. Ew di dilê xwe de dibêje: " Ez mirî me, haya min ji min tune

ye. Erê ez wek saxa me, lê bi rasti ez mirî me." Ji aliyeke de weha ponijî, ji aliye din de jî li bendî bersiva Nekîr bi heyecan sekînî. Wî bi xwe jî piş meraq dikir ku wê gunehê wî ci bin. Gava Nekîr got, tiştek tune ye, hebekî rehet û bêhneke azad kişand. Pişte bi dengê "Ş" dîsa meraq kir. Gelo "Ş" ci bû? Ev tip bi tenê dihat ci maneyê? Kulpe kulpa dilê wî bû lêdixist, lê belê wî qet ev dengê ha nedibist. Nekîr çend caran got: " Şe, şe, şe... û sekînî, ponijî. Li Munker zîvirand û got: " Hela tu li deftera xwe binihêre, bê ci tê de heye." Munker li kaxizekê nihêri, pelin di ser hev re qulupandin û got: " Di ya min de jî tenê típa "B" heye. Wekî din tu tiş li deftera vî qûlî nehatiye nivîsin. Li cem te "Ş" li cem min "B" heye. Gelo ev têن ci maneyê?" Munker hinekî ponijî û çend caran li ser hev tipêن "Ş" û "B" ji nûve kir. "Ş,B...Ş,B...Ş,B..." Ji nişkê ve dengê xwe bilind kir û got: " Şorbe!" lerizî û Ş,B dibe maneya şorbe" got. "Ş, B, Şorbe...Ş,B,Şorbe...Şor-be!"

Munker li Nekîr fitili " Evi qûlê Rebellalemîn, hem bi şorbê xêr kiriye, hem jî guneh kiriye. Xêr û gunehê wî bi tenê şorbe ye." got. Nekîr dest bi axaftinê kir: " Gelo cezayê wî ci ye? Li wê dînyayê ci kiriye bi şorbê? çîma şorbe?" Munker got: " Wî heta êvarê şorbe daye jin û zarokên xwe. Nehîştiye ku malîyên wî têr nan bixwin. Famîla xwe bi şorbê kezebreşî kiriye. Xwedê teeala jî ji vê yekê re ceza nivîsandiye. Ev ceza jî cil dar in. Em ê cil darî li binê piyê wî bixin." Gava ev gotinê ha ji devê Munker fitili Sado dest bi reelandinê kir. Veciniqî û bi atiyê ket. Xwêdan da û lerizî. Talerzkî girte nava wî. Jiyana wî ya dinya wî alî hate bîra wî. Jina

wî, kurrê wî...şorbe...Li hev xistin..Zare zara jina wî...Giriyê kurrê wî... Dengên cîranan... Dengekî bilind hate guhêن wî " Bes e, bes e êdi bes e. Te me bi vê şorbê nexwes xistin, Xwedê ji te re nehêle gidi." Ev deng dengê jina wî bû.Nekîr bi lingê wî girtibû û Munker dar li binê lingê wî dixistin. Gava cil dar lê xistin, qediya, lê ew ji qediya. Ew ji hal de ket. Tu deverike wî ku neêse nemabû. Nîvrûhî bû. Bûrayê wî yê mezin Munker got: " Bes e, em ê wî bi rastî bikujin. Rebeno mir, bes e. Ew ê xwişka me bê mîr bimîne." Gava herdu bûrayêن wî rahiştin kujêن doşekê, hisê Sado hê ji li serê wî bû. Sado nihêrt ku ew bi hewa ket. Ji xwe re got: " Melan li wê dinyayê digotin, cehenem li erdê ye, lê belê cenet li jor e, li asîmana ye. Min li erdê kotek xwar. Ev cehenem bû. Vêca ez bi hewa ketim. Ez diçim cenetê." Doşek bi hewa ketibû. Ew ji di nav de. Gava herdu bûrayêن wî ew di nava doşekê dianîn, di rê de devê wî le hev diket û hêdîka digot: " Ez diçim bihişta Baqî...Ez diçim bihiştê, ew der herî xweş e...Ya Rebî, pîr şikir ji mezinahiya te re." Bihişta wî mala wî û nava cihê wî bû.

Xwişka wan hêdîka derî li wan vekir. Wan ew disa danîn cihê wî yê berê. Şev dirêj bû. Lihêf li ser serê wî qelaptî bû. Ew bi şev heya sibehê bi xwe nehesiya.

Sibehê jina wî berî wî şiyar bû. Ew çû nava firaxa bû teqe reqa wê. Bi dengê firaxan re ew ji şiyar bû. Nihêrt ku di nava cihê xwe de ye. Şaş ma,şeqizî. Her azayê canê wî diêsiya. Dengên qûşxanan, teyfikan û kevciyan dihatin. Jina wî li xizînekê ci dikir gelo? Bi dengekî êlî û bilind gazî kir ." Keçê tu ci çê dikî?"

Jina wî :" Ez şorbê dipijînim!" Bi vê bersivê re êşa pişta wî û werimandina lingêن wî hatin bîra wî.

"Na, na , na...Keçê malixerabê wê gütêketiyê çê meke! Dev ji wê kerâfiyê berde!

---

*Ev pirtükên Edip Polat bi tirkî çap bûne:*

*1- Diyarbakır Gerçegi*

*2- Newrozladık Şafakları*

*3- Afganistan'da Halk Demokrasisi  
Mücadelesi*

*4- Devletsiz ülkeden Izdiüşümber*

*5- Bilim dilinde Kürtler ve Kurdistan*

# KENGÊ

Eskerê BOYIK



Ya serê sibê tu xêr vebî, şâ  
Hebekî şewqa xwe bide me kurda,  
Hebekî eşqa xwe bide me kurda,  
Hebekî bextê xwe, hebekî textê  
xwe,  
Hebekî azayî, rizq û rextê xwe  
Bide me kurda,  
Me derxe ji nav van kul û derda,  
Van şer û dawa, van talan, cerda  
Û van nemerda...

Ya serê sibê,  
Eva çend qurne û ev çend dewte,  
Sonda me tuî, para me ewre,  
Gazî te dikim ya serê sibê  
Lê şevreşê dengê me dibhê  
Û şevereş e mînanî kabûs  
Giran bêfeyde  
Rûniştiye li ser bextê me, emus  
Dixwaze nava terya xweda me  
Bifetisînin...

Ya serê sibê  
Binhêre hela qeyd-zincîra da  
Çarnikal çek û nemamya dijmin  
Çawa sekiniye KURDISTANA min.  
û çek diteqin  
Cewikê çiya ra xwîn dikşe lêmişt,  
Xwîn dikşe bê hed,  
Û divê Mûrad û divê Ferat  
Ber çavê dinê...


Kor bûye dinê,  
Kerr bûye dinê.

Bes nîne, XWEDÊ, ya serê sibê,  
HEQIYÊ kengê dengê me bibhê...

# ÇİROKA JIYANA MIN

## A. Hicrî ÎZGÖREN

Wergera ji tirkî:  
**M. BARAN**



Ez di sala 1950'î de li Siwêregê hatime Edinê. Min dibistana yekemîn û navîn li Siwêregê xwendin. Li dibistana pêşîn li aliyekî me hewl dida ku em hînî xwendin û nîvîsandinê bibin, li aliyekî jî em hînî zimanê tirkî dibûn. Pişti dibistana navîn me mala xwe bir Diyarbekirê. Min lîse li Diyarbekirê xwend. Gava ez li eskeriyê bûm, ez ketim îmtihanen û min "Diyarbekir Egitim Enstitüsü" beşêzanînên civakî qezenc kir. Min danê êvarê dixwend. Min ev dan bi taybetî hilçandibû. Ji ber ku diviya ez bişuxuliyama da ku min bixwenda. Min bi şev jî dixwend. Di sala 1978'an min ev dibistana ku min her xeyal dikir qedand û min dest bi mamoşetiyê kir. Dîsan di wê demê de ez zewicîm. Niha lawekî min bi navê Pola heye û diçe dibistana pêşîn.

Ez li lîseya ticaretê ya Diyarbekirê pênc sala xebitîm. Di wê demê de hin helbestên min di hin rojname û kovaran de hatin weşandin. Min jî para xwe ji ba û bahoza 12'ê ilona 1980 wergirt. Girtin, ifade, pirsin,

binçav...û di pey re jî sîrgûnê dest pê kir....

Ji 1988'an vir ve ez li Diyarbekirê dixebitim.

Pêwendîya min û helbestê di salêni lîse de dest pê kir. Lî di navenda salêni 70 de min fêhm kir ku tiştên min nîvîsibûn ne helbest bûn. Lî vê gavê nîvîsin û weşandinê jî bi xwe re anî. 1978-80 li Stembolê, di rojnameya Demokratî de gelek helbesten min hatin weşandin. çaxa faşizma 12'ê ilonê ev rojname girt, min jî berê xwe da kovaran.

Ez bawerî bi gotina "Salêni şikestinê, xwendegahen baş in" tînim. Loma jî ez di wê baweriyê de me ku min ew sal baş bi kar anîne.

Heta niha sê kitêbên min yên helbestan hatine weşandin.

1- *Aciyla Diri* ( 1981, weşanxana Bad, Stembol )

2- *Sessizliğin Sagnağı* ( 1984, weşanxana

Dayanışma, Ankara )

3- Verilmiş Sözdür ( 1987, Weşanxana Iz,  
Ankara )

Hemû helbestên min ên van kitêban di kovar û rojnaman de jî hatine weşandin. Mijarên helbestên min, jiyan û hebûn û mana wê ye. Di nav yekîtiya do-iro-sibe de, ez dixwazim vê manê bibînim û pêgirim.

Gotin zehmet e, lê rast e jî ; ez zimanê xwe yê zîmîkî bi qasî tirkî nikarim baş bi kar bînim.

Talan hemû dewlemendiyêne me vegirtin. Belê, zimanê me jî kizirandin.

Ez li malê, li kuçê bi kurdî dipeyivim, lê ev nayê wê maneyê ku min huwiyyeta xwe ya neteweyî di nav avahiyên neteweyî de qulupandiye ser jiyanke neteweyî. Ji ber ku ziman ne bi tenê navgîneke peyivîn û gotinê ye, herweha ew pergaleke fikirînê ye jî. Di vê maneyê de, perwerdeyiya ku me di dibistanan de wergitiye jî pirr tesîr kiriye ku em ji xwe bi dûr ketine. Ev guherînên germ ku em iro dijin, pêwîstiya nivîsna kurdî roj bi roj hîn bêtir mecbûr dike. Mirovên kurd di vî warî de bi xwe re ketiye nav hesabekî kûr.

Ez li ser navê xwe dikarim bêjim ku ez di nav hewldaneke weha de me. Niha ez li ser ferheng û rîzmanenê kurdî dixebeitim û dixwazim kêmâniyên xwe ji holê rakim. Bi hêdîka min dest pê kiriye û hin helbestên xwe werdi-gerînim kurdî.

Bi ya min bêşansîyeke mezîn e ku em di van waran de hê neghîstine qeîdeyên yek-girtû û li ser siyasetan.

Ez nikarim bibêjim ku ez mirovîkî zêde bi plan û program im. Ez niha dosyayeke helbestên xwe hazır dikim ku tê de helbestên ên van sê çar salên dawî hene. Ez hêvîdar im ku ew ê di van mehîn pêşıya me de derkeve.

Ez mîna merivekî ku kêm diafirine, têm nasîn. Di mesela afirandinê de, ez gelekî qîmet didim kalitê, ne zêdehiyê. Li gora min helbest bi carekê nayê navîsin. Têkoşîn dikare bi rojan dewam bike. Gelek caran ez bi ser na-kevîm. Loma ez baş nizanim ka helbestê kengê were û lêde. Ez dixwazim giraniyê bidim ser xebata xwe ya wergerandina helbestên hevdem û xebata xwe bilezînim. Ez divê lê zêde bikim; ez hewlî didim ku helbestên xwe jî bi zimanê xwe û bi bedewî bikaribim binivîsim.

# PÊŞÎ TU Ê HEZKIRINÊ HÎN BIBÎ

## A. Hicrî IZGÖREN

Li milekî zulim

Li milekî ked

Çavê ku nabîne

Guhê ku nabihîze

Û zimanê ku çerx nabe

Bila ne yên me bin.

1

Zarokê min, divê tu bizanibî

Keça periyân

Pînokyo

Robenson yekcar derew in

Ne xalîçen ku difirin

Ne koşkên zêrîn

Tu nas nakî xerabêñ rastî yên çiyayê

Kafê

Hîroşîma hê jî zarokêñ seqet diwe-  
lidîne

Li Kenyayê

Li Ugandayê zarok birçî ne

Memik miçiqîne

Dayikan girî jî bîr kirine

Lê reş bîr bi reşahiya xwe biriye

(.....) mumkin e

emperyalîzm îkna be

Li van deran

Li van deran bavêñ dest vala

stûxwar

û di meydanêñ bêcejn, bêbihar de

Provayêñ qetliyamêñ giştî

Mirin li kolanan digere

Li ser kevirêñ me yên gorê

tarîx hê teze ne

Tu jî pê bizanibe

2

Tu ê jî bizanibî

Reş û spiyê

Birîna ku

Mîna stiraneke evîndariyê xwîn  
dirijîne

Liberxwedanê

Merhebayê

3

Ev dest e, zarokê min

Ji çerm dest pê dike jiyan

Sûrêñ Amedê tevî heyşte û du bircan

Sinifandî, neqîsandî, Asûrî

Hunera van destan

Lêdana wan a tembûrê heye

Tu dibêjî qey qulungê Ferhad e

Ji bo ku Herran bereketa xwe bi  
parve bike

Hesreta ajotina makînê ye  
Ji zû ve ye  
Dilek e ku  
Erd û esman jê re teng in  
Tê de dihele berfa çiyan  
Dîwarêñ kevir  
Hesin û beton  
Tê de zîl vedide  
xwîn jê dere xwîn  
niha di tengahiyê de ye.

4

Çi derew  
Çi talan  
Nikarîbûn stiranêñ diya min xelas  
bikirana

5

Di nav şevê de zîl dide  
Rengê sibê  
Roniya rojê  
Rojenon.

Ev çav in  
Ji bo naşîna  
rûçikê duzenbaz, kuliyyêñ pêxas  
Paşê, girêdana wî ya hedefê heye  
Pê re zîndan heye  
Pê re riyêñ sîrgûnê hene  
Dişewite û dişewite  
niha tevî henaran e

Ev roniya çavan e  
Xwêdana eniyê  
Dinya li ser wê  
Bihar pê re heye  
Niha di kaseyêñ xwefiroşan de  
tomar tomar  
Zaroktiya min a nejiyayî ye

## XWE BI BÎR TÎNE

1

Êş êdî efsane ye  
Li vir cografiyayek tê talan kirin  
çûkek baskê xwe dişkîne li vir  
Li mirinekê lihevhatî ku bi çûyinê  
qet naqede  
Hem jî wext nemirî û evînê lêdide

2

Tu ê cihêtiya xwe bîne zimên  
Ji hev veqetîne li ser hesabê binivîse  
zêde bike dijitiyan  
Wê senfoniyê li dengê bêdengiyê  
guhdarî bike  
Li nik goştê min ê ku dişewite pal  
bide, birînêñ min  
Binêre mîna qîrîneke cegersoj  
Çawan Bihar xwe bi bîr tîne

Binêre, ev însan e zarokê min

Ev çiya ye  
Dê bide û veşêre  
  
Mêzeke ev mêsake hingivîn  
ev derziya wê  
ev jî hingivê wê  
û ev zanîn e, zarokê min  
Tu ê tê de binası  
Kesêñ li hember te, kesêñ aliyê te

# KURTEBEHSEKE JIYANÊ

## Zeynelabidin ZINAR



**E**z di Çarê Sibata 1953-an de li gundekî Bakûrê Kurdistanê yê bi navê Hedhedkê ji diya xwe re çêbûme. Bavê min ji eşira Pencînar e û diya min jî Reşkotî ye. Wê demê bavê min meletî dikir û her salek, du salan carekê diçû li gundekî ciwar dibû. Sedemê gerra wî ya zêde li gundan jî ev bû: Neçûbû leşkeriya Tirkiyê. Îcar dixwest ku şopa xwe wenda bike, da ji aliyê cendirman ve nête girtin. Ji ber hindê em li gelek herêmên bakûrê Kurdistanê geriyan û têkiliya me jî bi xelkê re pir çedibû. Niha em jî bavekî 23, lê ji diya min heşt xwişk û bira hene. Lê zarûkên min tenê sisê hene!

Di çaxê meletiya bavê min de, gelek feqî li cem wî dixwendin. Kêm-zêde hin caran jimara wan digiha 40-50 feqîyan.

Min hêj di zarûktiya xwe de dev bi xwendinê kiriye. Pêşî min li cem bavê xwe xwend û timî di nav feqeyên wî de dimam. Pişti çend salan, ez jî mîna her feqeyî ji malê derketim û cûm li xwendinê geriyan, di hin medreseyên li herêmên cuda de xwendime. Lê belê di salên 1967-68-an de teqla xwendina kevn sist bû û zarûkên Kurdan berê xwe dan xwendina dibistanê bi zimanê tirkî.

Di Hezîrana 1968-an de min diploma dibistanê ji derve bi îmtîhan li Piranê (Dicle) stend-

û di payiza wê salê de jî dev bi xwendina mekteba "Imam-Hatip"ê ya li Diyarbekir kirim. Di eynî salê de têkiliya min bi Partiya Demokrat a Kurdistanâ Tirkîye re çêbû. Lê çaxê Cunta Faşist a Duyemin di 11'ê Adara 1971'ê de hat, ez ji Mektebê hatim avêtin. Lê ez cûm Elîhê (Batman) û min dev bi xwendina Mekteba Navîn a Neftî sinifa sisîyan kir. Di ber wê xwendina xwe ya bi zimanê tirkî de, ez danek jî diçûm medresê û li xwendina Nehw, Şerîet, Tefsîr i Hêdîse domandim.

Ez di 8.11.1974-an de cûm leşkeriyê. Pişti şe meh û 14 rojan, ez bi rapora doktoran li Nexweşxana Leşkerî ya "Gumusuyu" ya Sten bolê jê rizgar bûm. Ez di 25. 07.1974-an de li Belediya Elîhê ketim karê memurtiyê. Ji 1976-an hetanî 1980 yî min xwendina Liseya Elîhê ya Şevê xwend. Ji destpêka jiyanê heta 1980 min hinek meletî kir û li hin mizgevtan jî min meletiya bê meas, wek melê fexrî "xutbe" ya îñê dixwend.

Di 12'ê Elûna 1980 yî de ku Cunta Faşist a Siyemîn hat, hetanî Sibata 1984-an, ez heşî caran hatim girtin. Ci cara ku ez dihatim girtin gelek îşkenceyên bi sosret li min dikirin. Heta li Îşkencexana "Kurdoğlu" ya herî bi navudeng li Diyarbekrê, wan ez anîm ber kuştinê. Lê berî ki e bême kuştin, heval Mele Brahîm şehîd kirin i

ji kuştina min vekişiyen. Yekê Adara 1984-an Dadgeha Leşkerî-1 ya li Diyarbekrê, ez bi pênc salan girtîgeh û 20 meh jî sîrgûn tawanbar kirim.

Di 27.10.1983-an de karbîdestên Cuntê, li ser rapora ku di derheqê min de ji Parastina Nihêni hatibû, ez ji kar dûr xistim. Parastinê di buwara min de nivîsbû ku: "Şixulandina Zeynelabidîn di işê Dewletê, xasma karê berpirsyariya malî de pir talûke ye..."

Di dawiya 1984-an de ez ji Kurdistanê reviyam û hatim li Swêdê cîwar bûm.

Destpêka nivîsandina min ya bi zimanê kurdî, di salê 1962-3-an de, pêşî bi tûpêñ erebî çêbûye. Ewçax di nav feqîyan de herweki derseke taybetî xwendinek ji bo fêrkirina nivîsandina rind a bi navê "Meşq" hebû. Pişû ku ez fêri awayê nivîsandina pirtûkan bûm, pêşî min wek nivîsende dest bi nivîsandina çar pirtûkîn dersa *Nehwê* kir. Ku heta wê demê ji ew pirtûk nehatibûne çapkirin. Min her yekê nusxeyek ji wan nivîsi. Pirtûk ev in: *Ewamila* bi zimanê erebî, *Zurûf û Terkîba* bi zimanê kurdî û *Sadulahî Sexîra* bi zimanê erebî. Herweha min gelek helbest û qeside jî dinivîsandin.

Dema feqîtiyê, hewesa min zêde ji helbestên Melê Cizîri, yên Ehmedê xanî, Feqiyê Teyran û Cegerxwîn re hebû. Min ew pir dixwendin û dixwestim ku ez jî bi şûfê yên wan helbest biafirînim.

Di wê demê de piraniya feqîyan weke min difikirin. Heta hinekan xwe bi Ehmedê Xanî, bi Mele Cizîri, bi Feqiyê Teyran, bi Elî Herîri û hwd, xeysetnav dikirin.

Belam çaxê mirov mezin dibe, serpêhatiyêñ zarûktiyê jî pir têne bîra mirov. Her çendî min zewqa zarûktiya xwe zêde hilnedaye. Ji ber ku timî ez bi bavê xwe re digeriyam û li civatîn mezinan wek ya şêx, mele û giregiran bûm, min xwe wek zilamîn navsere dihesiband. Lî

hin tiştên zarûktiyê hene ku tu carî ji hişê mirov naçin. Yek ji wan ev e: Cûreyek zikrê şêxantiyê bi navê "xitme" heye. Her kes li ser çokan rûdine, çavêñ xwe digire û şêx li nava wan digere, helbest û qeside, selewat û ayetan dixwîne. İcar li gor baweriya terîqetê; yê ku tê de çavêñ xwe veke dê çavêñ wî kor bibin. Lî carna min bi nihêni çavêñ xwe vedikirin û li şêx dinerim, ka ci dike ci nake.

Serpêhatiyek din jî ev e: Temenê min li dora heft, heşt salan bû. Ez tenê bi riyekê ve diçûm. Du cendirme rastî min hatin. Ew bi min re peyivîn. Lî min tu tişt ji zimanê wan fêm nedîkir. İcar yekî du şemaq li min xistin û ez giriyam. Dema ez çûm malê, min ji bavê xwe pîrsî:

- Li rî du cendirme laqî min hatin, min û wan ji zimanêñ hevdu fam nedîkir. Ez kurê mela me ji, yekî du şemaq li min xistin. Çima cendirmeyêñ Kurd jî nînin?

Bavê min keniya û piştre jî hinek ponîjî, got:

- Dema tu mezin bibî, tu yê sedem zanîbi?

Pişû ku ez li Swêdê cîwar bûm, li min wek mesela miriyê ku serê wî li ferşan dikeve hêj bi xwe dihise ku yê mirî ew e, êşa îşkencê zêde tîna xwe li min nîşan da. Ez ketim rewşike wisan xirab ku ji ber wê nexweşinê nigeki min giha ber deriyê gorê. Lî *Nexwêşxana Xaça Sor Beşa* Îşkenceditän a li Stockholmê di nehê Sibata 1985-an de ez girtim bin tedawiyê û heta 20.12.1990'ı domand.

Ez bi wê tedawiyê ji mirineke zû filitim. Lî niha di yazdeh deveran de hestiyêñ şkestî û hinekîn jicîderketû di laşê min de hene, ku ez jî ber wan timî diêşim. Herweha di laşê min de li sê cihan şopa birînê îşkencê têne xuyakirin. Yek ji wan ya şewitandina bi cigara serokê Îşkencexaneya Sêrtê Anîl e, ku di 1981/11-an de pişta destê min ê rastê şewitandibû. Du şop jî di çîpêñ min de hene.

Di nav salê 1981-84-an de, ci cara ku ez diha-

im girtin, îşkenceciyêñ devçarox geleki çêr û lijûnêñ bêmirêz bi min dikirin, ku ango "ne zimanê Kurdan ê nivîskî heye û ne jî Kurd ew nirov in ku karibin dewletek çêbikin!" Bêguman ew gotinêñ qirêj pir li zora me diçûn. Îcar min hêj li îşkencexana Sêrtê adek li xwe da: "Eger ez bi saxîti bifilitim, heta ku rihistîn silava xwe li min bide, ez ê ji ziman û çanda kurdî re bibim suxrevan."

Di destpêka 1985-an de min du program hazir kirin. Yek, ya wergerandina klasikên bi tîpêñ erebî û çapkirina wan. Ya din, programa XWENÇE. Ku ez ê Gotinêñ Pêşîyan, çirok, meselok, leqemok, serpêhatî, stran û dîlokan ji nav xeikê berhev bikim, binivîsim û wek pirtûn bidim çapkiran. Ji xeynî wan, min di nav du salan de nêzî 250 rûpel destnivîsên klasik jî berhev kirin, ku piraniya wan hûç nehatibûne çapkiran. Ew herdu programên min di demeke kurt de berê fêkiyên xwe dan û her ku diçû giyana min bi wan xweş dibû, şêntir bûm û wan gelekî zêde ez didehfandim bibal xebateke hin zêdetir ve. Xebata min ji ber ku pirtexlit û cihêawe ye, ez jê hûç zivêr nabim û piranî ez bi şev hetanî sibehê dişixulîm. Ji 1985-an ve, ez bi wê xazê heta iro jî wisa didominim û bi xwe bawer im ku ta mirinê jî her wisa dê bidominim.

Aboriya malbata min ta Gulana 1990'ı, jî aliyê belediyan ve dihate kirin. Ez yazdeh mehan nîvdan li Pirtûkxana Qiraliyetê (Kungliqa Bibliotek) şixulîm. Piştre jî ez nêzî salekê li ser navê Yekîtiya Nivîskarêñ Kurd şixulîm û Dewleta Swêdî meaş dida min. Lê mixabin ji ber hin sedemên bêcîh, işê min li wir giha dawiyê. Piştre ez demeke kurt li AMI (Enstituya peydakirina iş) bi xeysetê teknîkerê compitûrê şixulîm. Niha ez di heftiyê de du şevan diçim qursa zimên. Ji 1989-an ve jî, ez endamê Sendika Nivîskarêñ Swêd im.

Ez vêgavê pir kêfxweş û şad im ku heta niha 26 pirtûk bi ked û emeka min ji pirtûkxana Kur-

distanê re bûne mal û ji wan 19 heb jî hatine çapkiran.

Pirtûkên ku min nivîsine ev in:

- 01- **Îşkencede 178 Gün** (178 Rojan Di Îşkencê De), bi zimanê Tirkî, weşanxana Komkar, Köln 1, 1987, rûpel: 240.
- 02- **Xwençe Cild I**, Gotinêñ Pêşîyan, Kilam- Dîlok û Çirok, Weşanxana Çanda Kurdî, Stockholm, 1989, rûpel: 287.
- 03- **Xwençe Cild II**, Kilam, Dîlok û Çirok, Weşanxana Çanda Kurdî, Stockholm, 1990, rûpel: 285.
- 04- **Xwençe Cild III**, Kilam, Meselok û Çirok, Weşanxana Çanda Kurdî, Stockholm, 1991, rûpel: 297.
- 05- **Xwençe Cild IV**, Kilam, Lavija Mesîh, Meselok û Çirok, Stockholm, 1991, rûpel: 262.
- 06- **Xwençe Cild V**, Kilam, Meselok û Çirok, Stockholm, 1991, rûpel: 297.
- 07- **Xwençe Cild VI**, Kilam, Meselok û Çirok, rûpel: 290, bê çap e.
- 08- **Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî**, antolojiya helbestvan û nivîskarêñ bi zaravayê kurmancî û yê dimili, Stockholm, 1991, rûpel: 377.
- 09- **Mîrate**, Leyztkêñ Zarûkan, bê çap e.
- 10- **Çarmix**, Helbestenî Îşkencê, bê çap e.
- 11- **Siyabendû Cexê** destan, bê çap e.

Pirtûkên kilasîk ên ku min ew ji tîpêñ erebî wergerandine tîpêñ latêni ev in:

- 01- **Nûbar**, Ehmedê Xanî, Roja Nû, Stockholm, 1986, rûpel: 75 (Digel teksta wê ya bi tîpêñ erebî).
- 02- **Mewlûda Kurmancî** ya Melê Bateyî, Roja Nû, Stockholm, 1987, rûpel: 63.
- 03- **Dîwan**, Melê Cizîri, Roj Nû, Stockholm, 1987, rûpel: 560 (Digel teksta wê ya bi tîpêñ erebî. Bi alykariya E.O.)
- 04- **Nehc-ul Enam**, Mele Xelîle Sertî,

Weşanxana Kurdistan, Stockholm, 1988, rûpel: 54 (Digel teksta wê ya bi tîpên erebî).

05- **Dîwana Rûhî**, Şêx Evdirehmanê Axtepî, Jîna Nû, Uppsala, 1988, rûpel: 125 (Hinek bi alikariya E.O.)

06- **Mîrsad-ul Etfal**, Şêx Mihemed Kerbela, Ferhenga Kurdi-Farisi, Jîna Nû, 1988, Uppsala, rûpel: 175 (Digel teksta wê ya bi tîpên erebî).

07- **Iqdê Durfam**, Şêx Eskerî, Çirokêñ Kurdi bi helbestkî, Apec-Tryck, Stockholm, 1989, rûpel: 203.

08- **Herdubat**, M.Zahidê Diyarbekrî, Mewlûd,Apec-

Tryck,Stockholm,1989,rûpel:73.

09- **Rêberê Sanî Şerha Eqîdeya Ehmedê Xani**, M.Ehmedê Qoxî, Dengê Yekîtiyê, Germany, 1990,rûpel: 174 (Digel teksta Eqîdê ya bi tîpên erebî).

10- **Sirmehşer**, Feqe Reşîdê Hekarî, Dengê Yekîtiyê, Germany, 1990, rûpel: 112 (Digel teksta wê ya bi tîpên erebî, ya ku Mele Ehmedê Qoxî nivisiye).

11- **Dîwan**, Pertew Begê Hekarî, Weşanxana Rewşen, Bonn 1, 1991, rûpel: 271.

12- **Rewdneîm**, Şêx Evdirehmanê Axtepî, Stockholm, 1991, rûpel: 440.

13- **Dîwan**, Şêx Mihemed Kerbela, ji bo çapê li Jîna Nû ye.

14- **Dîwançê**, Şêx Eskerî, bo çapê li Jîna Nû ye.

15- **Leyl û Mecnûn**, Şêx Mihemed Can, ji çapê re hazir e.

Berî ku ez dawî li nivîsa xwe bînim, ez ê helbesteka xwe ji xwendevanên NÛDEM ê re li jêr binivîsim. Min ev helbest di 1988-an de nivîsibû û pêşkêşî Nexweşxana Xaça Sor kiribûm. Kêfa doktorê Nexweşxanê pir jê re dihat. Dr. Lars Odefors got min, ku emê wergerînin zimanê swêdi.

## PÊŞKÊŞÊ XAÇA SOR

*Her bijî, her bijî, her bijî Xaça Sor  
Perwer i, xweşker i, gulber i Xaça Sor  
Zehmetkêş, zexmankêş, jar û bindest hemî  
Xweş dikî, naki ferq, baş dikî Xaça Sor*

*Kurdeki im, pir dîtim îşkence û lêdan  
Jî destê faşistên xwîn xwîrê Kurdistan  
Bê riş û bê jiyan çaxê ku l' te gîham  
Te-m avêt ber hemêz, xweş kirim nagîhan*

*Îşkence rûres e, lê çikim çêdibe  
Gelé min bindest e, dijmin jî serhişk e  
Herçiyê hate te, te ew kir xweş û şen  
Jînveda, bevz te da, tevî can û dil e*

*Pir sejet, pir nexwek te kîrin dermanxwes  
Hin bi hin rabûn pê, wek berê gula ges  
Ew gîhan hogiran, cih girtin l'nav refan  
Saya te, paya te, cihan dagirt keles*

*Ez olok ne ji te, tu olok ne ji min  
Yê li min kir lêdan, ez û wî olok in!  
Jî ber wî ez revîm, ter kîrim Kurdistan  
Lê te min derman kir, temamî çar sal in*

*Pir spas, şikurdar bo te me Xaça Sor  
Ez xweş im vê dibêm deyndarê Xaça Sor  
Kar dikim, xar dikim bo bindest û jarjan  
Ew giyana te da naçe hûç, Xaça Sor*

*Her bijî, her bijî, her bijî Xaça Sor  
Perwer i, xweşker i, gulber i Xaça Sor  
Zehmetkêş, zexmankêş, jar û bindest hemî  
Xweş dikî, naki ferq, baş dikî Xaça Sor.*

19 12 1988

# ELÎ HERİRÎ

## 1010 - 1078

### Zeynelabidîn ZINAR

**Y**ek ji helbestvan û nivîskarêñ Kurd ên ku bi zara vayêkurmancî nivîsîne, herweha kevntirinê nivîskaran Şêx Elî Herîrî ye. Herîrî di 1010-an de li ji diya xwe re çêbûye. Di 1078-an de jî çûye dilovaniya xwe. Niha gora wî ya pîroz li Herîrê ye û ji gelên Kurd re devereke serdanê ya herî giranbiha û pîroz e.

Em bi vî helbestavanê xwe gelekî serbilind in û pê dipesinin, ku navê wî bûye rewneq ji çanda kurdî re. Herweha gelek kesen zana, pispor û gerokên zanistiyê jî behsa wî kirine û pesnê wî gelek dane, ku Elî Herîrî hêj di despêka Serdasala Yazdehan de bi zimanê xwe yê netewî helbest nivîsîne û şexsiyeta nijada Kurd pê daye eşkerekirin.

Nav û dengê Elî Herîrî li Kurdistanê gelekî belav bûye; li nav xelkê pir siyaneta wî heye û qedr û qîmetê didin wî. Ew bi navê "Şêx Eliyê Herîrê" tê binavkirin. Pir kes hene ku helbest û gotinêñ wî jiber dizanin û hertim di civat û caxiyan de behsa wî dikin. Xasma nele û feqiyêñ Kurd di civatêñ xwe de timî jê zi xweşî dipeyi

vin û gelek pesnê wî didin.

Basili Nikitin di pirtûka xwe ya bi navê "Kürtler" (Çapa Özgürlik Yolu, rûpel 489, bi zimanê tirkî) de nivîsiye ku:

- Folklorâ kurdî ya dewlemend, ci dibe bila bibe divê ku nê jibîrkirin û di cihê xwe de ye jî, ku dîroka vî mileti ya nivîsi gelekî dûr diçe. Çimkî hêj di serê Sedsala Nehan de li Şemdinan Elî Herîrî bi kurdî nivîsiye û Dîwana wî ya destnîvis heta bi roja iro jî maye...

Lê belê sed mixabin jînenîgariya vî helbestvanê hêja jî mîna ya gelek mirovîn wisa yên kevn rind nehatiyê zanîn û di derheq tarîxa jidayikbûn û koçkirina wî de hin tarîxên cihê têne gotin. Îcar em ê ji xwendevanan re hin jêderk ji gotinêñ pispor û kurdologan li jêr binivîsin.

Profesorê gorbîhişt Qanadê Kurdo di "Tarîxa Edebiyata Kurdi-1" de nivîsiye, ku: Elî Herîrî li gundê Herîrê nehiya Şemdinan sincaqa Hekariyêda sala 400'ê Hicrî (1009-1010) ji dayik

bûye û sala 470`ê Hicrî (1078) jî çûye rehmetê.

Profesorê Kurd dîsa gotiye: Aleksandir Jaba di pirtûka xwe ya bi navê "Recueil De Notices Et Recist Kurdes" de nivîsiye, ku: Şairê Kurdan yê pêşin Eli Herîrî bûye û dîwaneke wî ya menşûr a helbestan heye.

Dîsa Profesorê me gotiye: Albert Sosin di berrevoka xwe ya bi navê "Kurdisch Samlungen" (Peterburg, sal 1887, rûpel 275) de, helbesteke Eli Herîrî çap kiriye.

Nivîkarê bi navudengê gorbihişt ê nemir Mihemed Emî Zekî Beg, di pirtûka xwe ya bi navê "Tarîxa Kurdistan" (Komal, 1977, bi zimanê tirkî) de nivîsiye ku: Eli Herîrî di nav salên 1010-1077-an de li gundê Dêr-Herîrê jiyaye. Ew hevdemê eynî sedsala hozanê Îranî yê navdar Firdewsi bûye. Dîwana wî bi hêsanî tê famkirin û bi uslûb hatiye nivîsandin. Helbesten wî nazik, rewan û bi evînî ne.

Kovara "Hêviya Welêt" nivîsiye ku: Eli Herîrî di 1009-an de li gundê Herîrê çêbûye û di 1079-an de jî çûye dilovaniya xwe. Herîr, yek ji gundêne Bedlisê ye. Di dema wî de Merwanî karbdesten dewletê bûne û Diyarbekir ji xwe re kiribûn serekbajar.

Mamoste Cegerxwîn di "Tarîxa Kurdistan-1" de nivîsiye: Despêka Dewleta Merwanî di 374`ê Hicrî (984) de bûye û di 564`an (1169-70) de jî pelîsiye.

Belam ev yek eşkere ye ku girêdana gundê Eli Herîrî bi Bedlisê ve ne rast e.

Nivîkarê hêja Evdilreqîb Ûsiv di pirtûka xwe ya bi navê "Dîwana Kurmancî" de nivîsiye ku: Eli Herîrî di çerxa Dehan (16 Miladî) de jiyaye. Şêx Ehmedê kurê wî di 1048`ê Hicrî de (1638) miriye.

Ev tarîx û behskirina ji Eli Herîrî ku me li jor nivîsîne, piraniya wan nêzîkayî didin hevdu. Lê gotina kek Evdilreqîb hinekî ji wan dûr çerixiye. Wî di layê gotina xwe de çavkaniyeke vekirî jî neaniye zimên.

Di 1985-an de çaxê min dest bi berevkirina destnivîsên kilasîk kiribû, du helbestê Herîrî jî di nav berevokên min de derketin. Lê ew herdu, berê di "Dîwana Kurmancî" de hatibûne weşandin. Ú yek ji wan, hêj berî Dîwana Kurmancî di Tarîxa Edebiyata Kurdi-1 de bi tîpêñ latêni hatibû weşandin. Dema min ev û ew rûqalê hevdu kirin, di navbera wan de newek-hevî gelek hebû.

Bêguman ci dema ku asîmanê Kurdistanê sayî dibe, eger ewrêñ zîpikê ji ser serên Kurdan bifirrikin, ger çiyayêñ qesemê jî bîhelin û Kurd bi awane zanistû dest bi lêkolîn û gerîneyêñ bi rîkupêk bikin, ewçax dê jînenîgariya van bapîrêñ emekdar rind zelal bibe û serpêhatiyêñ wan ji çavêñ raya giştî ya cîhanê re pêşkêş bibin.

Mixabin heta niha çu fersend û mecal nehatine dayin, ku Kurd karibin li xwe xwedî derkevin. Eger bi imkanêñ xwe yên kêm û kas ci serkeftin kiribin jî hemûyan bi dilxwazî, bi fedakarî kirine û li xwe xwedî derketine. Lê me

umîdeke pir heye, wek vê mesela ku dibêjin  
"Devî zû dîbin dar, xwelî li merivê bêwar" ku  
warê me şêntir bibe û deviyên me ji pir zû  
bibin daristanêñ gulistanan. Ewçax dê her tiş  
bihêsanî têkeve ser raya xwe û xwençeyên  
qeşemgirtî di demeke pir kin de bipişkifin.

Belam ji van helbestêñ klasik, dewlemendiya  
zimanê kurdi di şopa xwe ya sererast de rind  
eskere dibe. Bêweku berî niha bi 900 salan Eli  
Herîri helbest nivisine, herweki xeberdana niha  
mirov têdigehe. Eger ne ji hin peyvikên erebî  
yan farisi bin, ferqekê wisa zêde di navbera axa-  
fita niha û ya wê demê de tune. Ev xasmetiya  
han, di zimanêñ kêm netewyan de heye.

Em ê li jêr bo xwendevanan helbesteke Eli  
Herîri binivisin:

## IŞ Q A B E R İ\*

Dîsa ji nû işqa berî  
Pur enderûnim ates e (1)  
Zulfa muzeyen enberî  
De'wa digelxala reş e

Xala li dêmê dil reva  
Sed rûh û carim bin feda  
Sotim gelo çûm tê nema  
Terkim kîrin eql û heş e

Eql û hisim bûne esîr  
Dinya ku geh-geh tête bîr  
Dêm subhetê bedra munîr  
Zulfa ji werdê bînxwes e

Werda ji nêv zulfan derîn  
Şula bineffê té werîn  
Bala û qeda 'er'erîn  
Her ban li ser marê reş e

Dîsanê hey têt û diciçit  
Ihyayê emwatan dîbit (2)  
Wechan mudam nûr jê diciçit  
Dêm subhetê şem'a ges e

Şem'a şebistanan ew e  
Werda gulistanan ew e  
Sira di bostanan ew e  
Şoxa Herîri dilges e

Ecêb lettifû cindî ye  
Eznan nizane, Romî ye  
Ageh ji işqbazan niye  
Mest û xumar û serxwes e

Serxwesê cama şerbetê  
Dêm subhê şem'a zulmetê  
Horya di baxê cennetê  
Serdarê çendîn mehwes e

Mehwes ku westan sef bi sef  
Ew hate der Misri di kef (3)  
Wan go "Eliyo, la texef" (4)  
Me b'murdinê qewî xwes e. (5)

\* Berî. Di kilasikan de piranî bi mana qenc, piroz, gi-  
randiba té bikaranîn.

1- Enderûn: hinav

2- Ihyayê emwatan: giyankirina miriyan

3- Misri: navê cüreyek şûr e.

4- "Eliyo, la texef": Eliyo metirse.

5- Murdin: mirin

# TU ÇÛYÎ, ÇÛYÎ

**Fêrîkê ÜSIV**

Ezê-çevê te îdî neyêm sêrê,  
Neçim xewn-xêrê  
Wê cinet-êrê...  
Tu çûyî, çûyî...

Ezê maç nekim îdî porê te,  
Herdu tetkê te  
Nevim sîngê xwe,  
Tu çûyî, çûyî...

Bi gustîlka te ezê nelîzim,  
Ezê nebhîzim  
Dengê lêzim,  
Tu çûyî, çûyî...

Tu çûyî, hema  
Ser zarê min ma  
Navê te biha  
Nolanî dua,  
Tu çûyî, çûyî...

# ÇIROKA JIYANA MIN

## Firat CEWERÎ

Ez di sala 1959'an de an jî di sala 1960'ı de, li gundekî Dêrika çiyayê Mazî, li berrîya Mêrdinê hatime dinyayê. Di sê-çar saliya min de, bavê min bi malbata xwe ya mezin re mal bar kire Wêranşar. Em zêde li Wêranşar neman, lê ew salên li Wêranşarê weke xewnekê têن bîra min. Xuyabû jiyana Wêranşar bi malbatê hêsan nehatibû, bi firsenda reformeke erdan ya pişti salên 1960'ı em dîsan berepaş vegeriyabûn gund û li gund perçak erd para me ji ketibû. Ew erdê neavî û bi kevir di gel kêfxweşiyê zehmetiyek ji dabû me. Em hûr û gir ji rohilat heta roava di nava erd de dixebeitûn û me bi teskeran kevirên di nava erd de li ser qûç û şikêran kom dikirin. Bi xwedîerdbûnê em dilşa bûn, hêviya me ya pêşerojê xurt bû, tevdîra me baş bû...

Di gundê me yê bê av û dar û ber de, axa tunebû. Hemû gundi bira û pismamê hev û herkes axayê mala xwe bûn. Di warê aborî de jî çend malbat ne tê de, hema hema hemû gundi nola hev bûn. Gorî ku mezin behs dîkin, demekê rewşa malbata me ya aborî baş bûye, lê rojekê sofiyek li malbatê dibe mîvan; gava sibehê zû endamên malê radîbin, dîbinin ku deriyê êxur li ser pişte ye û sofiyê nenas hemû dewarên di êxur de bi xwe re birine û

çûye. Ji ber vê yeka ha diya min a dilovan gelekî li ber dikevc, zaroka wê ji ber diçe û ew ji kerban dikeve nava nivinan.

Li gund min û birayê xwe yê mezin bi hev re dest bi dibistanê kir. Me jî mîna hemû zarokên gund bi tirkî dest pêkiribû. Di gel ku em bi mîjiyê xwe yê terr û teze tavilê hîni zimanê tirkî bûbûn û gelekî kêfa me ji dibistanê re hatibû jî, disan bi a min di hin cihan de kîmasîne hebûn. Her ku ez mezin bûm min ew kîmasiyê ha bêtir fêhm kirin. Politika dewleta Tirk ya asîmlasyonê wê demê ecêb xurt bû. Dewletê bi zilm û zor û stema xwe gelê kurd bêhawê çavtîsandî kiribû. Di dibistanê de ji bo her gotineke kurdî me cezayê peran dida. Heta car caran em newêribûn li malê ji bi hev re bi kurdî bipeyi-viyanâ. Pirrê caran li gund ji devê hin zarakan dihate bihîstîn ku ew tirk in. Perwerdiya ku me ji mamostê xwe yê tirk stendibû, kiribû ku em gelekî kêfa xwe ji Mustafa Kemal Atatürk re bînin. Tê bîra min ku me zarakan di 23'ê nîsanê de helbestên li ser Atatürk li hewşa dibistanê bi deng dixwendin. Stiranên ku mezinan jî davêtin ser Atatürk hê di bîra min de ne. Yek ji wan wilo bû:

*Kemal bavê me tê,, Kemalo  
Reisê Cumhûriyetê, Kemalo...*

Rojek ji rojên Biharê ya herî xwes, sibe-hekê zû, hê berî rohilat eskeran ji nişkê ve girtibûn ser gundê me û her eskerek çûbûn ser xaniyekî. Cemseyên eskeran ji bi dengên bilind û bi sureteke xurt di nava gund de geriyabûn û tirseke psîkolojik di nava gund de belav kiribûn. Pişî ku ro hebekî bilind bûbû, me ji lawikekî cîranê me bihîstibû, ku eskeran hemû zilamên gund li meydana gund dane hev û bi dar û qamçîyan li wan dixin. Ka bê çawa bûbû, wan li deriyê me nexistibûn û bavê min nebribûn. Bavê min yê dîndar û di halê xwe de, hema rahiştibû qurana xwe, xwe avêtibû bextê wê û bi duan ketibû. Em zarok jî ji tîrsa diricîfîn û me çîrok fêhm nekiribû. Pişî kur-jedemekê eskeran bi pehînan deriyê me jî vekiribûn, weke kuliyan li hundur belav bûbûn, kulîna me ji jor de anîbûn xwarê, kîsên genim yên ku spartî dîwêr bûn çîrandibûn, sindoqa diya min ya neqîsandî, ya bûkaniya wê şikandibûn; gava tiştên ku ew lê digeriyan nedîtibûn, bi milên bavê min girtibûn, ew bi dû xwe de kişişandibûn û ew jî biribûn nava peyayên gund yên ku li meydana gund hatîbûne civandin. Gava me dîtibû ku ew zêde guh nadin zarokan, tenê bi dengên xwe wan ditîrsînin, ez jî pişî bavê xwe ji mal derketibûm, çûbûme maleke nas ya nêzîkî dibistanê û me zarok û pîrekan di pencerê re li wê koma zilam û eskeran nihêribûn. Esker bi hêrs bi wan re dipeyivîn, carê yek ji nava rêza zilaman derdixistin, sê-çar heb lê diciviyan û heyâku ew ji ser hişê wî dibirin lê dixistin. Carna jê wan dudu ji nav rêzê derdixistin, dar dixistin destê yekî, li ser wî disekinîn û dixwestin ku ew bi wî darî li gundiyan xwe xe. Ji gundiyyê

jî wêdetir li bavê xwe xe, li birayê xwe xe. Gava mîrikê dar di dest de protesto bikira, esker lê diciviyan û heta ku ew ji ser hişê wî dibirin lê dixistin. Me zarokan, ku me hê bi kûraniya mirinê nizanîbû, ji me webû ku ew dimirin. Gava wan apê Hecî jî ji nava rêza gundiyan derxistibûn, bi riha wî ya dirêj girtibûn û ew avêtibûn erdê, ez ecêbmayî mabûm. Apê Hecî li gund pirr bi qîmet bû. Biçûk û mezinan xatirê wî digirtin. Gava ew danê êvaran diçû ber siya dîwêr, hemû kes ji ber wî radibûn, ên cigare jê re dipêcan û davêtin ber wî û yên ku kîsê xwe yê tütinê keremî wî dikirin. Lê qey eskeran nizanîbûn ku ew ewqasî di nava gundiyan de bi qîmet û xwedî xatir e. Heta eskerekî ji wan kirasê wî kişişandibû serê wî û derpiyê wî yê spî jê şeqitandibû. Hingî lawîkê hevalê min keniyabû, lê pîreka malê tepek di nava pişta wî de lêxistibû. Dawî, berî ku ew ji gund derkevin jî, wan muxtarê gund şîlfî tazî kiribûn, keç û jinê gund bi zorê ji hunduran derxistibûn der û muxtar wilo tazî di nava gund de gerandibûn.

Ez, zarokekî heyş salî li hember vê zilma han ecêbmayî mabûm. Ez çiqas fikiribûm min tu sedem ji wê zilma wan re nedîtibû. Lê kîn, nefret û girrekî ecêb di dilê min de çê bûbû. Dilê min ji ber van hê jî diperpite.

Gava min sedema wê yekê ji mamoşteyê xwe pîrsibû, di gel ku wî gelekî ji min hez dikir, dîsan ji erza min şikandibû. Ji ber şikandina erza xwe ez gelekî li ber xwe ketibûm, rûyê min sor bûbû, min bi dizika serê xwe danîbû ser masê û ez bi îskîn giriyabûm.

Min gelekî guhêñ xwe didan dibistanê.

Loma jî ez di dersên xwe de gelekî jîr û bi serketî bûm. Jîrîtiya min di dersên min yên dînî, li ba melê jî navdar bû. Gorî mezinênu ku behs dikin, min gelek caran dersên suxtên pêşîya xwe jî dida. Lî jîrîtiya min ya li ba melê bi pirranî ji bo anîna kîfa bavê min bû. Bi serketina min ya di dersên dînî de bavê min dilşa dikir. Yê min jî ji bo ku ez bikaribim dibistana xwe bidomînim, min xwe bi jîrbûna xwe dixiste çavên bavê xwe. Pir neajotibû ku min quran xitim kiribû û mewlûda Melayê Batêyî ya bi kurdfî, ya ku hê jî ez pirraniya wê ji ber dizanim, min wê çaxê ji ber kiribû.

*Hemdê bê hed bo Xwedayê alemîn  
Ew Xwedayê daye me dînê mubîn*

*Em kirine ummeta xeyrulbeger  
Tabiê wî muqtedayê namiuwer*

Di salêne heftêyi (1970) de me ji gund bar-kire Nisêbînê. Nisêbînê wê çaxê bi min pirr xweş hatibû. Hebûna tirênenê, nêzîkbûna Qamîşlokê, herikîna çemekî mezin di nava bajêr de, darêni li sîfîka wê çikandî em tavilê bi xwe ve girê dabû û ew roj ev roj e malbata min li vî bajarê xweş, delal û bijîn rûdinê. Min xwendina xwe ya ku nêvcî mabû li Nisêbînê dom kir. Di ber xwendina xwe re jî geh ez li çayxana bavê xwe dixebeitîm, geh jî min li firnan nanopêjî dikir. Min sinifa pêncan bi serfirazî li Nisêbînê qedand. Ez êdî bûbûm xortik, min porê xwe şeh dikir û çavên xwe li keçikan digerandin.

Nisêbînê, ew bajarê biçûk û delal roj bi roj mezin dibû. Bi mezinbûna xwe re jî problemen wê zêdetir dibûn. Berberiya di navbera Nisêbînî û gundiyan de roj bi roj serî hildida.

Vê yeka han çend salêne baş ajotin. Di sala 74'an de ez ji bo kar çûme bajarêne mina Manîsayê, Izmirê û Kuşadasiyê. Tişte ecêb, nêrîna kurdayedî û welatêzî li wan bajaran bi min re çêbû. Ji dil çûyina xortêne kurdan ya şerê Qibrisez gelekî diêşandim. Tê bîra min, gava xortekî Diyarbekirî ev stirana ku wê demê ji devêne nasyonalistên tîrkan dernediket,

*Allah Allah deyip geliyor Türkler  
Çekil Kibrîs bizim ey kahpe Yunan*

Gotibû, ji bo ku ez şûsa di destê xwe de li serê wî nexim min bi zorê xwe girtibû.

Piştî şikandinêne serîhîdanêne Kurdistanê bêdengiyekî li welatê me dest pê kiribû. Ji kuştin, bi dar de kîrin, işkence û girtinê gelê kurd çavtîrsayıb bûbû, li ber pêla asîmîlasiyonê ya polîtîkaya Tirkîyê ketibû û diçû. Herçiqas di navbera van salan de ronakbîrêne kurd li bajarêne mezin yên Tirkîyê dest bi xebatên siyasi û intelektuelî kiribûn jî, dişan ji bo hemêzkirina zirecêba gelê kurd têr nekiribû. Zulum pirr bû, xelk razayîbû, ronakbîrêne kurd bêçare bûn.

Ew xebat û keftelefata wê kulma ronakbîrêne kurd hêdî hêdî reh û şaxêne xwe berdida Kurdistanê, keç û xortêne nûgihişti hemêz dikir; li dibistanan, li nav erdan, li çayxanan, li kuçan, li dawet û dîlanan êdî pîrsa gelê kurd û welatêne wan Kurdistan bi her awaye xwe ve dihate munâqeşe kîrin.

Bi zixtikêne vê pêla hisyarbûnê ez jî hisyar bûbûm; li dijî neheqî, zulmê û stemkariyê bi ciwanî û dinamîkbûna xwe, ez bi şev û roj dixebeitîm. Gorî pêwîstiyêne wê demê ez ji felsefeya idealist bi dûr ketibûm, min ji xwe re felsefeya materyalist hilbijartibû.

Di sala 77'an de pirtûkeke helbestan ya reh-

metiyê Cegerxwîn ketibû destê min. Wê pirtûkê dilê min şâ kiribû, hêvî dabû min, zimanê min bi min şérîn kiribû. Ew pirtûka Cegerxwîn bû sedema nivîsandina min ya bi kurdî. Di eynî salê de min dest bi nivîsandina helbestên kurdî kir. Min xwe li helbesta nûjen rakişand. Gava li dawetekê kurdî, li hemberî bi sedan kes min helbestên xwe xwendibûn, dengê çepikên guhdaran di dilê min de pêl dabûn.

Li welêt tevger xurt dibû. Ew pirsa ku tenê ya xortan (teleban) xuya dikir, êdî bûbû ya geleki. Di gel vê yekê zulm jî pîr bûbû. Min ew zulma ha bi nivîseke tirkî, li ser navê komeleya xwe di sala 1979'an de da rojnameyekê. Ji wê bendê pê ve min êdî hew bi tirkî nivîsand. Min bi hemû hêza xwe zor dabû nivîsandina kurdî. çiroka Malbata Evdo ku ji 134 rûpelan pêk hatiye û bi kêşan e, min hê wê demê nivîsandibû. Ev pirtûka min ya ku ne çapkırı ye, da sala 1981'ê de, li bajarê Uppsalayê kek Reşo Zilan ji kurdiya wê re geleki bûbû alîkar.

Bêî ku ez diploma xwe ya lîseyê bistûnim, ez di sala 1980'ê de sîbeheke gulanê ya xweş, bi çenteyekî biçûk û bi sernavê 25 helbestên xwe yên di bin pizya derpiyê min de veşartî, min xatir ji endamê malê xwest, ew di nav şin û giri de hiştin û bi stûxwarî derbasî Sûriyê bûm. Ez demeke kurt li wir mam. Paşê ji wir ez bi hevalekî xwe re çûme Almanyayê. Li Almanya jî ez nêzîkî du mehan mam. Dawî dawî min xwe avête vî welatê sar, yê ku ji salekê carekê roj lê naçe ava, Swêdê.

Ez her ku ji welatê xwe bi dûr ketime, welatê min ewçend bi min şérîn bûye, ez ewçend pê ve hatime girêdan. Heta niha ez li nêzîkî bîst welatan geriyame, lê tu welatan jî

weke welatê min cihê xwe di dilê min de çênekiriye. Ax û ava welatê min, hewa welatê min bi min xweş e. Mirovên welatê min bi min şérîn in. Loma jî ez ê vî emrê xwe yê ku maye jî ji bo bidestxistina vê xweşiyê bibuhurînim.

Ev panzdeh salê min in ez têgihîştime, ku welatekî bê ziman ne tu welat, gelekî bê nivîs, bê kovar, bê rojname û pirtûk gelekî ji medeniyetê bêpar e. Gelê kurd, ku xwediyê gelek medeniyetên kevnar e, iro jê bêpar e. Min riya rohnîkirina civata kurdan ji xwe re hilbijartiye. Ji bo vejandina zimanê kurdî, lêkolîna çanda kurdî, pêkanîna edebiyateke kurdî a nûjen ev panzdeh sal in ez bi îmagnê xwe yên bi sînor li ber xwe didim. Min heyâ niha quruşek ji nivîskariya xwe bi dest nexistiye, lê ez gelek caran ji ber nivîskariya xwe di bin deynê mezin de mame. Ji bili hin kesan, ez bawerim pirraniya nivîskarê kurd nola min in. Di gel pîr zehmetiyan ew bê rawestan dinivîsinin. NÜDEM ya ku me firsenda danasına xwe tê de dîtiye, berê xebata van nivîskaran e. Ked û xwêdana me ye. Em bi vê ked û xwêdanê dixwazin tovê jiyanke xweş li axa welatê xwe ya bi ber bireşînin.

Heya niha di gel pîr zehmetiyan pênc pirtûkên min derketine. Ya pêşî di sala 1980'ê de, ya dawî jî di sala 1992'an de derket. Ji vana sisê helbest, dudu jî kurteçirok in. Wekî din min di gelek kovar û rojnameyên kurdî û swêdî de nivîsandiye û ez niha endamê Yekîtiya Nivîskarê Swêdê me. Xwendina min ya lîsê ya ku li welêt nêvcî mabû, min li Swêdê xelas kir û ji bili wê jî min psîkoloji û pedagoji xwendiye. Min karê wergevaniya sê zimanan, mamostetiya dibistana destpêk ya Swêdê, mamostetiya kurdî ya zarokên kurdan û dikandarî kiriye.

# SWÊD, ALFRED NOBEL Û XELATA WÎ

## Firat CEWERÎ

**S**wêd welitekî biçûk, lê di dinyayê de xwediye roleke mezin, ji welatê me bi hezaran kilometre dûr, di dilê Skandinavyayê de ye. Swêdiyên ku îro bi mulahîmbûn û bêdengiya xwe di dinyayê de navdar in, neviyên Vikingên hov in. Bapîrên swêdiyên îro Vikingan, jiyana xwe bi şer û pevçûn, talan û wêrankirinê ve derbas dikirin. Wan bi keştiyên xwe yên zexim derya û girav derbas dikirin û cihêن ku ew digihîştinê bi talankirinê ji bo demêن derbasî lê bi cih dibûn. Bermayên van Vikingan demekê li Ewrûpayê jî hukum dikirin û hemû welatên bicûk yên Skandinavyayê di bin destêن xwe de hiştin. Hêdî hêdî welatên bindestêن wê gihîştin azadî û serbixwebûna xwe û welatê ku dawî bi riyekê aşti ji Swêdê vejetiya, Norvecê bû. Di sala 1905'an de bêî ku dilopek xwîn birije, bi raya giştî ya gelên herdu welatan, Norvecê gihîştazadî û serbixwebûna xwe. Norvec welitekî biçûk, xwediye nifûseke çar milyon e û di tixûbê Swêdê de ye. Gava di sala 1980'ê de ez hatibûm Swêdê û min bihîstibû ku di navbera tixûbê Swêd û Norvecê de têl û mayin tune ne, ez ecêbmayî nabûm. Niha jî ez ecêbmayî dimînim ku serxet û binxet bi têl û mayinan ji hev hatine vejetandin, meriv û malbat ji hev hatine sidûrxistin û di nava wan têl û mayinan de bênejmar mirovên bê sûc ji jiyânê hatine bîrrîn.

Erê, Swêd û Norvec bi dostanî ji hev veqe-

tiyan, îro jî ew dost û cîranêñ hev yên herî nêzîk in. Wan ji berdêla rijandina xwînê, wêrankirina gund û bajaran, şewitandina mal û daristanan; riya aşti û jiyânê ji xwe re hilbijartîn. Niha jî ew weke du welatên cîran di xweşiyê de, hevwelatiyên wan jî di geşiyê de dijîn.

Ev welatê ku nifûsa wê heyş milyon e û ji van heyş milyonan milyonek jê biyanî ne, ku mirov bûyera sala 1905'an a vejetandina Norvecê bide ber çavan, mirov dê bibîne ku ev welat di warê demokrasiyê de bi kêmanî 90 salan di pêşîya Tirkîyê û welatên cîranêñ Tirkîyê yên ku îro serdestiya kurdan dikin, de ye. Herweha ew di warê civakî de jî ewçend li pêş e. Herçiqas sistema Swêdê sistemekê monarşik be jî, lê di dema nêzîk de welat ji aliyê sosyal demokratian ve hatiye idarekirin. Bi gotina "monarşî" hûn nexapin. Ev ne dişibe monarşiya Tsar, ne jî dişibe ya Şah... Li gorî qanûnêñ Swêdê mafê qirêl û mijûliya polîfikayê bi sînor e. Ew tenê weke sembolekê heye. Car caran mirov dibêje qey mafê hevwelatiyekî normal di warê gotina polîfikayê de ji yê qirêl bêtir e. Qiralê Swêdê ne qiralekî zulmdar e, lê disan jî ew qiral e. Xatûna Swêdê ku bi xwe jî ne swêdî ye, ji aliyê gelê Swêd ve gelekî tê hezkirin û hebandin û pîrre caran ew weke dayika nasyonê tête pêşkêşirin. Li vî welatê bi qiral û bi xatûn, wek me li jor jî got,

bi salêñ dirêj ji aliyê sosyal demokratan ve tête idarekirin. Tenê carinan di nav re cihê xwe ji kualisyona partiyêñ rast re dihêle, lê demeke dirêj tê re naçe, dîsan sosyal demokrat bi riya hilbijartinêñ demokratik karînê bi paş de distîne.

Sistema ku îro li Swêdê heye, pîrrê caran ew bi navê "Modela Swêd" an ji "Sosyalîzma Swêd" tê bi nav kirin û gelek welatan xwestîne vê modela ha li welatêñ xwe bi cih bikin, standarta jiyana hevvelatiyêñ xwe bilind bikin, azadiya şexs û ramanê lê bi cih bikin.

Pişî hilweşandina sistema Sovyet û sosyalizma reel, heyetek ji Sovyet û kevnîewelatêñ Sosyalist ji bo ku vê modela ha li cihê cih tahlîl bikin û berên van civatêñ bermayêñ şoreşa cotmehê bidin vê modelê, ew hatibûne Swêd. Lê ji aliyê din ve ji, di destûra Partiya Komunisten çep (VPK) de Swêdê weke welatêñ emperyalist i biçûk û birçî dihate nasandin.

Ev Swêda ku wê ji îro para xwe ji krîza ekonomîk stendiye, berî şerê cîhanê yê duwemîn geleki perişan, belengaz û feqîr bû. Carinan gava ku mirov rewşa Swêd ya wê demê, di derheqa jiyana wan salan de ji devê kal û pîran dibihîze, dilê mirov bi wê rewşa wan dişewite.

Bayekî wilo yê belengaziyê hebû, ku bi sedhezaran Swêdî mecbûr man ku welatê xwe terk bikin û li kujê cîhanê yê din ji xwe re li starekê bigerin û pariyek nanê bi rehetî bixwin. Bi deh hezar û sedhezaran swêdiyan mal û erd û hebûnêñ xwe bi buhayekî mirî fîrotin axa û keşîşen çavvekirî û bi zar û zêçen xwe ve ketin riya dûr; riya çûyin û nehatinê, ya welatê ku di xewnerojka wan de, Emerîkayê. Hin li wir şerpeze bûn, bê kar man, li kuçan raketin û hin ji bi ser ketin. Ew

nifşê ha îro li Emerîka bi navê "Swêdî Emerîkî" tê binavkirin.

Ew çûn. Cihûyêñ di nava wan de ji ji xwe re xelas bûn. Dengê teperepa lingêñ sosyalîstên nasyonal hêdi hêdi li Ewrûpayê olan dida. Cihû, cengene, qehpîk, homoseksuel, komünîst, sosyalîst, mirovîn bi uzur bê pirs dihatin kuştin, hayûhûyek bi nava mirovan ketibû, Cihûyan vir de û wir de sînor gav dikirin û ji xwe re li starekê digeriyan. Her ku çû şer mezin bû û hê berî ku birîna şerê cîhanê yê yekemîn bikewe, şerê duwemîn dest pê kir. Swêda ku niha ji neutral e, di neutralbûna xwe ya şerê cîhanê yê duwemîn de ji bi politîkaya xwe ya durû, gava ku dinya li nav guhê hev ketibû, wêran dibû, wê alavêñ şer difirote Almanya û bi wê yekê ew ji şer û ji kirîza dînyayê destkewtî dibû û pê ekonomiya xwe baş û bilind dikir. Wê ekonomiya baş pişti şer ji dom kir. Swêda ku berê ekonomiya wê şerpeze bû, swêdiyêñ ku berê hewcedar û belengaz bûn, pişti rawestandina şerê cîhanê yê duwemîn, gava ku dinya bi "jinûveavakirê" ve mijûl bû, ew êdi xwedî ekonomiyeke baş û pêşerojeke rohnî bû. Ew pereyên ku wan di dema pêvajoya şer de bi dest xistibûn, ne hewce bû ku wan pê gund û bajarêñ xwe ji nû ve ava bikirana, avahîyen xwe ji nû ve lê bikirana, ji bo saxkirina nexweş û birîndarêñ xwe bi milyonan pere xerc bikirana. Ji ber vê yekê bû ku wê pişti kurtedemekê li pêşîya gelek welatêñ Ewrûpayî xist. Standarta jiyanê li Swêdê bilind bû, xaniyêñ wê xweş, imkanîn wê pîrr bûn. Vê hebûn, xweşî û rehetiyê bi xwe re serbestî û azadî ji anî. Azadiya fîkî, azadiya îndivid, azadiya hilbijartînê, azadiya weşanê û çapemaniyê li vî welatî bê sînor bû. Hemû

hewcedariyêن bingehîn yên ji bo pêwîstiya mirovan li vî welatî pêk hat. Bêkarî nema, lê kar pirr bû. Endustrî bi pêş ket. Ji bo bersiv-dayina pêşketina endustriyê di salên 70'ê de Swêd deriyê xwe ji karkerêن biyanî mîna girêkiyan, tîrkan, yugoslaviyan û hwd. re vekir. Ew karê ku hevwelatiyên swêdî li xwe danetanîn ku bikin, biyanîyêن ku ji der ve hatibûn bi kêfxwesi û dilşahî dikirin. Bi vî awayî Swêdê hebekî ji izolebûna xwe jî rizgar dibû û xwe hêdî hêdî ji gel û miletên din yê cîhanê re vedikir. Nemaze piştî bûyerên polîfik yên dinyayê, Swêdê hê bêtir di warê humanîzm û comerdiya xwe ya li hember biyanî û kesên bindest hate nas kirin. Li Şili hatina Pînoçet ya li ser hukum, li Îranê hatina Xumeynî, li Tirkîyê di bîn serokatiya Kenan Evren de hatina Cûntayê, li Etopya problemên Erîtrîya, li Guatemala, Elsalvador û welatên din yên Emerika Latînî hatinêñ diktatoran, bû sedema ku siyasetvan, têkoşer û demokratên wan welatan ji ber zilm û zora karbidesten welatên xwe bazdin û werin xwe bavêjin vê Swêda biçûk. Swêdê jî heta ku jê hat hemêza xwe vekir, ji van kesên ku ji ber zilm û zorê, tade û işkencê reviyabûn, ew bi mîvanperweriyeke dilsoz qebûl kirin.

Kurd jî yek ji van gelên cîhanê bû ku di ser gelek welatan re, bi gelek zehmetî û dijwariyan xwe gihadine Swêd. Ger em ji dîroka 1980 dûrtîr neçin, piştî 1980 bi hatina cûntayê re, gelek kurdêñ ku neketin xefka 12'ê ûlonê, ji ber kuştin, işkence û idaman bazdan; wan jî xwe li vî welatî girtin, ew jî bûn mîvanen vî welatê biçûk û sar.

Nifûsa kurdêñ li Swêdê iro di ser deh hezaran re ye. Li gorî statîstîkên ku di nava grûbêñ biyanîyan de çê dibin, grûba kurd

grûba herî aktîv û bi ber e. Bi dehan komeleyen wan hene, radyoyen wan yên herêmî hene, pirtûk, rojname û kovaran derdixin, grûbêñ wan yên folklorê, tiyatroyê û fûtbolê hene. Bi dehan nivîskar û bi sedan jî xwendevanen kurd li vir gihan. Ew zû hînî swêdî bûn û gelek ji wan zû adepteyî civata swêdiyan bû. Pirr kesan ev welatê ku ewçend ji welatê me dûr, bi nas û dosten xwe, gundî û bajariyêن xwe dane naskirin. Ew Swêda ku berî niha bi panzdeh bîst salan pirr kesan navê wê nebihîstibû, niha ew ji her kesî re nas e. Niha haya wan ji av û hewa Swêdê, demsalen wê, qanûnen wê hene. Tê bîra min, berî bi dîroka vê nivîsarê bi deh salan cîranekî min ji welêt ji min re nameyek şandibû û wî di nameya xwe de dabû xuya kirin, ku ew û hevalekî xwe li ser iklîm û av û hewa Swêdê ketibûn qirika hev, yekî gotibû li Swêdê her şev e; yê din jî gotibû na, li Swêdê her roj e. Herdu hevalan li ser vê yekê bi şerd listibûn û bi ya kê derketa ew ê jî yê din re diyariyek bi qîmet bikiriya.

Ne tam xebera wan be jî, şev û rojêñ Swêdê li gorî şev û rojêñ welatê me geleki cihê ne. Zivistanen Swêdê bêhawen dirêj, sar û tarî ne. Ji çend saetên ronahîyê pêve, zivistanan li Swêd her tarî ye, her şev e. Lê havînen wê yên kurt û xweş, berevajîya zivistanen wê, ji çend saetan pê ve, her roj û rohnkayı ye. Li jora Swêdê, nîvê havînê, rojekê roj naçe ava. Dîtina vê yeka ha bûyerek e.

Di gel qanûnen entresan yên xwezayê, li vî welatî hin qanûnen din hene, ku ji bo hevwelatiyêñ me yên li welêt gelekî balkêş in.

Di sala 1987'an gava ez seriyekeji Swêdê

çûbûme Sûriyê û li Qamîşlokê li kurdan bûbûme mîvan, di civatekê de peyayekî navsal ku ji xwendinê hez dikir, ji min pîrsî bû:

- Gelo rast e, ku li Swêdê diz têkevin mala mirov û bişemitin, lingê xwe bişikinin, heqê mesrefa wan ya nexwesxanê li ser mirov e?

Gava min gotibû erê û min hebekî bi firehî behsa hin qanûnên Swêdê kiribû, civat şas û ecêbmayî mabû û hin kes ji kenan li ser piştê li erdê ketibûn.

Dîsan li Qamîşlokê gava min li restorante ke biçûk xwarin xwaribû, çavên min li dîwêr li posterekî ABBA yê mezin ketibûn. Paşê ku min posterekî EUROPE li ba pirtûkfiroşekî dîtibû ez zêde ecêbmayî nemabûm.

Swêd weke rûyê xwe yê humanîstî (Mixabîn di vê dema dawî de ew di derheqa kurdan de kerr e) di warê teknîk û kulturê de jî bûye navekî navneteweyî. Volvo, Saab, Sas, Elektro Lux yên Swêd in. August Strindberg, Selma Lagerlîlf, Artur Lundqvist, Astrid Lindgren, Ingmar Bergman, Ingrid Bergman, Greta Garbo, Roxet swêdî ne. Björn Borg ji Swêd e...

Di gel van hemûyan jî, dîsan navê ku ji salê carekê Swêd bi bîra dinyayê ve tîne, çapemaniya dinyayê meşgûl dike, navê Alfred Nobel e.

## ALFRED NOBEL

Alfred Nobel di 21'ê cotmehê 1833'an de li serbajarê Swêdê, Stockholmê ji malbateke teknîkhez û teknîkzan hatiye dinyayê. Malbata

wî Nobelius hê di salê 1600'ı de navdar û xwedî gelek keşif (dîtin, servebûn) bûn. Bavê Alfred, Immanuel Nobel bi xwe ji gelek keşif kirine; ew peyayekî zana, bêhñfîreñ û yê endustriyê bû. Her çiqas ew Swêdî û ji herêma Kristianstadê bû jî, dîsa wî wek peyayekî endustriyê gelek salê xwe li Petersburgê buhurandine. Mayinê binavê yên ku ji aliyê Immanuel de hatibû dîtin di şerê Krimê de hatin bikaranîn û wan wê demê bala gelek welatan dikişandin. Gelek welatê din yên di şer de, dixwestin ku van mayinê binavê ji xwe re bi dest bixin û pê bi hêsanî zora dijminê xwe bibin. Immanul Nobel tenê bi dîtina mayinê binavê nehate ser, wî paşê bê hejmar dîtinê din jî kirin.

Ji vî bavê xwedî zanebûneke kûr ji bilî Alfred sê lawêñ wî yên din jî; Robert, Ludvig û Emil çêbûne.

Gelek caran zarok li dê û bavê xwe nayêñ, li hember wan serî hildidin, dibin berevajiyêñ dê û bavêñ xwe. Lê herçar zarokêñ Immanul wilo nebûn, wan dane ser şopa bavê xwe û mîna ku tiştêñ li vê dinya me ku heye têr nakin, wan jî wek bavê xwe dest bi dîtina tiştêñ nû kirin. Dîtinêñ vê malbata ha ya xwedî paşerojeke rohnî, nizanim çîma, lê her aletêñ şer bûn. Bi dîtina van, dema şûr û mertalan li paş dima, merdî û mîrxasî dimir, demeke jîñî û zirektiyê dest pê dikir.

Weke ku me li jor jî got, ku Alfred Nobel li Stockholmê hatiye dinyayê, lê wî bi salêñ xwe yên gelek biçûk koçî Sankt Petersburgê kir û pirraniya emrê xwe; zarokî û xortaniya xwe li wî bajarê dîrokî û xwedî kultureke kûr jiya. Hem di dema zaroktiya xwe de, hem jî di



Alfred Nobel (1801-1872)

dema xortaniya xwe de wî qîma xwe bi jiyana rojane û basît nedianî, wî dixwest hertim li der û dora wî tiştin biqewimin, tiştin nû derkevin, civat bête guhertin. Loma jî ew geleki digeriya û her welatê ku ew diçûyê ew hînî tiştên nû dibû. Ew hînbûna tiştên nû ji bo keşifên nû ji wî re dibûn weke çirayê. Di nav gerrêن xwe yên welatên cihê cihê de, ew salekê ji bo xwendina Kîmyayê li Parîsê ji ma. Ew xwendina wî ya Parîsê ji bo keşifên wî bû bingehêke baş.

Heta ku ew li jiyanê bû wî zêdyî hezar keşif û sêsed patent kirin.

Piştî şerê Krîmê ( 1853-1856 ) malbata Alfred ji Petersburgê vegeriyane welatê xwe. Lê Alfred ji bo ceribandina patentên xwe bi malbatê re venegeriya, ew piştî wan bi çend salan, di payiza 1863'an de vegeriya. Ew piştî vegera xwe ranewestiyan, dengê teqîna alavên wan yên şer ew ji xew dipengizandin, ew di xistin liv û tevgerê. Vê malbata bi gîr, her wekî li Petersburgê, li Swêdê jî xebata xwe berdewam kirin. Lê li Swêdê di sala 1863'an de bobelatek bi serê malbatê de hat, ku hemû endamên malbatê xemgîn kirin û ew di nava hîzin û şînê de gerandin. Ev bobelata ha li derveyî mala wan, di laburatuara Alferd Nobel, li Heleneborgê bûbû.

Dibêjin, gava birayê Alfred, Emîl Nobel bi teknologekî xwe re li laburatuarê serbixwe dixwazin nitroglicerînê pak bikin, prova wan diteqe, wê teqîna ku bi alavên keşîfê yên din, ku pirranî ji alavên şer pêk hatîbû, dikeve, teqîn hê xurttir dibe, taxê dihejîne; pencerên malan dişikîne, teknologekû ciwan, keçikeke bermalî, şagirtekî biçük û delalê ber dilê malabata giran ya Immanuel, Emîl tê kuştin.

Ew bûyera trajîk tesîreke ecêb li malbatê

dike, demekê destêن wan li kar sist dibin, lê pirr tê de naçe Alfred Nobel perdeya şînê û hîznê ji ser rûyê xwe davêje û bi dû prova Emîl bîst salî dikeve. Ji bo ku çavên kekê wî yê biçük Emîl li paş nemînin û ew di gorra xwe de bi rehetî binive, Alfred xwesteka wî bi cih tîne, navê keşifa xwe dike "dînamît" û bi wê di sala 1867'an patenta xwe distîne.

Ew keşifa wî ya ku paşê bû bingeha avakirina fabrika alavên şer û çekêن giran, Boforsê, ew bûn sedema gelek şerên mezin li dînyayê û kuştina bêhejmar mirovên di emrê birakê wî Emîl.

Alfred Nobel vê dawiyê bêhawe dewlemend bû. Ew bû xwediyê fabrikan, malan, makînan... Lê digel vê dewlemendi û şarezabûna xwe dîsan ew bi tenê bû; hevalên wî kêm bûn, ji mirovan bi dûr bû. Ji xwe di warê evînê de qet şansê wî tunebû, ew tu caran nezewicî, zuriyeta wî çê nebû. Tenê ew carekê li Viyanayê keçikekê nas dike. Naskirina wî ya bi keçikê re wilo çê bûye; Alfred Nobel li Viyanayê vexwendiyê xwarinê ye, ew jî kincên xwe yên şîvê li xwe dikin, xwe diediline, ji bo kirîna gurzek gul diçe dikaneke gulfiros. Li dikana gulfiros keçikeke ciwan, bejinzirav, rûbiken, kar dike. Keçika gulfiros bi wê rûbikenbûnê xwesteka Alfred Nobel bi cih tîne, jê re destek gulên ges di nav kaxizeke spehî de dipêce û bi dostaniyek germ didiyê. Ew keçika nazik, şérîn û diltenik dilê wî germ dike, wî ji bêhna barûd û keşifên wî bi dûr dixe û ber bi derya evînê ve dikişine. Erê, Nobelê ku bi bîst-sî salan ji keçikê mezintir bû, bejinkinik, çeloxwarzî, ne-lihev, lê weke cin zekî bû.

Alfred Nobel hewesa xwe berdide ser keçikê, dildar dibe, lê bêî ku pê re bizewice, bi salan pê re dimîne. Zaroka ku dawiyê ji

## XELATA NOBELÊ

jînikê re çê dibe, diyar dibe ku ew ni ji Alfred Nobel e, lê ew ji yekî dî ye. Di gel vê hindê ji Alfred Nobel ji bo ku bi zaroka xwe re hewcedar û stûxwar nemîmin, alîkariyek mezin ya peran bi wê dike, riyên xwe ji hev vedi-qetûnîn û her kes bi riya xwe de diçin. Lê oxira Alfred Nobel ne dûr bû, riya wî her ku diçû kurtîr dibû, heta pîrrê caran dihate gotin, ku Nobel dixwest bi rê û metodêna cuda xatir ji dinya me bixwaze, koç bike, here û hew vegere.

Alfred Nobel di dawiya jiyana xwe de aciz bûbû, ew xwedî serweteke mezin û navekî bilind bû; lê bê heyal, bê evîn û bê jiyaneke rind bû.

Tê gotin ku Nobel carna poşmaniya xwe ji bo dîtin û keşifêñ xwe yên mîna dinamit û alet û alavêñ şer yên din tanî ziman. Her çiqas mijûliya wî ya jîyanê dîtina alavêñ şer bû, lê ew aştîxwaz bû û wî piştgiriya tevgerên aştiyê yên dema xwe dikir. Loma jî wî berî mirina xwe ji bo ku ew girîngiya aştiyê isbat bike, poşmaniya xwe ya dîtinêñ alavêñ şer tanî ziman, xwesteka xwe ya ji bo jiyaneke xweş û cîhaneke bê şer û pevçûn bigihîne nivşen dahatû û navê xwe nemir bike, wî di wesiyetnama xwe de nivîsand, ku ji serweta wî salê di warê aştiyê, edebiyatê, fizikê, kimayê û fizyolojiyê de xelata bi navê wî bide.

Alfred Nobel di sala 1896'an de, di vîla xwe ya bi navê "Mio Nido" li San Remo, li Italyayê, di nav tenêtiyeke bêdeng de çavêñ xwe girtrin, jî dinya me koç kir û çû.

Alfred Nobel pişti mirina xwe, serweteke mezin li dû xwe hişt. Wî bi pereyên wê demê sih û yek milyonên swêdi li dû xwe hiştibûn. Lî mal û milk û pereyên wî belawela bûn; hinek veşîrtî bûn, hinek di bankeyên Fransayê de bûn. Pişti mirina Nobel, herçiqas fransizan xwestin dest deynin ser pereyên wî jî, lê dîsan swêdiyan nehiştin û ew pere ji nav lepêñ wan revandin û ew gihadîn welatê zaroktiya wî, Swêdê. Herçiqas Nobel pirraniya jiyana xwe li derveyî Swêdê derbas kiribe jî, dîsan ew hevwelatiyê Swêdê bû û wî nasname û paseporta Swêdê hidigirt. Weke ku tê zanîn, wî pirraniya jiyana xwe li Petersburg, Italia û Fransayê buhurandiye. Lî dîsan dilê wî ji bo welatê wî lêdixist, mîjîyê wî ji bo danasîna welatê wî bû. Loma jî welatê wî û hevwelatiyê wî jî bi kêfxweşiyek bêhempa li vî peyayê biçûk, lê bi navê mezin xwedî derdiket û bi hebûna wî xwe di nava gel û neteweyên dînyayê de dilşâ û serbilind hîs dikir. Ji bo ku navê wî nemire, xebata wî bertelaf neçe, perêñ wî ver de û wê de bê mane neyên xerc kirin, li ser navê wî komîteyek hate avakirin. Ew komîta ku ava bû, perêñ wî, serweta wî ji cih û deverên cihê cihê dane hev û ew hemû li Swêdê civandin. Niha bi navê xelata Nobel di şeş şaxan de; şaxa edebiyatê, aştiyê, fizikê, kimayê, fizyoloji û tibbê de xelata Nobel tê belavkirin. Her ji bo şaxekî komîteyek hatiye avakirin. Akademiya Swêdê ku ji 18 kursiyan pêkhatîye, berpirsiyare xelata Nobel ya edebiyatê ye. Ev xelata ha hem li Swêd, hem jî li dînyayê xelateke balkêş e. Pişti wê jî xelata aştiyê tê, ku ew jî li serbajarê Norvecê, li Osloyê tê dayin. Bi rêzê jî xelatê din têñ.

Li gorî destûra akademiya Swêdê mirov bi xwe nikare xwe weke kandidatê (aday) Nobelê nîşan bide. Herweha sazgeh ji nikarin kesan ji bo xelata Nobelê pêşniyar bikin. Lê kes ji aliyê kesan ve têne pêşniyar kirin.

Ev xelata ha ya ku ji sala 1901'ê û vir de tê dayin û salinan dibe mijara munqaşe û nêrînên cihê, her sal di dehê meha donzdehan de, di roja bîranîna wefata Nobel de, ji aliyê qiralê Swêdê bi şahî û sermoniyeke xweş, di gel gelek besdarêن navdar, li serbajarê Swêdê, li Stockholmê tê belavkirin. Meha donzdehan li Swêdê sar e, reş e, dirêj e..Şahî û sermoniya Nobelê vê meha nexweş xweş dike, wê dixe-milîne, wê dijîne.

Heta niahâ ji gelek qitan û welatan nivîskaran xelata Nobelê girtine. Di gel ku carinan giraniya ideolojîk tê de hebe ji, dîsan bi gelemperi bêtî ku ferqiyyeta reşik û spiyan, müsliman û cihûyan, Ewrûpî û Efrîkayîyan bê kirin, nêzîkî sed nivîskaran ji her besê dînyayê bûne xwediyê vê rûmeta bilind. Herweha welatên ku ev nivîskarêن mezîn afirandine, xwe di nava gel û miletên dînyayê de serbilind hîs kirine. Lê hem Tirkîye, hem ji welatên cîranêن Tirkîyê yên ku iro serdestiya kurdan dikin, ji vê rûmetê û serbilindahiyê bêpar mane, nebûne xwediyê vî navê nemir.

Lê kengî ku ew li humanîzmê vejerin, li hember karbîdestên xwe derkevin, êş û elema kurdan, têkoşîna wan a ji bo jiyanekî de rûmet, banga wan, liberxwedana wan, stiran û xwezaya welatê wan di berhemekê de bicivînin, ez bawer im wê çaxê wê kurd bi xwe wan pêşniyarî akademiya Swêdê bikin. Lê ne dûr e, ku kurd berî wan bibin xwediyê

vî navê gerdûnî.


Mixabin, îsal ne wan, ne ji kurdan stendin; xelatê xwediyê xwe li peravê giravekê, li bin siya darêن xurman, li ser qûma hûr û nerm dit.

## XELATGIRÊ ÎSAL, DEREK WALCOTT

Gava îsal serokê Akademiya Swêdê Sture Allen deriyê xwe ji çapemaniyê re vekir û mizgîna xelatgirê îsal Derek Walcott da, herkesî ev mizgîna ha bi kêfxweşî hemêz kirin. Ji tu kesî dengê protestoyê nehate bîhistin. Lê tenê, gava xwediyê xelatê Walcott ev nûçeya ku dibû bingeha guherandina jîyana wî û ew bi şes milyon û nîvê Swêdî dewlemedendir dikir bîhistibû, pêşî bawer neki-ribû, paşê bi dengeki bi kêf, ku di qirikê de mabû, gotibû: "cîma nemaze ez? Li dînyayê ewqas nivîskarêن mezîn hene".

Lê Akademiya Swêdê, li gorî nêrîn û pîvanêن xelatê, îsal ew mezintir dîstibû.

Ew mezînahiya wî ji aliyê rexnegirêñ edebiyatê ve, li seranserî dînyayê di rûpelên kulturê yên rojnameyên rojane û di kovarêñ edebî û kulturî de ji bi xurtî hatin dîtin. Tu kesî li tu cihan nerazîbûna xwe ya li hemberî biryara Akademiya Swêdê ya îsal neanîn ziman. Herkesî ev biryara ha pesinand, ev şairê nîvresîk, hevalê xelatgirê Nobelê yê sala 1987'an Brodsky, ji kûraniya dilê xwe pîroz kirin. Ev navê ha her çiqas ji xwendevanêñ kurd re nenas be ji dîsan hêjayî pesindayanîñ



Derek Walcott

ye. Ji ber ku ew nîvreşik e, ji qitak dûr, ji neteweyek bindest e. Rexnegirekî Swêdî ew weha dabû naskirin " Derek Walcott ne tenê niviskarekî nûjen, lê ew herweha şairekî reşik yê Emerikî ye ji". Lê bi a me ji ew ne tenê şairekî reşik yê Emerikî, ew herweha şairekî gerdûni ye ji. Ew ne tenê malê kujeke cîhana jibîrkîfî, lê ew ejderhayekî cîhanî ye. Loma ji, di vê dema me ya ku ji berdêla aştiyê şer, ji berdêla biratiyê dubendî heye de, ji vî carnêrê pênûstûj re bi gîrsî çepik lêketin. Mezinahiya vî mirovê ji neteweyek biçük, lê xwediyê dîrokeke kûr û dirêj ji aliye serokê Akademiyê Sture Allen, di nav şewq û çiçe çığa kamerayê japonî de bi riya çapemaniyê di rojekê de bi dînyayê ve hate gihandin.

Derek Walcottê nîvreşik, ji dê û bavekî reşik û spî hatiye dînyayê. Tevliheviya xwînê di giyanê wî de bûye hîm û asasê kultureke dewlemed, du qita gihadine hev. Ew hin caran xwe weke Ewrûpayî hîs dike, di nava kultur û medeniyeta Ewrûpa de bi avjenî dilize, hin caran ji xwe serserî berdide binê derya kultura Efrikayê ya kevin û wê bi hemû héza xwe derdixe rûkala dînyayê.

Derek Walcott hê di salêن xwe yê zaroktiyê de bal û hewesa xwe berdabû ser huner û edebiyatê û di hîjdeh saliya xwe de berhema xwe

ya pêşî bi navê "25 Helbest" ku bi rastî ji ji 25 helbestan pêkhatîbû, bi alîkariya diya xwe, ku ew ji hezkira poesiyê bû, çap kiribû û di dema xwe de baleke baş kişandibû.

Wî piştî wê pirtûka xwe bê hejmar pirtûkên din ji nivîsandin. Ji bili nivîsandina helbestan wî xwe li nivîsandina piyesan, se-naryoyê sînema û hwd. ji rakişand. Weke helbestikariya xwe, ew di warêن din ji yên nivîsê de şareza ye û di berhemêن wî de şoperiyêن kultureke kûr û zanebûneke pirr di-xuyin. Lê Walcott bi berhema xwe ya bi navê "Omeros" ku ji çend cildan pêk hatiye, hate naskirin û bi wê bû xwediyê navekî gerdûni. Û ew bû sedema ku Akademiya Swêdê îsal ew layiqê vê xelata navdar dit.

Derek Walcottê Karîbî yê 63 salî, bi jin e û bavê sê zarokêni gihişî ye. Ew ji sala 1983'an vir de li Massachusetts, li unîversiteyê Harvard û Bostonê mamostetiyê dike.

Erê, ev şâîrê nîvreşik, nivîskarê Homeros bibûrin, "Omeros", niha bi tena kurtepantonê xwe li bin siya darêن xurman rûniştiye, herdu lingêن xwe dirêj kirine, li aliyekekî xwe şes milyon û nîv kronêن swêdî danîne, li aliye din ji pirtûk û rûmeta xwe ya nivîskariyê... Ka em binêrin bê di pêşerojê de kijan zora kijanê dibe.

# QEHREMANÊN KURD LI ZÎNDANÊ MIN DÎTIN

Laleş QASO

## JI SÎDARA MIN RE

Ax hewar!  
Van çavan ci nedîtin!..  
Vî dili ci nekişand!..  
Dîwarên zâlim, derabêñ kafir  
Şahidêñ min in

Bi perçekî giyan yêñ arê serhildanê  
êxistin  
Min dîtin!  
Bi ser mirinê de çûn  
Heta bi zebeniyêñ dojehê behût hiştin!

Berxwedana wan kevirê aramê  
liqelaşt  
Li ber serê mirinê jiyan didîtin  
Giyanêñ di devê tivingê de bûn  
Ji bo teqînê amade bûn  
Min dîtin!

Her yekî ji wan giyanekî taze  
Şewitîn  
Ketin  
Bi qêrîn  
Her yekî ji wan cîhanek bû!

Kat kirin, wekû dînekî  
Banêñ girtîgehê!..  
Û ew evîna dîwane, di banêñ  
girtîgehê de  
Evan banêñ girtîgehê ye  
Sîdara min

Eva banê hesret, aram û hêviyê ye!  
Ro çûye ava, hîv nabesişe  
Ji siya ewran stêrk naxuyin  
Sîdara min

Yek jî Sîdar;  
Ro û hîva ku  
Bi te re dibeşişe  
Û stêrk


Hesreta roja nû ku bi te re dest pê  
dike  
Ev qulincên dil tune ne, ya!  
Axînan nakişîne ji kûrayê  
Heta bi barandina gilorîkên hêşiran  
Çi çare Sîdara min  
Çi çare!

Girtîgeha Diyarbekirê, sibat 1984

Girtîgeha Diyarbekirê, 1991

# CİROKA JIYANA MIN

Cemşîd BENDER



**B**avê min ji Şarikê, ku bi qeza Kixê ya Bingolê ve girêdayî ye, diya min jî bi malbata xwe re ji qeza Wanê, Başkalê bi peyati bi rê dikevin. Ew ji van deverên ku di şerê cîhanê yê yekemîn de işgal bûbûn diqetiyän. Malbatên kurd yên ku li Edenê bi cih dibin, di jiyana mahcirtiyê de, gelek zehmetî dikşînîn û têkoşîna man û nemanê didin. Gava Firansız Edenê işgal dîkin, yên ku ji tayê û ji êşa zirav li ser lingan dimînin, pêşî dikevin riya Bozantiyê. Ew serpêhatiya diya xwe, ya ku çawa peya ji Wanê didin rê û di nava kevir û deviyan de di Helebê re xwe digihînin Edenê, piştî ku ez mezin bûm min ji wê bihîst. Tiştên ku diya min jî min re behs kirin, ew zehmetiyên gelê kurd yên pêşî bûn ku min dibihîstin. ew qedera gelê kurd hê jî nehatiye guhertin. Gelê kurd niha di bin êş û zulmeke dijwartir de ye. Erê, ez di sala 1927'an de hatim dinyayê. Ew sal salên nûavakirina Cumhuriyetê bûn. Bi têkoşîna dê û bavê min ya li hember zehmetiyên bi cihbûna bajarekî nû, me dest bi dibistanê kir. Min dibistana destpêk, ya navîn û lîse li vî bajarı qedand. Min di sala 1946'an de li Stembolê dest bi xwendina universîte kir. Ev demek ne

xweş, dema şerê cîhanê yê duwemîn bû. Di wê dema ne xweş de jî, dîsan min perwerdiyek baş ji mameşteyên xwe yên Cihû; Neumark, Swarts, Crozat, ku ji ber zilma nazîstan bazzabûn û li fakulteya hukûkê ya Stembolê profesori dikirin, stend. Ez di sala 1950'ı de mezûn bûm. Min heya 1953'an karê xwe yê eskeriyê û staja zwe ya avûkatiyê qedand. Hema piştî wê ji bo doktora hukûkê ez çûme Parise. Min doktora xwe ya hukûkê di sala 1958'an de bi perên bavê xwe li Fransayê stend. Mijara teza min (diroka malî ya Osmaniya) bû. Di dema xwendina doktoriyê de ez li ez li pirtûkxanê Parisê pêrgî pirtûkên li ser kurdan hatim. Ez hingî têgîhiştîm ku paşerojek vî geli ya dewlenned heye. Nemaze gava min dîtibû ku gelek medeniyet ji dema antîk ji aliyê kurdan ve berpêşî mirovâtiyê bûye, ez gelekî kîfxweş bûbûm. Tu bêjî nebêjî heta sedsala bîstan gelek medeniyetîn din bingeha xwe ji medeniyeta gelê kurd stendine. Di dema me de gava Sumer, Hîfit, Asûr, Frigya, Lîdyâ asûmîle bûne û winda bûne, di sedsala bîstan de gelê kurd bi hejmareke mezin derdikeve pêşîya me. Ev şanseke mezin e. Di gel hemû neyîniyê hemdemî, hebûn bûyereke girîng e.

Diva bû ronakbîrên kurd cihokên xetimî vekirana. Ji ber ku gelê kurd, di maneya cografik de, di warê kultur û bajarvaniyê de nema bû. Di wê dîrokê de li Tirkîye gotina "Kurd" qedexe bû. Behs kirin û vekirina dîroka Kurdistanê jî bê imkan bû. Min hingî bîryara xwe da ku ez ê lêkolinê xwe bidomînim û di demeke hêsan de wan biweşinim. Di dema xwe ya xwendevaniyê de, ez li Parîsê tevlî tevgerên şoresserî bûm. Ji bo liberxwedana gelê Cezayirê, min kar girtin ser milê xwe û bi vî awayî ez bi antî împeryalîzmbûna xwe bûme înternasyonalistikî gerdûnî. Di sala 1959'an de ez çûme Norvecê û min demekê li wir xwendina kooperatifî xwend. Min di derheqa kirinê dewletê, yên ku bi navê Sosyalîzma Skandinavya dihatin bi nav kirin, malûmat girtin. Ez di sala 1960'ı de vege riymam Tirkîye. Di 27'ê gulanê de, piştî darba hukûmetê bi sê rojan, ez ji aliyê wezîrê hundurkarî, ku teymenek bû, ji bo kurdîtiyê hatim girtin. Ev bûyera ha di jiyanâ min de ji bo min dibû tecruba dudan. Ez bi efûya ku piştî pênc mehan hat, hatim berdan. Gorî ku min di 6 saliya xwe de dest bi dibistana destpêk kiriye, 27 salên min bi xwendinê derbas bûne. Lê digel vê keda me dîsan em di çavên dewleta Tirkîye de hevwelatiyên dereca duyemîn in, muamela reşikan bi me tê kirin. Êdi em mîmlî bûn. Sûcê me jî kurdbûyina me bû. Ger em qet tiştekî nekin û tenê li nasnava xwe ya kurdî xwedî derkevin, ew di çavê TC de sûcê herî mezîn e. Di wê demê de, di nav çepenî Tirkan de behsa vê nasnavê kirin, weke şovenîst û nijadperestî dihate ditin. Yanî jî ber ku em kurd bûn, em li vê zirecêba dinyayê bi tenê bûn. Gava ez ji Ewrûpayê vege riymam

bajarê zaroktiya xwe, Konyayê, min di bin şerdêñ zehmet de jiyanâ xwe bi avûkatîyê berdewam kir. Di eynî salê de ez bi jina xwe ya Norvecî û zarokêñ xwe ve li Norvecê bi cih bûm. Ez heya sala 1983'an li vî welatî, li bajarê Golê mam. Min xebatêñ xwe yên di derheqa medeniyet, dîrok û kultura kurdan li vî bajari hê xurttir kir. Piştî vê dîrokê ez vege riymam Tirkîye. Ez niha li Îzmirê dijîm. Ez yek jî hîmdarêñ Enstituta Kurdi ya Stembolê me.

Nivîskariya min digihê salêñ dibistana navîn. Kurteçiroka min ya pêşî di kovara Arkadaş, ya ku li Stembolê diweşîya, derket. Di dema lîscyê de min û hevalekî xwe me bi rojnameya Babalik re pareka edebiyatê weşand. Ji ber ku me hê lise neqedandibû, mafêñ me û derxistina rojnameyan tunebû. Me mecbûriya derxistina kovareke mehane hilbijart. Gava ku mebihistibû tenê li Îzmîre 300 lib têne firotin, em şaş û ecêbmâyî mabûn. Di wê demê de tûrajeke wilo piir bû. Em gelekî kêfxwes bûbûn. Lê ev mijûliya me jî ber xebatêñ dibistanê zêde neajot.

Di sala 1951'ê de min li Konyayê rojnameyeke hefteyî bi navê "Bizim Şehir" derxist. Ev weşana me baleke baş kişandibû, lê gava ku ez çûme eskeriyê dawîya weşana vê rojnameyê jî hat. Salêñ dûvre jî min nivîsandina kurteçirokan domand. çîrokêñ min di rojnameyên Cumhuriyet, İstanbul, çagri, Vartik û kovarêñ Türk Dili de belav bûn. Di salê 1959-1960'ı de bi alykariya wergerên jina min a Norvecî, çîrokêñ min di kovarêñ Norvecî û Danîmarkî de weşîyan. Piştî salêñ 1986'an jî

li bajarê Yugoslavya, li üsküpê, çirokên min di kovara bi navê SESLER ku bi tirkî çap dibû, weşîyan. Ji sala 1974'an û vir de ji ber ku min dev ji avûkatiyê berda ye, ez dema xwe bi nivîskariyê derbas dikim. Ez debara xwe bi kiriya xêni û bi perên avûkatiyê yê teqawîtê dikim. Berhemên ku min nivîsandine ji ev in: Gülen İnek (çeleka ku Dikene) 1959, Karides Duragi (Rawestoka Karidesê) 1967. Lê çirokên ku min piştî 1967'an nivîsandine û hin çirokên bijarte ku min ji van pirtûkên xwe girtine, ew ê bi navê "Kürt Kizi Zengê" li Stembolê di nav weşanên Berfin de derkeve. Ew çirokên min yên ku ji aliyê wergervanên NÜDEM'ê yên hêja têne wegerandin, ezê di pêş de wan mîna pirtûkekê bi kurdî çap bikim. Ez nivîskarekî kurd im ku ji zimanê dayika xwe hatime birrîn û nikarim pê binivîsinim. Ji ber ku ez bi tirkî dinivîsim nayê wê manê ku ez ne(nivîskarekî kurd im). Di pêvajoya dîrokê de edebiyata kurdî bi zimanê serdestan bi pêş ket. Ebû Muslim Horasanî, Ebû'l Vefa, Şihabedîn Suhreverdî, Abdull Kadîr El-Geylanî, Şêx Addî, B. Mîdsafir bi erebî nivîsandine. Di dema Selçukiyan de Husamettîn çelebî yê Kurd bi zimanê resmî, farisî nivîsandiye. Seyit Nesîmî, ji şairên me yên diwanê Nabîye Kurd û Fuzûlî bi erebî û Osmanî nivîsandine. Di dema me de jî gelek şair û nivîskarêñ kurd bi zimanê resmî, bi tirkî nivîsandine. Ji xwe ev heftê sal in, ku nivîsandina bi kurdî li Tirkîyê qedexe ye. Lê ez nivîskarekî kurd im û ez bi vê jî serbilind im.

Berhemên din ku min nivîsandine ev in: *Skandinavya'da Turizm* (Li Skandinavyayê Turfizm) 1985.

*Konya Sazi ve Türkülerî* (Tembûra Konyayê û Stiranê wê) 1986.

*Antolojiya ku li Yugoslavia bi navê-çiroka Tirkîyê a do û iro*, 1987.

*Kürt Tarihi ve Uygarlığı* (Dîrok û Medeniyeta Kurdan) 1991.

*Kürt Uygarlığında Alevilik* (Di Medeniyeta Kurdan de Elewîti) 1991.

*Kürt Mutfak Kültürü ve Kürt Yemekleri* (Kultura Kurdan a Mitfaxê û Xwarinêñ Kurdi) 1992.

Ji bili van jî ez ê hemû bend û meqâleyên xwe di pirtûkekê de bicivînim û wan çap bikim.

---

*Çiroka jiyanâ Cemîd Bender ji aliyê F. Cewerî ve ji tirkî hatiye wergerandin.*

# AZAD ŞEWQÎ

Amadekar: D. MÊQERÎ

Azad Şewqî di sala 1933'an de li Silêmaniyê, li Kurdistana Iraqê hatiye dinyayê. Xwendina xwe li Bexdayê temam kiriye. Ew ji nîvçê yekta ya zanîngeha hunermendiya spehî ye. Ew di salên pêncî de li Silêmaniyê bûye damezyarê lêkolîna hunermendiya spehî. Di çil salên xwe yên xebata hunerî de wî çar pêşangehêن taybetî pêşkêş kirine û di gelek pêşangehêن komeleyî de jî besar bûye. Piştî 40 salên xebata mamesteyî, niha ew karkenarî bûye. Wek tê zanîn, mamesta A.Şewqî hunermendê kurdistana başur e. Ew li Silêmaniyê weke sembola tevgera wênekêşan e. Di nav çil salên dawî de nivşen ciwan li ber desten wî digihê û berê xwe dide riya hunermendiyê. Ew geleki bi pirsên folklor û etnografa gelêri jî mijûl bû. Di aliye folklorê de wî pirr caran pêşangehêن taybetî pêşkêş kirine. Herweha di pirsa etnografa de jî hevpariyek girîng ji bo damezrandîna Muzexaneyî Etnografa Kurdi kiriye.(1)

Ev hunermendê mezin yê ku bêtir ji çil salan ji hunerê xwe dilsoz kiriye, mero xurîsta Kurdistanê di tabloyen wî de dibîne: Tema malen gundan yên ku xwe pal dane darêن çaman di tabloyen wî de dixuyin. Rengen çarmedora efsanewî mero dikişine; mero bi hiş hewesdarê van cihêن bi reng dibe. Ev rengên



Azad Şewqî

spehî yên nîşana berhemên A.Şewqî mero berjor hildide nav asoyen muzika şîirî. Weke ku rengê tûrejtavê bi awakî tûj; firça hunermend li ser tabloye diherikîne. Herweha di pesnê berhemên wî de yên ku nîşana spehiya şîirî û

muzîkî dide; mero têdigihîje ku mijara hunera A.Şewqî bi xwezayî bendewarî dike. Ew ji dibistana Impressionizm e.

Lêbelê tiştên ku dirûvê tabloyên wî cuda dikin ew e; çêkirina liveka (hereketa) wêne bi alîkariya tevdan ya ku di esmana berhemên wî de tê belavkirin. Di vî warî de A.Şewqî dibêje, ku liveka han bi awayê teknika xwe ya taybetî çêdibe. Vê teknikê hişt ku ew hergav rewişa hunermendiya xwe biguherîne. Wek nimûne, gava hunermend pê hesiya ku firçe li hember serbestiya xwe radiweste û mero kotevê diken ku sê tiliyên xwe bi kar bîne ji bo ku wê bigire. Ji lewre hunermend bi eks kir, firçe ji destdarê wê girt û ew weke pênuşê bi kar anîye. Herweha ew carna şehê jinên gundiyan bi kar fine û dibêje ku teknikê weha bandûreke xurt li ser rewişa berhemên wî kiriye.(2)


Mero ecêbmayî dimîne gava dibihîze ku rengên spehî yên dirûva tabloyên wî cuda dikin, hindik ji wan ew bi xwe bi awayekî

taybetî çêdike. Mîna şitlê dareke navdar li welêt, ku jinên gundiyan ji wê hine (boyaxa por), derdixînin: Û bi texmîne me dibe ku koka peyva (hine.r: huner) ji peyva (hine) hatiye, ji ber ku ev boyax kevintirîn rengê ku mirov bi kar anîye.

Niha Azad Şewqî hunermendiya xwe li Silêmaniyê didomîne. Ew hewl dide ku di pêşerojê de pirraniya wextê xwe bide hunera zarokan û pêşangehêن taybetî pêşkêşî wan bike. Ji ber ku bi baweriya wî zarok hêviyên welêt û kulîlkên ku xwezaya Kurdistanê dixemîlinin in. Ev xwezaya rengîn ya Kurdistanê, ku Azad Şewqî yek ji hunermendêن wê yê navdar û mezin e.

(1) *Hevpeyvîn bi F. Hafid re, Nûdem No 1, 1992*

(2) *Huda Hamûdi, kataloga pêşangeha 4'an ya A.Şewqî, Salona Al-Rewaq, Bexda 1989.*



# EV XWÎN

Arvain WERTA

Werger: Mervanê KELES

Wê nabînim,  
min naşo bîhna wê ya bi êş  
Dengê wê nakim diherike li ser  
Keviran  
Û ne wê hestdikin destên min,  
Û ne hestiyên min xwe dugherin  
rengê  
Sor  
Û nema tifa min kesk e  
Tal e,  
Zeremar e.

Min ew nedît,  
Na, pê hênebûm  
Digere di xwîna min de  
Bigirîn wek balindkî winda  
Û ne tiştek bilî geryana  
Li xweşewîstiyê.

Safdar e ku xwîna İSPANÎ nebare  
Li ser bajarên EMERÎKİ  
WEK xwîna gayêh hov  
Yan hêşirên simsîyaran.


Lê belê  
BELÊ wê dibînim,  
Belê diherike  
Di ezmanê bajarê min de  
Belê wê hestdikin destên min  
Belê porê serê min reş dibe ji  
Tirsê  
Belê devê min birînek dijwar e  
Û hestiyên min şîneke sor e.

Min ew dît, ew hest kir  
Bi tiliyên xwe yên lerizî  
Û hîn gilî dikim ji axînê  
Ji şevê û bîranînan.

# KURTEJIYANA MIN

---

## Derwêş M. FERHO



Ez ji gundê Mizîzexê, girêdayî Midyadê me. Bi tarîxa 02.10.1961 de hatime nivîsin. Bûyina min a rastî nizanim çi ye. Ez "di rojekê ji yên zivistanê de, hê berf li erdê bû û me haziriya avakirina xaniyê xwe dikir" de bû me.

Wek her kurdî, jiyana min di dema zaroktiya min de pîr dijwar û çetinbihurt. Havînan û dema dibistan girtî bûn ez kahrwan û şixrekêş bûm. Ew kahrwanî û şixrekêşî ji min re bûn tovê hînbûna pîr tiştîn gîring di jiyanê de.

Ez di wê demê de bi stiranên kurdî Siyamend û Xecê, Evdalê Zeynikê, Ziravê, Kulik, şerrîn gelerî, Emê Gozê, Elîkê Betê, Seîd Axa û bûyerên Koçero re mezin bûm. Şivanên gund, di dema kozkirina pez de, ribat û avdanê de, gundî di "oda gund" de digihiyan hev û ji bûyerên rojane, dîrokî û rewşa xwe diaxivîn. Ev xezîna giranbiha ji hev re digotin. Bi hev nadîn jibûkirin. Hev hîn dikin. Ku neslên li dû wan wan tiştan bizane û bide jîndar kirin. Wek her kurdî, min ji, bi meraq, li wan guhdarî dikir. Min 11 salan li Tirkîyê xwend lê çirokeke wek Têlî an ji Seyrê nedît ku bixwînim. Her kurd dizane ku di nav civaka me de bend û berberî heye. Dema ku gundî li hev dicivin, ne bes li ser bend û berberiyê, lê ew li ser hemî tiştan diaxivin. Dibistana

jiyana me, pirraniya kurdan, ev xusûsiyeta han a gelê me ye.

Weke ku şerrê li hemberî dewleta Tirk ne besî me ye, me bi qirika hev ji girtî ye, dev ji hev ji bernadin. Hêza xwe zeş dikin, dijminê xwe ji bi hêztir û mezintir dikin.

Kekê min, ku mamoste bû, di sala 1971'ê de ji aliyê dewleta Tirk hate hepskirin. Girtina wî tesîreke mezin li min kir.

Di wê demê de min dest bi nivîsa helbestan kir. Tiştîn min dinivîsin bi pirranî protestoya dijwariya jînê bûn. Protestoya zîlm û dijwariyê bûn.

Dema ku kekê min ji girtîgehê derket û min ew helbest şanî wî kir, ew ji kena kete erdê. Helbesten zarokekî deh salî ew ê çawa bin? Min ew helbest avêtin, lê min qet dest ji nivîsinê berneda. Min nerazîbûna xwe ya di jiyana de li ser kaxezê bi awayekî helbestan dinivîsi. Eskerê "Rom", polisê xedar, muxbirên bêbext ku xwe firoştine dewletê, feqîri û belengazî tesîreke dijwar li ser min kir. Ez bûm dijminê van tiştan. Ew tişt ji bûn sedemê nivîsa min.

Di sala 1984'an de pirtûka min a helbestan bi navê "Dengê Roja Dil" hat çapkirin. Di wê

demê de ferhengokên besît ji bo turistan "Kurdî-Holandi" û "Kurdî-Tirkî" jî çap bûn.

Di sala 1986'an de min pirtûka "Topragin Türküsü" a Medenî Ferho û komek ji hel-bestên CEGERXWÎN wergerandin zimanê Holandî û bi navê "Lied Der Aarde" û "Poezie uit Koerdistan" weşandin.

Demek berê meriv dinêrî ku çend kesên nivîskarê zimanê kurdi bibine. Mixabin kêm bûn. Pirr kurd nivîskar hebûn, pirr kurd rewşenbir hebûn, lê meriv çi bêje, ew nivîskar û rewşenbirêne Tirkî bûn. Mala wan ava be wilo jî man. Lê rewş guherî. Niha tu li ku dînihêri binihêre çîrûsk xuya dîkin. Li her aliyê welêt, li her welatê Ewrûpa, Amerîka, Sovyeta kevn, nivîskarêne me hene. Li her alî kovar û pirtûk çap dibin. Nivîskarêne nuh berhemên xwe belav dîkin. Ez ji bo vê yekê pirr şâ me. Ev yek reng dide edebiyata kurdi ya zengîn. Ez tişteki jî vê yekê xweşîr nabînim. Pîrdengî zengîni ye. Zengîni jî zadê jiyana berdewam e.

## AZADÎ

*Di stêrkan de  
di heyyê û rojê de  
li serê mitikêñ çiyan  
navê te hate nivîsin  
hey azadî.  
Bi stiranan  
    bi dûlokan  
li zarokan  
li ser ewran  
    li ezmêñ  
bi hevî  
    bi sahî  
bi ronahiyê hat neqîşandin*

*di sibehêñ hênik de*

*di gevêñ xwes de  
li ser dilan*

*navê te  
bi rengê gulan hate nivîsin  
hey azadî.*

## HÊVIYÊN AZADIYÊ

*Eger azadî bê meyandin  
bi rohniya rojê  
an jî di bin tava heyvê de  
li ber spehiya stêrkan  
an bi agirê rojê  
di rojekê ji yêñ havînek germ de*

*Kîne ev  
di dilê min de ji îsotê tûjtir  
xerab e, har e, periû ye  
di zîndanêñ îroyîn de  
li meydanêñ bênamûsan belav in  
axîn lawik, lawik derd in  
û ji hêviyan qut nabîn  
evîn wek a gul û bilbil e.*

## DI ROJÊN PÊŞ ME DE

*Bila gotina te be  
evînî, esq û këf  
silav tev bo te bin  
emê tev bo te bistirêñ  
dilanê ji naza te re bikin  
û şahiyê ji can  
li ber gotinêñ te bikin*

*Da hêvî ûro neşikin  
bes iro,  
bes iro xewn rast derkevin  
û  
em ji hev xwes bin.*

# HUDA SABRÎ;

## Tabloyeke Rengîn Ji Kurdistanâ Sîrîn

Mueyed TEYIB



**M**ueyed Teyib di sala 1957'an de li bajarê Dihokê hatiye dinyayê. Di sala 1977'an de li danişgeha Bexdayê dest bi xwendina hiqûqê kiriye. Ew sala 1978'an dibe endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd. Li rojnama Hawkari weke rôdaktor û li radyoya kurdî li Bexdayê sê salan kar kiriye. Berhemên xwe yên edebî li piraniya kovar û rojnameyên kurdî li welat û li derveyî welat belav kiriye. Demeke dirêj di redaksiyonâ Berbangê de ci girtiye û bûye berpirsiyarê wê. Diwanekê helbesta bi navê "Stiran, befir û agir" berî niha bi demeke kurt li Kurdistanâ başûr çap bû.

Mueyed Teyib niha li bajarekî Swêdê, Kâtrineholmê mamostetiya zimanê kurdî dike.

Pileya sivilizebûna gelan iro, bi pileya besdarbûna jinê, di hemî warêni jiyanê da, têt pîvan. Ger em bi çavekî objektîv berê xwe bidin civaka xwe, bê guman, em dê xwe paşkeftî bibînin. Ji ber ku hûn ciyê jina kurd di gelek aliyêni jiyanâ me da yê vala ye. Ev valabûn jî ne ji kêm pêçebûna jina kurde, belku ji wan şertêni sext û dijware yên ku jina kurd û hemî civaka me têda jiyaye û diji. Lê di ser vê rastiya tal jî re, eger em yekcar xwe reşbin nekin, dê di asoya pêşeroja civaka xwe de, hin nîşanan bibînin ku jina kurd ya gavan ber bi pêşkeftinê dihavêje û gelê me jî pê ra.

Ez deh salan ji Kurdistanâ dûr ketim. Piştî ez vege riym, tişte pir bala min kêşay, rewşa jina kurd bû. Iro jina kurd bi awayekê balkêş rola xwe di civaka me de difuze. Hejmareke ne ya kêm ji wan nivîskar û hunermendin û bi çelengî ciyê xwe di rêxistinêni siyasî û demokrat de kiriye. Ez wekî kurdeki şanaziyê bi

civaka xwe dikim, dema ez dibînim li dewletteka serbixwe wekî Kuwêtê-ku berî demekê kurt, helbijartin lê hatiye kirin-jinê mafê dengdanê nîne û li Kurdistanê jinê ciyê xwe di perlemanî de kiriye û bûye wezîr jî.

Di seredana xwe ya işal da bo Kurdistanê, min gelek hunermend û nivîskarên nû nas kirin. Yek ji wan hunermenda çeleng Huda Sebri bû ya ku bi firçeya xwe ya rengîn û bi behreya xwe ya ges ciyê xwe di nav hunermendê Kurdistanê da kiri. Huda li sala 1966'an li Bexda ji dayik bûye. Xwendina xwe ya bingehîn jî li wêre xilas kiriye. Paşî malâ wan hatiye Dihokê. Li sala 1986'an xwendina xwe ya amadeyi bi dawî anîye, her wê salê çûye Bexda û li danişgeha wê, Akademiya hunerên ciwan, beşa Grafic Design çar sala xwendîye.

Tabloyen wê li gelek pêşangehan hatine nîşan dan û bi biranîna Helebçe û Newrozê du pêşangeh wê bi xwe vekirine.

Huda dibêjê: "Yek ji problemên me yên herî mezin, nebûna kel û pelên huneriya wekî reng, firçê, kaxez...htd."

Her wesa dibêjê: "ci tiştek wekî azadiyê nîne bo mirovê hunermend. Em iro bayê azadiyê heldikêşin û gelê me efrandinê ji me dixwaze. Mirovê hunermend pêwist e yê rast bît digel xwe û dêwr û berê xwe û ew rasti di huner û helwêstê wî de reng vedet". Min ji Hudayê pirs kir, babetê tabloyê te çiye û tu îlhama xwe ji ci werdigir? Bersiva wê ev bû "Babetê tabloyen min mirov û siroşte û ez ji wan îlhama xwe werdigirim".

Ji hunermendê cihanê, Huda bi çavekê bilind li hunerê Van Gogh û Salvador Dalí mîze dike.



*Huda SABRÎ*

Jî hunermendê kurd Huda ji hunerê van hunermendan hez dike; Mihemed Arif, Ebdil-rehman Kelho, Guhdar û Ednan fiño.

Hêvî û daxwazê Hudayê pir in, ji wan ku bikare hunerê cîhanî bêtir nas bike û hunerê modernê çap û çapkirina bigehe Kurdistanê. Kitêb, rojname û kovarên kurdi bi awayekî ci-wantir bêñ çapkirin.


Ev jî çend nimûneykin ji tabloyên wê.

*Di hejmara sêyemîn , di rêzika dawî ya helbesta M. Teyib de ji berdêla "şor" "sor" hatibû nivîsandin. Em ji M. Teyib û ji zwendevanan lêborinê dixwazin û ji bo rasîtîgîhistina helbestê, em rêzika dawî ji nû ve dînîvisinin: "Yan ji heta ber pêñ xwe serê xwe şor bike!"*



*Tabloyeke HUDA*

# APÊ HORO



## Husen HEBEŞ

**S**ahrezaya apê Horo di naskirina şeniyên gundine çiyayê kurmênc de pirr e. Carna li cîvînan we lêdihat, ger merikî nû heba û bigota: Ez ji Zivingê me, an ji Sêwiya me, wê lê binihêriya û bigota: Ez li daweta bavê te reqisi me... Erê çi dawetek şen bû... Beri niha bi deh panzdeh salan min qufir li Sêwiya difrot, gava ez vege riyam li derveberjêrê Gund kerê min bi rê ve veciniqî û di ser hev werbû heta li ber devê gêli rabû ser xwe û ji wê rojê de min tobe kir ku ez êdî hew diharim wê topraqê...

Ji gundiyyên wî re ne nihêni bû ku ew nizanibin ji ku derê navêne ewqas embarandiye; wî etarî dikir û te çi jê bixwesta, te ê di meharê wî de - wek hemû hevpîşê-ya- û biki riya: Caw, çit, derzî, dezî, şekirê noka, yê mişmişkî û cûreyê din ji şîrîniyê, lastûkên doxînan û htd...

Laqirdî û henek bi jinebiyan re karê etêr xweş dikir û hema wa eşkere peyvên bi aliyê jinan de diçün, diçerpandin û fedî nedikir, eger kî li hawîrdor heba...

\* \* \*

Di êvareke tebaxîn de ku heft havîn di ser çûyina Kêmo re bihurtibûn, û ew ji hevîrka lêzmi bi dûr ketibûn û şevbuhêriyeke we di xewnan de ji bi dest nediket û niha bi rastî ew li nav gundiyyên xwe û hevaldostên gundine

hevsayı de rûniştiye. Di şevêne weha de rola kebaretiştên gelêri mezin e; apê Horo yek ji wan bû.

- Ma ji dêxwînê û berjêr li wê derê çô ye ?

Di gotinan re apê Horo ev pirsyara li Kêmo kir, ew hinekî li xwe xera bû û nikarî yekser bersiv bida, loma ew wek xwendevan li Mosko nikare di cîvenek weha de ku jin, mêt, keç û zarro rûniştibin çeliya wê mijarê bike, li wir we vekirî deng nakin, we layiq nabînin. Hîn Kêmo we guf mabû, dengê Misto ji alîkî de hat: - Welleh ciyê te ye apê Horo. Misto hevpîşeyê xwe ji ziqifekî teng rîzgar kir, ew ji wek Kêmo bi mîvanî vegerrî bû.

Ta pêkenîn bi behra şevbihuriyan giştan be, wan ji apê Horo lava kir ku çiroka Meyroya Hemê ya ji çeqmaqê mezin xeberde: Di zivistana çûyî de ez pirr nexweş bûm, de meriyêne wek min kal tim di nav doşekê de ne, halê min pejwîrde bû, min digot: Ev zivistana di ser min re derbas nabe û ez ê biharê nebînim. Meyro dibihîze ku ez nexweş im û li ber mirinê me, wê rojekê xeberek bi yekî re şand û wî ji weha li ser zimanê Meyro ji min re got: Eger Horoyê Simo berî min bimire, ez ê herim ser tirba wî, ez tu fatihan bi ser de naxwînim, ez ê bes bi ser tirba wî de birrim.

Xwedê umirê apê Horo dirêj dike, tevî ku ew zivistana wek çiyakî li ser singê wî mexelî bû û destêne xwe xistibûn qirikê, lê xwe bi hekhekî ji nav lepêne wî derdixîne.

Erê! Bihar hat. Apê Horo ev sê peyvina bi zorê ji gewriya xwe derdixistin û di paş wan re kûr guhlixwedina; diyar bû di wê nabeynê de hîn sitavên mirinê jê xavê dihatin.

- Di pê tengiya re ferehî tê, di pê zivistanê re bihar tê. - Apê Horo wek filosofekî ev gotinên şopewer anî bîra rûniştvanan.

Bihar hat... Bihaşa çiyayê Kurmênc ewna ciwan û xweş e ku mirov li ber mirinê be ji, can ji nû ve pê tê, bi ser xwe tê û bi şiqinên daran re ges dibe, li gel bîhnê gul û kulîkan bîhin dide, hawîrdor ewna dixemile mera hest dike ku guyana jiyanê bi kevir û kuçikan ji dikeve.

Bihar hat... Xwîna teze di gewdê apê Horo de tîgerre ew ji gundê xwe çeqmaqê Biçûk derdikeve, bi tek hevalê xwe ve; çoyê xwe dihere gundê Meyro, ew rebena hîn rind ji nabîne, hêdi hêdi diçe ta dîghîne bin Dara Soqî.

Dara Soqî teatroxana havînî ya çeqmaqê Mezin e. Ew dareke tuyê bilind û pirpirik e, siya wê belki cil pêncî mirovî digire, ekter, qesmer û temaşevan bi hev re ne, pirraniya pîrsen dinê, yên welêt û yên gundan li cihên wilo têne munaqeşe kîrin; ew tradisyonike gundanî ye, li gundân Kurdistanê navendên wa pîr in. Dara Soqî bi sala ji apê Horo mezintir e, ew bi eşq li ber nermebayê biharê pîkên xwe dihezîne, guh li çîrok û sonteriyên gun-diyan digire, hîn neketî deraqê pîrîti yê çawa apê Horo.

Demekê apê Horo li bin darê rûdinê, li halê nas û dostan dipirse, derdê nexweşîya xwe ji wan re derdixîne, ew li ber wî dikevin ku ew wena jar bûye, hîn hinekan ji kîfxweşîya xwe ji dîtina apê Horo re nişan dide, ji nişka ve Kwîto silav dayê :

- Tu bi kîf i, tu rihefi, Kwîto jê pîrs kir.
- Law tu yî Kwîto! Yawrim. Hema apê Horo li bersiva wî ji neseñîn û vê re got:
- Ma dêka te li mal e?
- Erê li mal e. Kwîto lê vegerand.
- Herre vê re bibê mila qaskê dîne ser êr, ez i ditêm.

Vîqînî bi xelkê ket gava dengê apê Horo bohîstîn:

- De were guh li min û tonâ bigir, tu yî dimirî, tu hîn ji gotinê we namînî. Kwîto we got û ew vexwendî malê kir.

Apê Horo û Kwîto bi hev re diçin mala Meyro. Cil û doşekê ji mîvîn re wek adetê datinîn, bixêrhatuna wî dikin. Apê Horo bi xwe nikare, hema dibê:

- Meyro! Qaskê dîne ser êr.

- Wey xweli li serê te be, ma tu mîr i ku ez avê germ bikim!

Meyro ji ya xwe namîne.

Neviyekî Meyro yî biçûk li hudur bi çar lepan diçû, ew ber apê Horo dihat, ew jê nîz^k dibe, tê hemêzê, apê Horo destê xwe bi ser sêri re dibe û tîne û di ber re dibêje:

- Ez ê işev te li cem pişte xewkim.

Meyro di ber wê şabûnê rû li ken dibe û guh lê digire. Destê apê Horo hîn ne westiyaye û berdewam dike:

- Kirpit... Kirpit... Kirpit...

- Apê Horo we Meyro dibîhsîne û ew lê vedigerîne:

- Tim bi dev kirpit!

- Erê heta sibê tim kirpit.

\* \* \*

Herkes di cihê xwe de bi kirpita apê Horo dikenîya, Guloyê Zikxîrar bi aliyê Kêmo de nîhîri û jê pîrsî:

- Ma tu zanî kirpit ci ye?

Ji wî ye ewqas sal in ew li şevbihuriyê wan bi dûr ketî ku wî peyvine wan ji bir kirine.

- Çawa ez nizanim! Kêmo bersiv da û got: Apê Horo peyvike nû bi hostayî di zimanê me de afirandî. Tiqîqiyyên şevbihuryan bi "Kirpita" apê Horo gumreh dibû.

## PAYTONA VEGERRÊ

Ez û keça xwe ya heft salî Viyan ji avjen-gehê vedigeriyan. Tevî ku destpêka heziranê bû lê bayekî sar em hemêz dikirin.

"Em iro wende (1) hîn bûn" Viyanê di nav gotinan re ez agahdar kirim. Gava min ew peya bihist yekser Perestroykaya Gorbaçov û "Wêndêñ" li welatên berê bi navê sosyalist hatibûn nas kîrin kete bîra min.

- Wende çi ye? min jê pirs kir.

- Wende di avjeniyê de ew e ku tu xwe bi ser alîkî ve şûnda bavêjî û eger avzivirk ji hebe tu karî xwe jê rizgar kî. Bona ku ew ji min re rind şirove bike bi dest û lingên xwe nişan da.

- Ma li Kurdistanê tu hînî avjeniyê nebû ku nazanî wende çi ye.

- Na ne wek te, mamostêñ avjeniyê di dema me de li herêma me tunebûn û em ji ber xwe hîn bûn û gava ez biçûk bûm, eger du caran doston ez ji nav avêñ kûr derxistibûma, min û te niha bi hev re deng nedikir û ez nedibûm bavê te... Loma gava ez avjeniyê dikim, ez zû diwestim, çinkû ez bi şewakî rast fêri wê nebûm; ne wek te û birayê te Hogir.

- Tu karî li vê derê hîn bibî, keçikê rê nişanî min da.

- Rast e, lê niha wexta min tune ye, min şersiva wê da û berdewam kir: Her ji ber wê yekê em dê û bav gava ji we re dibêjin: Bixwînin, fêr bibin, eger sibe hûn mezin bibin wê wexta we ji tune be, çawa ku niha wexta me tune ye.

Gotinêñ min belkî ne bi dilê Viyanê bûn, wê berê axaftinê bi aliyekî din da guhert û ev pirsyara ji min kir:

- Ma rojnamevan û nivisevan heq e pîrr bixwînin û binivisînîn?

... Û pîrr bigerrin ji min lê zêde kir.

- Lî çiqas dirav ew werdigirin?

- Hinek pîrr, hinek kêm û hinek ji herziyanê dikin.

- Ma bavê te li Kurdistanê çi kar dikir?

- Bavê min cotkar bû, ji sibê û heta êvarê li çolê bû, tim kar dikir, wî pîrr dixwest te bibîne ta hespekî pêşkêşî te bike.

- Ma ew ji mêt ve miriye? keçikê pirs kir.

- Hîn tu û Hogir nebûbûn.

- Bavo! Ma tu ê çi demê ji min re hespekî bikirî?

- Ev çiqas car e tu vê pîrsê ji min dikî ?

- Belkî ji hezar carî zêdetir be...

- Ü min tim çi bersiv dida te ?

- Ez ê bi xwe herim ba hespan.

Vê carê keçikê lava kir

- Tu bilêteke balafirê ji min re bikire; ez ê xwe bi Iraqê ve gihînim, ez ê li wir Saddam bikujim û çar hespan bikirim, herdu hespêñ herî baş ez ê bi xwe bibim û yên din ez ê bi Hogir dim. Ez ê wan di paytonê kim û wê tijî şokolat bikim û bi aliyê kurdêñ me ve bajom yên ji ber Saddam revîne û li çiyan di nava çadiran de ji serma û ji nêzan dimirin, ez ê wan vegerînim malêñ wan û ji wê şûnda ez ê hespêñ xwe bînim û li wan siwar bim û biçim dibistanê û nema li makîna dayê siwar dibim.

( 1 ) Wende: Peyveke almanî ye, mana wê: Guhertin, xala vegerê ( Sport)


# Helbestvanê Swêdî: Eric FYLKESON

Eric Fylkeson xwedî tecrubeyek baş ya xwendina helbestan e. Di salên 70 de wî bi Per-Eric Söder û Bruno Köijer re bi navê grûba xwe ya Dikê Vesuvius, ji bo xwendina helbestên xwe turne dikirin. Wî zêdeyî cil turne bi grûbêj jaz û rockê re kirine û ew herweha bi balerînan re jî xebitiye.

Heya niha Eric Fylkeson deh pirtûkên helbestan çap kirine. Pirtûka wî ya pêşî di sala 1973'an de bi navê "Zarok û Şer" di nav weşanên Poesî de derketiye. Ya dawî jî bi navê "33 helbest" di sala 1986'an de di nav weşanên Wahlström û Widstrand de derket.

Ji salên 1973 heya 1988'an wî xwedî û berpirsiyariya sê kovarêñ edebî bi navê "Feber", "Janus" û "I Minne" kiriye. Wî bi navê weşanxaneya xwe "Janus" jî li ser hev 70 pirtûk çap kirine.

Di van salên dawî de jî wî bi navê "antolojiya dengan" ji dengê 33 helbestkarêñ Swêdê yên herî navdar sêlik û kaset weşandine.



Eric FYLKESON

Eric Fylkeson hate seredana NÛDEM'ê û behsa tecrubeyêñ xwe yên salan kir. Me jî bi vê munasebetê du helbestên wî yên kurt wergerandin kurdî û pêşkêşî xwendevanêñ kurd dikan.

## XORTANÎ

Di xaniyê min yê zaroktiyê de  
Deriyek hebû  
Deriyekî ku min qet ferq nekiribû.  
Tu di wî derî re çû

Tu li dor hemû masan rûnişt li kafetaryakê  
Ez li dor wan zîvirîm  
Û min kir ku tu winda bibî.

Hertim gava rê vala ne  
Ez bawer im ku tu tê re çûyî  
Rê hertim vala ne.

## BARAN

Pêşî tarîtî hat  
Bi barana pêşî ya tebaxê re, paşê  
ez li wir dirêjkirî mam  
di hernêza xewnan de, bêdeng  
sibeh hat  
tiştek negot.

---

*Amadekirin û werger ji aliyê F. Cewerî ve hatiye kirin*

# ÇIROKA JIYANA MIN

## Xelîl DIHOKÎ



**D**i sala 1951'ê de ez li bajarê Dihokê, li Kurdistana başûr ji dayik bûme, min seretayî û navincî li wî bajarî xwendîye û her zû dest bi karî kiriye. Di cenga cîhaniya duyê de, pîr kurd ji deverên Kurdistana bakur derketin. Hingî kes û karê diya min jî gihane Dihokê. Di wan salan de diya min- Canê - mêt kir. Lê dema şer bi dawî hatî, kes û kar vege-riyane Şîrnexê, lê ji ber ku zarokên diya min hebûn, wê dest ji me berneda û tenê li xerîbiyê ma. Diya min, wê jina xweragir û pîr jêhatî, êdi nekarî kes û karên xwe bibîne, lewra ji xerîbiyên wan çiya, nihal û bexçên Şîrmâxê, berdewam ji me zarakan re çîrok, stiran û ser-hatiyên folklorîk digotin. Bi rastî jî ew gencîneke zérin e. Belê; hingê evîna welatî û ya folklora kurdî kete kûratiya dilê min. Her wesa ez mîvanê pirraniya rûniştin û Şeverokên taxa me bûm.

Min her ji zaroktiyê stiran û çîrokên fol-klorî dinivîsin û ji ber dikirin, pîrrê caran min bi şev ji hevalan re digotin. Lê mixabin xwen-din û nivîsin li devera me Behdinan, bi zimanê erebî bû, lewra me çi zimanê kurdî nedizanî. Me carna navê Cizîrî, Xanî, Feqiyê Teyra û Cegerxwîn ji devê mela û pîremêran dibihîst.

Dema mîletê kurd di sala 1970'ê de, bi xwîna hezaran şehîdan hinek mafê xwe wergir-tin, ji nûxwendîna kurdî-ew jî bi kurmanciya jêrî ( soranî ) - destpêkir. Lê hingê azadiyeke ji dil li seranseri Kurdistana başûr peyda bû û bizava edebî û çandeyî pêşde çû. Min jî di sala 1970'ê de , dest bi nivîsına helbestan kir û ya yekê di sala 1972'an de di rojnama Hewkarî de belav kir. Di wan çar salan de ( 1970-1974 ), min di pirraniya aheng û mîhrecanan de, hel-bestên şoresgerî pêşkêş dikirin û di rojname û kovarên kurdî de belav dikirin. Lê di buhaba 1974'an de disan şer di navbera milletî û faşîstên Iraqê de destpêkir. Hingê pirraniya nivîskar û ronakbîrê kurd - ku ez ji yek ji wan bûm- gihane rêzen şoreşê û ber bi deverên rizgarkirî çûn. Helbet di wê demê de şores pîr germ bûbû û me ji radyoya şoreşê ku ez li wê derê dixebitîm- helbest û nivîsinê xwe pêşkêş dikirin û bi pênişen xwe şerê dijmini dikir û serê mîletî jî bilind dikir. Lê sed mixa-bin di meha adara sala 1975'an de şoresa me ji nav çû. Mîlet jî tera û bera bû û kesî hay ji kesî nema. Şeva faşîzmê jî bi ser mîletî de hat. Hat û terr û hişk şewitandin. Hingê disan pirraniya nivîskaran, ji neçarî vege-riyan ber destêni dijminê hov. Lê nivîskaran pênuşa xwe

neavêtin û li ser xebatê berdewam bûn û bi bâweriya min hingê edebiyat bêtir pêşde çû.

Her ji sala 1973'an bûme endamê yekîtiya nivîskarên kurd. Min helbest, kurteçirok, vekolin û babetên edebî di pirriya rojname û kovarên kurdî de, çi li nav kurdistanê û çi li derveyî Kurdistanê belav kirin. Endamê desteka rêvebera ( redakson ) çendin kovarê kurd bûm û niha jî ez endamê komîta kargêr a Yekîtiya Nivîskarên kurd li Swêdê me.

Zulim û stema dijmin cardin ez neçar kirim ku ez di sala 1982'an birevîm û bigihêm hêzên şoresa kurdî. Lê rewşa siyasiya aloza Kurdistanê ez neçar kirim ku di sala 1987'an bigihême welatê xerîbiyê, Swêdê.

Berhemên min yên çapkirî heta niha ev in:

1. Di sala 1982'an de diwaneke helbestan bi navê " Te çi viya û min ne anî" hatiye çapkirin.

2. Di sala 1983'an de pirtûkeke bi navê " Leheng" vekolînek li ser kurteçiroka kurdî, hatiye çapkirin.

3. Di sala 1988'an de diwanek helbestan bi navê " Gaziyek ji cergê Asya" hatiye çapkirin.

4. Di sala 1990'ı de diwaneke helbestan bi navê " Min digot û te vedigêra", hatiye çapkirin.

5. Di sala 1990'ı de diwaneke helbestan bi zimanê kurdî û swêdî bi navê " Ragirtin" hatiye çapkirin.

Berhemên amade ji bo çapê:

1. Helbesta kurdî ya hevçerx. Cildê yekê û yê duyê, nêzîki nehsed rûpelan e.

2. Kurteçiroka hevçerx ya kurdî. Nêzîki pêncsed rûpelan e.

3. Jimareke kurteçirokên min hene.

4. Çendin vekolinê edebî min li ser babetên cihê nivisine.

Ez hêvîdar im ku min bersiva kovara NÜDEM'ê dabit.

Her bijîn û ber bi pêş de herin.

Swêd, 6.10. 1992

# HEVPEYVÎN

**P**işti sala 1980'ê, carna çîrokên Fazil Umer Salih di kovar û rojnameyên kurdi de, li Kurdistanâ Iraqê dihatin belavkirin. Ew ji kariye bi çîrokên xwe bête qada edebiyata kurdi. Mixabin wî ci li ser jiyana xwe ji me re negandiye, lê bi tenê em dizanîn ku ew li nexweşxanêner deverê doktor e. ci pirtûkên wî nehatine çapkirin, lê wî çîrok mişe hene. Me ev hevpeyvîna digel kiriye û me çîrokek wî ji ji tipêr erebi wergerandiye tipêr latîni. Em hêvidar in qulaçeha edebiyata kurdi pirkin.

**Xelil Dihokî:** Kengî û ji bo ci te dest bi nivîsinê kiriye ?

**Fazil Umer Salih:** Di salêن heftêyî de min dest bi nivîsinê kiriye, lê ez destpêka xwe ya dirust di salêن heyştêyan da dibînim. Bi hizra min kêm hene wek ku destpêk biza-nin kanê ji bo ci dinivîsin, lê hêvî ew e niha-bizanin ji ber ci dinivîsin.

**X.D:** Barê edebê kurdi evro çawa ye? Hel-best, çîrok, rexne...

**U.S:** Nivîserên li derveyî Kurdistanê, bi hizra min du cor in. Yek ji Kurdistanê reviyî ye ji bo xoşiyê û ev kesana bawer nakim, ne ji xwe razî bin, ne ji rojekê qenciyek ji wan çê be. Desteka din, ku ji kawdanêner berteng û aloz cihê xwe guhastiye û deron û canêner wan hêj li Kurdistan e.

Evana cihê rêz û qedirgirtinê ne û çavên me li xamêner wan e. Pêdiviya nivîserên dervey Kurdistanê evan karan biken. Li ser kurd û Kurdistanê bi wan zimanêni biyanî binivîsin. Li ser dîroka Kurdistanê binivîsin, ji ber ku jêder û azadî berfirehtir e. Bo me awa û terzêner nû yên torê biyanî wergerin. Binkarê ferhenga kur-diya danin.

**X.D:** Tu bi ci mijûl i û projêne te ci ne?

**U.S:** Ez niha piçekî bi zimanî ve mijûl im û meha çûyi min semînerek li jêr navê ( Vavartin û gogirandina zimanê nivîsinê ) li binkê Yekitiya Nivîskaran pêşkêş kir. Heke delive kete min, dê li gel hinek nivîsinêner xwe yên destxet çap kem.

**X.D:** Di vî kawdanî xerab de , dewrê edebê kurd ciye?

**U.S:** Pêdivîye torevan cirayê gelan be, lê mixabin pirraniya me barê li ser milê xwe ni-zanîn!

**X.D:** Edebê biyanî ci kartêkirin li edebê kurdi kiriye?

**U.S:** Wek Nilata dibêje: Mirov yan çav li siroştê dike yan ji çav li çavlêkerê duwê dike, lew afirandin û çavlêkirin herdu bi hev re dijîn.

# DUBARE MIRAR BÛNE

Fazil Umer SALIH

**L**i cîhanek vala, mêzeyek avedan bû,  
teqin û şeqin diçû ber asmanî.

- Bi dehîn e.
- Bi pazdin e û me ji xelkî bibûrîne.
- Bi dehîn e û bi xelkê re bigihîne.
- Du cihar û çi de qewmît bila bîqewmît.

Dinya di çavêن wî da wegera, adarîk û  
nîsanîk keftin nîhal û betenan, nêrgiz di latan  
de ges bûn, bêhna behîstê dinya vegirt, dest  
havete duşesê , destê xwe bilind kir û jor da  
berda xwarê û vêra digot:

- Bi bîstîne û serê van herdu xişîma  
biçemîne!

Dema destê wî yê giran gehîste mêtê,  
destê wî di nav da çû xwarê û mêtê pirtikî, her  
polek bi rexekî ve firî...û ji xewê veciniqî.  
Navê Xodê ïna, rûnişt, bawişkek hatê û bi  
xavî li demjimêrê nêri, serê wî hind giran bû,  
hizir kir demjimêr xelet e. Viya paldet ve, lê  
dergeh vebû û dayka wî hate jor, kirasê tebisi  
û fistanê şîn ode li ber çava şîn kir. Berê xwe  
da lewendiyên dayka xwe û bawişkî ïna xwe.

- Dê çi key?
- Ma xelk çi diken?
- Têşta xwe dixon, hizra iş û karên xwe  
diken, berê xwe diden dinyayê, çi heye, çi

nîne.

- Tu nabêjî dê çi hebit? Erd; girover e û  
her dê mînit girover. Her sal carekê li dû rojê  
dizivirit û rojê carekê li dû xwe. Her ro roj ji  
rojhilatî derdikeyit û li rojava winda dibit.

- Bes dawo jiyê me pê dibûrit!

Gotina dayka wî, tirarek tezi bû û diruşt  
ji xewê rakir. Di dilê xwe de got: çi qewimî  
ye? çi caran hîzrê dayka min ji dergehê aşxanê  
ne dikeftin, iro her tiştek qewimî ye;

- Rast bêje, te vê spêdê çibihîstiye?

Dayka wî bişkûrî û bi dilgeşî bersiva wî  
da.

- Radyoyê got: Emerîkey balafirek  
çêkiriye, dê pê çine asmanî û vegeerin... Min jî  
hizra te û wan dikir.

- Vêca daykê vegeerin, venegerin, bizivî-  
rin, stu lê bişkên... Tu nabêjî me çi jê ye?  
Bapirê min bi kerdişkîlî dibezi û bi sîmerxê  
difirî. Ez bi du lingan dibezi û bi du çingilan  
difirim... ( Herdu desten xwe wekî qurtê li ser  
kelexî) min got ka çi qewimî ye.

Piştî hingê qewîna taştê lêdan û dema ji  
dayka xwe pirsi, kanê Siyapoş hatîye yan ne,  
dayka wî axînkek rahêla û dergeft. Rabû ser  
xwe, çavên xwe şuştin û ji serşükê derkeft,  
lêvek xewliyê li ser milê çepê bû û bi lêva dî  
rûyê xwe ziwa dikir. Zengilê lê da û xoşka wî

dergeh vekir, dengê Siyapoş hatê.

- Rostem ji xew rabûye yan na?
- Fermo, yê çavêt xwe dişût.

Rostem gazi kirê: Ha eha ez hatim. Xîret nekir sentor û pentora li ber xwe biket, ne dûre da porçika xwe şe neket. Şelwalek ji dîwarî vekir û qemîsê reş kirine ber xwe, tilên xwe kirine şe û bi rê ket.

- Min iro bo wan sond xwariye, bifire ber perê asmanî ji me neben!

- Ez nizanim çawanê ew herdu xişim ji me diben! Şeşê ji pêncê cuda nakin! Ez hizir dikem dorandina me ji zanîna me ye.

- Ji bîr neke domîne bext e. Ma heker hercar çar civît bo te hatin dê ci key? Ji bîr neke heger ew ê di gel te biket xişim bit, te ji xişim diket!

Vê dan û standinê herdu gihandin ber pêpeliskên gazinoyê, Rostem gava xwe havête ser peyiska yekê û li Siyapoş zîvirf û got:

- İro ez dê li ser destê Serdar bim

Siyapoş bi çavên gomanî lê nêri û herdu bi sîlal keftin. Dema gehîştine jor, ji qulan-cekê du dest ji nav dûkelê bilind bûn û herdiwa rûkirê.

- çiye hûn şevê dî li vir nivistibûn?

- Dê were! Em xewa spêdê ji xwe dipeyin da cîhekî bo axey bigirîn, hêj ew neraziye!

- Dirêj neke û me ber minet neke... Gazî çar şîşkên cergî bike û panka destê xwe bialise!

Ser mîze bo qada şer û cengan. Dubare mir, dubarê deh xwarin. Duşes bo aznîf, duşes mir. Du şes ma destê wî da, duciharê deh xwarin. Hepîyek hate kuştin...

Êvar bû dema gehîştîye mal, ji Hilwazê pîrsî kanê firavîn çiye? Dema gotiyê: Te çi divêt ? Got: çayek wek ya mirova!

Xwe palda ser textî û herdu destêne xwe têkdan û danîn ber serê xwe. Ewî jî nezanî çewanê kûlîç û heval hatin bîrê û xewna Serdarî dîtî, bişkurînek êxiste rûyê wî; min û Rostem dumîne dikir, hindî me dikir min jê dibir, Rostem ji qehrîn xwe da pîlek havêt li stûna xanî da û heraft... Avahî bi ser êk da hilweşya. Ez mame li ser kursîka xwe û bi kenî ve min digot: Tu ci dikey dê ji te bim! Tu ci dikey dê ji te bim!

Dema xoşka wî dergeh vekirî û çay bo ïnay, Rostem di xew çûbû û ew bişkurîn hêj li ser lêvan bû.

Destek mezin ew dîmen ji mêjîyê wî malî û dîmenek dî nîşa da. Pil ji asmanî dîbarîn, hemî dubare bûn, Ehrîmen li ser heyyê rûniştibû, pên wî li ser erdî bûn. Pêyek li ava deryayê dida û ê dî li çiyay dida. Pil li stêran didan û Ehrîmenî diqijand: Dubare, dubare...

Paşê Rostem xwe di odayekê de dît, dîwar dubare bûn, erd zendorek bêbin bû, banî dubareyek dihate xwarê, Ehrîmen lê siwar bû û dihajot... Jor da wekî birûskê dihat, hindî Rostem hate xwe ku birevit, berhingarbit yan xwe ve det neşîya... Dubare vî mejîyê wî yê şîşe keft û pirtikand. Û taristanek bê domahîk lê pê xwe hişt.

Nîneva, 1984.

# HEVPEYVÎNEK

## BI MAMOSTA HAFÎ QAZÎ RE

### Redvar MIZÛRÎ

**R**ojnamevan û xebatkarê hêja mamosta Hafiz Qazî li sala 1929'an, li bajare Dihokê hatiye dinyayê. Li danişgeha Bexda, beşa aborî xwendîye. Li sala 1957'an berpirsyarê kovara "Hiwa" bûye. Li sala 1960'ı kovara Ronahî li Bexdayê dexistiye. Kovara Ronahî, yekem kovar bû bi zimanê kurdî-kirmanjiya jorî-derkefi li Iraqê. Li ser xebata xwe ya ji bo azadiya Kurdistanê sê caran hatiye zîndankirin, li salên 1966, 1967, 1969. Niha ew penahendeye li Austurya. Li ser daxwaza heval Mueyed Teyib min ev hevpeyvîne digel kir ji bo xwendevanê kovara NÜDEM.

**Revdar MIZÛRÎ:** *Xebata we digei peyva kurdî bi ci rê hate dest pê kirin?*

**Hafî QAZÎ:** Destpêka têkeliya min digel peyva kurdî bi riya rojnamegeriyê bû, ew ji sala 1957'an bû dema ez bûyme berpirsyarê kovara "Hiwa".

**R.M:** *Mamosta, pa kovara Rohnî çawa hate rohniyê?*

**H.Q:** Suhbeta jidayikbûna Ronahiyê ya dirêj e! Sed kibare li serê minara me bo kirin, hata ferec hatî û dinya rohn ditû. Piştî serkeftina şoreşa sala 1958'an, rê hate dan bo derkeftina belavokêñ kurdî. Hingê ez berpirsiyarê kovara Hiwa bûm. Min bi çakîzanî wê delîv ji dest xo nekem û daxwaza imtiyaza kovareke



*H. Qazî*

dî bikem bi navê Ronahî, serek zimanê wê zarê kirmancî bit, çunke me wê demê ci belavok bi wê diyalêktê nebûn.

Wezîrê rêberiyê wî demî kurd bû û yê niyas bû û wezareta wî berpirsiyara dana imtiyazê bû. Min daxwaza imtiyazê pêşkêş kir lê ci bersiv nedane min. Carekê min wezîr dît û gazinde jê kirin. Lê sed sond xwarin û got: Ne bi destê min e bi destê hakimê eskeriye! Roja duwê min sohbeta xo û wezîrê kurd bo Barzaniyê nemir kir. Pêşeway destê xo bilind kire gerdena xo û kerem kir: Ez dê kak Fuad Arifi ji stukurkê xendiqînim, çewa imtiyaz hinde gîro kirye.

Ez 19 meha mame li hîviya kakê wezîr, heta wezîrekê erebê dust hate şûnê. Ez çûme pîrozbahiya wezîrî û bi nîv saetê anku hêşta ez li dev imtiyaza kovarê da min. Bi vî rengî kovara Ronahiyê li meha 10 sala 1961'ê çavêن xwe vekirin û kete qada rojnamegeriya kurdi.

**R.M:** *Mamosta, astengên ku keftîne di rîya derçûna Ronahiyê da ci bûn û xwendevana bi ci awayî lê mèze dikir?*

**H.Q:** Serê rojê hinde biradera bawer nedîkir ku kovareke kirmancî dê şêt-karit- ciyê xwe di nava xwendevanan de peyda ket. Bo nimûne, berî derçûna kovarê ez li mala seydayê rehmetî Refîq Hilmî rûnişti bûm. Pişti Seyday zanî min înyeta kirî kovareke dî derkem, keyfa xwe derbirî û pîrozbahiya min kir. Biraderekî muhendis li wêrê bû, hêris kire ser min û wesa diyar kir ku ev piroje her ji nuke yê serneketiye û karekî pûce!

Seydayê rehmetî gotê: "Erê bira! Ta êsta carêk şitêk le kovarêk yan rojnameyêk nûsite? Biraderî got: "Ne xêr mamosta!". Seyday gotê: "Ê kuri bawkim! Eger xot ta êsta bo milleteket hîçit nekirdibê, bo waz le xelk nahêni şitêk bo mîlleteke bikat? Hindeka bi vî rengîberê xo dikire derçûna Ronahiyê. Ji bili hindê jî çapemaniya kurdi wî çaxî û bi taybeti li Bexda ne ya bi sanahî bû. çapxane ji rengê kevin bûn, karkerêñ çapxanan ereb bûn, nedizanîn tîpêñ kurdi danine berhev. Divya xudan li ser serê wan ba dema tîp didanan û rêz diki- rin. Her çapemaniyeke diviya pişta xo bi şiyâni û imkanen yên taybeti gerim bikira. Harîkarî di binî re nebû. Xwendevan kêm bûn û nivîskar hêşta kêmtir.

Lê pişti derçûna du hejmara xwendevan pir bûn. Nameyêt pîrozbahiyyê jî hemî aliya ve hatin. Nexusme nameyêt rehmetî Kamiran Be-

dirxan Beg û profesor Qanatê Kurdo û birayê hêja Ismet Şerif Wanlı. Ev name handerek bû ez paldam hêj micidit bibim li ser wê dozê û destan ji derkirina kovarê bernedem. Lê pişti rewşa siyasi hatiye guherîn û hukumeta Baas hakim wergirtû sala 1963'an kovar qedexe kirin û gelek xwendevanen wê girtin û azar dan.

**R.M:** *Ew kesên ku di Ronahiyê de dinivîsin kî bûn? Li ser ci babet dinivîsin?*

**H.Q:** Hejmareke seyda bi hemî şiyân û karina xwe destê harîkariyê bo min dirêj kirin wekî, Mela Enwer Maî, Hejar Mukriyanî, Dr Sadiq Etroşî, Cegerxwîn, Salih Yosifi, Qedîri Can, Qanatê Kurdo, Sadiq Behaeddin û gelekêñ dî.

Babetê nivîsinê jî petir edebiyat û ziman bû, lê nivîsarên gişî jî cih digirt. Ji wan yên ku xwe gelek diwestandin Seydayê rehmetî Hejar Mukruyanî û Tehsîn Ehmed Begê Berwarî bûn

**R.M:** *Mamosta tu berpirsiyarê du kovaran bûy, aya her du bi yek wext derdiketin?*

**H.Q:** Belê ez berpirsiyarê herdu kovaran bûm. Ji sala 1957'an ez berpirsiyarê kovara Hîwa bûm lê pişti min icaza kovara Ronahî wergirtî êdî çê nedibû ez berpirsiyarê du kovaran bim, lewra min berpirsiyariya Hîwa ji sala 1960'ı da hevalê xoştîvî Doktor Haşim Duxremeçî.

**R.M:** *Aya rojnamegeriya kurdi mafê mamosta Hafî Qazi dayê?*

**H.Q:** Li gel şiyana xo rojnamegeriya kurdi texsîri di derheqê min da kiriye. Her dem navê min yê ïnay û hevpeyvîn yê digel min kirin. Vê dawiyê rojnameya Kurdistanî Nwê şehyanek gêra û kevne kevne rojnamevanê kurd xelat kirin wek seyda İbrahîm Ehmed, Seîd Nakam û ez. Mixabin ez li wêrê nebûm lê kiça min bi pêş min ve amade bûbû û xelat wergirt.

# GERREK AGAHÎ

## LI CİGEHÊN HUNERA KURDÎ YÊN KEVIN (2)

### Dilower MÊQERÎ

Jî nûve hişê min vedigere havîna sala 1986'an û wan rojênu ku min ew li çiyayê kurmênc ( Kurddax ) derbas kiribûn û vedigere hevrêtiya li gel wan hevalên hunermend, ya ji Helebê ta Efrînê. Ji Efrînê vegera me ya bi hev re li nik rêtêz otomobilan, ta gihîştina gundê Meşelê ( Li ser riya Helebê nêzî Kefer Canê ). Li wira em amadeyî şahiya kurrê muxtêr bûn.

Serhatiyek yewnanî dibêje; eger tu bixwîzî şêhîrvaniya mîletekî binasî, pêwîst e tu li merdbûna mazûbanan û azadiya jinêni wî mîlefî temaşe bikî. Mirov jî di şahîyen kurdan de dihingive van herdu tiştan. Weke ku hevalê me yê hunermend Bilind Mella, li Dirbêsiyê û Qamişlî guhdarên xwe serdar û matmayî kiribûn; wisa jî li meşelê bi çend ahengên klasikî yê muzîka kurdî guhdar surdar bûbûn. Ew muzîka ku wê şevê li ser orgê ji tiliyên wî diherikî.

Em dizîvirin Efrînê û em endamên koma muzîka li vir dihêlin. Ez û Bilind berê xwe didin seredana hevalekî ji gundê Basûta; xweşiktirîn havîngehên Kurddaxê û seyrangeha gelêri ya xelkê Helebê. Basûta... Xwedaya meyê werzan e. Xwe bi ser newala rûbarê Efrînê yê efsanewî de, daqûl kiriye. Min jî xwe li gel şaxêñ darêñ hinarê û lavlavkan bi ser de daqûl kir. Wê gavê spehişbûnên wê newalê yê xurustî yênu ku bi tava rokê gurr dibûn. Hûmêñ giranî yênu bi sîber û dagirtî bi bîna rihanen, bîyêñ pozpilind li ser reva rûbar, spîndarêñ ku alêñ xwe bi ser wêneyê de raxisibûn û bayê zelal ê ku xwendina bilbilan hil-

girtibû.

Nêzî vê newala mezin, çend kîlemetran ji Basûta, gundê Êndara bi cî dibe. Ez bi xwe navê wê yê kevnar çêtir dibînim. " Kaniya Dara" ku belkî angoya wê bi kurdî ev be; ew darêñ hevgirtî yênu ku bi şax û perrêñ xwe wê ava zelal bi sîber dikin. Bê guman mirov nikare li vira vî tişî bi salixdan bike. Ji ber ku mebesta me ji vê nivîsê ne kanî û darêñ spehî ne; bi qasî ku ew girê rût yê ku li bakurî gund dikeve. Bi rastî jî Êndara ne bi kaniya xwe hatiye nasîn, lê bi girê xwe yê ku pêgehnasan gelek çikîn arkeoloji tê de ditin.

Hemû desthilatdar di vê navçeyê re derbas bûne. Weke Gilgamêş, Aşûrbanîbal, Dara, İskender û Roman û ta Erebêñ misilman. Tiştekî seyr di vir de nîne; ji ber ku dergehê Asya kevnar li bakurî vê herêmê bû " Derbendan Bilan" a navdar bû. Ku dirokzan dibêjin ev derbend kevintirîn rêçen cîhanê ne. Hemû desthilatdar dixwest vê herêmê ( Kurddaxê ) di dest xwe xînin. Ev herêma ku hevalekî ji Kurdistana başûr ji min re digot; ji welatê me xweşiktir e, di gel ku hin welatê me dikin wek Swîsreyê!

Eger dirokzan dibêjin ku kevintirîn rêç li cîhanê li vê herêmê ye; ka em temaşe bikin bê arkeoloji li ser girê Kaniya Dara yê navdar re ci dibêjin ?

### Kaniya Dara

Weke pirrê caran ku bi awayê li hevhatinê

gelek gir hatine nasîn. Wisa jî li gora Kaniya Dara: Biharâ 1954'an, Livanek li nêçîra roviyekî dixebite. Di qula rovi de serê şerekî ji baziltê dibîne. Di cih de arkeolojî berê xwe dide Girê Kaniya Dara ta bide diyar kirin, ku ev heykel ji eynî babeta wan şerîn mezin e yê ku dergehêñ şar û koşeyên Hûrî û Hîtîyan, di-xemiland (di nîva sedsla bîsta, berya zayinê). Cîgehê girê Kaniya Dara, ew bi xwe girekî mezin e. Du besen xweş zelal ji mirovan têñ xuyanîkirin: A yekem, beşekî nizim dibe ku taxa gelêri be. A duwem, beşekî biçük û bilind, 22 metran bi ser beşa yekem dikeve; û dibe ku taxa qiral be. Diyar e ku di serdemên kevnar de, sûrekî mezin ji kevir û kelpêçan bajar dorpêç dikir û ew ji êrişan diparast. Di wê sûre de dergehêñ bi bire hebûn.

Taxa qiral li kuça başûr ya rojavayî gir diket. Banêñ vê taxê pirr tûj û serberjêr in. Ji ber ku şerê li kontara rojhilat hatiye dîtin-loma hemû kolandinêñ arkeolojî li taxa qiralan hatibûn bi cih kirin; taybetî li beşa başûr ku lêgeran dixwest dergeha nêzîkî şér bibînin: Ji ber ku ew şerîn hanê di warê avahiyan de dihatin bikar anîn, pirrtir ji warê xweşikbûniyê an huneriyyê (Erîji cihekî din de vegerin vê xalê)

Ta payiza 1986'an, şes qatêñ avahiyan hatin nîşan kirin, ku li şér hatibûn danîn. Her şes qat vedigerin sedsaliya 16'an berya zayinê, ta sedsaliya 16'an piştî zayinê:

1- Qata yekem a nûjentir e. Vedigere dema ku Memalikan li Şam û Misrê hukum diki-rin.

2- Qata duwem; vedigere dema îslamî ya navîn. Ku komeleyek balkêş ji pelikêñ zérîn tê de ditine.

3- Qata sêyem; vedigere dema pêşin ya stemkariya ereban li ser vê herêmê. Ji qata duwem pirr ne cuda ye; tenê gundekî biçük ne balkêş e.

4- Qata çaran; vedigere dema paşmayêñ Îskender (serdema Selûkî: 330-64 B.Z.). Ku Kaniya Dara bajarekî mezin bû, bi sûreke gewre dorpêçkîrî bû û bi çend bircêñ parastinî hatibû piştgirtin. çend pelik û sewilkêñ biçük ên ji heriya sor, hatibûn ditin.

5- Qata pêncem; ku herêm ketibû bin destê Midîyan de (sedsala 7-4 B.Z.). Di vê qatê de çend şopêñ aramî (Suryaniyêñ kevin) hatin sergirtin, wek pûtêñ ji qafik û lîskên ji kîlê. Li gel çarkuceke kevirêñ ku ew ji qata şeşem hatine anîn.

6- Qata şeşem; Ev qat ji hemû qatêñ din giringtir û mezintir e. (Serdema Hûrî-Mitanî: nîva sedsla 20'an, B.Z.). Şerê baziltî ji vedigere vê qatê. Ev şér wekî kevirê kuncikê hatiye bikaranîn û çar jûran bi hevdu girê dide. Herçar jûre beşekê mezin e ji avahiya ku li hêla bakurî rojava ya taxê hatibû avakirin: Ev avahî di ferhenga arkeolojî de bi navê (



Çawçeka li ser selbendeke kevir ji Kaniya Dara (Wênexêx: D.M.)

Hilanî) tê bi nav kirin. Wekû mînakekê ji avahîgeha Hûrî-Mîtanî dide diyar kirin.

Berya dergeha avahiyê panaveke spehî ji kevirên şahîk xuyanî dike, mrov bi alfikariya mîrdewaneke kevirînî ku bi gûlî û şêrîn mezin xemilandiye, hildikişê avahiyê. Bi dû vê derbasgehê de lokaleke pêşwaziyê, forma wê lakêsiye, ya bi ban û gelek derbasgehan. Pêşıya wê hatiye dabeşkirin bi çend stûnan. Bi dû de lokala qiral û jûrê hawîrdor têni diyar kirin, diwarên wê pirtê caran bi tabloyan hatiye xemilandin. Ev tablo ji neqşen mirov, cinawer û gîha pêk têni, li gel çend pûtên cinaweran ku herdu layêن derbasgehê diparêzin. Qada vê lokalê bi qasî metreyekê ji qatê rûxistîgehê nizimtir e. Di vê lokalê de dergehê rûxistîgehê tê belû kirin, ku bi du şêrîn mezin hatiye parastin û eniya rûxistîgehê bi komeleyek şer ku li ser bingehhek kevirîn xemilandî bi gulyan, rûniştine. Di sînga perestgehê de çend bingeh belû dîbin, ji boyî danîna pûtên Yezdanan ku perestgeh bi taybefî ji boyî wan hatiye pê. Tişte ku vê perestgehê bêtir ji perestgehê Mezopotamya cuda dike ew e; wêneyên lingên girs yên ku li ber dergehê hundurîn de hatine kolandin, kû dirêjbûna wan 97 sm.û pehnibûn 35 sm e. Ev wêne bi alî hundur de xuya dikin: Tê bawer kirin ku ev ji nişana wê yekê ye ku mirov çawan derbaşî perestgehê dibe.

Berpîrsyârên resmî yên arkeolojîk li Sûriyê naxwazin şûnşopa dîrokî ya vê avahiyê bidin diyar kirin. Bahane hergav ew e ku lêkolîna wî kuta nekirine; digel ku dîroka sergirtina vê perestgehê vedigere sala 1954'an ??


Di dema dawî de ( sala 1986 ) li ser rûpelîn rojname û kovarêن Sûrî û erebî çend nivîsên resmî derçûne; didin diyar kirin ku ev avahî vedigere serdema aramî ( Samiyên kevi )... Xwedîyê vê bîr û baweriyê ji bîr dikin ku qata pêncem tenê çarkuçek biçûk ku bi dema Aramîyan girêdayî ye; digel ku kevirîn vê çarkuça biçûk ji avahîya qata şesem ( ya Hûrî-Mîtanî ) hatiye dizin: Weke raportên hinartên pêşin yên ku cîgeh dîtine, dibêjin.

Li muzexana Helebê ji Xwedaya Hûrî

(Shausheka ) ku Xwedaya evîn û cengê ye, ya ku di jûreyek perestgehê de wêneya wê hatiye dîtin; li muzexanê bi navê ( Ishtar ) hatiye nasandin?? Di gel ku ev Xwedaya han di wêneyê de, wekî Xwedaya Hûriyan rapêçayî ye û bi çek e ji. Li vira profesor A. Moortgat ( Temmuz, rûpel 224 ) dide xuyanî kirin ku ev Xwedaya bi çek nêzîkî ( çawçeka ) ye, ya ku di neqşen Kerkük de bi çek û bi bask tê diyar kirin. Li beramberî piştgirên ziyanê, wek ci-nawerên efsanewî û hovane, pêdariyê dike. Ev cinawer ji wêneya bingehî hatine bîrrin, ji ber ku wêne bi xwe şikestiye. Lî hebûna van ci-nawiran bi xurtî di girê Kaniya Dara de, rîberiyeke bi tûnd pêşkêş dike. Li gel ku navê vê Xwedayê bi zimanê hûri " çekdarê ye" û nêzîkî zimanê kurdi yê nûjen e ji ( çaw-çeka ): Navê wê pirr bi wêneya wê dikeve, belku di wêneyê de nîv çekdar e û nîva din endamên spehî yên laşê wê dide xuyanî kirin wek Xwedayeke evînê.

Tişte ku avahiyê dixîne çarçewa Hûrî-Mîtanî di dema geşbûna wê ya împaratori de; dîtina wan wêneyên Xwedayên çiyan e ( ya ku me di xeleka pêşin de şirove kiribû ) û çend kevirîn reweştê (kolayı) di minaka xêwên tirm (efritên) serteyr û çend eferîdeyên efsanewî yê tevlihev (gewde cinawir e û serî yê mirovan e); Ev ji ji sembolên çarçeva Ariyêñ-çiyayı, wek me di xeleka pêşin de li ser girê Tell Xwêra nivîsî bû.

Di dawî de em dixwazin li ser wê neqşâ pêşhatî ya li ser bingehekî ku Xwedayekî çiyayı li gel du mirovên tevlihev (mirov-ga) ji kevirê baziltî, bi bilindibûna 58sm ( Muze-xana helebê: wek Xwedayê çiya hatiye tesnîf kirin). Neqşen vê tabloyê ji neqşen girê Tell Helef, pirr ne cuda ne, ne tenê ji aliyê huner-mendiya xurt, lê ji aliyê çêtîrbûn û hostayiyê ve. Lewra Tell Helef û Kaniya Dara vedigerin herêma Hûrî-Mîtanî ya hunerî a ku hê di bin bandûreke xurt ji hêla çarçewa Ariyê-çiyayı de bû. Ev tişa mirov di cilêن pêladî yên ku Xwedan li xwe dike (bandûra Gûti), û tacâ bi quloç li serî (bandûra Kaşî). Li herdu ciyêن vî Xwedayê du gayêن rapêçayî, şipyâ rawestane.



*Qatên arkeoloji yên Girê Kaniya Dara (Wênexêx: D.M.)*

Her yek ji wan xwedî serekî merovî û bîrih e, bi du destêñ mirovî ku li jor hildayîne. Ev rewş di gelek wêneyên din de têñ xuyanî kirin wek hilgirêñ sembolî yên roka bi bask in ( Ev xweş di cîgehêñ Tell Helef û Kerkûkê de belû dibin). Lê belê ev tabloya Kaniya Dara di beşê xwe yê jorîn de hatiye râwestandin. Lewra guloka roka bi bask nayê diyar kirin.

Arkeolojîk dipirsin; ma gelo ev Xwedan û giyanêñ perestkar û cinawir, li vira wek hilgirêñ diwaran û avahiyê bi giştî, têñ jimartîn ? Ma gelo erkêñ wê tenê ji boyî avakirinê bû ? Ev ji rêzaniyek e ku avahiya girê Kaniya Dara li vê qatê, ji çarcewa hunerî ya Ariyên-çiyayı ye; ku kevirêñ reweştî yên wê hertim armancêñ avahiyê diparêze, pîrtir ji yên hunerî. Ev taybetbûn hergav û bi şûn de ligel hunera mîdî bû.

Ji alî din ve, em dibînin ku giyanêñ ziyanî kar ên wekû balandeyêñ goştxur ( hov ), li vira bi awakî tûj têñ xuyanî kirin. Ligel çend wêneyên mirovê-ga, ev wêneyê ku bi Mezopotamya hatine bandewarî kirin: Ev ji

rêzaniyek e ku hunera vê qatê, vedigere baweriyyêñ olî yên Ariyên-çiyayı ya nemir. Ya ku bi minaka pevcûna Xwedanê çiyan ku nûnerê xêrê ye, li gel van giyanêñ ku nûnerêñ ziyanêne. Ev ola arî hergav di hunera kurdî de ya kevnar, ta dawiya îmeratirya Midya mezin, bi awakî tûj tê diyar kirin.

Ev baweriya hunerî ya Ariyên-çiyayı em dê di pêşerojê de, di lêkolîneke taybetî de, amade bikin.

1. Anton Moortgat, *Temmuz, KILin 1949, wergera erebi, Şam, 1985*

2. A. Moortgat, *Die kuns des Alten Mesopotamien, KILin 1967, wergera erebi, Bexda 1974*

3. Ali Abû-Asaf, *Altsyrien, katalog, wergera erebi, Viyana 1985*

4. Hamido Hamede, *Tell Endara, rapport, kovara Al-Mathaf Al-Arabi, No2-1986, Kuweit*

5. Ali Qayim, *Tell Endara, rapport, rojnama Tichrin, 30.08.1986, Şam*

6. D. Mékeri, *Hepparuyek di lêkolîna sehirvaniya Kurdi ya kevin de ( Rojnama Gel: Lam 1989-1990*

# DI SİNEMA KURDÎ DE

## BÛYEREK NAVNETEWEYÎ:

### KILAMEK JI BO BEKO

#### Husêن DÜZEN

**Senaryo:** Nizamettin Ariç / Christine Kerlich

**Reji û muzik:** Nizamettin Ariç

**Kamera:** Thomas Mauch

**Montaj:** Gaby Vragge, Susann Lahaye û Kerstin Kaxel

**Deng:** Ernst Marell

**Birêvebirê Produksyonê:** Margarita Woskanian

**Redaksiyon:** Joachim Von Mengershau sen

Hunermendê kurd Nizamettin Ariç heta niha bi muzik û kilamên xwe di nava kurdan de dihate naskirin. Wî îsal wek rejisor bi filmê xwe yê yekemîn gavek din avêt; xwe bi dinyayê weke hunermendekî kurd yê navnete weyi da naskirin. Filmê wî yê bi navê "Kilamek ji bo Beko" bi kurdî ye. Film bi reng e û sed deqiqe ye. Ew li Ermenistanê û bajarên Almanya Berlin û Hamburgê hatiye kişandin. Teknika film ermeniyan û almanan girtine ser xwe. Heta niha şes festivalên filman ew dawet kirine. Di festîvala Hamburgê de (30.90.-04.10.92) ji nav sed filman "Kilamek ji bo Beko" sê caran hate nîşandan. Di bernama festivalê de ji bo wî weha hatibû nivîsandin:

"Filmê Kilamek ji bo Beko" di qeweta wêneyên xwe yên poetik de filmên Yilmaz Güney tîne bîra mirov.

Di festîvala filmê navnete weyi li Venedikê (07-08.09.92) du xelat girtin: Xelatek stand, ji bo ku ew filmê biyanî yê başdırın yê 1992 hate hilbijartın. Jê pê ve wî xelata Kodakê di festîvala Venedikê de girt. Rojnamevana İtalyanî Roberta Chiti piştî festivalê di rojnameya L'Unita de dibêje: "Gelo sedem ew çiyayên sar û bilind bûn, ku mirov bêî wan ditibe bêrya wan dike, yan civîna bi xelkekî re bû ku hew car caran di nûçeyên rojnameyan de derdikeye ku ew disa hindiktir dibe, yan jî sebeb qeweta sewta zimanekî bû, ku ew hetanî niha qet di sînemayê de nehatibû bihistin.

Ya rastî ew e ku temâşevan di vê festîvala filman de ji bo "Kilamek ji bo Beko" ji gelek filman bêtir li çepikan xistin. Deh deqiqeyên çepiklêdanê rejisorê ku ecêbmayî mabû û gurûba wî ya biçûk mecbûr kîrin ku ew çend caran li cihê xwe rawestin, berî ew karîbin salonê terk bikin. ( L' Unita, 09.09.92 )

Di filmê "Kilamek ji bo Beko" de serpêhatiyên kurdeki bi navê Beko têv vegotin: Beko ji Kurdistana Tirkîyê ye. Piştî birayê wî Cemal ji eskeriyê direve, Beko dikeve rê da ku



li birayê xwe bigere. Ew bi sobaniyan di ser çemê Firatê re derbasî binya xetê (Sûriyê) dibe. Lê li wir ew birayê xwe Cemal nabîne. Ji bo ku Beko dizane ku Cemal dixwast biçe Kurdistanâ Iraqê, ew ji Sûrî dere wê derê. Lê ew li Kurdistanâ Iraqê jî pêrgî birayê xwe nabe. Beko tev êlek koçeran dibe. Wê demê şerê Îran û Iraqê jî li dar e. Gelek gundiyên der û dorê yên ku malên wan bi bomban hatibûn hilweşandin jî li cem koçeran bi star bûne. Beko demekê bi hêviya belkî xeberek ji birayê wî bê li wir dimîne. Di navbera Beko û zarokêni li wir dijîn de dan û standin çêdibe. Beko û keçika sêwî Zinê baş hogirî hev dibin.

Piştî şer di sala 1988'an de radiweste, gundiyên gundekî nêzik yên ku malên wan bi bomban xera bûbûn û reviyabûn cem koçeran dixwazin vejerin gundê xwe, bi hêviya ku jê pê ve li wir di aşîtiyê de bijin. Zinê ji Beko tika dike ku ew bi wan re here gund. Bekoyê ku hîn jî ji birayê xwe tu tişt nebihîstiye, bi Zinê û bi zarokêni din re diçe gundê wan. Ew hemû bi hev re dest pê dikin, xaniyekî xerabe dîsa ava dikin.

Lê Seddamê xwînrêj ranaweste: Adinî rojê balafirêن Iraqê bombeyên jehrê bera ser gundê wan didin. Kesek ji Beko û Zinê birîndar pê ve li gund sax namîne. Ew jî ber bi tixûbê Îranê

ve diçin. Beko Zinê dibe Ewrûpa ji bo li serbijjîkên wir wê rehet bike. Li Almanya Beko dikeve xaniyekî penaberan Zîna ku çavên wê jî kor bûne divê di nexweşxaneyekê de bimîne.

Dawiyê Beko dibihîze ku birayê wî Cemîl li Tirkîyê hatiye girtin, ew dîsa birine eskeriyê û di êrîşek eskerên tirk ku dîbin ser kurdan de Cemal bi gullêن kurdan hatiye kuştin. Hemû hêviyên Beko dişikêni, bes Zinê jê re dimîne.

Çiroka film ji perspektîva Beko yê ku ketiye rîwîtiyek ne diyar û tijî xeter, hatiye qalkirin. Bingeşa babeta film zulma Seddam ya sala 1988 li ser kurdan e.

### Nizamettin Ariç kî ye?

Gava mirov cara pêşî wî dîbîne, bêdengiya wî bala mirov dikişîne. Tu şopa qurretiyîn hozanekî yan jî leyistvanekî sinemayê li ser wî nîn in. Bêhnikâ ewil intiba kesekî introversiv li ser mirov dihêle. Lê pişt re awirêن wî yên tije hîs û zanebûna xwe şanî didin. Gava ew dimizice spîbûna diranê wî yên wek berfê û jîrîti û dilovaniyê wî direşînin der û dorê dîbin yek. Wê gavê mirov têdigîhîje ku ew hunermendekî ne bi tenê bi mîjiyê xwe difikire. Pir nakişîne dewlemen-diya pêjn û dinya wî ya hundur derdi Kevin

pêş. Û gava kes û dera ew lê ye bi dilê wî bin, ew dest bi sohbet û henekan dike.

Nîzamettîn hunermendekî hem jîr, hem jî hisî ye. Ji bo wî bingehê hunermendiyê "Kûrîtî û dewlemendiya hundirê mirov e". "Ew giraniya xwe pir nadî derveyî mirov. "Hîs, xeyal û xewnên mirov" ji wî re ji dinya mirov ya derve gîringtir in. Gava bi hozantî derdikeve ser dikê pir nakişîne bêdengiyek xwe berdide ser guhdar û temaşevanan. Berî du salan gava di konserekê de N. Ariç dest bi programa xwe kir, hevalê min i alman ê ku li tenîşa min rûniştibû vege riya ser min û got: "Ew opera kurda ye, ne wisa?"

Nîzamettîn Ariç di sala 1956'an de li Agiriyê (Ararat) tê dinyayê. Hetanî 15 saliya xwe ew li wir diji. Pişt re mala wan tê Ankarê. Di navbera salên 1974-1980 de ew wek hozanekî di radyoyê Ankara, Stanbol û Îzmîrê de kilamên tîrkî dibêje. Ew di vê navê de wek listikvanê sereke di filmên "Bir günün hikayesi" (çîroka rojekê) û "Kurban Oldugum" (Ez bi qurban) de dileyize. Filmê "Bir günün hikayesi" di sala 1982'an de xelata yekemîn ya Hyêres distîne.

Ew hinek kilamên kurdi werdigerîne tîrkî û wan bi tîrkî dubêje. Pişti salan ew wê kirina xwe weha dibîne: "Tiştên min berê çedikir bêşexsiyetek bû. Bêşexsiyetek politîk û çandî"(1) Pişti sala 1980 guhertinek di jiyana Nîzamettîn Ariç de çedibe: "Divê min bîryara xwe bida; ya min ê kilam û çîrokên kurdi wergerandina tîrkî û min ê karyera xwe bidomanda, yan jî min ê cihê xwe li nik gelê xwe bigirta û min ê bi kurdi kilam bigotana"(2) Nîzamettîn Ariç riya duwemin girt, yanî riya rast û tijî dijwarî. Ji bo ku wî di konserên xwe de kilamên kurdi gotin, ew pişti cûnta leşkerî, 1980, hate girtin. Pişt re ji bo wî panzdeh sal ceza hepsê hate xwestin. Ew mecbûr ma ku welatê xwe terk bike. Ew jî wek gelek welatparêzên kurd di ser Sûriyê re

xwe digihîne Ewrûpa. Ev reva Nîzamettîn Ariç jî rîwîtiyek wek ya Beko ne diyar û tijî xeter bû. Wilo diyar e ku gellek ji hîs û serpêhatiyê rejisor yên wê rîwîtiyê ji filmê "Kilamek ji bo Beko" re bûne çavkanî. Ji sala 1980 vir de Nîzamettîn Ariç li Berlînê dijî. Van salê dawiyê di gelek projên muzik, film û tîyatroyê de kar kir.

Bi navê Feqiyê Teyran wî 9 kasetên muzikê çêkirin: " Ji cergî ez muzîka kurdi çedikim û vir de ez ji xwe bêtir ewle me...Di jiyana min ya demâ ku min muzîk bi gotinên tîrkî çedikirin û ya bi zimanê kurdi çedikim pir ferqek mezin heye." Ez û Nîzamettîn Ariç ji bo vê hevpeyvînê em hevdû li Frankfurtê li mala hevalekî dibînin. Sohbata me bi saetan dom dike. Sohbata me tenê bi kurdi ye. Pir kêm caran ku tiştek neyê bîra wî, ew gotinên almanî bi kar tîne. Mirov digot qey ew bi tîrkî nizane, yan jî wî sond xwariye, ku ew bi tîrkî deng neke. çend caran min xwest ez jê bipirsim: " Gelo pişti tu hatî derveyî welat, te çi re navê xwe kir Feqiyê Teyran?" Ji ber ku gelek kesan li cem min rexne ji bo vî navî li wî girtibûn. Lê min ew pirs jê nekir. Hate bîra min ku wî carekê di cihekî din de bersiva vê pirsê weha dabû: "Hinek nîvisen F. Teyran yên kevin û pir bi qîmet ketin destîn min. Evana di nav kurdan de wek helbestvan û hozanên din yên kevin nedihatîn naskirin. Jê pê ve di hoyê wê demê de ji min re navekî nû jî pêwîst bû. Di eslê xwe de min xwest Feqiyê Teyran bi rîka min belav bibe.(1)

Min baştır dît ku em bi "Kilama Beko" (Nîzamettîn di sohbata me de film bi vî awayî bi nav dikir) dest bi sohbata xwe bikin.

Ji ber tunebûna cih me hevpeyvîna bi Nîzamettîn Ariç re hişte hejmareke din.

1) M. Bayrak, *Kürt Halk Türküleri (Kilamên kurdi yên gelêri)* Ankara, 1992, r.81

2) Yeni Ülke, hej.43, 1992

# **NÜDEM FORUMA HEMÛ NIVİSKARAN E**

**Petra WURZEL**

**B**erî ku ez dest bi nameya xwe bikim, ez dixwazim we ji bo derxistina kovara NÜDEM'ê pîroz bikim.

Wextê ku kovara NÜDEM cara siftê ket destê min, kêfa min gelek pê hat. Lê divê ez çend xeberan ser zimanê wê bêjim, û di wê raman xwe da ez li bav û kalên we ji difikirim. Bav û kalên we, yên kû ji hemû keç û xortan çêtir bi kurmancî dizanin-û yên ku belkî bi nivî ji nivîsên rojname û kovaran fêm nakin...Kurdên ronakbîr ên ciwan iro dixwazin ku zimanê wan wekî zimanê ewrûpayî pêşva biçe, û da ku wê armanca xwe bînin cih, xeberên nû yên "saf kurdi" yan ji, wekî ku birayêن we yên soran dibêjin, "kurdiya patî" dixwazin. Lê ji bîr mekin, ku hûn li vir ne li welatê xwe ne, û heke gotinêن nû bêñ saz kirin ji, imkan di destê we da tune ku ew xeber nava kurdan belav bin, bigihin gund û bajârên Kurdistanê.

Îro piraniya ronakbîrêن kurd li deriveyî welêt dimînin. Yêñ ku man, gundi, karker, jin û zarok in-ew kesên ku bêñ alîkariya wan Kurdistan xelas nabe! Ez tehlûkekî mezin dibînim, wexsi zimanê kurdêñ li Ewrûpa ji zimanê xelkê bi dûr keve. Rojek wê bê ku ronakbîr vegerin kurdistanê, bibin pêşengêñ tevger û têkoşîna kurdan, lê ewê bibinin, ku kurdêñ Kurdistanê ji zimanê wan fêm nakin. Gava "Türk dil kurumu" (Enstituya zimanê tirkî) dest bi karê xwe kiribû, hemû imakanê weşandin û belav kirina xeberên "uçtürkçe" di destê wan da bûn. Rojname, kovar, radyo û pişta telewizyon ji gotinêñ nû digirtin û belav dikirin. Bi taybetî

kurd, yên ku di her babetê da rexne li politika tîrkan dikin, safîkirina zimêñ ji xwe ra kir nimûne û iro zimanekî "özktürice" çêdikin.

NÜDEM ne kovara nivîskarekî tenê ye, lê belê foruma hemû nivîskaran e. Ji ber vê yekê ji ez nikarim bêjim ku zimanê NÜDEM'ê bi xwe gelek pêşvaçû, zêde "Kurdiya patî" yan ji paşdemayı ye. Lê ez ikazî we dikim: ku hûn dixwazin ku kurd bêtir bi zimanê kurdî bixwînin û ku nivîskarêñ kurd, yên ku heyamî niha zimanê tirkî yan erebî bi kar dianî, nivîsandina kurdî ji biceribînin, vêga divê hûn bi zimanekî zelal, bi zimanê xelkê binivîsin.

Wextê ku ez niha li Kurdistanê bûm, rojnameke kurdî ket destê min, min ew şanî hevalêñ xwe da, yekî ji wan go, ka xwendina kurdî mumkin e? Min ji bi dengê bilind jê ra xwend û ew bi xwe şas ma, ka ew çilo dikare wan herfîn biyanî (x-w-ê-û...) fêm bike. Min rojname da destê wî, û min jê ra got ka ew herf çawa têñ xwendin. Di wextekî kin da wî fêm kir, ku xwendina kurdî hêsanî ye, û xwe bi xwe dil hebû ku ji niha şunda bêtir nivîsên kurdî bixwine. Lê xwezi ku ew xeberên nû nebûna!

Ji ber vê yekê ez gazî we dikim: Bi nivîsandina kurdî berdewam bikin. Fîkr û ramanêñ xwe bînin zimêñ! Lê wer binivîsin ku bav û kalên we, dayik û pîrikên we yên li Kurdistanê ji bikarîbin guhdar bin û ji seri heyani dawiyê bêñ ku bipirsin, wan nivîsan fêm bikin. Û ku rojekê hemû imkanêñ weşandinê bigihin destê we, ku dibistanêñ kurdî bêñ vekirin, wê gavê wextê safîkirina kurdî ji dê hatibe.

# KOMPETENS

Nûrî ALDUR

**G**elek caran di nav civaka me de tê gotin ku "filan tişt ne karê hemû kurê bava ye". Mirov kare vê gotinê wek "gotinek pêşîyan" jî qebûl bike. Ev gotin xwedî naverokeke fereh e û bersiva gelek pirsan di nava wê de heye. Dibe ku herkes kare tiştekî bike, lê herkes nikare hemû karan bike.

Eger em vê "gotina pêşîya" bînin rewşa rojane û li ser beşek ji yê jiyana civakî tedbiq bikin, an jî ji analîz û munaqeqşan re vekin, wê mesele zelaltır bibe. Gotina me ya rojane ev e: Derxistina rojnaman an jî kovaran ne karekî hêsan e. Helbet gelek kar û xizmetên dî jî ne hêsan in. Lê dîsa jî tu kar, an jî tu beşen xizmetê wek hev nîn in. Hin ji hinekan tevli-nevîtir, an jî zelaltır in; an jî kurtîr in, giran-çîha, an jî arzantîrin, xwedî naverokeke çonakbîri an jî praktilktir/rojanetir in û hwd. Wek me li jor got; vêca em ê li vir tenê li ser beşekî rawestin... Karê kovarderxistinê... Bê na ji bo belavkirin û derxistina kovarekê çi xewîst in, wê çilo derkeve, wê kîjan meselan sine zimên, wê kengî û li ku derkeve, wê şima û ji bo kê derkeve... û mirov kare hê jî şotinê pirsan zêde bike. Lâ di metodika karê ikademîk de, pêwîst e mirov "hidûd" bi xwe iş bike. Yanî divê mirov beşekî an jî menti-

qeyekê ji xwe re bike saha kar û xizmetê, da neficên bi zad derkevin holê, da xwendevan an jî bê raman çiye bigihîje bawerî û hedefek vekirî. Ev bawerî û hedef kare bibe pirsgirêkên nû, kare bibe destpêka xebatê teze, kare bibe nexweşî û problemên ku berê hîç nebûn û kare bibe alternativ û nefîcayêن pozitîv jî.

Vêca em li vir karin "hidûd" û "mentiqâ" xwe diyar bikin. Hingî problema me zelal dibe û em karin bi problem û pirsa xwe ve mëşgûl bibin, kar bikin. Em bêjin ku bîryara me ew e, ku em ê "kovareke hunerî, edebî û çandî" derxînin. Pişti ku me ev "identifikasiyon" a xwe kir, medotê planê me li vir aktuel dibe. Yanî em ê çawa bigihîjine vê armancâ xwe? Divê hedef û armancê bernama me diyar û vekiri bin. çend xal û şerd ji yê bernama û planê me pêwîst ev binn:

1. Armanç, plan.
2. Kalîte, zanyarî, pisporî: kompetansa intelektueli.
3. Finans û teknolojî: materyal.
4. Xwendevan, an jî çîma ne "muşterî".

Ev xal hemû bi hev ve jî girêdayî ne. Eger personal, an jî elemanê kompetent nebin- ji xwe armancâ û hedef jî çenabe, kovar fonksyo-

na xwe nabîne, an jî çap nabe.Helbet em li vir behsa karekî "proffs" dîkin- ne karekî nizim-bê kalîte an jî ku xwedî prensibên zeif be. Bê ma daxwazî û armanc çibûn/çiye - ew roleke mezin dileyize. Gotina "kompetens" ne tenê ji bo rewşenbîriyê- ji bo pakêta hemû bernaman kare bê gotin. Eger hemû tiştên bernamê ne mukemel bin ( zanyarî, teknik, kalîte, felsefa plan û pêşerojan...ûhwd.) hingî, bernâme ne xwedî "kompetens" e an jî ne berhemekê "profesyonel" e.

Misalek: Eger em li alim û feylesofê kurd "Ahmedê Xanî" bixwazin lêkolînekê bikin, divê ji hindikayî ve em xwedî van tiştan bin an jî van tiştan baş bizanibin:

1) a- Ji ber ku di dema Ahmedê Xanî de alfaba kurdi bi tûpêner erebi bû, gelekî baş ( heta mirov kare bêje ku pêwîst e jî) ku merov alfaba erebi bizanibe.

b- Ji ber ku Ahmedê Xanî di medresê olî de xwendiyê, pêwîst e kesê ku lêkolînê dike, di aliyê teoloji de têgihiştibe.

2) Tarîx û coxrafya-ya Ahmedê Xanî.

a- Şexsiyeta Ahmedê Xanî, malbat, gund, mentiqe, welatê wî.

b- Büyerê wê demê û tesîra wan li ser Xanî

c- Materyal: kê ci nivîsi ye-çi gotiye li ser Ahmedê Xanî. Bila bi zimanê erebi, farisi, tirkî an jî kurdi be-bi çend zimana malûmat hebin, ewqas baş e.

Eger merov ev hemû tişt anîne ber çav û destêne xwe, hingî analîzeke ilmî kare bê kirin û berhemekê objektîv were holê. Helbet ev

hemû kar ne hêsan in. Gelek teşqeple û zehmetiyên xwe hene.Ji xwe li vir rol an jî fonksiyona zanyarî, teknikî, aborî, dûrmeyizîn û armancêne xwe dide xuya kirin. Eger kovar, a ku me li jor qala wê kiribû, van noktan di jiyana xwe de bi kar bîne, hingî-li ser rêça xwe ya ku pêşî hilbijartibû-wê berdewam be û her ku çû jî wê stêra wê xurttir û geştir bibe. Wê gelek kes jê istifade bikin, wê jî xwe re deriyên nû vekin û kes wê hingî li vê kovarê-pêşî ji bo xwe-otomatîkî xwedî derkevin.Helbet kar li vir temam nabe-mesele gelekî komplekstir e. Xwendevan jî her dem divê xwe nûjen bike. Yanî ne tenê redaksiyona kovarê wê berpirsyartiya hemû tiştan bike-divê xwendevan an jî muşterî jî berhemê xwe bidine diyar kirin. Herdu rex, wek zincirê (pêwîst e) hev temam bikin.Wezîfa kovarê ku pelê xwe (li gor prensibê redaksiyonê) ji nivîsê hunerî, edebî û çandî re veke. Pêwîst e ku kovar û xwendevan/nivîskar hemfikir bin ku hemû berhem ji bo serketina planê bernamê ye-jî bo civakeke humanist û demokratik e. Nivîsên kovarê pêwîst e hevçax bin. Her du rex jî, pêwîst e ji bo vê armancê bixe-bitin. Divê nivîs ilmî, neutral, objektîv, aktuel û xwedî huner û armancek be.Lê ne şert e ku hemû rex li ser berhemekê hemfikir bin. Tam tersê wê-jî xwe di vê mentiqê de (huner, edeb, çand, politik) kêm caran kesen ku hemfikirin hene û ne pêwîst e jî. Ji ber ku felsefa vê meselê gelekî dûr û dirêj e û ji ber ku her ferd, bûyer, bawerî û beşê zanyarî yê "unîk" in, gelekî normal û pozitîf e ku ji hev cûdabûn heye.

# DANASINA KOVARAN

Lokman POLAT

**D**i vê demê de hem li welêt û hem jî li derveyî welêt pîr kovarên kurdî yên tewr bi tewr derdikevin. Weşandina van kovar û rojnaman ji edebiyat û kultura kurdî re dewle-mendiyek e. Her kovar û rojnameyek di hêla xwe de valahiyekê dadigire. Ev kovar û rojnameyên han di nav rûpelên xwe de li ser çand, ziman, dîrok û hwd. nivîsên hêja diweşinîn. Weşanxaneyên kurdan li ser ziman, çand û nemaze li ser dîroka kurda lêkolinêñ baş, berhemên hêja çap dikin. Ronesansa kurd xwe bi van pirtûk, kovar û rojnameyan ve dide nişandan.

Kovar û rojname (hefteyî, panzdeh rojî û yet jê rojane) yên kurdan bi pirranî bi du zimanan derdikevin. Li welêt tenê xwerû bi kurdî rojnama hefteyî "Welat" û kovara mehane "Nûbihar" derdikeve. Li derveyî welat kovarêñ ku tenê bi kurdî derdikevin ev in:

*Berbang, Nûdem, Armanç, Roja Nû, Rewşen* (kovara Rewşen a ku li welat derdikeve bi kurdî û tirkî ye). Li derveyî van kovaran yên din hemû bi kurdî û tirkî ne.

Armanca vê nivîsê ne ew e ku em li ser hemû rojname û kovarêñ kurdî bi awayekî lêkolinî agahdariyê bidin. Di vê hêlê da Mîrza Malmisanij û Mamûd Lewendi bi xebatek hêja lêkolinek fireh çêkirine û bi navê "Li Kurdistan Bakur û Li Tirkîye ROJNAMEGERIYA KURDÎ ( 1908-1992 ) berhemek hêja, du cild weşandine.

Di vê nivîsê de em ê li ser kovarêñ kurdan yên ku niha jî derdikevin, bisekinin û di hejmarêñ wan yên dawî de ci herie bi xwendevanan bidin naskirin.

Dibe ku haya pîr kesan qet ji hin kovaran tunebin. Hinek mirov nikarin hemû kovaran peyda bikin û bixwînin, pîr kêm kes hemû kovaran dixwînin. Hinek kesan ji xwe navê hin kovarêñ kurdî qet nebihistine. Lê ku mecal hebe divê mirov hemû kovarêñ kurdî bixwîne.

Berî ku em xwendevanan agahdar bikin ka di hejmarêñ dawî yên van kovaran de ci hene, em ê navê wan binivîsîmin. Em ê kovar û rojnaman bikin du beş. Beşa ku li welêt derdikevin û beşa ku li derveyî welêt. Li vir ji kovarêñ li welat mebesta me ew kovarêñ ku li Tirkîye derdikevin û bi pirranî di riya fermî de li Kurdistanâ bakur tê belavkirin.

Niha em binêrin bê di hejmarêñ rojname û kovarêñ kurdan yên paşîn (dawî) de ci hene:

## MEDYA GÜNEŞİ

Navê wê bi kurdî tê mana "Roja Medya". Ev kovar panzdeh hejmara mehane derket. Kovara nûçe-lêkolin-şirove bû. Niha ew weke rojname derdikeve. Li bin navê vê rojnamê dinivîsîne, ku rojnama nûçe û şirovekirinê ya panzdeh rojî ye. Medya Güneşî bi zimanê tirkî û kurdi derdikeve. Hejmara dawî ya di destêne me de, hejmara 18'an e. Di rûpelê pêşî yê vê

hejmarê de wêneyên pêşmergan heye. Li ser vê wêneyê nivîsek bi kurdî heye, navê nivîsê: Rêxistinê Kurdistanê: "Divê şerê birakujiyê bê sekinandin". Di rûpela duyem da nivîsek li ser: "Stratejiyek hovane: Şerê bi tevayî" heye. Ev sernivîs e. Nivîskarê vê nivîsê Osman Aytar e. Di rûpela sisîyan de wêneyek ku leşkerên tirk gerilayek di pey tanqê de kişandibû heye û di bin wêne de wilo hatiye nivîsin "Ma tu dikarı rismê hovîtiyê çêbikî?" Di vî rûpelî da nivîsek bi kurdî "Dîsa Şerê birakujiyê;" heye. Navê nivîskarê wê mamosta Qasim e. Di rûpela çaran de nivîsa Mahmut Kîper bi zimanê tirkî heye. Di rûpela pêncan de nivîsek ya Salar Gelawêj bi tirkî heye. Li bin nivîsê du kurtenûçe bi tirkî hene. Di rûpela şesan de du kurtenûçe û du şirove bi tirkî hene. Di vî pelfî de daxuyaniyek komîta piştgiriya Kurdistan li Almanya heye, navê "Ji şerê birakujiyê re NA" ye. Di rûpela heftan da belavoka meclîsa netewa Kurdistanâ başûr li ser flankirina dewleta federe a kurd, ev belavok ji kurdî wergerandine tirkî û weşandine. Di rûpela heyştan de hevpeyvînek bi Cewher Namik, serokê meclîsa netewa Kurdistanâ başûr re heye. Di rûpela nehan de ji hevpeyvînek bi Dr. Fuat Mahsûm, serokwezîrê Kurdistanâ başûr re heye. Di rûpelên deh û yanzdehan de bi tirkî nivîsek li ser civîna hêzên Kurdistanê li Hewlêrê heye. Di rûpela donzdehan de ji nivîsa Malmışanîj "Dr. Frîç Kî bû?" heye. Di rûpela sêzdehan da berdewamiya nivîsan û hinek nûçe hene. Rûpela çardeh hemû kurtenûçe ne. Rûpela panzdeh berdewamiya nivîsekê û kuncika "Mûçink" heye. Amadekarê vê kuncikê Bawer Andok e. Di rûpela şanzdehan de nivîsek bi navê "Li ser bûyerên Kurdistanâ Başûr" heye, nivîskarê wê Şervan Pola ye. Medya Güneşî, hejmara 18'an hemû li ser hev şanzdeh rûpel e.

## SERKETIN

Ev kovar, kovareke siyasi ya mehane ye. Nivîsen wê bi du zimanân, bi kurdî û tirkî ne. Heta niha çar hejmaren wê derketine û ew hê ji

derdiikeve. Hejmara dawî ku di desten me de ye hejmara çaran e. Di rûpela wê ya yekê de wêneya xelkê kurd yên rûniştevanê Şîrnexê ku pişî xirabkirin û gulebarankirina Şîrnexê ji bajêr koç dikirin, heye. Kovar 64 rûpel e. Di vê hejmarê de heft nivîs bi zimanê kurdî, ên din hemû bi tirkî ne. Sernivîsa kovarê "Dewleta TC bi fermî li diji gelê kurd şer ilan kir. Şîrnex xerab kirin û şewitandin." Di rûpela sêzdehan da nivîseke rexne li ser Saddam û çepen tirk heye. Navê nivîsê "Gelo, Saddam Antî Emperyalîst e?" nivîskarê vê nivîsê C.Seydo ye. Di rûpela şanzdehan de nivîseke F. Baran li ser "Diplomasiyê" heye. Di rûpela bist û pêncan de kurteçirokeke bi kurdî heye. Navê wê "Şeytanokên Hizbilkontra" ye, nivîskarê wê Lokman Polat e. Di rûpela 32'an de ji Koçgînî hetanî Dersimê teverga neteweya kurd, nivîskarê wê F. Baran e. Ev nivîsa ha lêkolîneke dirêj e. Di rûpela 55'an de nivîsa M. Yilmaz heye, bi kurdî nivîsandiye, navê nivîsê "çend gotin li ser zimanê Cîhanê û kurdî" heye. Rûpelên 60'ı û wê ve de çend helbest û kurtenûçe hene. Nivîseke bi navê "Ji Ugur Mumcu re nameyek vekîri" heye, li wî rexne digire. Di rûpela dawî de ilana çend şehîdê Kurdistanê heye. Hejmara Serketinê ya çaran bi naveroka xwe hejmareke dewlemed e.

## NEWROZ

Mehê carekê derdiikeve. Kovara mehane ya siyasi û kulturî ye. Heta niha deh hejmarên wê derketine. Di hejmara dawî de nivîsen bi zimanê tirkî û kurdî hene. Li ser qapaxa wê wêneya şehîdê nemir Musa Anter heye. Kek Musa qolêن sor di desten wî de ne û di rê de dimeşe. Li ber wênen gotina wî ya "Kurdistan Sax be" hatiye nivîsandin. Di rûpela duyem de Z.Kizilyıldız li ser jiyan û têkoşîna apê Müsa nivîsandiye. Nivîseke bê imze "Musa Anter çîma hat kuştin" heye. Li Şîrnexê qetliam, Yilmaz Varol nivîsandiye. Di rûpela dehan de li ser şeva hevkari ya Newrozê nûçe heye. Di şevê de, bijî Kurdistan! Bijî Newroz

slogan hatine avêtin. Nivîsek li ser "Mirovên şoreşger û berpirsiyariya wan" hatiye nivîsandin, nivîskarê vê nivîsê Halil Keskin e. Di rûpela hijdehan de li ser şehîdbûna Dr. Saît

Şerefkendî û hevalên wî nivîsek heye, Ebû Şehmus ev nivîs nivîsandiye. Z. Abidin Kizilkaya li ser "Heqêñ çarenûsî ya mafen miletan" niviseke

dirêj nivîsandiye. Nivîsek jî li ser pirsa neteweyî heye. Kemal Ardil li ser pirsa "Ciwanêñ Kurdistan" nivîsandiye. Nivîseke dirêj li ser pirsa neteweyî û kolonyalîzm heye. Di vê hejmarê da (hejmara 10'an) çar nivîs bi zimanê kurdi hatine nivîsandin.

1- Li ser rewşa rewşenbirêñ kurd yên li Ewrûpa, nivîskarê wê A.Dura.

2- çend nimûne jî zargotina kurdêñ Sûriyê. Berhevkarê wê Celîl Celîl e.

3- Xezeb-kurteçîrok, nivîskarê wê Lokman Polat e.

4- Dersêñ zimanê kurdi, bê imze ye. Ev nivîs di hemû hejmarêñ Newrozê de berdewam dike. Hê jî dûmahiķa vê nivîsê heye.

## VATAN GÜNEŞİ

Bi kurdi "Roja Welat e", kovara siyasî û kultûrî ye. Hertim heyştê (80) rûpel e. Nivîsên tê de bi zimanê kurdi û tirkî ne. Nivîsên vê kovarê bi giranî nivîsên teorîk yên siyasî ne. Heta niha heyşt(8) hejmarêñ Vatan Güneşî derketine. Hemû hejmarêñ wê bi biryara dewleta TC hatine civandin. Du xwedî û sê berpisiyarêñ vê kovarê hatine guhertin. Xwediyyê wê û midûrê wê yê berpisiyar demeke dirêj li girtigehê razane. Vatan Güneşî kovareke sosyalist e û xeteke radikal ya siyasî

diparêze. Di hejmara heyştan de sernivîsa li ser büyerên Şîrnexê ye, Kamîl Hesâr nivîsandiye. Navê nivîsa wî "Katliam nikare têkoşîna gelê me bide şikandin." Nivîsek şirove, li ser

hovîtiya dewleta Türk ku li Kurdistanê li ser gelê kurd wahşetiyê dike, L.Yezdan nivîsandiye e.



Nivîseke dirêj li ser avakirina hukûmeta neteweyî ya Kurdistanâna başûr e. Ev nivîs Selî Ugur nivîsandiye. Felat Dilevîn li ser kurdêñ Laçinê nivîseke kin nivîsandiye û rewşa kurdêñ li wê derê şirove kiriye. Di vê hejmarê de du hevpeyvîn hene. Yek jê bi serokê PDK-Î Mesüt Berzanî re, li ser rewşa Kurdistanâna Başûr heye. Hevpeyvîna din bi nivîskarê kurd Malmîsanij re ye. Di vê hevpeyvînê da Malmîsanij bi giranî li ser lehça (zarava) zazakî-dimili disekine û agahdariyê hêja dide xwendevanan. H. Sîpan "Dewlet, Demokrasî, Türkiye û Kurdistan" nivîseke teorîk nivîsandiye. Ev nivîs dirêj e û li ser gelek pirsan sekinî ye. Dîrokzan Botan Amedî (ku pirtûka wî ya bi navê dîroka kurd û Kurdistan heye) li ser komara Kurdistanê (Mahabadê) lêkolîneke dîrokî nivîsandiye. Ev nivîs di du hejmaran de hatiye weşandin û hê jî dom dike. A. Zozan û Firat Baran jî her yekî nivîsek nivîsandine. Di beşa zimanê kurdi de jî çar nivîs hene:

1- Li ser zimanê kurdi, ev nivîseke lêkolînî ye. Ev bû pênc hejmar ku ev nivîs dom dike, lê hêj dûmahiķ nehatiye. Nivîskarê wê S. Dîjle ye.

2- Serbûriyek bi navê "Ser namûsê hevpeyvînek bi Seyda re". Ev serbûri Xurşîd Mîrzengî nivîsî ye.

3- Kurteçirokek kurdî bi navê "Dêran-Dêran" Lokman Polat nivîsandiye.

4- Helbesteke kurdî "Em Bes in" Salehê Hesen nivîsandiye.

Ev kovara ha hê ji berdewam e.

## REWŞEN

Heta niha du Rewşen derdiket. Yek li Ewrûpa, ya din ji li Stembolê. Rewşena ku li Ewrûpa derdiket, heya niha neh (9) hejmarên wê derketine. Em ê di beşa danasına kovarên kurdî li Ewrûpa qala vê kovarê bikin.

Rewşen kovareke mehane ye. Bi zimanê tirkî û kurdî derdikeve. Tê de nivîsên kurdî zêde ne. Rewşen kovareke çandî ye û berhema Navenda çanda Mezopotamya ye. Heta niha şes hejmar derketiye. Rewşen mehê carekê tê weşandin.

Di hejmara şesan ya Rewşenê de sê nivîs bi zimanê Tirkî hene, yên din hemû bi kurdî ne. Wêneyê li ser qapaxê, wêneyek keçek gerfla ye. Di destê keçikê de keleşnîkofek û pirtûkek heye, bi gundiyan re dipeyive. Di qapaxa paşîn de tabloyeke wênevan Kawa Baban heye. Di wêne de sê jin di nav erd de genim diçinin. Sergotara wê bi navê Vejîn e. Li ser girîngiya 15'ê tebaxê disekine. Nivîsa S.Rêving ku berê di Armancê de hatibû weşandin carek din di Rewşenê de ji ji ber girîngiya xwe hatiye weşandin. Navê nivîsê "Divê em xwe ji alfabetîzbûna tirkî xelas bikin". Nivîsa şes rûpel e û nivîseke dirêj e. Di vê hejmarê de çirokeke piir xweş heye. Navê çîrokê "Birîna Dilê Min" e, nivîskarê wê şervan e. Nivîsa bi tirkî navê wê "Ronakbîrê gel, şervanê gel e". Nivîskarê Rewşenê Mîrhem li ser "Demokrasi Şores, Ewrûpa û Rewşenbirêne" nivîsandiye. Dîrokzan û lêkolînvanê hêja Cemşid Bender çirokek bi zimanê tirkî nivîsandiye. Navê çîrokê "Tijîkirina Valahiyê" ye. Li ser bajarê Hewlîrê nivîseke danasînê bi navê "Niştimana xwe binase" nivîsek heye. Abdurrahman Durre li ser şairê nemir Ahmedê Xanî nivîsandiye. Feqî Huseyin Sagnîc li ser ziman

nivîsandiye. Bi navê "Bang" helbesteke dirêj, Xamevan nivîsandiye. Di du rûpelên dawî de cih dane nameyên xwendevanan. Rewşen 54 rûpel e û naveroka wê dewlemend e.

## WELAT

Rojnameyeke hefteyî ye. Heta niha ew her hefte di wextê xwe de derketiye. Ev büye sî û heft (37) hejmarên wê ku derketine. Welat xwerû bi zimanê kurdî derdikeve. Di rûpela yekem (qapax) ye Welat hejmar 37 de gerflayeke keç li ser milê wê arpêci heye û nişan girtîye. Welat hertim şanzdeh rûpel derdikeve. Nivîsên tê de cûrbecûr in. çend kes kuncika wan heye, di her hejmarê de li kuncika xwe dinivîsin. Wek nimûne kuncika "Hawar", "Rewş", "Gotin", "Pênuş", "Azadî" û kuncika "Tîr" a şehîd Musa Anter bû. Apê Musa hertim li vê kuncikê dinivîsand. Nivîsên di vê hejmarê de bi kurtî ev in:

- TC li pêla gerfla qelibî
- Zimanê kurdî li Sorbonê
- Kaniya Ehmedê Xanî
- HEP li her derê xurt dibe
- Armanca geşta Demirel
- Welatê xelkê nabe welatê mirov
- Bavê min ê delal. Ev nivîs ji aliyê Yurda Kaya li ser bîranîna apê Musa hatiye nivîsandin.
- PKK di merhelayeke nû de.
- Mem û Zîn büye dabeşa teza xwendevaneke Amerîkî, nivîskarê wê Selmani ye.
- Rewşâ muzîka kurdî, Zana Farqînî
- Teyrê Reş, Abdurrahman Durre.
- Divê civata neteweyî alîkariya kurdan bike, parlementera Norvecî, Vîken.

## NEWROZ ATEŞİ

Kurdiya wê "Agirê Newrozê" ye. Kovara mehane ya teorîk, nûçe û şirove ye. Bi tirkî û kurdî ye. Heta niha şes hejmarên wê derketine. Di bergê pêşî û paşîn de wênen bi reng hene. Keçikek li pêş tankê rûniştiye. Tankê berê gulla xwe daye rojê. Di Newroz Ateşî de

nivîs bi giranî bi tirkî ne. Nivîsên kurdî pîr kêm in. Di vê hejmara şesan de tenê du nivîsên pîr kurt û helbestek bi kurdî heye. Navê helbestê "Ez Kurdistan im ez" M.Sait Alpaslan nivîsandiye. Nivîsa kurdî a kurt "Germa Havînê" jî M.Sait Alpaslan nivîsandiye. Nivîsa din a kurt "Generalekî Türk" Haci Erdogan nivîsandiye.

Nivîsên din ên vê kovarê hemû nivîsên direj û teorîk in. Di nivîsên tirkî de ên balkêş ev in: Şoreşa Kurdistanê û li ser çepêن Tirkan, Halîf İbrahim Akyol nivîsandiye.

- İslamiyetî û têkiliyên neteweyî, S. Gulrêz.
- Qetliam û Rêcündin, İbrahim Încesu.
- Qetliama Şirnexê.
- Li ser destana Mem û Zinê.

## DENG

Kovara mehane ya siyasi û kulturi ye. Bi zimanê tirkî û kurdî derdiikeve. Heta niha 21 hejmar derketiye. Di vê hejmara 21 de tenê nivîsek bi kurdî heye. Ew jî nivîsa Baran "Dersêن zimanê kurdî" du rûpel û nîv e. Nivîsên tirkî pîr in. Yêن balkêş nivîsa şehîd Dr. Abdurrahman Kasimlo ya bi navê kurtediroka PDK-Î ye. Munzur çem li ser problemen xwendin û nivîsandina kurdî sekinî ye. Nivîseke hêja ye.

- Biryarênen parlementoya Ewrûpa
- Dîroka edebiyata kurdî, Kemal Burkay nivîsandiye. Kemal Burkay di beşa dîroka edebiyata kurdî de li ser dîswana Melayê Cizîri, Mem û Zîna Ehmedê Xanî, mewlûda Mela Ehmedê Baîê, Şêx Senan a Feqê Teyran û ta helbestvanê hêja Cegerxwîn disekine. Di vê hejmara Dengê de nivîsek lêkolînî ya Malmisanij jî heye. Nivîs li ser "Kird, kirmanç, dimîlî an jî zazyên kurd" e. Deng 64 rûpel e. Di rûpela dawî de daxuyaniyek Partiya Sosyalîs a Kurdistanâ Tirkîye heye.

## AZADI

Rojnameya hefteyî ya nûçeyî û şiroveyî ye. Azadî rojnameyeke bi tirkî û bi kurdî ye. Heta niha bîst û şes (26) hejmaren wê derketine. Di

vê hejmare de heft nivîsên kurdî, yên din bi tirkî ne. Giraniya nivîsan li ser nûçeyan e. Di hinek kuncikan de nivîskar meqale dinivîsin. Ferhat Can di goşa xwe de tim bi kurdî dinivîsine. Alî Dîjle "Gav Bi Gav Kurdistanâ Azad" bi kurdî nivîsandiye. Ev nivîs di şes hejmaran de berdewam dike. Humanê çiya, Serbestiya mirina Asê nivîsandiye. Ev nivîs jî bi kurdî ye. S. Xewro çend pêkenin bi kurdî nivîsandiye. Mebûsê berê İbrahim Aksoy di her hejmare de dinivîsine. Di vê hejmare de Huseyin Beysulen bi navê "Serketin bi yekîtiyê ve girêdayî ye" nivîseke balkêş nivîsandiye û realita tevgera kurd daniye holê. Nivîs bi zimanê tirkî ye, lê xwezî ku ew bi kurdî bûna jî.

## GOVEND

Kovara çandî û Hunerî ye. Ji du mehan carekê derdiikeve. Heta niha pênc hejmî derketiye. Her hejmareke wê 32 rûpel e. Kovar hîn jî derdiikeve. Ev kovar wek kovarênen din li Stembolê dernakeve, ew li Diyarbekirê derdiikeve. Di qapaxa Govendê hejmara 5 de wêneya şehîd Musa Anter heye.

Nivîsên vê hejmare ev in:

- Bîranîn.
- Jiyana min, Ekrem Cemîl Paşa.
- Ji navâ Edebiyata Cihanê, Nerûda.
- Çê sosêن beqî, Munzur çem.
- Serpêhatiya Siyabendê Silivî.
- Niştîmana me, Farqîn.

Di Govendê de pîr kêm be jî carna nivîsên bi tirkî jî derdiikevin.

## DEVRİMÇİ YURTSEVER GENÇLİK

Bi kurdî "Ciwanê Şoresger û Welatparêz' kovara ciwanî ya siyasi ye. Mehê carekê derdiikeve. Heta niha heyşt hejmî derketiye. Bi giranî li ser pirsên ciwanan disekine. Carna bi pisporan re hevpeyvînan çêdiike.

## KOMEL

Kovara hunerî ye. Berhemê yekîtiya huner-

mendan e. Heta niha tenê hejmareke wê derkekiye. Di berga pêşî de roj û du K hene. Hejmara duyem dermeket.

## ÖZGÜR HALK

Gelê Azad; kovara siyasi û kulturî ye. Ji mehê carekê derdikeve. Nivîsên vê kovarê hemû bi tirkî ne. Nivîs, bi pirranî nivîsên pîr dirêj yên siyasi û teorîk in. Di her hejmareke vê kovarê de du-sê nivîsên dirêj yên Ali Firat derdikevin. Ev kovar heta niha 23 hejmara derkekiye. M.Can Yüce jî di her hejmara vê kovarê de dinivîsine. Di hejmara dawî de ev nivîs hene:

- Qetîfama Şîrnexê
- Demokrasiya Sextekarı, Ali Firat
- Hevkarên gelê kurd gelên herêmê ne, M.C. Yüce û Mistefa Karasu
- Li ser dewleta neteweyî fikrandin, M.C.Yüce

## YURTSEVER EĞİTİMCİLER

Perwerdê Welatparêz, kovareke huner, çand û perwerdeyî ye. Ji mehê carekê derdikeve. Hêj tenê hejmareke wê derkekiye. Di hejmara yekem de ev nivîs hene:

- Di dema neolitîk de li Mezopotamyayê jiyan. Nivîskarê vê nivîsê Süleyman Danişman e.
- Diyalektîka ziman û fikrandinê
- Di perwerdetiyê de pîrsa şes saliyan.

## BERHEM

Kovara lêkolînên civakî û çandî ye. Ev kovar berê li Swêdê derdiket. Lê niha li Ankarayê derdikeve. Berhem ji du mehan carekê derdikeve. Berhema ku li Tirkîye derdikeve hejmara wê gîhîştiye sisêyan (3).

Berhem bi zimanê tirkî û kurdî (zazakî) derdikeve. Tê de nivîsên lêkolînî zêde ne. Ji nivîskarên biyaniyan werger hene.

Di hejmara sêyem de ev nivîs hene:

- Cihûyên ji Kurdistanê, A. Medyali
- Kurd, werger

- Leyl û Mecnûn, wergera Z. Kaya

- Di navbera salêن 1582-1839 de pirtükên kurdnasiyê, bi zimanê frensi, îngîlizî û almanî, Ferhad Pîrbal. Berhem şest û şes (66) rûpel e.

## NÜBIHAR

Kovareke xwerû bi zimanê kurdî ye. Bi şîara "Ne zalim be, Ne mazlûm" derkekiye. Di pêşgotina xwe de, di bin navê "Di payiz de Nûbihar!" armanca derketina xwe û girîngiya Nûbiharê tîne ziman. "Ne zalim be, ne mazlûm" sernivîsa berpirsiyarê kovarê Sabah Kara ye. Sabah Kara di vê nivîsa xwe de kîna li dijî zaliman û pişgîriya bi mazlûman re tîne ziman. "çend ayetin ji Qurana Mecîd" Azad nivîsandiye. "çend hedîsin ji peyamberê Ekrem" dîsa Azad nivîsandiye . Bi serokê Komela Piştgîri ji bo Mafêن Mirov û Mazlûman (Mazlum Der) M.İhsan Arslan re hevpeyvînek heye. "Peyivên Rastan" ji aliyê xebatkarê kovarê ve hatiye amade kirin. "Ey geli Kurdan!" nivîseke Mela Seîdê Kurdî ku bangî kurdan dike, di rûpela şanzdehan de cih gîrtiye. "Şerefa redkirina her tişte ku mixalîfe azadiya me ye" ji pêñûsa berpirsiyar e. "Jiyan-name û têkoşîna Bediuzzeman Seîdê Norsî" Süleyman çevîk nivîsandiye.

- Newaya mutrib û çengî, Mela Ehmedê Cizîri

- Rojnama "Volqan" û "Cemiyeta ittîhadî Muhemmedi", Osman Tunç

- Milletek Şîzofern, Mersabîzade Nameyên bê cewab, Niasn 7, 1991, Sabah Kara

- Şeva Mewlûdeke pîr hezin, Muhammed Akîf bi wergera Hozan

- Serhîdan, Bager


- Du qise ji jiyanâ peyamberê Ekrem, Azad

Di rûpela dawî de jî ferhengokeke kurdî-tirkî cih gîrtiye. Kovar sî û du (32) rûpel e, bi çapek bedew, bi zimanekî xweş û zelal hatiye nivîsin.

Di hejmara bê de jî em ê li ser kovarên kurdî yên ku li derveyî welêt derdikevin, rawestin.

# GERAN BEDWAY WILATEKÎ TAZE, WILATEKÎ HUNERÎ

Ferhad PÎRBAL



**L**e 28.08.1961 da, le Kurdistanî Iraq, le şarı Hewlêr le dayik bûme. Her lewê ji, le naw gereke zerd û belengaz û qurawiyekan da, zwêndin î seretay û nawendî û amadeyim tewaw kird. Paşan le salı 1979-80 da çûm bo şarı Silêmanî û lewê çwar salan, le zanko, ziman û edebiyatî kurdîm xwênd: Ziman û edebiyatî kurdî, "ew tişte" ke bawkim henek û galtey pê dekird!

Mawey salanî 1970-1980, wate mawey salanî zaroky û herzkarîm, salanêkî tijî le tirajidya û nisko û karesat bûn: Girift û naxoşiekanî jiyanî naw û aşbetli 1974-75, destpêkirdinî cengî Iraq û Êran...hetd. Her le maweyn ewan salaneş da bû ke behre û hezî nûsîn le naw rohî min da çekerey kird.

Îro hest dekem ke hezî nûsîn yan hoy nûsîn, li cem min, peywendiy be çwar tiştewe heye; yekem: Be xom, dûwem; be xom, sêyem ji her peywendiy be xomewe heye; belam çwarem peywendiy be hezar û yek tiş corawcorewe heye ke natwanîm basyan bikem.

Min, bînînî hunermendaney xomim, maweyekî zor le jêr sansori faşistekanî Iraq û maweyek ji le jêr karigerêtyî aydolojyetî "Şorişî çekdarî kurd" da hepîs kirdibû. Bextewerane, zor zû têgihîştîm kû hîç aydolojyetek, hîç xemêkî siyasi û hîç core bîrkirdineweyekî komelayeti û siyasi be hîç awayek natwanât berhemî hunery û edeby resen dirûst bikat. Hûnermend, bo nûsînî berhemî resen pêwîsty be felsefeyekî şexsy heye, pêwîsty be bîrkirdineweyekî azad û bînînekî takrewane heye. Bînînêk ke le kangay birîn û ezmûne

şexsiyekanî xoyewe helqulapêt. Şanonamey (Malawa ey welatekem) ke le salı 1983 da bilawim kirdewe, bo min seretayek bû bo taqîkirdinewey em bîrkirdinewe tazeyem.

Le salı 1984 da çûm bo Êran, paşan bo Danmark, inca paşan geyştîme Ferensa. Nêzîkey neh sale le dûrewitay da dejîm. Dûrewilatî fêrî ewey kirdim ke min, wekû kurde, hemû jiyan û sertapay jiyanım dûrewilaty û bêwilatiye. Bûni min wate geran bedway wilat, geran bedway dahênan û dirûstkiridinî wilatekî taze: huner. çunke êmey generasîonî bêwilaty, taze çîtir natîwanîn ew wilateman carekî din dest bikewêtewê ke caran hemanbû. Îro hemû tiştêki ew witatey caran, rûxawe, têk şikawê, wilat tenê le naw nûsînekanim da debinim. Dîwane şîri Exil, ke emsal le Paris bilawim kirdewe, em ezmûne trajidy-hûneryey min pişan dedat.

Dûrewilatî fêrî zimanekî tazey kirdim ku bikarim le rêgey ew zimanewe temasay cîkhanekî din, ciyawaz, pêşkewtû bikem û çendin tişti taze, nedîteny û dûr bibinim; herweha çendin ezmûnî dewlemend û tazey pêm bexşî ke bînînî hûnerimî zerkeft û qultîr kirdewe.

Layene pozetîfekey dûrewelaty, bo min, le Parisewe dest pê dekat. Paris seretayekî taze bû le jiyanî çalekie kultury û edebiyekanî min da. Hînbûnî metodî nwêy vekolin, xwêndinî berzî akademî le zanistgay Sorbonne, dozînewey deyan gencîney dîroky û kultury lebarey jiyan û edebiyat û mêtjûy netewekemen, nasînî kultûr û edebiyatî nûdemî ferensi,

ezmûne tazekanim...deyan tiştî din, ke bo bûjanewey bînînî hemû hunermend û nûserêk zor pêwîstin, hemûyan le Paris fêr bûm. Lêre, lem şare rengin û nazenîney dûrewilat'ya da. Bêguman eger bûrsî Enstituy Kurdi Parisim nebwaya, nemdetwanî ke be asanî em qonaxey jiyanî edebîm bibînim.

Min yekemîn berhem ke belawim kirdewe, le salî 1979 da, çirokek bû be nawnişanî "Nawnişanekî Nwê", le govarî "Rojî Kurdistan", le Bexda. Lew maweyeda Şêrzad Husêن, paşan ji (Le nawey salanî 1981-84) Serwer Ahmed, taqa kesanêk bûn ke rol û karigariyekî gewreyan beser xemlandînî rohî edebyî min da hebû. Bêguman ziyatir le bwarî xemlandînî bînînim bo nûsînî çirok.

Le salî 1986 da şanonameyekî dîkem nûsî û le Kopinhagin bilawim kirdewe : Beyanî baş ey Xerîby. Em şanonameye ezmûnêkî dikey min bû bo hewildan bo xoderbazkîrdin le formî çirok. Be ray min geran bedway teknik û formî taze rolekî girîngî heye le bwarî dahênanî edeby da. Dahênan yan edebiyatî newjen be bê teknikî nwê û formî nwê nayete ara. Nûserî Nûdem, bo ewey bitwanêt berhemî resen û newjen binûsêt, pêwîst e xoy le teknik û forma kewnekanî rabirdû be dûr rabigrêt û be dway teknik û formî taze da bîgerêt; le sinûrî edebiyatî kurdi biçête derewe û aw le edebîtaî newjenî rojawaiy da bixwatewe. Emroy ême, bêguman, daykî hemû edebiyatî newjenî dahatûmane.

Paris: 5.9.92

## BYABAN

Xûşike biçûkekey Haşûş le nakaw xoy kutaye jûrewê û be peleprruzî û henerebirrkêwe gût:

- Dayê, dayê... Sibeynê dîsan malle kurdekan Radeguêzinewe!

Min ke ew kate mindall bûm û zimanî arebîm baş ne dezanî, le sereta da lew arebîye cilfiyey xuşkekey Haşûş hallî nebûm, nemaze

leber ewey ke zor be heştewî hewallekey pêman rageyand.

Lew demeda min û Haşûş beramber yekir danıştibûn, dame man dekird. Haşûş ke gwêy le hewalleke bû, yekser desî le ser berdî dameke sard bûewe, temî xefetêki lenakaw kewte ser rûy. Daykî, bedyar semawereke mat ma, be xemgînî û be çawêkî pirr le bezeiyewe nîgayekî kirdim.

Bawkî Haşûş, ke dyar bû ew jî em hewalleley zor leser dill giran dehat, rûy kirde kîcekey, guû:

- Kê way pê gutî?

Kiçolleke be şillejawi temaşay miny kird, încâ rûy kirde bawkî, guû:

- Mallî Seadye y dirawsêman.

- Gûtiyan ci?

- Abû Seadye guû.

- Gutî ci?

- Gutî, sibeynê malle kurdekan radeguêznewe.

Daykî Haşûş, be xefetbariyekî pirr le gazande, wek ewey be nihêni qisê bikat, rûy kirde bawkî Haşûş. guû:

- Rast dekat, Abû Seadye polise, dazenêt.

Min yekser têgeyştim, zanîm idî emcare be yekcarî ramandegwêznewe berew Eran, yanîş berw byabanekanî ser sinûrî Urdin: çunke zor lemêj bû bawkim le mallewe basî ewey boman dekird.

Min çitîr xom pê ranegira, be ser textey damekewe, serim nuştadewe ser sîngim, wek mindalleki le temenî ewsam zor biçuktır, le hejmet derdeserî û suguari i xom da destim kird giryan.

Bo beyanîkey, katê le jûre zindanasa tarikeke da, dîmenî şewî dwênenê û coniyetiý ra-geyandinî em hewalle û peşokanî mallî Haşûş im bîr dehatewe, dillim zêtir teng debû. Le jûre zindanasake da leser tenekeyekî sardî qopaw danıştibûm, bêdeng, heniskim deda û le ber xomewe hon-hon degiryam. Le dillî xom da demgot: "Xetay xom bû", "bo ci şew le mallî Haşûş mamewe!"

Yazde mangî rebeq bû ke lew Byabaney başûrî Iraq da dejiyayan: hemû xêzanekeman (Dayk û Bawkim û xuşkêkî biçkollanem), min nemdezanî bo çi, nefi kirabûyne ew byabane wişk û germesêrey başûrî Iraq. Byabanekî, heta çaw birr deka, her çollewanî û wişkaiy bû. Min be dirêjaîy hemû ew heft salley rabirdû y mindallim, ke hemîse le kwêstan û le naw şax û daxî rengîn da dejiyam, jiyan û guzeranî ew byabane gele lesor dill giran dehat. Tenanet wa bizanîm bo dayk û bawkim jî heman shit bû. Be dirêjaîy hemû ew yazde mangey lew byabane da büyn, tenê mallî Haşûş û malle arabekî din hamûşoyan dekir-din.

Bawkim bo ewey bitwanêt bexêwman bikat, her sê-çar roj carêk, begel bawkî Haşûş dekewit; deçün (nazanîm le kam gündî nêzîk awaîyek) túryan dekirri û dehatînewe le awaîyekê da deyanfirostewê.

Min jî hemû beyaniyek, legel Haşûş, deçûn le zelkawekî pîsi dûredesî awaîyekê da, ke hemîse pîr bû le mês û megez, masî y "Curre" man degirt û dehatînewe le awaîyekê da demanfirostînewe. Ewaran jî, legel Haşûş û mindalle arebakanî dikey awaîy, deçûn le nêzîk mallî Haşûş, le çollewaniyekî wişk û birîng da ke tenya çend birrke-xurmayekî lê bû ûşewan huştirekanyan lejîr debertewe, yary î futbollênman dekird.

Min zor hezim le futbollên dekird. Hemîşê nexseyekî yarıkkirdinî futboliênim pê bû: nawî hemû mindalle yarıkkere kanîm lesor nûsibû, şwêñ û rollî her yekêkiyanim "hicum", "difaa", "hedef", be hêma û hêlli corawcor lesor nexsêke dyarî kirdibû.

Gelêk êwaran, katê le yarıkkirdinî futbollên şeker debûyn û şew ballî tarîk xoy beser byabaneke da radekêşa, itir legel Haşûş pêkra deçûynewe mallî xoyan, gelêk şewaniş her le mallî ewan da demarnewe û dexewtim.

Daykim pêy xoş bû ke min legell mindalle arebakanî naw gund yarıy futbollên dekem, deyut: "belkû legell mindalle areban fêri zimanî arebi debêt." Bellam bawkim, carêkyan-bem dwaîye- xoy lêm tûrre kird,

gutî:

- Be naxêrî gyanit ke le futbollên tewaw debî, şewan bo xewtin werewe kawilbûekey xot; meçwe malle areban.

Min iş gutim:

- Babe axir, ke tarîk dadêt, detirsêm bew byabane da bigerêmewe mall.

Têrre bû, gutî:

- Çawit derdehat. De kewate waz le futbollên bêne.

Bawkim rastî dekird. Eger ew êwareye, le dway futbollên gerrabamawe mallî xoman û şew le mallî Haşûş nemabamewe, itir le dayk û bawkim danedebirram, tûşî ew çurtîme û em bedbextiyey niha nedehatim. Xetay xom bû. A. Xetay xom bî.

Le jûre şêder û tarîkeke da, wam be xom degot. Dillim xerîk bû şeqî debird. Le dirzekî dergakewe temasay derewem dekird: bîrim le bawkim dekirdewe, bîrim le daykim dekirdewe, le xuşke biçkolle xincilanekem. Detirsam lem maweyey êsta da ke min lem jûre zindan asaye da ragîrawim, malleweman swarî kamionî serbazî biken û rayanbigwazinewe, idî carêkî din hergirawhergîz neyanbînmewe.

Ew jûre zindanarayey minyan têda ragiribû, cêgayekî kontrolî polis bû, parêzgarî ew nawçeyey byabanekey dekird. Tenê nîw seatêk le mallî xoman dûr bû. Jûrekî firawanî şes pallûy bû, tarîk, şêdar; diwarekanî be bilok û berd "hendê şwênişî be teneke û bermîl" dirust kirabûn.

Ew beyanye, xor taze xerîk bû gizingî deda, min zû mallî Haşûş imbecê hêşit. Be naxêrî giyanîm, gutim: "ba rêga ke qedbirr birrim û be lay cêgay kontrolleke da bigerrêmewe". Keçî ke geyîştime lay cêkontrolleke, polise arebeke, lewber, herke çawî be min kewt, weku ewey be dirêjaîy hemû jiyanî, hergîz lew byabana da çawî be besar nekewtibêt, tifengekey arastey min kird, hawarî kird, gutî:

- Ogef! (1)

"Axir çim kirdiwe!?", "Seyre!", "wa dû seat ziyatiye", "bo ci miniyan lem jûre da râgirtiwe!?", "tawanîm çiye!?".

Lewe ziyahir xom pê ranegirî, dergakem kirdiwe û çûme derewe. Ke geiştîme ber dergake, poliseke yekser tifengekey le şan kirdewe û rûberrûm hat. Xoy lêm gîv kirdiwe, be arebiyekî cilfi i wişk şîrandî be serim da:

- Hetîw, pêt dellêm: biço jûrewe!

Le şîrrandinekey netirsam, bellam le hejmar xemî malleweman, azarêkî sexit be rohim da gerra, lallamamewe, gutim:

- Malleweman. Daiyk û bawikim!

- Mallewetan çî?

- Derron. Becêm dehêllin.

Wekû ewey galltem pê bikar, yan biywêt lasaiyîm bikatewe, be tûrreiyewe gutî:

- Bo kwê derron?

Gutim:

- Nazanim. Ramandegwêzinewe.

- Kê ratandegwêzêtewê?

- Hukmet. Hukmet ramandegwêzêtewê.

- Berew kwê?

- Bo Êran.

- Direw dekey. Pêştr ji emet gut.

- Diro nakem be xwe, ramandegwêznewe.

Nazanim berew kwê?!

Be bêbakîyewe gutî:

- Biço jûrewe, çawerê bike!

Demzanî ke disan mebestî ewe bû ke çawerêy "Reiys" bikem (ke le jûrewe nustbû) ta le xew heldestêt û xoy lêm bipirsêtewê. Her leberdem dergay jûreke da, disan rûm kirdewe poliseke, wek ewey daway lê bikem bezeiyî pêmda bêtewe ya xatirim bigrêt û iznim bida; destim bo jûrewe dirêj kird, gutim:

- Nustûe.

Gutî:

- Çawerê bike ta bexeber dêtewê!

Gutim:

- Hellî bistânim?!?

Gutî:

- Ne. Nekey. Xoy bexeber dêtewê.

Gutim:

- Bexeber nayetewe.

Turre bû, hawarî kird:

- Dellêm: biço jûrewe!

Lew demeda, poliseki din, ke min pêştir nemdîtibû (Dyar bû taze hatibûe lay ew polisey harêy) le ser çiçikan, tifengeyekey le néwan laqekanî ragirtibû, piLTî be diwar dabû; hellisyewe, berew lay dergake hat. Rûyi kirde min guî:

- Başe, êwe nefî nekirawnete êre !?

Be qisey ew polise dillim xoş dahat, gutiwi:

- Ba.

- Edî çon dibêjî "ramandegwêzinewe" ?!

Ratandegwêznewe berew kwê?!

Giryam, gutim:

- Nazanim!?

Le nakaw ew ji tûrre bû, gutî:

- Edî bem beyaniye zû le kwê bûy?!

Xellik bem sibeyney sallinan lem sehayre ci dekat?!

Bûarı bersivdanewey nedamê, demûdest kaxezekî bor, girmollebûy le baxelli xoy derhêne; ditim kaxezekay xom bû. Ew kaxezey nexsey yarîkirdinî futbollênim leser dirûst kirdibû. Polisekey pêşû lêy sendibûm û dabûy be ew. Kaxezekay pîşan dam û be dengekî tûrrey naqollawe, gutî:

- Em kaxezê çiye pêt, ha?!

Paşan tifengekey şanî hellixizande piştiyewe û tund qollî girtim, raykêşame lay xoy. Danuştayewe, kexezekay le rûm nîzîk kirdewe; pence qeliştawiyekanî xiste ser hendê swêni ser "nexşeye", be peşokenekî le radebedar gutî:

- Hicûm, Difa, Hedef... Em şitane ci lêra nûsiwtewe, ha?!

Min bîrim dekirdewe; be lamewe zor seyr bû, demgut: "Em du polise xo arebişin, bellam boçî lewa tênenag kû ew peyvane peyv û zarawey yarîkirdinî futbollin?!"

Tund gwêi girtim û sermî legel bada. Simêlli gîv, çawîşî lêm zeq kirdewe, gutî:

- Em nexşeye çiye pêt, qise bike! Î texribate?!

Minîş le taw azarî gwêm, nûzamewe, gutim:

- Nexşey yarîkirdin î futbollêne.

Gwêmî tundtir bada, du caran sermî legel

aweşand, gutî:

- Hemîşe em qise nefretbare dûbare de-teytewe! "Hicûm", "Hedef", "Difai..." em iemû nave, em hemû işarete seyr û semerane! Qise bike, to çit!?

Minîş nemdezanî billêm çî. çâş mabû. Le ew sugwari û azarı xom da, hez heniskim leda û denawramewe. Le kotaîy da gwêmî şerda, şanîmî wersûrrandewe û berew jûrewê pallêkî pêwe nam, gutî:

- Biço jurewe, dey, ta "reîys" bexeber lêtewe.

Minîş her dellallamewe, demgut:

- Malleweman. Derron, becêm dehêllin. Le jurewe, naçar, be dem heniskewe, cûm eser teneke sarde qopaweke da danıştimewe. Jareserî dîkem nebû; debûaye çawerrey ew iyiye nustûe bikem, ke ewan nawiyan lê labû "reîys", ta le xew heldestêt û ew-xoy êm bipîrsêtewe.

Em çawerrê kirdine bêhûdeyem lew jure arîk û zindanasaye da, be rastî way lêm dekird iest bikem ke em piyawe nustûe "reîys" taqe imêd û taqe hîwayeke bo azad bûnim; çunke em maweye da hemîşe bîrim le ew dekirdewe. 3em tişte jî dillim xoş dadehat, demgut: "reîys lewaneye kabirayekî dinyadide û awkirawê bêt", Serî le futbollêñ derbiçêt û ızanê ke em nexşeye nexşey casûsî û texribat îye, bellkû pilanî fubollêne"; "eme xwaye, şeskû azadim bikem û bigemewe mallewe, ay dayk û bawkim!"

Le jureke da siçenîm nedegirt, her bîrim de-irdewe û çawim be dewri xom da degêrra. urekş hênda tarîk bû ke hîç şîtêkim bo ledebînra: teniya sê sisemî kon ( ke ekêkiyan kabiray reîys leserî nustibû), ewanî lin jî komelêk cilûberg û qayş û postallî ser-aziyan leser firrê dirabû, herweha dû mêzi war ke yekêkiyan pankeyekî şikawî leser bû, wey din jî zembilek-wabizanîm xurmay têda û; mişik û s'sirik teratêniyan be dewri da ekird. Be xomim gut: "Seyre!?" "Le kazîwey m beyanîyewe minyan lêre ragirtiwe", "em emû denge-denge, ew hemû nalle û giryaney iin, çon kabiray raîys gwêy le hîç nebû?";

"çon bew hemû denge-denge her bexeber nahêtewe!?"

Leser teneke sarde qopaweke da danıştibûm û serincî piyawe nustûekem deda. Betanîyeyekî be xo dadabû, tenê simbel û ser û sekûti be derewe bû: bêdeng, bê ewey hîç mirxeyek, hî culleyek bikat, tenanet hîç nişaneyekî ne mandûy, ne xewinbinîn, hîç tiştekî jîyanî beser ruxsaryewe dyar nebû.

Dillim kewte xitûre, be xomim gut: "Detirsêm kû em piyawe le herdû polisekey dikes mendebortir û kellereqtir bêt"; "reîsyane", "xo lewaneye reîysi hemû em byabaneş bêt"; "reîys hemû tiştekî le dest dêt", "herçî bixwazêt dekat".

Zor lewe detırsam, -ke idî eger hosa bêt, nek her tenê dayk û bawkim becêm dehêllin û taze çitir birray-bibrî nayanbine, belkû tenanet le kotayıda sebaret bem parça kaxez negbebiye, gullebaranîsim deken.

Çarege seatekî din jî, her be dem em dilerawkê û nîgeranîyewe katim birde ser. Lew maweye da sê caran dengî girregirri utumbêlim kewte ber gwê (ke zyatir be dengî kamionî serbazî deçün) le dûrewê, leserto, ret debûn û têkell be dengî segwerrêk debûn. Hemû carêk, legell girre-girri her kamionek da demgût: " Ewe malfî êmeye; dayk û bawk û xuşke biçûkekey mine, "rayandegwêznewe". Nemdezanî axo berew ci mellbendêk, ci hewarék!?

Totikem lê birra bû, xom pê ranedegîra. Lenakaw, disan repê bûmewe, dergakem kirde-we û çume derewe. Le pêş dergake da temasam kird: pêş dergake kesî le nebû. çawim bem la û bew lay xom da gêrra: hîç kesekî lê nemabû. Ew nawe be tewawetî çoll û holl bû. Sêrem girte dû, ditim: komelek huştır le bin birrke-xurmayek da besti-rabûnewe.

Lew dema da, lew çollî û bêdengîye samna-key ew byabane sillemamewe. Hestim be namoy û tenyaîyekî kuşinde dekird. Bê ewey xom bimewê, be na agaîyewe "wek ewey hogiry û kone peywendîyekî zor be tûn berew lay kabiray reîys kêşim bikat" gerramewe

jürewe. çûme nêzik sîsemekey, rawestam.

Destim dirêj kird, bêdeng, qollim raweşand. Hiç culleyekî lêwe nehat. Carekî din jî qollim raweşand, bangîm kird: "Reîys, Reîys". Keçî hiç wellemekî nebû. Emcare betanyekem le seri û destîm beriz kirdewe: Ke destîm berda: bê culle, bê giyan, beser leşî da kewte xwarewe. Zanîm ke itir "Reîys" mirdiwe!

Bedyar meytekewe, le jure xamoş û tarîke da xerik bû zendeqîm deçû. Wîstîm le zirre bidem, bellam ne, yekser ram kirde derewe.

Le pêş dergake da, dîtim, lenakaw, çwar polîs, lem la û lew la, xoyan lêm gîv kirdewe, be şillejawî, berew rûm dehatin; rûy tifengekanyan le min kirdibû. Wek ewey byanewê hawar biken, yan byanewê teqem lê biken, xoyan lêm danûsandibû, le dûrewe, hêwir-hêwir, be lûley tifengekanyan gemaroyan dam.

Min le cêm xom nebizûtim, be hepesawî temasam dekirdin, dû polisekey pêşû, legell efendiyek "ke qerewêtekî şînî hestibû", le na-werrastewe rûberrûm dehatin. Yekêk le dû polisekan be çwar polisekey dikey gut:

- Bîgirin!


Efendiyek qerewêt şîneke jî, be morre kirdineki dujminanewe, hêdî-hêdî lêm hate pêşewe. Le polisekey pîrsî:

- Xoyeff??

- Bellê, xoyetî.

Lew dema da gwêm lê bû. Le dûr, dengî girre-girri kamionekî serbazî, hêwir-hêwir, awayiekey becê dehêşî û dûrtir û dûrtir dekewtewe.

Parîs, zistanî 1989



"Niviskari Kurd" Yusif Salih: Jinêv- 1991

# GEDEDÊ WEDATÎ RÊ

## Mihem HIMBÊLIJ

Bihîwi!  
Wa çimê to yê rindî nêbermê.  
Eşqî reydi jiyan ra bewnî.  
însanî ra,  
nefret meki.  
Ayê ki,  
Pî to kişt,  
însanî nêbî.  
Qîmetê jîni,  
hinda heywanan zî çinîyo.  
Heywana zî.  
Merhemetê jîni esto.  
Zaf, zaf...  
Hetanî ki,  
şenê,  
hesbiki însanî ra.  
Bawer biki!  
Aw çax,  
heskerdoxî to,  
pî to,  
se ki,  
yew hewnêdo şêrîn di bo.  
Rehet,  
se yew gula sûri.  
çimkî,  
armaanca delalî,  
însanî ra heskerdiş  
û insanetey bî.

9-5-1992

## YEW HÊRS

Yew hêrs,  
mi çiman ro hamey.  
Belki kîfana bi,  
belki zî,  
telû yo ki giştan mîyan di bi.  
Kam ci zano?  
Qethina,  
nêbo, nêbo ha!  
Ti mi ra persê,  
dest tepiştoxî ra perski.

1991, Stockholm

## RAYNAZÎ

Hewrî,  
Arrixayê.  
Roj,  
Sey dizdî,  
xwi taldana anceno.  
Birûskî,  
tilîlî veyndanê.  
Eyan pûştey keno.  
Aşmana Nisan.  
Asmên bermenô.  
Dinya,  
xeyr û bêr.  
Wetendê xwi di,  
Teyr û tebûr.  
Ez,  
Sey boranda perşikta,  
bêwar bêdû,  
kêber û kuçandê xeribey di,  
geyrena.  
Eyan,  
rayna pûştey kerd.  
Emser zî,  
bêpar verda welatê mi,  
Na dinya q'apiki.

"Gededê Wedatî rê" û "Yew Hêrs" di hejmara me  
ya sêyemîn de ji derketibûn. Lê ji ber hin şâsiyêñ  
çapê em wan dîsan diweşînin. Em ji nivîskarê xwe û  
ji xwendevanê xwe lêborînê dixwazin.

# BI ZEHMETEY A AMEYO

## Koyo BERZ

Lazim o ma xorî xorî bifikirîyê û ser o vinderê. Goreya kî, no hendayê serî yo ma kewtê destan bin û kiş a zaliman û zordestan ra lete bîyê û tahda vînenê, fina jî ma kultur, edet, tore û ziwandê xo ra zaf vêsi cî vinî nêkerdo û xo pede nêviradayo.

Tahda, zilim, zalimey û zordestey bin di, heta ewro ma no çiyê xo domnayo, ramito û ardo resnayo no hal. Labrê çi reziley a ameyo û resayo ewro vanê kes hesab bikerô. Lazim o verê heme çi, ma spasey bikerê, qandê ê ki nê edet, torey, kultur, folklor û ziwanê ma ardo resnayo rojda ewroyenî.

Ez posena a (umid), emeley a mi yena ney a tepey a jî nesilê ma yo ki newe werzeno do bidomno, biramo û nêverdo pede şiro û werte-ra vinî bo. Heta ewro ne dewlet a ma bî û ne jî folklorê ma bi serbest ameyê domkerdenî. Heme çiyê ma qedexe bi.

Nê şart û şûrtan bin di fina jî ma xo ver da û ard resna ewro. Heta ewro zaf tay çi ma ser kuÎtur, edet, tore, folklor û tarixdê ma ser ameyo nûşnayenî û kewt o mileta ma dest.

Ser ra 1910 ra tepisi heta ewro tayn bo ji bi zeravandê kirdasî (kurmancî) û soraniya çi ameyo nûşnayenî û o yo yeno nûştenî.

Labrê bi dimili (zazakî) çiyo ki dest a tepêsiyo niyameyo nûştenî. Nê serandê bahdo yênan di jew jew enbaz vijiyayo, werist o, jew jew çi jew jew megale nûşneno.

Çend hebî jî kitabi ameyê çapkerdeni. Nimûneyê ferhengê Malmisanij i dimili, tirkî û kitaba ci ya folklorî.

Newe newe dest bi wendîş û nûşnayışdê zeravdê dimili bîyo. Heta ewro rind néronişt o û cayê xo nêgiroto. Labrê ez zaf çi posena, eger kes hewl bido xwi û ser o bigirweyo o do



roj bi roj ravey şiro û zengin bo. Wenda û nûşnayoxê ci do boli bê. Verê ney şes-hew serî kesi şayê wendox û nûşnayoxanê ci bi giş a bimisno.

Labrê ewro winî nîyo.

Vanê verê heme çi ma hewl bidê xo, fek eştenda pê ra, kişteni da pê ra, ling antenida pê ra viradê. Pê di raştî bê û pê nêtewnê. çerwçeweyê mîyan di dest û doşîyan bidê pê jew bê û qandê reyayeni, serkewteni û azadida welat û milet a xo bigirweyê û kar bikerê.

Bê jewbiyayeni, bê pê ser amyayeni, bê pê ra çi perskerdeni ma nêşenê ravey berê û çiyê xo dest finê.

Xebatê da jewbiyayê nêbo ma nêşenê çiyê ser finê. Ez werza parça kera, ti werzê parça kerê, alewî werzo parça kero, sûnî werzo parça kero, no hesab a serî ravêrê ma nêşenê nê parçan jew kerê û serkewê. Vanê ma fek çi do wina ra viradê û bewnî rê rewşdê dinyay. Şima zanê i dinya heme zano. Dişmenê ma ne jew o, ne didiyê?

Dişmenê ma zaf û bi quwetê. Jew jewî ra zalim, zordar, bêwijdan, bêbext û xayino.

Ma kiş a hîrê iraqan ra û çîhar dewletan ra ameyê letekerdeni.

Hemejî sereyê ma pay kenê, ma kişenê û talanê ma pê ra bara kenê. Roj çinîyo guniya ma nêrijnenê. Rojê ma yeno rojî xirabêri. Gunî da çend merdimana jî nêvindenê. Wazenê ki ma hemini bikişê û werte ra hewadê.

Wexro kima birê pê ser û jew bê, ê çend bi-quwet benê wa bibê, çend zalim û zordar benê wa bibê, nêşenê ma werte ra hewadê.

Wexto ki ma jew bê, dest û doşîyan bidê pê, ê nêşenê vêsi günîya ma birijnê û ma rê çiyê bikerê.

No çiharsey ser o Ereb, Ecem û Tirk o, ma ser o zalimey û zordessey keno. Ziwan û kulturê ma qedexe keno. Edet û toreyanê ma werzaneno. Ü gûniya ma rijnen.

Hewna ma yê nênenê pê ser, jew nêbenê û hemberdê ïnan di xo ver nêdanê. Xo ver dayena ma parce parce bena, qandê coy ji ser nêkewna. Ma ancax bişê pê di dişmeney bikerê û pê bikişê. Jew bî ma nêşenê çiyê pê ra saff kerê.

Dişmenan senî kerd, senî nêkerd fina jî nêşa ma asîmîle bikerê û werte ra vinî kerê. çend şenê wa dest dergey bikerê û gûniya ma birjinê. Rojdo bîro ê do nê hesabî diqat bidê. Heme ci jewbîyayenda ma ser o mendo.

Ma dişmenê xo rind bisinasnê, hile û kurdanê ci vejê, gorey bêbexteyda ci tawîz nêdê, jew heta ïnan, o bîn heta xo nêbo, no babet a ma lete nêbê û pê ra nêqetiyê, jew gan, jew beden hemberdê ïnan di vinderê, sileya ki ê wazenê ma ro dê, ma do a sîla ïnan, pey di ïnan ro dê. Lazim o ma weş bizanê ê yê ci babet a ma ser o kaykenê û ci hesab a ma danê kişteni û verdanê pê yo. Wexto ki ma nînan fahm bikerê, bizanê û nîrê kayandê ïnan, o wext ma do raya xo raşt kerê û rayda rasto şirê.

Bewnî rê tarixdê ma ra. Her wextê tarixî di nîfaq visto ma mîyan û ma pê di kerdê dişmen û dayê şîknayeni. Beg, mîr, şêx, axa, sereşir, pîl, esîr û milet a ma tim verdaya pê û pê di dayê kişteni.

Lazim o ma zaneye bê, çimanê xo akerê şorşmey (dormey) xo bewnîyê û gorey ey hereket bikerê.

Ma dost û dişmenî pê ra nîyabirnê, ma bi to pê rê dişmen vajê û pê di xayiney bikerê ma iêşenê çiyê ser finê. Vanê ma raştay bivinê û şê rê raştay vajê. Vanê ma weş bifikriyê. No şihar sey ser o dişmeno aman nêdeno ma. Qetli virazeno, ma bomba keno, tepşeno erzeno tepiştxane (zîndan) qersün keno, çekandê cîmyewîyan a veşneno. Vanê hember nê çiyan na hesab û kitabê xo virazê.

Wexto ki no ci wina beno, edet, tore, cultur, folklor û ziwanê ma jî kewno ver û liha vêşî nînan ser o vindenê û wazenê ïnan jî tok ra bifetisnê, asîmîle kerê û werte ra iewadê. Qenê kes nêvajo ez kurd a, yan jî surdi estê.

Estbîyayena ma încar kenê, hemberdê dinyay di zürker û încarcî vijiyê, labrê fina jî nêşermayê û verê zincîda ci nêveşeno. Heta nê serandê bahdoyênan kultur û folklorê ma qedexe bî. Bi nimitena fekan ra doş bîyê û ameyê. Jiyanê xo o babet a ramitê. Ewro qedexe bo jî, ma bikişê, berê zîndan kerê jî ma do binûşnê. Qandê ki ravêro petikan, ser û vinî nêbo. Ney a tepey a ma qedexen nêsinasnenê.



Ma cor di va, fekan ra ameyo resayo ewro. Lê vanê ma ê ki ardo resnayo ewro hezar fini sipas bikerê û xo ïnan rê deyndar his bikerê û bîhesibinê. Begleranê ma weda û qonaxandê xo di, sük û dewandê xo di, mehla û taxandê xo di kultur, edet û toreyê xo domnayê û folklorê xo dayê vateni. Bi dêri, lûli, saz, erbana û kayandê xo ya folklorê xo kerdê dînc û domnayê. Dewijan keyandê pê di şan ra heta şefaq pê rê me-seley, estanik û fiqrey vatê û heta şefaqê kîfê xo domnayê. Dérwanan (denbêjan) şan ra heta şefaqê dêrî kerdê û teklemey eştê pê ver. Aşıqanê ma bi lûli, saz, fitiki, erbana, niqara û zîrnandê xo ya roşan û veyveyê ma kerdê şenî, kerdê dewlemend û kulturê ma ramitê.

Na seati ra tepey a vanê bîro nûşnayni û mileti miyan ra vila bo. Eger kes ser o nêgirweyo, nênuşno, mileta xo miyan ra nêgeyro, pers nêkero û nêkeno çiyê ser nêkewno. Raya heme ci mileti miyan ra û jewbiyayeni ra ravêrena. Raya edebiyat, kultur, edet û toreyandê ma jî winiya.

Semedê min ê nê nûşti nuşteni, gazi kerdeña. Vanê enbarê ki ci dest ra yeno, edet, kultur, tore û edebiyatdê xo ser ci zanê, lazim o hewl bidê xo û ê çiyan bi ziwandê xo ya binûşnê. Winî nêbo ravey nêşino. Lazim o ewro didi meşti hîrê-çîhar, bîro bi desan a vêşîbê û rîzdê mileta xo miyan di cayê xo bigirê.

Heme ci hewldayeni û girweynayış a beno. Vanê ma na jûweri bizanê, kes loqmeyê xo yê hadrî kesi fek nêkeno. Bi gir weynayışa kes şeno loqmayê xo hadre kero.

Jewbiyayeni, jewbiyayeni, girweynayış, girweynayış û hewldayeni, ma rê lazim a.



Pirtûkê Nû

Kurta çirok

## KERKUJ



## AGROSE ALYANI

Fethullah HUSEYNI



## KUTSUŞU ÇİFT

## SCHİDAD

İsmail Hakkı

Dilek

1



Cemsiid Bender  
**KURT KIZI  
ZENGE**



BERFİN

